

Çi bikim ku qewî kesad e bazar  
Nînin ji qumaşî ra xerîdar  
Ger 'ilmî tamam biday bi polek  
Bifroşî tu hikmetê bi solek

**Ehmedê Xanî**

*Jiyanameya Kurdîniûsên Rojavayê Kurdistanê (Cild 1)*

Jiyaname.....2

# Jiyanameya

Kurdînivîsên Rojavayê Kurdistanê

Cild 1

Komkirin û amadekirin

**Dilawerê Zengî**

**Mafê çapê parastî ye**

Navê pirtûkê

**Jiyanameya Kurdînivîsên Rojavayê Kurdistanê (Cild 1)**

Komkirin û amadekirin

**Dilawerê Zengî**

Pêşkêşî

**Dr. Phil. Ebdilmecît Şêxo**

Pêşgotin

**Dr. Memo Abdî**

Tîprêzî

**Şengo Dumilî**

Bergsazî

**Ramî Misewer**

Çapa yekem

**2723k - 2023z**

Rojavayê Kurdistanê - Qamişlo

Çapxane

**Mîran**

Qeware: 17,5c.m X 25c.m

Jimara rûpelan: 560

Tel: 0963 938 077 414

E-mal: dilawerzeng@gmail.com

## Ji bo mîrê ronakbîran Celadet Alî Bedir-Xan



"Vî zemanî herkes mîmarê dîwarê xwe ye".

**Ehmedê Xanî**

"Şerma mezin ew e ko mirov nezanê xwendin û nivîsandina zimanê xwe be"

"Ziman mercê heyînê a pêşîn e. Yekbûna Kurdan jî bi yekîtiya zimanê Kurdî çê dibe. Yekîtiya zimanî bi yekîtiya tîpan dest pê dike".

**Celadet Alî Bedir-Xan**

"Gelî Kurdan!

Eger hûn naxwazin ji hev tarûmar û winda bibin, berî her tiştî, bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin, naskirin û hezkirin, û bi hevaltî û dostaniya milletên din re pêş ve herin û bi rûmet û serbilindî bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin".

**Nûredîn Zaza**

"Ziman dilê jîndar ê çandê ye, hîmê zanava neteweyî ye. Di nav sedsalan de, di nav jiyanê de, bi xebat, tevbûnî û tevkeriya bi milyonan kesan çêbûye, dewlemendiya hiş; hest û nêrînên mirovan nîşan dide. Ziman dîdarê şehrezayî û bajarvaniya gelekî, û neynika giyan û bîra wî ye. Sermayê wî yê dîrokî ye. Evîna zimên, di cihekî de, evîna gel e, evîna welêt e".

**Kendal Nezan**

"Dîwarê ku me ji dijminan biparêze, ziman e. Ziman, kesayetiya wî milletî bicî dike. Vêça, berî her tiştî divê em li zimanê xwe xwedî derkevin. Xwedî-derketin ji rêber, zana û rewşenbîran tê xwestin.

Ziman jî mîna; heybereke jîndar e; dijî, nesax dikeve û dimire; hişk dibe û geş dibe. Heger em guh nedinê û xwedî lê dernekevin, ji mafê zimanê me ye ku ew li welatparêziya me gilî bike".

**Dilawerê Zengî**





## Pêrist

Pêşkêşî .....	19
Pêşgotin .....	21
Abbas Ismaîl .....	27
Abbas Mohammad Abbas .....	30
Abdulkader Bedredîn .....	32
Alwan Şivan .....	33
Ammar Hesên Mûsa .....	34
Arşek Baravî .....	36
Arşevê Oskan .....	38
Baranê Cûmê .....	39
Bavê Nazê .....	41
Berzo Emer Mehmûd .....	43
Besam Mistefa .....	46
Beşîra Derwîş .....	49
Beşîrê Mele Newaf .....	51
Beşîrê Şêx Zahir .....	53
Bêwar Brahîm .....	55
Bîlal Mehmûd Hesên .....	56
Biradostê Mîtanî .....	57
Birahîm Qasim .....	60
Birahîm Xelîl Îsa .....	63
Boniye Cegerxwîn .....	65
Brahîm Mehmûd .....	68
Jiyaname.....	9

Can Bapîr .....	69
Can Birahîm .....	71
CanKurd .....	72
Cawîdan Kasanî .....	73
Cegerxwîn .....	75
Celadet Alî Bedirxan .....	79
Cemîl Ebdirezaq Dahir .....	85
Cemîl Ibrahîm .....	86
Ciwan Nebî .....	89
Ciwanê Abdal .....	90
Deham Ebdulfetah .....	92
Demhat Dêrikî .....	94
Dîlan Şewqî .....	95
Dilawerê Zengî .....	97
Dilbirîn Mihemed .....	106
Dildarê Mîdî .....	108
Dilêrê Kurd .....	110
Diljan Cûdî .....	113
Dilovan Çeto .....	115
Dilovanê Deştê .....	117
Dilşad Murad .....	120
Diya Ciwan .....	122
Diyaa Receb .....	124
Ebas Mûsa .....	125
Ebdelah Şêxo .....	126
Jiyaname.....	10

Ebdil'ezîz Ferman .....	128
Ebdilhelîm EhmedLawî .....	130
Ebdilhelîm Elî .....	131
Ebdilmecît Şêxo .....	133
Ebdilselam Xoce .....	138
Ebdulselam Nacî .....	139
Ebdulsemed Dawûd .....	140
Ebûdê Mexso .....	142
Ednan Mustefa .....	144
Ehmed Hesên Tahir .....	146
Ehmed Huseynî .....	147
Ehmed Mistefa .....	149
Ehmed Şêx Salih .....	150
Ehmedê Namî .....	152
Ehmedê Palo .....	156
Ehmedê Zivingî .....	158
Elî Cefer .....	160
Elî Çilaxa .....	163
Elî Mihemed Salih Şemdîn .....	164
Elî Şêxo Berazî .....	166
Emerê Lalê .....	169
Enes Hec Qasim .....	171
Enwer Sofî .....	173
Evdî Çaço .....	175
Evîndarê Xemgîn .....	176
Jiyaname.....	11

Ferhadê Çelebî .....	179
Ferhadê Içmo .....	180
Ferîd Cizîrî .....	182
Ferîd Xelîl .....	184
Fethula Huseynî .....	185
Fewaz Ebdê .....	186
Fewaz Osê .....	188
Fewziya Qiço .....	190
Feydullah Xeznewî .....	191
Fîxan Hîmo .....	193
Gewher Fetah .....	195
Gulal kasanî .....	196
Gulistan Awaz .....	198
Gulistan Sîdo .....	200
Hadî Behlewî .....	203
Hafiz Abdulrahman .....	205
Hamid Bedirxan .....	207
Helîm Yûsiv .....	210
Henîf Yûsiv.....	213
Hesen Hişyar Serdî .....	215
Hesen Omer Hesen .....	224
Hewar Qasim .....	225
Heyder Omer .....	226
Heznî Haco .....	229
Hisên Omar .....	230
Jiyaname.....	12

Hisên Xerbî Abbas .....	232
Hoşeng Broka .....	233
Hoşeng Osê .....	236
Hozan Girkundê .....	238
Husên Hebeş .....	240
Husên M. Hebeş .....	246
Ibrahîm Abbas Ibrahîm .....	250
Ibrahîm Xelîl .....	252
Imer Kalo .....	254
Imran Isa .....	256
Imran Yûsiv .....	257
Imranê Menteş .....	259
Isa Mihemed Xelo .....	261
Ismetê Seyda .....	263
Jan Dost .....	265
Kamiran Bedirxan .....	268
Kamiran Haco .....	272
Kamiran Haj Abdo .....	273
Kawa Şêxê .....	275
Keça Kurd .....	277
Keleş .....	279
Konê Reş .....	281
Lawkê Hacî .....	285
Lazgîn Dêrûnî .....	287
Lema Elî .....	288
Jiyaname.....	13

Leyla Reşo .....	290
Lorî Tildarî .....	291
Luqman Abdulrehman .....	293
Luqman Osman .....	294
Luqman Yûsif .....	295
Mahîn Şêxanî .....	297
Mehfûzê Mele silêman .....	299
Mehmûd Akko .....	300
Mehmûd Badilî .....	301
Mehmûd Birîmce .....	304
Mehmûd Omer .....	306
Melevan Resûl .....	308
Memo Abdî .....	311
Merwa Birîm .....	314
Merwan Berekat .....	315
Mesûd Dawid .....	320
Mîdiya Merwan Berekat .....	322
Mihemed Bakro .....	324
Mihemed Ebdo Elî .....	326
Mihemed Elî Hiso .....	328
Mihemed Elî Şakir .....	329
Mihemed Emîn Reşîd Sa'dûn .....	331
Mihemed Hemo .....	334
Mihemed Şerîf Berzencî .....	337
Mihemed Şerîfê Cilînî .....	338
Jiyaname.....	14

Mihemed Şêxo .....	342
Mihemed Xelef "Rêwî" .....	344
Mihemedê Cemîlê Seyda .....	346
Mihemedê Pîrê .....	348
Mihemedê Seyid Husênê Sîtî .....	349
Mîral Zîlanî .....	350
Miş'el Osman .....	352
Miş'el Temo .....	354
Mistefa Tewfîq Mihemed .....	355
Mizgîn Hesko .....	357
Mohamed Jumaa .....	359
Muhemed Ehmed Reşîd .....	360
Muhemed Salih Cuma .....	361
Muhamed Zeyno .....	365
Mûsa Dilbirîn .....	366
Mûsa Zaxuranî .....	368
Mustefa Emîr.....	370
Mustefa Reşîd .....	372
Mustefayê Hilêliyê .....	376
Narîn Omer .....	379
Nayif Şêx Çolo .....	383
Nêrgiz Ismayîl .....	384
Newafê Bişar .....	386
Nizar Yosif .....	388
Nûredîn Zaza .....	391
Jiyaname.....	15

Nûriyê Hesarî .....	397
Nûşîn Bêcirmanî .....	399
Osman Sebrî .....	401
Pîr Rustem .....	421
Qadir Egîd .....	424
Qado Şêrîn .....	427
Qedrî Can .....	431
Qehar Silo .....	440
Raman Hesê .....	441
Rêber Hebûn .....	442
Resendar Misûr .....	444
Reşîdê Kurd .....	445
Rewşen Bedir-Xan .....	448
Rezoyê Osê .....	455
Ridwan Yûsif .....	459
Rizoyê Xerzî .....	460
Rojdiyar Xelef Hemê .....	461
Rojîn Mihemed Mûsa .....	463
Ronê Elî .....	464
Rûken Silo .....	468
Rustem Welat .....	469
Rûxweşê Zîvar .....	471
Salih Bozan .....	473
Salihê Heydo .....	475
Samî Mela Ehmedê Namî .....	481
Jiyaname.....	16



Sawuşka Ammar .....	484
Sebxetullah Seyda .....	485
Selah Eldîn İbrahim Seyda .....	487
Selah Mihemed .....	489
Selam Darî .....	492
Serdar Keleş .....	493
Serhan İsa .....	495
Seyfidîn Qadirî .....	497
Silêman Azer .....	498
Siyamend Birahîm .....	499
Stêrê Çelo .....	500
Subhî Ahmad .....	501
Şahîne Bekirê Soreklî .....	502
Şama Mihemed .....	505
Şev Hesên .....	507
Şiyar Alyanî .....	508
Taha Selîm Husên .....	510
Tengezar Marînî .....	511
Tewfîq Huseynî .....	513
Tîrêj .....	516
Vejîna Kurd .....	519
Xalid Cemîl Mihemed .....	521
Xalid Umer .....	523
Xalis Misewer .....	524
Xelîl Kalo .....	525
Jiyaname.....	17

Xelîl Mihemed Sasonî .....	526
Xembar Gul .....	527
Xemgîn Remo .....	528
Xemgînê Xanî .....	530
Xoce Ferec .....	531
Xorşîd Ehmed .....	532
Xoşman Qado .....	534
Yasînê Eliyê Bekir .....	535
Yûnês Şêx Nasan .....	536
Yûnis Hemê Husên .....	538
Yûsivê Berazî "Bêbuhar" .....	540
Yusra Zibêr .....	543
Zagros Osman .....	544
Zagrosê Haco .....	546
Zahid Mehmûd Xelef .....	552
Zara Salih .....	553
Zekeriya Efrîn .....	555
Zerdeşt Haco .....	557
Zubêr Ehmed Zînal .....	558

## Pêşkêşî

**Dr.Phil. Ebdilmecît Şêxo**

Niha di nav destên me de (Antelociya ) nivîskar, helbestvan û lêkolînerên Rojavayê Kurdistanê bi pênûsa helbestvan, lêkolîner û rojnamevan Dilawerê Zengî, nûh jidayik bûye.

Dilawerê Zengî bi çalakîyên xwe ji aliyên rewşenbîrî, nayabkirinê û weşandina berhemên xwe bi Kurdî û Erebî li sê herêmên Rojavayê Kurdistanê, Şam û Helebê baş nasdar e.

Nivîskar Dilawerê Zengî di vê berhema nirxuha de gavek gelek payebilind di warê danasîna pênûsên Kurdî de avêtiye û ewî bi cevakêşiyek mezin valahiyek berferê di çanda Kurdî de dagirtiye, ewî bi vê pirtûka xwe ya nûh; ne tenê pirtûkxana Rojavayê Kurdistanê dewlemed kiriye, lê belê ewî ya tevayê Kurdistanê dewlemendtir dike û hemû pênûsên çalakvan bi gelê Kurdîstana mezin dide naskirin.

Belê! Nivîskarên pir navdar û pêşengên çand û rêzaniya Kurdweriyê yên ku ji ber sedema têkçûnên raperîn û şoreşên Kurdî penaberî Rojavayê Kurdistanê bûne, mîna Celadet Bedirxan, Qedrîcan, Cegerxwîn, Osman Sebrî û hin wêjevanên din di vê berhema nûh de cihên xwe girtine.

Di rastiyê de; wek gelê Kurd di metelokekê de dibêje: (giya li ser koka xwe şîn dibe) wisa jî wêjeya Rojavaya Kurdistanê li ser koka van nemir û gorbuhîştên jorîn de şîqin daye.

Em kanin bêjin ku nivîskar Dilawerê Zengî gelek cefa daye xwe ku di vê Antelociyê de navên (240) nivîskar, helbestvan, çîroknivîs, romannivîs, zimanzan, lêkolîner, wergervan û zargotinasan li gorî Alfebeya Kurdî û tev navnîşanên berhemên wan bi xwendevanên zimanê Kurdî, zaravê Kurmancî bide nasîn.

Herweha em li gor nirîn û bawerîya xwe dibînin; du sûdên giring û serekîn di vê Antelociyê de hene:

1-Beşên ziman û wêjeya Kurdî li hemû zanîngehên Kurdistanê kanin van berhemên nivîskar û lêkolîneran wek çavkaniyên giring di pîşeya wêje û zimanê Kurdî de bibînin û sûdên baş ji wan wergirin.

2-Kurdnasên welatên Ewropî û hin welatên din biyanî kanin navên berhemên Kurdên Rojavayê Kurdistanê nas bikin û ew bibin sedemên lêkolîn û nirxandinên nûh.

Li dawiyê; divê em pir ji nivîskarê navdar re spasdar bin ku ewî gelek dem ji bo pêkanîna vê berhema nirxbuha terxandiye û pêwendiyên cuda, cuda li hundir welêt û li dervayî welêt kirine û samanek dewlemend pêşkeşî pirtûkxana Kurdî kiriye.

Herweha jî ez gelek spasiya nivîskar Dilawerê Zengî dikim ku ewî ev pêşkêşiya hilpesartiye ser milê min.

EFRÎN - ÇIYAYÊ KURMÊNC

22. 02. 2023

## Pêşgotin

Çanda Kurdî li ser dev û lêvên bikarhênerên wê, qeyraneke rasteqîn dijî, wisa jî tê sextekirin li ser heman navên qaşo hilgir û danerên wê ne.

Di hemî çerx û qonaxan de, pişaftina mirov, regez û ta gelan di riya qedexekirina zimanê dayikê yê resen de tê encamdan.

Pir nîrxine şaş di civaka Kurdî de hatine çandin, bi sedemine curbicur, û piştî wan tê rastkirin gorî behaneyine bê binema. Ev jî bextreşîya Kurda ye, ku carcarna bi xwe qelena van destêwerdanên nebabetane didin, bê ku ew zanibin, ka çi sûd û mifaya gelê Kurd tê de heye?.

Ji xwe ger em awireke bilez li ser serpêhatî, bobelat û komkujiyên ku di dermafê Kurdan, jîngeh û şaristaniya wan de encamdane vedin, bêdurû, em ê pêrgî rastiyeke nehej û cîhgir bibin.

Ew jî bi hevokeke asan puxtedibe; ta ku Kurdan ji Kurdayetiya wan dûrbixe, pêwîste, ku zimanê wan bi wana tehl bike û li wan qedexe bike. Di encamê de Kurdekî fedîkoyî, şermok, ji xwe nebawer û dijî ziman û çanda xwe derketiye.

Man û zindîmana miletekî bi berhemên wî yê rewşenbîrî ve girêdayî ne. Ger tu bixwazî miletekî bibînî, ka çi qas ev millet şaristanî ye, zindî ye û jiyanez e, pêwîste, ku tu li tûrikê wî yê afirandin û dahênanê temaşe bikî.

Erê ne timûdayim miletek dikeve dîrokê ji berfirehtirîn û bilindtirîn deriyên wê ve, lê guman tê de nîne ku milletên xwedî dîrok û şaristaniyeke bê-hempa pencemora xwe bi şeweyekî erênî li ser herikîn û encamên qonaxên çarenûsane vedidin. Berevajî hîn milletên ku bi awayekî hovane şopa xwe di dîrokê de kolane.

Helbet Rêgezên avakirina mala Kurdan û parastina paşma û zengîniya keleporî, ne tenê bi çek û cengan tî bidestxistin, lê bi şakarên afirîner û destanên wêjeyî cihekî bi rûmet di cîhana gelên zindî û dewlemend de distînin.

Li vir pirseka seyr xwe davêje holê; çima evqas giringiyê hûn didine zimên?, bi ser de jî pir netew û millet hene ku karîbûn welatên xwe çêbikin, bê ku zimanê wa yê netewî hebe, berevajî van hemî rewşan zimanê dagîrkeran ji xwe re hilbijartin û kirine zimanê fermî, Ta ku Hêdî hêdî bû regezekî girîng ji mala wa ya netewî. Nimûne pir in, Pêwîstî bi bîranînê nîne. Giring e, ku em xwe bi van tiştan nexapînin û barê Kurdewariyê ji ser stûyê xwe navêjin.

Baş e, ziman endameke ji komendama neteweya Kurd e, bê wîna dibe, ku dawî li Kurda bê, jiber ku ne bi dest û vîna Kurda ye, ku dijminên wan di wêrankirina zimên de biserketine û piştî Kurdan şikandine. Dûv re Kurd naçar kirin, ku bi zimanê serdest û dagîrkeran hizir bikin û di Yarîgeha afirandinê de wana werbikin, derfet li pêşiya Kurdan nema ye, da ku li benda qonaxa perwerdeya bi Kurdî destpêdike û fêrbibin. Ew jî belkoya bidestxistina vê derfetê hê ne diyar e, dibe ku bi dihê salan berdewam bike, ger ne sedsal bin.

Ji xwe di rastiya xwe de rikberiya me bi dijminan re ne tenê di gorepana şer û cengê de ye. Ger di qonaxine dîrokê de ev helwest li ser me sebandibin jî, lê bi xwe cenga herî bi encam û wate cenga rewşenbîrî ye, heta radeyekê şaristanî ye. Me jî zû bawerkiriye, ku pêwîste timî tiving û hûravêj li milên me bin, ne ku pêûs û tînûs. Bi qasî ku talanker û dagîrkerên Kurdistanê xwestine, dîmenê afirîner û ronak ji ser tevgera azadîxwaz a Kurdistanê rakin û wêneyekî sexte û bêmirês ji cîhanê re bidin xuyanîkirin, erk û berpirsiyariya ronakbîra ye, ku rasteqîniya mafdariya gelê Kurd vegeşînin, da heme diyar bibe; ka ew bedewiya têkoşîna me û pîrozmendîya xebata rewşa ku li hember zor, destdirêj û stuxwariyê?

Ji xwe bextê Kurda ta îro reş e, bi fermanê nebûna delîv û derfetan bo perwerdeya bi zimanê xwe, nexwende mane û di çerxa helandina zimanên serdest de geriyane û hatine hêrandin. Ew qonaxa serxweşî û şabûna bi zimanê dayikê nedîtine û hertim bûne siwarê hespa zimanê biyanî û zordestên xwe, ji lewre peya mane, sêwî, tazî û riswa mane.

Ma ji xwe ne dûrî aqila ye?, dema ku tu bindest î, zimanê te li te qedexe dikan, çanda te ji te didizin, kelepûr, zargotin û hemî hebûna te ya gelêrî dikan

ya xwe, piştî van hemî bînpêkirinan tu bibêjî, ne girîng e, ku ez bi zimanê xwe biaxîfim û biafirînim. Aya Navê vê helwestê çiyê?, ger ne xwexapandin be, yan jî reva ji erkê xwe yê rewşenbîrî be, ma gelo wê navê wê çi be?.

Ez ne dij im, ku milletên bindest bi zimanê serdestan dîroka xwe binivîsin û berhemên buha pê dahênin ta qonaxa ku bibine xwedî zimanekî xwe yî standart û nûjen. Bedbîn im ta radeyekê, ku ev xewn wê di rewşa Kurdan de pêkane be!.

pir gelan bi zimanê dijminên xwe cengên rizgariyê gerandine, di encamê de serxwebûna xwe wergirtine ta demeke dirêj zimanê heman dagîrkerî bikaranîne.

Bes ev kiras li bejna doza Kurdan nayê û nehevşeweyê wê ye. Kurdistan mîna ku Îsmâîl Beşikçi navê " mêtîngeheje navdewletî" lê dike, ne mînaka ku Cezayîr ji hêla Ferensiyên ve û ne jî nimûneya "Hindistan" e ku ji aliyê Îngilistanê ve hatibûn dagîrkirin. Navê wan li wa bû. Ferensiyên digotin Cezayîr millet û welatek e, lê dagîrkiribûn. Heman boçûn Ingîlîzan jî hevpar dikirin sebare Hindistanê.

Sereray van nêrîn û bîrokeyan, dagîrkerên Kurdistanê ne Kurdan nasdikin û ne jî xwe dagîrker dibînin. Tevî ku Kurd bindest in û welatê wan dagîrkirî ye, mixabin nenaskirî ye û bê nav e.

Turk, Ereb û Fars ve dîtaneyê napejirînin û rîjd in li ser nêrîna ku Kurd ne xwedî welat û erdnîgarî ne, zimanê wa paşketî ye û nabe perwerde û afirandin pê hebe. Ev e Xala bîngêhî e «ku pêwîste em xwe bispêrinê û li ser wê helwestan avabikin. Li hember ve qirkirina rewşenbîrî û komkujiya sipî, ku xwe dihingivîne giyan û zimanê gelekî, kuştina rewîştên herî pîroz di bîrdanka wî de. Ka rewşenbîr, şehreza û hişmendên wî çi dikin?, erkên xwe nas-kirinê?, li hember van êrîşan çi amadekirine?.

Eger ronakbîr û aqilmendên zordestan Kurdan mîna netew nabînin, mafên wan yê xwezayî nasnakî û zimanê Kurdî weke gunehekî mezin dinirxînin, ji van destdirêjiyan û pêlêkirinan xerabtir û riswatir tiştêkî dîtir

heye gelo?. Ger em van bêrûmetiyan nabînin û zêdegaviyan hestnakin, çi ji Kurdewariyê di me de heye?.

Ji vir û pê ve, gereke hişemend, afirîner û tagirên Kurdî di hemî biwarên têkoşîn û reftara xwe de, hinekî bi berpirsiyarî liv û tevgera xwe bidin pêş. Xwedîderketina li zimên, parastin û dahênana pê, êdî yek ji binemayên her kesekî ye, ku xwe dibîne heyran û dilêşê gelê xwe. Nivîsandina bi Kurdî ne heme diyardeyeke hezkirina ji zimên e û çespondina arezûya ye , na û sed carî na!, jê wêdetir nîşana helwesteke rewşenbîrî, Kurdperwerî û mirovperwerî ye. Bersiva xweragirî û berxwedana dijî êrîşên dijmirovane ye, ku jiholêrakirina şaristaniyekê û netewekê armanc digre.

Ger em li dîrokê vegerin û waneyan jê derxin, şakarên Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Mela Mehmûdê Beyazîdî, Hacî Qadirê Koyî, Husên Hiznî Mukriyanî, Mihemed Emîn Zekî, Bedirxanî, Memdûh Selîm Beg, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Tewfîq Wehbî, Mûsa Enter û hwd bersiva xwe dane li hember dîrokê û bac û xûgiyên girêdan û pabendiya xwe bi zimên ve bêperwa dane.

Ger van xweşmêran ev şaheserên giranbuha ji me re tomarnekiriba, menê bi çi rengî xwe bi dîrok û zimanê xwe paye bikirana?, ger Ehmedê Xanî mîna helbesvan û nivîskarên îro bigota : ziman ne girîng e û ezê bi turkî yan bi farisî Mem û Zîna xwe binivîsim, wê ziyar bi Kurda bikire, yan na?. Ger Celadet ziman û ABeya Kurdî ji xwe re nekiribe kar û xebata rojane, em Kurd sêwî nebane Gelo?. Ev pirsên me rewa ne û li benda bersivan e ji hêla rewşenbîrên Kurd ve.

Di heman demê de vana ev ziman parastiyê, li ser lingan hiştiyê û ji mirinê rizgar kiriye. Cenga pênuşa van rewşenbîra ne kêmi çek û cebilxaneyên leheng û şoreşgerên Kurdan e, ku di şoreşên rizgariya netewî de gelê xwe ji komkujiyên hovane parastine. Di helûmercên dijwar û teng de, hin zana û bîrewerên Kurdan dev ji zimanê xwe bernedane, bepêçewaney, fêrbûna bi Kurdî timûdayim kirine mercê endametiya hemî komele û rêxistinên ta siyasî. Nimûneyek Ji wana komeleya "Hêvî" bû, ya ku li Stenbolê hatibû damezirandin sala 1913ê.



Piştî vê nirxandin û xwendina bilez, vebirane nivîskarê Kurd ê ku dixwaze roleke rewşenbîrî bilîze, jê tê xwestin ku di rabûn û rûniştina xwe de cihê zimanê Kurdî bihêle, helwesta xwe zelal û yekalî bikin, daku ji keysbaz û dijminan re biçesipîne ku zimanê Kurdî zindî ye, nûjen e şayestê dewlet û şaristaniyê ye.

Dem û dewran îro ne mîna berê ye. Rewşa zimanê Kurdî, perwerdeya bi Kurdî, weşangerî û ragihandina bi Kurdî dîdevanên gavine dîrokî ne. Jîngeheke gunçaw bo geşepêdana çanda bi Kurdî li Rojavayê Kurdistanê peydabûye. Derfeteke dîrokî di destên afirînerên Kurdî de dabînbûye, da karibin berhemên xwe bi zimanê xwe binivîsin û biweşînin. Peyama rewşenbîriya Kurdperwer bigihînin baregeh û navendên rewşenbîrî yê dagîrkeran, ku bi helandin û komkujiyên rewşenbîrî mijûl bûn.


Bêguman ev berhemê kêmpêda yê bi navê "Jiyanameya Kurdînivîsên Rojavayê Kurdistanê", ku ji qehreman û pêncûsên Rojavayê Kurdistanê yê bi Kurdî pêktê, bi saya keda Mamostayê zimên û alahilgirê Bedirxaniyan Dilawerê Zengî ku berhevbûye, bê westan û rawestan ji hezker û heyranên zimanê Kurdî re amadekiriye, kedeke dûrûdirêj e, bi heman mebestê radibe: Spasnameyeke ji tekoşîna rewşenbîriya bi Kurdî re ye, ku kesayetiyê Kurd a resen û bi xwe bawer ji nû ve diafirîne. Ji xwe ev hêz û hêviya Kurda ye, ku ronakbîrên Kurd karibin di van werçerxên dijwar de, di vê hev kêşeya fereregez, nakokbar û piralî de cihekî bi rûmet û li gorî giraniya şaristanî û peyama mirovperwerane ya Kurdan di rojhilata navîn de bistînin.

## **Dr. Memo Abdî**

Rêveberê giştî yê Nexweşxaneyê Dil û Çav

Qamişlo





## **Abbas Ismaîl**

Di sala 1938an de, li gundê Sada yê nêzî bajarê Qamişlo hatiye dinê. Di qeyda dewletê de, temenê xwe 1943an tomar kiriye. Sêwî û bi tenê ji bav û bira nedîtine mezin bûye. Delalê sê xwişka ye.

Di sala 1948an de, Qur'an xwendiyê.

Di sala 1950ê de, çûye dibistanê û yekeser derbasî refa dudiwan dibe.

Ji sala 1954-1955an, sê bûyerên balkêş di jiyana wî de çêbûne, ew jî ev in:

1-Keçama xwe mehirkir. 2-Sertefika stend. 3-Bûye Komenîst.

Di sala 1959an de, li bajarê Qamişlo bawername Brovê stend û çûye dibistana mamosteyan li bajarê Hisiça.

Di sala 1962yan de, bawernameya mamosteyan û bawernameya bekalorya bi hev re standin. Ew ji bo xwendinê çûye Şamê navê xwe li Zanîngeha zimanê Erebi tomar kiriye.

Di destpêkê de, Abbas Ismaîl bi zimanê Erebi helbest û gotar nivîsîn. Piştî ku Dr. Celîlê Celîl ji Ermenîstanê hate Qamişlo, sala 1982yan, Abbas handêr kir ji bo bi zimanê Kurdî binivîse. Ji wê salê dest bi nivîsandina zimanê Kurdî kir û heta niha ew berdewam e. Berhemên wî di warê helbest, Folklor, kurteçîrok, roman û dîrokê de ne.

### **Pirtûkên wî yê çapkirî ev in:**

- Gula civatê, Şam, 1995
- Çîvanok û pêkenok, Beyrût, 1996
- Em beranê ber kêrê ne, çîrok, Qamişlo, 1998
- Serdana serok Mesûd Barzanî ji bo Sûriyê, Erebî,1998
- Xelata Mandêla, Helbest, Qamişlo, 1999
- Stêr û bêr, çîrok, Beyrût, 2000
- Fêrbûna zimanê Kurdî, Şam, 2005
- Çend goşî ji mêwa jiyana min, Qamişlo, Helbest, 2006
- Ferhenga Dengan, Şam, 2009
- Nameyek ji gorê, çîrok, Qamişlo, 2012
- Derya rewrewkan, Roman, Qamişlo, 2013
- Min wilo jiyana naskir, Felsefe, Qamişlo, Beşê yekem, 2014
- Dîwana Qehreman, Helbest, Qamişlo, 2015
- Alfabeya Ciwanan, Qamişlo, 2015
- Min wilo jiyana naskir, Felsefe, Qamişlo, Beşê duyem, 2015
- Pêvajoya şêst salî, Qamişlo, 2015
- Goristana perçên laşê mirovan, çîrok, Qamişlo, 2015
- Çîrokên gelê min, Qamişlo, 2016
- Ferhenga mînakên angoraz, Qamişlo, 2017
- Çîrokên deşta Mêrdînê, Qamişlo, 2018
- Gula Zeysefûn, Bi zimanê Erebî, Helbest, 2018

-Ji baxê jiyana min, serpêhatî, Qamişlo, 2020

-Rengîn û xemrevîn, Qamişlo, 2020

-Ferheng Erebi-Kurdî, Qamişlo, 2020

-Çîrokên lehengan, Qamişlo, 2020

-Metelok-1-, Qamişlo, 2021

-Metelok-2-, Qamişlo, 2021

-Metelok-3-, Qamişlo, 2021


-Metelok-4-, Qamişlo, 2021

-Mistek ji cêra kelepûrê Kurdî, Qamişlo, 2021

-Îlam, ji dîrokê, Qamişlo, 2021

-Kasî, ji dîrokê, Qamişlo, 2021

-Kûtî û Lolo, ji dîrokê, 2021



## Abbas Mohammad Abbas

Di sala 1946an de, li gundê Nisran li herêma bajarê Qamişlo hatiye cîhanê. Li gund û li bajarê Qamişlo, xwendina xwe heya bekaloriyayê qedandiye, û du salan jî li Zanîngeha bajarê Şamê, felsefe xwendiyê. Di destpêkê de, bi zimanê Erebî hin şano û helbest nivîsîne û du roman, yek ji wan bi navê şaşîtiya şaristaniyê bû (Nehat çapkirin).

Di sala 1987an de, ji ber ku dewleta Sûriyê milkê wan bi darê zorê ji wan stand û li ereban belavkir, ew koçberî Almaniyê bû û li bajarokê Axinê bi cih bû ye. Li vî bajarî 14 salan karê taxsiyê kir, û di ber karê taksiyê re derfet dît ku car dî vegeerê nivîsandinê û vê carê bi zimanê Kurdî, û ji 1992 dest bi xwendina zimanê Kurdî kir. Piştî du salan hin kûrteçîrok bi zimanê Kurdî nivîsîn, û di çend kovar û rojnameyên Kurdî de hatin weşandin. Di pey wan re jî hin şano ku di yek pirtûkê de hatine çapkirin, û herwiha pênc roman û kûrteçîrok jî hatine weşandin.

### **Pirtûkên ku heya niha hatine çapkirin ev in:**

- 1- Şevên zivistanî û Melekî Tawus: Şano.
- 2- Xewnên Şiyarî: Roman
- 3- Ez û Şalûl: Kûrteçîrok
- 4- Şivanê Berxan: Roman
- 5- Dengbêjê Piçûk: Roman
- 6- Helbestvan: Roman

- 7- Neviya Çiyayekî: Roman
- 8- Axx...War: Kûrteçîrok
- 9- Gornebaş: Şano.
- 10- Bêjing: Şano.
- 11- Penaber: Şano.

**Bi Zimanê Erebî:**

- 1- Bîranînên Joker (مذكرات جوكر)
- 2- Ez im ê girî (أنا كنت الباكي) kûrteçok.
- 3- Şopa ramanê di navbera 2018-2020



## **Abdulkader Bedredîn**

Di sala 1952yan de, li gundê Cumayê jidayik bûye. Bi karê siyasî û welatperwerî di destpêka jiyana xwe de wekî her mirovekî welatperwer destpê kiriye. Ji ber wek hatiye nasîn di civata Kurdî de ko, karê siyasî û karê kultûr û yê edebî ji hevûdu cûda nabin, ji ber wisa ew mijûlî karê kultûrî û edebî jî bû. Bêguman, ji nav nivîskarên rojavayê Kurdistanê yê pêşîn e ku li ser dîroka rojnamevaniya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê nivisandiye. Hêjayî gotinê ye ku mamoste ji binemaleke xebatkar, Kurdperwer û welatparêz e. Mafir ku tu kes azadiyê nade mirovî, divê mirov bi xwe wê bistîne. Herhe evê malbatê di ber doza gelê xwe de pir kar û fidakarî kiriye.

### **Ji berhemên wî:**

- Rojnamevaniya Kurdî li rojava sala 1998an, ku sed sal li ser rojnameya yekemîn ji layê Mîrên Bedirxaniyan ve, li Qahire paytexta Misrê, hatibû weşandin.
- Pirtûkek bi navê "Xwarinên Kurdî" ji layê Kombenda Kawa ve hatibû çapkirin.
- Pirtûkek bi navê "Kar û pêşên Kurdan" di bin çapê de ye.





## **Alwan Şivan**

Di sala 1970ê de, li gundekî ji devera Tirbespiyê hatiye jiyanê. Xwendina xwe ya seretayî li dibistana gund derbaskiriye, qonaxa duyem li dibistanên bajarê Qamişlo qedandiye û qonaxa siyem li bajarê Helebê ji bo xwendina peymangehê, lê mixabin ji ber hin sedemên taybet bi serî nekir û berê xwe da leşkeriya neçar.

Ji sala 1990î de, dest bi nivîsandina helbesta Kurdî kiriye. Helbestên xwe di riya malperên Kurdî re belav dike. Gelek semîner, şevbuhêrk û ahengên newrozan pêşkêş û birêve dibe.

Ji sala 2007an salane li Elmaniya beşdarî mihrecana helbesta Kurdî dibe, û wek pêşkêş û rêveber mihrecanê bi rêve dibe.

Ji sala 2001ê, penaberî Elmaniya bûye.

**Ji berhemên wî du pirtûkên helbestan hene ew jî ev in**

-Hêviyên bê sînor

-Şevê dî



## **Ammar Hesên Mûsa**

Di sala 1974an de, li bajarê Heseke jidayik bûye.

Di sala 1997an de, bawernameya Amojgeha Mamosteyan, zimanê Erebi bidest xistiye.

Di sala 2012an de, bawernameya kolêja Edebiyat û Zimanê Firensî bidest xistiye.

Li dibistanên bajarê Heseke û dewrûberên wê, ji sala 1997 ta sala 2016an, karê mamostetiyê li fêrgehan kiriye.

Ammar Hesên Mûsa, şewekar û peykersaz e, nêzî 15 pêşangehan lidar xistiye, li deverên sûrî, Libnan (Qesra Yonisko) û Kurdistanê. Pêşangeh ji tabloyên reng, û başnivîsîn û peykerên ji têlên hesin û alavên bê sûd û mifa yê êliktirîk û êliktirîk amade dibûn. Li gel karê dîzaynê wekû dehan ji dîwanan.

Bi zimanê Kurdî û Erebi pirtûk amadekirine, ligel hin karên wergerandinê.

### **Pirtûkên Kurdî yê çapkiri:**

- 1- Gulnîgar: Helbestên Hayko.
- 2- Azadiya gelan: çîrok, li ser zimanê ajalan.
- 3- Kelmêşê mêrxas: çîrok, li ser zimanê ajalan.

### **Pirtûka Erebî ya çapkirî:**

-أصابع حمراء اللون.

### **Pirtûkên Kurdî yên li hêviya çapkirinê:**


- 1- Xatûna Hesenkêf: çîrok.
- 2- Rênivîsa biçûkan ji bo çîmengah û pêşdibistanê.
- 3- Ferhenga biçûkan: Bi pênc zimanan: (Kurdî/ Badînî û Soranî/, înglîzî, Firensî, Erebî, Farisî).
- 4- A B C ya Kulîlkan.
- 5- Sîka tilîkan.
- 6- Wateyên zimanê leşî.
- 7- Wêneyên rengîn (8 cûr e). Bo fêrkirina hunerê ji bo zarokan.
- 8- Tîp û wêne: ji bo fêrkirina tîpan. (4 cûr e)  
Kurdî / Latînî, Kurdî / Soranî. Erebî, Ingilîzî.
- 9- 10 – Du Dîwanên Hayko

### **Pirtûkên Erebî yên li hêviya çapkirinê:**

-العلاج بالألوان: طرق و تعليم العلاج بالألوان.

-فن المنمنمات: دراسة

-دواوين الشعر: صمت الظلال\_ كلمات ملونة\_ ألوان الصمت\_ رائحة التفاح\_ فقاعات الخريف.



## **Arşek Baravî**

Sala 1963an li Amûdê jidayik bûye, fakulteya mafnasiyê li Zanîngeha Bêrûtê xwendiyê, lê bi dawî nekiriye. Sala 1980ê dest bi nivîsîna helbesta Kurdî kiriye. Yekemîn xula hînkirina zimanê Kurdî sala 1986an li Amûdê vekiriye. Sala 1989an dest bi lêkolînên rêzimana zarê Kurdî kiriye. Sala 2006an komîta Celadet a fêkirina zarê Kurdî damezirandiye. Nûnertiya Rojava li gelek konferansên Kurdistanê di warê ziman û wêjeya Kurdî de kiriye, bi sedan xwendekar hînî Kurdî kirine. Bi pênc zimanan daxive (Kurdî-Erebî-îngilîzî-turkî-parsî), bi sedan pirtûkên nivîskaran sererast kirine, ji gelek saziyên derve û hundirê welêt re karê wergerê jî kiriye, bi dehan rojname û kovarên Kurdî nivîs û lêkolînên wî belav kirine ....û hwd.

### **Berhemên wî ev in:**

-Çar dîwanên helbestê (Welat, Nêrgiza welat, Mukurhatin, Helbesta nazik).

-Çar dîwan jî weke tabloyên helbestî (Ramûsan, Dûman, Li deriyê hêviyê, Ez di çavên wê de dibînim), hemû jî destnivîsên ji çapê re amade ne.

### **Lêkolînên ziman, wêje û dîrokê:**

-Pênav/cînavk (rêzimanî, destnivîs e).

-Hûrbînên rêzimanî (destnivîs e).

- Dîroka Kurdan ya kevnar (destnivîs e).
- Berhevkirin, danhev û sererastkirina 200 çîrokan ji kevnetora Kurdî (destnivîs e).
- Rista hokirina zimanê Kurdî 2-3-4-5-6 (5 pirtûk destnivîs in).
- Çîvanokên Zarokî.
- Fehenga Peyvên Zanyarî-Wêjeyî- Dijwate.
- Bîrdoza Hebûn û Nebûnê (lêkolîn).
- Yezdan û Zeradeşt.
- Abeceyên kevnar û Ola Zeradeştî.
- Wêjeya Kurdî 1002 Rûpel li ber çapê ye.

**Pirtûkên çapkirî ev in:**

- Rista hokirina zimanê Kurdî 1.
- Zarê Zêrîn1.
- Zarê Zêrîn2 (du bergên çapkirî ne).
- Romana sêwî (JIYAN).
- Fehenga Çeleng Erebi/Kurdî çapa (0) û çapa (1).
- Zar û Ziman.
- Zimanê Kurdî/Asta Serbestiyê.



### **Arşevê Oskan (1967- 25ê çiriya paşîn 2012)**

Rojnamenivîs, helbestvan û nivîskarekî Kurd bû. Ew di sala 1967an de, li gundê Birkînêsê ku dikeve di navbera Dirbêsiyê û Serê Kaniya Binxetê de, hatiye dinê.

Wî xwendina xwe ya despêkê (seretayî) li gundê xwe bidawî kir û ya navçeyî li bajarê Dirbêsiyê û herweha lîse li bajarê Hîsiçayê.


Di sala 2001ê de, wî û hin kesên din biryara derxistina Kovara Zevî da û Oskan bû sernivîserê wê. Heyanî dawiya 2003yan deh hijmar jê derketin û bi derketina nivîskar ji welêt, ew jî rawestiya.

Di salên dawî de, li Almanyayê dijiya, zewîcî û bavê sê zarokan bû.

Arşevê Oskan ku bi nexweşiya Penceşêrê ketibû, di 25ê çiriya paşîn a 2012an de, li bajarê Hamborgê (Almanya) çû ser dilovaniya Xwedê.

#### **Berhemên wî ev in:**

- Hêviyên Birîndar, Helbest, 1995
- Kê Gul Çinî?, Helbest, 1999
- Berbang Qedexê ye, Helbest, 2001
- Xewnistan. Helbest, Weşanên Do, 2010
- Keştiya Penaberan, Roman, Weşanên Do, 2010
- Awazên Evînê, Helbest, 2012



## Baranê Cûmê

Navê wî Baranê Cûmê ye. Ji Rojavayê Kurdistanê, herêma Efrînê gundê Celemê li sala 1968an, ji dayîk bûye.

- Ji sala 1987an de, di riya Elfebêya nemir apo Osman Sebrî re fêrî zimanê Kurdî bû. Li sala 1990î yekmîn car kurseke fêrkirinê li Helebê vekir û 7kes fêrî Elfebêya Kurdî kirin û herweha di wê demê de jî wî hewaldanên nivîsandina helbestê dikir, û li sala 1993yan ew tevî kurseke fêrbûna rêzimanê Kurdî bû, lê mixabin bidawî nebû, herdem wî kursên fêrkirinê ta sala 2006an jî şagirtan re vedikirin û keç û xort fêrî Kurdî dikirin, di ber wê re jî wî helbest dinivîsand.

- Li sala 2006an Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Helebê hate damezirandin û ew bûye endamekî wê saziyê, careke din ew tevî kurseke fêrbûna rêzimên bû û bi ser ket, ta sala 2011an li Helebê wî kursên zimanê Kurdî asta 1, 2, 3an didan, pişt re ji ber rewş û aloziya bûyî ew û malbata xwe li gundê xwe Celemê veşeriyên, li wir wan mala Zanîn ji bo fêrkirina zimanê Kurdî vekir, bi sedan xort, keç û zarok ta sala 2016an fêr kirin.

- Li sala 2017an wî, tev malbata xwe, berê xwe da Almaniya li bajarê Bremen bicih bû, li sala 2019an wan şaxeke S.F.P.Z.K. li Almaniya damezirand, û ew di komîta rêveberiyê de ye, û karê mamostetiyê di rêya (Onlein) re û weke din jî dikir.

- Berhemên wî ta roja îro çapkirî tune ne, lê du berhemên wî neçapkirî li ber destên wî ne, yek bi navê "HÛNANIINA BÎRANÎNAN", û yek jî hîn lêvedigere ew ne binavkirî ye. Ew bawer e yek ji wan wê di demeke ne dûr de çap bibe.

- Li sala 2016an, li gel çend xwendekaran di riya êntêrnêtê ew fêrî beşê wêjeya Kurdî di warê helbesta kilasîk di riya peymangeha Bedirxan li bajarê Dêrka Hemko bû û wî bawername wergirt.

- Ew pêşkêşvaniya aheng û cejnan jî dike, û li bajarê Bremenê di Komela Civaka Kurdî ji bo Hînkarî û Perwerdeyê-Hînkarî Bremen- cih digre.

- Ew li Mihrecanên Roja Helbesta Kurdî 2013, 2014 û 2015 li Efrînê û 2018 jî li Almaniya bi helbestên xwe tê de beşdar dibû û dibe.





## Bavê Nazê

Di sala 1946an li gundê Kucuka li Bakurê Kurdistanê hatiye dunyayê. Sala 1953 ew hate Binxetê (Kurdistana Rojava) û li bajarê Amûdê - mala birayê wî yê mezin li wir bû - dest bi xwendina xwe ya seretayî kir.

Sala 1957 mala wan bi temamî hate binxetê, destpêkê li Amûdê ma û dûre mal hate bajarê Heskê û li wir xwendina lîseyê sala 1967 biserî kir.

Sala 1969 ji bo xwendinê ew çû Soviyetê û sala 1980î wî li zankoya Mosko ya hikumî nameya xwe ya diktora parast. Sala 1977 li gel rehmetyê Rezo Osê û Dr. Mihemed Ebdo Alnecarî û Se'ededîn Mele wan (Hevbenda Kawa bo wêjeya Kurdî) damezirand û di paşerojê de beriya vê destegehê wî berhemên xwe weşandin. Dûre jî li welatên curebecur berhemên wî di sê waran de hatine weşandin: -Werger. -Amedekirin. -Afirandin

### 1-Di warê wergerê de ev pirtûk in:

1. Îstişhad albetel alKurdî, Fiyodor Lîtkîn sala 1977 bi zimanê Erebî.
2. Alcîbal we alsîlah li gel Dr. Ebdî Hacî – 1978.
3. Intîfadet alşeyx Seîd 1981 ya nivîserê wê Hisiretiyan.
4. Nehdet al-ekrad alqewmiye we alseqafiye 1985 Celîlê Celîl.
5. Kurdistan ma beyine alherbeyn li gel Dr.Seadedîn Mela 1988.
6. Berzanî we şehadet altarîx li gel Dr.Ebdî Hacî 2004.
7. Pêseka dîroka Kurdistanê ya mela Mehmûdê Beyazîdî 2009 bi zimanê Kurdî.
8. Qelawiz - şanoya Xoxol (nehatiye weşandin) bi zimanê Kurdî.
9. Îzop – şano (nehatiye weşandin) bi zimanê Kurdî.

## **2-Di warê amedekirinê de:**

1. Rêzimana Kurdî bo zaroka sala 1996
2. Têwriya edeb- ji bo şagirtên zankoyê- zankoya Duhok 2010
3. Dîroka edeba Yunanî ya kevinar 2010
4. Dîroka edebê romanî birgê 2 sala 2013
5. Dîroka edeba serdema navîn û vejînê birgê 3 sala 2013
6. Edeba sedsala 17-18 birgê 4 sala 2013
7. Edeba sedsala 19-20 birgê 5 sala 2013
8. Rêzimana Kurdî (têwrî û piratîk) sala 2013
9. Ferhenga tîrmên wêjeyî sala 2013.

## **3-Berhemên di warê afirandî de:**


1. Çiyayên bi xwînê avdayî - roman-sala 1978 bi zimanê Erebî, sala 1981 bi zimanê rusî - sala 1988 bi zimanê Kurdî.
2. Hêsir û baran - kurteçîrok-sala 1996
3. Miriyê heram - kurteroman-2009
4. Dara pelweşiyayî - roman-2011

## **Ji berhemên afirandî ku nehatine weşandin:**

1. Tahliya rastiye
2. Dengê ji dûr ve tê nayê bihîstin.

## **Ji vekolînên ku hatine belavkirin:**

1. Çi bi Kurdistana sor hat?
2. Ber bi zimanekî yekbûyî ve.
3. Roman çî ye.
4. Ehmedê Xanî - weku pêşke di dîwana wî de hate weşandin.



## **Berzo Emer Mehmûd**

Li sala 1960î li gundê Girkê Xelo li devera Aliya li bareşî Qamişlo hatiye ser rûyê dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û bekaloriya li Qamişlo biserî kir.

Di sala 1977an de, çûye Helebê jibo xwendina ziman û edebiyata Ingilîzî bixwîne. Lîsans di ziman û edebiyata Ingilîzî de, li zanîngeha Helebê sala 1980 biserî kiriye. Paşê dersên zimanê Ingilîzî wek fermanber li nik hikûmetê li xwendingehên Qamişlo dida, û li sala 1990î jin anî û du zarokên wî hene kurek û keçek Kardo û Nermîn.

### **Xebata nivîskariyê**

- YEKEM, Piştî xwendina ziman û edebiyata Ingilîzî li zanîngehê biserî bû, ji sala 1984an ve ew di xebata ziman û edebiyata Kurdî de kar dike. Wek edîtor di sê kovarên Kurdî de kar kiriye, ew jî ev in:

A) Kovara Gelawêj ji 1984 ta 1992 (Gelawêj- ji No 8 to No25)

B) Kovara Pirs ji 1993 ta 2004.

C) Ew û hevaleyê xwe bi hev re heft hejmar Kovara Hevînd belav kirin, ji sala 2005 ta 2007 li bajarê Qamişlo belav dibû.

- DUWEM, di salên 2005 û 2012 de, wî du lêkolînên zimanvanî wek pirtûk çapkirine ku ew jî ev in:

1. Rênivîsa Peyva Kurdî navbera likan û nelikanê de, 2005 (the Orthography of Kurdish word between separation and non-separation - *In Kurdish*).

2. Kopyûle di Ristesaziya Kurdî û Hindo-Ewropî de (The copula in the Kurdish and Indo-European syntax. *In Kurdish*).

3. I translated from English to Arabic, a book whose title is Nationalism in Xani's Mem u Zin. الوعي القومي في مم و زين خاني

4. Wî gelek gotar û lêkolîn bi zarê Kurmancî û Soranî û bi zimanê Erebi belav kirine.

- SÊYEM, Di sala 2006an de, li Diyarbekirê beşdarî li kongirê ziman û edebiyata Kurdî kir, Ew yek ji çar endamên serokatiya kongirê ziman de hate hilbijartin. Wî tê de gotarek xwend û di kovara ZEND de belav bû.

### **Xwendina Bilind**

- ÇAREM, Ji arezûtiyê çûme pîşeweriyê من الهواية إلى الاحتراف

6. Di sala 2014-an de wî xwendina Masterê (MA) li zanîngeha Mardin Artuklu du salan biserî kir. Teza masterê di dengsazî û zimannasiyê de bû.

7. Di sala 2016an de ew di xwendina doktora de hate pejirandin û wî du salan madeyên xwendinê biserî kirin, ya balkêş wî di zimannasiyê de 100 ji 100 anî. Ev yek wek belge li nik wî heye. Pileyên madeyên xwendinê wek (edebiyata klasîk û edebiyata nûjen û edebiyata devkî, zimannasî û rêbazên lêkolînê) yên masterê û yên doktora bi belge li nik wî hene.

- PÊNCHEM, Îsal wî du pirtûk lêkolîn çap kirine:

8. Dengsazî lêkolîneke giştî di dengsaziyê de, çapxana Şilêr, 2019, (250 rûpel)

9. Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî di Dengên Zimanê Kurdî, Herrek , (300 rûpel)

10. sala 2020 wî pirtûkek bi navê Rezo Osê ronakbîr û zimanzan ... belav kir.

- ŞEŞEM, Niha ew li Zanîngeha Rojava kar dike ji bo amadekirina hin projeyan:

1. Bernameya xwendin û fêrkirina zarê Soranî di zankoya Rojava de.

2. Bernameyekê bo xwendina zimannasiya Kurdî di astê Zanîngehê de.

3. Bernameyek bo xwendina ragehandinê bo Zanîngeha Rojava.

- HEFTEM, Kar û xebat ji bo pêşxistin û geşepêdana xwendina Kurdî erkek e di stuwê wî de ye, berî her kesî, ji ber wilo zanîngeh pêwîstî bi akadîmiyên

Kurd heye ku zexeliyê nekin di xizmeta zimanê xwe de, û bilez xwe bigihênin nav kar.

Pênc Pertûkên wî bi zimanê Erebi amade ne ji bo çapkirinê:

١. في الأدب الكردي
٢. في الثقافة الكردية
٣. في المسألة الكردية
٤. في اللغة الكردية
٥. الرابطة والمباني النحوية

Sê Pirtûkên Kurdî amade ne bo çapkirinê.



## **Besam Mistefa**

Di sala 1977an de, li bajarê Hesîçeyê li Rojavayê Kurdistanê jidayik bû. Besam kurê Ekrem kurê Faris kurê Silêmanê Mistê ye. Ew bi eslê xwe ji eşîra Elikan, Mala Dîbo ye. Cih û meskenê wan yê resen navçeya Xerzan e, ango ew bi esl koçer in û ser bi bajarê Êlihê (Batmanê) ne. Ji ber beşdariya malbata wan, wek gelek malbatên Kurd ên din, di Şoreşa Şêx Se'îd de, ew di destpêkên sedsala bîstan de Binxet bûn.

Besam Mistefa zaroktiya xwe li gundê Cima'ayê yê ser bi bajarê Qamişloyê ve borand. Cima'ayê niha taxek ji taxên Qamişlo ye. Xwendina xwe ya seretayî û navendî û lîse li Qamişlo biserî kir. Paşê di fakultêta wêje û zanînen mirovî, beşê wêjeya Îngilîzî li Zanîngeha Helebê xwend.

Di sala 2003yan de, bawernameya xwe ya dîploma stand. Pişt re, dora du salan li Qamişlo û gundên dora wê mamostetiya zimanê Îngilîzî kir.

Di 16ê kanûna paşîn a 2006an de, derbasî başûrê Kurdistanê bû.

Nivîs û gotarên wî di gelek rojname û malperên Kurdî de hatine weşandin.

Ew demekê endamê desteya nivîskarên kovara Werzî bû, ya bi sernavê Hawara Nû ku ji aliyê Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî li Hewlêrê dihat derxistin. Herwiha endamê Komîteya Birêveber ya Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî bû. Endamê redaksiyona rojnameya Rûdaw, a çapa Ewropayê ye.

Di sala 2011an de, dest bi kurmancîkirina berhemên ji zaravê soranî kir, û ji wê demê vir ve, gelemperî romanên sereke yê zaravayê soranî li kurmancî werdigerîne. Besam Mistefa niha dîwaneke helbestan ji bo çapê amade dike. Bi zimanê Kurdî dinivîse, lê hin gotar û helbestên wî bi zimanê Erebi jî hene. Herwiha berhemên wêjeyî wek gotar û roman ji zimanên Ingilîzî û Erebi werdigerîne ser zimanê Kurdî.

Niha Besam Mistefa li Hewlêrê dijî (2019)[çavkanî hewce ye].

### **Werger û Berhemên wî:**

- Biguherîne M, Çîrok, Şêrzad Hesên, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2011.
- Xewna Pîrepindan, Roman, Şêrzad Hesên, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2011.
- Jineke Xinanî, Roman, Şêrzad Hesên, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2012.
- Êvara Perwaneyê, Roman, Bextiyar Elî, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2012.
- Apê min Cemşîd xan ku Hertim bê ew li ber xwe dibir, Roman, Bextiyar Elî, Weşanxaneya Avesta, 2013.
- Piyale ji bîr dîkin min vexwin, Helbest, Çinar Namiq, Weşanxaneya Ronahî, Amed.
- Gulên Şoran, Roman, Eta Nehayî, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2012.
- Hotêl Europe, Roman, Ferhad Pîrbal, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2012.
- Em li vir in, Çîrok, Beroj Akreyî, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2012.
- Santiago de Compostela, Roman, Ferhad Pîrbal, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2013.
- Balindeyên Li Ber Bê, Roman, Eta Nehayî, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2013.
- Qesra Balindeyên Xemgîn, Roman, Bextiyar Elî, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2014.

-Segwer (Reyîn), Roman, Mihemed Mukrî, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol, 2015.

-Hinara Dawî ya Dinyayê, Roman, Bextiyar Elî, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol, 20017.

-Şîfa Gerdî, Çîroka Rojnamevaneke Wêrek, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol, 2018.

-Koberhemên Bêbuhar, Amadekirin û Sererastkirin, Weşanxaneyê Rojhelat, Hewlêr, 2018.

-Pêla Xîzê Reş (1), Kurteçîrok, Xêrî Bozanî, Latînîzekirin B. Mistefa, Hewlêr, 2018.

-Naqosên Romayê, Roman, Jan Dost, Wergerandin ji Erebî bo Kurdî, Weşanên Dara, Amed, 2019.

-Derziya Tirsê, Roman, Heysem Hisên, Wergerandin ji Erebî bo Kurdî, Weşanxaneyê Ava, Kobanî, 2021.

### **Berhemên niha li ser wan kar dîke ev in:**

-Kurmancîkirina Dîroka Wêjeya Kurdî ya Dr. Me'rûf Xeznedar 7 cild in.





## Beşîra Derwîş

li Qamişloyê jidayik bûye. Bi zimanê Kurdî û zimanê Erebî dinivîse. Di zarokatiya xwe de dest bi nivîsandinê kir. Destpêkê di qonaxa amadekariyê de, bi nivîsandina rojnivîskên rojane bû. Paşê helbest û kurteçîrok nivîsandin; lê ji ber sedemên kesayetî û yê siyasî ewê belav nekir. Paşê ew bi navên nenas di rojname û kovaran de weşandin. Di wê demê de, lê haydar dibe, ku ewqas hestên pêçayî yê ku bi tîpên wê re tevdigerin, û tevî sadebûna wan, ji wê re bû bingehê ku ew bi pêdar be û binivîse.

### ji weşanên wê:

- Komeke helbestî, û ya yekem ku bi navê wê bi Erebî hatiye binavkirin ev e:

1 - Keça Rojê. ابنة الشمس

2 - Berhevoka gelek kurteçîrokên bi zimanê Kurdî, bi navê: Marên di hêlînên kevokan de.

3- Berhevoka helbestan bi zimanê Kurdî bi navê: Buxçika hêviyan.


4- Çîrokên bi navê: Pêl û dûman.

5- Pirtûkek helbestên Hayko bi navê: Girseyên xewnên bêserûber.

6- Pirtûka hevbeş a helbesta Erebî û wergera Emazîxî.

Ya heftan jî li ber çapkirinê ye û bi navê: Hezar Hayko û Hayko ye. Ji bilî dîwanên helbestan ên ku hêj nehatine çapkirin û antolojiyên hevpar wek: Antolojiya Helbesta Nûjen li Rojava. û Helbesta jinên Kurdî ya helbestvanên Kurdên Sûrî. Antolojiya helbestvanên Kurdistan, Iraq, Sûriye û Amazîxê ye. Nivîsên wê gelek xelat wergirtine û hinek ji bo çend zimanan hatine wergerandin.

Ji bilî beşdarbûna pêşangehan û xelatan, Keça Rojê beşdarî pêşangeha Navdewletî ya Hewlêr û Pêşangeha Qamişlo bû. û wê xelateke pesindayîne ji Rêxistina Gîlanê li Kurdistana Iraqê wergirt. (Marên di hêlînên kevokan de), ew çîrokên civakî ne û li ser rizgarbûn û revandiyên DAIŞê ne. Wê ji aliyê Serokê Herêma Kurdistana Iraqê Nêçîrvan Barzanî ve belgeya spasî û pêzanînekê wergirt. Ji bilî gelek xelatan ji bo nivîsên wê yên Hayko ji klûbên Erebi û yên din. Rêznameya Rûmetê ji Akademiya Helbestê li Holenda El-Asala Kovara Wêjeya Erebi wergirt.



## Beşîrê Mele Newaf

Di sala 1956an de, li bajarê Amûdê hatiye dinê. Xwendina xwe ya seretayî ta lîseyê li bajarê xwe biserî kiriye. Ji ber pêvajoya rejîma Be'is, ya ku bi hezaran Kurd li Rojavayê Kurdistanê bê nasnameyên fermî hiştin, malbata wî jî yek ji wan malbatan bû, lewra nikarîbû xwendina xwe berdewam bikira.

Wek tê nasîn ku şopên kesayetên navdar li bajarê Amûdê morkirî ne, taybet qonaxa perçebûn û gengeşeyên di navbera partiyan de. Wî di nav van rewşan/heyaman de, çavên xwe li derdorê vekir û haydarî gelek tiştan bû. Bavê wî, şopên hezkirin û ezberkirina sirûdên Cegerxwîn di hestên wî de çand, û ahîn û keserên dayika wî jî li ser nûxwiriye wê ku bû qurbana şewata Sînemê, ev tev bûn tovê şaneyên şanoya tirajîdî û ji kûrahiya derûna wî, ew hejandin. Dîtina Seydayê Cegerxwîn ji bo wî weke hêman û arandina ber bi helbesta Kurdî ve bû. Her weha bingeh û hîmên sereke ji bo diyardeya wêjeyê, di derûnê danerî de, jîngeh û civak e. Ji bo ezmûneya wêjevanekî bikeve nav êş û azarên jiyane ku ew kes ji neteweyek zimanê wî, çanda wî û hunera wî qedexekirî bin.

Ev rewş/heyam dibin tevina avakirina wêjeyek neteweyî, ji bo biwêj û hinermendekî. Beşîrê Mele Newaf, bi qonaxa tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê re, û bi teybet cangoriyên wê bûne şîyan û bizav ji mijar û zarîkirina helbest, sirûd û şanoyên wî re, di ahengên Newroz û bîranînên şehîdan de. Herweha, di pêvajoya komên hinerî de jî xwedan rol bû. Niha, li

bajarê Qamişlo, li "Zanîngeha Rojava", mamosteyê wêjeya Kurdî - beşê Şano ye.


**Berhemên wî:**

1-Hêlana Guran, Kurteşano, wergêrî zimanê Erebî ye.

2-Girêka Kor, şano

3-Bilbizêq, helbest

4-Ziravê, helbest, li ber çapê ye.



### **Beşîrê Şêx Zahir "Bêxew" (1926-1981)**

Beşîr kurê Şêx Zahir kurê Şêx Mustefa yê Seyid Haşimê Şêx Mehmûdê Girbenî ye. Girben gundeke dikeve herêma Midyatê. Wek malbat, di yekemîn şerê cîhanê de, penaberî Binxetê dibin.

Di sala 1926an de, li gundê Ezîmê ku dikeve bi ser devera Dêrka Hemko ve jidayik bû.

Li ber destê Melayên deverê tê perwerdekirin ta bawernameya olî (Îcaze) werdigire, û dibe Melayê gundê Şebek. Di wê demê de, dest bi helbesta Kurdî dike.

Helbestên wî bi şêweyê kilasîk li ser sazband û pêlewazan tîna ava kirin.

Di sala 1957an de, dibe yek ji endamên çalakvan di damezirandina Partiya Demuqrat a Kurd li Sûriyayê de.

Di sala 1961ê de, bi destê rêjîma sûriyê tê girtin û zîndankirin.

piştî berdanê jî, gelek caran tê girtin û binçavkirin, ji neçarî berê wî dikeve Beyrûtê paytexta Libnanê li wir 2 salan dimîne.

Mele Beşîr bi herdû zimanan, Zimanê Erebî û Zimanê Kurdî, nivîsand.

**Ji berhemên wî yê çapkirî ev in:**

1-Sirûdê Niştimanî, helbest, çapa Libnanê,1992

2-Gaziya Belengazan, helbest, çapa Dihokê, 2004

**Berhemên nehatine çapkirin ev in:**

- 1- Civata Xeman, helbest
- 2- Felsefa Hevalî, vewejartinek li ser bendan
- 3- Evîn û Evîndarî, çîrokek helbestî
- 4- Komek gotar û helbestên belav, bi zimanê Kurdî û Erebî li şûn xwe ve hiştin.

Di 4-11-1981ê de, li gundê Şebek, di temenê 58 salî, dimre û li goristana gundê Girdêmê Helîmê tê veşartin.



## **Bêwar Brahîm**


Bêwar Brahîm nivîskar û helbestvaneke Kurd e, bi Kurdî û Erebî dinivîse. Bêwar Brahîm di sala 1973yan de, li gundê Girbawî, yê nêzîkî Qamişlo hatiye ser rûyê dinyayê. Berhemên wê di piraniya kovar û rojnameyên Kurdistanî de hatine weşandî; ji piçûkanî ve meyla wê li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî ve hebû, di destpêkê de dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, û pişt re dîwanên Cegerxwîn xwendine û bandora wan di mêjîyê wê de hatiye çandin. Di her deh salên dawî de gelek caran bi Seydayê Tîrêj re giftûgo kirine û jê fêrî hûnandina helbestên klasîk bûye, lê helbestên xwe yê kilasîk çapnekirin, û di van salên dawîn de bêhtir berê xwe da nivîsandina pexşan û gotaran.

### **Berhemên çapkirî**

-evîne bibûre tu bê wateyî; helbest bi zimanê Erebî, Şam 1999 (Asife eyûhe elhub leyse leke meena)

-Nameyek ji bo qedere; helbest bi zimanê Kurdî, Şam 2001

-Payîzokine çavşil ji dilê xewnê Roman bi zimanê Kurdî, Amed 2014, ji weşanên Lîsê.



## **Bîlal Mehmûd Hesên-Çolbîr**

Di sala 1933an de, li gundê Xilalka, herêma Efrînê, jidayik bû. Navê bavê wî Mehmûd Kosa. Navê diya wî Meryem Abdulmajîd (Hijamala, Efrîn). Hevjîna wî: Rojîn Cegerxwîn e. Zarokên wî: Hozan, Rêzana, Jiyana, Rola, Manî.

### **Perwerde:**

- Sertefika
- Asta 7 û 8 li ba Mamoste Reşîd Hemo li Xulalko xwendiyê.
- Li Çiyayê Cirqa xwendina Zimanê Kurdî û Diyaliktîk li ba Mamoste Reşîd Hemo xwendiyê.

### **Berhemên weşandî:**

- Pend û Şîret 1995
- Pend û Peng, ji Wêja Gelêrî, 2008
- Pîr û Pendî, ji Wêjeya Gelêrî, 2012
- Ferhenga Kurdî – Erebi, 2016
- Termên Rêzimana Kurdî, Kurdî – Erebi, 2017
- Heft ji Hejmarên Hêzdar, 2020
- Ferhenga Çolbîr, Erebi – Kurdî, 2022


### **Berhemên ne weşandî:**

- Ferhenga Kurdî – Kurdî
- Jînenîgarî

### **Jiyana Partî:**

- Partiya Komunîst: Berî 1947 - 1957
- Partiya Dimokrata Kurdî 1957 - 1970





## **Biradostê Mîtanî (Evdilhekîmê Mela Emer)**

Mamoste Biradost Mîtanî, niha li bajarê Girkê Legê, yê dikeve herêma Dêrka Hemko de, li Rojavayê Kurdistanê dijî. Di sala 1960î de, li gundê Xirbêcihiwa yê ku dikeve bakurî Çilaxa yê bi navçeya Dêrka Hemko ve girêdayî ye, li Cizîrê, ji dayîk bûye. Dibistana seretaî li gundê xwe qedandiye, ya navîn li dibistanên bajarê Rimêlanê bi dawî kiriye, û bawernameya dibistana bekeloriya pêşesazî (Mîknisyanî) li bajarê Hesekê bi dawî kiriye. Li Dêra zorê jî, ji paymangeha pêşesazî, beşê miknisyanî derçû ye.

Bawernameya Amedayî (bekeloriya wêjeyî) bi şêweyê azad (hur) bi dest xist û pişt re xwe li zanîngeha Şamê tomar kiriye. Ji ber hezkirina wî ji zanist û dîroka milletê wî yê Kurd re, vî tiştî hiştiye ku beşê dîrokê di kulêja wêjeyî li zanîngeha Şamê bixwîne. Piştî derçûna wî ji zanîngehê, karê wekîl mamoste li hin gundan kiriye, û bi renekî fermî li Rimêlan dest bi mamostetiyê kiriye; ji berya (27) salan ve û ta roja îro bê rawestandî di nav xebatên perwerdê de ye, tevî ku hukûmeta Be'is ew di sala 2013 de, ji erkê wî yê mamostetiyê dûrxistiye, ew jî ji ber rol û çalakiyên wî yê rewşenbîrî û perwerdehî di layê zimên de, nexasim dema ku karî wî bû dîroka Kurdî ya rast, û ya milletên din yê li herêmê dijîn jî derêxe wê holê, nemaze dikarîbû wan xwehrî û çewtiyên li ser dîroka me Kurdan bi belgeyan û bi zanebûn rake. Ew bi gelek çalakiyan, çi di warê guftûgoyan de, çi di warê vejîn û zindîkirina helkeftinan,

û diyarkirin û eşkerekirina dîroka Kurdî de, û di hemû warî de jî bêhawe xwe westandiye û mijûlkiriye.

Bi sedan gotar û lêkolînên wî yên dirokî hene, ji bilî sîmînarên ku li piraniya bajarên herema Cizîrê pêşkêş kirine, nexasim wek endamê komîta perwerdê ya Ekademiya Civaka Demuqrat, û civaka milî û rewşenbîrî bi wan xemilandine

Mamoste Biradost Mîtanî rehên wî yên kûr û dûr, di warê welatparêziyê de têne dîtin. Ji dema faşîstên Be'îsiyan de, mala wî bi dergehê fereh û bi rengê razyarî û veşartî ji hemû çalakiyên welatparêziyê re vekirî bû, û roleke wî di warê belavkirina têgih û hestên neteweya Kurd û rewşenbîrî û zimanê Kurdî de pir mezin heye. Ji ber wilo jî mîna me gotibû, ji erkê mamostetiyê hatibû derxistin û mûçên wî hatibûn birîn.

Mamoste bi hezaran ciwan li ser zimanê Kurdî ji asteyên 1-2-3 perwede kirine, û di warê dersdana dibistanên herêma Girkê Legê de bûbû Rêpêşan, pişt re şêwermend û pişt re endamê KRD û endamê komîta Wêjeya Zimanê Kurdî ye di S.Z.K de.

#### **Ew xwediyê vê kedê ye jî:**

- Avakirina Dîdargeha (Multeqa) Girkê Legê ya rewşenbîrî
- Rola wî di avakirina Saziya zimanê Kurdî (SZK) di destpêka Şoreşê de.
- Rola wî di avakirina Saziya (Nûrî Dêrsimî) li Rimêlanê de
- Rola wî di avakirina Yekîtiya Mamosteyên Girkê Legê û Rimêlanê de.
- Rola wî di avakirina yekîtiya Mamosteyê Herêma Girkê Legê de û hevserokatiya wê, û pişt re hevserokatiya Yekîtiya Mamosteyên Kantona Cizîrê re 2014z.
- Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê ye.
- Rola wî di avakirina Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê de û hevserokatiya wî ji şaxê wê ye nivîsgeha Girkê Legê re.

Têbînî: Ji wan saziya niha tenê ew endamê Desteya Rêvebir a Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê ye.

-Wek nivîskar û lêkolînavan bihtirî (40) destnivîsên wî hene ji wan (5) pirtûk çap bûne.

**Ew jî ev in:**

-Pirtûkek rêzimana Kurdî bi navnîşana(Gurzek Gul Ji Baxê Zimanê Kurdî).

- Pirtûkek bi zimanê Erebi bi navê:

-Dergihek bo dîroka Kurdî ya kevnar, Kurdistan ji serdemên kevîrî yê kevnar ta hatina misilmantiyê.

-Pirtûkek bi Kurdî bi navê: Kurtedîroka gelên Rojhilata navîn û tîkilyên wan bi hev re.

- Pirtûkek bi Erebi, bi navê: elberzex In Marîfe Kurdiye

-Pirtûkek bi Kurdî, bi navê: Bergihek ji Zanista Kurdî.

- ji destnivîsên wî yê bi zimanê Erebi, yê neçapkirî (10) berhem hene, dibin zincîrek bi sernavê: Ehdas Min Ehwal Kurd û Kurdistan

-Ji destnivîsên wî yê bi zimanê Kurdî û neçapkirî (26) berhem hene bi sernavê: bûyerin ji rewşa Kurd û Kurdistanê.



## **Birahîm Qasim**

Birahîm Mela Qasim Nivîskar û Helbestvan e. Di sala 1962yan de, li gundê Hemzebegê, herêma Dêrika Hemko li Rojavayê Kurdistanê, jidayik bûye. Derçûyê Zanîngeha Helebê ye (Peymangeha Bazirganiyê) di sala 1984an de.

Di jiyekî piçûk de xwe fêrî ziman û nivîsandina Kurdî kiriye, ew jî bi saya hin pirtûkên bavê xwe Mela Qasim û birayê xwe yê nuxurî Ebduletîf ku ji bilî pirtûkên olî çend pirtûk û kovarên Kurdî hebûn, mîna: Dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, helbestên Feqeyê Teyran, bi tîpên aramî û Elfbaya Osman Sebrî û Cegerxwîn, û çend hijmar ji kovar û Rojnameyên Kurdî bi tîpên Latînî.

Pişt re, xwe fêrî rêzimana Reşîdê Kurd kir û li ser wê rêzimanê çend heval û dostên xwe fêrî nivîsandinê kirin, di wan çend salên xwendina lîseyê dibistana bazirganî li Hisiça û Peymangehê li Helebê de.

Di destpêka sala 1988an de, li Şamê paytexta Sûriyê li Taxa Kurdan "Rikin-Eldîn", heyamê 5 salan jiyanê xwe derbas kiriye wekî karmendê dewletê.

Li Şamê, bi rêya çend kursên Ziman bi awayekî nehînî di mala xwe de, xwendekarên zanîngeha Şamê fêrî Zimanê Kurdî dikirin.

Li Şamê têkiliyan bi rêberê Kurd Osman Sebrî re çêdike û xwe nêzîkî wî dike, her wesa çend nivîskar û rewşenbîrên Kurd nas dike, û bi hev re girûpeke rewşenbîrî li mala Diya Ciwan didamezirînin.

Piştî karê wî yê karmendiyê tê Dêrika Hemko, pişt re dibe endamê sernivîser di kovara Bihar de, li sala 1995ê tevî Giropa Rewşenbîrî ya Dêrikê dibe ta damezirandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê, di sala 2013an de, û tê hilbijartin wekî serokê Tayê Dêrikê yê Yekîtiya Nivîskarên Kurd.

Ji bilî rêveberina tayê Dêrikê yê Yekîtiya Nivîskaran, çend salan dibe endamê Komîteya Mihrecana Helbesta Kurdî li Sûriya, û li Peymangiha Bedirxan dibe mamostayê beşê wêjeyê, herweha çend korsên xwendina helbestên klasîk û pêlewaz û danasên helbestê ji hijmarek helbestvanan re dike di riya Skype û Watsappê re.

Di kongirê awarte sala 2015, li Dêrikê dibe endamê desteya rêveber ya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyê, niha yek ji endamê Desteya Sernivîser ya Kovara Pênûsa Azad e, herweha endamê ragehandina Yekîtiyê ye û rêveberê Malpera wê ye, û bi awayekî berdewam gotar û helbestan di rojname, kovar û malperan de dinivîse, ji bilî ew vîdyoyên xwendina helbestên xwe û yên helbestvanên kevnar, li ser kanala xwe ya taybet belav dike.

Li sala 2022yan Xelata şanaziyê ya 27mîn Mihrecana Helbesta Kurdî werdigire.

Ta vê rojê li gundê xwe Himzebegê jiyana xwe li mal û li nav bistanê xwe yê zeytûnan derbas dike.

#### **Berhemên wî yên çapkirî:**

1-Şîn û Zayîn-Helbest çapa Şamê, 1991z.

2-Fîxan-Helbest çapa Dêrika Hemko, 2005z.

3-Vekolîn – vekolîneke lezgîn di tore û wêjeya Kurdî de, çapa Dêrika Hemko, sala 2012.

4-Vekolîn – Ciwaniya Helbesta Kurdî- çapa Heseke, sala 2017.

5-Azariya Dêmen Mehweşîn –Helbest- çapa Qamişlo, sala 2018.

6- Kurteyêke hînkirin li ser binêşeyî û ciwankariyê di wêjeya Kurdî de.

7- Vekolîn -Helbest- Qunaxên Rêbaza Wêjeya Kurdî, Pirtûkxaneya Bedirxaniyan li Duhokê, 2023

**Pirtûkên li ber çapê:**

1-Dîwana Baxçê Min

**Reşnivîsên berdest:**

1-Mijarênên wêjeyî û zanistî

2-Hijmarek helbest biqasî 2 dîwanan

3-Kurteçîrokên Belav

4- Wergerandina dîwana Asoma Girtinhevê ya Helbestvan Ehmedê Şêx Salih "tîpguheztin" ji tîpên Kurdî yê Aramî bo tîpên Kurdî yê Latînî, mixabin hîn ew jî nehatiye çapkirin!.



## **Birahîm Xelîl Îsa (1932-2012)**

Zanayê mezin Birahîm Xelîl Îsa kurê Ebdilhemîd e, bi navê: Xelîl Hemdo tê naskirin.

Di sala 1932yan de, li gundê (Îkî Axûr) yê girêdayî herêma Efrînê ya bi ser parêzgeha Helebê ve hatiye dunyayê. Bi herdû zimanan, bi zimanê Kurdî û zimanê Erebî dinivisand.

-Zanayekî olî yê ku xwedî çandên cihêreng bû û Lêveger û rêberê olî û civakî bû.

-Bavê wî ji gundê Celber / Xubarî / ye. Bavê wî ew biriye cem xwendayên gund ku li cem Şêx Mistefa Henan (Xoce A'ska) xwendin û nivîsandinê hîn bibe.

-Sertefîka li Efrînê xwendiyê û bawernameyek jê wergirtiye, ku hevqasî bawernameya dibistana seretayî ya niha ye, ji dibistana Efrînê di sala 1949an de, û dibistana navîn jî li Helebê di navbera salên 1945-1952 de.

-Ji sala 1959an ve nêzî 13 salan wek karmendê dewletê li Şamê kar kir.

-Di sala 1969an de, ji zanîngeha Şamê "Bekaloryos di Şerî'etê de" wergirt.

-Li dibistanên amadeyî yên parêzgeha Helebê wek mamosteyê perwerdeya îslamî li "Minbic" kar kiriye.

-Çûye Erebistana Si'ûdî û li wir heta sala 1983yê zayînî maye. Dûre vedigere Efrînê û di 31ê Kanûna 1991ê de xanenişînbû, heta ku koça dawî kir.

### **Berhemên wî ev in:**

\_ Çewtiyên zimanî yên hevbeş, bi şêwaza / bêje û nebêje /, ku hin ji wan di kovareke perwerdeyî de, li Erebistana Si'ûdî, di sala 1978 de, hatine weşandin.

\_ Peyameke meydanî "Hevalê Hecî" bo "Hikûmên Hec û Umre", di nav hiqûqnasan de, li ser çar mezhebên ramanê. 1978

\_ Hêskirina bendên xwendinê ji bo Saziya danejiberkirina Quranê li Efrînê di sala 2003yan de.

\_ Mîrasî di şerî'eta islamî de / di du cildan de/ destnivîsa sala 1982, bi pêzanînên bîrkarî yên pêwîst.

\_ Mîrasî (bermayî) di şerî'eta Islamî de ... berawirdî yasaya sala 2002 di yek cildî de.

\_ Lavij û bîranînên rast û berên wan di sala 2005an de / li dora 400 rûpelî ye, di amadekirina çapê de.

\_ Pîvan, kêşan û berhevdanên kevin.. beramberî sedsala bîstan 1980 / destnivîs.

\_ Helbestên evînê û civakî bi zimanê Kurdî, di navbera salên 1952-1960 de / bi tîpên Erebî.


\_ Pirtûkek li ser "Mafên jinan di îslamê de" (Mafên Pîrekan), bi zimanê Kurdî - tîpên Latînî, di 80 rûpelî de, ji qetê mezin). Di sala 1997an de, ji hevlekî xwe re li Almanyayê şandiyê.

\_ Berên xweş di peravên bîranîn û lavijan de.

Seyda her dem di pirtûkxaneya xwe ya tijî pirtûkên zanistî yên curbecur de, dixwîne û dinivîse. Mirovekî ku bi hezkirina xwe ya ji zanistê û xwendina berfireh tê naskirin. Ew xwediyê pirtûkxaneyekê bû ku di warên curbecur yên zanist û zanînê de dewlemend e, û dibe ku yek ji mezintirîn pirtûkxaneyên kesane li herêma Efrînê be.

Di 29ê Gulana 2012an de koça dawî kir.





## Boniye Cegerxwîn

Ew, di sala 1946an de, li gundê Topiz yê bi ser bajarê Amûdê ve, li Kurdistanê Rojava dikeve, jidayik bûye. Hîna ew di çil de bû, wan mala xwe barkir bajarê Qamişlo. Ew di malbateke siyasî de mezin û perwerde bû. Li Qamişlo xwendina seretayî û pola heftan qedand, û ji ber ku bavê wê helbestevan, nivîskar û siyasethedarekî çalak bû, rewşa malbata wan tim di metirsînê de bû, ew tim di binçav de diman û gelek caran bavê wê hatiye girtin û êşkencekirin.

Di sala 1959an de, wan sînore Sûriya bi dizî qutkirin û derbasî başûrê Kurdistanê bûn. Berî wan bi salekê Bavê wê jî sînore qutkiribû û çûbû Baxdadê, êdî ew jî gihan e bavê xwe. Li Bexdadê ew sê salan man.

Wê xwendina orte û salek ji xwendina wêjeyî li wir qedand. Bavê wê jî, li Zankoya Bexdadê zimanê Kurdî, zaravê kurmancî, dida.

Lê piştî ku rewşa Kurda ne xweş bû û nemir M. Mustefa Barzanî derkete çiyê, desthilata Îraqê biryara derxistina wan ji Iraqê da, lewma ew vegeriyan Qamişlo.

Li Qamişlo rewşa wan ya aborî ne baş bû, bi taybetî sala 1969an, gava ku bavê wê çû Kurdistanê giha şoreşa Êlûnê ya bi serokatiya M. Mustefa Barzanî. Êdî malbata wan, ji neçarî barkir Şamê.

Wê jî li Qamişlo wek cîgira mamoste li dibistanên Qamişlo û der û dora Qamişlo karkir. Pişt re bi awakî azad bê ku ew biçe dibistanê, wê xwendina xwe kir û bawernameya Bekeloriya wergirt. Wê mamostetî berdewamkir û Xwendina Mamostetiyê xwend, lê bawername nedane wê, ji ber ku ew keça Cegerxwîn bû.

Êdî ew jî gihaye malbata xwe li Şamê, û hin kar li wir kirin û xwendina zimanê Rusî li ( Navenda çanda Sovyata berê) li Şamê xwend û ji wan Stîpendyom wergirt, lê desthilata Sûrî derketina wê nepejirand, dîsa ji ber ku ew keça Cegerxwîn e.

Malbata wê bi tevahî çênedibû derkevin derveyî welat û çênedibû jî karên fermî bikin.

Êdî dîsa ew vegehiyaye Qamişlo û wek cîgira mamoste, li dibistanên wê kar kir.

Di wê demê de, dest bi karê siyasî kir. Wê di nav rêxistina Partî Demokratî Kurdistan de, di rêxistina jinan de, kar û xebat kir.

Herweha, wê çalakiyên civakî û kultûrî dikirin û ew di cejnên Newrozê de pêşkêş dikirin.

Di sala 1982yan de, û piştî ku desthilatê astengiyên giran datanîn ber wê da ku nema kar bidin wê, êdî ew û her çar zarokên xwe çûn e welatê Swêdê, ew gihane bavê xwe yê ku berî wan çûbû.

Li wir wê salekê zimanê Swêdî xwend. Pişt re li Hêlîna Zarokên Kurda çend salan karkir. Pişt re çûye xwendina (pêşdibistanê) ji bo guhdana zarokan, du salan xwend û dîsa vegehiyaye karê xwe berdewam kir, lê vê carê bi bawername.

Di heman demê de, wê karê civakî kir, ew bûye endama Komela Demokrat ya Jinên Kurd li Swêdê, û di komîta wê ya birêveber de cî girt. Çend salan xebat kir, pişt re Yekîtiyek jinan avakir û sê salan bûye seroka Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Swêdê. Li ser pîrsa jina Kurd û pîrsa neteweya Kurd gelek kar û xebatên balkêş kirin. Yek jê, weşandina kovara (Jin). Ewê berpirsiyariya kovarê dikir.

Herweha, ew û endameke din li ser navê Yekîtiyê beşdarî konferansa (NGO) ya navneteweyî ya Jinên Cîhanê li Çînê bûn. Ew beşdarî konferansa jinên Kurd ya berfireh li Kölnê-Elemanya jî bû. Ev konferans ji aliyê rêxistina (Komjin) hatibû amadekirin. Di herdû konferansan de, biryarên balkêş û berbiçav girtin.

Herweha, û ji ber ku ew seroka YJK Li Swêdê bû, û li gor biryarên hatibûn girtin, ew bibû endama komîta birêveber û ya Giştî ya Federasiyona Komelên Kurdistanê li Swêdê û di hemû civînên wan de amade dibû.

Piştî çend salan, ew bi malîti vegehiyaye Qamişlo.

Li wir komeleyeke jinan ava kir û ew bûye seroka komelê. Çend salan berdewam kir, lê piştî qeyrana Sûriyayê, ew vegehiyane Swêdê.

Dîsa ew tevî Yekîtiya Jinan bû û kete nav komîta birêveber ya Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Swêdê.

Demekê wê kar kir û pişt re ji ber nexweşiyên xwe, wê xwe ji berpirsiyariyê azad kir. Di vê pêvajoya dirêj de, kar û xebata neteweyî, pirsra jinan û ya zarokan û ji bo çanda Kurdî gelek kar û xebat kirin.

Ji sala 2004an de, ew endama Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyayê ye û di sala 2014an de, bûye endama komîta birêveber a Yekîtiyê. Herweha, ew di komîta desteya birêveber ya Rojname Yekîtiyê (Pênûsa Nû) beşê Kurdî de jî, ji destpêka weşana wê, cî girtiye.

Di sala 2016an de, ew bûye cîgira serokê Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyayê.

Ji 20 saliya xwe ve, wê dest bi nivîsandina helbestê kiriye, lê wê bi zimanê Erebi helbesta xwe dihûnand û helbestên xwe belav nedikirin, di nav rûpelên wê de razayî man. Hino hino û piştî kar û xebata wê di nav rêxistinên Kurdî de, xwe fêrî nivîsandina zimanê Kurdî kir û dest bi nivîsandina helbesta Kurdî kir. Ew helbesta Kilasîk û ya nûjen bi hev re dinivîse.

Gelek gotar û helbest di malperên Kurdî de, bi salan belav kirine. Aniha ew li welatê Swêdê dijî.

Helbestên xwe yên bi zimanê Erebi û yên bi zimanê Kurdî tev çapkirin. Çar pirtûkên wê bi zimanê Kurdî hene, yek ji wan ji bo zarokan e. Anha jî ew di pirtûkekê de dixebite, bi hêvî ye, ewê wê jî bigihêne weşanê. Du pirtûkên wê jî bi zimanê Erebi hene.

#### **Pirtûkên wê yên bi zimanê Kurdî ev in:**

- 1- Banga Cegerxwîn ji Gorê- Weşanxana Lîs li Amedê, Sala - 2016
- 2- Omîdên Windayî- Weşanxana Lîs Amedê, Sala- 2017
- 3- Sîberên Xewna- Weşanxana SerSera, Elemanya 2020
- 4- Baxçê Gulan (Ji bo zaroka ye)- Weşanxana APC, Stockholm 1997

#### **Pirtûkên wê yên bi zimanê Erebi ev in:**

- ١-أوراق مبعثرة
- ٢-عندما يشتعل الصمت



## **Brahîm Mehmûd**

Brahîm Mehmûd lêkolîner û ramanwerekî Kurd - Sûriyeyî ye, di sala 1956an de, li gundê Xirbet l'nizê, yê gundewarê bajarê Qamişlo, jidayîk bûye. Di sala 1981ê de bawernameya felsefeyê ji zanîngeha Şamê stend, piştî bîst salan mamostetiya li enstîtûyên Qamişlo kir û xwe bi xwendin û nivîsandina di warên cuda yên rewşenbîrî, wêjeyî, dîrokî û rexneyî de terxan kir. Niha li Herêma Kurdistanê penaber e, û li Navenda Beşikçi ya Lêkolînên Mirovî ya Zanîngeha Dihokê kar dike.

Nivîsarên wî: Zêdetirî dused pirtûk di warên rexneyî yên rewşenbîrî, dîrokî û wêjeyî de, bi zimanê Erebi çap kirine, bi taybetî li ser aliyê antropolojiya lêkolînên xwe, û li ser bedenê, ji bilî beşdariyên wî ji bo pirtûkên hevbeş û pêşgotin û ravekirina pirtûkên ku ji fransî hatine wergerandin (bi taybetî Jacques Derrida). Wî gelek gotar û lêkolînên rewşenbîrî û wêjeyî di kovar û rojnameyên mezin ên Erebi û kovarên curbicur ên çandî de weşandine. Gelek roman û pirtûk ji Kurdî wergerandine Erebi. Di derbarê nivîsên xwe yên bi Kurdî de, wî dîwaneke helbestan di bin navê: Weke çemekî ji dil derkeve – Şam-2005 çapkiriye.


-Tirs bi xwe û helbest bilî wê: Helbest.

-Gotinên beravêtî: Helbest

-Yek du: Gotarin ji xwe re.

-Av û nivîsandin

-Min xwe spart jiyane, wê ez himbêz kirim, 2023



## Can bapîr

Can bapîr romannivîs, rojnamevan û derhêner e, li 27ê Avdarê sala 1970î de, li gundê Bozîk ya bi ser devera Kobanî ye hatiye dunyayê, niha li welatê Osteriya dijî û salên dirêj di mîdiya de kar kiriye , gelek pirtûk di navbera roman û helbestê de çap kirine û derhunera filman ên kurt û dîkometerî û destanî kiriye.

### **Berhmên wî ev in:**

- Pêdaçûna dûjehê, helbest bi erebî, Şam, 1998
- Sing, roman bi erebî, Şam, 2000 .
- Gewiriya Helbestê Za .Helbest, Beyrût, 2001
- Biryarên guneh hev beş li gel Selah Mislim bi erbî Şam. 2003
- Sêqoliya bi erebî şêl û bêl, roman
- Şêl û bêl roman bi erebî, Şam, 2005
- Sîrqîniya yekşemê derî çar şemê bi erebî, roman, 2007
- Kuştina nivîsandinê roman bi erebî
- Zarokê li baxçê dilfê, helbest bi erebî, 2012
- Zemawenda helbesta hevbeş Xedîce Belûş helbest bi erebî, Tûnis. 2013

- Naveroka qereçiyar helbest hev beş bi erebî, Tara Îbo, 2015
- Rûdawekan û helwestekan Mam Celal, werger. 2006
- Hêmen, roman, bi erebî, 2019 çapa Misrê
- Peyalên janê, helbest Takî xav, roman, 2020
- Romana takî xav - romana çarsing - Wergerandina stranên jinên peştûnî bo kurdî - Helbesta ku te helbest bûya - Romana Azland Ji bilî karê xwe yê nivîskariyê, wî di warê çapemeniya xwendî, dengî û dîtbarî û derhêneriya fîlman de jî kar kiriye. Di warê sînemayê de, Belge filem:
- Laleş belge filim
- Parêzvanê zargotinê Celîlê Celîl
- Cegerxwîn belge filim
- Filmên bêdeng - Pêngav
- Filmên romanî- Neferstan, - Henarê bextewer.- Sitrana şekestî.
- Zincîra li pêş perdê 3 xelek
- Wek aktor beşdarî zincîreya bikekne ey Gîneral bû her wiha di filmeke nemsawî de beşdar bû.



## Can Birahîm

Can Birahîm navê wî Feyad Mustefa Birahîm e, di 10/9/1969an de, li gundê Şeşê yê girêdayî bajarê Kobaniyê jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî, navendî û amadeyî li bejarê Reqayê berdewam kiriye. Endamê komîta Mehricana Helbesta Kurdî ye, endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriyeyê ye, herweha jî endamê HRRKê ye. Gelek caran pêşkêşiya bernamêyên çandî, di radyoya Qerecdax û Siba FM kiriye. Wî bernamêyên tilivizyonî jî pêşkêş kirine.

Yekem helbest di sala 1988ê de, li ser Keleha Dimdimê nivîsand. Di kovar, rojname û malperên Kurdî de helbestên wî hatine weşandin. Çend xelat wergirtine. Wek: Xelatek ji Partiya Ciwanan a Avakirin û Guhertinê. Her wiha ji Meclîsa Sivîl a Reqayê di sala 2022yan de. Spasname Ji Mehrîcana Çîroka Kurdî her sal ji ber beşdariyê û Mehricana Helbesta Kurdî li Sûriyeyê û yekîtiya rewşenbîrên serbixwe.


Gelek çîrok û helbestên wî bi zimanê Kurdî û Erebi destnîvîs hene. Wek danhevek peyvên Kurdî û Erbî bo ferhengeke Kurdî - Erebi amade ye.

### **Berhemên wî:**

Di sala 2017an de, dîwana Lorîn çap kir.

Di sala 2019an de dîwana Beravên Aso çap kir.

Dîwana 3eyemîn 2022 bi navnîşana Koşka Keseran di çapê de ye.



## CanKurd

Di sala 1948an de, li gundê Meydankê yê Rojavayê Kurdistanê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya destpêkê li gundê xwe û ya navîn û lîse jî li Efrîn û Helebê biriye serî.

Du salan piştî lîseyê li Enstîtuya Amadekirina Mamosteyan beşa zimanê Erebi li Helebê xwendiyê. Ji ber xebata siyasî gelek caran hatiye girtin û îşkencekirin.

CanKurd di sala 1979an de çûye Almaniyayê û xebata xwe ya siyasî û çandî dewam kiriye.

Ew bi Kurdî, Erebi û Elmanî dinivîse û heta niha ev berhem çap kirine:

### **Bi Kurdî:**

- Gundê Dîna, kurteçîrok.
- Selahdînê Eyûbî (Kurdekî cîhan hejand)
- Alexander Jaba (Berhevoka çêrokên kurmancî)
- Dilopeka xwîna dila, helbest.
- Bazirganê Vênîsiya – Werger ji Shakespeare.

### **Bi Erebi:**

- El–Muslîmon wel Qediye El–Kurdiyye.
- El –Hîlal El–Meeqof.
- El–Merhele Errahîne mîn Kîfah Eşeeb El–Kurdî.

### **Bi Almanî:**

- Gutachten Pirtûkek li ser rewşa rojavayê Kurdistanê wek belav kiriye.





## **Cawîdan Kasanî**

Navê wî Xalid Qasim e, di 05/05/1965an de, li gundê Kasanê ku girêdayî bajarê Dêrika Hemko ye, ya rojavayê Kurdistanê, hatiye jiyânê. Xwendina xwe ta bekaloriya li bajarê Dêrikê biserî kiriye. Paşê bawernameya xwe ji nexweşxaneyê Tîşrînê ya bajarê Dîmeşq standiye.

Berê xwe daye rûsya, li wir 10 salan jiyaye. Ji ber sedemên cuda nikarîbû xwendina xwe ya dermansazî biqedîne. Ji wir çûye dewleta Finlanda şeş salan li bajarê Hêlsinkî maye, û careka dî vegeryaye bajarê San Pitrisborg û du salên dî li wir maye. Paşê vegeryaye bajarê Dêrikê û bi hevjin bûye û sê zarok jê re çêbûne, navên wan: Avend, Rewend û Elend in. Niha ew li Dêrikê dimîne.

Cawîdan dema ku ew di refa heftan de bû, dest bi nivîsîna helbesta Kurdî kirye û li nav rewşenbîran geriyaye û têkilî bi wan re çêkiriye. Mîna: Seydayê Tîrêj û Kamîran Gêlanî û gelekên din. Cawîdan du salan bûye mamosteyê zimanê Kurdî. Herweha zimanê Rusî, Erebi, Finlandî jî baş dizane û beşek ji zimanê ingilîzî.

Di sala 2007an de, helbesteka wî ya bi navnîşana Dîroka Kurd, di pêşbirka helbestê de, li gundê Mûsa Gewra, di mehrecanê de, yekem û serkeftî hat diyarkirin. Lê mixabin, hêzên saloxgeriyê yên Sûrî bi ser wan de girtin û mehrecan rawestandî, û pênc kes ji beşdarên mehrecanê çar mehan hatin

girtin. Wekî dî, di pêşbirka zimanê Kurdî de, yê yekem derket û hat xelat kirin.


Berhemên Cawîdan nêzî 200 helbestan nivîsiye û nehatine çapkirin. lê di gelek hilkeft û cejnan de hatine xwendin.

Spasname ji karê wî yê mamostetiyê re ev in:

- 1- Ji partiya yekîtiya Kurd li sûriyê wergirtiye.
- 2- Ji peymangeha Bedirxan a zimanê Kurdî
- 3- Ji Bawernameya rûmetkirinê ji hevgirtina jinên Kurd li Sûrî
- 4- Ji Rêzname ji partiya Azadî ya Kurd li Sûriyê.

Cawîdan romanek nivîsiye ew jî bi destê kesekî din wenda bûye.

Niha Cawîdan endam e di Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê de nivîsgeha bajarê Dêrika Hemko.



## **Cegerxwîn (1903-1984)**

Cegerxwîn navê wî Şêxmûsê kurê Hesênê Mihemedê Mehmûdê kurê Elî ye. Cegerxwîn di sala 1903yan de, li gundê HESARÊ jidayik bûye. Ji (11) xuşk û biran, tenê sisê mane: Şêxmûs, Xelîl, Asya.

Di sala 1918an de, bavê wî Hesên li bajarê Amûdê mir.

Di sala 1919an de, li gundê Bêdir-Memo, diya wî Eyşan a heftê salî jî serê xwe danî û mir. Ji bo debara jiyânê, wî hê di salên zaroktiyê de dest bi kar kiriye. Pêlakê li cem xuşk û birayê xwe maye.

### **Jiyan û xebata li Binxetê (Roavayê Kurdistanê)**

Di sala 1920an de, çûye xwendegêha olperestî û çend salan li ser hev li Roava, Başûr û Rohilatê Kurdistanê jî, li xwendinê geriyaye û rewşa gelê Kurdistanê baş nas kiriye.

Di 1924an de, Cegerxwîn dibe welatparêz.

Di sala 1927an de, keça xalê xwe Kehla Selîm ji gundê Hesarê ji xwe re tîne û li Amûdê bicî dibe.

Di sala 1928an de, xwendina xwe qedand û îcaza xwe wergirt û bû melayê gundê Hazda jorî û di wê salê de dîwana xwe ya yekemîn nivîsiye.

Di sala 1936an de, Cegerxwîn, bi çend malên gundiyan ve, du gund avakirin (Çêlek û Cehenem).

Di sala 1937-1938an de, Cegerxwîn û hevalên xwe Nadiyek-Komelak li bajarê Amûdê (Ciwankurd) ji xortên Kurd re vekirin û komela wan gelek berepêş çû, lê bi destwerdana hin mirovên nezan û dijminê milletê Kurd Firansizan ew komele girt.

Di sala 1946an de, Cegerxwîn mala xwe ji gund guhaztiye bajarê Qamişlo û ketiye nav pêlên rêzanî û siyasetê. Di heman salê de, Civata Azadî û Yekîtiya Kurd hate çêkirin: Dr. Ehmed Nafiz serok û Cegerxwîn sekreterê wê bû.

Di sala 1948an de, Cegerxwîn bûye hevalê Partiya Komunîst a Sûryayê.

Di sala 1949an de, cara yekemîn bû ko Cegerxwîn hatiye girtin.

Di sala 1950an de, Cegerxwîn dikeve Civata Aştîxwazên Sûryayê û di hundirê wê de kar dike.

Di sala 1954an de, Cegerxwîn ji hêla komonîstan ve bû berbijêrê perleman a Sûriyayê.

Di sala 1957an de, Cegerxwîn ji komonîstan dûr dikeve.

Di sala 1958an de, Cegerxwîn, meke Şêxmûsê Qerqatî (Hec Girzîn) û meke Şêxmûsê Şêxî rêxistina AZADÎ saz dikin. Piştî pêlakê Cegerxwîn û hevalên xwe rêxistina xwe nehêlan dikin û bi Partiya Dîmoqrati Kurdî re dibin yek.

Di sala 1959an de, Cegerxwîn direve Îraqê û sê salan li Zanîngeha Bexdayê beşê Kurdî, dibe mamosteyê zimanê Kurdî-kurmancî.

Di sala 1962yan de, hukûmeta Îraqê bera Cegerxwîn dide; lewma jî, ew û zarokên xwe vedigerin Sûryayê. Cegerxwîn tê girtin û piştî pêlakê tê berdan.

Di sala 1963yan de, dîsa Cegerxwîn tê girtin û dikeve Zindana Mezê li bajarê Şamê, lê piştî pêlakê tê berdan, lê wî nefî (Surgun) dikin û dişînin bajarê Siweyda nav Durziyan; piştî demeke ne dirêj tê berdan û vedigere bajarê Qamişloyê.

Di sala 1967an de, Cegerxwîn bû endamê Komîteya Navendî ya Partiya Pêşverû ya Demokrat a Kurd li Sûriyê.

Di sala 1969an de, Cegerxwîn diçe Kurdistana Îraqê, nav şorişa Kurdî û nêzîkî salekê li wir dimîne.

Di 1969-1970yî de, ew cardin diçe Başûrê Kurdistanê û nêzîkî salekê di şoreşê de dimîne, û paşê vedigere Sûryayê.

Di navbera 1973 û 1975an de, ew ji ber stemkariya hikûmeta Sûriyê diçe Libnanê û li wir dimîne. Li Libnanê dîwanên xwe, ya sisyê “Kî me ez?” û ya “Salar û Mîdya” çap dike.

Di sala 1976an de, Cegerxwîn vedigere Sûriyeyê û heta sala 1979an li wir dimîne.

### **Li Swêdê**

Di sala 1979an de, Cegerxwîn ji Sûryayê diçe Siwêdê û pênc salên xwe yê dawî ji jiyana xwe li Siwêdê derbas dike.

Di 22-10-1984an de, li bajarê Stockholmê, Cegerxwîn serê xwe danî, mir. Cegerxwîn di hewşa xaniyê xwe de, li bajarê Qamişloyê hatiye veşartin. Zarokên wî yê ko li dû xwe hiştine du kur û çar keç in: Keyo, Azad, Gulperî, Rojîn, Boniye, Selam.

### **Berhemên Cegerxwîn ên çapkirî û yê destnivîs ev in:**

- Dîwana yekem Pirîsk û Pêtî, Şam 1945
- Çîroka Cîm û Gulperî, Şam 1947
- Dîwana -2- Sewra azadî, Şam 1954
- Çîroka Reşoyê Darî, Şam 1956
- Gotinê pêşiya, (pend), Şam 1958
- Awa û destûra zimanê Kurdî, Bexda 1961
- Ferhenga Kurdî,1 Bexda 1962
- Ferhenga Kurdî,2 Bexda 1962
- Kîme ez, dîwana 3 Bêrût 1973
- Çîroka Salar û Mîdiya, Bêrût 1973
- Ronak, Dîwana 4 Stockholm 1980, weşanên Roja Nû,
- Zend-Avista, dîwana 5 Stockholm 1981, weşanên Roja Nû.
- Şefeq, dîwana 6 Stockholm 1982, weşanên Roja Nû.
- Hêvî, dîwana 7 Stockholm 1983, weşanên Roja Nû.
- Tarîxa Kurdistan, cild 1, Stockholm 1985.
- Aşitî, dîwana 8 Stockholm 1985, weşanxana Kurdistan,
- Tarîxa Kurdistan, cild 2, 1987 Stockholm
- Folklorê Kurdî, 1988 Stockholm

- Jînenîgariya min, 1995 Stockholm
- Şerefnameya Menzûm, Libnan 1997.
- Dîwana 9an
- Tarîxa Kurdistan, cildên 3-4
- Awa û destûra zimanê Kurdî (nû kiriye)
- Fehenga kurmancî, cildên 1-2 (nû kiriye)
- Folklorê Kurdî, cildên 1-3
- Çîroka jîndariya min, cildên 1-3
- Hozan û navdarên Kurdistanê
- Şerha dîwana Cizîrî
- Şerha dîbaca Xanî
- Hespên ristvanên Kurdistanê
- Gotinên pêşyan, cildên 1-2 (nû kiriye)
- Hesenê Mûsê, (Çîrok)
- kuştina xortekî Îranî li Bêrlînê (wergerandin)
- Kurd, Mînoriskî, (wergerandin)
- Dewleta Mehabad, (wergerandin)
- Tarîxa Mala Şedad, (wergerandin)
- Tarîxa Kurdan li Yemenê, (wergerandin)
- Kurd û Kurdistan, Nîkîtîn (wergerandin)
- Çîroka Şofêrê kemyona sor
- Çîroka Xecê û Siyamend
- Tarîxa Şoreşa Kurdistanê Îraqê (hatiye hinda kirin)
- Rapora mifetişê umûmî li Turkiyê.



## **Celadet Alî Bedir-Xan**

**(26ê nîsana 1893 - 15ê tîrmeha 1951an)**

Bêguman, di dîroka milletê Kurdî de, malbata Bedirxaniyan xwedî rol û kedeke bêhempa û gewre ye. Xwedî cihşîneke dewlemend e. Çi di warê serhildan û raperînên azadîxwaz, û çi di warê rewşenbîrî û zanistiyê de be. Gelek fedakar û cangorî pêşkêşî gelê xwe kirine.

Bêdiro! Di navîna babilîska nozdehan de, Bedir-Xan beg xwediyê ramana azadîxwaz a gelê Kurd bû. Ji (1842-1847), li hemberî zordariya dewleta Osmanî serî hilda. Lê mexabin pê re neçû serî. Bedir-Xan beg û zarûzêçên xwe dîrî welatê bav û bapîrên xwe ketin. Dewleta Osmanî bi zanebûn lawên Bedirxan bi kar û xebata dewletê mijûl dikirin, û çûyîna Bedirxaniyan ya Kurdistanê qedexe bû. Emîn Alî lawê Bedirxan yê mezin bû. Wî di nav tevgera Kurdî de cihekî giring digirt, û çavdêrê dadgeha Stenbolê bû. Xebatkerekî gerok bû. Osmanîyan ew ne li cihekî û ne li bajarekî dihişt.

Di 26. 06. 1893yan de, Li Stenbolê, Xwedê lawek dayê ku navê Celadet lêkirin. Celadetî Xwendina xwe ya destpêkê û ya navîn li wir riha kir û zarokatiya xwe, tevî bavê xwe, di van sirgûnan de derbas kir, û li bajarên wekî Stenbol, Isparta, Edirne, Konya, Akka, Nabilis û Salonîkê geriya. Celadet di maleke welatparêz û xebatkar de mezin bû. Bavê wî Emîn Alî zarokên xwe li ser şopa zanîn û Kurdayetiyê xwedî kirin.

Di temenê hejde-nozde saliya xwe de, Celadet derbasî Kuliya Herbî dibe. Diya wî Senîhe ya Çerkes nerazîbûna xwe ji vî karî re diyar dikir û dixwest wî

dûrî Osmaniyan xe. Celadet di Şerê Cîhanê yê Yekem de beşdar bû. Li qefqasyayê di şerî de bû. Ew gihişte heta Bako.

Diyar e, Celadet ji biçûkanî de dest bi nivîsandinê kir, û temenê wî negihabû bîst salan dema pirtûka (Rastiya Rûxandina Edirne) ya ko di sala 1917an de, digel birayê xwe kamîran nivîsandiye.

Di salên 1918-1919an de, derfeteke zêrîn ji bo damezirandina dewleteke Kurdî peyda bû. Celadet û birayê xwe Kamîran, Ekremê Cemîl Paşa, Fa'îq Tewfîq û siyasetmedarê Ingilîzî Mêcer Edward Noel li nav hoz û êlên Kurdan gerian. Armanca wan amadekariyên Peymana Sêvrê bû. Lê mexabin ew tevgera wan cih negirt û tu axa, beg û serokeşîran piştî wan negirtin; lewre ew karê wan zû têk çû. Celadet di vê gera xwe ya Kurdistanê di nav eşîran de, gelek metelok, peyv û çîrok jî kom kirin. Di vê çûn û tevgerê de, li ramana çêkirina Alfabeke Latînî divarqile. Ê bi ûştê Mêcer lê hay dibe û dest bi danîna Alfabeke xwe dike.

Di sala 1922yan de, rojnama Serbestî li Stenbolê derdiket, Celadet cîgirê girîndeyê wê bû. Di wê demê de, Kemalîyan Stenbol xistibûn bin destê xwe, û bi xurtî li dijî Kurdan derketin. Di cih de fermana bidarvekirina bavê wî Emîn Alî û her sê birayan: Celadet, Kamîran û Sûreya didin. Bavê wî Emîn Alî Bedirxan û lawê xwe Sûreya diçin Misrê-Qahire. Celadet û birayê xwe Kamîran diçin Almanya-Miyûnixê. Celadetî li wir zanistgeh xwend û Şehada dadmendiye/ hukukê wergirt.

Celadet ji kaniya çande û kultûrê Almanîyan vedixwe, bandûra rewşenbîriya wan gelek lê dibe, nemaze dîtina Besmark, ê ko dixwest di riya yekbûna zimên re yekbûna Almanîyayê biparêze. Rewşa zimanê Kurdî gelek bala Celadet kişand û hêdî hêdî dest bi danîna bingeha rêzimana zimanê Kurdî kir. Lê, her bala wî li ser rewşa tevger û şoreşên Kurdî bû. Têkilî û girêdanên wî bi hundirê welêt re hebûn. Dema şoreşa Sêx Se'îdê Pîran di sala 1925-an de, destpêkir, berî da welêt. Lê mexabin dema ew giha welêt, şoreş têkçûbû. Bi dilekî kuldar dîsa berî dide Almanya. Lê mexabin, ji ber nesaxiya bavê xwe, di sala 1926an de, berî dide Misrê û ji wir diçe Beyrûtê.

Piştî têkçûna şoreşa Şêx Se'îdê kal di sala 1925an de, dewleta Turk dest bi siyaseta helandina bi darê zorê kir – ya ko bi siyaseta Tirkîrînê (tetrîk) têt



naskirin. Dasa şer, hişk û ter da ber xwe. Bi destekî hesinî dest bi kuştin û wêrankirina gelek gund û bajarên kirin. Çek ji destê hoz û 'eşîrên Kurdan wergirtin. Berê agirê sitemkariyê giha hemû warên jiyane (aborî, civakî, siyasî û rewşenbîrî). Xebatkarên Kurd penaber bûn û tev ji hev tarûmar bûn.

Giringiyek bi girêdana kongirekî giştî ji bo yekîtiya hêzên Kurdan yê belavbûyî, li ser pirogrameke yekbûyî hebû. Ewan welatparêzên kelecandar û penaber kongirê xwe di 5ê çiriya pêşîn sala 1927an de, li Beyrûtê-Bihemdûnê, girêdan. Celadet Bedirxan yek ji damezrênerên pêşîn yê 'Xoybûn'ê bû, û hemû çavkanî û jêderên dîrokî nîşan didin ko ji sala 1927-1932an serokatiya wê kiriye.

Bi rastî, em nikarin xebata Xoybûnê û şoreşa Araratê ji hev veqetînin, ji ber ko li dora çar salan (1927-1930), bi hev ve hatibûn girêdan. Em dikarin bibêjin ko pareke mezin berdewamkirin, û geşkirina agirê şoreşa Agirî ji keda rêxistina 'Xoybûn'ê bû. Ji nav malbat û malmezinên Kurdan rola malbata Bedirxaniyan ya sereke bû, nemaze tekoşer Celadet Bedir-Xan.

Li Beyrûtê sala 1929an, wek parêzer xebitî û di wê demê de, û bi taybetî di 16-8-1929an de, li bajarê Beyrûtê, dest bi nivîsandina bîranînên xwe kir. Di navbera 1927-1931ê de, pir di navbera Beyrût û Şamê de dihat û dihat.

Dema şoreşa Agirî têkçû, berê wî jî ber bi Tahranê ve ket. Li ser gotina wî şah Behlewî hin kar û xebatên dewletê jê re pêşniyar kirin, lê qet wî dil nekir. Lewra Şah wî dispêre Îraqê, Îraq jî wî dispêre Sûriyê. Ev ne cara yekê ye ko hin dewlet dixwazin wî bertîl bikin û wî ji xebata Kurdayetiyê dûr bixin. Belê Frensîz, Turk û şahê Urdirê jî jê xwestibûn, lê qet Celadet ji bo armanca xwe, radestî li ber van xwestek û daxwazan nekir.

Piştî hilweşîna şoreşê û têkçûna xebata çekdarî giringiyek bi girêdana civatekê ji penaberan re, li mala welatparêzê Kurd Elî Zilfo Axa - li taxa Kurdan - li bajarê Şamê û bi serokatiya Mîr Celadet A. Bedir-Xan. Di wê civîna pêşîn de, ev gotina xwe ya dîrokî pêşkêşî wan kir û got: *"Gelî Kurdan..! Gelî rewşenbîr û welatparêzên delal...Şoreş û rapêrînên me bi çekan serneketin û ne jî gihan armancên xwe... Niha ji me tê xwestin ko em bi pêûsê, bi zanîn û rewşenbîriyê, gelê xwe hişyar bikin, û pê şerê dijminê gelê xwe bikin. Em,*

*dîrok, tore, folklor û rewşenbîriya xwe nas bikin û xwe bi cîhanê bidin naskirin... Bila zanîn çekê me be..”.*

Bi van gotinên pir bi akam û hêja, Mîr Celadet Alî Bedir-Xan ronaka xebatê li pêş wan penaberan vêxist û berê xebatê da pêûs û zanînê. Berê wan ji eniya şer û cengan da eniya wêje û pênivîsê.

Di 26-çiriya pêşîn - sala 1931ê de, rêdana çapkirina kovara HAWARê di bin jimara 6224 de, ji wezaretê hundirî ya dewleta Sûriyê wergirt.

Di roja 15ê Gulanê sala 1932yan de, hejmara pêşî ji kovara HAWARê derxist. Kovareke wêjeyî û zanistî ye. Dûrî siyasetê ye. Pêncî û heft hejmar ji vê kovarê derketin. Hejmara dawîn di 15-Tebax- 1943yan de bû. Her 15 rojan hejmarek derdiket. Temenê wê 11 salan dirêj kir. Gerek li dora pênc salan tenê bûna, lê mexabin çend caran radiwestiya. Pê re alfabeya xwe ya Latînî û çend pirtûkên li ser zimanê Kurdî - Kurmancî di bin navê weşanên kitêbxana 'Hawar'ê (1932-1943) de belavkir. Di riya vê kovarê re, çend navên gewre di gasîna toreyê Kurdî de hatin naskirin. Ji wan navdaran Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Hesên Hîşyar, Ehmedê Namî, Cegerxwîn, Kamîran Bedirxan....hd. Ev qonax bi van ronakbîran û bi berhemên wan hat naskirin.

Berhemên hêja di warê dîrok, ziman û toreyê Kurdî de afirandin. Folklorê Kurdî ji qonaxa devkî derbasî qonaxa nivîskî kirin. Raman, hizir û bîrweriya mirovane, di koda 'Hawar'ê de meyndin. Zaravayê Kurdmancî hem ji mirinê riha kirin, hem jî bi bêjeyîne nûh û nûzayî dewlemend kirin.

Dewlemendiya Celadet netenê di warê afirandina alfabeyê Latînî û rêzimana zimanê Kurdî de bû, belê xwediyê du dibistanan jî bû. Dibistana pêşî Kurdaniya biware ya ko gelek nivîskarên Kurd yê penaber jê hînî rastxwendin û rastnivîsandina zimanê xwe bûn, hînî giringiya pênivîs û zanînê bûn.. Dibistana din hevotina rojhilatnasên mîna Rojer Lîsko, Pîr Rindo û Tomas Biwa bi pirs, doz û rewşa Kurdî bû. Rola van rojhilatnasan di kovara Hawarê de gelek bû. Çend perhemên giring di warê folklor, kultûr û dîroka Kurdî de afirandin. Mîr Celadet bala wan kişande ser çande û wêjeya Kurdî.

Celadet Alî Bedir-Xan bi heşt zimanan zanî bû; Kurdî, Turkî, Farisî, Erebi, Elmanî, Yûnanî, Frensî û Ingilîzî. Elfabe û rêzimana xwe li gor van zimanan dipîva û dida ber hev. Reng û durvin nuh û serbixwe li alfabeya xwe kir. Bi zanebûn taybetmendiyeke da alfabeya xwe ya nuh, û bi pênc zimanan belav kir: Kurdî, Frensî, Farisî, Turkî û Erebi.

Di sala 1932yan de, li şarê Hisiçayê li gor biryara 'Xoybûn', û bi piştgirî û alîkariya Celadet, Komela (Civata Arîkariyê ji bona Belengazên Kurd li Cizîrê) hat damezrandin. Evê Komelê armanc û sedemê çêbûna xwe di kovara (Hawar)ê de, hejmara: 2 ya ko di 1ê Hizêrana 1932yan de hatiye weşandin, dide diyarkirin.

Di sala 1937an de, li gor biryara 'Xoybûn'ê û bi piştgirî û alîkariya Celadet, li bajarê Amûdê (Nadî CiwanKurd - Amûde) hat damezrandin.

Di 1ê Nîsana 1942yan de, Mîr Celadet hejmara pêşî ji kovara Ronahî belavkir. Bîst û heşt hejmar jê, bi awayê mehane, derketin. Hejmara dawîn di Adara 1945 de derket. Temenê wê çar sal bûn. Ewê Kovarê nûçe û salixdanên şerê cîhanê yê didiwan bi wêne, digel gelek nivîsên hêja di warê folklor, tore û rewşenbîriya Kurdî de belav kirin. Em dikarin bibêjin herdû kovar (Hawar 1932-1943 û Ronahî 1942-1945) wêjeyeke nuhkirî, nuhbûyî û nûjen bixwe re vejand. Gelek bêjeyên nuh afirandin. Bêdiro! Kovarên Hawar û Ronahî zerezengiya ser serê wêjeya Kurdmancî û Qur'ana zimanê wê ne.

Hêjayî gotinê ye, ko ev qonaxa dîrokî bi qonaxa Bedirxaniyan bê binavkirin. Ji ber ne tenê xebata wan di ber çand û toreya Kurdî de cihê serbilindî û şanaziyê ye. Belê, di geşkirina hestê neteweyî de rol û bandûreke pir mezin di civaka Kurdî de lîstin. Tîrêjên vê akamê bi xurtî li raman, hizir û jiyana civakî ya Kurdan vedan.

Ji sala 1934 - 1936an, Celadet zimanê firensizî li dibistana pîşe, li bajarê Şamê daye.

Di sala 1935an de, Bi Rewşen Bedirxan re, hevjin bûye û keçek bi navê Sînem (1938) û lawek bi navê Cemşîd (1939) Xwedê dayê.

Di sala 1939an de, li dezgeha Rêcê - ya tûtînê, wek parêzer û serokê çavdêrî kar kirye.

Di dema şerê cîhanê yê dudiwan destpêkir de, firensizan ew û hin penaberên Kurd li Şamê binçav kirin. Bi taybetî, ew di sala 1943-yan de, li bajarê Şamê, dibin çavdêriya dewletê de bû.

Di sala 1947an de, li ser navê xelkê Cizîrê xwe ji bo endametiya perlemanta Sûriyê da pêş. Lê mexabin di cih de ew vekişandin.

Di sala 1950î de, li sûriyê buhayê pembo gelek bilind bibû. Derfetek bû ko mirov rewşa xwe pê xweş bike. Husên Îbiş mirovekî dewlemend û xwedî erd bû. Hêcanê gundê wî bû. Xwest alîkariya Celadet bike û parçak erd dayê ji bo çandiniya pembo. Ji neçarî, berê Celadet kete riya çandiniyê. Lê ne bi dilê xanima wî Rewşenê bû. Celadet jî pir ji wî karê xwe ne dilrast bû. Pir ji bîra

Qederê xemgîn bû. Di roja avdanê de, mexabin di tirsaxwe ve derket û di wê bîrê de wer bû. Celadet li 15'ê Tîrmeha sala 1951ê li gundê Hêcanê nêzîkî Şamê çû ber dilovaniya Xwedê û laşê wî li kêleka bapîrê wî, Mîr Bedir-Xanî, li Goristana Şêx Xalidê Nexşbendî, li taxa Kurdan li Şamê hat veşartin. Sed mehder û dilovanî li giyanê wî yê pîroz bibarin û cihê wî buhişt be.

### **Ji navên ku Celadet Bedir-Xan di HAWARê de bi kar anîne ev in:**

Nêrevan, Herekolê Azîzan, Xeberguhêz, Stranbêjê Jêliyan, Stranvan, Şîretbêj, Çîrokbêj, Şevger, Seydayê Gerok, memosteyê Gerok, Hawar, Cemşîd, Newîn, Dilistan, Şebistan, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînemxanê, Koçerê Botan, Yekî Vexendî, Xwediyê HAWARê, Nivîsanoka HAWARê, C.A.B. Ronahî, Xwediyê Ronahî... dibe hin navin din jî hebin.

### **Berhemên Celadet:**

Ji bilî herdû kovarên wî (Hawar û Ronahî), çend berhemên hêja belav kirin, ji wan:

-Rêzana Elfabêya Kurdî. Mîr Herekol Azîzan. Çapxana Tereqî. Şam: 1932. Kurdî, Frensizî, Turkî, Erebi û Farisî. Bîst rûpel in. H:1.

-Rûpêlinen Elfabê.

-Biyêşa Pêxember. (Mewlûda Nebî) Osman Efendî. Bi Kurdiya dumilî, bi dîbaca Celadet. Çapxana Tereqî, Şam.1933. Çel û şeş rûpel e.H:4.

-Nivêjên Êzediyan bi dîbaca Celadet. Çar nivêj in Ji devê Şêx Heyder û Ismaîl beg hatine girtin. Çapxana Tereqî, Şam:1933. Heşt rûpel in. H:5.

-Mektûb ji Mistefa Kemal paşa re, bi destê Rewşen Bedirxan hat wergerandin bo zimanê Erebi, û min jî çapkir û belavkir.

-Ji Mesela Kurdistanê. Min wergerande zimanê Erebi û belav kir. Sala: 1999 - Hewlêr. Ji weşanên rojnama Medya.

-Gramêra zimanê Kurdmancî. Celadet û Rojê Lîsko. Min wergerand zimanê Erebi û belav kir. Digel çend mamosteyan, 1991, Şam.

-Fehenga Kurdî-Kurdî. Çapxana Avesta. Stenbol - 2009.

-Bîranînên min. Celadet Bedir-Xan. Komkirin û werguhêr: Dilawerê ZENGÎ. Çapa yekê (1997) Beyrût - Libnan. Çapxaneya Emîral. Çapa didiwan, Beyrût: 2010. Bi zimanê Kurdî - Erebi.



## Cemîl Ebdirezaq Dahir

Di sala 1977an de, li gundê Til-Nayif yê li dora kîlometreyekê bakurê riya diweli, û di navbera rêya Amûdê û Til-Bêder dikeve, jidayik bû. Zaroktî û xwendina seretayî li gund qedand. Di havîna sala 1988an de, malbata wî koçî bajarê Heseke kir û li taxa Miftî bicih bûn, xwendina navîn û ya amadeyî û bawernameya peymangeha werzîşê jî di sala 1999an de, li Heseke wergirt.

Wî derdora du mehan mamostetiya werzîşê li gundewarên Heseke kir, tevî ku ew yê yekemîn di her du salên peymangehê de bû. Lê ji ber gendeliyê û ji ber şer û zora bi Kurdan re dihat kirin, kesên girêdayî hêlên ewleyî, li bajaran bicih dikirin û ew avêtin gundan.

Di havîna 2002yan de, leşkeriya neçar bi dawî kir û pişt re vegeriya mamostetiye. Di destpêka kirîza Sûriyê de, û piştî lawazbûna hêza rêjîma Ba's li herêmê, ew tevî Komîta Fêrbûna Zimanê Kurdî bû û li taxên Heseke komên ji qîz, xort, zarok, jin û mêran amade kirin, û ew fêrî zimanê Kurdî kirin. Ewî di wê demê de dest bi nivîsandina helbestan kir; lê piştî derdora du salan, komîta ziman hat sekinandin ji ber dibistanê Kurdî vebûn û pêwîstî bi hebûna komîtê nema.

Di havîna 2015an de, ji ber pîrsa nebûna avê li bajarê Heseke û rewşa xizmetguzariyê mala xwe koçî bajarê Qamişlo kir.

Niha destnivîsek wî ji helbestan heye, lê neçapkirî ye. Em hêvîdar in di demeke nêz de çap bike.



## Cemîl Ibrahîm

Li gorî tomarên fermî, ew di sala 1951ê de, hatiye dunyayê, lê li gorî ko diya wî digot: Ew di rojekê ji rojên heftiya dawî ji meha Cotmehê, sala 1949an de, li gundê Girkeftar, parêzgeha Hisiça li Rojavayê Kurdistanê, jidayik bûye. Diya wî digot: "Buhara sala din, ango sala 1950î, serê meha Adarê, em derketin buhariyan, em xwedî pez bûn, divabû koça me di çemê Ceqceq re derbas bibe, wê demê ava çemê Ceqceq hemû bûbû qeşa, ji bo ko em di çem re derbas bibin, em neçarbûn, me sewalên xwe, pez û dewarên xwe, di ser qeşayê re derbas kirin, piştî ko me ka li ser qeşayê reşand, qene em û ajelên xwe li ser qeşayê neşemitin". Mane tê zanîn ko çemê Ceqceq serê buhara sala 1950î bûbû qeşa, heya çemê Dicle jî, ango ava mezin, weke ko li Amedê, berî deh-duwanzdeh salan, ji wî re hate gotin, û di heman demê de wî jî qeşa girtibû, ava wî jî bûbû yek parçe. Xuya ye sermayeke zor û dijwar wê demê ew herêman hemû vegirtibû.

Diya wî Xedîce Eslan e, bavê wî jî Hisênê Heso ye, ko heya niha jî bi navê mala Heso di nav xelkên herêmê de, ew têne naskirin; Heso jî kurê Biro yê Dêwid e.

Tê bîra wî, ew hîna piçûk bû, belkî temenê wî çar sal derbas nekiribûn, gava ko carê apê wî, Mela Nayif, ango helbestvanê navdar Seydayê Tîrêj, dihat cem wan malê, û carê helbesteke xwe ji wî re dixwend, pişt re digot wî: "De ka tu bêje", wî jî cara yekê yan ya duduwan ew helbest ezber dikir, û jê re digot. Gelekî kêfa apê wî dihat, loma wî ew bi germî himbêz dikir, ew maç dikir, û aferîn ji wî re digot. Ew wê demê gelek helbestên wî ezber kirin, hîn jî hinek ji wan li bîra wî ne, loma bandora vê yekê li ser wî gelekî mezin û kûr

bû, hiştibû ko ji piçûkanî de hezkirina helbest û wêjeya Kurdî di dilê wî de, di hişê wî de bê çandin, û bingehê xurt ji zimanê me re li cem wî bê duristkirin.

Salên 1956 - 1962an, wî xwendina seretayî li dibistana gundê xwe xwend, qonaxa navê û institûta mamosteyan, 1963-1970î, wî li bajarê Hîsiça xwendiyê. Sala 1972-1977an, wî li zankoya Şamê, fakoltaya Mafnasiyê xwendiyê, û bidawî aniye. Ji sala 1970 heya 1983yan ew bûye mamosteyê dibistana seretayî, û ji sala 1984 heya Nîsana 2014an, li bajarê Qamişlo ew bûye Parêzer, ji ber ko ew û malbata xwe, di sala 1972yan de, li bajarê Qamişlo niştêcî bûne.

Di sala 1966an de, ew bûye endamê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriye, ya ko pişt re navê wê bûye "Pêşverû". Sala 1986an ew bû endamê Komîteya Navendî, û ji sala 1992-1999an ew bû endamê Deftera Siyasî; lê sala 2005an ew ji nav rêza vê partiyê derketiye ....

Hêjayî gotinê ye ko helbestvan Seydayê Tîrêj (Nayifê Heso) apê wî ye, û helbestvan Seydayê Namî ( Mela Ehmedê Namî) xezûrê wî ye.

Ew 17-18 salî bû gava ko wî helbesta yekemîn bi zimanê Kurdî nivîsand, lê wî gelek helbest ne nivîsandin, têra dîwanekê nedikirin, hinek ji wan helbestan windabûn, tê bîra wî ko di buhara 1969an de, wî 9-10 helbestên xwe di deftereke piçûk de nivîsand, û wî diyarî hevalekî xwe kirin, mixabin ko ew hemû winda bûn, niha tenê 10 helbestên wî li cem wî mane. Piştî sala 1976an, wî nema tiştêk bi zimanê Kurdî nivîsand, ew mijûlî nivîsandina bi zimanê Erebi bû, ji ber ko di nav partiya xwe de, wî gelek gotarên siyasî, ramanî, rewşenbîrî, bi zimanê Erebi dinivîsandin. Ji sala 1992yan heya sala 2002yan, ew berpîrsê nûsîngeha ragihandina partiyê bû, ragihandina partiyê jî, bi hawayekî serekî, hemû bi zimanê Erebi bû.

Piştî ko ew ji nav partiyê derket, wî ji nû ve dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kir, lê wî helbest nenivîsand, wî di warê roman, çîrok û wergerandinê de nivîsand.

### **Niha çar pirtûkên wî yê çapkirî hene:**

- Guharok (Roman) e, du caran hatiye çapkirin, di sala 2016an û di sala 2019an de.

- Çûna Silêmaniyê (Wêjeya Geştîyariyê), di sal 2019an de çap bûye.

- Şingalname (Roman e), wî ew romana mamoste Ibrahîm El-Yûsif, ya bi heman navnîşanê, ji zimanê Erebî wergerandiye zimanê Kurdî, û di sala 2019an de çap bûye.

- Romaneke wî bi zimanê Erebî di sala 2020an de hatiye çapkirin bi navê (التين البري), ew jî wergera romana (Guharok) e.


Wî niha dest bi nivîsandina du berheman kiriye, yek jê birê duyemîn ê romana "Guharok" e, ango qonaxa bi dû de, yê duduwan bîranînên wî ne, ji destpêka jiyana xwe û heya niha, ew hêvîdar e ko ew karibe herdû berheman, di demek nêzîk de, bibe serî, nivîsandina wan bi dawî bîne.

Wî gelek gotar û lêkolînên çend dost û hevalên xwe, li ser daxwaza wan, ji zimanê Erebî wergerandine zimanê Kurdî, herweha wî gelek gotarên wêjeyî nivîsîne, him ji bo kovar û rojnameyan, û him jî di simînarên wêjeyî de, yên ko Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd (li Sûriye) lidar dixistin.

Ew, ji 01.08.2014an ve, li Elmanya, li bajarê Dortmund, dijî.

Ew endamê komîteya rêveber ya Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd (li Sûriye) ye.





## **Ciwan Nebî**

Helbestvan Ciwan Nebî, di sala 1983yan de, li Qamişlo, taxa Enteriyê hatiye dunyayê.

Xwendina xwe ya lîsansê li zanîngeha Helebê, Fakulteya mafnasşyê (Hiqûq) di sala 2007an de bi dawî anî, û bi bawernameya xwe ya parêzer di gelek warên qanûnî û yên din de kar kir.


Wî, li zêdetirî yek dezgehên ragihandinê de, wek peyamnêr û edîtor, kar kir.

Wî, di warê wergerê de kar kir û gelek helbest, gotar û lêkolîn û peymanên ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hatine derxistin, wergerandine zimanê Kurdî.

Wî gelek berhemên wêjeyî nivîsandin û gotarên rojnamevanî di kovar, rojname û malperên Kurdî de hatine weşandin.

### **Berhemên wî:**

- 1- Sar weke Tirsê, 2006
- 2- Li çepî xilmmaşiyê. 2010
- 3- Weke gulleyeke ku te nekuje, 2014
- 4- Henaseyên te ku xewna çemekî, 2018



## Ciwanê Abdal

Nav û Paşnav: Mihemed Se'îd Mele sa'îd, û dema nivîsandina bi zimanê Kurdî navê Ciwanê Abdal tê bikaranîn, li Dirbêsiya Roavayê Kurdistanê, di 13/8/1955an de, hatiye dunyayê.

Ew bi xwendin û nivîsandinê re têkildar e: (Helbest, çîrok, şano, gotarên rexneyî, û awayên din ên nivîsandinê), her çend ev têkilî di destpêka nivîsandina wî de dest pê kir, lê ew di wê demê de, ji ber sedemên kesane yên mecbûrî, herî zêde malbatî, nehatin weşandin.

Xwendina wî: Dibistana navîn e, lê balkêşî bi nivîsandin û bi xwendinê pêş ket, mîna her kesê xwe-avakirî be.

Çend berhemên xwe di rojnameyên vedor de weşandine: Li Kurdistan-Hewlêr wek kovara Gulan El-Erebî, li Lubnanê wek rojnameya El-Kifah El-Erebî, li Şamê di rojnameyên Tîşrîn, El-Isbû' El-Edebî û kovarên El-Me'rîfe, El-Turas ElŞ'ebî, El-Mewquf El-Edebî ...htd; li Urdunê wekî rojname El-Fînîq.. çîrok û gotar, ji bilî weşandina di kovar û rojnameyên Kurdî yên herêmî de li Qamişlo..

dema; Li hemû bajar û bajarokên Rojava / Hîsiça, Qamişlo, Serêkaniyê, Amûdê, Dirbêsiyê, Dêrik, Kobanî, Efrîn, Heleb, Şam...hwd, li vir û wir gelek beşdarî û şevbuhêrkên wî hene, ji bilî endamtiya Yekîtiya Nivîskarên Kurd û endamê Yekîtiya HRRK.

### **Berhemên wî yê çapbûyî:**

- Heft pirtûkên kurteçîrok hene. Du kurteçîrokên bi Kurdî, navê ya pêşîn (Lehya Qamîşa) 2002 û ya din bi navê (Hungivê Şor) 2018

- Şeş pirtûkên şano jî bi Erebî, û yek pirtûk helbest jî heye.

-Çar pirtûk helbest bi Kurdî çapkirine. Helbesta riste û ya nûjen. Ya pêşîn bi navê (Tolaziya Dil-2000),( Aso li demê dipêle 2001), (Ronî û Germe-2004).. û tê gotinê ku pirtûkek hebestî wergerandiye Kurdî ya helbestvanê Espanî yê navdar: Lorka û navê pirtûkê (Lorîkên Qereçiyên-2005)

-Yazde pirtûkên helbesta stranî bi navê:( Xeleka Zêrîn) 2018

Herwiha di kovarên Erebî û Kurdî de berhemê xwe belav dike.



## **Deham Ebdulfetah**

Di sala 1942yan de, li gundekî bi navê (Bellê), nêzî bajarokê Amûdê jidayik bûye. Xwendina xwe heta lîseyê li xwendingehên parêzgeha Hesekê kiriye. Li Zanîngeha Helebê, beşê Ziman û Wêjeya Erebî, xwendina xwe biserî kiriye. Nêzî 25 salan mamostetiya Ziman û Wêjeya Erebî kiriye. Nuha jî destê xwe ji karmendiyê kişandiyê û xwe ji kar û barên Zimanê Kurdî re vala kiriye.

Destpêkê, çalakiyên xwe yê rewsenbîrî bi Zimanê Erebî dinivîsîn. Helbest û gotarên xwe di rojname û govarên Erebî de belav dikirin. Di sala 1978an de, di taya ezmûneke derûnî de, li xwe hay bû û ev pirs ji xwe kir: Kesê ku tovê xwe di zeviya xelkê de biçîne, ji bilî poşmaniyê gelo wê çi biçîne?!

Wê hingê her tişt di mejiyê wî de hate guhertin. Berê pênuşa wî jî, di babelîska wê ezmûnê de, hate guhertin. Nêzî deh salên peyapey, xwe bi xwendin, danhev û hevberkirina ziman û rêzimana Kurdî westand. Di sala 1988an de, dest bi nivîsîna bi zimanê xwe kir û hêj li ser wê rêbazê berdewam e.

### **Berhemên wî yê çapkirî ev in:**

- Peyvînek Bi Kurdekî re - Helbest (Bi Erebî), wergerandin-Şam 1989
- Li Ber Dergehê Laleş- Helbest, Şam 1990
- Nêrîneke Rexneyî Li Helbestên Kurdî, Rexnegirî, Şam 1992

- Hinek Aloziyên Zimanê Kurdî, Lêkolîn, Şam 1993
  - Di Mûzîka Helbestên Kurdî De, (Têbînî û Bersiv) Bi Erebî, Şam 1995
  - Rênivîsa Zimanê Kurdî, Lêkolîn, Weşanên Kombenda Kawa, Beyrût 1998
  - Destana Gilgamêş, Duhok - Dezgeha Spîrêz, 2005 çapa yekem. - Çapa dûyem, Stanbol 2006 - Çapa sêyem - Diyarbakir 2019
  - Nav Di Zimanê Kurdî De - Duhok, Dezgeha Spîrêz, 2006 çapa yekem.
  - Çapa duyem - Diyarbakir 2006 - Çapa sêyem - Qamişlo 2020
  - Cînav Di Zimanê Kurdî De - Wezareta Perwerdê, Duhok- Dezgeha Spîrêz, 2006. - Çapa duyem - Amed-Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê - Kewçêr 2006 - Çapa sêyem - Qamişlo 2020
  - Nav Di Zimanê Kurdî De – Amed - Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê - Kewçêr 2006
  - Kar di Zimanê Kurdî de - Çapa yekem - Diyarbakir 2011 - Çapa dûyem - Dihok 2012 - Çapa sêyem - Qamişlo 2020
  - Yarsan (Werger), Diyarbakir 2017
  - Mistek ji Hêvî û Arîşeyên Zimanê Kurdî, Diyarbakir 2018
  - Çarînen Xeyam, (Werger) Diyarbakir 2019
- Li Ber dest: Tewang û Veqetandek û Hin Mijarên Dîtir.



## **Demhat Dêrikî (Remezhan Hisên)**

Demhat Dêrikî helbestvan û rojnamevenekî Kurd e. Di 8.2.1973yan de, li gundekî rojavayê Kurdistanê bi navê Girbalat ku girêdayî bajarokê Dêrika Hemko ye, jidayik bûye. Demhat heta dibistana amadahî xwendiyê.

Berî niha bi navê Demhat Hezexî di rojnameya Azadiya Welat, Kovara Peyv, Nûbûn, Zaxo û Hêzil de, gotarên siyasî, wêjeyî (çîrok û helbest) nivisandiyê. Li herêma Başûrê Kurdistanê li bajarê Duhok û Zaxo maye. Piştî ku jiber rejîma Ba'as, li sala 2004ê, jiber egera serhildana Qamişlo direve.

Li Duhokê endamê Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê ye û endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd Tayê Duhokê ye. Di nava desteka nivîserên Kovara Zaxo de cî girtiye û di dengê Radyoya Zaxo û televîzyona Zagrosê de kar kiriye. Li dawiya sala 2016ê ve li welatê Almaniya dimîne.

### **Berhemên çapkirî ev in:**

1. Şev jî diaxive (helbest). Li sala 2010an ji aliyê weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê Dohuk ve hatiye çapkirin.
2. Hest diaxivin (helbest). Li sala 2012an ji aliyê Wezareta Rewşenbîrî û Lawan û Yekîtiya Nivîskarên Kurd Tayê Duhok ve hatiye çapkirin.
3. Esmera Bakur (helbest). Li sala 2013an ji aliyê Weşanxana Ronahî ve li Amedê hatiye çapkirin.
4. Keçika Agirî (çîrok). Li sala 2015an ji aliyê Weşanxana Aram ve hatiye çapkirin.
5. Nameyên vekirî ji evîna dilê min re (helbest). Li sala 2022y
6. an ji aliyê Weşanên SÎTAV ve li Wanê hatiye çapkirin.



## **Dîlan Şewqî**

Di sala 1970yê de, li Serê kaniyê jidayik bûye.

**Sê pirtûkên wê yên helbestan bi zimanê Kurdî çapkirî hene.**

1 -Ramûsanên sor 1998

2-Hevdîtina pêxemberan 2004

3-Ez tev de pencere me 2013

Ya çaran (Xerîbiyê ez kor kirim) ji bo çapê amade ye.

Ya pêncan (Çend helbest ji bo diya min) ew jî ji bo çapkirinê amade ye.

**Pirtûkên ku wê wergerandine:**

1-Pirtûka Ahmed Arif (Hesretinden prangalar eskîttim) ji zimanê turkî wergerandiye zimanê Erebi. Berî niha hineka ew wergerandibû zimanê Kurdî. Ew li dûbeyê çap bibû.

2-Pirtûka Cegerxwîn (Jîn û geriya min) ji zimanê Kurdî wergerandiye zimanê Erebi.

- Sê pirtûkên Turkî wergerandine zimanê Erebi û ew li Şamê hatine çapkirin:

-ûmmûhan biçaklî (helbest).

- Ahmet Tellî (helbest).

-Atîlla îlhan (helbest).

Dîlan Şewqî gelek karê wergerandinê kiriye, ji Kurdî û Erebi û Tirkî wek helbestên helbestvanên Erebi ê mezin mîna: Mehmûd Derwîş wergerandin zimanê Kurdî û di dergî û belavokên Kurdî de belav bûne.

Ji sala 2013an de, romanê dinivîse.

-Romaneke wê bi navê ( Xato ) di kovara (Pênûsa nû) de, li ser xelean hat weşandin.

-Romanek bi navê (Danûk) ew jî li ser xelean hat weşandin.

-Deh rojan li nexweşxana lêkolînê odeya 219. (roman) e, sala 2021ê, li çapxana Name hate çapkirin.

-Şekirê di bêrîka bavê min de. (roman) e, Evesta, sala 2021ê çap kir.

- (Terpiyê Narê) roman e ew li ber çapê ye.

Du romanên din jî amade ne ji çapê re.

Ji sala 2011an de, Dîlan li Turkiyê li Kûlo dijî, Kûlo bi bajarê Qoniyê ve girêdayî ye.





## Dilawerê Zengî

\*Dilawerê Zengî, navê wî yê dirust Ibrahîm kurê Ismaîl e, Ismaîl kurê Mihemed e, Mihemed kurê Emê ye. Piştî şewata Sînema Amûdê, bi heşt mehan, di sala 1961ê de, li bajarê Amûdê hatiye dinyayê.

\*Ji ber rewşa xizanî û feqîrtiyê xwendina xwe ya bilind kuta nekir. Lê xwe ji xwendina pirtûkan û çûn û hatina li nik mirovên rewşenbîr, siyasetmedar û zanayên Kurd û civatên wan bêpar nekir.

\*Ew bi xwe ji xelkê Kurdistanê Bakur e, ji (Qeza Şêrwanê, welayeta Sêrtê, gundê Qewmik) e, û ji êl û 'eşîra Dumila ye.

\*Di dema şerê Dewleta Osmanî û Îris de, û ji ber sedemên ramyarî yê wê demê, bapîrê wî (Mihemedê 'Emê) tevî malbata xwe, ji gundê xwe derdikevin û berî didin Binxetê. Bi rê de, û li gundekî ji gundên Wêranşehrê Mihemedê 'Emê dimire. Lawên wî (Isma'îlê Mihemedê 'Emê û birayê xwe Mihemed "Hec Emîn") meşextî binya Xetê dibin û li bajarê Amûdê bicî dibin.

\*Di sala 1979an de, li Amûdê bavê wî diçe ber dilovaniya Xwedê, di wê salê de, dest bi nivîsandina helbestan dike.

\*Li ber destê dayîkeke welatparêz û milletperwer mezin dibe. Evê diyê (Ferîde Elî) riç û bandûreke mezin li jiyana wî ya nivîskarî û ramyarî dike. Diya wî Ferîde Elî gelek zarok ji nav agirê sînema Amûdê riha kirine. Hêjayî gotinê ye ku birayê wî Ehmed di Sînema Amûdê de şewitî, û birayê wî Mihemed jî ji

ber riç û bandora şewata Sînemê tim nexweş bû, û vê dawiyê ew jî mir û bi jiyana xwe şad nebû.

\*Bandûra Şêxê welatparêz û miletperwer (Şêx Sedredînê bavê kal) pir lê dibe û li ser destê wî dest bi nivîsandina elfabeya Latînî- Kurdî dike.

\*Du salan li gundê (Gir Sor) mamostetî kiriye.

\*Di sala 1979an de, li ber destê seydayê Tîrêj hînî awayê nivîsandina helbestê dibe, û ji wê rojê de heta roja koçkirina seyda hevaltîya wan berdewam dike. Hêjayî gotinê ye ku seydayê Tîrêj navê Dilawer lê kiriye.

\*Di sala 1980yî de, ji neçarî berê xwe dide bajarê Şamê û li Zanîngeha Şamê kar dike. Piştî heşt salan ew dûrî karê xwe dikeve. Ji wê rojê de, xwe ji nivîsandin, lêkolîn û xebata ji bo ziman, çand û wêjeya Kurdî vala dike.

\*Di sala 1983yan de, li ber destê Osman Sebrî hînî nivîsandina pexşan û serbest dibe. Ji wê rojê de, li dora deh salan, têkilî di navbera wan de berdewam e ta sala 1993 ku Apê Osman ji nav me koç dike.

\*Li bajarê Şamê gelek qursên fêkirina zimanê Kurdî li nav Kurdên Şamê lidar dixê, û bi sedan xort û keçên Kurd fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî dike.

\*Di warê ramyarî û siyasetê de, li dora 35 salan kar kiriye, û di vî warî de gelek keda wî heye.

\*Di sala 1987an de, Rewşen Bedir-Xan nas dike.

\*Piştigiriya Rewşen Bedir-Xan di wergerandin, amadekirin û weşandina çend pirtûkên wê û yên malbata wê de dike.

\*Di sala 1991ê de, piştî serhildana Kurdên başûr, diçe Kurdistanê û li wir çend semînerên rewşenbîrî û wêjeyî lidar dixê.

\*Di hin rêdaksiyonên kovar û rojnameyên Kurdî de kar dike. Mîna: Gelawêj, Pirs, ElHîwar û Newroz.

\*Ji bilî nivîsandina lêkolîn û helbestan karê rojnamevaniyê jî dike. Di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de nivîsandiye.

\*Gelek dîwanên helbestvanên Kurd yê navdar ji tîpên Erebi veguhestiye Latîni û pêşgotin ji wan re nivîsiye, ji wan: (Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Seydayê Bêbuhar, helbestvan Ebdurehmanê Mizûrî, helbestvan Hizrevan û .....htd.

\*Li dora (300) pirtûkên li ser wêje, çand, dîrok, û folklorê Kurdî çap kiriye û her weha gelek kovar, rojname û posteran dane çapkirin û weşandin.

\*Di sala 1985an de jin aniye. Sê kur û keçeke wî hene: (Royar, Rodî, Ronî û Rewan).

\*Di sala 1998ê de, li gel hin nivîsevanên Rojavayê Kurdistanê, (Xelata Osman Sebrî bo dostaniya gelan) damezirandine.

\*Di 12/7/2000an de, li ser navê Komîta (Xelata Osman Sebrî) diçe bajarê Enqerê û xelatê pêşkêşî prof. İsmail Beşikçi dike.

\*Di sala 2004an de, li ser navê Komîta (Xelata Osman Sebrî) diçe Elmaniya ji bo xelata Osman Sebrî bide xanima hêja Danyêl Metiran.

\*Di sala 2008an de, li ser navê Komîta (Xelata Osman Sebrî) diçe Elmaniya ji bo xelata Osman Sebrî bide mamosteyê gewre Munzir El-Fedil.

\*Gelek caran serdana başûrê Kurdistanê kiriye û ji aliyê serokê Kurdistanê Mesûd Barzan û Celal Telebanî ve, û gelek serkirdayetiyên partî û rêxistinên siyasî û rewşenbîrî li başûrê Kurdistanê dihate pêşwazîkirin.

\*Têkilî, danûstendin û hevaltiya wî bi van navdaran re pir xurt bû: Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), ronakbîrê mezin Osman Sebrî, wêjevana gewre Rewşen Bedirxan, dîrokan Hesên Hîşyar ê Serdî, helbestvan Mele Nûriyê Hesarî, helbestvan Keleş, helbestvan Hamid Bedir-Xan, helbestvan Umerê Le'lê, helbestvan Ehmedê Palo, helbestvan Hadî Behlewî, zimanzan Rezoyê Osê, wêjevan Tewfîq El-Huseynî, helbestvan Mihemed Elî Heso, helbestvan Ehmedê Şêx Salih.. û htd.

\*Berhemên wî di warê helbest, çîrok, ziman, dîrok, wêje, folklor û wergerandinê de, derdora (40) pirtûkî weşandine. Gelek pirtûkên wî yên destnivîs hene..

\*Ji ber rewşa siyasî û lêpîrsîna ewlekariya dewletê, ji bilî navê xwe yê nivîskariyê, di bin gelek nasnavan de berhem, pirtûk, gotar û lêkolînên xwe belav kirine.

\*Ji sala 2013an - 2020an ve, ew serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriyayê bû.

### **Berhemên wî:**

\*Dîwana (Pêdarî), helbest. pêşgotina: Seydayê Tîrêj e. Çapxana Emîral, Beyrût, Libnan, Sal: 1985.

\*Berî Heyv Hilê – Komek çîrok - wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebî. Ji weşanên Mîdiya - Erbîl. 2001.

\*Bîranînên Osman Sebrî, bi zimanê Kurdî, sal: 2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

\*Şerên Sasûnê, Osman Sebrî, komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî sala 2005, Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral. Careke din li Istanbulê, li weşanxaneyê Pêrî, 2005 - hatiye çapkirin.

\*Qedrî Can (helbest, gotar, çîrok û wergerandin), amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê Kurdî. Çapxana komal, Istenbol, sala 2004. Careke din ev pirtûk li çapxana Emîral, Beyrût, Libnan di Sala 2005an de hatiye çapkirin.

\*(Wesenun Lil'işiq) dîwanek ji helbestan, wergerandina Şêx Tewfîqê Huseynî bo zimanê Erebî. Weşandina Dar Kîwan, Şam , sala 2005.

\*Muxtarat (Lîqaat we Hîwarat= Hilbijartin (hevpeyvîn û hevdîtin), Perçê yekem, Beyrût-Libnan, Çapxana Emîral, Sal: 2009.

\*Muxtarat (Lîqa'at we Hîwarat, hilbijartin (hevpeyvîn û hevdîtin), Perçê duyem, Beyrût - Libnan, Çapxana Emîral, Sal: 2009.

\*Etyaf El-Madî. Beyrût - Libnan. Çapxana Emîral.2009.

\*Bînahî - Gotar, lêkolîn, helbest û hevpiyivîn, Beyrût – Libnan. Çapxaneyaya Emîral. Sal: 2010.

\*Ji wêjeya dozê. Amadekirin û komkirina D. Zengî û Ehmed Şihab. Elmanya - Berlîn- 2011.

\*Osman Sebrî: Jiyan, Têkoşîn û Berhem. Beyrût - Libnan. Çapxana: Emîral. Sala 2012. Bi zimanê Kurdî-Erebî.

\*Çîroka Alaya Kurdî, Qamişlo, çapxana: Pêla, Sala 2012.

\*Wêjeya Kurdî Di navbera Rastî û Hêviyan De), Qamişlo, sala 2014.

\*Kurd û Kurdistan Di Nav Rêwîtiyên Dîrokê De, bi zimanê Erebî, çapxana: Pêla, Qamişlo, sala 2015.

\*Rewşen Bedir-Xan: Jiyan û Berhem, çapxana: Pêla, Qamişlo, sala 2017.

\*Ji Xunava Bîranînan: Dîtin û Hevpeyivîn, çapxana: Pêla, Qamişlo, sala 2017

\*Rewan: Gotar û Lêkolîn, pêşgotina Dilovanê Deştê, Çapxana: Pêla, Qamişlo, sala 2017.

\*Qîrîna Mirinê, bi zimanê Kurdî, pêşgotina Dilovanê Deştê, Çapxana: Pêla, Qamişlo, sala 2019.

\*Dîwana Gulistan, , bi zimanê Kurdî, Çapxana: Pêla, Qamişlo, sal: 2019.

### **Wergerandin:**

\*Ji Mesela Kurdistanê, Celadet Bedir-Xan, wergerandiye zimanê Erebî, çapxana Emîral, Beyrût, sal: 1990.

\*Gramêra Zimanê Kurdî, Celadet Bedir-Xan û Rojê Lîsko, wergerandiye zimanê Erebî, çapxana El-Elem, sala 1990, Şam.

\* Bedirxanî di Cizîra Botan de, Malmîsanij, wergerandin: Gulbuhar Bedirxan û D. ZENGÎ, Çapxana Emîral, sala 1998.

\*Bîranînên Osman Sebrî, D. Zengî û Horamî Yezdî wergerandine zimanê Erebi, sala 2001, Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

\*Qedrî Can: Helbest, Gotar, Çîrok û Wergerandin, wergerandina ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebi: Horamî Yezdî û D. Zengî, li başûrê Kurdistanê hate çapkirin. Çapxana Aras, Hewlêr 2001.

\*Ebdulrezaq Bedir-Xan, wergerandin ji zimanê Erebi, çapxana Emîral, Beyrût – Libnan, sala 2010.

\*Bîranînên Celadet Bedir-Xan, Komkirin û wergerandin bi herdû zimanan /Kurdî - Erebi/, çapxana Emîral, Beyrût – Libnan; Çapa duyem, Sala 2010.

\*Çîrokên Kurdî, Danheva: Rojê Lîsko, wergerandin ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebi: D. Zengî û Tewfîq Huseynî, Şam, sala 2010.

\*Serpêhatiyên Kurdan, Tîrêj, (Beşên 1 - 2), wergerandin bo zimanê Erebi, D. Zengî û Tewfîq Huseynî – Şam, sala 2010.

\*Tedarîs El-Edeb El-Kurdî, wergerandin ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebi, (Çend lêkolîn), Qamişlo, sala 2014.

\*Xwendina Kurdî, Kamîran Bedir-Xan, Wergerandin bo zimanê Erebi. Çapxana Pêla, Qamişlo, sala 2017.

\*Raperîna Çanda Kurdî Di Kovara Hawarê de, daner: Dr. Husên Hebeş, wergerandin ji zaravê Kurdmancî bo zimanê Erebi, weşanxanaa Dar, Qamişlo, sala 2017.

\*Tabloyên Şerefnameyê, Ebdulreqîb Yûsiv Zivingî, wergerandin ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebi, çapxana Pêla, Qamişlo, sala 2018.

\*Destpêka Edebiyeta Kurdî, Mihemed Uzun, wergerandin ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebi, çapxana Pêla, Qamişlo, Sala 2019.

\*Şerên Sasûnê, Osman Sebrî, wergerandin ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebî, çapxana Pêla, Qamişlo, sala 2019.

\*Kurdên Çewisandî û Birayên Wan Ên Misilman, Cemal Nebez, wergerandin ji zimanê Erebî bo Kurdî, çapxana Pêla, Qamişlo, sala 2021.

### **Pirtûkên ku ji tîpên Erebî veguhestine ji tîpên Latînî:**

\*Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, bi alîkariya seydayê Tîrêj, ji tîpên Erebî veguhestiye tîpên Latînî. Şam, 1984 (destnivîs e).

\*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî: Ji Evîna Çirayên Kevin, veguhestina tîpan, ji Erebî bo Kurdî, sala 1991, Şam.

\*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî: Li Xelkê Tehlê Li Min Şîrînê, veguhestina tîpan, ji Erebî bo Kurdî sala 1991. Şam.

\*Şerefnameya Menzûm, Cegerxwîn, ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî, û lêveger û ravekirin, çapxana Emîral, sala 1997.

\*Ez û Agir, Dîwana helbestvan Hizrevan, veguhestina tîpan, çapxana Emîral, sala 1998.

\*Dîwana Zindan ya helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), veguhestina tîpan û pêşgotina: D. Zengî, Beyrût – Libnan, çapxana Emîral.

\*Dîwanên Seydayê Tîrêj (Xelat-1, sala 1985, Zozan-2, sala 1990 û Cûdî-3, sala 1998), veguhestina tîpan û pêşgotin: D. Zengî, Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.

\*Mewlûda Pêxember, Tîrêj, veguhestina tîpan û pêşgotina: D. Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral 2006.

\*Serpêhatiyên Kurdan, Tîrêj, veguhestina tîpan û pêşgotin: D. Zengî, Beyrût - Libnan. Çapxana Emîral, sala 2009.

\*Dîroka Kelepûra Mîrnişîniya Botan, Mele Xelefê Bafî. Veguhestina tîpan bi zimanê Kurdî - 2005. Beyrût, Libnan, çapxana Emîral.

\*Nivêjên Êzîdiyan- Celadet Bedir-Xan, veguhestina tîpan ji Erebî bo Latînî: D. Zengî, Çapxana Pêla, Qamişlo, sala 2017.

**\*Alfariya Rewşen Bedir-Xan di amadekirina hin pirtûkan de kir, ji wan:**

\*Name Bo Mistefa kemal Paşa (Celadet Bedir-Xan). Wergerandina Rewşen Bedir-Xan. Beyrût, 1990.

\*Bîranînên Min, Salih Bedir-Xan, Wergerandina Rewşen Bedir-Xan. Şam,1991.

\*Mîr Bedir-Xan, Lutfî, wergerandina: E. S. Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedir-Xan û Dilawerê Zengî, çapxana Emîral, Beyrût, sala 1993.

\*Bîranînên jinekê (Perçê duyem), Guzîda Sebrî, wergerandina Rewşen Bedir-Xan, weşanxana Dar El-Elaa, Şam, 1996.

**Xelatkirin:**

\*Di sala 1999an de, ji hêla Rojnameya Mîdiya, ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname)yê werdigre.

\*Di sala 2011an de, careke din ji hêla Rojnameya Mîdiya, ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname)yê werdigre.

\*Di sala 2012an de, ji hêla komela Celadet Bedir-Xan ya Çandeyî li bajarê Qamişlo hat xelatkirin.

\*Di sala 2013an de, ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd yê Heskê ve hat xelatkirin.

\*Di sala 2013an de, ji hêla Peymangeha Bedirxan a zimanê Kurdî li Dêrikê bi bawernameya şanaziyê "Rêzname" hate xelatkirin.



\*Di sala 2013an de, ji hêla komela Şawişka li bajarê Qamişlo hate xelatkirin.

\*Di sala 2015an de, bi Xelata Seydayê Tîrêj, ji alî Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê hat xelatkirin.


\*Xelata Azadiyê ya Şehîd Miş'el Temo ya herdû salên 2017-2018an, li bajarê Qamişlo wergirtiye.

\*25-26/09/2022, li ser vexwendina Yekîtiya Nivîserên Kurd - Duhok, di Festîvala Duhokê ya Rewşenbîrî 5 de, beşdar bû.

**Pirtûkên neçapkirî ev in:**

- Yûsivê Çelebî û pêvajoya afirandinê, Faris Osman, wergerandin ji zimanê erebî ji bo zimanê kurdî-kurmancî, Dilawerê Zengî.

-Têgih û pênase-lêkolîn-.



## **Dilbirîn Mihemed "Ferhanê Hesê" (1946-2019)**

Dilbirîn Mihemed, navê wî Ferhanê Hesê ye, di sala 1946an de, li gundê Çaxir Bazar yê li başûrê bajarokê Amûdê dikeve, hatiye dinê.

Dema bavê wî ji jiyane koç dike, Ferhan 11 salî bû.

Di maleke pir xizan de jiya ye, û ji ber ku dibistan li gundê wan nebû, ji neçarî diçû gundê Şercî ji bo xwendinê.

Pişt re dibistan li gundê wan vedibe, tenê çar salan li gundê xwe xwendiyê.

Piştî ku mezin dibe, xwe nêzîkî tevgera siyasî ya Kurdî dike, û têkilî û danûstendinên wî bi mirovên welatparêz û rewşenbîr re çê dibin.

Di sala 1970yê de, bi malbatî diçe bajarê Qamişlo û li wir bicî dibe.

Di sala 1975an de, hînî zimanê Kurdî dibe û dest bi nivisandina helbestê dike.

Piştî çend perçebûnên ku li partiya Demokrat ketin, ew li mala xwe rûnişt û nema karê siyasî kir.

Di 11/10/2013an de, di kongirê damezirandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya de, yê ku li bajarê Qamişlo lidarket, bi serokatiya Dilawerê Zengî<sup>1</sup> bû, beşdar bû. Ew her endamê wê bû ta roja ji nav me bar kir.

Di 24/4/2019an de, ji ber nexweşiya penceşêrê, li bajarê Qamişlo - taxa Xerbî çû ber dilovaniya Xwedê, û li goristana Hilêliyê hat veşartin.

### **Berhemên wî ev in:**

-Pêlê evînê sote dil, helbest, 2017

-Gulistan, helbest, 2018

-Mizgîn, helbest, 2018

-Medya min, helbest, 2019

---

<sup>1</sup> Encamên dengdanê li gorî komîta rêveber a kongirê damezirandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Sûriyayê, yê di 11/10/2013an de, li bajarê Qamişlo hatibû lidarxistin, ev in: Dilawerê Zengî 89 deng, Elî Cizîrî 77 deng, Heybet Me'mo 76 deng, Mihemed Şêxo 74 deng, Mihemed Se'dûn 68 deng, Yûnis Hemê 68 deng, Ehmed bavê Alan 66 deng, Marya Ebas 61 deng, Salihê Heydo 59 deng, Wecîha Ebdilrehman 56 deng, Mihemed Ebdî 56 deng, Luqman Yûsif 52 deng, Berzan Husên 47 deng, Ekrem Te'lo 45 deng, Miş'el Osman 33 deng, Taha Xelîl 31 deng, Jînda Mihemed 29 deng, Ibrahîm Xelîl 28 deng, Imran Yûsiv 25 deng, Hekîmê Revê 23 deng, Lazgîn Dêrûnî 21 deng, Kasî 19 deng, Hena'i Dawûd 18 deng, Isma'îl Resûl 17 deng, Hişyar Le'elê 16 deng, Ehmed 'Icê 15 deng, Qasim Mer'îka 12 deng, Mihemed Şefîq Ibrahîm 11 deng û Xalid Umer 7 deng.



## Dildarê Mîdî

Navê wî Mihemed kurê Ehmed kurê Mihemed kurê Haco kurê Doşo ye. Di sala 1963yan de, li gundê Elwanka Şêxê hatiye dinê (jidayik bûye). Ew piçûkê sê xwîşk û du bira ye.

Bavê wî bi zarotî destê xwe ji mam û pismamên xwe birî û gundê Bafê (Kevana Reş) li pişt xwe hişt û berê xwe da Binxetê û dawî li gundê Elwanka Şêxê bicî bû.

\_ Di sala 1972yan de, mala xwe barkirin û li bajarê Qamişlo bicî bûn.

\_ Li bajarê Qamişlo xwendina xwe berdewam kir ta kû wî bekelorya sitand. pişt re li zanîngiha Şamê beşê toreya Erebî jî du salan xwend, lê mixabin ji ber hin sedeman nebir serî.

\_ Di sala 1983yan de, dest bi ristin û hûnandina helbesta Kurdî kir, pê re jî ew bi danhev û komkirina folklorê Kurdî mijûl bû, mîna: (çîrokên gelêrî, metelok, şertok, sitran, lîstkên zarokan û gotinên pêşyan).

Di piraniya simînar û Festîvalên helbestê li hundirê welêt de, beşdar bûye, heta sala 2011an ku koçberî başûrê Kurdistanê bûye û li Hewlêra paytext rûniştiye.

\_ Li başûrê Kurdistanê çend salan karê ragihandinê wekû bêjer di kenala Zagros û Rûdaw de kir.

### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

1\_ Dîwana Kevana Reş- 1998

2\_ Dîwana Ken û Girî -2003

3\_ Dîwana Ez û Jîn - 2017

Dîwanek neçapkirî, du pirtûkên çîrokên gelêrî û hin şertok û metelok û gotinên pêşiyên jî hene.

### **Xelatên ku wergirtine:**

1\_ Koma Mîdya ya folklorê Kurdî- 2003

2\_ komela Jinên Kurd

3- koma Qamişlo ya serbixwe

4\_ Xelata Nivîskar û tekoşer Reşîdê Kurd 2008

5\_ Xelata Seydayê Cigerxwîn ji bo afrandinê 2016

6\_ Rêzname Ji Saziya Roj a Mirovayetiye-2021

7-Rêzname ji Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê

8 \_ Rêzname ji Saziya Mafên Mirovan (Maf) 2021

9\_ Xelata Helbestvan Umerê lalê 2021

### **kom û Hunermendên ku helbestên wî kirine sitran jî ev in:**

1-Aram Dîkran. 2- Şivan mîdî. 3- Sefqan. 4- Laleş Mîdî

5-Elyê gavan. 6-Dilyar. 7 - Bihaa Şêxo. 8- Koma Narîn

9-Koma Cûdî. 10-Koma Serxwebûn ya Rûdaw. 11- Xêro Ebas.



## Dilêrê Kurd

Navê wî Mihemed Nezîr Seyid Remezhan Berzencî ye, li gundê Cim'ayê bi ser qeza Qamişlo ve, li Kurdistanê Rojava, di sala 1959an de hatiye jiyânê.

Malbata wî gelek hejarî û perîşanî dît, Bavê wî Seyid Remezhan yek ji zanayên dema xwe bû. Mirovekî ronakbîr, welatparêz, milletperwer, û xebatkarekî navdar bû. Di dema damezirandina tevgera Kurd li Sûriyeyê de, xwedî roleke pir mezin bû. Pir xelek û komên rêxistinî li nav herêma Cizîrê ava kirin. Berî damezirandinê jî liv û lebat û çalakîyên wî hebûn, nemaze di warê rewşenbîriyê de. Wî helbest jî dinivîsîn, û pir helbestên Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Cegerxwîn, Ehmed Namî û ..hwd, ji gel re dixwendin. Dilêr, di nav vê dibistanê de mezin dibe. Li ber destê bavê xwe Qur'an, çend pirtûk, rêziman û helbestan dixwîne. Apê wî helbestvan û hunermend Mihemed Şerîfê Berzencî jî helbest dinivîsîn û awaz dikirin û stiran digotin û li erbanê jî dixist .. Ewî jî bandoreke mezin li Dilêr kir.

Di sala 1975an de, Dilêr dest bi nivîsandina şanoyê, û pê re jî dest bi hûnandina helbestên Kurdî kir.

Xwendina amojgeha ekteriyê biserî kir.

Di serpereştiya derhênerê şanogerî yê pispor Fewazê Sacir - qola 1977z ji sendîqeya hunermendan, di êzgeh û telefizyona fermî de, gelek salan xebitiye, hevbeşî di nivîsandina pir sînyaroyan de, yê xelekên ekteriyê di telefizyonan de kiriye.

Her wiha di gelek ahîngên welatparêzî de, weke cejnên Newrozê, şevbuhêrkên helbestî, rewşenbîrî û fîstîvalan bûye dîktar û sipîkerê ahîngan.

Lê mixabin ji ber sedemên ewlehî û regezperestî, xwestin wî ji kar biqewitînin û dûr bixin, lê wî xwe ji kar kişand û vegeriya gundê xwe.

Ji wê demê de, Dilêr xwe ji nivîsandinê, ji kar û xebata kêşeya xwe re valakiriye. Da ser rêbaza Bavê neteweya Kurd, sembola Kurdistan û cîhanê nemir Barzanî.

**-Berhemên wî yên çapkiri:**

1-Şanogeriya Sêwî, Kurdî, (ji beşekî pêk tê), bo piçûkan. Ew di sala 1983z de hatiye çapkirin, û di wê salê de hatiye pêşandan jî.

2-Şanogeriya Azad û Gulistan, Kurdî, (ji beşekî pêk tê) hatiye çapkirin, sala 1986z, di wê salê de hatiye pêşandan jî.

3-Dîwana Alav, helbest, sala 2010z hatiye çapkirin.

4-Dîwana Fîxan, helbest, sala 2016z hatiye çapkirin.

Berhemên wî yên destnivîs bi Zimanê Kurdî:

1-Dîwana Kêşe -helbest.

2-Girnijîn.

3-Qewxe.

4-Rewrewk.

5-Berevok bi navê "Bîranînên Zarotiyê", ji bo piçûkan.

Bi tevayî 15 dîwan -helbest -bo zarokan.

**Wî pir şano nivîsîne, hin hatine pêşandan û hin jî hîn mane:**

1-Bûka Welat, ji beşekî ye, hatiye pêşandan, sala 1988z û sala 1989

2-Mirin Yan Jiyar, yek beşekî ye, hatiye pêşandan, sala 1991z.

3-Azad û Gulistan, yek beşekî ye, hatiye pêşandan, sala 1986 z.

4-Helebça Birîndar, yek beşekî ye, hatiye pêşandan, sala 1994z

5-Mişko, ji du beşan e, hatiye pêşandan, sala 1993z, ji bo piçûkan.

6-Barê Giran, ji du beşan e.

7-Welat û Kurdistan, ji beşekî ye.

8-Kum Soro, ji sê beşan e, ji bo piçûkan.

9-Xemê, ji beşekî ye, ji bo piçûkan.

10-Girgirok, ji beşekî ye, ji bo piçûkan.

11-Çûçik, ji beşekî ye, ji bo piçûkan.

12-Dayik, ji beşekî ye,ji bo piçûkan.

13-Dînbûn Ji Dînbûnê, ji sê beşan e.

Hîn bêtir şano hene, berhemek jî sînariyo bi navê: “Serhildan”, ji 19 nozdeh xelekên diramî ye. Berhemek jî sînariyoya filimekî sînemayî ye û kin e, bi navê: Azad û Newroz Heye.

Berhemên wî bi zimanê Erebi jî hene, ji yên Kurdî ne kêmtir in; tenê me xwest em ên Kurdî bidin nasîn. Wî nêzîkî 12 salan, di komîta amadekar a Mehrecana helbesta Kurdî li Kurdistana Rojava - Qamişlo de, kar kir. Ji ber gelek sedeman û ji nerazîbûna wî ji karûbarê komîtê, wî xwe jê vekişand, û bi rûmetî li mala xwe rûnişt.

Di gelek rojname û kovarên Kurdî de nivîsandiye, wek: Gelawêj, Xunav, Sitêr, Zanîn, Gulistan, Jîn, Hevind, Rastî, Nivîskar, Pênûsa Azad, Welat, Roj, Newroz.





## Diljan Cûdî

Diljan Cûdî yê ku bi navê Yusef Hacî Sêvo tê naskirin, ji gundê Girê Şêra (Til Xenzîrê Banî) yê girêdayî herêma Dêrika Hemko ya Rojavayê Kurdistanê ye. Li gundê Girê Şêra, di sala 1968an de, jidayîk bûye. Navê bavê wî Hacî Sêvo ye, û navê dayîka wî Sînem e. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Girê Şêra, û xwendina amadeyî û navîn li bajarê Dêrika Hemko, li dibistana Yûsif El-Azmê qedandiye; pişt re li zanîngeha Helebê xwendina xwe ya bilind beşê hişbirin û lîngwîstîkê li peymangeha tenduristiyê dawî kiriye. Ewî du salan di pileya yekemîn de, li ser asta Sûriya bawernameya xwe wergirtiye. Lê mixabin, piştî derçûna wî rêjîma Sûriya ji ber kar û xebatên wî yê neteweyî di nav xwendekaran de, ji hemû kar û erkên tenduristiyê ew mehrûm kiriye, herweha ji ber fikir, raman û nivîsên xwe, çend caran ji hêla istixbaratên rêjîma Sûriyayê ve hate girtin û binçavkirin û zindanî bûye.

Diljan Cûdî hîn di piçûkatiya xwe de hijêkarê stran, çand û hunera Kurdî bû. Di sala 1986an de, dest bi nivîsandina helbesta Kurdî kiriye. Hemû cureyên helbesta Kurdî ya kîlasîkî nivîsandine. Ji kela dilê xwe û bi hest û rewanê xwe yê neteweyî, bi sedan helbestên niştimanî, welatperwerî û evînî rêsanê û vehûnandine. Herweha bi dehan helbestên wî di kovar û rojnameyên Kurdî de hatine weşandin.

Li kêleka helbesta Kurdî ya kîlasîkî, ewî helbesta nûjen, kurteçîrok ,skêtş, kurteşano, bîranîn û gotarên civakî û wêjeyî nivîsandine; gelekî li ser ziman, wêje, çand û kelepûra Kurdî vekolaye. Wek rewşenbîr û nivîskarekî, di dema destpêka Buhara Gelan û şoreşa Rojava de, di nivîsandina rêzîkname û tûzikên sazî, dezgeh, komîn û meclisan de, roleke mezin lehîstiyê.

Diljan Cûdî 26 sal ji buhara emrê xwe di nav girûp û komên çand û hunera Kurdî de, li Rojavayê Kurdistanê, borandiye; yek ji damezirînerên koma Cûdî, koma Wanê û Hunergeha Rojava ye. Di gelek sazî, komele û girûpên çandî û rewşenbîrî de, di asta rêveberiyê de, û wek endamekî çalak cîgirtiyê, mîna (koma Cûdî, koma Wanê, Yaneya Şîlan, girûpa Torevanan ya herêma Dêrikê, Tevina Çand û Huner, komîta rêveber û şopandina cejnên Newrozê li ser asta herêma Cizîrê, û girûpa Torevan û nivîskarên herêma Dêrikê); herweha di gelek festîval, şahî, bîranîn, newroz û cejnan de, pêşkêşvanî kiriye.

Di yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê wek endam cîgirtiyê, û tevî gelek şevbuhêrkên helbestê û çalakiyên wêjeyî û hunerî bûye. Bi sedan helbestên wî bi destên awazvanên qedirbuha Bavê Hêco , Ciwan Sebrî, û bi destê wî bi xwe, bûne stran. Komên hunerî û kultûrî yên herêmên Rojava bi dehan helbestên wî di newroz, kasêt û şahiyên de strandine, wek Koma (Cûdî - koma Agirî "Heleb" - koma Engîzek Efrîn - koma Botan Kobanê). Herweha, gelek hunermendên navdar bi dehan helbestên wî di kasêtên xwe de tomar kirine, mîna: (Cemal Sadûn - Dilo Doxan - Bavê Hêco - Azad Cizîrî - Hejal Elanê - Ciwan Sebrî - Hesen Dêrikî - Bengîn Neso - Şîlan Dêrik û gelek hunermendên din).

Ji berhemên wî yên wêjeyî û hunerî - Sê dîwan ji helbestên Kurdî li ber çapê ne.

1- Evîna Welat : 50 helbestên kilasîk.

2- Sîval : 40 helbestên kilasîk û nûjen.


3- Qend û Pend: Çend helbestên çîrokî.

- Kasêtek ji stranên filklorî û kevneşopî bi dengê wî.

- Veguestina Dîwana Helbestê ya Melayê Cezîrî ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî yên Kurdî.

-Ji helbestên wî yên ku bûne stran û girûpên hunermendên Cizîrê strandine:

- Ey Rojava - Dêrik bûka bajara. - Ey şehîd - Şehîd Xebat. Ji senaryoyên şanoyê yên wî yên navdar - Pez û Çeqel (koma Agirî) Eşqa mezin "Sîpan " koma Cûdî.



## Dilovan Çeto

Dilovan Çeto, navê wî yê resen Abdulrehman Çeto ye. Di sala 1970yî de, li gundê Tilzîwan ku li rojhilatî bajarê Qamişlo derdora 10 K.M dikeve, jidayik bûye.

Xwendina xwe ya seretayî li dibistana gund qedandiye, paşê çûye bajarê Qamişlo û li dibistanên Hitîn û Ereban, herdu qonaxên navîn û amadeyî twaw kirine. Pişt re, di sala 1992yan de, bekeloriya ji amojgeha navîn ya pizîşkiya ajalan, derçûye. Di qonaxa seretayî de, xwe fêrî alfabeya Kurdî kir, û di demeke kin de fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê - Kurdî tîpên Latînî bû.

Di zaroktiya wî de, heskirina folklor kete dilê wî. Ji civatên kal û pîran hesdikir, loma çî çîrok, serpêhatî, pend û mamikên Kurdî, stiran, lîstok û hertiştê girêdayî civakê, ji xwe re dida hev û dinivisand. Ji vê yekê, heskirina wî ji nivîsandina çîrokê re hat, û di sala 2004an de, dest bi nivîsandina çîrokên folklorî û yên danehevê kir, paşê dest bi nivîsandina çîrokan bi giştî kir.

Berî kirîza Sûriyê û pişt re jî, di riya korsên zimên re gelek xort û keç fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî kirin.

2 berhemên wî yên çîrokan hene:

- yek bi navê " Mêweyên Şevên Zivistanê" – danehev-

- yek jî bi navê "Xewnên Şkestî
- lêkolînek li ser dawetên Kurdan, li herêma sinceqa aşîtiya, di navbera salên 1940 – 1990î de.

Herweha, hijmarek ji pend, mamik, stran, Lîstokên biçûkan û mezinan, dengê xuristê û hin tiştên din girêdayî bi folklorê Kurdî ve, dane hev. Di gelek rojname û kovarên Kurdî û hin malperan de nivîsandiye.

Di hezîrana sala 2014an de, di yekemîn mihrîcana çîroka Kurdî li bajarê Qamişlo de, beşdar bû, herweha di mihrîcana çaremîn û pêncemîn û heftemîn de jî beşdar bû.

Di sala 2015an de, bi destpêka weşana kenala Kurdistan 24 de, bû peyamnêrê kenalê li bajarê Qamişlo. Li gel hin dezgehên ragihandinê din jî kar kiriye.

Yek ji damezirênerên Yekîtiya Nivîskarên Kurd Li Sûriyê ye, ku di sala 2014an de yekemîn kongirê xwe li bajarê Qamişlo lidar xist. Lê, piştî parçebûna yekîtiyê û 2 yekîti çêbûn, xwe ji yekîtiyê vekişand. Niha karê rojnamegeriyê dike, herweha bi karê nivîsandinê jî mijûle. Hêjayî gotinê ye ku berhemên wî ta vê dîrokê, tev reşnivîsin û neçapkirî ne.



## Dilovanê Deştê

Gurgîn kurê Mihemedê Bîrhê, ji malbata Îsa kurê Eyûb ê Berazî, di Buhara sala 1958ê de, li gundê (Tilxatûnkê) jidayîk bûye. Gundê wî li herêma Ceriha Cizîra Rojava, û li Bakûrê bajarokê (Tirbepî) derdora / 9 / km, cih digire. Di sala xwendewariyê 1965/1966ê de, Gurgîn li gundê Tilxatûnkê dest bi xwendina xwe ya seretayî kiriye, û ta bi pola 5ê li wir xwendiyê. Ji pola 6ê ta ya 12ê (Bekaloriya) li bajarokê Tirbepî bi dawî kirine; ango, herdu bawernameyên xwe yê pola 9ê (Brovê) û ya pola 12ê (Bekaloriya) ji dibîstanên bajarokê Tirbepî wergirtine. Xwendina xwe ya piştî bekaloriya li zankoya bajarê Heleb bi dawî kiriye. Bawernameya xwe di beşê wêjeya Îngilîzî de, ji kolêja Wêje û Zanistên Merovahiyê ji vê zankoyê wergirtiye.

Di pola 4em de, Gurgîn li ber destê bavê xwe fêrî xwendin û nivîsandina abeya zimanê Kurdî, li gor Alfabeya nemir Osman Sebrî, bûye. Sal bi sal, wî xwe di xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî de pêş xistiye. Wî xwe bi xwe fêrî rêzimana zimanê Kurdî kiriye; û bi nasnavê Dilovanê Deştê wî dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye.

Ji sala 2009ê ve û ta îro roj, yek ji endamên Rêveberiya Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê (S. F. P. Z. K. S) ye. Hêjayî destnîşankirinê ye ku (S. F. P. Z. K. S) saziyeke zimanwerî ye ku, di Nîsana sala 2006ê de, hate

damezirandin. Ew ji sê şaxan (Efrîn, Kobanî û Cizîrê) ava dibû; lê, piştî sala 2011ê, Şaxên wê li Kurdistanê û Ewropayê jî hatin damezirandin; ta îro roj jî, Dilovan di kar û xebata xwe de wisa berdewam e.

Dilovanê Deştê, di sala 2014ê de, ango ji kongireya diwemîn ve, bûye endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd \_ Sûriya (Y.N.K.S). Di sala 2016ê de, bûye endamê Desteya Rêvebir ya Y.N.K.S, û ta kongireya 4emîn ya awarte, û ta îro roj jî, ew di endametiya Y.N.K.S de berdewm dike. Di herdu mehrecanên kurteçîroka Kurdî (4+5), û di mehrecana Apo Osman Sebrî ya Duyemîn de, Dilovan yek ji endamên komîta nixandina berhemên bi zimanê Kurdî, bû.

sê rêzname wergirtine: Yek di Nîsana sala 2014ê de, ji aliyê Rêxistina Tirbespiyê ya P.Y.D.K.S (Y) ve, yek jî di Sibata sala 2016ê de, ji aliyê Y.N.K.S ve, û ya sisîyê jî di Havîna sala 2022iwê de, ji hêla Y.N.K.S ve.

Dilovanê Deştê di hin kovar û weşanên Kurdî de nivîsiye, weke: Kovarên NÎVÎSKAR, Pirs, welat; û weşanên Bûyer, Newroz, ... Lê, hin gotarên bi zimanê Erebî jî di weşan û malperên eliktronî de belav kirine, hem jî ew di pirtûkekê de jî weşandine.

### **Berhemên çapkirî:**

- BÎNGEHA FÊRKÎRÎNA RÊZÎMANA ZÎMANÊ KURDÎ – QONAXA 1EM  
Çapa taybet di sala 2013ê de, ji aliyê Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Cizîrê ve, hate weşandin. Çapa yekem: Qamişlo 2017z, Weşanxaneya Şilêr, û bi alîkariya Yekîtiya Nivîskarên Kurd\_Sûriya (Y.N.K.S), hate weşandin.
- ZÎMAN JÎYAN Û HEBÛN E  
Çapa taybet bi alîkariya Y.N.K.S: Qamişlo, 2017z.
- ROLA HEVKARÎYÊ DÎ YEKÎTÎYA MÎLETAN DE  
Çapa taybet: Qamişlo, 2017z
- RÊZÎMANA KURDÎ (TÎYORÎ Û PRATÎK), Daner: Bavê Nazê, veguhestina tîpan ji abeya Erebî bo ya Latînî: Dilovanê Deştê.  
Çapa taybet: Qamişlo, 2017z

- آراء ومواقف – مقالات
- ماضي وحاضر نشر الكتب باللغة الكردية في تركيا وسوريا - ترجمة من اللغة الانكليزية

- RABURDÛ Û NIHOYA WEŞANDÎNA PÎRTÛKÊN BI ZÎMANÊ KURDÎ LI TIRKÎ Û SÛRIYÊ

Nivîskar: Malmîsanij

Wergerandin ji Îngilîzî: Dilovanê Deştê

Çapa taybet: Qamişlo, 2017z. Çapa yekem: 2021z, ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê ve.

**Yên neçapkirî jî ev in:**

- BÎNGEHA FÊRKÎRÎNA RÊZÎMANA ZÎMANÊ KURDÎ – QONAXA 2YEM (Hevoksazî di Kurdiya Kurmancî de)

- NETEWEPERWERIYA NÎJADÎ YA KURDÎ HEMBERÎ DEWLETBÛNA NETEWEYÎ. Wergerandin ji Îngilîzî: Dilovanê Deştê.



## **Dilşad Murad**

Di 25ê gulana sala 1984an de, li gundê Girê Şêra, yê girêdayî herêma Dêrikê, jidayîk bûye. Fakulteya Aborî li Zanîngeha Şamê xwendiyê.

Di sala 2007an de, komeleyeke Kurdî (Komeleya Rojda ya Çanda Kurdî) ya girêdayî xwendevanan li Zanîngeha Şamê ava kir, ji ber vê yekê gelek caran navbera salên 2007-2008an, ji aliyê rêjîma Sûrî ve hat binçavkirin.

Di navbera salên 2008-2009an de, lêkolîneke berfireh li ser rêxistinên siyasî, civakî û çandî yên Kurdî li Sûriyê, belav kir.

Di destpêka aloziya Sûrî sala 2011an de, rojnameya elektronî ya bi navê “Azadî” damezirand û birêve bir, jê 40 jimar derketin û heya sala 2018an dewam kir.

Di sala 2012an de, beşdarî damezirandina rojnameya wêjeyî ya elektronî (Pênûsa nû) bû.

Di navbera salên 2013-2018an de, weke serokedîtor û rêveberê beşa Erebi di “Rojnameya Ronahî” de bû.

Bi avakirina Rêveberiya Xweser ya li Rojavayê Kurdistanê re, bû endamek Meclisa Zagonsaz a Herêma Cizîrê, û bû rêveberê Komîteya Çandî di meclisê de. Di sala 2016an de, devjji erkê xwe berda.

Di hevîna sala 2018an de, tevî desteya edîtoriyê ya “Kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk” bû, û li ser amadekariya hejmara 40î sekinî.



Di îlona sala 2018an de, tevî çend rewşenbîrên din, kovara wêjeyî “Şermola” damezirand û heya niha ew kovarê weke serokedîtor û rêveberê giştî bi rê ve dibe.

Di sala 2019an de, pirtûka “أيدولوجيا الإبادة العرقية في الشرق الأوسط” “Di Rojhilata Navîn de, Îdeolojiya Qirkirina Etnîkî”, ku bi zimanê Erebî ye, bi riya weşanxaneyê Şilêr hat weşandin, pirtûk li Misrê jî ji aliyê weşanxaneyê Nefertîtî, hat çapkirin. Ev pirtûk di sala 2021ê de, bi zimanê Kurdî hatiye wergerandin, û ji aliyê weşanxaneyê Şilêr ve hatiye çapkirin.

Tevî karê rojnamevanî û berhemên wî, her wiha gotarên siyasî û çandî bi zimanê Erebî di rojname û malperên hundir û derveyî welat de jî, dinivîse, û niha koşenivîsek wî ya heftane bi navê “Axaftina Ser Çandê” di “Rojnameya Ronahî” de heye.



## Diya Ciwan

Di rojek ji rojên Hezêrana sala 1953 de jidayik bûye, di malbateke rewşenbîr û neteweyî de hatiye perwerdekirin. Diya Ciwan dibêje: "Min hingê nivîsî, roja ku min başî û xirabî, sitembarî û berxwedan ji hev cudakir. Roja ku devê min tama talî û şêrnahiyê ji hev cudakir, ew roj bû destpêka nivîsandinê; min di hindirê xwe de, bi evîneke mezin dinvîsî, lê bi bûyerekî biçûk, bi wateyeke kûr, hew min dît ku nivîs xwe ji sînga min davêje ser rûpelan, ew dem jî di sala 1977 de bû. Wesan bû destpêka nivîsandinê".

Diya Ciwan jineke Kurd e, bawer e bi mafê Kurd yê rewa û peyama dayikê, ew bi xwe dibêje: "Dayikbûn peyama min e pêşî ye di jiyane de". Ew bi xwe jî dayika şeş zarokan e. Di sala 1975an de, li şamê, taxa Kurda bicî bibû. Vê dawiyê berê xwe daye herêma Kurdistanê Îraqê û li wir bicih bûye. Piraniya rojname û kovarên Kurdî li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê nivîsên wê weşandine.

Hêjayî gotinê ye ku Diya Ciwan endam e di komîta parastina mafê jinan li Sûriyê de, endam e di komîta mîhrecana helbesta Kurdî li Sûriyê û di komîta Xelata Osman Sebrî jî, ew endam e.

### **Xelatên ku wê wergirtine:**

- Rêzlênan ji aliyê partiya Çepê Kurdî li Sûriyê 1993.
- Xelatek zêrîn ji wezaretê rewşenbîriya Kurdistanê li Îraqê 1998.
- Bawername ji festivala helbesta Kurdî li Sûriyê, 1999.

- Xelata festîvala Melayê Cizîrî, ji aliyê wezareta rewşenbîrî li hermêma Kurdistanê, 2000.
- Xelat û bawername ji festîvala rewşenbîrî ya Tûnisê, ji hêla wezareta rewşenbrî li Tûnis, 2001.
- Xelata sedsaliya nemir Barzanî li herêma Kurdistanê, 2003.
- Rêzlênan ji kolîja Wêjeyê li Duhokê, 2005.
- Xelata festîvala Bedirxaniya ya rojnamegeriya Kurdî li herêma Kurdistanê û bawername, 2005 û 2006.
- Xelata zêrîn ji wezareta rewşenbîrî li Kurdistnaê ku mezintirîn xelat e, 2007.
- Bawername û rêzlênan ji dezgehê Mîdiya yê rojnamevanî, 2007
- Xelata festîvala helbesta Kurdî li Akrê, 2008

#### **Berhemên wê ev in:**

- Pêlek ji deryanên kovanê min - helbest-1992.
- Bazbend – çîrok.
- Hêsrên ziwa- helbest.
- Çîrokên Kurda, beşên 1 û 2.
- Bênder, helbest – 2007, Duhok
- Gotinên pêşiya - 2007. Duhok



## **Diyaa Receb**

Dr. Diyaa navê wî Diya'eddîn e, Kurê Mele Ebdilcebar Receb e; bavê wî bi xwe ji herêma Wanê ye. Diya wî, Hemdiye Qasim, ji herêma Cizîra Botan e.

Di sala 1962yan de, li gundê Cirnika Mezin (bakur-rojhilatê Qamişlo) jidayik bû. Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û lîseyê, li dibistanên Qamişlo biserî kir. Di sala 1988an de, li Zanîngeha Helebê ya bijîşkiyê bawernameya xwe wergirt. Di sala 1988an de, jin anî. Hevjîna wî Reqiyye Mele Mustefayê Heskîfî ye. Kurek û du keçên wî jê hene: Salar, Stêr û Sîber.

Di sala 1989 - 1991ê de, diçe leşkeriya neçar ya Sûrî, bi payeya Efser.

Di sala 1991ê de, dîdengeha xwe ya bijîşkî, li Qamişloyê vekir. Li bajarê Qamişloyê dimîne.

### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

1- FERHENG A BIJÎŞKÎ YA KURDÎ.

(Inglîzî - Erebî - Kurdî) û (Erebî - Inglîzî - Kurdî)

2- PEYVÊN KURDÎ YÊN EREBÎKIRÎ.

3- ZARAVESAZÎ DÎ ZÎMANÊ KURDÎ DE.

4- AR DÎ ZÎMANÊ KURDÎ DE.

5- ZARAVEYÊN BÎRKARIYÊ BÎ KURDÎ.

(Inglîzî - Erebî - Kurdî) û (Erebî - Inglîzî - Kurdî)

6-PEYVÊN HAWBEŞ NÊWAN ZÎMANÊ SOMERÎ Û KURDÎ.

**Berhemên wî yên neçapkirî:** 1- Ramaknasî (Etymology) di kurdî de.

2- Kiriknasî (Pronunciation) di kurdî de 3- Alfabeyên kurdî seranserî dîrokê



## **Ebas Mûsa**


Nivîskar, rojnameger û çalakvanê çandî, bi Kurdî û Erebi dinivîse. Di navbera zimanên Erebi, Kurdî û Farsi de, wergerê dike. Kurteçîrok, bexşan, lêkolîn û nivîsarên girêdayî wêjeyê dinivîse. Herwiha, lêkolîn û vekolînên civakî û çandî dinivîse. Di warê ragihandinê de, wekî peyamhinêr û edîtor xebitiye. Gelek rapor, lêpîrsîn û nivîsarên wî hatine weşandin.

Ebas Mûsa di sala 1983yan de, li gundê Sogiya, girêdayî bajarokê Tirbespiyê yê Rojavayê Kurdistanê, jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gund qedand, paşê heşt salan xwendina şerî'etê kir, û dawiyê xwendina xwe ya zanîngê di beşê wêjeya Erebi de, li zanîngeha Tîşrînê ya Sûriyayê qedand.

### **Berhmên wî yên çapkirî:**

- Şampûana Bi Bêhna Sêvan (bi zimanê Erebi), kurteçîrok, Saziya Çarçira ya Çandê, Qamişlo, 2016.
- Jineke Laşqot (wergera heman pirtûka jorîn e lê li jêr serenavekî din), kurteçîrok, Weşanxaneya Lîsê, Amed, 2016.
- Elqenas (Nîşanbaz), (bi zimanê Erebi), bexşan, weşanên Temûz dîmozî, Şam, 2018.
- Taxa Ermenan (bi zimanê Erebi), werger, kurteçîrok, weşanên Neqş û weşanxaneya Şilêr, Qamişlo, 2021.

Di sala 2022yan de, malpera xwe bi zimanê Kurdî û Erebi weşand.



## **Ebdelah Şêxo**

Ebdelah Şêxo ji xelkê bajarê Qamişlo, Rojavayê Kurdistanê ye.

Dîroka jidayîkbûnê: 1988. Xwendin: Beşê Mafnasiyê ji Zanîngeha Şamê.

### **Karên berê:**

- \* Edîtorê weşanxaneya Lîsê, Amed (2013-2014)
- \* Wergêrê Navenda Civaka Şarwer û Demokrasiyê ya Sûriyayê (CCSD) (2014)
- \* Wergêrê radyoya ARTAyê, Amûdê (2015-2016)
- \* Sernivîskarê beşê Kurdî yê kovara Sormey, Qamişlo (2015-2017)
- \* Damezirînerêkî weşanxaneya HINARd, Qamişlo (2017)

### **Karên ku niha berdewam in:**

- \* Gerîndeyê weşanxaneya NEQŞÊ, Qamişlo (ji 2019an heta niha)
- \* Edîtor û serastkerê ajansa North Press, Qamişlo (ji 2020an heta niha)

### **Berhem:**

- \* Amadekirin û wergerandina lêkolîn û lêgerînan ji bo navend û saziyên mîna Saziya Çarçira ya Çandê, kovara Sorme û Navenda Civaka Şarwer û Demokrasiyê ya Sûriyayê (CCSD).

\* Wergerandina neh berhemên (pirtûkên) wêjeyî, hizirî û siyasî.

\* Nivîsandin û wergerandina bi dehan nivîsar û lêkolînan bo kovar û malperên çandî yên Kurdî û Erebî.

### **Berhemên çapkirî:**

\* Boxeyê Birîvayê, pexşan, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2016

### **Wergerên çapkirî:**

- Şikeftên Haydrahodahosê, roman, Selîm Berekat, çapa yekê: weşanxaneya Lîsê, Amed, 2013; çapa didiwê: Projeya Hinarê ya Çandî, Qamişlo, 2017

- Miriyên Sade, roman, Selîm Berekat, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2014

- Her Du Jiyanname, jiyanname, Selîm Berekat, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2014

- Cihûyê Xweşkok, roman, Elî El-Muqrî, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2014

- Jineke Laşqot, kurteçîrok, Ebas Mûsa, Weşanxaneya Lîsê, Amed, 2016

- Hin Pirsyar Der Barê Demokrasiyê De “Sûriye Wekî Mînak”, lêkolîn, Şiyar Îsa, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2016

- Nêrgiz, Selîm Berekat, çîroka zarokan, 2016, Projeya Hinarê ya Çandî, Qamişlo

- Diwahemîn Hinarî Dunya (العامل اناترم آخر), Bextyar Elî, roman, ligel Ibrahîm Xelîl, wergera ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebî

Ziman:

- Kurdî: Pir baş e

- Erebî: Pir baş e

- Îngilîzî: Baş e



## **Ebdil'ezîz Ferman (Can Salar) (1944-2018)**

Ebdil'ezîz Ferman, an "Can Salar", di sala 1944an de, li gundê Çaxir Bazar, yê girêdayî bajarokê Amûdê, jidayik bû. Piştî xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û lîseyê biserî kir, ji bo xwendinê berê xwe da Yekîtiya Sovyet û li wir bawernameya bijîşkiya nexweşiyên jinan wergirt.

Di sala 1965an de, dest bi nivîsandina helbestê kir. Du dîwanên wî hene.

Di sala 1978an de, li welatê Siwêd, bajarê Uppsala, bi alîkariya komela Xwendekaranên Kurd li Ewropa, dîwana pêşî ya Can Salar di bin navnîşana "Dûriya Welêt" de, hate weşandin.

Ev dîwan bi xameya Dr. Nûredîn Zaza hatiye pêşkêşkirin. Dr. Zaza di pêşgotinê de dibêje: "Salar yek ji van xortan e, ku tevî xwendina xwe ya bijîşkiyê û têkoşîna xwe ya siyasî bi kurmancî nivîsandin ji xwe re kire armanc". Wilo jî mamoste Reşo Zîlanî bi nivîsandina xwe "Çend Gotin" vê dîwanê dide nasîn û dinirxîne û dibêje: "Dîwana Can Salar, ji berê welatparêzî neqş û nîgarkirina şoreşa Kurdistanê Başûr re pir giring e." Û berdewam dike. "Can Salar bi xwe .... wek xortekî jîr û dilsoz, wî hem xwendina xwe pêkaniye û hem jî wek welatparêzekî xwe bi doza rizgarî û gerdengaziya gelê xwe ve mijûlandiye..".



Belê piştî bîst salan ji derçûna dîwana pêşî, helbestvan dîwaneke din dide çapê, lê salên 1998 - 1999 naveroka vê dîwana nû berqef dikan. Dimîne, mirov xwe têxe wê behweriyê, ku hozanê me Can Salar di van bîst salan de, bi karê xwe yê bijîşkiyê daketibû û vî karî valayî bo nivîsînê jê re nehiştibû.

Lê, ne veşartî ye, ku hozanê me dil bi kul û perşikestî, piştî têkçûna şoreşa Barzaniyê nemir, sala 1975, li welêt vedigere û hesteyên "Dûriya welêt" bi evîneke veşartî dipêçe. Dîwana duyem bi navê "Evîn li welêt", di sala 1999an de, belav kir. Pêşgotina wê bi xameya mamoste Rezo Osê hatiye nivîsandin.

Di 02/06/2018an de, mir û li gundê wî Çaxir Bazar hat veşartin.



## **Ebdilhelîm Ehmedlawî**


Ebdilhelîm kurê Ehmedê Mele Silêman ê Zivingî ye, yê naskirî bi Ehmedlawî.

Di sala 1963yan de, li gundê Kehniya Nebî ji malbata xwe ya rêncber re hatiye dinyayê, li wir çûye dibistana seretayî. Sala 1977 malbata wî li Girkê legê cîwar bû. Li Rimêlan dibistana amadeyî xwend û bakalorya çaksazî li Hisiça, paşê peymangeh li Dêra Zorê 1985, biserî kir. Ji ber bênasnamiyê û siyaseta şofen a rêjîma Ba'is, li yek cihî wek karmend qebûl nekirin.

Di nav mercên zehmet de jiya, û ji piçûkaniya xwe de kete nava siyasetê de. Di dema xwendinê de, li dora 200 metelokên Kurdî û gotinên pêşyan dane hev, û heza wî çû ser nivîsandina helbesta Kurdî û dest pê kir. Ji salên 2007 – 2011an de, endamê Komîta Amadekar a Mehrecana Helbesta Kurdî bû.

Di sala 2013an de, pirtûka xwe ya lêkolînê ku li ser Girkê legê weşand, her li Girkê legê bûye serokê şaxê Yekîtiya Nivîskarên Kurd \_ Sûriya.

Di 11/10/2006ê de, çar kesan li Girkê Legê Dîdargeha Girkê Legê ya Rewşenbîrî damezirandin. Gelek şevbuhêrk û çalakî lidar dixistin. Armanca wî ya sereke yekrêziya milletê wî û parastina ziman, wêje û çanda Kurdî ye.



## Ebdilhelîm Elî

Navê wî Ebdilhelîmê Ebdê Elî ye, navê diya wî Şêrînê ye. Di cîhana wêje û rewşenbîriyê de, bi navê Cindiyê Metîn - Bavê Metîn tê naskirin.

Di sala 1961ê de, ji dê û bavekî xizan, li tara Ezîziyê, li parêzgeha Heskê, hatiye dunyayê. Li gundê Refref - bi ser çiyayê Homanê (Kizwana) ve ye (qonaxa 10 k.m an, li bakurî parêzgehê) ye, di zaroktiya xwe de, wek pîr zarokên Kurd, bi xizanî û belengazî jiyaye.

\* Di sala 1974an de, xwendina xwe ya seretayî, li dibistana gundê Refref bidawî kir.

\* Di sala 1978an de, xwendina xwe ya amadeyî, li dibistanên [El-Sewra, li tara Xiwêran, û li ya Ebî-Temam, li bajêr], bidawî kir.

\* Xwendina lîseyê, li dibistana Ebî-Zer El-Xefarî, li Heskê xwend; lê, ji ber zorkirina xizaniyê, xwendina xwe, bi dawî nekir.

Di sala 1977an de, dest bi helbestan kir, helbesta yekemîn bi zimanê Erebi nivîsand. Lê hestên wî, yê neteweyî û welatparêzî hiştin, ku ew ji helbesta Erebi dûr keve. Helbesta wî, ya bi navê "Dil diza min", ya yekemîn bû ku saz bû, û hat stiran.

Di sala 1982yan de, bi helbestê re, dest bi nivîsandina çîrok û çîvanokên Kurdî kir.

Di sala 1998an de, bi hinek welatparêzan re, koma Sefqan ya torevanî, damezirand; lê, mixabin ji bo hin pîrsgirêkin konevanî, nikarîbû berdewam kiribaya.

Di sala 2001ê de, carek din, bi hinek welatparêzan re, koma Ehmedê Xanî, ya zarê Kurdî, damezirand, mebest jê fêrbûn, û afirandina mamosteyên zarê Kurdî bû.

Di sala 2002yan de, yekem car, pirtûka "Xwendin" bi navê "K.E.X" bi çapa destan amade kir, ji bo fêrbûna kesê ku bi yekcarî xwendin û nivîsandina Kurdî nizanin; lê carek din mixabin, helemercên aborî û konevanî li himber rawestiyan û qedexe bû.

Di sala 2012an de, cara yekemîn, kurteşanoya "Zarê me nasnama me ye" nivîsand, û li ser textê şano, di cejna Newroza sala 2012an de, hat pêşkêşkirin. Pişt re, pir şanoyên dirêj û kurteşano nivîsandin.

Di sala 2014an de, ew bi awayekî fermî, tevî saziya "Nûrî Dêrsimî ya Ramanê" bû.

Di sala 2015an de, ew tev li Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê, Şaxê Heskê bû.

### **Berhemên wî:**

4 dîwanên helbestên klasîk, 2 dîwanên helbestên Kurdî yên nûjen û 2 dîwanên helbestên Erebi nûjen.

16 şanoyên dirêj, û bêtirî 40 kurteşano, Zengilo û Çingilo, Tehlê û Tehlo, û Cengo û Bengo, hene.

Pirtûkên xwendinê: Jîrwerî: beşê 1ê, Kezêba Min, Rewîşt, Ma Kenê Te bi Çi Tê, Rêzara Kurdî û çand û geletora Kurdî, hene.

Waneyek bi navê, Kawa Ne Hesinkar E, û wî hin name ji Kongirê neteweyî û rewşenbîrên Kurd re, rêkirine.

Ta niha du dîwanên wî yên helbestî hatine çapkirin, yek bi navê Nazenîn1, di sala 2017an de, ji weşanên Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê, ya din bi navê Nazenîn2, 2023 .



## **Ebdilmecît Şêxo**

### **Dr. Phil. Ebdilmecît Şêxo**

- Ebdilmecît Şêxo di 15. 09. 1951ê de, li Efrînê jidayik bûye.
- Ewî xwendina xwe ji pola yekê ta diwanzdan li Efrînê qedandiye.
- Di sala 1969 de, dibe endamê (Partî Dêmkokrata Kurdî) li Sûriyê.
- Di Havîna sala 1972yan de, nûnertiya xwendekarên Efrînê di kongira yekê ya (Partî Dêmkokrata Kurd) de – li Sûriyê, li Kurdistanê Îraqê dike.
- Di sala 1973yan de, ji Bêrûtê ji bo xwendinê diçe Berlîna Rojava.
- Di sala 1974an de, dibe endamê (Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa).
- Li Berlîna Rojava du salan di (Akadêmiya Zimanên Biyanî), beşa Zimanê Almanî de, dixwîne û dîploma zimanê Almanî werdigire.
- Di salên 1975 - 1977an de, di nav (Partî Dêmkokrata Kurdistanê Îraqê) de, li Berlîna Rojava dixebite.
- Di salên 1978 - 1988an de, dibe endamê (Komela Xwendekarên Kurdistan li Dervayî Welêt, AkSA, navenda Berlîn).
- Di sala 1978an de, diçe Mosko, û li wir sala amedeyî kuta dike.
- Di sala 1984an de, Macêstir di pîşeya rojnamevaniyê de, ji zanîngeha Lênîngrada berê werdigire.

- Di wê salê de jî, bawername mamostê zimanê Rusî werdigire .
- Di sala (1988)an de bawername Doktoriyê li ser çapemeniya Kurdî werdigire: Rola Dengê Komkar di Tevgera Azadîxwaz A Kurdistanê de ).
- Di sala 1988an de vedigere Efrînê .
- Di salên 1980 - 1988an de, di kovarên Kurdî de, Roja Nû), Berbang, Kulîlk li Siwêdê û Komkara li Almaniya Rojava, gotar û helbestan bi navê Kurdux diweşîne.
- Di salên 1993 - 1994an de, di zanîngeha Selahedîn, li Hewlêrê, di beşa wêjeya Kurdî de, dibe mamostê zimanewaniyê .
- Li Rojavayê Kurdistanê çend salan dibe endamê rêdeksiyona kovara Kurdî Pirs, û ew di wir de, di bin van navên jêrîn de dinivîsîne.
- Pêşrew Berwarî, Şêrko Bedirxan, Sindî, Botanî, Rêber Kurdaxî.
- Di sala 199 ?, li Çiyayê Kurmênc, wek kesayetiyek serbixwe dibe berbijêrê Partiyên Tevgera Azadîxwaza Kurdî li Sûriyê, ji bo encûmena parêzgeha Helebê.
- Xwediyê ramana damezirandina Roja Helbesta Kurdî, di 22. 10, 1993 de, li Rojavayê Kurdistanê, lewra jî ew du caran, li Almaniya û li Efrînê, ji aliyên komîtên rêveberên Roja Helbesta Kurdî ve, hatiye xelatkirin .
- Li Helebê du salan 1994 - 1995 waneyên zimanê Kurdî ji bo amadekirina mamosteyên zimanê Kurdî dide.
- Di salên 1995-1997an de, dibe sernivîserê rojnama (Newrozê) li Rojavayê Kurdistanê.
- Yek ji damezirênerên (Xelata Osman Sebrî), di sala 1999an de, ye.
- Di sala 1999an de, dîsan tev hev jî û du keçên xwe diçin Almaniya.
- Li Almaniya dibe endamê rêdeksiyona kovara (Pênûs), û paşê ew ta hejmara dawiyê dibe sernivîserê wê kovarê li Almaniya.
- Ewî li hin bajarên Almaniya (Berlîn, Osneburg , Bonê û H.W.D) sêminar li ser tevgera azadîxwaza Kurdî li Rojavayê Kurdistanê pêşkêş kirine.

-Li Almaniya dibe endamê ( Partiya Yekîfî Demokrata Kurd li Sûriyê), û dibe endamê komîta rêveber û berpîrsê ragihandina wê Partiyê li Ewropa.

-Ji ber sedemên çavtengiyê û behaneyên ne rewşa, ji aliyê rêveberê rêxistina Ewropa ve, endametiya wî ji aliyê komîta Ewropa salekê tete rawestandî.

-Piştî salekê (Partiya Yekîfî) dîsan wî vedixwîne ser karê partî, lê ew ji ber hin sedemên siyasî venagere nav partiya Yekîfî.

-Dibe yek ji damezirênerên (Tevgera Rastiya Kurdistanê) li Sûriyê.

-Piştî demeke kurt û li gor pêşniyara wî, (Tevgera Rastiya Kurdistanê) tev P.D.K Sûriyê dibe, lê mixabin ji ber hin aloziyên rêxistinî û çavtengiyên hin hevalên wê rêxistinê li Almaniya, ewî di P.D.K de karên rêxistinî nekir.

-Di sala 2009an de, dîsan tev hevjin û çar keçên xwe vedigerin Efrînê û ta niha ew li Efrînê dijî.

-Di salên 2011 - 2013an de, dibe endamê kongira( Encûmena Niştîmanî Kurd) li Sûriyê, û dibe endamê Komîta El-Emanê ya Giştî).

-Di salên 2015 – 2018 de, dibe ragirê fakulta wêjeyî li zanîngeha Efrînê û dibe mamostê zargotin û wêjeya Kurdî.

-Di salên 2016 - 2018 de, li zanîngeha Efrînê dibe mamoste di beşê rojnamevaniyê de .

-Di zanîngeha Xazî Entab, Fakulta Perwerdê de, li Efrînê di salên 2020 - 2023 de, dibe mamostê zimanê Kurdî.

-Niha serpereşiyê zanistî yê sê kursên zimanê Kurdî ji bo hemwelatîyên Efrînê li peymangeha bilind ya hukumeta Sûriyê ne hemdemî, li Ezazê dike.

### **Xelatên wergirtine**

1- Ji ber ku Ebdilmecît Şêxo xwedî ramana lidarxistan (Roja Helbesta Kurdî) li Rojavayê Kurdistanê ye, ewî ji aliyê komîta rêvberê fîstîvala (Roja Helbesta Kurdî) li Almaniya xelatek di sala 2009an de wergirtiye.

2- Ji aliyê (Malpera Tîrêj) ve, ji bo karên rewşenbîrî di sala 2012an de, hatiye xelatkirin .

- 3- Ji aliyê komîta fîstîvala (Roja Helbesta Kurdî) li Efrînê di sala 2014an de, dîsan ji ber ku ew xwediyê ramana destnîşankirina roja helbesta Kurdî bû, hatiye xelatkirin.
- 4- Ji bo fêrkirin û amedekirina mamostên zimanê Kurdî li Efrînê, ji aliyê Partiya Yekitiya Dêmkokrat a Kurd li Sûriyê, di sala 2010an de, têtê xelatkirin

### **Berhemên Ebdilmecît Şêxo**

1-Rola (Dengê Komkar) di tevgera azadîxwaza Kurdistanê de, nama Doktoriyê, Lênîngrada berê, di sala 1988an de, bi ziman Rusî.(Lêkolîn).

2-Bi kurtî dîroka lêgerînên ziman û zaravên Kurdî, Prof. Dr. Qanatê Kurdo bi zimanê Rusî, Sovyetistana berê; werger bi zimanê Erebî, 1991, Şam, Sûriya.

3-Bi kurtî dîroka wêjeya Kurdî ya hevdem , Dr.Merof Xeznedar bi zimanê Rusî, Sovyetistana berê; werger bi zimanê Erebî. 1993.

4-Gurzek ji helbestên Kurdî yên hevdem, bi zimanê Erebî, werger bi zimanê Kurdî, 1995, Heleb, Sûriya.

5-Kovara Çiya 1965 - 1970, awêna çanda Kurdî li Ewropa, bi zimanê Kurdî, di sala 2004an de, li Almaniya (Lêkolîn).

6-Dara Zêtunê dipeyive û çama Efrînê di ber re dişewite. (Serpêhatî). 2020, bi zimanê Kurdî, Efrîn. Sûriya.

7-Mijarên Kurdî (Gotar, lêkolîn, 1984 - 2004) bi zimanê Erebî, 2011, Efrîn, Sûriya.

8- A. Gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê (Dîrok, rêxistin, siyaset). B. Bi gelemperî pêwendiyên Kurdî û Erebî bi zimanê Kurdî , 2012, Efrîn. Sûriya.

9-Gurzek gotar (1980-1988), bi zimanê Kurdî , 2011, Efrîn. Sûriya.

10-Tu bi Xwedêkî medî girî (Helbest), 2012, Efrîn. Sûriya.

11-Lêkolîn û hevpeyvîn , bi zimanê Erebî ,2014, Efrîn. Sûriya.

12-Berhem (Gotarên Kurdî) bi zimanê Kurdî, 2015, Efrîn. Sûriya.



13-Kemal Henan ( Dewletên Ewropî û Kurdistan) bi zimanê Kurdî wergrandin bi zimanê Erebi, 2015. Efrîn . Sûriya.

14-Berhevok (Çîrok) , bi zimanê Kurdî, 2016, Efrîn . Sûriya.

15-Peyv û helwest (gotar û lêkolîn) bi zimanê Kurdî, 2016, Efrîn . Sûriya.

16-(Stranên Kurdî) amedekirin J. Museliyan bi zimanê Kurdî, tîpên Erebi, guhaztin bi tîpên Kurdî Latîni , 2017, Efrîn. Sûriya.

17-Roman (Dengvedana biyanistanê), bi zimanê Kurdî, 2019, Berlîn. Almaniya.

18-Lêkolîn: 1- Cihê Ehmedê Xani di wêjeya Kurdî de 2- (Rola Feqiyê Teyran di wêjeya Kurdî de 3- Rola Mileyê Cizîri di wêjeya Kurdî de. 2020. Berlîn.

19-Lêkolîn, Zargotin û helbestvanên klasîk, bi zimanê Kurdî, 2020. Berlîn.

20-Berhevok, Were!, Helbest, bi zimanê Kurdî, 2021, Berlîn .


21-Waneyên zimanê Kurdî ji bo xwendekarên zanîngeha Xazî Entab li Efrînê, û peymangeha bilind li Ezazê amede bûne. 2022, Efrîn .

22-Roman: Bi Xatirê te Berlîn, Xelekên wê di rojnameya Pênûsa Nû de, di vê demê de têtin weşandin . Zimanê Kurdî .

23-Lêkolînek li ser kovara Jîn û 5 xelek li ser rojnama Roja Nû di Malpera Welatê me û rojnama Pênûsa Nû de belav bûne.

24-Niha li ser kovara (Ronahî) lêkolînan amade dike.

Efrîna birîndar. 26. 02. 2023



## **Ebdilselam Xoce**

Ebdilselam Xoce, di sala 1980yî de, li bajarokê Amûdê hatiya dinê. Xwendina xwe ya seretayî û navîn û amadeyî li Amûdê qedandiye. Bawernameya bakalorya - beşê wêjeyî - bi dest xistiye.

Di sala 2004an de, dest bi nivîsîna helbestê bi zimanê Kurdî kiriye.


Di sala 2013an de, li Radyoya Arta.fm li Amûdê wek Bêjer û pêşkêşvanê nûçeyan kar kiriye, û di Radyoyê de, bernameyeke taybet a wêjeya Kurdî amade û pêşkêş kiriye.

### **Du berhemên wî yên neçapkirî hene:**

1-"çirûskên êşê " bi zimanê Kurdî.

2-مضات ألم- bi zimanê Erebî, herwiha gelek helbestên îraqî, sûdanî û mesrî yên nûjen wergerandine.

Niha li bajarokê Amûdê dimîne.



## **Ebdulselam Nacî (1878-1952)**

Zanayê mezin Ebdulselam kurê Murad ê Cizîrî. Di sala 1878an de, li Cizîra Botanê hatiye dinê. Di dibistanên Cizîrê de fêrî xwendin, û nivîsandinê bûye û bawernameya zanistî li cem Mele Mihemed Beşîr kurê Elî yê Cizîrî, û herwiha li cem Mele Mihemed Se'îdê Cizîrî wergirtiye.

-Piştî wergirtina bawernameya zanistî, li Cizîra Botan bû meleyê Mizgefta Mezin, û herwiha bû mamosta li Dibistana Sor, û gelek zana li ber destên wî bawernameya xwe biserî kirin, weke Mele Abdulrehîm kurê Abdulrehman El-Westayî û Mele Remezhan ku bavê Dr. Mihemed Se'îd Remezhan ê Botî ye.

- Bi zimanê Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî baş dizanîbû.

- Di sala 1933yan de, tevî hevkarê xwe Dr. Ehmed Nafiz, koçî Sûriyê dike. Li Sûriyê, li Eyn Dîwar a bi ser Dêrika Hemko ve, û paşê li Qamişlo niştecih dibe.

- Mirovekî welatparêz û Kurdperwer bû, riça ramana neteweyî, bi taybetî bandora Şêx Abdulrehmanê Garisî pir lê hebû.

- Wî nasnavê Nacî wek navê xwe yê wêjeyî bi kar aniye. Ew endamê Komeleya Xoybûnê bû. Di sala 1952yan de çû ber dilovaniya Xwedê.

### **Ji nav berhemên wî:**

-Ravekirina Dîwana Melayê Cizîrî. Weşanxana Spîrêz, Kurdistan – Duhok.

-Komek ji helbestên bi zimanê Kurdî. (Destnivîs).



## **Ebdulsemed Dawûd (1948-2020)**

EbdulSemed Dawûd, di sala 1948an de, li Girkê Deqoriya, gundekî başûrê Amûdê ye, jidayik bûye.

Di sala 1973yan de, li Zanîngeha Helebê Endezyariya Çandiniyê biserî kiriye; di sala 199ê û şûn de, wek berpîrsê Sendîkayê hatiye hilbijartin.

Gelek gotar û lêkolîn di warên siyasî û çandî de, bi Kurdî û Erebi, dane û gelek gotar jê re di rojnameyên Kurdî û Erebi de hatine weşandin. Carna bi navê xwe yê rast û carna jî bi navê xwe yê nasnav belav dikiir. Li dora 35 salan di rojnameyên Erebi û Kurdî de nivîsiye, û di rêxistinên siyasî yên Kurdî de kar kir, heta ku bû endamê desteya siyasî ya Partiya Yekîti ya Kurdî li Sûriyê, û endamê Encûmena Niştimanî ya Kurdî ya niha. Piştî demeke dirêj, bi nexweşiya şeker û dûv re gurçikê ketibû, di 30ê Çiriya Pêşî 2020an li Almanyayê mir.

### **Berhemên wî ev in:**

- Stêrka geş a Kurdistanê Yilmaz Guney, نجم كردستان اللمع يلماز كوني bi hevalbendiya birêz Hemze Ehmed re 1989.

- Kembera Erebi li Cizîrê - Sûriye, الحزام العربي في الجزيرة, 2003. Û çapa duyem 2015

Lêkolîna mamoste di vê mijarê de weke belgenameyeke bingehîn tê pejirandin.

- Serhildana Kurdî ya duyem, li ser şehîdbûna Dr. Meşûq Xeznewî, 2007.

الانتفاضة الكردية الثانية حول استشهاد الدكتور معشوق الخزنوي

-Destpêka Dawiyê, النهاية بدايات berhevoka çîrokan 2009.

- Deh Xetîr, المشاعر العشرة ji jînenîgarî, 2019. Bi Kurdî

- Melayê Cizîrî, lêkolîn 2019

- Paytexta Xwedê, عاصمة الاله berhevoka helbestan, 2019.

- Gencîneyên Dilovan, خزائن دلوفان, 2019.

- Deh nedîr. Serpêhatî 2019 – bi Erebî jî heye.

- Evîndarê te me, helbest, 2019



## **Ebûdê Mexso**

Ew Ebdilmecîdê Qasim kurê Silêman kurê Hisênê Mexso ye, û bi navê Ebûdê Mexso têye naskirin.

Di sala 1966an de, li gundê Dawidiyê jidayik bûye. Gundê Dawidiyê dikeve devera çaxirbazar, bi ser bajarê Amûdê ve ye, parêzgeha Heseke. Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe û Bîrziravê xwendiyê, û ya navîn li Heseke û Qamişlo xwendiyê. Piştî bekelorya Peymangeha Mamosteyê Pola Taybet ya perwerdekirinê li Qamişlo xwendiyê. Pişt re xeta sor li ber navê wî danîn; ji ber encamê karê siyasî ew ji erkê xwe hate dûrxistin.

Di sala 1981ê de, dest bi nivîsandina helbestê kiriye, ew jî bi tîpên latînî bûn. Ji wê demê de, ew li bajarê Qamişlo dimîne.

Bi boneya bîranîna şeva Newrozê 18.3.1985an de, li bajarê Heseke li taxa Til-Hecer, wek mêvandar beşdarî vê şeva helbestî bû. Li wir wî helbestên xwe şanî mamoste Salihê Heydo û nemir seydayê Tîrêj kirin, herdu mamosteyan destê xwe li pişt wî dan û moralê wî pir bilind kirin. Ev jî ji bo wî cihê şahnaziyê bû. Di gelek kovar, rojname û malperan de nivîsandiyê. Beşdarî gelek şevbihêrkên helbestî û festîvalan bûye.

-Ji sala 2017 heta 2020 wek hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê bû.

-Ew yek ji endamê damezirandina Pêşangeha Şehîd Herekol e.

-Ji sala 2017an heta vê gavê (2022) ew endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê ye.

**Berhemê wî yên çapkirî ev in : ( helbest)**

-Kulîlkên Zozanan - weşanxaneya Mîrav - 2016

-Vîn û Viyan - weşanxaneya Şilêr-2018

-Xemla Welêt - weşanxaneya Şilêr-2020

-Zindana Evînê- weşanxaneya Beyan-2022

**Berhemên li ber destan (Reşnivîs) ev in:**

-Çavkaniyên jiyânê - (helbest )

-Rewşenbîr û şoreşa Rojava - (şîrovekirin)

-Romanek li ser dîroka berxwedana şehîdekî

-Ji Kurdî bo Erebî, (سجن العشق), Wergêr: mamoste Xalis Misewer

**Xelat:**

-Xelata Tevgera Civaka Demokrat, 2016

-Xelata Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê, 2019

-Xelata salane ya Seydayê Tîrêj ya Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, 2022

-Xelata Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, 2022



## Ednan Mustefa

Nivîskar û derhênerê Kurd Ednan Mustefa, di sala 1992yan de, li bajarê Efrînê ji dayîk bûye. Navê bavê wî Ehmed û diya wî Melek e. Ew ji gundê Şêxûtka ya girêdayî navçeya Raco ye.

Xwendina xwe ya destpêkê li dibistanên herêmê kuta kiriye, û di sala 2011an de, li zanîngeha Helebê beşa Mafnasiyê xwendiyê. Herweha, wî di sala 2013an de, dest bi xwendina zimanê Kurdî kiriye û di amûjgeha Viyan Amare de salekê perwerde bûye. Pişt re ew di sala 2015an de, li Zanîngeha Erînê, di fakulteya Ziman û Wêjeya Kurdî de dixwîne. Ji ber êrîş û dagirkirina dewleta Tirk a dagirker ji herêmê re, ew neçar dimîne û koçî herêma Cizîrê dibe. Her weha li Zanîngeha Rojava xwendina xwe ya zimanê Kurdî dewam dike, û bawernameyê di pileya bilind de distîne.

Di warê wêje û hunerê de, xebateke hêja kiriye. Wî, di warê nivîsandin û wergerandina şanoyê de, gelek berhemên giranbuha pêşkêş kirine; berhemên wergerandî yên weke Geliyê Mirinê, Fîl, Zimanê Çiyê, Şekal, Karmend û gelek şanoyên dîtir.

Li rex vê jî, wî ji bo xwendekarên dibistanên amadehî du berhem wergerandine zimanê Kurdî, navê wan jî ev in: Rêgezên Elektronîkî û Bîngehên Mekanîka Wesayîtan.



Ednan di warê nivîskariyê de gelek berhemên şanoyê bi Kurdî afirandine, yên weke pirtûka Rêgehên Şanoyî, pirtûka Têgehên Şano, Şanoya Serwer, Şanoya Biriya, Şanoya Memê Alan, Şanoya Giyanên Şewitî, Şanoya Babelîsk, Şanoya Bermîl, Şanoya Talora Hecran û gelek berhemên din.

Ednan Mustefa, li rex şanoyê, çîrokan jî dinivîse, û niha amadekariya pirtûkek çîrokan dike.

Ednan Mustefa, di dirêjahiya jiyana xwe ya hunerî de, gelek xelat li ser nivîsandinê wergirtine, weke:

-Xelata baştirîn nivîskarê afirîner (2014)

-Xelata baştirîn derhênerê şano (2016)

-Xelata baştirîn nivîskarê şano li Bakur û Rojhilatê Sûrî (2020)

Herweha, hêjayî bibîrxistinê ye ku, nivîskar û derhêner Ednan Mustefa bi dehan şano derandiye û di nava gelek festîvalên şanoyê de, berhemên xwe pêşkêş kirine.



## **Ehmed Hesên Tahîr**

Di sala 1967an de, li gundê Dekşûriya bakurê Rimêlan, herêma Dêrika Hemko, hatiye dinê. Xwendina xwe ya seretaî li gundê Kanî Kerkê xwend, û xwendina amadaî û navendî li bajarê Qamişlo bi dawî kir. Ji ber helwestên wî yê siyasî, ji Zanîngehê hate dûrxistin û qewitandin.

Di sala 1990î de, fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bû.

Di sala 2000î de, dest bi nivîsandina helbestê kir.


Aniha pênc pirtûkên wî hene, didu ji wan hatin çapkirin û belavkirin, ew jî ev in:

- 1- Helbest bi navê "Helbest û Helwest"
- 2- Kurteçîrok bi navê "Penceşêra Koçberiyê".

### **Pirtûkên wî yê destnivîs ev in:**

- 1- Helbest bi navê "Keleka Mirinê".
- 2- Helbest bi navê "Evîna Bê Dawî".
- 3- Kurteçîrok bi navê "Hindik û Rindik".

Aniha ew li başûrê Kurdistanê dijî, di kampa Domîz 2 de, li bajarê Duhokê.



## Ehmed Huseynî

Di sala 1955an de, li Amûdê jidayik bû. Amûdê bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye. Huseynî dibistana seretayî, navendî û amadeyî li bajarê Amûdê qedand.

Pişt re li Zanîngeha Şamê, paytexta Sûriyeyê, beşa Felsefeyê qedandiye. Hikûmeta Sûriyeyê nehişt ku Ehmed Huseynî bi dîplomeya xwe bixebite. Ew neçar ma ku karên ne li gorî xwe bike.

Lewra Huseynî jî mîna gelek xortên Kurd berê xwe da Ewropayê.

Huseynî di sala 1989an de çû Swêdê. Demekê li Îngilistanê jî jiyaye. Niha li bajarê Qamişlo, Rojavayê Kurdistanê, dijî. Gelek pirtûkên Ehmed Huseynî hatine çapkirin.

Di sala 2002yan de, Dîwana wî ji aliyê Weşanxaneya Avestayê ve hate çapkirin. Di Dîwana wî de, beşeke mezin ji berhemên wî hene.

Sala 2001ê, di Medya TV de, bernameya Sîmirê Tavsorkê, û di sala 2005an de, di Roj TV de, bernameya Dengvedana Peyvê pêşkêş dikir.

Ji destpêka sala 2013an di Ronahî TV de, bernameya Şeva Hicranê pêşkêş dike.

**Berhem:**

- Mistek Ji Şîna Bêcir, Stockholm, 1990, Weşanên Komeleya Jinên Kurdistanê.
- Bi Xewna We Pênûsê Dilorînim, Stockholm, 1993, Weşanên Jîna Nû.
- Rono û Sirûdên Bêrîkirinê, Stockholm, 1994, Weşanên Jîna Nû.
- Sîriskên Hesinî (Selîm Berekat) Wergerandin, Stockholm, 1997, Weşanên Apecê.
- Bazbend, Kewname, Stockholm, 1999, Weşanên Apecê.
- Dîwan (Berhemên Giştî), Stenbol, 2002, Weşanên Avestayê.
- Bajarê Dirinde, Amed, 2003, Weşanên Belkî.
- Çend Dîmenên Xemgîn ên Kurmanciya Nivîskî, Amed, 2004, Weşanên Aram.
- Ronoya (Nûristan), Amed, 2011, Weşanxaneya Belkî.
- Navekî Kuştî Ji Navên Te yên Kesk Bûm, 2012, Weşanxaneya Ronahî.



## Ehmed Mistefa

-Di 8ê Gelawêjê (Tabaxê) sala 1980yê de, li gundê KORA yê girêdayî navçeya Cindirêsê li herêma Çiyayê Kurmênc ( EFRÎNÊ ), jidayîk bû. Xwendina xwe ya Zango bi dawî nekir.

-Di destpêkê de, bi Zimanê Erebi dest bi nivîsandinê kir, lê ji ber heza zimanê dayikê, dest bi zimanê Kurdî jî kir.

-Yekemîn helbesta wî ya bi zimanê Kurdî di Kovara Perwan de, sala 2010an belav bû.

Dema fêrî Zimanê Kurdî bû, dest bi helbestên kilasîk kir û nivîsand, lê xwe siwarê helbesta nûjen dibîne. Ew helbest û gotaran bi Kurdî û Erebi dinivîse, û di berhemên xwe kovar, rojname û malperên Kurdî de, diweşîne. Mîna: Kovara Avşîn û hin kovarên din. Sê pirtûkên wî hene, didu jê bi zimanê Erebi ne, û yek jî bi zimanê Kurdî ye.

-Ji sala 2007an de, li Siwêsrayê dijî.


Ew bi hevjin e û keçek wî heye, navê wê "Lîdiya" ye.

### Ji berhemên wî yên çapkirî:

۱- آلامٌ مُتَمَرِّدَةٌ. شعر، ۲۰۲۱

۲- هَمْسَاتٌ دَافِنَةٌ. شعر، ۲۰۲۲

3-Awazên Evînê: Helbest, bi zimanê Kurdî, pêşgotina Dilawerê Zengî ye.



## **Ehmedê Şêx Salih (1935-2017)**

Di sala 1935an de, helbestvanê Kurd Ehmed Şêx Salih Şêx Mehmûd, li devera Eyndîwerê ya girêdayî bajarê Dêrikê, li Rojavayê Kurdistanê jidayik bûye. Koka malbata wî ji gundê Şêx Melek Naviyanê, yê girêdayî bajarê Şernexê li Bakurê Kurdistanê ye. Di destpêka jiyana xwe de, li gund, li ber destên melayan fêrî xwendinê dibe û Qur'anê xitim dike. Li dibistaneke bajarê Dêrikê xwendina xwe ya seretayî temam dike; xwendina 5 salan tenê di 3 salan de qedand û ji hemî hevalên xwe bihurî, ev yek jî ji ber jîrbûn û zanebûna wî bûye. Dema ku li dibistanê di refa 4ê de dixwîne, li bûyînên Şoreşa Şêx Se'îd û Komara Mehabadê diponije û bi hêrseke Kurdewar, heyvanekî pak di giyanê wî de dimeye, da ku paşê hizir û ramanên xwe bi rêya pênivîsa xwe der bibire. Geşta nivîskariya wî ji vir dest pê dike.

Di sala 1952yan de, bawernameya Sertefîkayê werdigire. Di wê hingê de, rêdaneke taybet ji bo wî tê dayîn da ku biçe Erebistana Sî'ûdî xwendina xwe bidomîne; lê ji ber ku ew takekurê dê û bavê xwe bû, malbata wî nehêla ku biçe. Ew û çend hevalên xwe weke Mihemed Nûrî Dêrşewî lawê Şêx Reşîdê Dêrşewî, xwendina xwe li ber destê zanayê gewre Mele Ehmedê Kurdî bi dawî dike, û bawernameya (Icaze)yê werdigire. Piştî demekê Ehmedê Şêx Salih, dibe yekemîn mamosteyê fermî di dibistana Eyndîwerê de.

Di sala 1957an de, çawa ku li Rojavayê Kurdistanê tevgera siyasî têtê damezirandin, Ehmedê Şêx Salih bi dest xwe re tevli tevgerê dibe. Di sala 1960î de, ligel birek ji welatparêzên Kurd tê desteserkirin û ji bo Zindana Mezê tê veguhastin. Di Zindana Mezê de, ligel xebatkarên Kurd ên herêma

Dêrikê, Qamişlo, Kobanî û Efrînê cezayê xwe dixwe. Piştî ji zindanê riha dibe, her di kar û xebata xwe de berdewam bû. Di sala 1976an de, serok Mes'ûd barzanî nameyekê ji xebatkar Hemîd Sîno re rêdike û jê dixwaze ji nû ve Partî were vejandin. Têkoşer Hemîd Sîno wê nameyê şanî Ehmedê Şêx dide û jê dixwaze ku li herêma Dêrikê dest bi vejandina Partî bike. Di wê demê de, xebatkar Hemîd Sîno li bajarê Qamişlo û Ehmedê Şêx li Dêrika Hemko dest bi xebata xwe kirin. Ehmedê Şêx Salih di ber doza gelê xwe de her dimîne xebatkar û welatparêz.

Di warê nivîsandina helbestê de, Ehmedê Şêx xudanê reng û şêwazekî taybet bû. Her çi qas bi awayekî kilasîk ristên xwe dihûna jî, lê wêne û tabloyên nûjen li helbesta xwe bar dikir, û kirasekî sipehî li helbesta xwe ya bangewazî jî dikir. Pirtûka wî "Asoma Girtinhevê" li ser yek kêşê, ji 681 malikî pêk tê, û bi zimanê Kurdî hûnandiye û bi zimanê Erebi şirove kiriye.

Di sala 1983yan de, kurê wî Ebdulxefar, di qezayeke trafikê de, jiyana xwe ji dest da. Şêx Ehmed, di şîna kurê xwe de, tenê karîbû evê bûyîna trajedîk bi rêya helbestê vebêje, ji lewre di şîna kurê xwe de wiha dibêje: *Şiyar bûm konê reş xuya kir*. Paşê hunermendê Kurd ê navdar Mihemed Şêxo ev helbesta wî bi awaz kir.

Di sala 1988an de, ew û mamoste nivîskar Dilawerê Zengî hev nas dikin. Têkilî û dostaniya wan her berdewam bû ta ji nav me bar kirye. Ciwantiyên helbest diyarî mamoste Dilawer kiriye.

Mixabin, ku tu caran helbest û nivîsên xwe komî ser hev û din nedikirin, û piraniya wan winda dibûn. Gelek helbestên wî bûn stran, û hunermendên Kurd ên navdar ew strandin, wek hunermend Mihemed Şêxo ku ji gotin û helbestên wî ev stranên xweş çêkirin, weke: *Şiyar bûm konê reş xuya kir*, *Cana min cana min û Xortên Melê*.

Tevlî rewşa aborî ya xerab, Ehmedê Şêx Salih tu caran li xwe dernedixist û xwe ji tu kesî re kêr nedikir. Demeke baş karê dirûnkariyê kir, paşê ji ber rewşa tenduristî rawestiya. Di nêva civak û derdora xwe de, her û her

mirovekî xêrxwaz, şîretkar û geşbîn bû, ji vê yekê tamamî xelkên deverê li hember wî bi rêz bûn. Bi yek nivîsê hemî aliyên jiyana wî ruhî nabin, ji ber di gelek şax û hêlan de xebat kiriye, û di bîrdanka her kesekî Beravî de, serpêhatiyeke xwe hêlaye.

Piştî xebateke dûr û dirêj û di 82saliya xwe de, Ehmedê Şêx Salih di 22yê meha 10ê de, li sala 2017ê, li Nexweşxaneyê Şarê ya li Hewlêra Paytext, jiyana xwe ji dest da û paşê li goristana şarê xwe, “Dêrika Hemko”, hat veşartin. Hêjayî gotinê ye ku çar keç û du kurên wî hene<sup>2</sup>.

-Di Mehrecana 13an ya helbesta Kurdî li başûrê rojava û li sûriyê , ku roja îne 24. 10. 2008an, bi navê Tevna Çand û Huner a Kurdî, li Dêrika Hemko hat xelatkirin.

-Di sala 2014an de, nasnameya endamtiyê ya Şanaziyê ji alî Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriyayê ve, pêşkêşî wî tê kirin.

-Di sala 2015an de, bawernameya rêzgirtinê, ji aliyê civata rêveberiya Dezgeha Bedirxan a Çand û Zanistan ve, wergirt.

-Di sala 2016an de, ji alî Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyê tê xelatkirin.

### **Berhemên çapbûyî**


-Pirtûka **Asoma Girtinhevê** di 2015an de, ji Weşanxaneyê Temûzê ya li Şama Paytext derket.

-Dîwanek ji helbestan (destnivîs) e.

---

<sup>2</sup> kurê wî Ebdulxefar di qezayeke trafikê de jiyana xwe ji dest da bû.





### **Ehmedê Namî (1906-1975)**

Namî, navnîşanê torevaniyê bû, ko Mela Ehmed kurê Mehmûd kurê Evdella, dayika wî Xedra Sofî Elî, li xwe kiribû û nivîsandinên xwe bi vî navî dixemilandin. Di jiyane de jî, bi navê Mela Ehmedê Namî dihate naskirin.

**Namî dibêje:** *Di sala 1906an de, heyva gulanê li gundê Erbetê, qeza Nisêbînî li bakurê Kurdistanê hatime dinyayê. Pênc pêhisyên min- Hewasî elxemse حواسي الخمسة - li wî gundî agadar bûne.*

*Ango, bi bîna gul û sosinan.*

*Û bi dengê şalûl û bilbilan.*

*Û bi dîtina tîrêjên roja jîndar.*

*Û bi hingiftin û destdana berê dayikeke Kurdî.*

*Û li tamkirina şîrê bustanê wê dayikê tamdar û beşdar bûme.*

*Paşê ez bi dergûşeke darî ji darên çiyayê Kurdistanê.*

*Li ser erd û di bin azmanê wê de.*

*Bi destekî Kurdî hatime hejand in, ta ko bûme du salî.*

*Jê û pêve, ez di himbêza dê û bavê dilovan de, bi delalî hatim xwedîkirin.*

*Wer xuya bû ko dêya min pir qîmetê xwendin û zanînê li cem hebû, tevî ko xwendin di wê demê de bê qîmet û nirx bû.*

Heft salî bû, dema Namî dest bi xwendina olî kir, û li çend dibistanên olî (Hicrikên Feqehan) xwendiyê, weke Êstilê, Kercosê, Darê, Amûdê, Girêsiwêr û Tilşe'îra Aşîta. Li Hicrika Tilşe'îrê xwendina xwe bidawî anî, û bû melayê wî gundî.

Namî di sala 1932yan de, dest bi nivîsandina Kurdî kiribû û keda xwe di nava rûpelên kovarên "Hawar" û "Ronahî" de, yê ko Mîr Celadet Bedir-Xan li bajarê Şamê derdixistin, û "Roja Nû" ya ko Doktor Kamîran Bedir-Xan li bajarê Bêrûtê derdixist de, diweşandin.

### **Kar û Xebata Namî di warê siyasî, civakî û çandî de**

#### **Di warê siyasî de**

Namî di nava hemû civat û rêxistinên kurdî yê siyasî d endamekî çalak û xwediyê roleke berbiçav bû, weke Civata Xoybûn, Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan, Civata Alîkariyê Ji Bona Belengazên Kurd li Cizîrê, Nadiya CiwanKurd li Amûdê, Civata Aştîxwazên Cihanê Li Sûriyê, û Şêwirdarê Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd Li Sûriyê bû. Bi sedema van çalakiyan gelek caran dibû mihvanê girtîgehên rijîmê.

#### **Di warê civakî de**

Namî di civata Kurdî de Mirovekî navdar bû, xwediyê baweriyêke dûrbîn bû. Di civatan de, xwediyê gotina xwe bû, pir rûmet ji gotin û baweriyên wî re dihat girtin. Zar xweş bû, têgihîştî bû, kîn û dilreşî li ba wî peyda nedibûn, dozdarê xwendina keçan bû, dijîtiya zewaca ji jinekê bêtir dikir, tund û tûjiya li ser jinan pirotisto dikir, doza çareseriyê ji hemû mafên ko jinên Kurd ji wan bê par bûn, dikir.

#### **Di warê Perwerdeyê de**

Mela Ehmedê Namî yek ji wan şagirdên Mîr Celadet Bedir-Xan bû, yê ko fêrkirina gel danîbûn ser milên xwe. Di sala 1948an de, li gundê xwe, gundê Tilşe'îra Aşîta, dibistaneke şevê di odekê ji odên dibistana fermî de vekir û

seydayê dersdar Namî mamostê xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bû; her şev xort û kalên gund hînî xwendin û nivîsandina bi tîpên Latînî dikirin.

Di sala 1950î de, piştî xebateke bê westan bi persiyarên perwerdeya Parêzgeha Hisîça re, Namî karîbû dibistaneke fermî ya keçan li gundê xwe Tilşe'îra Aşîta veke. Xwendevanên dibistanê bi sirûda niştimanî ya Sûriyê, û helbesta Namî, ya bi navê Neşîd û Gaziya Keçan, roja xwendinê dest pê dikirin.

### **Namî çend şûnmayên hêja li şûna xwe hiştine, weke:**

1-Daxwazname, dîwana helbestan. Çapa yekemîn li Siwêdê û ya diwemîn li welêt, hatin çapkirin.

2-Kozar - حَظِيرَةُ اللِّسَان - Ferhenga zimanê Kurdî - Erebî û Erebî - Kurdî ye, wa ye li Komara Çîka tê çapkirin.

3-Agirê Sînema Amûdê, bûyer û serpêhatiya şewata sînema bajarê Amûdê ye. Li bajarê Uppsala Li Swêdê hate çapkirin û çapa diwemîn, wa ye li welêt û bi dîmenekî nû tê çapkirin.


4-Çiko Li Bîr im, 33 rûpel in (destnivîsa Namî ye).

5-Rêzimana Kurdî û Erebî, dibe alîkar ji xwendina Ferhengê re, û bi ferhengê re, û di yek cildê de tê çapkirin.

٦- كتاب الفرائض (destnivîsa Namî bi zimanê Erebî ye).

Ji bo pêşketina civatê, û da ko keç û xortên Kurd xwenda, zana û serfiraz bin. Namî, xizmetên hêja ji gelê xwe yê Kurd re kirine.

Piştî demeke dirêj, û di sala 1952yan de, Namî bi malîti ji gundê Tilşe'îrê xwe guheste bajarê Qamişlo, û xebata xwe ya torevanî, siyasî û civakî li wir berdewam kir. Mixabin, piştî nexweşiya dil û ya bihintengiyê û di 11. 12. 1975an de, Namî çû ber dilovaniya Xwedê, û li goristana Qudûr Beg li bajarê Qamişlo, hate veşartin.



## **Ehmedê Palo (1920-1991)**

Ehmedê kurê Mihemedê Mistefa ye, navê diya wî Elîfê ye, di sala 1920an de, nêzîkî bajarê Palo, li gundê Sêreçurê (Bakûrê Kurdistanê) jidayik bûye.

Di zaroketiya xwe de, dê û bavê xwe winda dike, sêwî dimîne. Jiyana wî di nav belengazî û perîşaniyê de derbas dibe. Dixwaze ko bixwîne, lêbelê mercên xwendinê nabîne. Ji bo vê sedemê jî, carcaran ji mal direve, berê xwe dide bajarê Siwêrekê. Newal û kortalan dibîne, li deşt û zozanan dibe mêvan. Paşê ew dibe rêwî û li Kurdistanê digere. Li hin ciyan dibe mêvan û li hin ciyan jî dibe şivan. Di pazde saliya xwe de, bi nexweşiyê giran dikeve. Li dor du mehan di nexweşxana Mêrdînê de dimîne. Di pey ko ji nexweşxanê derdikeve, berê xwe dide Binxetê û demekê li Dirbêsiyê dimîne. Di sala 1935an de, diçe Qamişlokê. Ji wir jî diçe gundê Wêsikê şûnûwar dibe. Li vî gundî dibe şivan. Di sala 1936 de, diçe Xizna û li wir xwendina xwe ya olî dixwîne. Di wê demê de hînî xwendin û nivîsandinê dibe, û zanîna xwe roj bi roj ferehtir dike. Bi taybetî li ser rêzimana Kurdî radiweste û xwe perwerde dike. Ji bilî Zimanê Kurdî, xwe hînî Erebî, Tirkî û Farisî jî dike. Lêkolîn û lêgerînên xwe li ser wêje û dîroka Kurdistanê pêş de dibe. Di wê demê de dest bi helbestên Kurdî û nivîsandinê dike. Heta roja xwe ya dawî vî karî didomîne. Mele Ehmed ji gelê xwe re meletî dikir, gel ji xewê hişyar dikir. Dîwana xwe ya ko bi navê "Dewr û Gera Kurdistanê" di van deman de nivîsiye. Mele Ehmed, paşê, mirovên ko rêzaniya Kurdî dizanîbûn nas dike û dibe hevalbendê wan.

Di 9. 5. 1957an de, û nemaze gava ko givika şêx û melan bi destê Ebdilhemîd Serac, û bi piştgirtina mala şêx Ehmed hate çêkirin, mele Ehmedê Palo xwe jê dide paš û nabe hevalê wan, ew jî ji ber ko dibîne ev kar ne ji bo Kurdan e. Li gorî gotina wî, di wê demê de, ew endamê komela Zanistî û Alîkariya Kurd bû. Ew komela ko di 1955an de hatiye avakirin, tenê li dora du salan dirêj kiriye û ji karê xwe sekiniye. Li ser gotina wî, evê komelê xwe tevî Partiya Demokqrata Kurd li Sûriyê, ya ku sala 1957an ava bûbû, nekiriye.

Ew, di 29ê meha Gulana 1991ê de diçe ser dilovaniya Xwedê.


- Mele Ehmedê Palo di jiyana xwe de, gelek berhemên giranbuha afirandin. Çi mixabin, ji wan berhemên giran, bes dîwana wî ya bi navê "Dewr û Gera Kurdistanê", di sala 1994an de, bi tîpên Latînî û "Rêzimana Kurdî" - 2011an û "Civîna Nemiran" – 2022yan, hatine çapkirin. Heger hin lêkolîner û çapxane li wan berhemên hêja xwedî derkevin, bêguman gencîneyên pirtûkxanên Kurdî dê hîn dewlementir bibin.

#### **Berhemên Mele Ehmed yên haine çapkirin ev in:**

- Dewr û gera Kurdistanê, 1994, Şam
- Rêzimana Kurdî, 2011, Qamişlo

#### **Berhemên Mele Ehmed yên neçapkirî jî ev in:**

- Tarîxa Kurdan, şano (bi şêweyê helbestê hatiye nivîsandin).
- Civîna Nemiran (Helbest) ji deh hezar beytan pêk tê. Cild 1-2, weşana Buhar, 2022
- Ferhenga Kurdî - Tirkî, Farisî û Erebî.
- Baxê Evînê (Helbest)
- Baxê Niştimanî (Helbest)
- Pehlewî û civîndarî
- Birîna Niştimanî
- Bîr û bawerî (helbest)



### **Ehmedê Zivingî (1893-1971)**

Mela Ehmed kurê Mela Mihemedê Zivingî yê Botî, çendî ku xelkê Zivinga Botan e û di sala 1893yan de, li bajarê Sêrtê, di dema ku bavê wî lê dersdarî dikir de hatiye dinê jî, lê bavê wî Mela Mihemed bi eslê xwe Paloyî ye, û ji çiyayên Paloyê hatiye devera Botan. Mela Ehmed li Sêrtê, li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye, û demeke dirêj li bal maye. Gava bavê wî hêvî û umîdeke baş ji bo zanînê tê de dîtiye, gelek ji wextê xwe jê re terxan kir da ew bikeve nav refên zana û şarezayên dema xwe. Wî jî ew hêviya bavê xwe vala dernexistiye, û digel temenê xwe yê piçûk jî, piştî mirina bavê xwe li cihê wî li gundê xwe yê Zivingê dersdarî kiriye. Demek pişt re ew çûye li Cizîra Botan li dersdariya xwe domandiye; ji wê derê jî çûye gundê Eyndîwerê û bûye melê mizgeftê, lê dû re dest bi karûbarê bazirganiyê kiriye.

Mele Ehmedê Zivingî kesayetiyeke zanistî yê binavûdeng bû, gelek zaniyar, îmam, mamosta û şagirtên zanistê li ber destên wî me'ezûn bûn, yê herî navdar jî helbestvan Seyid Elî Findikî bû, ku di çûna wî ya Norşînê de, pê re bûn, di sala 1968an de mir. Di nav şagirtên wî de, zanyarê hêja Mela Silêman El-Hewserî jî hebû, û Mela Yûsifê Zivingî pirtûkeke helbestan heye (bavê dîroknasê navdar Ebdulreqîb Yûsif) e. Herweha, birayê wî Mela Îbrahîmê Zivingî jî yek ji şagirtên wî bû. Ew yek ji endamên komeleya Xoyîbûnê bû.

Piştî rizgariya Sûriyeyê, ew demekê çûye gundê Xezna, û li cem Şêx Ehmedê Xeznayê maye, lê dû re vegeriya bajarê Qamişloyê û li wê derê ketiye nav xebatên ji bo bipêşxistina welat li herêma xwe, û ji bo avakirina weqfên olî û mizgeftên çêtir li bajarê Qamişlo û der û dorên wê xebitiye.

Ew damezirînerê ewqafên Îslamî li Cizîrê bû ye, piştî serxwebûna Sûriyê, ew dibe yekem muftiyê Cizîrê li bajarê Qamişlo.

Ji ber zanîna xwe ya bi zimanên Rojhilatî yên mîna Tirkî, Erebi, Farisî û zimanê xwe yê dayikê – Kurdî - ew bi Erebi kirina gelek kitêbên ziman, ferheng û fiqhê ve rabûye; bi vî awayî jî bi wêje, kultûr û zanista gelên îslamê hay lê bûye.

Hêjayî gotinê ye ku, çapkirina pirtûka "العقد الجوهري في شرح ديوان الجزري" (El-'eqidul Cewherî fî Şerhi Dîwanil Cizîrî) di dema Komara Erebi ya Yekgirtî de (Mesir-Sûriya) hatiye redkirin. Ji bo vê pirsgerêkê Mela Ehmedê Zivingî kurtenamekê ji bo kesayetiya Serokomarê wê demê re, dişîne. Ango ji bo serokê Komara Erebi ya Yekgirtî, serok Cemal Abdil Nasir re. Mela Ahmedê Zivingî di wê kurtenamê de balê dikşîne ser doza Kurd û çanda kevna a Kurdan, û girîngiya vê pirtûkê û rewşa helbesta Melayê Cizîrî di wêjeya Kurdî ya klasîk de. Di encamê de, serok Ebdil Nasir bi çapkirina vê pirtûkê razî dibe.

Corc Hermûş yekem çapxaneyê otomatîkî li Qamişloyê bi navê Çapxaneyê El-Rafîdeyn damezirand, û pirtûka (العقد الجوهري Gerdeniya Gewherî) ya Mela Ehmedê Zivingî pirtûka yekem bû ku tê de çap bû (1959).

Seydayê Zivingî ji ber bihurandina şevên xwe li ser lêgerîn û amadekirina hinek karên din, yên mîna "Mem û Zînê", ji rohniya çavên xwe bêpar bûye, û bêgavê xanenişîniyê bûye ku dû re mala xwe biriye Helebê, û li wê derê di 06. 12. 1971ê de, miriye û li ser temîna xwe li gundê Tilmarûfê hatiye veşartin.



## Elî Cefer

Elî Cefer ji xelkê gundê Behdîna, herêma Çiyayê Kurmênc, Rojavayê Kurdistanê ye. Ew di 04. 04. 1960î de, jidayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî û navîn li gundê xwe kuta kiriye. Pişt re lîse li bajarê Helebê xwendiyê.

- Ji 17 saliya xwe de (sala 1976ê), ketiye nav refên Tevgera Rizgarîxwaza Rojavayê Kurdistanê. Lê ji çend salan ve, wek kesekî serbixwe (bê layan) maye.

- Xwediyê yekemîn pirtûkxaneya Kurdî sala 1990î ye, ya ku bi navê: "Pirtûkxaneya Xanî" li bajarê Helebê hatibû naskirin. Rola wî di çapkirin û belavkirina pirtûka Kurdî de berbiçav bû. Di vê derbarê de, çend pêşangehên pirtûkên Kurdî bi nehên û bi alîkariya hin hêzên Kurdî yên Rojava, li hin bajarên Rojavayê Kurdistanê û Heleb vekirin.

- Ew yek ji endamên komîta "Ehmedê Xanî", ya ku di sala 1995an de, ji bo 300 saliya Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî, li Rojavayê Kurdistanê hatibû damezrandin.

- Yek ji damezirênerên: "Mehrecana helbesta Kurdî li Sûriyê", ya ku di sala 1993yê de, li Rojavayê Kurdistanê hatibû damezirandin. Ew û Dr. Ebdil-mecîd Şêxo, Heyder Omer û Rûxweşê Zîvar xwediyên ramana nîşankirina roja 22 Çirîya Pêşîn (Roja koçkirina helbestvanê gewre Cegerxwîn), ku ew roj her sal bibe Roja Helbesta Kurdî li Sûriyê. Herweha yek ji endamên damezirênerên "Xelata Cemîl Horo û Bavê Selah" e.



- Elî Cefer bi zimanê Kurdî û Erebi dinivîse. Nivîsên wî di pir kovar û rojnameyên Kurdî û Kurdistanî (Pirs, Nubihar, Xebat, Armanc, Pênûs, Yekgirtin, Yekîtî, Havîbûn, û... ), herweha di gelek malperên Kurdî de belav bûne û hê jî belav dibin.

- Di navîna sala 1996ê de, ji encama girtina pirtûkxaneyê wî ji laşî dezgehên ewlekariya rêjîma Sûriyê ve, ew û malbata xwe, ji neçarî, koçberî Elmanyayê bûn, û ta niha jî jiyana xwe li wir didomînin.

- Ew di destpêka weşandina kovara „Pênûs,, ê, ya rêxistina Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî) de, li Ewropa ku bi zimanê Kurdî û Erebi derdiçû (1998 - 2006), endamê desteya kovarê bû. Herweha dîsan di çend hejmarên dawiyê de jî.

### **Ta niha ( 10 ) berhemên wî hatine çapkirin:**

#### **Bi zimanê Kurdî:**

1- (Gotina mîrê Kurd, gotin e): Sala 2000î, li Stockholmê weşiya ye. Ev pirtûk danhev e, û ji zincîra: ( Ji Berhemvaniya Devkî ya Gelêrî - 1 ). Çapa duyem 2016an, Istanbûl - Tirkiyê.

2- (Kurd neviyên Mîdiya ne): Lêkolînek rojhilatnasê Rûs, Mînoriskî ye, ji Erebi wergerandiye Kurdî, û wek berhevok di sala 2005an de, li Elmanyayê hatiye çapkirin.

3- (Gotinên Pêşyan): Ew jî danheva metelokên Kurdî ye, di sala 2006an de hatiye weşandin. Ev jî, ji zincîra: ( Ji berhemvaniya devkî ya gelêrî - 2 ).

4- ( Roja Helbesta Kurdî li derbideriyê ), amadekirin, sala 2016.

5- Rojnameya (Dengê Kurdistan), ya ku sala 1949ê, ji laşî "Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa" derdiçe, û bi serpereştiya rehme lê be Dr. Nûredîn Zaza. Amadekirin sala 2018an.

#### **Bi zimanê Erebi:**

باللغة العربية

6- ( بقعة ضوء من مذكرات عبد الرزاق بدرخان ). ترجمة من الكوردية إلى العربية، بالاشتراك مع حيدر عمر، عام 2000.

7- صلاح الدين الأيوبي ( كوردي هز العالم ), تأليف جان كورد باللغة الكوردية. ترجمة إلى العربية عام 2002.

8- كورد المهجر ( جمعية الطلبة الكورد في أوروبا - سفارة كردستان في المهجر ) 1949-  
1975، الجزء الأول، الطبعة الأولى 2016. الطبعة الثانية 2019. و هو بحث تاريخي. من  
إصدارات دار خاني.

9- كورد المهجر ( جمعية الطلبة الكورد في أوروبا - سفارة كردستان في المهجر ) 1949-  
1975، الجزء الثاني، و هذا الجزء هو متمم للجزء الأول. الطبعة الأولى 2020. من إصدارات دار  
خاني.

10- كورد المهجر ( بعض منشورات جمعية الطلبة الكورد في أوروبا باللغة العربية، الجزء  
الرابع، جمع و إعداد، الطبعة الأولى 2021. من إصدارات دار خاني.

### مسودات معدة للطبع:

11- قاموس عربي - كوردي.

12 - ( Ji berhemvaniya devkî a gelêrî -3 )

١٣-الجمعيات و المنظمات الكوردية في أوروبا حتى العام 1985.



### **Elî Çilaxa (1970-2021)**

Di sala 1970yî de, li gundê Girkê Xelo yê girêdayî bajarokê Çilaxa, jidayîk bûye. Xwendina xwe ya seretaî li gund dest pê kiriye, pişt re çûye bajarokê Çilaxa, xwendina xwe ya qonaxa navîn û amadeyî li wir biserî kiriye. Eliyê Çilaxa derçûyê Zanîngeha Helebê ya mafnasiyê ye.

Di temenkî piçûk de dest bi nivîsandin û ristina helbestê kiriye; gava ku temenê wî 11 salî bû hunerweriya hûnandina helbestê li gel xwe dîtiye û li ser vê bingehê dest pê kiriye.

Di destpêkê de, helbest bi zimanê Kurdî û Erebi nivîsandine. Dû re dest bi nivîsandina gotar û çîrokan kiriye.

Eliyê Çilaxa di nav malbatek cotiyar û gundî de, pir bi perîşanî û hejarî qonaxa zarokatiyê borandiye.

Du dîwanên wî ji helbestê hene, ya yekem di sala 2021ê de, bi navê (ARYA), ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriyayê ve hatiye çapkirin.

Dîwana wî ya duyem bi navê (HEYAS), di sala 2022yan de hatiye çapkirin.

Di sala 2020an, de bûye endamê birêveber ê Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriyê.

Eliyê Çilaxa di 28. 1. 2021ê de, li bajarokê Çilaxa sipartine axê.



## **Elî Mihemed Salih Şemdîn**

- Qamişlo di sala 1958 de, jidayîk bûye.
- Fakulteya Endezyariya Çandiniyê, Zanîngeha Helebê 1980.
- Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriya, û nûnerê wê li Herêma Kurdistana Iraqê ye.
- Endamê kargêr yê Sendîkeya Rojnamevanên Kurdistanê, Iraq.

### **Berhemên çapkirî:**

- 1- Mîrnişîna Ebdulxan El-Bedîsî, wergerandin ji Kurdî bo Erebî, çapa yekem (2010), û ya duwem (2012), li bajarê Silêmaniyê.
- 2- Tevgera Kurdî li Sûriyê di bin Ronahiyê de, wergerandin ji Erebî bo Kurdî, çapa yekem (2012), li Stenbolê.
- 3- Şoreşa Şêx Se'îd Pîran di nerîna malbata wî de, wergerandin ji Kurdî bo Erebî, çapa yekem (2013), li bajarê Silêmaniyê.
- 4- Ragihandin û raya giştî ya Kurdî li Sûriyê, bi Erebî hatiye nivîsandin, çapa 1. (Silêmanî: 2014).
- 5- (Bere ev şer bisekinê), bi hevbeşiya Ebdulhemîd Derwîş, Çapa 1 li Silêmaniyê (2015).
- 6- Tevgera Kurdî li Sûriyê û diyardeya parçebûnê, bi zimanê Erebî hatiye nivîsandin, çapa yekem (2016), li bajarê Silêmaniyê.

- 7- Bandora Heyva Şî'î li Rojhilata Navîn, wergerandin ji Kurdî bo Erebî, çapa yekem (2017) li bajarê Silêmaniyê.
- 8- Tevgera Kurdî li Sûriyê û diyardeya parçebûnê, wergerandina (Şanaz Remzî Hîranî û Aran Elî) ji Erebî bo zaravayê Kurdî soranî, çapa yekem (2018), li bajarê Silêmaniyê.
- 9- Ebdulrehman Zebîhî (Ulema), bi Erebî hatiye nivîsandin, çapa yekem (Adar 2019), li bajarê Silêmaniyê.
- 10- Yê ku perengek bi dest xwe girtî, bi Erebî hatiye nivîsandin, çapa yekem (çile 2019), li Silêmaniyê.
- 11- Tevgera Kurdî li Sûriyê û diyardeya parçebûnê, ji aliyê nivîskar ve hatiye wergerandin ji Erebî bo Kurdî bi zaravayê kurmançî, çapa yekem (çile 2020), li Berlînê - Almanya.
- 12- Ewropiyek li welatê Kurdan, wergerandin ji Kurdî bo Erebî, çapa yekem (2020), li bajarê Silêmaniyê.
- 13- Herêma Aşîta (lêkolîneke siyasî, çandî û civakî), bi zimanê Erebî hatiye nivîsandin, weşanên Akademiya Kurdî li Hewlerê (2021).
- 14- Di Kurdolojiya Erebî de: Kurd û Kurdistan di Hişê Siyasî yê Ereb de, wergerandin ji Erebî bo Zaravayê Kurdî/Kurmançî, Weşanên Akademiya Kurdî li Hawler (2022).

#### **Berhemên neçapkirî:**

- 1- Çar beş ji romana (Derbar) ya romannivîsê Kurd Xisro Caf, wergerandin ji Kurdî zaravayê Soranî bo Erebî.
- 2- Kelihên ku bi diruşmên cemawer hatine hilweşandin (Komelek gotar), bi zimanê Erebî hatiye nivîsandin.
- 3- Zorba El-Kurdî (Jînenîgariyeke romanî), bi Erebî hatiye nivîsandin.
- 4- Namîlkeya (konê Tevgera Rizgarîxwaziya Gelê Kurdistanê), ya nivîskar Stran Ebdullah, wergerandin ji Kurdî, zaravayê Soranî, bo Erebî.



## Elî Şêxo Berazî

Ew bi xwe, ji devera kobaniyê ye – Sûriye.

-Di sala 1960î de, li bajarê Reqayê jidayik bûye û jiyana xwe jî li wir derbaskiriye.

-Nivîsên wî di warê: Dîrok, rexneyên wêjeyî û folklor de ne.

- Di sala 1988an de, ji Peymangeha Hunerê li bajarê Reqayê derçûye.

- ji sala 1999an de, Endamê Sendîkeya Hunermendên Sûriya ye.

- ji sala 1994an de, Endamê Komeleya Hunermendên Reqayê ye.

- ji sala 2012an de, Endamê Sendîkeya Hunermendên Kurdistanê ye.

-Endamê damezirîner e di Sendîkeya Hunermendên Kurdistana Rojava de.

- Di sala 2015an de, wekî Neqîbê Hunermendan hate hilbijartin.

- Di sala 2013an de, endamê damezirîner e di sendîkeya Rojnemevanê Kurdistan – Sûriya de.

-Di Radyoya Rojava de, 2015 – 2016 pirogramek bi navê (Deng û vedeng) pêşkêş dikir .

-Ji sala 2014 – 2020 mamostayê zimanê Erebî û Hunerê bû .

-Ji sala 2021ê de, serokê şaxê Hewlêrê yê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistan – Sûriya ye .

### **Pêşangehên wî yên Hunerî yên taybet:**

1 – Li libnanê – Beyrût 2000

2 - Li Sûriya – Reqa 2002

- 3 – Li Tirkiya – Orfa 2003
  - 4 – Li Kurdistanê – Hewlêr 2013
  - 5 – Li Kurdistanê – Hewlêr 2014
  - 6 – Li Kurdistanê – Hewlêr 2015
  - 7 – Li Kurdistanê – Hewlêr 2016
  - 8 – Li Kurdistanê – Hewlêr- Eyn kawa 2017
  - 9 – Li Kurdistanê – Hewlêr 2019
- Ji bilî pêşangehên hevbeş.

### **Berhemên wêjeyî yên çapkirî bi zimanê Erebi:**

- ١ – موت الياسمين – شعر ، مطبعة الرشيد الرقة – سوريا عام ١٩٩٩
- ٢ – طبول الضياع – شعر، مطبعة الرشيد الرقة - سوريا – عام ٢٠٠٤
- ٣ – البرازية – دراسة تاريخية طبعة ، دار الينابيع – دمشق. عام ٢٠١٠

### **Berhemên wêjeyî yên çapkirî bi zimanê Kurdî:**

- 1 - Xec û Siyamend, Risteçîrok ,Heleb, sal 2000
- 2 - Ferat , Helbest, sal Raqa, 2005
- 3 - Gulçînê ji dil, Helbest ,Raqa, 2006
- 4 - Dîwana folklor, 2015, Hewlêr
- 5 - Destana Hem û Kenê Mûsikê 2016 Hewlêr

### **Berhemên wêjeyî yên ne çapkirî bi zimanê Kurdî û Erebi:**

- ١ – تاريخ الكورد في الجزيرة الفراتية .
  - ٢ – تاريخ الكورد في سوريا ولبنان .
  - ٣ – من ذاكرة البرازية - قصص ووقائع .
  - ٤ - في رحاب سروج مجموعة مقالات عن أهل سروج
  - ٥ - أوراق على أרصفة الغربية – شعر
  - ٦ – مجموعة قصصية- الصديق عند الضيق.
  - ٧ - عشيرة الشيخان في كردستان- دراسة اجتماعية وتاريخية .
- 8– Bextê me Kurdan – Helbest

### **Hunermendên ku helbestên wî sitrane:**

Mehmûd Ezîz 15 helbest.

Mustefa Xalid 10 helbest.

Husên Şakir 23 helbest.

Zoya 3 helbest.

Lîloz 1 helbest.

Janyar 12 helbest.

Se'idûn Kobanî 10 helbest .

Ji bilî hunermendên ne navdar.

Di sala 1987an de, yekemîn gotara xwe, di kovara (Rê) de, ya partiya (Şexîle Kurdî), di bin nav û nîşana: (Birayetiya Kurd û Ereban) weşandiye.


Duyemîn jî li ser jiyana Eblola Goran bû, di bin nav û nîşana: jiyana û helbestên Eblola Goran. Her weha berdewam kir ta sala 1991ê.

### **Pişt re di kovar û rojnemeyên wek :**

Bi Zimanê Erebî : Furat, Raffîqa, Sewra , Hîwar.

Bi Zimanê Kurdî: Zanîn, Rê, Gelawêj û Pirs nivîsandiye.





### **Emerê Lalê 'Rêncber' (1938-2011)**

Di sala 1938an de, li gundê Qeser Dela ku dikeve rojhilatê Cizîra Botan li bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye. Bavê wî Hesênê Îsmâil e, ji eşîra Dêrşewan e, dayîka wî jî Lalê keça Necimê Hesên e. Piştî mehekê ji jidayîkbûna Emerê Lalê, malbata wî mîna gelek malbatên Kurdan ji ber zordariya dewleta Tirkîyê ji Serxetê berê xwe didin Binxetê û li gundê Endîwerê bi cih dibin.

Berî malbata Emerê Lalê koçberî Binxetê bibin, bi taybet jî di payîza sala 1929an de, malbata wî ji bo başkirina rewşa xwe ji gundê Endîwerê diçin gundê Mezrê, û ji wir jî diçin çend gundên din; li gundê Til Xenzîr bicih dibin. Emerê Lalê li gundê Til Xenzîr diçe dibistanê. Ew di ber xwendina xwe re jî li ser destê Mela Ebdulkerîmê Sofî fêrî Qur'ana pîroz dibe.

Di sala 1947an de, bavê wî dimire. Di wê demê de, temenê wî 9 sal bû û şagirtê pola sêyem a dibistana seretayî bû, Emer piştî mirina bavê xwe, ji ber xizanî û hejariyê, neçar dibe ku dev ji dibistanê berde û alîkariya diya xwe Lalê bike, lewma jî dest bi cot û rêncberiyê dike, êdî ew bi navê diya xwe tê naskirin û dibe Emerê Lalê.

Mîna jiyana hemû Kurdên belingaz û perîşan, ew jî jiyanekê bi zehmet û xizanî didomîne heta ku temenê wî dibe yê leşkeriyê û diçe leşkeriyê. Piştî xizmeta leşkeriyê bi dawî dike û vedgere mal, dizewice.

Di sala 1958an de, yekemîn helbesta xwe dinivîse.

**Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

1-Xem û Sawêr,1993

2- Çar Çira, 2002

3-Tewafa Yarê, 2008an ji aliyê Yekîtiya Nivîserê Duhokê ve hatiye çapkirin.

4-Welat Binase, 2009an ji aliyê Wezareta Rewşenbîrî û Lawan a Herêma Kurdistanê ve hatiye çapkirin.

5-Evîn û Welat, 2011

Çend berhemên wî yên destnivîs hene ku hê nehatine çapkirin.

Helbestvanê Kurd Emerê Lalê roja 6. 11. 2011an de koça dawî kir. Cendekê wî li goristana bajarê Dêrika Hemko bi axê hat spartin.



## Enesê Hecî Qasim

Di sala 1969an de, li gundê Gi'êt - herêma Amûdê jidayik bûye. Xwendina seretayî li gund xwendiyê.

Di sala 1980yî de, çûye bajarê Heseke bîcîh bûye. Li wir xwendina xwe berdewam kiriye, û di sala 1989 (amojgeha mamosteyan) bi dest xistiye.

Li dibistanên bajarê Heseke û gundewarên wê xebat kiriye ta sala 2019an.

Di sala 1988an de, dest bi helbesta kilasîk kiriye (ya movikan) û du dîwan pê çapkirine.

Pişt re, di sala 2017an de, bi têbînî û piştevaniya mamoste Mehmûdê Sebrî, dest bi helbesta terazûkirî kiriye.


### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

1. Dîwana( **Pertewa hestan**) 2017
2. Dîwana( **Gurzek gul**),2018
3. Dîwana( **Hêviyên bi seng**) terazûkirî ye. 2018
4. Pirtûka (**Terazûya helbesta Kurdî**), 2022
5. Romana( **Pîrejinek Efrînî pêdariyê diçînê**)
6. Dîwana (**Razên peyvê**) terazûkirî ye amadeye ji çapê re.
7. **Ferhenga hesan**. Amadeye ji çapê re.

Di destpêka şorşa sûriya de, dest bi çalakiyên sivîl kir û komeleyeke xêrxwazî bi hevbeşiya guropek ji çalakvanan avakir. Di sala 2014 an de,

navenda Mîtan a çandeya Kurdî, bi alîkariya gurûpek ji çalakvanan, damezirand û rêveberiya wê kir ta dawiya sala 2017an. Wê navendê pir çalakî kirin, lê ya balkêş pirtûkxaneyek avakir, ku ji 6500 pitûkî pêk dihat, û ew pirtûkxane kete bin xizmeta xelkên Heseke de, lê mixabin bi sedemin ne diyar hate girtin.

Ji sala 2020an de, destpêka meha avdarê, ji neçarî berê xwe daye Siwêdê, li bajarokê Sodirhamn bi cih bûye û niha ew û malbata xwe jiyana xwe lê berdewam dikin.



## Enwer Sofî

Enwer Sofî, di sala 1942yan de, malbata wî ji bakurê Kurdistanê, ji gundê Xirabê Şêref ya girêdayî navçeya Hezexê, derbasî Rojavayê Kurdistanê bûne û li bajarê Dêrikê cih girtine. Ew bixwe ji eşîra Meman e.

Di sala 1947an de, malbata wî derbasî başûrê Kurdistanê, li gundê Zimara nişteçî bûne. Di sala 1950î de, li wî gundî jidayik bûye.

Di sala 1954an de, cardin berê xwe dane bajarê Dêrikê û li wir nişteçî bûne. Xwendina seretayî û navîn û amadeyî li Derikê, li dibistana Yûsiv Ezemê qedandiye.

Sê salan mamostetî kiriye, di kolîjeya beşê Mafnasiyê de, li Şamê du salan xwendiyê û di maliyê de, di beşê jimêryarê de, kar kiriye. Jiber ku icaze/rêdan ango navber nedidan wî, wî devjêberdana xwe daye û dev ji kar berdaye.

Di sala 1972yan de, ji ber ku zimanê Kurdî qedexê bû, wî bi zimanê Erebî dest bi helbestê kiriye. Lê di sala 1975an de, dest bi helbeta zimanê Kurdî, ango zimanê dayikê, kiriye.

Di sala 2004an de, dest bi helbesta welatparêzî û neteweyî kiriye.


Enwer Sofî bavê şêrgo, yek ji endamên Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, şaxê Dêrikê ye.

### **Berhemên wî yên çapkiri ev in:**

- 1- Ronahî, di sala 2014an de, li Dêrika Hemko hatiye çapkirin.
- 2- Birusk, di sala 2016an de, li Dêrika Hemko hatiye çapkirin.
- 3 -Qevde serhatî, di sala 2017an de, li Dêrika Hemko hatiye çapkirin.
- 3- Deşt û zozan, di sala 2018an de, li Dêrika Hemko hatiye çapkirin.
- 4- Gelewêj, di sala 2019an de, li Dêrika Hemko hatiye çapkirin.
- 5- Çerxa bîst û yekê, di sala 2021an de, li Dêrika Hemko hatiye çapkirin.
- 7 -Rewşa Kurd (Li ber çapê ye)
- 8- Welatê min (Li ber çapê ye).

Ev berhem li her çar parçên Kurdistanê, û li deverên din hatine belavkirin. Gelek kar di Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê de kirine, Mînak: Şevbuhêrkên helbestan û çalakiyên wêjeyî.

Mamoste Enwer fêrî gelek zimanan bûye mîna Firensî, Erebî û Tirkî. Hin helbestên wî hene ku bi çend zimanan hatine çapkirin, Mîna: Farisî, Firensî, Hindî, Tirkî, Eberî û Siryanî.




## Evdî Çaço

Navê wî di nasnameyê de ( EBDULAH HUSÊN XELEF ) e, xelkê deverên ew lê dijî, bi navê (Evdî Çaço ) yan (Evdîyê Buşra), dinasin. Di sala 1960î de, li gundê (Toramîş) yê raserî rûbarê ava mezin, hatiye dunyayê. Di jiyê çarsalî de, wan barkir û ew li gundê (Quldîman) şênî bûn, û her di wê salê de bavê wî çû ber dilovaniya Xwedê û zaroktiya wî bi xwe re bir.

Xwendina binretî li gund, û ya seretayî û amadeyî (bekelorya), beşê wêjeyî li bajarê (Dêrikê) biserî kir. Hez û xewna wî bû ew biçûya (kolîja Hunerên ciwan), lê ji ber ku ew birayê mezin bû, û ji ber rewşa wan a taybet, pêdivî bû ew li wir raweste û dest bi kar bike, û bibe malxwêyê malê (semyan).

Her li gund û di malê de, wî xwe fêrî xwendin û nivîsîna zimanê Kurdî kir û çî pirtûka bi dest wî ket xwend, bi taybetî yê helbestvanan: (Cizîrî, Cegerxwîn, Sebrî Botanî, kovan).. h.d. Ji nav hemî corên wêje bihtir wî ji helbestê hez kir.

Destpêka nivîsînê, hineke hewldanê nivîsîna helbestên kevneşop, rêzbend û çîrokên kurt bû. Niha jî, hinek hewldanên nivîsîna helbestên nûjen dike. Tu berhemên wî çapkîrî nîn in, tenê destnivîs in, û carcar di hinek kovar û rojnameyan de belav bûne, mîna: (Zengil, Zevî, Jîn, War, Peyv).. h.d. Hîn ew hewil dide helbesteke hêjayî û layiqî bejna hunera helbestê binivîse.



## **Evîndarê Xemgîn (Mehmûdê Sebrî)(1937-2023)**

Nivîskar û helbestvanê Kurd Mehmûdê Sebrî (Evîndarê Xemgîn), di sala 1937ê de, li gundê Çetela Kîkan, ê bi ser devera Dirbêsiyê ve, li parêzgeha Cizîrê (Hesekê) dikeve, jidayik bû. Zarokiya xwe li gundê Melek, ji devera Dirbêsiyê, derbas kiriye. Li vî gundî û heft gundên hawîrdor jî, dibistanên fermî nebûn, û bi vê egerê Mehmûd, di heftsaliya xwe de, li nik melayê gund fêrî Qur'ana pîroz bûye.

Paşê 8 - 9 salan li nik melayên Kurd li Cizîrê, zanîna oldariya Islamî û rêzimanê Erebi xwend; di vî warî de, têgihîştina wî ya zanistî berbiçav bû. Di sala 1960î de, bi alîkariya seydayê xwe mela Ebdulla yê Qertimînî, du mehan li dibistana malbata Xeznewî ya navendî xwend, bi hêviya ku karibe dakeve ezmûna bawernameya navendî, çikû bawernameya qonaxa seretayî bi wî re nebû, ewa ku merc bû ji bo ezmûna navendî. Di meha Çirya pêşîn de, ji sala 1960 î, şewata sînema Amûdê rû da, û sedên zarokên Kurd lê hatin sotin, di vê komkujiya ku gelek gumanên gunehkariya desthilata Sûrî tê de hebûn.

Mamoste Mehmûdê Sebrî û hin hevalên xwe, û tevaya Kurdên azadîxwaz, hêrs bûn di wê rûdana diltezîn de, û Mehmûd û hevalên xwe civînek bi dizî lidar xistin, û di wê de desthilat tawanbar kirin.

Şêx Izeddînê Xeznewî nûçeya wê civîne bihîst. Diyar e ku bi wê tûre bûbû. Piştî du rojan qasidekî wî bi Mehmûd da zanîn ku ew bi navê dibistana wan nikare dakeve ezmûna navendî.

Ew naçar bû vegeriya mala xwe, û bi xwendina azad û koşanên xwe yê taybet, daket ezmûna navendî ya fermî, bi mercê ku di her sê polên navendî



de ezmûnê derbas bike, çikû bawernameya qonaxa seretayî linik wî nebû. Ewî ezmûn bi serkeftin pêşkêş kir, û bawernameya navendî ya fermî di sala 1961ê de wergirt.

Piştî wergirtina navendiya fermî, Mehmûdê Sebrî bû mamostayê şiwînkar, sê salan li Parêzgeha Dêrazorê, ji ber ku ew kar li Cizîrê bi dest wî neket, bi hoyên şofînî. Herwiha, da pey xwendina qonaxa duwemîn, û bi awayê azad ezmûna herdu polên pêşîn ji qonaxa duwemîn bi serkeftin derbas kirin.

Di sala 1965an de, bawernameya qonaxa duwemîn (Bekelorya) wergirt.

Piştî wergirtina Bekelorya û karê sê sal mamostayê şiwînkar, Mehmûd ezmûna mamostayê fermî (polê Taybet) li amojgeha (peymangeha) Şamê, bi serkeftin derbas kir, di sala 1966 an de.

Paşê, Mehmûdê Sebrî dest bi xwendina bilind li zankoya Şamê kir, li beşê mafnasî û yasayê, û di sala 1970yê de, bawernameya Lîsans wergirt. Di sala 1971ê de, li peymangeha pilandanînê, ya neteweyên yekgirtî, dest bi xwendina diploma geşepêdana abûrî û civakî kir. Û di sala 1972yan de, bawernameya wê wergirt.

Nivîskar û helbestvanê Kurd Mehmûdê Sebrî endamê komîta birêvebirina govara Xunav bû, û nivîskarekî wê yî sereke bû, û 18 hejimar ji vê govarê pêk anîn.


Mehmûdê Sebrî endamê komîta amedekar ya mihrecana rista Kurdî li Sûriya ye, û hem endamê komîta rexnekariya ristên ku di wê de têne pêşkêş kirin bû.

Mehmûdê Sebrî ji sala 1959an ta sala 1997an, di nav rêxistina azadiya Kurdî de, derbas kir, û di 25 salan ji wan de, di komîtên pileyên bilind de kar kiriye. Di roja 18/07/2023an li bajarê Hîsiça, li Rojavayê Kurdistanê mir.

Ji xêzana Mehmûd ya taybet, hevîna wî çûye ber dilovaniya Xwedê, du keç û du kurên wî Diktorên nojdar in, kur û keçek wî endazyar in, û du keçên wî bi bawernameya lîsansa Firensî û Erebrî fêrkar in. Hêjayî gotinê ye ku mamoste Dilawerê Zengî piraniya berhemên wî çapkirine.

### **Berhemên Mehmûdê Sebrî yê çapbûyî ev in:**

- 1-Nigarên kul û derdên jîyanê (helbest)1996.
- 2-Nerînek di terazû ya ristên Kurdî de (vekolîn)1997.
- 3-Geştekan li nav baxê ristên Cizîrî (beşê yekem)2000.
- 4-Hin hest û ramanên netewî û civakî 2002.
- 5-Geştekan li nav baxê ristên Cizîrî (beşê duyem)2003.
- 6-Doza giran û umîd û xwezga yê tevlihev (beşê yekem) helbest 2006.
- 7-Doza giran û umîd û xwezgayê tevlihev (beşê duyem) helbest 2007.
- 8-Nasnameya Kurdî li sûrya (vekolîn) 2011.
- 9-Cengên xaçparêzî û şikodariya berevaniya Kurdî (vekolîn)2013.
- 10-Salixên merd û zîbayên Kurd (helbest)2017.



## **Ferhadê Çelebî (1961-2004)**


Nivîskar û helbestvan Ferhadê Çelebî di sala 1961ê de, li bajarê Amûdê hatibû dinyayê. Xwendina destpêkê li Amûdê bi dawî anîbû. Di sala 1985an de xwendina xwe di zanîngeha Şamê, fakulteya abûriyê de biserî kiribû. Gotar, helbest û çîrok nivîsandine, û wergerandin jî kiriye. Endamê komîta navendî ya (Partiya Demokrata Pêşverû Kurdî li Suriyê) bû. Yek ji du xwediyan kovara (Zanîn) bû. Yek ji serperîştê kovara Buhar bû. Yek ji berpirsiyarên kovara (Gulistan) bû, ya ku Seydayê Cegerxwîn ji sala 1968an ve diweşand. Roleke wî ya berbiçav di komên folklorî yên Kurdî, hem jî di aheng û festîvalên Kurdî de hebû. Di gelek mihrecanên helbesta Kurdî de, li Efrînê û li Qamişloyê, hevpar bû. Du xelat wergirtibûn: Xelata Xanî ya rewşenbîrî li Helebê, 1994, û xelata Mehrecana Helbesta Kurdî, 2002.

### **Ji berhemên wî:**

-Helbesta Kurdî (Nerînek taybetî). -Kovarên Kurdî yên qedexê. -Yara min.

Ligel çend destxetên wî yên ku nehatine çapkirin, û dîwanek helbestên helbestvanê Erebi Riyad Salih Elhîsên ji Erebi wergerandiyê zimanê Kurdî.

Ew di roja 31/10/2004an de, di rûdanek tirafîkê de, mir. Li goristana Şermola, li bajarê Amûdê hat veşartin.



## **Ferhadê Içmo (1960 - 2017)**

Ferhadê Içmo di 15/12/1960î de, li bajarê Qamişlokê hatiye dinyayê. Li dibistanên bajarê Qamişloyê xwendina xwe bi dûmahî aniyê.

Di sala 1984an de, bawernameya bakaloryos di endazyariya şaristaniyê de, ji zaningeha Helebê wergirtiye. Berî helbestê, kêfa wî ji muzîkê re dihat û di sala 1970yî de, dest bi lêdana tembûr û gîtar û cumbişê kiriye. Lê, di 29ê tîrmeha 1978an de, helbesta xwe ya pêşî bi navê “Ey Zeman” nivisandiyê.

Di piraniya kovar û rojnameyên Kurdî de, helbestên xwe weşandine û nêzîka 50 helbestên wî bi dengê Mihemed Şêxo, Beha Şêxo, Adilê Hiznî, Selahê Osê, Ismaîl Cuma, Gulistan Sobarî, Şeyda, Sefqan, Îtidal, Hozan Derwîş, Şad Xalidî, Ednan Seîd û Xelîl Xemgîn... bûne stran.

-Di sala 2006an de bû endamê PENa Kurdî.

-Di sala 2005an de xelata Dr. Nûridîn Zaza wergirtiye.

-Di sala 2012an de xelata mihrecana helbestê wergirtiye.


-Di sala 2013an de xelata Cegerxwîn wergirtiye.

Helbestvan di 8/6/ 2017an de li Qamişlokê çû ber dilovaniya Xwedê.

### **Berhemên wî ev in:**

- *Lêmişta Zozan*, 1988, helbest
- *Piştî Çi*, 1995, helbest
- *Evîna te*, 1998, helbest
- *Landik I*, Helbestên zarokan, 1998
- *Pelên Sipî*, 2000, helbest
- *Landik II*, 2001, helbest
- *Qîrîna yekemîn*, 2005, helbest
- Kurdistan, helbest
- Sed gulên sor, helbest
- Delal, 2016, helbest û lêkolîn
- Lê.. 2016, helbest
- Kêlên goristana min, helbest
- Sed alên sipî, helbest
- Razên jînê, helbest
- Dara mirada, helbest
- Mîrê mişka, çîrok

Hêjayî gotinê ye ku hemû berhemên wî di du pirtûkan de bi navê  
(Berhemên Giştî 1-2) hatine berhevkirin û civandin, çapxana Emîn, 2021  
Qamişlo.



## Ferîd Cizîrî

Helbestvan Ferîd Cizîrî navê wî Ebdilferîd e, kurê seydayê Mele Ibrahîmê Golî ye, di sala 1933yan de, li gundê Sinceqê hatiye dunyayê, paş re li Gundê Gi'êd malbata wî bicî bûye.

Bavê wî Mele Ibrahîmê Golî gelek rêz dida xwendin û zanistê, ji feqên mele Ubeydulah bû. Piştî ku mele Ubeydulah çû ser dilovaniya Xwedê, li cem birayê wî mele Fethullah xwendina xwe bi serî kir û îcaza feqîtiyê bidest xist. Dema ku Mele Ibrahîmê Golî li gundê Sêmitkê Newaf meletî fikir, Seydayê Tîrêj salekê, kême zêde, li cem wî dixwîne, Tîrêj behsa wî di dîwana xwe de kiriye û gotiye : "Ez bi xêra mele Ibrahîmê Golî bi ser ketim".

Bavê Ebdilferîd Cizîrî gelekê hez dikir ku lawê wî bixwîne, rabû ew şande cem xalê wî mele Ehmed li gundê Gir Meyir, lê mixabin ji ber nexweşiya xwe wî nikarîbû xwendinê berdewam bike. Hîn ew sêzdeh-çardeh salî bû, li dora pênc-şeş mehan li nexweşxaneyekê li Libnanê ma, paşê zîvirî gundê xwe Gi'êd, du meh tê re derbas nebûn, bavê wî koça dawî, kir sal 1948an bû. Lê belê, koçka wî (Hucre) vekirî ma û mele Ebdilrehîm şûna wî girt. Li wê koçkê civata feqan digeriya, bi taybet êvarên Înan, helbestên Cizîrî, Xanî û Cegerxwîn lê dihatin xwendin.

Ferîd Cizîrî di sala 1957 de, dest bi nivîsandina helbestê kir. Di wê demê de, bîst û çar salî bû.

Di sala 1959an de, ji gund têye bajarê Hisiça û ta îro li wir bicih dibe û dijî.

Di salên 1963-1964an de, hate girtin û bi tawana damezirandina partiyek Kurdî ku dixwaze welat parçe bike, sê salan seza bû; lê bi biryareke lêborîna giştî hate serbestberdan. Lê mixabin, gelek helbestên wî ji hêla rêjîma be'is ve hatin desteserkirin.

Dîwanek wî bi navê (Dîwan û rûpelin ji toreya serhildanê) hatiye çapkirin. Ji weşanên Şilêr, Qamişlo, çapxana Beyan, 2022.



## **Ferîd Xelîl**

Ferîd Xelîl, bi navê Ferîd Mîtan tê naskirin. Qamişlo, Rojavayê Kurdistanê  
Dîroka jidayîkbûnê: 1995. Xwendin: Enstîtûya Zanistên Perwerdeyê

### **Karên berê:**

- \* Sernivîserê Ofîsa Ragihandinê ya Desteya Parastinê
- \* Sernivîserê Beşê Kurdî yê Dezgeha Bûyerê ya Ragihandinê
- \* Amadekarê War.Tvyê

### **Karên niha:**

- \* Berpîrsê Komîteya Ragihandinê ya Saziya Zimanê Kurdî (SZK)
- \* Edîtoriya berhemên Kurdî û wergera ji zimanê Erebî bo Kurdî

### **Berhemên wergerandî:**

Textê Peqlaweyê yê Xemgîn, Nebîl El-Elmulhim, Weşanên Navenda  
Mezopotamyayê

### **Tîpguhêzî**

Şevên Çileyî, Evidrehman Bamernî, Weşanên Neqşê

Ziman: - Kurdî: Pir baş e - Erebî: Baş e





## Fethulla Huseynî

Di sala 1970yî de, li bajarê Dirbêsiyê jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û lîseyê li dibistanên bajarê xwe biserî kiriye. Paşê peymangeha waneder, beşê zimanê Erebi dixwîne. Lê piştî sê mehan tê qewitandin bi gunehbariya "Xeter li ser ewlekariya dewletê". Ji wir diçe û tevî Zanîngeha Hiqûqê, li Zangoya Helebê dibe.

Di gelek rojname û kovarên Kurdî û Erebi de nivisandiyê. Aniha jî serokê HRRKê li herêma Kurdistanê ye, û goşeyek wî ya heftane bi navê "Ji Rojava" di rojnameya Kurdistanî Niwê de heye. Bêhtir bi karê siyasî ve mijûl e.

### Pirtûkên wî bi zimanê Kurdî:

- Kişwera şehîdan – Qamişlo.
- Firyada li hevdayî – Şam.
- Ayetên Dojehê –Beyrût.
- Şoreş vanekî sûrî –Duhok.

### Pirtûkên wî bi zimanê Erebi:

بالعربية: خرائط \_ بيروت طريد لا محالة \_ نيقوسيا مهدور كدم \_ دبي إمبراطورية الخديعة \_ هولير أسئلة الشعر \_ بغداد

Niha li Silêmaniyê dijî.



## Fewaz Ebdê

Nav û Paşnav: Fewaz Ebdê Silêman

Jidayikbûn: Qamişlo / Sûriye 25.12.1961

-Li gundê Neqare yê ser bi Qamişloyê hatiye dinê. Dibistana seretayî li gund, dibistana navîn û amadeyî li Qamişlo xwendiyê û zimanê Erebî li zanîngeha Şamê xwendiyê.

-Çîrok û helbestên wî di piraniya kovarên Kurdî yên li Sûriyê û Kurdistana Iraqê de, hatin weşandin.

- Di sala 1987an de, bi komê hevalên xwe re şanoya Kurdî ya gerok li Sûriyê ava kir.

-1992 berhemek kurteçîrok bi navê (Xewaro) li Şamê çapkir.

1992 – Endamê desteya weşanê ya kovara Stêr ku bi zimanê Kurdî derdiket.

-1995 xelata koma Xanî ya çîrokê wergirt.

-2001 romana Laleşê Qaso "Xezeba Azadiyê" ji Kurdî wergerandiye Erebî.

-2003 du berhemên nivîskar Ferat Cewerî "Romanseke çilmisî" û "Kevoka sipî" wergerandin Erebî.

- 2007 romana Helîm Yûsif "Tirsa bê diran" ji Kurdî wergernd Erebi.
- Ji sala 2011ê ve, endamê Komela Subartu ya ku guhdanê bi dîrok û kelepûra Kurdî dike.
- 2011 pirtûka Mîdya Mehmûd "Tundî dijî pîrekê" ji zimanê Erebi wergerand zimanê Kurdî.
- Di sala 2013an de, pirtûka Heznî Haco ya bi navê "Tê bîra min" ji Kurdî wergerand zimanê Erebi.
- Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriyê - Şaxa Qamişlo, sala 2014
- 4/3/2014 ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriyê xelata Rezo Osê wergirt.
- 2014-2015- Li ofîsa Mêrdînê ya Hikûmeta Demkî ya Sûriyê, di danîna rêbaza fêrkirinê (Zimanê Kurdî) de, kar kir.
- Di meha dawî ya sala 2015an de, koçî Almanyayê kir.
- 1984-1990 di koma Xelat a folklor û huner a Kurdî de wek lîstikvan, amadeker û wergêr xebat kir, û yek ji beşdarên yekemîn pêşandana şanoya Kurdî ya gerok "Birîna Reş" bû. Hejmarek ji şanoyan ji zimanê Erebi wergerand zimanê Kurdî. Ji wan çend şanoyên nivîskarê Îraqî Yûsif Anî û çendek ji yên Ehmed Isma'îl jî.
- Hilbijartinek ji helbestên Riyad El-Saleh El-Husên bo Kurdî hate wergerandin / neçapkirî ye.
- Berhevoka çîrokên nivîskar Mihemed Elî Kut wergerandiye Erebi/ neçapkirî ye.
- Helbesta helbestvanê filistinî Mehmûd Derwîş ya ko diyarî wêjevanê Kurd Selîm Berekat kiriye, wergerandiye zimanê Kurdî.



## Fewaz Osê

Di sala 1970yê de, li gundê Dekşûrî ku girêdayî navçeya Tirbesipiyê ya girêdayî herêma Qamişloyê ve, ji dayîk bûye..

- Xwendina xwe ya seretayî li dibistana gundê Dekşûrî berdewam kiriye, piştî re ya amadeyî û navîn li dibistanên bajarê Qamişlo bidawî kiriye.

- Di sala 1989an de, bawernameya Navîn ya giştî (Bekalorya) wergirtiye.

- Peymangeha amadekirina mamosteyan li bajarê Qamişlo xwendiyê, û di sala 1991ê de derçûye.

- Li gelek dibistanan ders daye, li Til Hemîs û Borûcî 1991ê, Dekşûriyê 1996an ta 2014an, û Ehmed Sebrî û Quteyba ji sala 2015an heta 2017an ku piştî xizmeta 28 salan di mamostetiyê de dest ji kar berda.

- Di pêvajoya jiyana xwe de, pir ji nivîsandinê hez kiriye û pir pê re mijûl dibû, ji helbestvan Nizar Qebbanî û El-Cewahirî re dixwend û xwendina pirtûkan tenê meyla wî bû, nemaze pirtûkên wêjeyî.

Di lîseyê de dest bi nivîsandinê kiriye, lê nivîsên xwe ji xwe re hiştin, beşdarî civînên edebî yên wek helbest û çîrok, semînerên edebî û festîvalên helbestan dibû û gelek gotar di gelek rojname û kovaran de nivîsandin.

Di destpêka xwe de heta sala 2011an bi Erebi dinivîsand, paşê guhdan li nivîsîna bi zimanê dayikê kir.

Ji pirtûkên wî yê çapkirî, dîwaneke helbestan 2014 bi zimanê Erebi bi navê "Hewacis Elyasemîn" anku Gumanên Yasemînan, û pirtûkek din bi zimanê Erebi bi navê "Kelimat Miftahiye" anku Peyvine kilîtî, ew bi xwe berhevokek gotarên civakî ye ku rastiya îroyîn dişopîne û şîrove dike. Herweha dîwanek bi zimanê Kurdî 2021 bi navê "Hêviyên Hebûnê" ye. Dîwanek bi zimanê Erebi jî niha li ber çapê ye, û projeyek nivîsandina romaneke bi zimanê Kurdî jî heye.


Ji damezirandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê, di sala 2013an de, endam e.

Endamê desteya rêveber ya Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriyê, di sala 2014 û 2015an de.

Endamê desteya serokatiya Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê ya sala 2022 û 2023.

Rêveberê Bernameyan li Rêxistina Aştiyê ya avakirina Aştiyê.

Çalakvanek sivîl e ji sala 2013 heta niha.




## Fewziya Qiço

Fewziya Qiço di sala 1953yan de, li bajarê Amûdê jidayik bûye, wek gelek keçên wê demê , ew qet neçûye dibistanê. Lê piştî mêkir, wê di sala 1972yan de, bi alîkarî û piştgiriya hevjinê xwe, Brahîmê Qiço fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe yê Kurdî bû.

### **Berhemên wê yên çapkirî**

1- Bîranînên Jineke Kurd, çapxaneya Şivan, Silêmaniyê, Kurdistan, Iraq, 2022



### **Feydullah Xeznewî (1956-2023)**

Roja sêşemê 25.07.2023ê.z, helbestvan û zimanzanê Kurd “Feydullah Xeznewî” yê ku bi nasnavê (Pêt) û (Homend Hadar) dihat naskirin, di temenê 67 saliya xwe de, di encama kirîza dil de, li Fransayê koça dawî kir.

Dr. Feydullah Xeznewî, di sala 1956an de, hatiye dunyayê, ji malbata “Xeznewî” ye, ku li seranserê Kurdistanê tên naskirin. Bavê wî Şêx “Qutbeddîn” kurê Şêx “Necmeddîn Xeznewî” ye. Ew, li gundê Til Ma'arûf li Tekya Xeznewî mezin bûye. Pêşî fêrî fiqh û bingehên olê bû. Paşê wêjeya Îngilîzî xwendiyê û ji zanîngeha Helebê bawername wergirtiye. Ji nû ve careke din lîseyê dixwîne û bawernameya pizîşkiya mirovî werdigire û li zanîngeha Şamê pisporiya “texdîr”ê diqedîne.

Dr. Feydullah Xeznewî dildarê wêje û zimanê kurdî bû. Di xortaniya xwe de, bi gelek rewşenbîr, nivîskar û zimanzanên kurd re didaûdistend wek helbestvanê mezin Mela Nûriyê Hesarî. Her wiha gelek hiqûqnasên olî, ziman û zanistên din ên ji Bakurê Kurdistanê ku serdana tekya Xeznewî dikirin, nas dikir.

Ji ber sitem û zordariya çewisandina dezgehên ewlekariya Sûriyê jê re; Rehmetî di sala 1988an de koçî Fransa dike û li wir li zanîngeha Sorbonne û Enstîtuya Inalco bi gelek zimanzan, rojhilatnas û zanayên zimanên kevnar re nas dike.

Di Enstîtuya Kurdî ya Parîsê de mamostetiya zimanê Kurdî kir, di warê wêje û zimanê Kurdî de gelek tişt nivîsand.

Xeznewî di salên jiyana xwe de li Tirkîye, Elmanya û Fransayê ku hemwelatîyê wan bû, pêwendîya xwe bi wêje û zimanê kurdî re domand. Bi çend zimanan şareza bû, wek: "Îngilîzî, Fransî, Erebî, Kurdî, Spanî, Farisî, Almanî û Tirkî."

Di xortaniya xwe de dest bi nivîsandina helbestê kiriye û ji gotinên wî hunermendê nemir Mihemed Şêxo stranek "Xalxaloka çema" û "Ay Bilbil" got.

Û hunermendê mezin Ciwan Haco, strana: "Bilûra min", û "Çeto yekî rind e".

Hunermend Baha Şêxo, strana: "Buhîşt di lêva de", "Min jê xwest".

Hunermend Mihemed Emîn Cemîl, strana: Loma şeva min tarîye"

Koma Armanc strana: "Bilbilo", "Hewara ez çûm bi erdê de", "Ez gihîştim Qamişlokê.

Hunermend Ebdilkader Silêman jî ji bo wî strana "Buhîşt di lêva de" got.

Hunermend Cemal Terij, strana: "Silavên dila", ji bilî albûma stranî ya hunermend Zorro Said Youssef.

Cendekê wî ji Fransa veguhestin bajarê Batmanê bakurê kurdistanê li goristana malbata Xeznewî hate veşartin.





## **Fîxan Hîmo**

Navê wî Şahir Telal Mihemed e nasnavê wî Fîxan Hîmo ye, di sala 1981ê de, li gundê Hîmo yê girêdayî bajarê Qamişloyê hatiye jiyânê, ew ji êla Şêxiya ye. Xwendina xwe ya seretayî li Hîmo û ya navîn li Qamişlo xwendiyê.

Fîxan di bîstsalîya xwe de dest bi nivîsandinê kiriye, sê dîwanên wî hene û hin gotar û lêkolîn, di derbarê wêje û çanda kurdî de nivîsandiyê. Ji hêlekê din ve Mûzexaneyek ji amûrên kurdî yên gelê kurd di gelek qonaxên dîrokî re bikar anîne, tevî lêgerînekê di derbarê têgeh û navên resen yên ku gelek jê di dema me ya îro de nema tînin bikaranîn an ku ber bi windabûnê ve diçe.

Xwendin: Derçûyê Zanîngeha Rojava, beşê ziman û wêjeya kurdî. Zanîngeha kurdolojî online.

Karê ku wî kiriye :

Vekirina dibistana yekemîn a zimanê kurdî li gundê Hîmo, di sala 2012an de.

Yek ji damezirînerê saziya zimanê kurdî li Rojavayê Kurdistanê.

Yek ji damezirînerê Dîwana wêjeyê li Rojavayê Kurdistanê.

Yek ji damezirînerê yekîtiya rewşenbîran li Rojavayê Kurdistanê.

Amadekirina biranşê wêje yê dibistanan refa 10. 11. 12 an

Mamoste li Akademiya Ş. Egîd Cîlo yê biranşanên kurdî.

Pêşkêşvanê bernameya bîrdanka wêjeyê Rojava.Tv

Hîna ji temenekî piçûk ji ber sedemên ramiyarî ew koçberî gelek welatan bûye, mîna: S'ûdiyê Erebestan, Libnan, Ordin, Turkî, Yûnan û ... hwd. Bi destpêkirna kirîza Sûriyê, zîviriye welat û niha jî mamostê wêjeya kurdî ye li Akademiya Ş.Egîd Cîlo.

### **Berhemên wî yê çapkirî ev in**

-Birînên min nema têşin, helbest, weşanxane Şilêr, Qamişlo, 2017

-Wêneyên min î şewitî, helbest, ji weşanên Dîwana Wêjeyê, 2017

-Tehto pelo, helbest, ji bo zarokan, bi alîkariya Help kurdistan hatiye çapkirin,2018



## Gewher Fetah

Li bajarê Qamişlo hatiye dunyayê. Li wir xwendina destpêk, navendî û lîseyê, beşê wêjeyî, bi dawî aniye. Di pey re, li zanîngeha Şamê, beşê Tore û Edebiyat û Zimanê Ingilîzî di 2011ê de, xwend û biserî kir. Li dibistanên bajarê Şamê, Qamişlo û Duhokê waneyên Ingilîzî dane, û bi awayekî kesane jî. Piştî kirîzeya Sûriyê, berê xwe da Başûrê Kurdistanê û wekî çalakvaneke civakî kar dike. Di komîteya kovara Herdê de dixebite.

### **Berhemên wê ev in:**

- "Strana dawî ji tîpa helbesta min î yekem", ji hêla weşanxana Sersera li Berlînê, 2020 hatiye çapkirin.

- "Yazdehok", du caran hatiye çapkirin, carekê ji hêla weşanxana Sersera, 2019, û cara din ji hela çapxana Avêsta li bajarê Amedê, 2020.



## **Gulal Kasañ**

Navê wî Gulal Hesên Hussên e; di sala 1968an de, li gundê Sogiya, li herêma Tirbesipiyê jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gund bi dawî kiriye, ya amedehî û navendî li bajarê Tirbesipiyê qedandiya. Li bajarê Şamê xwendina Amojgeha Xezil bi dawî kiriye, li bajarê Helebê Beşê yasayî, xwendiyê, û li bajarê Heseke bîcîh bûye, ta sala 2015an. Paşê çûye bajarê Qamişlo, û li wir nişteci dibe.

-Di sala 1984an de, li bajarê Tirbesipiyê tevî Koma Stêr a folklorî bûye, beşê dîlanê - ta sala 1990î, piştî ku bawernameya Bekeloriya wergit, çûye bajarê Şamê û li wir tevî Koma Kawa bûye, ta sala 1993yan.

-Di sala 1985an de, tevî partiya Yekîtiya Gelêrî Kurdî li Sûriyayê bûye, ta sala 1994an, paşê di nav Serkirdeya Hevbeş, a ku ji 3 partiyan pêk dihat, û karê xwe yê siyasî berdewam kiriye ta 2013an.

-Di sala 2017an de, dest bi xwendina bilind li Zanîngeha Helebê, beşê yasayî kiriye, lê di sala dawî de (sala 4), û ji ber sedemên ewlekariyê, xwe veguhestiyê Zanîngeha Feratê û li wir xwendina xwe bi dawî kiriye, û di sala 2013an de, bawername standiyê.

-Di sala 2015an de, dest bi karê parêzeriyê kiriye, û ta niha berdewam e.

## **Berhemên wî ev in:**

1-Azadî ( Helbest)

2-Reseniya Kurdan û heyîna wan a dîrokî li Rovatyê Kurdistanê( Bi zimanê Erebi) Çapkiriye.

3-Rola Turkan di kêşeya Kurdî de ( lêkolîn) destnivîs e.

4-pêvajoya Kurdan a dîrokî ( Çapkiriye).

5-Dîwaneke helbestî heye( destnivîs e).

6- Afsane di keleşorê Kurdî de ( destnivîs e).

## **Kar û xebata ragihandinê**

1- Ji sala 2017an ve dest bi kar û xebata ragihandinê kiriye.

a-Radiyoya One Fm, ji sala 2015an ta sala 2018an.

b-Radiyoya buyer derdora Du salan, ji sala 2017an, dema Radiyoya One fm rawistiya bû, ta sala 2018an û di sala 2019an de jî, wî karê xwe cardî li Radiyoya Buyer berdewam kiriye.

c- Li Ronahî TV, derdora salekê kar kir.

g-Ji sala 2020an, meha 4 ta niha, li Rojava TV xebata xwe ya ragihandinê berdewan dike – Bernameya REWŞ Û BÎR .

h- Govar û rojnameyên Kurdî yê wî di wan de, gotar û vekolînên xwe belavkirine: Rojanemeya 'Kurdistan', Rojnameya 'Buyer',Rojnameya 'Ronahî', kovara 'Welat', kovara 'Nivîskar ' – Niha sernivîserê komîta kovarê ye.



## Gulistan Awaz

Gulistan Awaz, ji gundê (Ebo K'ebê) navçeya Cindirêsê - Efrînê ye.

\*Li sala 1982yan, li Helebê - Sûriyê jidayîk bûye.

\*Li sala 2013an, asta siyemîn a rêzimana Kurdî bi pileya baştirîn di Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê de, qedand. Li Efrînê dest bi fêrkirina hersê astên zimanê Kurdî di mala /Zanîn/ de, li gundê Celemê kir û bi sedan xort û keç, biçûk û mezinan fêrî zimanê Kurdî kirin.

\* Ji sala 2012an, dest bi nivîsandina Kurdî kir.

\*Hin gotar nivîsandin, û di hin kovaran, wek: (Pênûsa Azad), û malperên Kurdî de, hatin weşandin.

\*Li sala 2016an, li gel çend xwendekaran, di rêya êntêrnête re, fêrî beşê wêjeya Kurdî di warê helbesta kilasîk de, di riya peymangeha Bedirxan li bajarê Dêrka Hemko, bû û bawernameya serkeftinê wergirt.

\*Ew bi helbestên xwe beşdarî roja helbesta Kurdî dibe.

\*Li ahenga roja Zimanê Kurdî li navçeya Cindirêsê-Efrîn, 15. 05. 2016an, ji ber keda wê di warê fêrkirina zimanê Kurdî de, hate xelatkirin.

\*Ji sala 2017an, li gel malbata xwe li Almanyayê, li bajarê Bremen, bicih dibe.

\*Carina pêşkêşvaniya aheng û cejnan jî dike, wek (Ahenga Roja Rojnamegeriya Kurdî - Roja Zimanê Kurdî - Cejna Newrozê).

\*Carina lêvegerên vekîtî û zimanî ji pirtûkên nivîskarên Kurd re, berî werin çapkirin, dike.

\*Di warê ragihandinê de, hin kar û xebatên wê hene û bernameyek bi navê VEJÎNA RAMANAN ku, bi xwe hevdîtin li gel nivîskarên Kurd re ye, pêşkêş dikir.

\*Li bajarê ku lê dimîne, di Komela Civaka Kurdî ji bo Hînkari û Perwerdeyê – Hînkari, Bremen, de cîgera serokê komelê ye; û ev Komele, ji sala 2019an de, hatiye damezirandin.

\*Li sala 2019an, li gel hin mamosteyên Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî yên li Almanyayê bicih dibin, şaxek ji saziyê re damezirandin û ew bi xwe di komîta rêveberiyê de ye.

\*Ew carina waneyên fêrkirina zimanê Kurdî li hin komele û (Online) dide.

\* Pirtûkeke wê ya helbestan bi navê BUXÇIKA BIYANIYÊ ye, hatiye çapkirin, û ew amadebûna du pirtûkên din ( Roman- Helbest) ji bo çapkirinê dike.



## **Gulistan Sîdo**

Gulistan Sîdo: Ji Çiyayê Kurmênc- Rojavayê Kurdistanê ye.

Di 10. 6. 1979an de, li bajarê Helebê ji dayîk bûye. Ji Efrînê ji gundê Maratê ye, li bajarê Helebê mezin bûye. Xwendina xwe heya zanîngehê li wir qedandiye.

### **Bawernameyên bilind û erk û berpirsyartî:**

2003 : Xwendina bilind di wêjeya fransî de, Zanîngeha Helebê.

2007 : Master 2 di wêjeya fransî ya nûjen de, ji Zanîngeha Sorbonê. Paris III.

2012 : Rêvebera Yekîtiya Mamosteyan - şaxê Helebê.

2013 : Yek ji endamên damezirîner ên yekemîn Peymangeha Ziman û Wêjeya Kurdî (Ş. VIYAN AMARA) li Efrînê.

2014 - 2016 : Cîgira desteya perwerde û fêkirinê li kantona Efrînê. Endama komîteya wêjeyê SZK, Efrîn.

2019-2021 Cîgira desteya rêveber û berpirsiyara nivîsgeha têkiliyên derve ya Zanîngeha Rojava. Qamişlo.

2021 : Yek ji endamên damezirîner ên inîsyatîfa ekolojî li Rojava û bakur û rojhilatê Sûriyê (*Keziyên Kesk*).

2022: Xwendekara doktorayê li INALCO'yê, Peymangeha Neteweyî Ya Ziman û Şaristaniyên Rohilatî. Paris.



## Warên lêkolînê :

-Lêkolîn û xebatên zanistî derbarê teoriyên wêjeya devokî û nivîskî.  
Rêbazên lêkolîna wan. Warên hînkirin û lêkolînên derbarê zimanê dayîkê de.

-Berhevkirin, tîpguhêzî û wergera metnên wêjeyî yên devkî yên Kurdî ber bi zimanê fransîzî ve. Rêbazên analîzkirin û têgihîştina hunera derbirandina devokî.

-2009-2010 : Berhevkirin û tomarkirina zargotinê li Efrînê û Helebê.

Yek ji Çîrokên Pîrka Min, ku wê ji devoka efrînê wergerandî zimanê fransîzî.

Wê bi xwe wêjeya fransî li Helebê xwendiyê. Lîsans û xwendina bilind di sala 2003 de qedandiyê, û pişt re di sala 2007an de, li Sorbonê, mastera xwe derbarê wêjeya fransîzî ya nûjen de, qedandiyê. Ew vegehiyaye Helebê û ew weke mamosteya zimanê fransî dixebitî. Di salên 2009 û 2010 de, dest bi berhevkirin û tomarkirina zargotina herêma Efrînê kiriye, û li ba wê arşîvek heye. Ji xwe di nava malbatê de, axaftina bi Kurdî xaleke girîng bû û hezkirina wê bi taybet ji zargotinê re, bi saya bandora pîrka wê hatiye. Ew li ser çîrokên dê û bapîrên xwe mezin bû.

Pişt re, di sala 2011an de, şerê li Sûriyê dest pê kir, û ji wê demê heya niha, wê cihê xwe di nava kar û xebatên pêşxistina perwerdeya zimanê Kurdî li Heleb û Efrînê girtibû. Piştî ku Efrîn hate dagirkirin, ew koçber bûn, wê berê xwe da herêma Cizîrê (Qamişlo). Wê di Zanîngeha Rojava ku, di sala 2016an de hatiye damezirandin, erkê xwe weke cîgira desteya rêveber û di heman demê de, berpîrsiyara nivîsgeha têkiliyên derve dest pê kir.

-Endama ODM, « *Oralités du Monde* », Zargontinên Cîhanê « beşa Kurdî-kurmancî » :

Pênaseya ODM : Komeke ji lêkolîner û pisporên ziman û çandên cîhanî ku, di sala 2019an de hatiye damezirandin, pêk tê. Ev kom girêdayî Plidamê ye (Navenda lêkolînê ji bo Pirengiya ziman û nasnameyan, dîdaktîk, fêrbûn û veguhestinê), seroka vê ekîpê jî Prof. Urusula Baumgardt e, û ji gelek pisporên din pêk tê. Rêbaza lêkolînerî ya ekîpê xwe dispêre gelek displînan. Weke zimannasî « *Applied linguistics* », şayesadina zimanan bi armanca hînbûna wan, warê perwerde û fêrkirinê û zanistên civakî, cografîya siyasî, siyasîyên zimanî, teknolojîyên perwerdehiyê....

### **Sernava mijara têza doktorayê:**

« Les articulations de la littérature orale et écrite en Kurde : les représentations de l'identité et de l'altérité culturelles »

-الروابط بين الأدبين الشفوي والمكتوب باللغة الكردية : تمثيلات الهوية الثقافية والآخر.

-Pevgirêdanên Wêjeya Devokî û ya Nivîskî ya Kurdî, Nîşaneyên Nasnameyî û Cudatîyên Çandî.

Şêwirmend : Prof. Ursula Baumgardt

Hevpeyvîn:

1. Hevpeyvîn di kovara fransî « Contre Temps » 19 hezîrana 2021.  
« *Bâtir une université révolutionnaire au Rojava ?* »  
(*Avakirina zanîngeheke şoreşger li Rojava*)
2. Mêvana RFI radyoya fransî ya navnetewî. 15 gulana 2022.

### **Lêkolîn, nivîs û gotar:**

Nivîsên ramyarî û şîrove derbarê şoreşa Rojava de, û bi taybet şoreşa ziman û rola jinê: Di rojnameyên weke Ronahî, kovarên mîna Asoya Jinê, Rojhilata Navîn a Demokratîk û kovara Şermola a çandî û wêjeyî.

-بعيداً عن الشمولية و التوحيدية، الدبلوماسية الثقافية في روح آفا أنموذجاً

-« Wêjeya Devkî Di Çarçoveya Teyorî û Rêbazên Lêkolînê Yên Nûjen De »  
(Gulîstan Sîdo)


Herwiha, gotarên bi zimanê Erebî di rojnameya Misrî de Kenûz Arabiya  
كنوز عربية جريدة

### **Berhemên wê yên çapkirî ev in:**

Gotar bi fransî : (*Wêjeya devokî di serdema şer de Tecrûbeyê çîrokbêjîyê li herêma Çiyayê Kurmênc*).

Wergera şanoya fransî ya bi sernavê (*Montserrat*) ya Emmanuel Roblès ber bi kurmancî. Weşanxaneya Şilêr, Qamişlo.

-Xelata Saziya Frankonfoniyê ya li Helebê di 2005an de/ Xelata nivîsandina kurteçîrokekê bi zimanê fransî.



### **Hadî Behlewî (1948-2021)**

\*Helbestvan Hadî Behlewî di 16ê Gulana 1948an de, li Rojavayê Kurdistanê, li Qamişlo û li gundê Girzînê jidayik bûye..

\*Li gund xwendina xwe ya seretayî xwendiyê, û di sala 1962yan de, pola nehan navinçî li Qamişlo stendiye û ya amadeyî jî li Hisiça stendiye.

\*Ji 1965ê ve, dest avêtiye pê nûsê, da ku bi herdu zimanên Kurdî û Erebi helbestê binivîse.

\*Di sala 1967an de, li zankoya Helebê, koleja zimanê Erebi xwendiyê.

\*Di sala 1969an de, li dibistanên seretayî mamosteyî kiriye.

\*Ji sala 1980 - 2004an, li dibistana Qadisiyê mamosteyê zimanê Erebi bû.

\*Di sala 2010an de, ew tûşî êşa Şekir hat, û roj bi roj, êş lê giran bûbû ta giha bînahiya herdû çavên wî winda bû. Rast e ew bi êşa korbûnê re di kêferat û nakokiyê de bû, lê tevî weha jî, tariya dîtinê nikaribû wî ji afirandin, wêje û karê civakî dûr bixistana. Hêjayî gotinê ye ku, mamoste Dilawerê Zengî bi pê nûsa xwe, bi dema xwe û li gelek cihan bi deravên xwe jê re

piştêgêr bû, karîbû di rewşek weha de, bêhtirê helbestên wî ji devê wî werbigirta. Çi rasterast û çî di riya telefonê re be.

\*Bi dehan ji helbestên Hadî Behlewî bûne sitran, û hunermendên wekî: Se'îd Gabarî, Beha Şêxo, Adil Hiznî, Hisên Bavê Azad û Selah Resûl helbestên wî bi awaz kirine û sitrane.

\*Helbestvan Hadî Behlewî di geştê nivîskariya xwe de, "Xelata Mele Ehmedê Palo" di salvegera wî ya duyemîn de wergirtiye.

\*Hêjayî gotinê ye ku, li vê dawiyê çend xelat pêşkêşî wî bûn, lê ewî lêborîn xwest û ji destên wan aliyan/kesan tiştêk wernegirt.

\*Di 18/08/2021ê de, demjimêr 9ê sibê, li bajarê Qamişlo koça dawîn kir.

\*Sê berhevokên Hadî Behlewî yên helbestan hene, yek bi navê:

-Dîwana yekem: Wê Sibe Bê, Beyrût-Libnan, Sal 2002

- Dîwana duyem: Ji Dil, Qamişlo, sal 2017

- Dîwana siyem: Ristek Janên Hûnayî , çapxana Pêla, Qamişlo, sal 2021.

-Piştî mirinê, û li gorî temîna wî mamoste, Dilawerê Zengî, her sê dîwanên wî (Wê Sibe Bê- Ji Dil – Ristek Janên Hûnayî), di yek pirtûkê de kom dike, pêşgotinê jê re dinvisîne û çap dike. Çapa yekê, Qamişlo, 2022z.



## Hafiz Abdulrahman

Hafiz Abdulrahman, di sala 1965an de, hatiye jiyane. Ew ji kesên Qamişlo ye, di warê ziman û çanda Kurdî û mafê mirovan de dixebite.

Beşê abûrî û bazirganî li zanîngeha Şamê xwendiyê.

Ji temenekî piçûk de guhdan bi ziman û çanda Kurdî kiriye.

Di salea 1986 de, tevî desteya amadekirin û çapkirina kovara “STÊR” bû, ew kovara ko di sala 1983yan de, hatibû damezirandin, ji aliyê Mamosteyan Rizoyê Osê, Zagrosê Haco û Ebdussemed Dawûd ve dihate birêvebirin, û bi piştgîriya Partiya Hevgirtina Gel li Sûriyê dihate çapkirin û belavkirin.

Di sala 1992yan de, beşdarî di jimara dawî ji Stêr de kir, û bi pişkdariya mamosteyan Siyamend Birahîm, Selam Darî û Reşîd Hesso, bi awayekî serbixwe kovara “ASO” damezirand, û yekemîn jimar belav kir.

Pey re, bi pişkdariya Selam Darî û Xalid Mihemed, du pirtûkên hînkirina xwendin û nivîsîna zimanê Kurdî amade kir û çap kir:

- 1- Ya pêşî bi sernavê “KESKESOR” bû, tevî kasêteke alîkar.
- 2- Ya duduyan bi sernavê “PIRTÛKA MIN” bû, ko ta niha sê caran hatiye çapkirin.


Sê pirtûkên wî amadebûyî bûn ji çapê re:

- 1- Berhevokek helbestên nûjen, bi sernanvê "KENÊ KO, GIRIYÊ BÊHÊL".
- 2- Wergerandina beşekî mezin ji nivîsên Cubran Xelîl Cubran, ji Erebî bal bi Kurdî ve.
- 3- Wergerandina lêkolîna "Newroz di navbera rasteqîneya zanyarî û efsaneyê de", ji Kurdî bal bi Erebî ve.

Lê mixabin, di girtina wî di sala 2010an de, ji aliyê hêzên ewlekariya Sûrî ve, ji ber kar û xebata wî di warê ziman û çanda Kurdî de, û warê mafê mirovan de, ew pirojepirtûk tevî pirtûkxaneya wî ya taybet di malê de hatin talankirin û desteserkirin.

Bi dehan kursên Alfabê û rêzimana zimanê Kurdî li Qamişlo, Hisiça, Helebê û bajarê Essen li Almanyayê, ji piçûk û mezinan re, dane.

- 4- Berhevokek helbestên nû li ber çapkirinê ye.



## Hamid Bedirxan (1924-1996)

Helbestvan Hamid Bedirxan di sala 1924an de, li gundê Şiyê hatiye dinê. Gundê Şiyê dikeve herêma Efrîn, li ser sînore bakurê Kurdistanê, li bakurê Sûriyê. Navê helbestvan Hemîd Murad Hesên Xidir e, û navê wî li Tirkîyê Hemîd Aragon bûye, û ji ber têkilî û hezkirina xwe ya bi helbestvanê mezin ê Fransî Louis Aragon re ev nasnav hilbijartîye.

Piştî ku, di sala 1947an de, vegeriya welatê xwe Sûriyê, ya rast ew bi xwe ji zindanên Tirkîyê reviya bû gundê xwe Şiyê, ji tirsê zordarî û îstixbarata Tirkîyê li hundirê Sûriyê, nav û nasnavê xwe guhert. Lewra jî, navê wî bû Hamid Bedirxan. Nasnavê wî Bedirxan ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve lê hatiye dayîn.

Careke din berê xwe dide serxetê. Sedema çûyîna helbestvan Hamid tevî malbata xwe bo Tirkîyê, ev e: Sitem û zora li ser malbata wî ye, ku ji aliyê dijberên wan axan ve li gund hatiye kirin, ew neçar bûne ku koçî bajarokê Qerqexanê, li nêzîkî gundê xwe Şiyê, di nav sînoren Tirkîyê de bibin. Li wir xwendina lîseyê werdigre û berê xwe dide Stenbolê wêjeya Tirkî xwendîye. Di dema mana xwe ya li Tirkîyê de, di rojnameya (Günayden) de kar kiriye, bi navê (Hemîd Aragon) weşandiye û tê de nivîsiye. Paşê bi hevalê xwe Abdîn Dîno re çûye Fransayê, lê demeke dirêj li wir namîne, ji ber wê jî vedigere Tirkîyê. Piştî guhertina siyaseta derve ya Tirkîyê li hember Rojavaya Emperyalîst, xebatên hemû partiyên çep û qomunîst hatin qedexekirin. Hamid Bedirxan û hevalên wî gelek caran hatin girtin. Di nav hevalên wî yê siyasî û qomunîst de wêjewan, nivîskar û helbestvan Nazim Hikmet, Memdûh

Selîm, Mûsa Entar, Abdîn Dîno, Ezîz Nesîn û yê din hene, ku bi hev re partiyeke sosyalîst a çep ava kirine. Lê, ji ber çalakiya wan a balkêş, rayedarên Tirk piraniya wan girtin. Hamid Bedirxan bi dizî li ser piyan vegeriya welatê xwe, rojavayê Kurdistanê; lê ji ber nêzîkbûna wî bi sînorê Tirkîyê re, nikarîbû li gundê xwe, Şiyê, bimîne. Loma rasterast çû Şamê û çend salan li wir ma. Piştî ku di sala 1951ê de vegeriya gundê xwe, Reşîd Ebdulmecîd di dibistana gund de mamoste bû, û hevaltiya di navbera wan de zû pêş ket û jê hat xwestin ku wî fêrî zimanê Erebi bike. Di demeke kin de, xwendin û nivîsandina zimanê Erebi bi lez bi dest xist.

Piştî nêzîkî deh salan, ango di salên şêstan de, wî dest bi nivîsandina helbestan bi Erebi kir, û paşê dest bi weşandina helbestên xwe yê Erebi di rojnameyên sûrî û libnanî de kir.

Hamid hemû jiyana xwe, di navbera gundê xwe, Heleb û Şamê de jiya. Lê rûniştgeha wî ya sereke, û rûniştina wî ya hertimî, li Helebê bû. Piraniya nivîskarên sûrî nas kirin, ji wan: helbestvan Elî Cundî, Mihemed El-Cundî, Hena Mîna, Wehîd Îstanbulî, Dr. Necah El-Ettar, Se'îd Huraniye, Se'ed Allah Wennous, Memdûh 'Edwan, Mihemed Omran, Fatih El-Muderris, Mistefa El-Hellac, Muzefer El-Newab, û gelek nivîskar û rewşenbîrên sûrî û ereb.

Helbestvan Cegerxwîn roleke mezin di nivîsandina helbestên Hamid Bedirxan bi zimanê Kurdî de lîst. Hamid Bedirxan di salên heştêyan de, di qonaxên dawîn ên jiyana xwe de, razî bû ku bi zimanê xwe yê zikmakî helbestan binivîse.

Di 29-4-1996an de, li nexweşxaneyê Zanîngeha Helebê dilê helbestvan Hamid Bedirxan rawestiya, û di 2-5-1996an de, cendekê wî bi girseyeke ji gel û xelkê, wêjevan, nivîskar û helbestvanan, ber bi gundê wî Şiyê ve hate veguhestin. Hêjayî gotinê ye ku min jî bi navê herdû kovaran El-Hîwar û Pirsê gotarek li ser gora wî xwend.

Wî bi çar zimanan helbest afirand, û tê de nêzîkî sî dîwanên helbestan nivîsî, ku panzdeh ji wan bi zimanê Tirkî ne, didu jî bi zimanê Kurdî ne.

Diwanzdeh pirtûkên bi zimanê Erebi hene, ji bilî bîranînên wî yê wînda, ku em tiştêkî li ser wan nizanin.



**Di jiyana xwe de du dîwanên helbestan çap kirin:**

Li ser Rêyên Asyayê / Helbest, di 1981 de.

\_ Şeva Hicran / Helbest, di sala 1988 de.

**Piştî ku koçkir, ev berhemên wî hatin çapkirin:**

\_ Qîrînên zarokan, sala 2004ê, li Hewlêrê hatiye çapkirin.

\_ Di sala 2007an de, Dîwana Şiyê û di sala 2008an de, dîwana SERDORA JIYANÊ yên bi zimanê Kurdî çap bûne.

\_ Berhemên Erebi Tekûz-Kamil-, helbest, weşanxane Dar Ebdul –Mun'im, / Heleb 2009, hejmara rûpelan 949, ji perçeyên mezin.

Tukesî berhemên helbestvan Hamid Bedirxan çap nekiribûn, ji pêvî jinekê ku tenê hayraza wî bû, û tenê jina ku destûrnameyek kesane da wê da ku mal û milk û berhemên wî yên wêjeyî, bi dest bixe, Elsaya Aragonê, Nazlî Xelîl, ku temamê berhemên bi perê xwe çapkirin û bê beramber belav kirin.



## **Helîm Yûsiv**

Li Amûdê (rojavayê Kurdistanê) – Sûriyê jidayik bûye. Fakulta mafnasiyê, hiqûq, li zanîngeha Helebê qedandiye. Ji sala 2000î ve li Elmanyayê dijî. Xelata romana Kurdî di sala 2015an de wergirt. Xelat ji hêla weşanxana Endêşe ve li Silêmaniyê – Kurdistana Iraqê, hate dayîn.

### **Pirtûkên wî ev in:**

#### **Roman**

Sobarto 1999 – Tirsî bê diran 2006 – Gava ku masî tî dibin 2008 – 99 morîkên belavbûyî 2011 – Weşê di hundirê min de 2018 – Firîna bi baskên şikestî 2019

#### **Çîrok**

Mêrê avis 1991 – Jinên qatên bilind 1995 – Mirî ranazin 1996 – Memê bê Zîn 2003 – Auslander beg 2011 – Serdema Qazîmazî 2021.

#### **Lêkolîn**

Romana Kurdî – kurmançî û zazakî- panoramayeke giştî. Ji 1930 heta 2010 – sala 2011 hatiye weşandin

## Şano

- Komara dînan (Şermola) 1998: Ev şano ji çîroka komara dînan ji pirtûka Mirî ranazin hatiye girtin. Li Stenbolê ji hêla “Teyatra jiyana nû” ve hate lîstin. Li gelek bajarên Kurdistanê, Turkiyê û Ewropayê hate pêşkêşkirin. Şano di gelek televizyonên Kurdan de derket, û wekî DVD hate belavkirin.
- Bidarvekirina pozekî – Monodrama 2001: Ev şano ji çîrokeke bi heman navî ji pirtûka “Jinên qatên bilind” hatiye girtin. Yekem car di mihrecana şanoya Kurdî de, li Berlînê sala 2001, hat pêşkêşkirin.
- Sol û serî – komedyaya civakî 2007: Ev şano ji çîrokeke bi heman navî ji pirtûka “Memê bê Zîn” hatiye girtin. Ji hêla koma Avesta ya şanogeriya ve, li Amedê, sala 2007an, hate pêşkêşkirin.
- Mezintirîn rawestgeha tirênan ya cîhanê 2018: Ev şano ji hêla koma şanogeriya ya bajarê Wuppertal “Wupperspuren” ve, sala 2018, bi zimanê Elmanî, hate pêşkêşkirin.

## Werger

Bi lihevkerina bi Gothe institut-Istanbul re, sê pirtûkên zarokan ji Elmanî bo Kurdî wergerandin. Her sê pirtûk ji nav weşanên îletişim li Turkiyê derketin:

- Xiltê biçûk – Werder Holzwarth 2011
- Werdek, mirin û kulîka nîsanê – Wolf Elbruch 2011
- Hemû werdekên wî – Christian Duda 2012

## Rojname û Kovar

Edîtoriya kovara „Dîwar“ ya çandî û wêjeyî kir ku, bi Kurdî li Elmanyayê di sala 2013 de derket. Herweha di birêveberiya gelek kovarên Kurdî û Erebî de cih girt, ji wan „Pêl“, „Orkêş“ û „Ewraq“. Bi salan di rojnameyên Kurdî de qunciknivîsî kir, ji wan „Rûdaw“ ku li Hewlêrê derdiket, „Azadiya welat“ ku li Amedê derdiket û ji „Kurdistanî nûy“ re ku li Silêmaniyê derdiket. Herweha hîn di "diyarnamê" de, ku di internetê de weşanan xwe dike, berdewam dike.

## Televizyon

Di televizyonên Kurdî yên satelît de, ku li Ewropayê weşana xwe dikirin, yên mîna MezopotamyaTV, MedyaTV, RojTV, ji sala 2000î heta 2011 bernameyeke wêjeyî bi navê „Gava sêyemîn“ ji bo danasîn û nirxandina berhemên wêjeya Kurdî amade û pêşkêş dikir. Ji sala 2011an heta 2020 heman bernameyê bi navê „Deriyê din“ berdewamkir.

### Lêkolînên li ser berhemên wî:

Pirtûk bi zimanê Erebi:

- Tecrubeyên nû di çîroka sûrî de, cîhana Helîm Yûsiv ya Expressionist. Rexnegir Muhamad Muhyedîn Mîno. Ji nav weşanên Mulhim, Hums- Sûriyê 2004
- Jînanîgariya cihekî talankirî, lêkolîneke şîrovevî, rexneyî li ser romana Sobarto. Rexnegir Mesûd Hasan, Dimeşq – Sûriyê 2006
- Ravekirina sembolan di romanên Helîm Yûsiv de – Rêber Hebûn , çapa Ewropayê - Elmanya 2021.

Bi zimanê Kurdî:

- Sûretê piştê – barê mêtîngeriye di anatemiya edebî ya Helîm Yûsiv de- , Lêkolîn, Ferzan Şêr e. 2021 ji nav weşanên Peywend derket.

Lêkolîn bi zimanê Erebi:

Vebêjî ya destpêkirinê di çîroka Kurdî ya nûjen de, bikaranîna bi metirsî ya xeyalkirinê, ya lêkolîner Ibrahim Mehmûd 2010.

Dosye kovara Wyê ku li Amedê derdiket. Hejmar 7, sal 2005. Hejmareke berbiçav ji nivîskarên Kurd li ser berhemên Helîm Yûsiv nivîsandin. Dosye bi vê manşetê belav bû: “Helîm Yûsiv, nivîskarê ku qonaxan dişewitîne”.

### Wergerandina zimanan

Heta niha pirtûkên wî ji bilî Kurdî bi Erebi, Tirkî, farisî, Elmanî û ingilîzî derketine.



## Henîf Yûsiv

Helbestvan, nivîskar û hunermendekî Kurdên Roavayê Kurdistanê ye. Di sala 1961ê de, jidayik bûye. Ji sala 1994an ve, li Holandayê dijî.

Ji ber ramanên xwe yên siyasî çar salan di dema hukumdariya Hafîz Esed de, ketiye zindanê. Ji ber wê yekê jî pir berhem, gotar û helbestên wî bê nav, carina jî bi navên (Agirî, Derwêşê Evdî û bavê Dicle) hatine belav kirin û hin jî wenda bûne.

Bi navê wî yê rasteqîn, şeş dîwan ji helbestan bi zimanê Erebî hatine çapkirin, û yek jî bi zimanê Kurdî du caran hatiye çapkirin; sê pirtûk jî li ser folklorê Kurdî hatine çapkirin, û ji bilî wan jî ta bi niha heşt destnivîs hene hîn nehatine çapkirin, ew bi zimanê Kurdî û Erebî û Holendî ne.

Li Urdinê bi fermî, di rojnameya (Axêr Xeber) de, ya rojane, wek nivîskar û rêdektûr, berî dema înternêta kar kiriye.

Pir gotar û berhem di kovar û rojnameyên Kurdî û Erebî de, li Kuwêt, Urdinê, Misrê û Ewropa, zêdetirî dused gotar û berhem belav kirine.

Di warê hunermendiyê de, peykeran çê dike, û pir pêşangeh li Holandayê çê kirine.

Di înternêta û Feysbokê de, pir pir kêr belav dike.

## Berhemên helbestvan yên çap kirî û weşandîs:

أعمال منشورة للشاعر

-تحديدا أحبك-شعر

-كوردية برتقالية كوردية بيضاء-شعر

-جهة المدينة وحليب النوق-شعر

-كاليتيم على مائدة اللنام-شعر

-ديوان باللغة الكردية Pesnê Amedxanê

-جبلي -ملحمة فولكلورية كردية

-دلال -ملحمة فولكلورية كردية

-ديوان شعر باللغة الهولندية

-نصوص من الفولكلور الكردي

-أما بعد هل قتلوك؟ باسم مستعار (أكري) شعر

-الفراشة والجبلي، باسم مستعار (أكري) شعر

-عشرات الكتابات والمواد في الصحافة العربية والكردية قبل عصر الإنترنت

Beriya serdema Înternêta, bi dehan nivîs û materyal di çapemeniya Erebi û Kurdî de nivîsandine.



## Hesên Hîşyar Serdî (1907-1985)

Hesên Hîşyar kurê Mistefayê hecî Umer e, ji Kurdistanê Bakur, ji wîlayeta Diyarbekir, qezaya Hênayê, gundê Serdê ye. Ji malbatê û barîxa wan re Sadiqan tê gotin, ku ji eşîra Zirkî ne.

Di sala 1907an<sup>[1]</sup> de hatiye dinyayê. Piştî ku temenê wî bûye heft salî, li ber destê meleyê gund, Hadî Emîn, dest bi xwendinê kiriye. Piştî mirina bavê wî, diya wî ku ji Kurdên Zaza ye, wî dişîne gundê xalê wî Dêrqamê; li wir, li ber destê xalê xwe Şêx Ehmed, çend kitêbên din ên dînî dixwîne. Piştî ku bîrwer dibe, li ber destê mamostayekî penaber (Mihacir) bi navê Haşim sê salan dixwîne.

Di dema Cenga Cîhanê ya Pêşîn (1914-1918) de, piraniya bûyerên wê cengê tîn bîra wî, nemaze pergala birçîbûnê, nexweşiyê û penaberiyê. Giraniya şer ketibû Kurdistanê ku, hingê li eniya tixûbê Qersê bû. Piştî salekê leşkerên Usmanî berûpaş ve dikişên, roj bi roj ji eniya şer bi şûn de vedigerin, heya ku enî tê Erzerom, Wan, Bitlîs, Artvîn û Mûşê. Kurdên van hawîran tev de welat berdidin û penaber dibin.

Pergala eniya şer li deşta Parsînê, Erzerom û Hesênqelayê pir xirab e. Ev qad, li tixûbê Kurdistanê Bakur û Êrîs dikeve. Gundê Hesên Hîşyar û malbata

wî li dora not malî ne. Ji gundê wan çil û heşt peya diçin wî şerê mirovxwer, yek ji wan jî venagere. Di wî şerê de, leşker di nav berfê de, bê çek û xwarin tev de, ji ber sipê û nexweşiyên qir dibin. Rewşa Kurdan û welatê wan Kurdistanê pir dijwar bûye.

Di 16. 05. 1916an de, û di riya hersê dewletên mezin Rûsiya, Brîtanya û Feransayê re, û bi navînkirina peymanê Saykîs-Pîko, Bakurê Kurdistanê ji Tirkîyê re, başûrê Kurdistanê ji Îraqa nuh re, rojavayê Kurdistanê jî ji Sûriyayê re tê hiştin. Ji xwe Rojhilat tev di bin destê Îranê de maye.

Piştî rûxandina dewleta Usmanî, Kurd derfet û fersendeka nuh di derbirîn û çareserkirina pîrsa xwe de dibînin. Nemaze di danezana rêbaza Wilson ya çarde-xalî de, ji bo mafên miletan bi azadî û serxwebûnê bête çespendin. Lê mixabin, biryarên Sêvrê, li kongireya Lozanê, di roja 23.07.1923 de, hatin binpêkirin û hevkarên soz û peymanê xwe bi Kurdan û Kurdistanê re xwarin.

Piştî têkçûna peymanê Sêvrê û îmzekirina peymanê Lozanê, di 29.10.1923 de, Komara Tirkîyê hat îlankirin. Hebûna Kurdan hat windakirin. Li ser vê yekê, hinek serbaz, axa, beg, şêx û rewşenbîrên Kurdan li Erzeromê, di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî de, bi navê Komîteya Îstîqlala Kurdîstanê, yan jî tevgera Azadî, rêxistineke siyasî dadimezirînin. Di çiriya paşîn ya 1924 de, ji nişka ve, Xalid Beg û mebûsê Bidlîsê Yûsif Ziya tene girtin û li Bidlîsê bê pîrs û bersiv tene bidardekirin. Ev rêxistin, bingeha pêxistina agirê şoreşa Şêx Se'îdî ya li sala 1925 bû.

Hesen Hişyar Serdî jî tevî wê serhildanê dibe. Di gelek eniyên cengê de, berevaniyeka lehengî û mezin dike. Di nava agirê şer û cengê de, nexweşî, dijwarî, xinizî, mêranî, qehremanî, cangorî û pakrewaniyê tev bi çavên serê xwe dibîne. Lê newqa xwe ji dijmin re vala nake, û bi lehengî û berxwedanî şer dike. Piştî ku şoreş têk diçe, dewlet dest bi girtinan dike. Li her deverê welêt dest pê kirin, li gorî awirên wan sûc bê sûc her kesî digirin. Ewçend ku ji zindanan pê ve mizgeft û dêr jî tene dagirtin.



Hesen Hişyar jî, ji wan girtinan bêpar namîne, ew jî tê girtin. Li ber dadgeha leşkerî, bi bidarvekirinê dê mehkemekirin. Lê ji ber ku temenê wî biçûk e, bi panzde salan ceza didin. Di zindanên Diyarbekir, Xarpêt, Qeyserî û Nîgdeyê de, sê sal û nîvan girtî dimîne, paşê ew jî dikeve ber biryara efûya sala 1928an, derdikeve û vedigere welêt. Piştî bûriya giştî, diçe bajarê Diyarbekirê. Li qezaya Qulpê, li dayreya tapûyê, wek mamûr dest bi kar dike.

Di sala 1930î de, bi geşkirina agirê şoreşa Sasûn û Araratê re, rêjîma Tirk kesên bi guman digirin, nemaze yên berê hatine cezakerin. Hesen Hişyar diçe nav refên şervanên azadiyê. Piştî mayîna sê salan li serê çiyayan ku, ji Licê heta Xarpêt û Çewlîgê, digel gelek şervanan. Bi şev û roj ji bo piştgiriya Araratê bi dijmin re şer dikin. Şoreşa Araratê têk diçe, ew û çar peya dadikevin Binxetê.

Di sala 1934 de, ew û du pismam û birakî xwe, bi du guleyan birîndar, diçin Cizîrê, li bajarê Amûdê bi cihûwar dibin. Ji ber rewşa bêkarî, zîvarî û belengaziyê, di riya Qedûr Beg re, li gundê Rihîkê li nav êla Milan, ku dikeve navbera Amûdê û Dirbêsiyê, demekê dimînin. Ji neçarî, ji wir jî diçe gundê Eynqirdê. Sê salan li wir cotkariyê dike. Dîsa ji wir jî bar dike diçe Senceqê ku dikeve qibleyê Amûdê. Di sala 1938an de, li gundê Senceqê dibistanekê ji bo hînkirina zimanê Kurdî vedike. Piştî salekê ji vekirina wê dibistanê, bi destê firensizan tê girtin. Piştî şeş sal ji jiyana cotkarî û gundîtîyê, di sala 1940î de, bi malbatî vedigere li bajarê Amûdê bicî dibe. Li bajarê Amûdê dikaneke manîfatora vedike. Di wê demê de, bajarê Amûdê navenda çand û wêjeya Kurdî ye. Bi saya serê gelek welatparêz û gelperwerên mîna Reşîdê Kurd, Mele Evdilhadî, Cegerxwîn, Qedrîcan, Êsê Hesan, Mihemed Elî Şiwêş, Şêx Selîm, Nûredîn Zaza, Şêx Beşîr, Ehmed Nafîz, Tîrêj û Hesen Hişyar. Wê demê, bajarê Amûdê qiblegeha welatparêz û şervanên azadiyê ye. Hingê kovar û rojnameyên Kurdî yên mîna Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr, belavokên civata Xoybûnê û hin kovar û rojnameyên ku bi zimanê Erebî, yên mîna Wijdan û Huriyê, dihatin weşandin. Li herêma Amûdê û derdora wê abone û kiryariya wan kovar û rojnameyan tev di riya Hesen Hişyarî re dibûn. Ji milê din ve, nivîskarên van kovaran, di riya wî re nivîsên xwe rê dikirin, û berhemên wan dihatin weşandin. Dikana wî dibe wargeha xortan, dibe hêlîna fêrkirin û

danûstendina li ser zimanê Kurdî, dibe navenda her mirovekî welathez û gelparêz. Wî bi xwe di wan kovar û rojnameyan de dinivisand, û bi herdu zimanan, Kurdî û Erebî, berhemên xwe belav dikirin.

Hêjayî gotinê ye, di wê demê de, bajarê Amûdê navenda zana û zanyarên olî yê gewre û mezin bû, mîna Şêx Mihemdê Moza, Mele Ebdulletîf, Mele Fethulla, Mele Ebdulhelîm, Şêx Beşîr Elhamidî, Şêx Ubeydê Şêx Zahir, Şêx Ehmedê Kesk, Şêx Ebdulmecîdê Huseynî, Şêx Efff û Şêx Selîmê Huseynî.

Di navbera salên 1953 - 1957 de, têkilî û danûstendinên Hesên Hîşyar bi rojnameya Wijdan û Huriyê re hebûn.

Di sala 1956 de, li bajarê Helebê Hesên Hîşyar û çend hevalên xwe civatek bi navê Komeleya Zanistî û Alîkariyê ya Kurd dadimezirînin.

Damezirênerên komelê Dr. Nûrî Dêrsimî, Rewşen Bedirxan, Hesên Hîşyar, Osman Efendî û Heyder Heyder bûn. Armanca komelê pêşxistina ziman, tore û dîroka gelê Kurd bû. Mexabin pir dirêj nekir. Li dora du salan (1956-1958) tenê berdewam kir. Lê pir çalakiyên hêja kirin. Damezrênerê komelê Hesên Hîşyar di destnivîsên xwe de dibêje:

– Bi doza Kurd ve me 18 rûpel nivîsarek li Misrê bi destê Mihemed Hilmî Beg da kongirisa Bandok.

– Ji bona şoreşa Ciwanro ya Kurdên Îranê me protestoyekî bi navê Jenosît bi zimanê Erebî, Tirkî, Farisî û Firansî li dijî şah da belavkirin.

- Me bi partiya EOKA ya Qibrisê re hevalbendî girêda, her bûyerên wan me di rojnama xwe de didane belavkirin, ji ber ku ew jî dijî dewleta Tirk û înglîz bûn. Çawa ku meseleyên Kurdan jî li Atîna serekê diyaneta îslamî Hafiz Elî Reşad werdigerandin zimanê Yûnanî û di rojnameyên wan de didane belavkirin.

- Li Beyrûtê di rojnameyên Erebî de li ser Kurd û Kurdistanê di rojnameya Wicdan û Hurriyet de didan belavkirin.

Evê komelê gelek pertûk dane çapkirin û belavkirin. Ji wan pirtûkan:

– El-Red `Ele Kosmopolîtiye, Hesenên Şiniwî. Bi zimanê Erebi.

– Kîfah el-Ekrad, Samid el-Kurdistanî. Bi zimanê Erebi.

– Dêrsim di Tarîxa Kurdsitanê de, Dr. Nûrî Dêrsimî. Bi zimanê Tirkî.

Diyar e, kar û çalakiyên vê komelê ji temenê wê pirtir in. Bi temenekî kin, ku du salan bi tenê dewam kir, xebatên berfireh ji gelê xwe re kirine. Evê komeleyê mîna komeleyên diin piştî damezirandina Partiya Demokrat ya Kurdistanê, ewê jî xwe hel kir.

Di sala 1962 de, ji bajarê Amûdê bere xwe dide bajarê Qamişlo, li wir, bicî dibe, ta ku ji nav me bar dike.

Di sala 1966 de, kovara AGAHÎ, bi destê ronakbîrê gewre Hesen Hişyar derket. Di rûpelê pêşîn de wisa hatiye nivîsandin: “Kovarek zanistî, toreyî, tarîxî û siyasî ye.” Kovar, li parêzgeha Hisiça, bajarê Qamişlo derdiket. Ji aliyê tîp û gewdê kovarê 20 x 40 cm ye. Rûpelên wê ji 15-33 rûpelan hevedûdanî ye. Ji ber rewşa ramyarî, xwediyê kovarê kovara xwe li tilnivîsê dida û bi hejmareke hindik û bi awayekî veşartî belav dikir. Ne tenê barê xercî û belavkirina kovarê li ser milê xwediyê kovarê bû, belê nivîsandin û amadekirina wê jî jê dihat xwestin. Kovar di şertên pir dijwar de derdiket. Lewre tu demek diyar ji derketina wê re nebû. Hejmarên vê kovarê gihane nozde hejmaran. Naveroka kovarê pirtir ramyarî û dîrokî ye. Xwediyê kovarê nêrîn, dîtî û bîrûbaweriyên xwe, di riya vê kovarê re, didane belavkirin. Hin caran bûyerên Kurd û Kurdistanê belav dikirin.

Di kovarê de du helbest û nameyek bi tenê ne yê xwediyê kovarê ne. Helbestek ya nemir Ehmedê Palo û ya din ya nemir Hemzayê Muksî ye. Name jî ya Prof. Qenatê Kurdo ye, ya ku di sala 1956 de, ji komela Zanistî û Alîkariyê ya Kurd re rêkiribû. Qenatê Kurdo di wê nameya xwe de wisa dibêje: “Gelî biran, ji wê xebata we re sipas dikim, eger çiqasî dijwarî bikevin pêşiya we jî divê hûn zêdetir navê Kurd û Kurdistanê di rozmanan, kovaran û

her nivîsarên piçûk û mezin de bidin belavkirin. Em di esra bîstî de ne esra ronahî û atomî de ne. Îro milletên bêdeng zû asîmîle dibin, heya zarok negirî, dê bi wê dilovaniya xwe şîr nade wî an wê...”

Xwediyê kovarê daxwaz û sedemên derketina kovara xwe dide diyarkirin û dibêje: “Daxwaz ji vê kovara veşartî û destnivîs: Herwekî ji zanan re qenc agah e ku li gor rêzan û heqnenasiya Rojhelata Navîn dewletên Kurdistan vegirtî, xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî gunehkariyek ji kiriyariya muxederatan gelek mezintir û diwartir e... Nemaze Kurdên Sûrî ji 1958an de, di giriftariyên dijwar de hatine girêdan... Di her awayên teqalîdên xwe ên qewmî û civatî de pêçandî mane! Çewa ku her niştimanperwerên ji hev dûr nikarin bi serbestî û hêsanî bigîne hev û serpêhatiyên tê de, ji hev re bidin zanîn û li ser çaredîtinan heş û agahiyên bi hev biguhêrin!... Ji ber wan bûyerên zeman û mekan di armanca xebatê de ji bo agahdariya hin niştimanperwer li gor pêkanîna min xwe berpirsiyar dît. Da ko nûçe û bûyerên der û hundir ên ku doseya Kurdistan, di xwe de digre ji wan re bişînim. Lewre rojên teng û tarî nêçîrê tarîxê ne.”

Xwedî û berpirsiyarê kovarê li ser vê bingehe kovara xwe derdixist û raman û baweriya xwe dida belavkirin. Bi giyanekî gewre û ramaneke bîrewer pêwîstiya yekîtiya tevgera Kurdî dida diyarkirin. Bi xurtî şerê perçebûn û jihevketina tevgera Kurdî dikir, digot “Çep û rast her du milên laşekî ne, laş ku nebe kîjan milê çep û rast?!”

Xwediyê kovarê mîna bijîşkekî pispor destê xwe datîne ser birîna nesaxiya tevgera Kurdî, ya ku sedema ji hevketin û bindestiya gelê Kurd e, bi zanîn diyar dike û çare û derman jê re dibîne. Ew çare û derman yekîtiya tevgera Kurdî ye.

Hesen Hişyar ê Serdî gencîneyek devgirtî bû. Dîrokvan, helbestvan, rojnamevan û tekoşerekî gernas û navdar bû. Di kûrahiya heşt hezar sal berî zayîna de, li ser dîroka kevnareya şaristaniya gelê xwe nivîsandiye û bi belge çespandiye. Nijadê Kurd bi kok û rehên wê yên dîrokî li ser xaka bav û bapîran vejandiye, û bi awayekî zanistî xelekên dîrokê, bi hev ve girêdane û li

ber çavan raxistine. Gelek caran bi awayekî zanyarî nêrîn û dîtinên xwe bi şehekî taybet hûnandine.

Ew bi xwe dibêje: “Çima ji tarîxê re muqedes tê gotin? Ji ber ku salix ji wan insanên zemanên bûriyên dûr ve dide, her tevgerên jiyîn û serpêhatiyên wan bi wî zeman û mekanî ve girêdayî bi xwe digre, wê rewş û her awayê wan ên civatî, abûrî, dezgedarî, zanistî û siyasî ku ji wan bi şûn de wek sî an rêça wana mayî di zemanê îro de ji me re dide derpêşkirin, ku ji muerix re muhendisê zeman û mekan tê gotin û ji paraztina mentiqa tarîxê re pîroz tê gotin.”

Dîsa gotin ya ronakbîrê gewre Hesên Hîşyar e: “Bi wê agahiyê divê em bizanin dema ku bixwazin bizanin ku tarîx ne pêgirtiyê nîzam û qanûnên dewleta ne, wiha reng e, ne pêgirtiyê pirogramên partiyên çep û rast û ne jî bi felsefeyên rûhî û madî ve jî girêdayî ye, ji ber ku ew tev de li ber eynika tarîxê ne, ne tarîx ji ronahiya wan pêk tê na, felsefe di tecrubeyan de xwe bi tarîxê digre. Em siya tarîxê û tarîx siya zeman e, ew zemanê ku ji xwe ye, bi xwe ye û li xwe ye, her peyda ji zeman in, lê zeman her ji xwe ye jê re pêşî û dawî nîne, her tişt ji vê ne û pê ve ne, bê zeman îlmê felekiyat, riyaziyat û fîza jî nikare qiyas û nisbet bigre.”

Hesên Hîşyar bi dûrbîneke pir hûr, kûr û zelal sedemên her serpêhatî û bûyerekê dîtî û jiyayî bi nav û nîşan rave dike. Ji peymanên navdewletî û sozên hevkarî, û xapandina Kurdan û parçekirina Kurdistanê û sînorên çêkirî bigre, ta bi xinizî, xapandin, nakokî û bêbextiya axa, beg, şêx û nezanên Kurdan re derkeve, bi zelalî ta bi derziyê ve dike.

Em dikarin bibêjin seydayê gewre Hesên Hîşyar dîdarê li ser hemû bûyerên dema xwe ye.

Seydayê gewre pir helbestên hêja û ciwan ji bo hişyarî û geşkirina hestê neteweyî nivisandine. Helbestên xwe bi awayekî klasîk, bi pêlewaz û terazû hûnandine. Naveroka wan li ser welatparêzî û berxwedanê ye. Xwediyê pirtûkekê li ser urûda Kurdî ye. Gelek gotar û nivîsandinên wî di warê siyasî û

ramaniyê de hebûn. Mirovekî siyasetvan bû. Xwediyê ezmûn û serpêhatiyên bû.

Hesen Hişyar bi Erebi, Farisî û Tirkî jî dizanîbû. Nivîskarê hersê kovarên navdar Hawar, Ronahî û Roja Nû bû. Seydayê Tîrêj demekê li ber destê mamoste Hesen Hişyar fêrî zimanê Farisî bûye. Hesen Hişyar nav li seydayê Tîrêj kiriye û ji wê rojê de, seyda bi vî navî, di nava gel de, tê naskirin.

Hêjayî gotinê ye ku Hesen Hişyar ê Serdî pênc law û heşt keçên wî hebûn navê lawan ev in: Selahedîn, Mustefa, Gurgîn, Kesra, Kamîran; navê keçan jî Perwîn, Gulistan, Gewher, Jale, Hêvîn, Şêrîn, Şevîn, Şehban.

### **Berhemên Hesen Hişyar Serdî**

-Pênc cild Dîroka Kurd ji 8000 sal berî zayînê heyanî qirnê 19an

-Pênc cild Dîtin û Bîrhatinên min ji 1914-1984 bi xwe digrin.

Sed heyf û mexabin ku hemû berhemên wî destnivîs in, nehatine çapkirin, ji bilî cildê yekemîn ji "Dîtin û Bîrhatinên Min", û ew jî bi destê min, li Lubnanê, li Beyrûtê, li çapxaneyê Emîral, di sala 1993yan de hate çapkirin.

-Dîwanek ji helbestan.

-Zerdeşt û Newroz Bûza û Konfiçyos

-Felsefeya Xebata Welat

-Gazî û Hawara Navbera Zagros û Zarakirasekî ye

-Urûda Kurdî ji bo helbestan

-Nozde Jimarên Kovara Agahî

-Deh Muzakeratên ku min dane şoreşa Îraqê

-Muzakeratên Qedrî Begî min wergerandine ser Kurdî

-Şoreşa Şêx Seîd û Araratê

-Kirasê Sipî û Destê reş

Ronakbîr, siyasetvan, dîrokzan, helbestvan û têkoşerê gewre, di 14ê îlona 1985 de, ji nav me koç kir û li Dugirê hat veşartin. Hezar dilovanî li giyanê wî bibarin û cihê wî buhişt be.

### **Jêder û Çavkanî**

– Hesên Hîşyar, Dîtin û Bîrhatinên Min, cildê yekemîn, li Libnan-Beyrût, çapxana Emîral, di sala 1993 de, bi destê min hatiye çapkirin.


-Kovara AGAHÎ, Hejmar: 3, Sal: 1969, r. 2

-Kovara AGAHÎ, Hejmar: 15, Sal: 1980, r. 10

-Kovara AGAHÎ, Hejmar: 16, Sal:1981, r. 11

---

[1] Hesên Hîşyar di wesiya xwe de, ku di 25 Hezîran 1984 de ji zarokên xwe re nivisandîye, dîroka bûyîna xwe 1907 dide diyarkirin. Ez bawer im wê ev ya rast be. Di hin destnivîsên wî de, bûyîna xwe sala 1905 nivisandîye, ez bawer im wê ev şaş be, ji ber ku li ser gotina wî, dema şoreşa şêx Se'îd 1925 de, tê girtin û ji ber piçûkbûna temenê wî biryara bidarvekirinê lê nakeve, ew tenê 15 salan ferwerî dikan.



## Hesên Omer Hesên

Navê wî Hesên Omer Hesên e. Nasnavê wî: Bavê Raman e. Dîroka jidayikbûnê: Amûdê 7/4/1979. Dibistana seretayî û navîn li Amûdê xwendiyê û bawernameya qonaxa navîn wergirtiye.

-Karê hunerî: Helbestvan e. Herweha bawernameya S.Z.K ya sê astan û bawernameya Ş. Peyman a amadekirina mamosteyan û bawernameya Akadîmiya Ş. Egîd Çilo ya biranşan wergitiye. Û niha li dibistana Şerefxanê Bedlîsî ya amadehî weke mamosteyê ziman û wêjeya Kurdî kar dike.

-Endamê Yekîtiya Rewşenbîran e.

-Endamê Yekîtiya Nivîskaran e.

-Dîwanek wî bi navê "Ramanên Birîndar" sala 2022yan ji hêla Yekîtiya Rewşenbîran ve hat çapkirin. Ji xwe ev dîwan bi rêbazê nûjen hatiye nivîsîn.

-Niha dîwanek bi rêbazê kilasîk jî ji çapê re amadeye.





## Hewar Qasim

Ji ber rewşa ewlehî ya li Sûrî pir kesan nikarîbûn bi navên xwe yê resen û diyar nivîsandinên xwe belav bikirana. Lewra, di bin navekî nasnav de, ji destpêkê de ta wek îro, di bin navê (Bavê Elend) berhemên xwe belav dike.

-Di sala 1972yan de, li gundê Gi'êt ê ku di navbera Heseke û Amûdê deye, hatiye jiyane. Xwendina xwe li dibistana gund xwendiyê, pişt re li Heseke, lê bidawî nekiriye.

-Di sala 1988an de, dest bi nivîsandina helbestê kiriye.


-Li bajarê Qamişlo, demekê bicî bûye, û ji wir çûye Hewlêr paytexta Kurdistanê nêzî 3 salan lê maye. Aniha ew li Elmanya dijî.

-Di sala 2009an de, berpîrsê pirtûkxana Kurdî di Şepêla Pêşeroj de bû. Paştî berpîrsê kovara Aza bû, ya bi herdu zimanan, zimanê Kurdî û zimanê Erebi, derdiket.

Pênc dîwanên wî yê çapkirî hene:

1- Reşo û Rewşê - 2010 2- Karwan 2017. 3-Penaber, 2017. 4-Mey Firoş, 2021 . 5-Gundê Firindan, 2022.

Dîwana herî dawîn helbestên wî tev terazûkirî ne û li ser pêlewazan e. Piştî belavkirina her sê –çar dîwanên pêşîn, pismamê wî Enesê Hecî Qasim piştevaniya wî di nivîsandina helbesta terazûkirî de kir.



## Heyder Omer

Heyder Ehmed Omer sala 1952ê li gundê Qizilbaşa, herêma Çiyayê Kurmênc jidayik bûye.

Li gundê Kotana xwendina seretayî, û ya navîn û lîsê li bajarê Efrîn, navenda herêma Çiyayê Kurmênc bidawî haniye, û sala 1970yê lîsê wergirtiye, û derbasî zanîngeha Helebê, fakulta wêjeyan, beşê ziman û wêjeya Erebi dibe.

Sala 1974ê Lîsansa wêje û zimanê Erebi ji zanîngeha Helebê wergirtiye, û sala 1978ê dîploma Zanista Perwedeyê ji zanîngeha Şamê wergirtiye. Di pergala perwerdeyê de, wek Mamosteyê wêje û zimanê Erebi li dibistanên Girava Mata, û bajarê Benî Xazî li Lîbiyayê û li Sûriyê li parêzgeha Helebê kar kiriye.

Sala 1969ê li gel hinek xortên Efrînê, Yaneya (Nadî) Efrîn a çandî û civakî damezirandine.

Heyder Omer Sala 1999ê neçarî koçberiyê bûye, û li welatê Elmaniya bi cih bûye, û li dibistanên Elmani bûye mamosteyê herdu zimanên Kurdî û Erebi.

Sala 2003yê bûye endamê komeleya Elmani ya perwerdeyê û zanistan / Gewekschaft Erziehung und wissenschaften.

Ji sala 1993yê heya 1999ê bûye endamê desteya kovara (Pirs) a ku li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê derdikeve, û desteya kovara (Pênûs) a ku li Elmaniya derdikeve, û herweha bûye serokê desteya kovara (Pêl) a ku li Elmaniya derdiket.

Ji sala 1973yê de, li gel wêjeya Kurdî mujûl bûye, ji wê salê de lawaziya tevgera rexne ya wêjeya Kurdî bala wî kişandiyê; vê lomê jî, di xebata xwe ya wêjeyî de, giranî daye lêkolînên rexneya wêjeyî.

Sala 1993yê li gel hinek wêjevan û helbestvanan festîvala helbesta Kurdî li Sûriyê damezirandine. Evê festîvalê roja (22. 10), roja koçbûna helbestvanê mezin Cegerxwîn; (Roja helbesta Kurdî li Sûriyê) bi nav kir. Ev festîval hîn jî sal bi sal li hundir û dervayî welêt tê lidarxistin. Herweha, sala 1998ê li gel hin nivîsevanên rojavayê Kurdistanê, (Xelata Osman Sebrî bo dostaniya gelan) damezirandine, û beriya du salan bûye serokê komîta vê xelatê. Ev xelat ji bo dostên gelê Kurd, ên di ber Kurdan de xebatên payebilind kirine, tê pêşkêşkirin, heya nûka pênc dostên Kurdan ev xelat wergirtine.

### **Pirtûkên wî yên hatine çapkirin:**

#### **Bi zimanê Kurdî:**

1. Cegerxwînê çîroknivîs. Rexne, sala 2003ê li ba weşanxaneyê Havîbûn li Almaniya / Berlînê çap bûye.

2. Osman Sebrî, helbestvan û nivîsevan. Rexne, çapa yekem, li Almaniya / Berlînê sala 2004ê, û çapa duyem li Başûrê Kurdistanê sala 2006ê derketin.

3 .Ehmedê Xanî, raman û huner. Rexne. Sala 2007ê li ba dezgeha (Sema) çap bûye.

4. Vedenga hestan (hunera helbestê). Sala 2014ê çap bûye, û sala 2019ê li Almaniya/Berlînê careke din li ba weşanxaneyê Sersera çap bûye.

5. Kurdistan berî her tiştî. Werger ji Erebî bo Kurdî. Sala 2015ê. li Amedê çap bûye.

6. Kurtedîroka wêjeya folklorê Kurdî. Sala 2018ê li Istenbulê çap bûye.

7. Lêkolînên wêjeyî û rexneyî. Sala 2019ê li ba weşanxaneya Sersera, Almanya / Berlînê çap bûye.

8. Gengeşe û hevpeyvîn. Sala 2019ê li ba weşanxaneya Sersera, Almanya / Berlînê çap bûye.

#### **Bi zimanê Erebî:**

1. Ehmedê Xanî di dastana helbestî Mem û Zîn de. Rexne. Sala 1991ê li Şamê çap bûye.

2. Feqî yê Tîran, jiyar, helbest û helbestvanî. Rexne. Sala 1993ê li Beyrûtê çap bûye.

4. Piçek ronahî, ji bîranên Edilrezzaq Bedirxan, bi hevkarîya Elî Cefer ji Kurdî bo Erebî hate wergerandin. Sala 2000î li ba weşanxaneya Havîbûn Almanya, Berlînê çap bûye.

5. Lêkolîna wêjeya folklorê Kurdî. Sala 2018ê li Istanbulê, û sala 2021ê li Misirê / Qahîreyê careke din çap bûye.

6. Çanda Kurdî û çandên cîranan. Sala 2022ê li Misirê / Qahîreyê çap bûye.

#### **Ji bo çapê Amadene:**

1. Kesayetiya Kurdî. Lêkolîneke civaknasî ye. Werger ji Erebî bo Kurdî.

2. Navdarên Kurd û helwestên wan. Werger ji Erebî bo Kurdî.



## Heznî Haco

Dr. Heznî Haco, di 23.4.1940<sup>3</sup> de hatiye dunyayê. Li gundên Alareşa, Dêrûna Qulinga û bajarokê Tirbespiyê, wî xwendina seretayî, qedand. Ya navîn û amadeyî li Qamişlo, Heleb, 5 salan li Libnan û salekê li Şamê, bidawî kir. Diploma bijîşkiyê sala 1970yê bidest xist û piştî 3-4 heftiyan tevî tevgera başûrê welêt bû. Destpêka 1972yan vegeriya Elmanya û dest bi nojderiya giştî li Elmanya kir. 1974 dema dîsa şer destpê kir, wî xwendina xwe nîvco hişt û dîsa berê xwe da Başûr. Piştî şikestina mezin di 1975an de, ew 7 mehan li Rojhilatê Kurdistanê, li Serdeşt û Mehabadê ma. Di Adara 1976an de, wî xwendina nojderiya giştî li Elmanya berdewam kir û di 1981ê de, bire serî. Wî nexweşxana Nafiz li Qamişlo sala 1983yan, damezirand û 12 salan tê de xebitî. Di 1995an de, bêçare bû koçî Skandenvaya bibe û li Nerwic dest bi karê xwe bike. Di 2006 de, vegeriya Qamişlo ta 2012an. Ji wê demê ve ta niha li Amedê û Sandviken a Siwêd, dijî.

Wek pirtûk tenê yek berhema wî bi navê " Tê Bîra Min" heye. Wî bi dehan gotar di kovarên Azadiya Welat, Avaşîn, Welatê Me, NetKurd û hinin din de - tev bi Kurdî - weşandine.

---

<sup>3</sup>Dr. Heznî dibêje: Ez, di 23. 4. 1940ê de, hatime dunyayê. Ji ber ku kalikê min Haco axa, weke di helbesteke seydayê Ehmed Namî de, di 22 nîsanê de, serê xwe danî û dotira rojê ez ji diya xwe re bûm. Ez nêzîkî 2 heftiyan bênav mam, sedem jî şîna kalikê min, navê min bû Heznî, ne Şîno yan Xemgîn.



## Hisên Omar

Hisên Omar rojnamevan, wergêr û nivîskar e

- Sala 1967an li gundê Rikava, ser bi herêma Dêrikê ya Rojavayê Kurdistanê jidayik bûye.

- Zaroktiya xwe li gund borand û xwendina qonaxa seretayî li dibistana gund biserî kir.

- Sala 1997an çûye bajarê Qamişlo û herdû qunaxên xwendina navendî û lîseyê li dibistanên bajêr biserî kirin.

- Sala 1986an li Zanîngeha Helebê dest bi xwendina beşê Zimanê Fransî li kolêja Wêje û Zanistên Mirovî kir.

- Sala 1991ê ji kolêjê derçû û dîploma xwe wergirt.

- Sala 1990î jiyana hevjinîyê ligel Fedwa Derwîş pêk aniye û ew bavê 2 zarokan e: Êva û Malva.

- Piştî biserîkirina xwendina zanîngehê jî her li Helebê maye heta sala 2012ê, ji encama şerê Sûriyê Heleb bicî hiştiye.

- Ji nîsana 2013an ve, li Hewlêrê paytexta Herêma Kurdistanê nişteci ye û li Tora Medyayî ya Rûdawê kar dike. Li Rûdawê, wek nûçesaz, rêveberê beşê Rojavayê Kurdistanê û amadekar û pêşkêşkarê bernameya Çavê Sêyem di Radioya Rûdawê de kar dike.

- Hersê zimanên Kurdî, Erebî û Fransî dizane. Zimanê Inglîzî jî heta radeyekê dizane.

### **Berhemên wî:**

Di warê wergerê de

- 39 pirtûk ji zimanê Fransî wergerandine ser zimanê Erebî.

- Komehelbesta helbestvanê Kurd ê navdar Şêrko Bêkes (Heftê Pencereyên Gerok) ji zimanê Kurd wergerandiye ser zimanê Erebî. Ew sala 2018an, ji weşanxaneya Dar el-Eyn, li Misrê hatiye weşandin.

Di warê nivîsandinê de

- Dawiya Dewleta Navendîkirî (bi zimanê Kurdî), Weşanxaneya J&j, Amed, 2018.

- Kurd di Kirîza Sûriyê de, (bi zimanê Erebî), ji weşanên Navenda Lêkolînan a Rûdaw, 2022.



## **Hisên Xerbî Abbas**

Di sala 1955an de, li gundê Dugirê jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Dugirê, ya amadeyê li Tirbesipiyê û ya bekalorya li Qamişloyê biserî kiriye.

Di sala 1976an de, Li Zanîngeha Şamê Edebiyat û Zimanê Ingilîzî biserî kiriye. Çend salan li dibistanên Qamişlo mamostetî kiriye.

Di sala 1986an de, ew çûye Elmanya û piştî heft salan wî nasnameya Elmanî wergirtiye.

Di sala 1993yan de, pirtûka xwe ya helbestê bi navê "Xewnên Dugirê" çapkiriye.

Di sala 2005an de, ew yek ji damezirênerê komela Kurdên Sûrî li Axin, li Elmanya bû û wî çend salan serokatiya komelê kiriye, û hem jî mamosteyê Zimanê Elmanî bû.





## Hoşeng Broka


- Helbestvan û lêkolînvan e.
- Di sala 1969an de, li gundê "Tilxatûnê" yê girêdayî navçeya Tirbespiyê /Başûrê Rojavayê Kurdistanê, ji dayîk bûye.
- Ji zankoya Şamê (Dîmeşqê) dîploma civaknasî (sosyologie) û derûnnasiyê (psychologie) wergirtiye (1994)
- Ji dawiya sala 1994an û vir de, li Elmanya dijî.
- Civaknasî û zanistên civakî li Zankoya Bielefeld a Elmanî, xwendiyê (2001)
- Magister di filozofiyê de (MA. Philosophie) ji zankoya Oldenburg a Elmanî wergirtiye (2013)
- Bi salan di rojnameyên dîgîtal wek "Elaph" a Erebi û rojnameyên Kurdî de (NetKurd wek nimûne), gotarên heftane nivîsandine.
- Aniha bi Kurdî mijûlî danîna hindêk berhemên filozofî ye.

### Berhemname:

- **Berhemên çapkirî**
- Mîtolojiya Êzdiyatîyê, Berlîn, 1995 (Lêkolîn / bi zimanê Erebi: دراسات في ميثولوجيا الديانة الإيزيدية).
- "Bawîşkandinin ji kopên minareyên razayî" (Helbest), Berlîn, 1995.

- "Serborekên çarşembên tozê" (Helbest), APEC, Stokholm, 1999.
- "Hizra xwedawendiyê di têksta avestane de", Lêkolîn, bi zimanê Elmanî (Di pirtûkeke hevbeş de, ligel komelek akadêmîsyên, nivîskar û lêkolînerên Kurd û biyanî, ku ji weşanên Înstîtûta Kurdî li Berlînê, li jêr navê "Dokumentation der Konferenz zu Avesta, 21-22.11.2001", Berlîn, 2002, hatiye weşandin.
- "Keskê dawî di cenazeya Xwedê de" (Helbest), Pêrî, Istanbul, 2002.
- "Derengî bajêr, weha diniqutim nimêja navê te" (Helbest), Pêrî, Istanbul, 2003.
- "Êzdiyatî û seqayên domoziyane (lêkolîn) bi zimanê Erebi (di berhevokeke hevbeş de, bi Dr. Xelîl Cindî re, li jêr navê "Êzdiyatî, dîrok û seqayên wê ), Silêmanî, 2003.
- "Ya ji sêvan û wêdetir" (Helbest), Pêrî, Istanbul, 2004.
- "Raza Tawisî Melek.. yan bineretiya xêr û şerr di Êzdiyatîyê de", weşanxeneya Temûz, Dîmeşiq, 2014 (lêkolîn / bi zimanê Erebi:  
(لغز طاوسي ملك.. أو أصل الخير والشر في الأيزيدية)
- Bi sedan lêkolîn û gotarên ronakbîrî, filosofî, wêjeyî û siyasî di derbarê Êzîdînasî, Zerdiştîyatî, mîtolojî, rexnegiriya olê, kordolojî, pirsên kêmayetî û pêkhatiyên Rojhilata Navîn û herweha Edebiyata Kurdî de, bi zimanên Erebi û Kurdî ji bo rojname û kovarên curbecur, nivîsandine.
- Di derbarê berhemên wî yê helbestyane de, rexnegir û ronakbîrê Kurd ê mezin Ibrahîm Mehmûd pirtûkeke rexnegirî ya mezin (672 R.) bi zimanê Erebi bi navê "Berhemên Hoşeng Broka yê helbestyane: Helbestvanek û masiyin di ava asîmanan de bilindbûyî"
- ( أعمال هوشنگ بروكا الشعرية: شاعر وأسماء محلقة في ماء السماء ) daniye.

- **Berhemên berî çapê bi sêvekê:**
  - Rê ji vir diçe axê
  - Wexta ku sêv şîpêya dimirin
  - Rastî ne yek e
  - Mirov çi ye?: Hebû nebû tiştek ji mirov mezintir nebû
  - Nietzsche: Fîlosofê siberojê û „fîlosofiya çakûç“
  - Logos, ol û fîlosofî
  - Çîroka Çarşemê



## Hoşeng Osê

Helbestvan û romanivîs e, ji Rojavayê Kurdistanê ye, di sala 1976an de, li bajarê Dirbêsiya binxetê hatiya jiyane.

Bi zimanê Kurdî û Erebi dinivîsîne. Hin mînak ji nivîs, gotar û lêkolînên wî hatine wergerandin zimanên Îngilîzî, Ferensî û Turkî û di rojname, malper û pirtûkan de hatine belavkirin.

Ta nuha; 9 dîwanên wî yê helbestê hatine çapkirin, 3ê ji wan bi zimanê Kurdî ne, û 5 bi zimanê Erebi ne, û yek jî bi du zimanên Holendî-Erebi ye.

Hin mînak ji helbestên wî hatine wergerandin zimanên Ferensî, Îngilîzî, Holendî û Turkî.

Di sala 2010an de, li Cezayrê, li ser helbestek xwe, xelat wergirtiye.

Ta nuha, 4 romanên wî bi zimanê Erebi hatine çapkirin.

Di sala 2017an de, romana wî ya yekemîn, xelata KATARA ya romanê ku ji girîngtirîn xelatên romanê di cîhana Erebi de ye, wergirtiye, û romana wî hatiye wergerandin zimanên Engilîzî û Ferensî.

Di sala 2021ê de, PENa Belcîka û navenda helbestê li Belcîka bi hev re, 13 helbestên Hoşeng wergerandine zimanê Holandî û kirine pirtûkek bi navê; "Ez ne deriya me" û belav kirin.

Herwiha Hoşeng Osê karê rojnamevaniyê jî kiriye, û di kovarên "Sorgul", "Rojda" û "Leylan" de û di kenala "ROJ.TV" de xebitiye, û nivîsên wî di gelek kovar û rojnamên Erebb, Kurd û Turkan de jî hatine belav kirin, weke: Elhayat, Elşerq-Elewast, Elsefîr, Elmustaqbel, Elkhaleej, Radîkal, Günlük, Azadiya Welat, BasNûçe, Kovara W, Peyv, Qelemûn û...hwd.

Hoşeng, ji ber nivîsên xwe yê rexneyî li dij rêjîma Sûrî, û ji ber sedemên siyasî û gefxwarinên hêzên ewlekariyê yê rêjîma Sûrî, neçar ma ji Şamê bar bike, û ji dawiya sala 2010an û vir de, li Belcîka dijî.

Hoşeng hetiyê vexwendin ji bo gelek festîval, pêşangehên pirtûkan, û çalakiyên rewşenbîrî, wêjeyî, li gelek welatan, weke: Misir, Tûnis, Felestîn, Belcîka, Almaniya û Kurdistanê.

Endamê PENa Belcîkî û PENa navnetewî ye.



## Hozan Girkundê

Navê wî Hozan Girkundê ye. Ew bi xwe ji gundê Girkundê ye. Di sala 1971ê de, jidayik bûye. Wî jiyana xwe ya herî bêtir li gund derbas kiriye. Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe bi dawî kiriye. Di malbatek xizan û cotkarî de jiyaye. Lê riç û bandora tevgera Kurdî gelekî li ser wî hebû û bi salan kar û xebata rêzanî kir, ji lewra berê xwe da nivîsandina bi zimanê Kurdî, û bi taybetî di salên heştêyî de, dest bi nivîsandina helbestê kir. Di destpêkê de, helbesta terazû nivîsand, piştî wê berê xwe da helbesta nûjen û bi wî şêweyî berdewam kir.

Di gelek kovar, rojname û malperên Kurdî de berhemên xwe weşandin. Hêdî hêdî têkiliyên wî bi helbestvan û nivîskarên Kurd re çêbûn, mîna: Xemgînê Remo, Ferhadê Içmo, Arşevê Oskan, Salihê Heydo, Dilawerê Zengî, Fethula Huseynî û gelek helbestvan û nivîskarên din. Di gelek Festîval û şevbihêrkên Kurdî de beşdar bû. Li kêleka wê, di hin komên Folklorî de jî kar û xebat kir, mîna: Koma Mîtan, Koma Ronahî, koma Xanî, koma Azadî, koma Şehîd Welat. Gelek hunermendên Kurd helbestên wî awaz kirine, mîna: Hisên Salih, Rûbar Hiso, Şeyda, Behcet Elî, Nûrî Elî, Mihemed Şêxmûs, Şêrîn Salih, Muntahir Salih û gelek hunermendên din.

Di sala 1996 de, wî û çend helbestvanan, li bajarê Dirbêsiyê komelak bi navê Komela Zêwa ava kirin, di bin vî navî de, gelek kar û xebat, li bajêr û li

derveyî bajêr kirin. Endamên Komelê ev bûn: Arşevê Oskan, Xemgînê Remo, Mîdasê Azîzî, Hemîd Şerîf, Ciwanê Evdal, Ibrahîm Berces, Zeyneb Azîzî.

**Berhemên wî ev in:**

-Di sala 1997an de, yekem pirtûka xwe di bin navê Evîna Vejandî çap kir.

-Ne payîz daristanan di weşînin, sala 1999

-Vehêsînek li ber delavên çavên dil berê, sala 2006


-Bihnek ji sirûşa peyama te, sala 2016

-çend wêne ji şengewîna gundê min, sala 2019

-Vedenga hestan, sala 2021

-العشق الأزلي وملحمة الألم ji Kurdî bo Erebî werger: Mesûd dawûd.

-Du pirtûkên wî li ber çapê ne: Henasên te û Hîna zû bû.



## Husên Hebeş

Husên Hebeş li Rojavayê Kurdistan, li gundê Çeqmaqa Biçûk, navçeya Efrîn, hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî li gundan, li bajarokê Reco, ya navendî li Efrînê (1960 -1963), ya amadeyî li Helebê, Dar Elmu'elîmîn (1963 – 1967) li Sûryayê temam kirine. Mamoste li gundê Elhulwaniyê, navçeya Cerablusê ta 24 nîsana 1968, berpîrsên emniyeta sûrî wî ji kar derdixin, ew bixemgînî vedigerê nav malbeta xwe li gund. Rajeya leşkeriyê ji 8.7.1968 ta 1ê gulana 1972. 5ê cotmeha 1972 Buraqa wî - balafira fîrma Malêv a hingarî- wî Mî'iracefirokxaneya Şêremetovo, li Mosko peyadike. Ji wê demê de xwandina zanîngehî li Voronêjê û paşê li zanîngaha Lomonosov ya hukûmî dest pê dike. Sala 1978 wergirtina master di tîlêvizyon û radyoyê de, û sala 1979 dibe xwendevanê doktora; her ew sala jî sala evîndariyê û jinanînê bû li Lênîngîradê, bi dewateke sêrojî li gor adeta Kurdî. Di 1983 tîtêla Doktor Dr. (ph.D) di filolojiya zanistên filolojiyê de, li Mosko bidestxist.

Ji destpêka 1984 de, ew tev malbata xwe li Elmaniya, li Bonnê dijî.

Hînbûna zimanê Elmanî, çalakiyên rewşenbîrî ji wê demê de û ta niha berdewam in. Li wir qonaxeke nû erênî di jiyana nivîsevan de dest pê dike; ew di welatekî serbest de dijî, kes jê napirse û nabêje, çima tu bi Kurdî dinivîsî û dixwînî, yan jî mera nivîsên xwe di qulên dîwaran de venaşêre.

Ewê spasdarê Elmaniya ye, ku rêya jiyaneke bextewar li pîşa wî û malbetê vekir; hevjinê wî Dr. Gêlas, pispora nexwaşiyên derûnî ye, kurê wî Hogir –



master di informatikê de li zanîngeha Bonnê wergirtiye û keça wî Viyan – pispora derûnî ya zarokan e-.

Husên Hebeş bavpîrê du keçnevî û du kurneviya ye. Ew jî bexteweriyek e taserî ye.

Helbestvan biheyhêrî têkêlî jiyana çanadî li Elmaniya û li dervayî wê dibe. Ew pişkdariya fêstîvaline navnetewî ya helbestvaniyê dibe.

Ji sala 2000ê ve, dibe mamosteyê zimanê Kurdî li dibistanên Bonnê. Bi pêşxerî û xebata wî ya du salan zimanê Kurdî, ji zaroyên Kurd re ji pola yekê û ta diheyê tê pejirandin, eger dê û bavên wan razî bibin ew Kurdî bixwînin. Ev jî destketineke dîrokî ye ji Kurdan re. Ji demsala havînî 2008 ta ya 2010, waneyên Kurdî li zanîngeha Bonnê dan xwendevanan.

Nîzîka deh salan jî kursa zimanê Kurdî li Bildungswewrk vekir ji Kurd û biyaniyan re li Bonnê, û demekê li FHa Triosdorfê jî.

Wergervan Husên Hebeş ji zimanên Avesta, Elmanî, Erebi, farisî, Îngilîzî, Parthî û Rusî werdigerîne kudî.

Di tebaxa 2017 de, û ta niha ew, “Helbesta Hefteyê” werdigerîne Kurdî. Helbestine H. Hebeş bi 32 zimanan hatine wergerandin.

### **Beşdarî di Fêstîvalên Helbestvaniyê de**

- Sala 1996 ew vexwandî “Struga Poetry Evening 96” kirin, lê nikanî tê de beşdar bibe, wî nikanî bîlêta balafirê bikiriya.
- International Istanbul poetry Festival 2010. Merca beşdariya wî ew bû, eger rê bidin wî ku bi Kurdî berhemên xwe bixwîne, ewê bê. Berpirsan jî erê kirin.
- International Istanbul Beyoglu Poetry Festival Şiiristanbul, 2011
- “Mihai Eminescu” International Poetry Festival 2017
- Pişkdarî wek mêvan di “vekirina daweya Fêstîvala 10ê ya Helbestvaniya Navneteweyî “Эмигантикская Лира” li bajarê Lîje, Belçîka di 18.8. 2018 de.
- Festival Internationale di Poesia de la casa della Poesia di Como 2020, Italien bi (On-line) bi hoya Korona

- Beşdarî di pirojeya THE CHARM OF URBAN LANDSCAPE (CADOYA DÎMENA BAJÊRÎ) li Îtaliya 2022
  - Wek zimanzan pişkdariya Konferansa Lêgerînên Îranî, Societas Irannologica Europaea, “Eight European Conference of Iranian Studies” St. Peterburg, Russia, 2015, dike
    - Husên Hebeş Medaliya Mihai Eminescu (Romaniya) sala 2017 û Medaliya Cross-Cultural Communications 50<sup>th</sup> Anniversary Award 1971- 2020 (USA) sala 2020 wergirtin.

### **Endametî**

Sê salan (1993-1996) serokê PENa Kurd bû.

Endamê nivîsevan û hunermendên cîhanî (Ohio USA) bû.

Endamê Yekitiya Nivîskarên Elmanî (VS) bû.

Niha ne endam e di wan rêxistinan de. (1.11.2022).

### **Berhemên çapkiri**

1. Stirana êş û hêviyê. Filmekî belgeyî, bi Rusî, 1977
2. Sê roj li Elmaniya Fêdêral. Fîmekî belgeyî, bi Rusî, 1978 (Fîlmê dîplomê)
3. Birîna Çiya, helbest, Düsseldorf 1978
4. Rola kovara Hawarê di pêşdebirina çanda Kurdî de. Lêgerîna doktora bi Rusî, Moskova 1983. Wergêr û lêzedekirina wê bo Kurdî di salên 1996 Bonn, 1999 Sûriyê (bi nihênî) çap bûye. Çapa sîsiyê sala 2019, belavgeha Sersera, 2019, çapa internetê di malpera: [www.drhabasch.wordpress.com](http://www.drhabasch.wordpress.com), li ser daxwaza pir xwendevan û pisporan, sala 2022
5. Helbestên bijarte, Mîxayîl Lêrmontov, Bexda 1983 (Ew bi nasnavê Dr. Husên Rehber Rêzan belav bûye)
6. Çend stranên Folklorî, Bexda 1987 (Ew bi nasnavê Dr. Husên Rehber Rêzan belavbûye)

7. Rojnamevanî di rajeya monopolyan de. Wergerandin ji Rusî bo Erebi, Dar Elfarabi, Beyrût 1986.

8. Li wir lêvên keviran çik didin, helbest, belavgeha Hogir Bonn 1994. Wergera wê ya Elmanî „Dort funkeln die Lippen der Steine“ Avlos, Bonn 1994

9. Darên behîvê berên xwe dişewitînin, helbest, belavgeha Hogir Bonn 1998. Wergera wê ya Elmanî „Die Mandelbäume verbrennen ihre Früchte“ Avlos, Sankt - Augustin 1998

10. 90 saliya bûyîna zimanzanê mezin Qanatê Kurdo. Amadekirin, wergerandin li gel Tosinê Reşîd. Belavgeha Hogir, Bonn 2000

11. Dastanin ji helbestvaniya gelêrî Kurdî. Belavgeha Hogir, Bonn 2001

12. Haynrîş Haynê (Heinrich Heine) helbestên bijarte. Wergerandin ji Elmanî bo Kurdî û belavkirina wê li gel minhoyên Elmanî. Belavgeha Hogir, Bonn 2001

13. Ronahiyê Birîn meke, Verletze das Licht nicht helbest, bi Kurdî û Elmanî belavbûye. Belavgeha Hogir, Bonn 2005

14. Rêbera sêzimanî (Kurdî, Înglîzî, Hingarî), wergera Kurdî, Toro Kaido, Zalaegerszg, Hungary 2005

15. Ebdela Peşêw, hîlbijartin ji hemû dîwanan, ferhengdayîn û minhonivîs bi Kurmanciya Latînî. Elka, Istanbûl 2006

16. Nivîs li ser rûyê demê, Schreiben auf dem Gesicht der zeit bi Kurdî û Elmanî, Free Pen Verlag, Bonn, 2013

17. Gelebte Mehrsprachigkeit: *Zungenbrecher, Lieder, Kinder- und Abzählreime, Bewegungsspiele, Sprachstark Kurdisch*. (Pirtûkeke dibistananî ye li NRW bi Kurdî û Elmanî li gel kasête bona mamosteyên Elman, ewên zarokên Kurd di polê wan de dixwînin, ta şagirtên elman jî hînî Kurdî bibin). Bezirksregierung Köln, 2014

18. Redektoriya Lekolîna Zaza ya Prof. Qamatê Kurdo li gel Prof. Zera Zusif, Hogir Verlag, Bonn, 2016

19. Rûyên Demê, Лица Времени, helbestên bijarte, wergera Rusî li gel A. Gosên-Gîsbrext, СПб.: Искусство России 2017

20. Efrîn û canberê bi mirov hatiye navandin, Afrin und das Lebewesen, das Mensch genannt wurde, Kurdî – Elmanî, Hogir Verlag, Bonn 2018

21 Efrîn û canberê bi mirov hatiye navandin, Afrin and the Creature that used to be called Human Being, Kurdî – Îngilîzî, Hogir Verlag & Cross-Cultural Communications, Bonn, New York, 2019

22. Amadekirin û wergerandina berevoka “Qanatê Kurdo, jiyana û helwest (Lêkolîn û Bîranînên 90salî û 100salîyê) li gel Tosinê Reşîd, belavgeha Sersera Berlin 2019

23. Ji helbestvaniya cihanî 1 Helbesta hefteyê Îthaka, Efrîn di helbestvaniyê de, berhemine Kurdî. Werger ji Elmanî, Îngilîzî, Rusî û Erebî, Hogirir Verlag BonnA 2020

Di van salên dirêj de, pir lêkolîn û bend di rojname û kovarên Kurdî de li Kurdistanê û li Ewropa hatine belavkirin. Dem niha ne arîkar e, ku ew li vir bêne nimakirin. Hin hevpeyvînên giring jî bi nivîsevan re hatine kirin, ew di çapemeniyên Kurdî de hatine belavkirin.

### **Berhemên belavnebûyî**

- Cebelî, an Cembelî, folklor
- Çêrokine folklorî
- Gotinên di bin navê re bi Kurdî û Elmanî, folklor
- Rojmêrên Helebce
- Wergera têkstên Manî ji zimanê Parthî (werger temambûye, lê divê hîn li gel berpîrsên Eka-demîya Elmanî ya Zanistî bê axaftin bona rêdana çapkirinê). Zimanê Parthî zimanê navendî yê Kurdî tê hijmartin.

### **Karên hîn temam nebûne**

- Wergera Gathayên Zerdoşt ji zimanê Avesta
- Ferhenga Hogir a Kurdî- Kurdî
- Bêjeyên Mîdî (529) peyv di lêgerîna Walter Hinz de. Ev peyvina sermiyanekî zêrînî ne ji zimanê Kurdî re. Zimanê Mîdî zimanê kevin yê Kurdî tê hijmartin
- Ji sala 1973yan de, û ta niha ew rojmêrên xwe dinivîse, lê mixabin rojmêrên 10 salan li Mosko û li gel hin kutêban hindabûn. Ew ziyaneke pir mezin e ji nivîsevan re.



## **Husên M. Hebeş (Hussein Habasch)**

Sala 1970yî li gundê Şiyê, herêma Efrînê li Rojavayê Kurdistanê jidayik bûye.

-Ji dawiya 1996 de, li Almaniya dijî.

### **-Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

1- Noqbûna di nav Gulan de/ weşanên Azmina li Urdinê û ji weşanên Alwah li Madrîdê (2002).

2- Revyayên di çemê Êvrosê re/ weşanên Sanabel li Qahîre (2004).

3- Ji dilbijînê bilindtir û ji newqa xezalê xweştir/ ji weşanên Alwah li Madrîdê (2007).

4- Windabûnên ji bo Selîm Berekat/ ji weşanên Alzaman, Şam (2009).

5- Firişteyê firyane (babetên li ser zarokên Sûrî)/ ji weşanên Moment li Londonê (2013).

6- A flying Angel (Texts about Syrian children) bi zimanê Îngilîzî/ ji weşanên Bogdanî li Albanya (2015).

7- Xewnên di Dîwêr de/ ev dîwana helbestvanê Albanî Jeton Kelmendi ye, min wergerandiye Kurdî - ji weşanên Bogdanî li Albanyayê (2015).

8- No pasarán "Derbas nabin"/ bi zimanê Spanî, pirtûk ji hêla Festîvala Helbestê ya Navnetewî li Puerto Rico hatiye weşandin (2016).

9- Dos arboles “Du dar”/ bi zimanê Spanî, pirtûk ji hêla Festîvala Helbestê ya Navnetewî li El Salvador hatiye weşandin (2017).

10- Tiempos de Guerra “Demên şer”/ bi zimanê Spanî, pirtûk ji hêla Mala helbestê û ji hêla Festîvala Helbestê ya Navnetewî li Costa Rica hatiye weşandin (2017).

11- Copaci Cu Chef “Darên sermest”/ bi zimanê Romanî, ji weşanên Ars Longa li Romanya (2017).

12- Taya Bîhokan/ ji weşanên Sersera li Berlînê (2019).

13- Berfa sor/ bi zimanê Çînî, pirtûk ji hêla Festîvala Helbestê ya Navnetewî li Taiwanê hatiye weşandin (2019).

14- Peace for Afrin, Peace for Kurdistan “Aştî ji bo Efrînê, Aştî ji bo Kurdistanê”/ ev Antolojiyê helbestê ye, navnetewî ye, bi zimanê Îngilîzî û Spanî ye. Min û helbestvana Taiwanî Miao Yi -Tu amadekiriye, tê de nêzîkî 80 helbestvan ji cîhanê beşdar bûne, û hestên xwe li ser Efrîn û Kurdistanê nivîsandine/ ji weşanên Sersera li Berlînê (2019).

15- Mirî di buhêrkan de gengeşeyê dîkin/ ji weşanên Al-Darawich li Plowdiw, Bulgaria (2020).

16- Darên sermest/ ji weşanên Sersera li Berlînê (2020).

17- Kulîlka Espinillo/ bi zimanê Spanî, ev pirtûkeke hevbeş e bi helbestvana Kolombiyayî Bibiana Bernal re, ku ji hêla Weqfa Çandî ya bi navê Esteros ve li Arjantîna hatiye weşandin (2020).

18- Bêzariya Peykerekî Westiyayî/ ji weşanên Sersera li Berlînê (2021).

19- A Rose for the Heart of Life/ Helbestên bijarte bi zimanê Îngilîzî, ji weşanên Inner Child Press International li Amerîka (2021).

-Hinek ji helbestên wî hatine wergerandin zimanê Îngilîzî, Almanî, Îspanyolî, Fransî, Farisî, Ozbek, Albanî, Rusî, Romanî, Îtalî, Sirbî, Makedonî, Bulgarî, Polonî, Slovenî, Lîtwanî, Vîetnamî, Nepalî, Hindî, Malayalam, Bengalî,

Tirkî, Berberî (Amazîxî), Boşnî, Portekîzî, Hungarî, Çînî, Yewnanî, Mandarin (zimanê Taywanê) û Tzotzil (zimanê gelên Mayan yên Meksîkayê).

-Helbestên wî di bêtirî 100 antolojiyên helbestî yên navneteweyî de hatine belavkirin.


-Xelata Helbestvanê Kurd yê gewre Hemid Bedirxan, ya ku ji aliyê Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd ve tê dayîn, wergirtiye. Herwiha xelata "Bosnian Stećak" Navneteweyî ya Helbestê, ku ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Bosna û Herzegovina ve tê dayîn. Xelata bronzî ya helbestê "Aristoteles" ji festîvala helbestê ya navneteweyî ya Naoussa li Yewnanîstanê jî wergirtiye.

#### **-Beşdarbûna Festîvalên helbestê:**

- Festîvala helbestê ya navnetewî li Medellin/ Colombia 2009
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Granada/ Nicaragua 2010
- Salona helbestê ya Almanî-Erebî li gelek bajarên Almanî 2012, 2013
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Parîsê 2013
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Safi/ Morocco, salên 2014, 2015, 2016, 2017, 2018, 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Guelmim/ Morocco, salên 2014, 2015, 2016
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Khenifra / Morocco 2014, 2015
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Nador/ Morocco 2014
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Curtea de Argeş/ Romania 2014
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Beni-Mellal / Morocco 2015
- Festival Helbesta Kurdî li dervayî welêt/ Gelek Salan
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Marrakech/ Morocco 2015
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Mexico City 2015
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Ouarzazate/ Morocco 2015



- Festîvala helbestê ya navnetewî li Guercif/ Morocco 2016
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Puerto Rico 2016
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Meknes/ Morocco 2017
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Martil/ Morocco 2017
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Lituania 2017
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Ecuador 2017
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Costa Rica 2017
- Festîvala helbestê ya navnetewî li El Salvador 2017
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Kosovo 2017
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Bulgaria 2018
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Struga/ Makadonia 2018
- Festîvala helbestê ya navnetewî li M'Diq/ Morocco 2018
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Slovinia 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Craiova/ Romania 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Khouribga/ Morocco 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Essaouira/ Morocco 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Havana/ Kûba 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Taiwan 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Chengdu/ China 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li New York City 2019
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Jönköping/ Swêd 2021
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Sarajevo/ Bosna 2022
- Festîvala helbestê ya navnetewî li Yonanistanê 2022.



## **Ibrahîm Abbas Ibrahîm**

- Di sala 1971ê de, li bajarê Heseke jidayik bû.
- Di sala 1997an de, li zanîngeha Şamê (Dîmeşiq) di beşa dîrokê de lîsans wergirt.
- Di sala 1998an de, li zanîngeha Şamê (Dîmeşiq) dîploma Qualification û pisporiya arkiyolojiyê wergirt.
- Di salên (2002-2013) an de, li dibistanên Qamişlo mamosteyê dîrokê bû.
- Di sala 2016an de, lîsansa bilind (Master) di beşa ziman û çanda Kurdî de, li zanîngeha Mardînê wergirt.
- Di sala 2021an de, dektora di beşa ziman û çanda Kurdî de li zanîngeha Diclê li Amedê (Diyarbakir) wergirt.
- Di salên (2002-2013)an de, li dibistanên Qamişlo mamostê dîrokê bû.
- Di sala 2012an de, bû endamê damezirandina komeleya Subartu ya guhdan bi dîrok û kelepûrê Kurdî dike, û du salan serokatiya wê kiriye (2012/2013).
- Di sala 2018an de, bû endamê komeleya nivîskarên Kurd li Swêdê.
- Di sala 2018an de, xelata Cegerxwîn a akadîmî wergirt (yekîtiya giştî ya nivîskar û rojnemevanên Kurd li Sûriyê).

### **Berhemên wî:**

- Rengvedana dîroka Kurdî di helbestên Cegerxwîn de, weşanxana APEC Swêd, 2018.
- Kurd û wargehên wan di pirtûka Sûretu'l-erd ya Ibin hewqel de, weşanxana APEC Swêd, 2020.
- Nivîsandina 48 belgefilmên dîrokî û arkiyolojîk (Şûnewarî) derbarê Kurdan û welatê wan de, ku ji aliyê dezgeha (Rê Production) ve hatine amadekirin.
- Hejmarek gotar û lêkolînên derbarê çand û dîroka Kurdî de, di hin govar û malperan de, hatine weşandin

### **Berhemên wî yên neçapkirî:**

- 1- Kurd û wargehên wan di berhemên erdnîgarî de (yên di serdema Memlûkî de hatine nivîsandin) (648-922 H. / 1250-1517 Z.).



## Ibrahîm Xelîl

Di sala 1972yan de, li bajarê Heseke li Rojavayê Kurdistanê jidayik bû. Ibrahîm kurê Ferhan kurê Ibrahîm kurê Xelîl ê Incî ye.

Ibrahîm Xelîl zaroktiya xwe li bajarê Heseke, taxa Tilhecer borand û xwendina xwe ya seretayî, navendî û lîse lê bi serî kir.

Sala 1988an, fêrî zimanê Kurdî bû, û ji sala 1997an de dest bi fêkirina Kurdî li bajarê Heseke kir. .

Di sala 1999an de, dîplomaya wêjeya fransîzî ji zankoya Helebê wergirt. Paşê, di ber karê dersdayînê re, dîplomaya perwerdehiyê, sala 2006an, bi dest xist. .

Ji 11.12 2021ê de, li welatê Almanayê dijî .

Nivîs û gotarên wî di warê wêje û raman û siyasetê de, di gelek rojname û malperên Kurdî û Erebî de, hatine weşandin.

Ibrahîm Xelîl, demekê endamê komîteya rêveber a (Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya) bû, Herwiha endamê Komîteya rêveber a (Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê) li Qamişlo bû. .

### **Werger û berhemên wî yên çapkiri:**

- Wergera romana (Berf) a Maxence Fermine ji fransîzî bo Kurdî, weşanên projeya Hinar, Qamişlo 2016

- Wergera (Zordestname) ya El-kewakibî ji Erebi bo Kurdî, weşanên projeya Hinar, Qamişlo, 2017

- Wergera (La Conquête du Pain) a Pyter Kropotkin ji fransîzî bo Erebi, weşanxaneya Neqş, Qamişlo 2019

- Wergera romana (Duwahemîn Henarî Dunya) a Bextyar Elî, ji kudî bo Erebi, (bi hevkarîya Ebdella Şêxo), weşanxaneya Miskilyanî, Tûnis, 2019

- Wergera kurteçîrokên bi navê (Gulokê) a Guy de Maupassant ji fransîzî bo Kurdî, weşanxaneya Neqş, Qamişlo, 2021

- Wergera şanoya (Caligula) ya Albert Camus ji fransîzî bo Kurdî, weşanxaneya Neqş, Qamişlo, 2021

- Wergera romana (Koşkî Balinde Xemgînekan) a Bextyar Elî, ji Kurdî bo Erebi, Qamişlo (weşanxaneya Neqş), Kuweyt (Dar El-Xan), 2021

- Lêveger û rastkirina berhemên giştî yên "Ehmedê Xanî", weşanxaneya Neqş, Qamişlo, 2021

- Wergera romana (Dagîrkirdinî Tarîkî) a Bextyar Elî, ji Kurdî bo Erebi (li ber çapê ye)

Li gel jimareka berhemên wî yên destnivîs bi zimanên Kurdî û Erebi û fransîzî di warên ziman û çîrok û helbestê de ku hîn çap nebûne.



## Imer Kalo

Imer Kalo di Nîsana sala 1977an de, li gundê Sêtelpê yê ser bi bajarokê Şêran ve, li herêma Kobanî ya Rojavayê Kurdistanê - Sûriyê jidayik bûye.

Di sala 2007an de, xwendina xwe ya bilind di Beşê Ragihandinê de, li Zankoya Dîmeşqê, paytexta Sûriyê, qedandiye û bekaloryos bi destxistiye.

Endamê Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê, û Yekîtiya Rojnamevanên Sûriyê, û Yekîtiya Rojnamevanan ya Navdewletî (International Federation of Journalists - IFJ) ye.

Ji sala 2000î ve bi herdu zimanên Kurdî û Erebî di rojnamegeriya çapkirî û dezgehên eliktronî de kar kiriye û nivîsandiye.

Di navbera salên 2010 - 2014an de, xwedî û edîtorê Rojnameya DILNAME, û pişt re, malpera Rojnameya Dilname li Kobanî bû.

Ji 1ê Gulana sala 2013an heta 5ê Tebaxa sala 2015an, nûçegîhanê Tora Medyayî ya Rûdaw li herêma Kobanî ya Rojavayê Kurdistanê bû.

Ji 6ê Tebaxa sala 2015an ve, bûye bêjer û pêşkêşkarê nûçeyên siyasî li navenda sereke ya Tora Medyayî ya Rûdaw li Hewlêrê, paytexta Herêma Kurdistanê.

Amedekar û derhênerê belgefilimên TV ya Tora Medyayî ya Rûdaw: Kobanî di 134 Rojan de - Alan Kurdî... Simbola Koçberiya Welatekî -


Pêşmerge li Kobanî, û gelek bername û belgefilim ji Radioya Tora Medyayî ya Rûdaw re amede û pêşkêş kirine.

Di roja 26-05-2018an de, ji aliyê Rêxistina Navdewletî ya Geşepêdanê û Mafên Mirovan, ya ser bi Neteweyên Yekgirtî (UN)ê ve, bi Xelata Aştiya Cîhanî hatiye xelatkirin.

Di roja 25 – 08 - 2018an de, ji aliyê Hêzên Ewlekariya Leşgerî yê Hikûmeta Sûriyê ve, li ser rêbenda Tayha li herêma Minbicê ya parêzgeha Helebê hatibû girtin, û pişt re ew ji bo Şaxê Filestîn li Şamê, paytexta Sûriyê, hatibû veguhestin, û di dema girtina wî de li Sûriyê, gelek dezgeh, rêxistin û saziyên mafên mirovan û ragihandinê yê Kurdistanî, herêmî û navdewletî wekî Komîteya Parastina Rojnamevanan (Committee to Protect Journalists - CPJ) û Rêxistina Lêborîna Navdewletî (Amnesty International) piştgiriya wî kiribûn.

#### **Berhemên Imer Kalo yê çapkirî:**

- 1- Mihemed Henîfe (Destan) - Weşanxaneya AVA, Kobanî - Berçille 2019.
- 2- Rojnameya Dilname (Komhejmar) - Weşanxaneya Sîtav, Wan - Adar 2020.



## Imran Isa

Sala 1947an li gundê Sebahiyê, yê bi ser devera Amûdê ve, hatiye dunyayê. Xwendina seretayî li gundên derdorê û ya navîn li Qamişloyê dibe serî. Seba egerên aborî xwendinê berdide û çend salan bi şûn de, di ciwanîyê de, xwendina xwe didomîne û derbasî Zanîngeha Şamê, Beşê Cografyayê dibe. Lê dîsa jî ji ber sedemên aborî û ewlehî nikare xwendina xwe bi dawî bike. Ew hem li Tirkîyeyê hem jî li Sûriyeyê, ji ber xebatên xwe yê siyasî tê zindankirin. Di salên 1990an de, êdî dest bi nivîsînê dike û li dor gelek babetan, bi dehan gotar di rojname û kovarên Kurdî de diweşîne. "Destegul" berhema wî ya pêşîn e ku tê weşandin. Ew anuha li bajarê Qamişloyê dijî û tenê mijûlî xwendin û nivîsînê ye.

### Berhem

-Destegul<sup>4</sup>, pêşgotin: Ferîd Mîtan, çapa yekem, Qamişlo, 2021, çapeke taybet.

---

<sup>4</sup> Piraniya gotar û nivîsarên "Destegul" salên 1990an di kovarên kurdî de hatine weşandin. Vê dawiyê nivîskarî ew berhev kirine û di vê pirtûkê de civandine.





## Imran Yûsiv

Imran Yûsiv, navê bavê wî Mele Nezîr e. Di sala 1972yan de, li bajarê Heseke jidayik dibe. Xwendina seretayî, amadeyî ta bi peymangehê li bajarê xwe biserî dike. Di sala 1992yan de, ji Peymangeha Amadekirina Mamosteyan (Beşê hunera şewekariyê) derdiçe. Ji sala 1993yan ta sala 2020an karê mamostetiye dike, di ber re mijûlê karê nivîsandin û hunerê dibe.

Ji biçûkaniya xwe ve hez huner û wêjeyê dike. Di temenê 14 saliya xwe de fêrî zimanê Kurdî wek xwendin û nivîsandin dibe, ji wê demê de dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî dike, hin helbest, çîrok û şanoyan dinivîse.

Hunera şanogeriye bala wî dikişîne û weke listikvan, derhêner û nivîser tê de dixebite.

Di sala 2000an de, li Şamê tevî xuleke amadekirina derhêner dibe, piştî wê vedigere bajarê xwe û bi komên Kurdî re karê şanogeriye dike. Mîna koma Azadî û Koma Tolhildan.

Gelek şano ji nivîs û derhêneriya wî li cejna Newrozê hatine pêşkêşkirin.

Di ber karê şanogeriye re kurteçîrok, helbest, gotar û sirûdên zarokan jî dinivîsîne.

Di sala 2014an de, beşdarî yekemîn Mihrecana Çîroka Kurdî, ya (Fûad Temo) ya ku ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Sûriya hate birêxistinandin, dibe û li ser çîroka xwe ya bi navê (Koçberî) xelata baştirîn çîrok werdigire.

Di sala 2017an de, beşdarî Pêşbirka Deqên Şanoyê yên Kurdî (pêşbirka Ebdilrehîm Rehmî) ya ku ji hêla Şanoya Bajêr ya şaredariya bajarê Amedê hate birêxistinandin dibe û xelata baştirîn deqê şano li ser şanoya xwe ya bi navê Venasîn werdigire.

Di sala 2005an de, li zankoya Şamê (xwendina vekirî) beşê ragihandinê dixwîne, lê piştî 2 salan û ji ber rewşeke tenduristî xwendina xwe radiwestîne.


Ji sala 2017an ve sernivîsertiya Kovara Welat dike, ku ew jî kovareke mehane ye, bi zimanê Kurdî ye û ji sala 2013an li deverên Rojavayê Kurdistanê tê derxistin û belavkirin.

#### **Ta niha du pirtûkên wî hatine çapkirin:**

-Venasîn, deqekî şano ye, ji hêla weşanxaneyê Sersera hate çapkirin.

-Gurê Belengaz û Roviye Xêrnexwaz, deqekî şano ji bo biçûkan e, di sala 2016an de, hate çapkirin.

Du pirtûkên din li ber çapê ne, yek jê şano ye, ya din kurteçîrok e. Herweha karê wergerê jî dike.



## **Imranê Menteş**

Imranê Menteş kurê Şêxmûsê Ebdê Osê Menteş e, di roja 15ê Adarê sala 1970yê de, li gundê Nayif, navbera Amûdê û Heseke, jidayik bûye. Zaroktiya xwe li gundê Nayif derbas kiriye. Pişt re li gundê (Tel Tewîlê Merşo), ku bi ser bajarê Heseke ve ye, jiyana xwe berdewam kiriye, nêzîkî 35 salan li wê gundê maye. Niha ew li taxa Miftî li bajarê Heseke jiyana xwe berdewam dike.

Bavê wî Şêxmûs sala 1981ê çû ser dilovaniya Xwedê, dayika wî Fethiya ji temenê çar salî ve, û bi sedema nezaniya hin pîrekên gundê, bi çavên xwe ta niha hew dibîne. Di dîwana yekem de, di helbesta xwe ya bi sernavê (Dayika min), mamoste Imran behsa vê rûdanê dike.

Temenê wî nêzîkî (18) salan bû dema ku dest bi nivîsandina helbestê kir.

- Di sala 1989an de, bawernameya Bekelorya wêjeyî wergirt, û derbasî Enstîtuya amedekirina mamosteyan (beşê zimanê Erebi) li bajarê Heseke bû, ta sala 1991ê ku xwendina xwe bi dawî kir, û karê mamostetiyê li dibistanên gundewar û bajarê Heseke dike.

- Di sala 2012an de, ew yek ji damezirînerên Hevgihana Mamosteyên Kurd li bajarê Heseke bû.

- Di sala 2014an de, tevî Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriya bû, û niha Endamê komîta cîbicîkar e di Yekîtiyê de.

- Endamê desteya nivîsînê di kovara Pênûsa Azad de ye. Beşdarî gelek semîner û mehrecanan bûye, herweha helbestên wî di hin kovar û belavokên Kurdî de hatine weşandin, û hin ji helbestên wî hatine awazkirin û bûne stran.


- Ji sala 2017an ve, dest bi nivîsandina çîrokê kiriye.

**Ji berhemên wî yê çapbûyî:**

1- Dîwana yekem (**Kaniya Jînê**) hatiye çapkirin sala 2014

2- Dîwana duyem (**Derdê Evînê**) hatiye çapkirin 2018

3- Dîwana sêyem (**Mujdeya Azadiyê**) çapkirin sala 2018



## Isa Mihemed Xelo

Isa Mihemed Xelo Qeregêçî, di sala 1937an de, bapîrê wî ji Serxetê daket Binxetê, li Serê Kaniyê nişteçî bûye. Bavê wî tayê bitenê bû, bê bira bû tenê xwehek wî hebû. Ew ji wî bavî pênc bira û du xweh çêbûn.

Ew di sala 1956an de, li gundê Bîr-Nûh, başûrê Serê Kaniyê 7km dikeve, jidayik bû. Hêjayî gotinê ye ku yekî Ermenî navê Issa li wî kir. Bavê wî di gelek qonaxê jiyane xweşî û reşî re derbas bû, her salê li gundekî bû, ta sala 1966an ew hatin gundê Alokê pênc salan li wir man.

Li ser daxwaza mamostê gund, bavê wî ew rêkir dibistanê. Mamoste ji xelkê Dirêkîş bû, navê wî Silêman Wesûf Heyder bû; bi saya vî mirovî li dibistanê bicih bû, ji wî re kinc û sernûs û pênuks kirîn. Ewî pola 2-3 xwend. Mamosteyekî din ji Tertûsê hat gundê wan û ew derbasî pola pêncan kir.

Li gundê Alok, ew di xwendina seretayî de, bi serket. Rojekê du birayên wî bi zimanê Erebî bi hevdu re dipeyvîn. Bavê wî ji muxtarê gund re got: "Zarokên min çirûk bûn, wê zimanê Kurdî jibîr bikin. Muxtar keniya.. ciwanmêr bû, dilê xwe negirt û ji bavê min re derbas kir".

Di sala 1970yê de, ew hatin bajarê Serê Kaniyê, di dibistana amadeyî de xwend, têkiliyên wî bi helbestvan Bêbihar re çêbûn. Mirovekî payenizim bû, tim jê re helbestên xwe dixwendin.

Wî ji zimanê Kurdî pir hezkir. Li bajarê Serê Kaniyê bekeloriya wêjayî tunebû, ji neçarî Bekeloriya zanistî xwend, bi dijwarî sitend. Ji ber rewşa

abûrî xwendina xwe bi dawî nekir. Di sala 1979an de, xwest fêrî Kurdî bibe. Hevalekî wî yê piçûkanî hebû, navê wî Emerê Ebdikê bavê Teymûr bû. Ji wî re Alîfbêya Osman Sebrî, kovara Gelawêj û Gulistan tanîn, ew bi saya wan baş fêrî zimanê Kurdî bû.

Ewî pir peyvên Kurdî komkirin. Çend salekî ji nivîsandinê dûrket, heta qeyrana sûrî, paşê dîsa vegeriya nivîsandinê. Gelek helbest nivîsandin û pirtûkek bi navê "Welat û Civat" amade kiribû. Nêzî 65 helbest 180 rûpel bû, pêşgotina wê mamosteyê nemir Mihemed Elî Şakir nivîsî bû.

Di sala 2017an de, pirtûka xwe ji Yekîtiya Rewşenbîrên Cizîrê re ji bo çapkirinê rêkir, lê sed mixabin çap nekirin. Dîwanek din bi navê "Koça Mirinê" 120 kîte û hin helbestên din hene, pêşgotina wê mamosta Hozanê Girkundê nivîsand, amade ye ji bo çapkirinê. Mamosta nemir Mihemed Elî pir alîkarî bi wî re kir. Ew helbesta kêşankirî dihûne.



## Ismetê Seyda

Helbestvan, siyasetmedar û ronakbîrê Kurd Ismetê Seyda, ew bi xwe ji malbateke welatparêz e, mamê wî Ubeydullah û bavê wî Mela Fethullah du zanayên olî yên navdar ên riya Neqşebendiyan li Kurdistanê Tirkîyê (Bakurê Kurdistanê) bûn, û di sala 1908an de, beşdarî di Şoreşa Bitlîsê de kirin. Piştî Şerê Cîhanî yê Yekem, ji herêma Hêzan a eyaleta Bedlîsê, koçî bajarê Darayê li Bakurê Kurdistanê, û ji wir jî koçî bajarê Amûdê yê Kurdistanê Sûriyê (Rojavayê Kurdistanê) kirin. Li bajarê Amûdê bi cî û war bûn. Gelek welatparêzên Kurd linik wan şagirt bûne, wek Cegerxwîn, Mela Ebdulletîf û Mela Şêxmûsê Qerqatî. Di sala 1925an de, şoreşa Şêx Se'îdê Pîran li dijî dewleta Tirkîyê a kemalîst dest pê kir, Mela Ubeydullah bi çekdarkirina ciwanan û şandina wan li kêleka Şêx Se'îdê Pîran beşdarî şoreşê bû. Ji ber vê yekê, rayedarên Tirk ên wê demê, ji bo Mela Ubeydullah bi awayekî bêyînî, biryara darvekirinê dan.

Di sala 1944an de, Mela Fethallah, bavê Ismetê Seyda, koçî gundê Sîhayê navçeya Tirbespiyê dike û Ismet li wî gundî hatiye dunyayê.

Di sala 1945an de, Mela Fethallah vedigere Amûdê, ku wê demê Amûdê li gorî deverên din ên herêmê pir li pêş bû, Amûdê bi navê: "Stûna Welat" dihat naskirin, Ismetê Seyda jî li wî bajarî mezin bûye.

Dema ku di sala 1957an de, yekemîn partiya siyasî ya Kurdî li Kurdistanê Sûriyê bi navê Partiya Demokrat a Kurdistanê hat damezirandin, Ismet ji ber temenê xwe yê piçûk wek endamekî şanê tevî partiyê bû.

Piştî ku Partî di sala 1965an de bû du beş, Rast û Çep, Ismet li aliyê Çep rawestiya. Di sala 1969an de, bû endamê serkirdayetiya Partiya Çep, û di sala 1975an de jî, bû Sekreterê Giştî yê Partiyê û ew li ser serê karê xwe ma heta roja mir, di sala 1989 de.

Hêjayî gotinê ye ku, Ismet siyasetmedarekî xwedî bîr û hizra siyasî bû ku li ser bingehê vekolîn û ezmûnê bû. Ew endamê şanda çepgir bû di konferansa lihevhatina herdu aliyên rastgir û çepgir de, ku daxwaza Mela Mistefa Barzanî yekirina herdû aliyên siyasî bû. Ji ber nerîn û dîtinên Ismet yê Kurdaiyê Barzanî pir rêzgirtina wî kir.

Ismet, hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, piştî vegera xwe ya ji wir, di sala 1988an de pêşbînî kir, wekî encamek neçarî ya nakokiyên navxweyî û derve yê siyaseta serokê kampa sosyalîst a wê demê; û ew yê pêşî bû ku banga yekirina tevgerên Kurd, yê nêzîkî hev in, kir. Di serdema desthilatdariya wî de, partiya Çep roleke bi bandor di nav tevgera Kurdî de hebû, û yek ji partiyên pêşeng bû di nava tevgerê de. Piştî mirina wî partiyê xwe winda kir û rastî çendîn şikestin û dubendiyan hat.

Ismet, ji bilî warê siyasî kesekî helbestvan û ronakbîr bû, û ji xortaniya xwe de evîndarê amûra bilûrê bû. Mirovekî zimanxweş û pir nefispiçûk bû ku gelek li gundên herêmê bi peyatî, û li taxên bajarê Qamişlo bi bisikleta duçerxe ya xwe, ji bo pêkanîna erkên xwe yê neteweyî û civakî, digeriya.

Helbestvanekî gelêrî bû ku gelek helbest nivîsandine, dîwaneke wî ya çapkirî bi navê "Mistek Azar" heye, li gel gelek helbestên dî yê evînî, civakî û neteweyî ku narvînê nehiştiye wan di dîwaneke helbestan de berhev bike û biweşîne. Çawa ku di destpêka ciwaniya xwe de di 45 saliya xwe de, tenê çil û pênc salî, di 6ê Îlona 1989an de, li yekê ji nexweşxaneyên Helebê, ji bo niştergeriya gurçikê bike, mir. Di 7ê Êlûnê de, merasîmeke bi coş, bi beşdariya bi hezaran ji gelê Kurd ku ji bajarê Qamişlo beşdarî merasîma koçkirinê bibûn, ber bi goristana Amûdê ve bi rê ket.





## Jan Dost

Ew, di 12ê adarê sala 1965an de, li bajarê Kobanî hatiye dinyayê. Xwendina xwe heta lîseyê li Kobanî qedandiye. Ji sala 1985an heta 1988an li zanîngeha Helebê fakulta zanistê beşê Biyolojiyê xwend, lê tamam nekir.

Jan Dost, di dehsaliya xwe de, dest bi nivîsîna helbestên Erebi kir; paşê ji panzdesalî de qulipî zimanê Kurdî. Çîroka wî ya yekem "Xewna Şewitî" sala 1993yan, di pêşbirka kurteçîroka Kurdî li Sûriyê de, xelata yekem stand. Herweha li Tirkîyê jî li ser sehneyê hatiye lîstin. Ji bilî wê çîrokê, Jan Dost çend çîrokên din jî nivîsandine, wek "Mistek Ax" ku sala 2007an li Almanyayê bû kurtefilmek, û "Rûyekî Şêrîn" û hinin din.

Herweha, gelek helbest û lêkolîn bi Erebi û Kurdî di rojname û kovarên cihê de weşandine. Jan Dost di malpera Diyarnamê de, di quncika xwe ya bi navê Şevnem de, ji 2007an heta 2012 nivîsar dinivîsandin.

Jan Dost ji sala 2000ê de, li Elmanyayê dijî, û ji Adara 2009an de hemwelatîyê Almanyayê ye.

### **Berhemên wî ev in:**

#### **Romanên bi Kurdî**

Mijabad Weşanxaneya Belkî, Amed, Sibat 2003, wergerandina bi Tirkî Sisli Şehir, Kawa Nemir, Beybun – Ankara: 2004

3 gav û 3 darek. Şeva dawî di jiyana Şêx Se'îdê Kal de. Roman: 2007,

weşanxana Avesta, Stembol. Çapa duyem Avesta: 2012

Mîrname. Roman; çapa yekem 2008. Çapa duyem 2012, Istembol, weşanxana Avesta. Wergera bi Tirkî: Muhsin Kizilkaya. Ithaki. Istanbul. 2011. Wergera Erebî Kalima, Abû Dabî 2011. Wergera Soranî Sebah Ismaîl, Endêshe, Silêmaniyê 2013

Martînê Bextewer. Avesta, Stembol, Gulan: 2012.

Romana Kobanî. Dara Yayinlari. Diyarbekir: 2017

### **Romanên bi Erebî**

Eşîq El-Mutercim, عشيق المترجم. Roman, Dubay, 2014.

Dem 'Ela El-Mizana المئذنة على. Roman, Qahire, Misir. 2014

Nawaqîs Roma نواقيس روما Roman. Bêrût, Lubnan. 2016

Otubusa Kesك باص أخضر Roman. Mîlano. Îtalya. 2019

سيرة خبات ٢٠٢٠ دار الفكر دمشق

مخطوط بطرسبورغ. دار مسكلياني تونس. ٢٠٢١

اللاهي. سيرة الكاتب العجوز. شركة المطبوعات. بيروت ٢٠٢٢

إنهم ينتظرون الفجر. دار الساقى بيروت ٢٠٢٢

### **Helbest**

Kela Dimdim, Destan. Weşanên Rewşen û Melsa 1991 Bonn-Istembol. Çapa çaran: Avesta- Istembol: havîna 2011

Sazek ji çavên Kurdistan re أغنية لعيني كردستان, Helbest bi Kurdî û Erebî. 1994, Sûriya

Dîwana Jan. Helbest. 2010. SemaKurd, Dubai

Dîwana Jan. Helbest. 2012. Avesta, Istembol

قصائد نسبتها الحرب في جيب الشاعر. دار فضاءات. ٢٠٢١

### **Werger û lêkolîn**

Mem û Zîn bi Erebî مەم و زین, çapa 1, Şam 1995. ilegal, çapa 2 Beyrût 1998,

çapa 3 Dihok 2006, çapa 4. Şam, Saibat (reşemî): 2008. Çapa 5 Qahire. Misir 2014

Şî'ir we şu'era'a المعاصر و القديم و الشعراء - مختارات من الشعر الكردي القديم و الشعراء Pirtûkek bibliografî li ser helbestvanên Kurd yê nû. 1991 sûriya

Mehabad ber bi olimpiyada xwedê de - Stembol 1996 helbesta Selîm Berekat wergerandin bi Kurdî. weşanxana Avesta

Bedayiulluxe بدائع اللغة ferheng Kurdî-Erebî wergerandin ji Farsi, 1997. Sûrye. çapa illegal

Elhedîqe el Nasiriyye جغرافيا كردستان و تاريخ و حديقة الناصرية في تاريخ wergerandin ji farsi, bi Erebi weşanxaneyê Aras Hewlêr 2002

Sirûda baranê, helbestên Bedir elseyyab wergerandin ji Erebi. Stembol Avesta, 1995

El Durr El Semîn fî şerhî Mem we Zîn الدر الثمين في شرح مم و زين werger û şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi zimanê Erebi. Dihok weşanxaneyê Spîrêz, 2006.

Mem û Zîn bi Kurdiya îro. Avesta. istembol. 2008

Adatul-Ekrad. رسالة في عادات الأكراد و تقاليدهم. pirtûka Mele Mehmûdê Bazîdî: adat û risûmatnameê Ekradiye. Abû Dabî. 2010.

Adat û Risûmatnameê Ekradiye. pirtûka Mehmûdê Bazîdî. wergerandina bi ser tîpên Latîni ve û ravekirin. Weşanxaneyê Nûbihar. Istembol. 2010

Mem û Zîn. şîrove û bi Kurdiya îro. Avesta Istembol 2010.

Ferhenga Kurdistanî. Kurdî/Kurdî. Nûbihar. Istembol. 2010.

الجن متاهة الجن wergera romana Hesênê Metê: Labîrenta Cinan. Kalima. Ebû Zebî 2013

رماد النجوم Ariya (xweliya) Stêran. kurteçîrokên hilbijartî. Belavkirina Meqam, Qahire-Misir 2014

Perik. Romana Selîm Berekat ji Erebi. Weşanxaneyê Ayrînti. Stenbol 2015

Şerha Dîwana Cizîrî. wergerandin. Dara. Diyarbekir. 2018

Xanî û Cizîrî: du stûnên wêjeya Kurdî. Dara. Diyarbekir. 2018



## **Kamiran Bedirxan (1895- 1978)**

Kamiran Alî Bedir-Xan birayê Celadet û Sureya bû. Di 21ê Tebaxa 1895an de, li Stenbolê hatiye dinyayê. Wî li Almanayê doktoraya xwe ya hiqûqê xwend. Paşê li Beyrûtê bicih bû, û li wir parêzerî kir. Ji bilî ko gelek nivîs û wergerên wî di kovara Hawarê de hatine weşandin, wî di sala 1943yan de, li Beyrûtê, rojnameyên Roja Nû û Stêr derxistin.

Kamiran Bedir-Xan, di sala 1947an de, çû Ferensayê û li wir sazgeha lêkolînerî ya Kurdî ava kir. Di wan deman de jî, li Zanîngeha Parîsê dest bi hînkirina zimanê Kurdî kir.

Wî di mijarên cihê de, û bi zimanên cihê, zêdeyî sih pirtûkî nivîsandin. Herçiqas pirtûkên wî ên kurteçîrokên tune bin jî, lê wî kurteçîrok jî nivîsandine.

Kamiran Alî Bedir-Xan di salên 1940î de, dersên xwendina Kurdî didan Kurdên Libnanê li zanîngeha Layîk ya bi nav û deng, tevî beşdarbûnên wî di weşînên bernameyên Kurdî yê radyoya Rohelatê li Beyrûta Libnanê, ya ku roja 5ê adarê sala 1941ê hatibû damezirandin. Weşîna radyoyê her hefte du caran bû, roja Çarşemê û roja Înê. Kamiran çend pirtûkên xwe jî li çapxaneyê Jozêf (Joseph) Selîm Seyqelî li taxa Sokak Al- Bulat, çap kiribûn.

Kamiran Alî Bedir-Xan, di sala 1970yî de, serek da Kurdistana Başûr û ji aliyê serok Mistefa Barzanî û her kesên ko di konfransa 8an ya PDK de

beşdar bibûn, cihê xweşhatinê bû. Gotara wî ya hêja di konfransê de, hêviya Kurdistaneke serbixwe xiste dilê giştiya guhdêran.

Kamiran Alî Bedirxan sala 1971ê serek da Kurdên Beyrûta Libnanê. Di vê seredanê de jî, li gel wezîrê kar û barên navxweyî yê Libnanê, Kemal Jumlat (yê ko ew bixwe Kurd e) civiya. Bi hinera Kamiran, Jumlat partiyeke Kurdî ramiyarî bi awayekî fermî pejirand, û destûra xebata ramiyarî da Kurdên Libnanê.

Kamiran Bedir-Xan, ê ko hemû jiyana xwe dabû çand, ziman û wêjeya Kurdî, di sala 1978an de, li Parîsê wefat kir.

Di sala 1991ê de, wekî malbatiyên xwe yên din, ew jî endamê Civata Bilindkirina Kurdistanê bû. Di sala 1919an de, Kamiran û birayê wî Celadet Bedir-Xan, di geştên xwe yên li Iraqê de, digel zabitê Brîtanî Edward Noel bûn. Edward Noel afirandina neteweyek fermî ya Kurdistanê dinirxand.

Bedirxan dijberê tevgera serxwebûnê ya Atatürk bû; û di sala 1919an de, ji aliyê dewleta Brîtanya ve, li Stenbolê biryar hate dayîn ku beşdarî kongreya Sêwazê de û Mustafa Kemal Atatürk hevdîtin pêk bîne. Ew û gelek kes, birayê xwe, parêzgarê Xarpêtê û zabitê Brîtanî Edward Noel re ket rê lê hevdîtin pêk nehat.

Kamiran dijberî Kemalîzmê bû; dema ku Komara Tirkîyê di 1923an de hate ragihandin, wî berê xwe da welatê Almanya koçê wir bû. Çendekî bi xizmên xwe re li Munîhê dijî. Wî li Zanîngeha Ludwig Maximilians hiqûq xwend, û piştî ku xwendina xwe li Zanîngeha Leipzigê dewamkir û li wir jî xelas kir.

Di sala 1927an de, ew li Sûriyê bicîh dibe, û li Beyrûdê wekî parêzer kar dike. Beşdarî rêxistina Xoybûn dibe û di derxistina rojnameya Kurdî Hawar de alîkariya birayê xwe dike. Di salên 1930an de, ew li Berlînê ma û bi Karl Hadank Îranî re hevdîtinek pêk anî.

Di navbera salên 1942 û heta 1946an de, li Radyoya Levant a Beyrûdê bernameyek radyoyê bi zimanê Kurdî pêk anî. Di sala 1944 de, Kamiran beşdarî damezirandina pêşkeftina karsaziyan ya Tora Trava bû. Di navbera salên 1943 û 1946an de, Kamiran Alî Bedir-Xan kovara bi zimanê Kurdî û

Fransî bi navê "Roja Nû" li Beyrûdê derxist. Salên paşîn ew li Almanyayê û Fransa dijî. Piştî ku Sûriye di 1946 de serbixwe bû, wî karê xwe di Radyoya Levant de winda kir, û wî nikaribû rêyekê bibîne ku di siyaseta herêmî de xwedî bandor be. Ji ber vê yekê, ew çû Parîsê û di sala 1948an de, li wir bû mamostayê Institut national des langues et civilisations orientales (INALCO) ê.

Di sala 1960î de, ew bû berdevkê Ewropî yê Kurdên Iraqê, ya bi serokatiya Mistefa Barzanî. Wî têkiliyên girîng di navbera Kurdan û Îsraîl de danîn. Îsraîl ji bo lawazkirina milîtraqa leşkerî û girêdana arteşa inraq li Bakurê Îraqê Kurdan wek navgînek hêz dît. Di sala 1962yan de, li Berlîna Rojava Îhsan Nûrî Paşa nas kir.

Kamiran di sala 1978an de, çû ser dilovaniya Xwedê. Piştî koça dilovaniyê hate bû hevdamêzîrênerê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê. Berhemên wî niha li Enstîtuyê têne ragirtin.

### **Ji Berhemên wî**

1. Dilê kurê min. Pirtûkxaneya Hawar Hejmar 3/ Çapxaneya El-Terqî - Şam 1932.
2. Alfabe ya Kurdî. Hejmara Pirtûkxaneya Hawar/9/ Çapxaneya El-Terqî - Şam 1937.
3. Xwendina Kurdî Kitêbxana Hawarê Hejmar 10 çapxana Tereqî Şam 1938
4. -Elfabe. Pirtûkxaneya Hawar Hejmar/11/ Çapxaneya El-Terqî - Şam-1938
5. Dersên Şerîetê Kitêbxana Hawarê Hejmar 12 çapxana Tereqî Şam 1938
6. Çarînên Xeyam - Kitêbxaneya Hawarê - Hejmar 13/ Çapxaneya El-Terqî - Şam sala 1939an.
7. Dadgeh û Gotinên Kurdî li gel "Lucy Paul Marquette". Parîs, 1937. Pirtûkxaneya Hawar Hejmar/14/.
8. Şahê Kurdistanê. Helbestên Kurdî - bi Fransî - bi Waldolph Felkerdel re. Parîs-1937. Pirtûkxaneya Hawarê Hejmar 15/.

9. - Eloy Kurdistan - bi almanî (di sohbetekê de li ser jiyana Yado el-Kurdî). Berlîn-1937. Pirtûkxaneya Hawar Hejmar/16/.
10. Çirayên berfê. Helbestên Kurdî - bi Fransî - bi Dr. (bi almanî). Berlîn-1937. Pirtûkxaneya Hawarê Hejmar 17/.
11. Eagle of Kurdistan: with Herbert Ertal, Berlin - 1937 (bi almanî).
12. Ferhenga Kurdî-Fransî.
13. Proverbes Kurdes, Paris, 1936 (bi Lucie Paul-Marguerite)
14. Der Adler von Kurdistan, Postdam, 1937
15. Elfaba Min, Çapxana Hawarê, Şam, 1938 (32 rûpel)
16. Langue Kurde, Paris, 1953
17. La Queztion Kurde, Parîs, 1959
18. Le Kurde Saus Paine, Parîs, 1965 (172 rûpel)
19. Zimanê Kurd / Kürt Dili, Stembol (bi Şivan, S.)
20. Kolay Kürtçe - Pirtûka rêzimanê, Weşanên Doz
21. Ji Tefsîra Quranê, Parîs, 1971
22. Rêzimana Zimanê Kurdî, Paris, 1971
23. Destpêka Xwendinê, Parîs, 1971 (165 rûpel)
24. Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer, 1977/1986
25. Tefsîra Quranê, Weşanxaneya Avesta, Stembol 2020



## Kamiran Haco

Kamiran Haco nivîskarekî Kurd e ku di sala 1959an de, li Tirbespiya Binxetê hatiye dinyayê. Xwendina seretayî, navendî û amadeyî li Tirbespî û Qamişlo tamam kir. Sala 1983yan, xwendina endezyariyê beşê Mekanîk li zanîngeha Helebê qedand...

Ji destpêka salên 1990an ve, wî dest bi nivîsandinê kiriye. Di kovar û rojnameyên wek: Gelawêj, Gurzek gul, Stêr, Xunav, Metîn, Armanc, Pirs, Deng, Medya Guneş, Çira û Nûdemê de nivîsî ye.

Ji dawiya sala 1997an ve li Swêd dijî, û niha di redaksiyona kovara Rastî de dixebite.

Di sala 1977an de, pirtûkeke wî ya kurteçîrokan bi navê Kelevajî di nav weşanên Avestayê de derketiye.





## Kamiran Haj Abdo

**Kamiran Haj Abdo** (Kamiran Hac Ebdo) an jî Kamiran Bêkes nivîskarekî Kurd e. Di sala 1966an de, li Başûrê Rojavayê Kurdistanê, li gundê Kefer Sefrê (Navçeya Cindirêsê), li herêma Efrînê hatiye dunyayê.

Dibistana seretayî heta lîsê li bajarê Helebê xwendiyê.

Dûra diçe Kroatiyayê (Xirvatistanê) û li wir dest bi xwendina bijîşkiyê dike.

Di sala 1993yan de, bawernameya bijîşkiya mirovî werdigire.

Di navbera salên 1994 û 2000ê de, li bajarê Cindirêsê wek bijîşk kar kiriye.

Di sala 2000 de, ji ber çalakiyên siyasî neçar dimîne ku koçî Almanyayê bibe. Niha li nexweşxaneyêke Almaniya ya Federal wek doktorê pisporê nexweşiyên xwînê û penceşêrê dixebite.

Ji sala 1995an ve, bi xatûn Aras Hac Abdo re zewicî ye û bavê keçekê ye ku navê wê (Anahîta) ye.

Helbest û nivîsên mamoste Dr. Kamiran Bêkes di gelek kovarên Kurdî mîna Newroz, Pênûs, Pirs de hatine weşandin.

Jiyana wî ya siyasî:


Di şanzdeh saliya xwe de, tevî karê siyasî bû, di nav rêzên tevgera siyasî ya Kurdî li Sûriyê de, heta niha jî dixebite. Destpêka wî bi Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê re bû, û di encama cudabûnên piştî pêvajoyên yekîtiyê di

navbera hin aliyên tevgera siyasî ya Kurdî de, ew bû endamê Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê. Di Nîsana 1993yan de, pêvajoyeke yekîtiyê di navbera Partiya Yekbûyî ya Demokrat a Kurd û du partiyên din de pêk hat û Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîti) hat damezirandin. Ji wê demê ve, Dr. Kamiran wek endamê serkirde xebatên xwe yê siyasî dimeşîne. Piştî girtinhev û gengeşiyê dirêj di nav partiyê de, parçebûna xwe ragihand û ji aliyê konferansa Partiyê ve bi erkên sekreteriyê ji bo partiya (Partiya Yekîti) hat erkdarkirin.

Di sala 1998an de, Komeleya Ciwanên Kurd li Sûriyê damezirand û heta derketina xwe ji Sûriyê serokatiya wê kir. Dema ku Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê, di 26ê cotmeha 2011ê de, hat damezirandin, ew wek endam di Komîteya Pêwendiyên Derve ya Encûmenê de hat hilbijartin.

### **Berhem**

- Kurd - Miletê bê dewlet- 1993, bi zimanê Kroatî
- Ez ne xemgîr im - Helbest 1994
- Di bawêşa bagerê de - Helbest 1995
- Bingehên Rêzimana Kurdî - zaravayê kurmanciya bakur - 2004 Almanya



## **Kawa Şêxê**

Ji xelkê Rojavayê Kurdistanê, bajarê Heseke, li gundê Biroreda jidayik bûye. Li zanîngeha Helebê xwendiyê û ji sala 2002yan ve, li Almanyayê dijî.

Karê Şano, nivîsandin, derhênerî û rojnamevanîyê dike.

Ji sala 2012an heya 2015an, xebatkarê Ronahî.Tv bû.

Sala 2017an li bajarê Amûdê xebatkarê Rojava.Tv bû.

Sala 2015-2016 endamê Jûrya pêşbirka têkistên şano ya Ebdirehîm Rehmî ya Amedê bû.

Xwedî heft berhemên çapkirî ye.

Di gelek şano, film û çalakiyên hunerî de cih girtiye.

### **Şano**

-Avakirina koma Zengil 2007

-Avakirina koma Aso 2011

-Şanoya Xanîkî kirê 2007

-Dêwê bi Çavekî 2019

## **Pirtûk**

- Şikeft-Şano-2008
- Neqşek li Agir –Çîrok -2010
- Hisên Hewran 2011
- Evînek Rojhilatî-helbest- 2012
- Derî Veneke-Şano-2006
- Nivişt 2018
- Dêwê bi çavekî

## **Film**

- Gulek ji bo Nesrîn 2009
- Solek Nû 2011

## **Senaryo**

- Guliyên Reş
- Nokên Şekir
- Şengo
- Dîlana li ser pizotan.



## Keça Kurd

Keça Kurd "Emîna Emer" nivîskar û helbestvaneke Kurd e ku di 1948an de, li Xirbê Cihûyan yê Binxetê, hatiye dinyayê.

Ew hîn zarokeke 8-9 salî bû dema wê cara pêşî Elifbaya Latînî û romana Memê Alan dîtî. Bêguman, li mala xalê xwe Mele Silêman bû. Vêce ji bo ku ew bikaribe Romana Memê Alan bixwîne, ew hînî Elfabêya Kurdî bû. Dema wê helbestên seydayê Cegerxwîn xwendin, wê kêşeya welat û gelê xwe yê bindest naskir, û xebata rizgarîxwaz bi wê gelekî pîroz bû.

Dema wê li sala 1971ê bawernameya polê 12 bidest xist, ew yekser çûye zanîngeha Silêmaniyê li Kurdistana başûr, û li kolîca ziman û toreya Kurdî xwend. Lê sed mixabin, li sala xwendinê ya sisiyan, ango li 1974, ew neçar bû pena bibe nav şoreşa Barzaniyê nemir, ji ber ku şerê hikûmeta Îraqê li dij şoreşê dest pê kiribû.

Cara pêşî ku wê dest avête pênûsê, ji bo pêlweşa Dengê Kurdistan bû, wê çend gotarek li navenda, weha bidegelî, xwendin.

Malikên pêşî ku wê bi helbestî nivîsîn, li jêr navnîşana Darbesta Zêrîn ji bo Seydayê Cegerxwîn bûn, li dema ku darbesta wî ji Siwêdê ber bi bajarê Qamişlo hate guhestin.

Wê di komîta sê kovaran de karkiriyê. Gelawêj, Pênûs û kovara Pêl.

Wê ta niha 15 pirtûk bi zimanê Kurdî nivîsîne.

### **Pirtûkên wê ev in:**

### **Wergerandin ji zimanê Erebî ev in:**

1-Çîrokine helbijartî yên Ezîz Nisîn. Sala 1991

2-Xoybûn (Civata serxwebûn) sala 1993

### **Folklor**

1-Çîroka Êsê û bilodo û pêre jî çîroka Şengê Pengê. Sala2003 Berlîn Elmanya

2- (Kêza kêzeran xwedîya şimika xêzeran) ji bo zarokan rengîn ji weşanên Sersera berlîn

### **Di mijara zimanê Kurdî de:**

1-Zayenda Mê û Nêr çapa yekê Berlîn 2001 ji weşanên Havîbûn

2- Paşpirtûka (Mê û Nêr) Berlîn 2004

3-Ferhenga (Etîmolojiya zimanê Kurdî) çapa yekê Istanbul ji weşanên Bûbihar

4-Nûbihara piçûk û mezinan. Ferhengeke helbestî êtîmolojî ye. Ji weşanên (Sersera) 2019

5-(Di mijara zimanê Kurdî de) Elmanya 2018

### **Vekolîn û xwendinek di çend pirtûkên Kurdî de:**

1-Vekolînek di naveroka pirtûka mamosta Cemal Nebez de (wişenamewişenamekî êtîmoljiyay zimanî Kurdî). Kolin Elmanya 20013

2-(Xwendinek li bin ronahiya çarçirayên mijabadê). Romana Jan Dost.


3-Ji semaya baweriyê. Xwendinek li helbesta peyalên Hawmayê..ya Ferhad Sîrîn. Ji weşanên (Sersera) çapa yekê 2020

### **Helbest**

1-(Bejna xemên min) 2013 çap bûye

2.(Bazê hêviyên min) Ji weşanên (Sersera) 2020

3-(Pirgala bênifûsî) ji 7 kurteçêrokan pêk hatiye.



### **Keleş (1930-2007)**

Bi navê xwe yê din Hisên Mihemed an Mele Hisênê Bizgûrî, yan jî Keleşê Bextreş, di sala 1930î de, li gundê Bizgûra Mêrdînê, jidayik bûye. Di 6-saliya temenê wî de, bav û diya wî diçin ber dilovaniya Xwedê, ji feqîrtî diçe Binxetê. Li Binxetê, di temenê 10 salî de, dest bi xwendina dînî kiriye; ew berê xwe dide gundên Binxetê, ew jî wî dibin cem seydayê Mele Ebdulrezaq. Cihên xwendina wî ev bûn:

Xalit, Girgod Til-Erbîta Jêrîn, Til-Erbîta Jorîn, Qotikê, Girdêwan, Girbawî, Xizna û Til-Me'erûf.

Di sala 1945an de, dest bi karê welatparêzî û xwendina Kurdî kiriye, û danûstandinên wî bi rewşenbîrên wê hingê re, weke nimûne Cegerxwîn, Qedrî Can, Ehmedê Namî û Seydayê Tîrêj, çêdibin, û bi wan re dest bi hûnandina helbestê dika

Ji ber ku wî, ji biçûkaniyê ve, gelek zilm û zor dîtibû, û gelek cûreyên kar û xebatê ji bo bidestxistina pariyê nanê xwe û zarokên xwe kiribûn, ji cotkariyê, şivantiyê, palahiya û avakirina xaniyan, ji ber van yekan, piraniya ristên wî bi dijwarî û xurtî êrîşî zordestiyê, sitemkariyê û bindestiyê dika, û li dor rewşa gel û welatê xwe bi xurtî sekiniye. Wî ji serketinên welatîyên xwe re lîlandiye, û ji têkçûnan re jî hawar kiriye.

Seydayê Keleş xwedî 8 dîwanên helbestan e. Wî, herweha di çapemeniya Kurdî de, komek ji meqalên wêjeyî nivîsandine.

**Berhemên wî ev in:**


- Em û dijmin, Dîwana 1ê, li welatê Swêdê hatiye çapkirin.
- Rêka gel, Dîwana 2an, 1981.
- Derdê millet, Dîwana 3an, 1993.
- Ronahî, Dîwana 4an.
- Xebat
- Gotinên pêşyan
- Helebçe (Dîwan)
- Berbang (Dîwan)
- Baxistan (Dîwan)
- Bîranînên min (Bîranîn)

Seydayê Keleş piştî nexweşiyêke dirêj di 18ê Hizêranê û 77 saliya xwe de, li mala xwe ya li Qamişlokê çû ser dilovaniya Xwedê, û li Qamişloyê, li Goristana Qidûr Beg, hate veşartin.

Keleş, di nav helbestvanên Başûrê Kurdistanê Rojava de, yek ji helbestvanên naskirî bû. Di 19ê Kanûna pêşî ya sala 2002yan de, wî yekemîn Xelata Seydayê Cegerxwîn wergirt. Di sala 2001ê de, wî xelata Mihrecana nehemîn ya helbesta Kurdî li Sûriyê, stand.

Herweha, Seydayê Keleş di nav siyaseta Kurdî de jî çalak bû. Vê dawiyê ew bûbû endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurd li Sûriyê.





## Konê Reş

Konê Reş, di sala 1953yan de, li gundekî ji gundên pir belav di navbera tixûbên Rojava û bakurî Kurdistanê de, bi navê Doda de hatiye ser rûyê dinyê. Gundê wî di navbera Qamişlo û Amûdê de ye. Navê Konê Reş yê rasteqîn (Selmanê Osmanê Abdo) ye. Li ciyê ku lê hatiye dinyayê xwendina xwe ya seretaîî tamam kiriye, paşê li Qamişlo û Heskê lîse “bakalorya” standiye, û gelek hewl dane ku xwendina xwe ya bilind bi dawî bîne, lê pê re neçûye serî ta ku di Almanya Rojava re derketiye.

Ji kesên pêşî ye di vê qonaxa nû de li Rojava, piştî Osman Sebrî, Cegerxwîn, Qedrî Can, Tîrêj, Keleş, Rezoyê Osê, Dilawerê Zengî, Derwêşê Xalib, Deham Ebdulfettah û yên ku bi zimanê Kurdî nivîsandine.

Ew xwediyê kovara “Gurzek Gul” bû, digel hevalê xwe A. Baqî Huseynî ta bi hejmara 10an, paşê wî bi tena xwe, ta ku hejmarên wê gîhane 15an, berpirsiya kovarê kiriye. Ew kovara ku di navbera salên 1989-1992yan de, li Qamişlo, li nav Kurdên Binxetê dihat belavkirin.

Konê Reş gelek xelat standine. Ji wan xelatan: Xelata Zêrîn ji Hikumeta Herêma Kurdistanê di sala 1998an de, bi helkeftina sedsaliya rojnamegeriya Kurdî; di sala 2000î de jî, bi helkeftina festîvala Cizîrî li Duhokê, ji aliyê wezîrê rewşenbîrî yê hikumeta herêma Kurdistanê, birêz Felekeddîn Kakeyî ve, hatiye xelatkirin. Di sala 2003yan de, li Amedê beşdarî di sedsaliya rojbûna Cegerxwîn de kiriye. Ji festîvalên ku Konê Reş di wan de beşdarî kiriye û xelat wergirtine: Festîvala Çand û Hunerê li bajarê Cizîra Botan 2008, Festîvala

Feqeyê Teyran li Wan û Miksê 2010, Festîvala Cegerxwîn li Batmanê 2010, Festîvala Bedirxaniyan li Hewlêrê 2006, Pêşangeha Pirtûkan li Hewlêrê 2013 û Muzexaneyê Kurdistanê li Hewlêrê 2016, Festîvala Ziman û Çanda Kurdî li Brukselê 2008, Festîvala Sinameya Kurdî li Duhokê 2019, Festîvala Ihsan Nûrî Paşa li Duhokê 2012, Festîvala Mîr Celadet Bedir-Xan li Duhokê, Festîvala rojnamegeriya Kurdî li Rewandûzê 2012, Festîvala folklorê Kurdî li Zankoya Zaxo 2022, Semînerek li Komeleya Qencyê li Beyrûtê 2014, Kongreyê PENa Kurd li Diyarbekirê 2013. Di sala 2019an de jî, beşdarî di yekemîn pêşangeha pirtûkan de li Kobanî kiriye.

Di sala 2020an de, ji ber ked û xebatên wî di warê çand, ziman û wêjeya Kurdî de, xelata Înstîtûta Çanda Kurdî ya Vîyênayê bi navê (Şerefnameya Çand û Zimanê Kurdî), standiye.

Di 18ê Êlona 2021ê, di civîna konseya çandî û zanistî de, li Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Konê Reş layîqî endametiya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê hatiye dîtin û bûye endamê wê. Bi vê boneyê, di roja 21 Êlona 2021ê de, nameyeke agahdariyê jê re hatiye şandin.

Konê Reş ji berî 20 salan ve di PENa Kurd de, ya ku şaxek ji PENa Navnetewî ye, endam e. Ji tebaxa 2006an de, bûye yek ji helbestvanên (Poetas del Mundo), û jê re rûpelek di nav her 8 helbestvanên Kurdistanê de hatiye terxankirin. Ev yekemîn car e ku navê Kurdistanê di cihekî cihanî de bi helbestvanên wê bilind dibe. Herwiha, ji çend salan ve berpîrsê groupa Weqfa Sarayê ye, piştî xwediyê wê mamoste Goran Candan.

Di meha Nîsana 2006an, di Festîvala Bedirxan ya sêyemîn de, li Hewlêra paytext, beşdarî festîvala Bedirxan bûye û xelata festîvalê standiye.

Di sala 2021ê, 124 saliya cejna Rojnamegeriya Kurdî de, Konê Reş ji hêla Komîta (Xelata Kemal Henan) a Şeşemîn ve, hatiye hîlbijartin û xelat wergirtiye. Di sala 2021ê de jî, ji raliyê Fasla Yûsiv, sekretêra Partiya Elwehde ElKurdistanî ve, hatiye xelatkirin.

Di sala 2018an de keçekê bi navê Semîra Mistefa qutabiya (Zanîngeha Rojava Fakulteya Wêje/ Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî), teza xwe li dor Konê Reş û berhemên wî bi navê: (Min Konê Reş Evîndarekî Welat Dît), ji

Zanîngeha Rojava re pêşkêş kiriye, û teza wê bi zor baş hatiye pejirandin. Herwiha, di sala 2021an de jî Silva Şêxê, qutabiya Zanîngeha Rojava teza xwe bi navê (Çîroka Nivîskarekî Ziman û Çanda Kurdî: Konê Reş), ji zanîngeha Rojava re pêşkêş kiriye û bi pileyeke baş biser ketiye..

### **Ji Berhemên Konê Reş ev in:**

- Serpêhatiyên Mîran (1) Beyrût 1991
- Mîr Celadet Bedirxan, bi Erebî, Şam 1992, bi Kurdî Stokholm, 1997
- Serhildana Sasonê, 1925-1936, Şam 1995, bi zimanê Erebî ye. Vê paşiyê mamoste Musedîq Tovî wergerandiye zimanê Kurdî, tîpên Erebî û li Duhokê çap kiriye.
- Komela Xoybûn û Bûyerên Rojane yê Şoreşa Araratê, Erbil, 2000, bi zimanê Erebî ye.
- Osman Sebrî, 1905-1993, Şam, 1997
- Dîroka Qamişlo, Lêkolîn bi zimanê Erebî ye. Stenbol, 2003, Heleb, 2004 û Silêmaniyê, 2006, Şam, 2012. Qamişlo 2020.
- Welato!, Helbest, Beyrût, 1998
- Dergehê Jîn û Evînê: Helbest, Beyrût, 2001
- Cûdî Çiyayê Miradan: Helbest, wergerandina Hejar Îbrahîm, Şam, 2004
- Dara Çinarê, Helbest, wergerandina Îmad Elhesen, Şam 2006
- Şihîna Şevbuhêrkên Dîl: Helbest, Ji weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê Duhokê, êlûna 2010.
- Sîpan û Jîn, helbestên zarokan: I. Beyrût, 1993
- Şagirtê Bedirxan im, helbestên zarokan: II. Beyrût, 1996.
- Helbestên zarokan: III. Amed (Diyarbakir) 2013.

- Dîroka Rojanamegeriya Kurdî li Sûriyê û Libnanê: 1932 - 2012, lêkolînek berfireh e, Duhok 2013.
  - Bajarê Cizîra Botan û Hunera Mîr Bedirxan, di weşanxaneyê Azad de li Stanbol hatiye çapkirin/ 2013.
  - Malbata Bedirxaniyan (Geşta Têkoşîn û Janan): ev pirtûk bi zimanê Erebî ye, Qamişlo 2016.
  - Kurdên Êzidî li Sûriyê: Qamişlo 2017.
  - Gernameya Min: Geşt û Serdan: Ev pirtûk germane ye. wek ku bi zimanê Ingilîzî dibêjin; (Voyages Literature), Qamişlo 2017 û 2021.
  - Osman Sebrî 1905-1993: Jînenîgarî û çend nivîs û helbestên nû, çapek nû ye. Qamişlo 2017.
  - Gurzek Êş: Helbest, wergerandina zimanê Erebî Xalis Musewir, Qamişlo 2017.
  - Dr. Nûredîn Zaza; (Kurdê Nejbîrkinê), di nav weşanên weşanxaneyê Sîtavê de li Wan û Anqra di sala 2019an de hatiye weşandin.
  - Beriya Mêrdînê; (Romana Heymên Derbasbûyî), Roman e, di nav weşanên weşanxaneyê Sîtavê de li Wan û Anqra di sala 2019an de hatiye weşandin.
  - Qamişlo-Pol: Helbest û pexşan in, li Qamişlo hatiye çapkirin/ 2020.
  - Ez û Cegerxwîn: (Sê Helbest û Sê Festîval), li Qamişlo hatiye çapkirin/ 2021.
  - Jiyana Rewşenbîrî bi Zimanê Kurdî li Cizîrê û Serboriya Min Ya Edebî: li Qamişlo hatiye çapkirin/ 2022, 210 rûpel e.
- Digel ku berdewame di karê nivîsandina bi zimanê Kurdî de, û baş destnivîs û berhemên amade ji çapê re hene.



## Lawkê Hacî

(Lawkê Hacî) Mihemed Taha kurê Mihemed kurê Ibrahîm torinê Yûsif axa kurê Memûd axa (Lalo ) torinê Mîrsom ji êla Omerya, ji gundê Hacya li bajarê Serê Kaniyê li Kurdistanê li herêma Rojava, li roja 1ê heyva 2yê li sala 1968an jidayik bûye.

Li sala 1991ê, mewleta şeşê amadeyî wêjeyî li Serê Kanyê bi dest xwe ve îname.

Ji ber ku ji nasnameya sûryayê wekû malabt bê behir bû, ku li parêzgeha Heskê bi (biyaniyan) dihate binavkirin, her mîna 150 hezar kesên din ji gelê Kurd ji encama jimêryariya neyasayî ya staybet, ewa şofînî ku li sala 1962yan ji layê partiya Ba'es ya şofînî ku derbarî Kurdan bi kar anîn bi mebestin siyasî.

- Endamê damezirandina navenda Celadet Bedir-Xan li bajarê Qamişlo sala 2001 e.

- Endamê damezirandina navenda rewşenbîrî ya netewî ya Kurdî li Duhokê sala 2006 e.

- Endamê damezirandina Komela Qamişlo ya alîkarya penaberên rojavayê Kurdistanê, li Kurdistanê herêma başûr sala 2012.

- Endamê sendîka rojnamevanên Kurdistanê – liqê Duhok .

- Damezirênerê cejna zaroka Kurd li 10ê Nîsana sala 1995an li bajarê Serê Kanyê.

### **Ji berhemên çapkirî yê nivîskarî**

- Şah mirûz pirtûkek helbestan li sala 1996 li Dîmeşq.
- Wiha ji dîrokêre dinivînim pirtûkek helbestan li sala 1998 li Heleb.
- Çirûskin di tariya dîrokê de pirtûkek helbestan li sala 2005 li Duhok.
- Pirtûkek helbestan bi zimanê Erebî bi navê zewreqû xelcatên we el leyl sala 2019 li Duhok زورق خلجات و الليل
- Derxistina kovara zaroka Kurd bi navê Gulîzar li Kurdistanê herêma rojava ji sala 2000 – 2003 bi pîtên Latînî.

-Birîna Jiyanê, 2021, çapa yekê, beşê 1-2, çapxane Tehran-Îran



## Lazgîn Dêrûnî

Di sala 1964an de, li gundê Dêrûna Qulinga, yê bi ser herêma Tirbespiyê ve, jidayîk bûye. Di sala 1991ê de, li zanîngiha Şamê, beşê bîrkariyê (Matematîk) bidest xistiye. Bîst salan karê mamostetiye li dibistanên herêmê heta sala 2014an kiriye. Paşê tevî malbata xwe koçî Ewropa bûye, û li welatê Swîsra dijî.

### **Pirtûkên wî yên çapkiri ev in:**

1-Dîwan1: Bi navê (Derd û derman), helbestên Kurdî yên klasîk in. Sala 2017an, hatiye çapkirin.

### **Pirtûkên wî yên destnivîs ev in:**

1-Dîwan2: Bi navê (Awazên jiyane) helbestên Kurdî yên klasîk in.

Gelek Gotarên bi zimanê Kurdî û Erebî li ser rewşa Roavayê Kurdistanê di malperên Kurdî de belav kirine.



## Lema Elî

Lema Mihemed Elî, di sala 1974an de, li gundê Şêro yê girêdayî bajarê Dêrika Hemko, jidayîk bûye. Wê zaroktiya xwe li bajarê Qamişlo derbas kiriye. Di temenekî mezin de dest bi xwendinê kiriye; di xwendina Erebi de bekeloriya wêjeyî bidest xistiye û di zanîngehê de, beşê abûrî tomar kiriye, werzek qedandiye û ji ber sedemên şer xwendina xwe rawestandiye.

Paşê, di sala 2016-2017an de, li Zanîngeha Rojava beşê ziman û wêjeya Kurdî xwendiyê; piştî du salan ji xwendina bê navber, bawernameya derçûnê bi dest xistiye.

Di 15. 11. 2018an de, dest bi mamostetiya wêjeya Kurdi li Akademiya Şehîd Egîd kiriye. Di sala 2017an de, dest bi nivîsandina bîrhatin(xatîre), bîranîn û çîrokan kiriye. Bi demê re giranî daye nivîsandina çîrok û lêkolînên wêjeyî. Heft ji lêkolînên ku nivîsandine bûne dokumenter û li ser Ronahî.Tv hatine weşandin, ew jî dibin sernavên: (Derwêş û Edûlê, Memê Alan, Zembîlfiroş, Evdalê Zeynikê, Xatûna Şamê Zumurud Xan, nîgarên li ser perde û çîrokên wan, Mestûre Kurdistanî). Herweha, hin lêkolînên wê di hin kovaran de hatine weşandin, mînak: di Kovara Şermola de lêkolîna bi navê Rastiya Tofanê hatiye weşandin û di Kovara Destar de lêkolîna bi navê Rêwîtiya Dîrokî ya Destana Memê Alan, hatiye weşandin; herweha di Kovara Sîwan de, Çîroka bi navê Leheng hatiye weşandin. Di heman demê de, du helbestên wê di pirtûka Gulbjêrkên Înstîtuya Kurdî Li Stokholmê de, cih



digirin, ku Înstîtuya Kurdî li Stokholmê daye çapkirin di 2022 de. Navenda Jinê UTAMARA li Elmaniya pirtûkek daye çapkirin bi navê Her Jin Çîrokek Xwe Heye, di vê pirtûkê de, bi helbesta Ez Hez Dikim û çîroka Şefeq beşdar bûye.

Di sala 2018an de, di Mihrîcana Osman Sebrî ya wêjeyê de, xelata sêyem ya çîroka Kurdî wergirtiye, çîrok bi navê Leheng bû.

Di sala 2021ê de, di heftemîn Mihrîcana Kurdî ya çîrokê de, ku Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê pê radibe, xelata duyemîn wergirtiye, çîrok bi navê Goristan bû. Niha du pirtûkan hazir dike ku bide çapê: yek jê pirtûka çîrokan e û ya din ya helbestan e.

**Berhema çapkiri:**

-Hestên Seyr, Amedê, weşana J&J,2023



## Leyla Reşo

Leyla Reşo xelkê bajarê Heseke ye. Ew di sala 1979an de jidayik bûye. Ji piçûkaniya xwe de ji helbest û çîrokên Kurdî hez dikir, û di hîjdeh saliya xwe de, yekemîn helbest di cejna karkeran de, bi zimanê Kurdî xwend.

Rola bavê wê di sedemên girêdana wê bi helbestê ve pir hebû.

### **Berhemên wê :**

- Tava Hêviyan - dîwana yekem e.
  - Lale û Peyal - dîwana duyem e.
  - Niha Can û Veden bi rê de ye; ligel pirtûkek ji xwendekaran re amede kiriye, ew jî efsane û çîrokên Kurdî yên kevnepîvan in.
- Gelek helbest wergerandine.
- Bi herdû awayên helbestê, kilasîk û nûjen, dinivîse.



## Lorî Tildarî (1958-2023)

Helbestvan û nivîskar Loryê Tildarî di sala 1958an de, li gundê Tildarê li herêma Dêrka Hemko jidayîk bûye.

Di sala 1964an de, li gundê Kaniya Dêwa (Endîwerê) dest bi xwendina xwe ya seretayî kiriye. Piştî qedandina qonaxa seretayî li Dêrikê, di dibistana "Yusif Ezme" de, dest bi xwendina amadeyî kiriye, û di heman dibistanê de bawernameya (dîplema) bekeloriyayê wergirtiye, û piştî wê li Zanîngiha Şamê beşê mafnasiyê, ango yê dadweriyê, sê salan xwendiyê; pişt re jî leşkeriya neçar ya rêjîmê kiriye. Piştî wê zêdeyî 20 salan li gundan bi erkê mamostetiyê rabûye.

Di sala 1975an de, dest bi nivîsandina helbestê kiriye bi awayekî seretayî. Lê di sala 1979an de, dest bi nivîsandina helbesta resen kiriye, û di vê mijarê de kar kiriye.

Loryê Tildarî li ser gelek cihok û cobaran xebat kiriye. Yek ji wan nivîsandinan helbesta resen a kilasîk û ya nûjen bi zimanê Kurdî, û herweha yên Erebî. Lê belê, li gel vî karî dest bi berhevkirina folklor kiriye û heta vê gavê jî di van mijaran de kar dike:

Komên folklorî û taybet komên newrozan gelek sûde ji berhemên mamoste Lorî wergirtine, û herwiha piştgiriya tevahiya stranbêj û dengbêjên Rojava kiriye, hem bi helbestan û hem bi awazan. Mînak Cemal Se'edûn, Elî

Gavana, Ronî Cizrawî, Bilind Birahîm, Emîn Nadir, Kanîwar, Şadî Tildarî, Ziya Bek, Mustefa Mihmed Xelîl, Azad Feqe, Wehîd Mirad û hwd...

Li gel berhevkirina folklor gelek çandeserî li ser folklor kiriye, ango nivîsandina stranê li gel şîrovekirina wê bi awayekî wêjeyî veçirandiye û şîrove kiriye heta vê gavê di derdora 800 stranê berhev kiriye. Ango 3 pirtûk in. Di sibeha roja şemiyê 29/07/2023 li nexweşxana Selam li bajarê Qamişlo mir û cendekê wî li goristana Dêrika Hemko hat veşartin.

### **Berhemê Lorî Tildarî ev in:**

Dîwaneke helbestê bi navê: "Halan", çapkirî ye.

Herwiha, 2 dîwanên helbestên kilasîk, yek bi navê "Seqlan" û yek jî bi navê "Tildar", û dîwaneke helbesta nûjen bi navê "Sefan" li ber çapê ne.

Mamoste Lorî gelek kar û xebat derbarê wêjeya Kurdî de kiriye.



## **Luqman Abdulrehman**

Di sala 1973yan de, li gundewarê Heskê jidayik bûye. Xwendina seretayî ta Bawername fakulteya perwerdê, ji fakulteya Fûrat a bajarê Heskê wergirtiye. Ji salên notan de, helbesta Kurdî dinivîse, herwiha ya Erebi jî.

### **Berhemên çapkirî bi zimanê Kurdî ev in:**

1\_ ( siya avê) Helbest ji weşanên HRRKê 2019

2\_ (Tîpên qûmê) Helbest ji weşanên HRRKê 2021, û pelreşkin bi Kurdî hene hîn nehatine çapkirin.

Bi zimanê Erebi pirtûkek çapkirî heye, bi navê ( Zihûr El-‘Ewsec ). Sala 2006an li şamê hate çapkirin.



## Luqman Osman

Navê wî Luqman Osman e. Di gulana sala 1969an de, li gundê Xirbê Kejê yê ku bi ser herêma Cizîrê, li devera Amûdê dikeve, jidayik bûye. Xwendina seretayî li dibistana gund û ya navendî li bajarê Hesekê xwendiyê. Di sala 1987an de, bawernameya Bekelorya bi dest xist. Di sala 1988an de, derbasî zanîngeha Şamê, kolêja Bîrnasî, beşê Sîsyolociya bû, û ji ber ku ew jî wekî 150,000 Kurdên li herêma Cizîrê bê nasname bû, nikarîbû xwendina xwe berdewan bike, tenê du salan xwendiyê.

Di riya dengbêj û hunermendên Kurd ên mîna: Şivan Perwer, Mihemed Şêxo û Se'îdê Gabarî, hezkirina Kurdayetî û helbestê kete dilê wî. Pirtir agirê helbestê di dilê wî de gûr bû dema ku wî pirtûk û dîwanên Kurdî peyda kirin û xwendin. Hêjayî gotinê ye ku li malê, bi dengê bavê xwe pirtir ji helbestên Cegerxwîn hez kir.

Di sala 1986an de, dest bi nivîsandin û hûnandina helbesta kilasîk kir.

Di sala 2014an de, dest bi nivîsandina helbestên ji bo zarokên Kurdan kir.

Pirtûkek tenê hatiye çapkirin ew jî bi navê: "Dîmenên Ji Dil" helbest e.

### **Pirtûkên wî yên neçapkirî ev in:**

1- Pakrewan, helbest . 2-Derdê Efrîn, helbest. 3- Sîmen 1, helbestên zarokan. 4- Sîmen 2, çîrokên bi helbestî yên zarokan. 5- Sîmen 3, şanoyên helbestane.



## Luqman Yûsif

Li gundê Tilşe'îrê, yê girêdayî bajarê Tirbespiyê, ew gundê ku wargeh bû ji Mele Ehmedê Namî re, û bûbû rawestgehek ji gelek navdarên Kurd re, mîna Cigerxwîn, Hejar Mukiryânî û Şêx Birhîmê Tinatî.

Di sala 1965an de, çavên xwe li jiyânê vekirine. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Tilşe'îrê, û ya navîn û lîseyê li bajarê Qamişlo biserî kirine. Li zankoya Helebê wêjeya ferensî xwendiyê. Pişt re li dibistanên bajarê Qamişlo û Tirbespiyê, û herweha li gundewarên wan karê perwerdekirinê kiriye.

Di qonaxa xwendina navîn de, fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bûye. Di qonaxa xwendina lîseyê de, dest bi nivîsandina çîrokê bi zimanê Kurdî kiriye. Bi şêweyê tinazî komek kurteçîrok weşandine û ji layê wezaretê rewşenbîrî ya herêma Kurdistanê ve bi sernavê REŞ Û SIPÎ hatiye çapkirin.

### Ji berhemên wî yên çapkirî ev in:


- 1- Reş û SIPÎ.... kurteçîrok.
- 2- Dehşikê şêx.... kurteçîrok
- 3- Mirîşo... kurteçîrok
- 4- Hêviyên bi rê de.... roman
- 5- Ji bîrdanka dîrokê... belgeyî.
- 6- Biryara dadgehê... Şano.
- 7- تل شعير... الماضي والحاضر..... تاريخي.

**Berhemên wî yên neçapkirî ev in:**

- 1- Romanek.
- 2- Dîwanek helbestî.

Luqman Yûsif yek ji damezirênerên Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya bû û di dema îro de, ew serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriya ye.





## **Mahîn Şêxanî**

Di sala 1960î de, li bajarê Dirbêsiyê, li Roavayê Kurdistanê jidayek bûye. Sala duyem yasa li Zankoya Erebî li Beyrûtê xwendiyê. Wî karê hunerî ji bo xwendina xweser xwendiyê. Di kursa perwerdehiyê de, tevî peymangeha "Adham Îsmâil" bûye. Li dibistanên Dirbêsiyê şeş salan ji bo waneya hunerê mamostetî kiriye. Çend pêşangehên kesayetî û hevbeş li Dirbêsiyê û Qamişlo lidar xistine.

Pêşangehên herî girîng ên ku hevpişkî di wan de kiriye, ev in:

-Pêşangeha hevbeş bi hunermendê plastîk Arşevîn Mîkael re, li Dirbêsiyê 1992.

- Pêşangeha Hunera Kurdî - Du salan li bajarê Qamişlo: di salên 1997 û 1998 de.

-Pêşangeha kesane / Birûskên Hêviyê / li navenda Zulal li Dirbêsiyê 2/11/2012

-Pêşangeha Komî / Hevdîtina Nifşan / li navenda Çand û Hunera Kurdî ya Zulal, li gel komek hunermend ji 3 nifşan, li bajarê Dirbêsiyê

- Paşê, gelek pêşangehên komê li Diyarbekir, Qamişlo, Heskê, Amûdê û Dirbêsiyê lidar xistine.

Wî di gelek rojname û kovaran de nivîsandiye, ji wan El-Kifah El-Erebî, Şoreşa Sûriyê û kovarên Kurdî.

Mahîn Şêxanî helbestvan, çîroknivîs û wênekar e. Helbest bi zimanê Kurdî û kurtçîrok bi zimanê Erebî nivîsandine.

Ji sala 1984 ve dest bi hûnandina helbestê û nivîsandina çîroka Erebî kir; lê mixabin pir dereng ma, ta ku di sala 2014an de, berhevoka çîrokan bi navê "Li qiraxa Xabûr" li çapxana "Dar El-Temmuz" derket û hat belavkirin. Di navbera herdu bergan de, 15 kurteçîrok hene, çar ji wan ji aliyê helbestvan û nivîskarê navdar Reşîd Mekram Talebanî ve hatine wergerandin bi Kurdiya Soranî.

-Di sala 2019an de, dîwana helbestan, bi navê 'Evrodît' bi zimanê Kurdî derket.

- Berhevoka amade ya kurteçîrokan a bi navê "Bêhn" û dîwaneke helbestan a bi navê "Ez Ne Xwedî Lê Dil im" hene, bi zimanê Erebî ne. Di festîvalên helbestê, şevbuhêrk û malperan de jî pişkdariya wî ye çandî heye. Di kovara "Gulan - Erebî" û rojnameya 'Xebat - Erebî' de, ku bi zimanê Erebî derdiketin, gelek çîrok weşandine, û di kovara Kîfah El-Erebî ya Lubnanî û Şoreşa Çandî ya Sûrî de jî nivîsandin û çîrok belevkirine.

\*Berê endamê desteya rêveber a Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriyê bû.

\*Endamê Komeleya Hunermendên Bedew a Amûdê ye.

### **Berhemên wî ev in:**

-Li qiraxa Xabûrê ... berhevoka kurteçîrokan; Xanî: Tîrmeha 2014..

-Evrodît ... berhevoka helbestan, 2019

Bi zimanê Erebî (3) pirtûk (destnivîs) hene:

1- Bihn

2- (ji pêvî vî dilî li bamin nîne (helbest).

3- Danhev û pêşkêşkirin, li ser hunermend Yilmaz gunê.



## Mehfûzê Mele Silêman


Mehfûzê Mele Silêman, bi navê Mehfûzê Reşîd tê naskirin. Di sala 1962yan de, li "Riçabiya" ku li başûrê bajarê Qamişlo dikeve, jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretaî, amadeyî û lîseyê li dibistanên Qamişlo biserî kiriye.

Di sala 1986an de, li zanîngeha Helebê, Bekaloryos di Endazyariya Mîkanîk de bidest xistiye.

Ji piçûkaniya xwe de, guh dida nivîsandin û xwendinê. Bi herdû zimanan: zimanê Kurdî û zimanê Erebi pir gotar, xweşxewan, helbest, çîrok û şano nivîsîne. Berhemên xwe di pir kovar, rojname, belavok û malperan de weşandine. Guhdaneke mezin daye zargotina Kurdan; pend, mamik, serpêhatî, çîrok, çîrçîrok, û gelek kevnetorê Kurdan berhevkirine û ji windabûnê parastine. Lê mixabin, ji berhemên wî tenê du pirtûk hatine çapkirin, ew jî ev in:

- Ya yekem bi navê "4000 pendên Kurdî", sala 1993yan, ji weşanên ASO.
- Ya duyem helbest in, bi navê "Rista min" sala 2013an, ji çapkirina pirtûkxana "El-Rawî" li Qamişlo.

Çend pirtûkên wî yên neçapkirî hene, dido ji wan ferheng in: (Kurdî - Erebi û Erebi- Kurdî), ji sala 2003yan ve amade ne ji bo çapkirinê.




### **Mehmûd Akko 21. 3. 1966 - 27.9.2015**

Nivîskar û helbestvanê Kurd Mehmûd Akko di bîst û yekê Adara sala hezar û neh sed û şêst û şeşan de, li gundê Biwêytix – TilHemîs, yê bi ser bajarê Qamişlo ve, li Rojavayê Kurdistanê hatiye dunyayê. Mehmûd Akko ji dema piçûkaniya xwe ve, ji stran û mûzîka Kurdî hez dikir. Evîndarê helbest û wêjeya Kurdî bû. Pir helbestên Ehmedê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Cegerxwîn, Tîrêj û Şêrko Bêkes, û ji kesên din re ku niha li ser qada wêjeya Kurdî ne, dixwendin.

Di sala 1984an de, dest bi jiyana xwe ya wêjeyî kiriye, li ser destê birayê xwe yê mezin Behzad, fêrî nivîsandin û xwendina bi zimanê Kurdî bûye. Berhemên xwe di kovar, rojname û malperan de, belav dikirin. Di sala 1991ê de, yekemîn helbesta wî ya hatiye belavkirin “Dostê Vînê” bû. Kovara Hawar, a ku di sala 1932yan de ji aliyê mîr Celadet Bedir-Xan ve bi Kurdî derdiket, veguherand forma wê ya elektronîkî, û ev xebat yek ji girîngtirîn kiryarên ku Kurdekî ji bo belgekirina arşîva Kurdî kiriye, tê jimartin. Gelek nivîs bi zimanê Almanî çap kirine, piştî ku di Gulana 1996an de, koçî Holendayê û pişt re koçî Almanyayê kir. Lê, mirin li hêviya wî bû, wî di 27/9/2015 de koça dawî kir.

#### **Berhemên wî:**

- Berhevoka çîrokan a bi navê [Çend Çirûsk]
- Berhevoka helbestan a bi navê [Mirina Xwedakî]
- Roman [Ciwana û Xewnên dil]



## Mehmûd Badilî

Mehmûd Badilî, kurê Hisênê Hemê Xatê ye, dêya wî Behiya Remo ye, li gundê Hemê Xatê yê girêdayî bajarê Dirbêsiyê, li Rojavayê Kurdistanê, di 02. 02. 1973yan de, jidayik bûye. Ew gundê ku wek xalxalokekê li ser bandeveke kevirî diçirise, qefaya ku zincîra wê ji Kepezê Dirbêsiyê dikişe ta digihêje bajarê Tiltemirê, ber bi Heskê ve. Zarokatiya xwe li gundê xwe, û di heman gavê de, li gundwarên girêdayî bajarê Serê kaniyê ve, derbas kiriye. Bavê wî cotkarekî bi çandiniya pembo û genimî ve mijûl bû, lê di heman gavê de, di nava malbatekê de, ku ji destpêka damezirandina tevgera siyasî ya Kurdî, li nava kar û xebatê bûn, û ew di nav vê tevgerê de perwerde bûye.

Mehmûd Badilî di zaroktiya xwe de gelek êş, derd û janên jiyane jiya ye, ku bêparî û hejarî di nava xirecira jiyane de yek ji navnîşanên wê bû. Hîna temenê wî heftsalî bû, birînen bavê xwe jimartine; ew birînen ku, di kêrahiya wî de, bax dane û xwe li bêdengiya wî vedane, kuştina bavê wî ku heyva havîne şahida wê bû. Li ser destê malbateke Ereb, bi sedema tolhildanê, diyardeya herî paşketî li nava milletên herêmê, bi xwe çîrokeke bi êş û dijwar e, ji bilî êş, zor û sitema ku li meletê Kurd, ji hêla desthilatên şovînist dibariya ku ta niha jî berdewam e, ev tev şêlûbêla bêdengiyê û xirecîreke bêhempa di giyanê wî de nexişand, û wisa bi gavine hedanî, giyanekî veketî û dilekî dîn şana hebûna xwe, di henteşa helbestê de, diyar kiriye ku herdem ber bi azadiyê ve hezkirin û evîniyê rêberiya raman, hest û nîgaşên wî dike.

Xwendina xwe ya seretayî li gundê Şorê, dûvre ya navendî û lîseyê li bajarê Til-Temirê xwendiyê. Di vê qonaxê de, bi temenê xwe yê biçûk dikeve

nava tevgera siyasî de, di sala 1988an de, dibe endamê partiya çep a Kurdî li Sûriyê. Di nava wê tevgerê de, çavên wî li ser tevgera rewşenebîrî jî vedibin ku, di rêya helbestên Seydayê Cigerxwîn û stranên şoreşgerî re, girêdana wî bi ziman û wêjeya Kurdî re çêdibe. Dîwana (Kîme Ez) pencereya wî a pêşîn bû, wisa stranên Şivan perwer, Ciwan Haco û Mihemed Şêxo ku, di rêya wan re bi ser tîpên zimanê Kurdî ve vedibe û dûvre, xwe bi xwe, xwe fêrî zimanê Kurdî dike. Pişt re di sala 1993yan de, derbasî kolêjeya perwerdeyî bûye, Lesans û Diplom a beşê Derûnî (Psychologie) li zanîngeha Şamê wergirtiye.

Di sala 2002yan de, li bajarê Heseke bicih dibe; di heman salê de, bi Civîn Dêrikî re dizewice ku herdu li zanîngeha Şamê di heman beşê de, bi hevûdu re dixwendin. Wisa herdu jî li dibistanên Heseke, di warê rêberiya derûnî û perwerdeyî de, karê wan dest pê dike. Sê zarokên wan hene: Peyam, Larî û Meyar.

Di nava kar û xebatên wêjeyî de, ew endamê komîta amadekirina mihrecana helbesta Kurdî bû, ku salê carekê lidar dikeve, ji bilî çalakiyên wêjeyî mîna şevên helbestê ku heyvê du caran li bajarê Heseke dihat lidar xistin.

Di sala 2011an de, şoreşa Sûriyê lidar ket, wisa pê re şoreşa Rojavayê Kurdistanê, di nava vê şoreşê de, wî û hin hevalên xwe yên nivîskar li bajarê Heseke, di sala 2012an de, yekîtiya nivîskarên Kurd li bajarê Heseke ava kirin. Digel vê yekê, di konfiransê yekîtiyê de wek serokê yekîtiyê hat hilbijartin, tevku wî û hevalên xwe, nivîskarê bajarê Heseke bizaveke mezin kirin derbarê yekîtiya giştî de, gelek civat, danûstandinek berdewam, lê mixabin gelek kelem li pêş karên wan ji hêla hin nivîskaran ji bajarên dîtir derketin, û wisa mecbûr bûn ku yekîtiya xwe wek şaxê Heseke lidar bixin.

Di meha şeşan sala 2013an de , bi sedema şerê bêhûde û nîrên jiyane yên zehmet, ji Rojavayê Kurdistanê derdikeve. Ew çend mehan li Tirkiyê li nav Kurdên Anatoliya navîn, li gundê Zincîrlükuyê yê girêdayî bajarê Konya dimîne; dûv re bi zor û zehmetî derbasî Elmanya dibe û mafê penaberiyê li Elmanyayê werdigire. Niha li bajarê Axinê (Aachen) yê Elmanî bicih bûye, û li ba Centera Autismus Aachen kar dike, di warê perwerdeya taybet de bi zarokên xwedî pêdiviyên taybet û xwetenahî re dixebite.

### **Ji berhemên wî:**

- 1- Şêlûbêla Bêdengiyê ( helbest) 2004.
- 2- Nexşên Dînîtiyê ( helbest) ji weşanên Dar Elzeman, 2006.
- 3- Çemê Êvarê (helbest) ji weşanên dezgeha SemaKurd ya çand û huner li Imarat Al-Arabiye – Dubey, 2008.
- 4- Wêneyin ji paxila avê (helbest) ji weşanên Ar, Çile (Rêbendan ) 2020
- 5- Rê heyvanê her tiştî ye (helbest) ji weşanên Ar, Çile (Rêbendan ) 2020
- 6- Sevdera şewatê (çîrokên kurt) ji weşanên Ar, Çile (Rêbendan ) 2020
- 7- Şana keskesorê (helbestên Hayko) PDF ji weşanên yaneya hayko ya Kurdî 2021.
- 8- Li vir sar ji xwe dibarim (Helbest) ji weşanên J&J, 2022.

### **Ji berhemên wergerandî:**

- 1- Çemê Morîkan ( helbest) 2019, Majda Darê, ji zimanê Erebî bo Kurdî.
- 2- Pirtûk ( Şano) destnivîs, , Imad Mustefa, ji zimanê Erebî bo Kurdî.
- 3- Romana Kehreman, Rêzan Îsa, ji zimanê Erebî bo Kurdî, ji weşanên Ava 2021.



## Mehmûd Birîmce

▪ Nav û paşnav: Mehmûd Birîmce.

▪ Cih û dîroka jidayîkbûnê: Efrîn - Kefirsefrê: 04/07/1977 Z.

### ▪ Bawernameyên standî:

▫ Bawernameya ziman û wêjeya Erebî ji zanîngeha Helebê, sala: 2001ê Z.

▫ Bawernameya Diploma perwerdeyê ji hêla rêxistina Yonêsîvê (UN) beşa Tirkîyê, sala: 2008an Z.

▫ Asteya sêyemîn ya Zimanê Kurdî, ji hêla SZK sala: 2014an Z.

-Asteya Zimanê Tirkî ya sêyemîn (B1) ji hêla paymenga niştimanî ya Zimanê Tirkî li Tirkîyê- Hatay sala: 2020an Z.

### ▪ Kar û xebat:

▫ Memosteyê ziman û wêjeya Erebî ye ji sala: 2001ê de.

▫ Hûrbîner û derhênerê pirtûkan e, ji sala: 2017an de, û bêtirî pêncî pirtûk di hemî cureyên wêjeyî de anîne warê derhênanê.

▫ Romaneke ji zimanê Kurdî wergerandiye Zimanê Erebî.

▪ Nîşana wêjeyî: Helbestvan û nivîskar e.



▪**Berhemên wêjeyî:**

▫ Hêviyên veşartî: Berhevokek helbestan e (2020 Z).

▫ Navên kurdî: Pirtûkeke navan e.

▫ Qêrînine Mirovahiyê: Berhevokek helbestan e (2019 Z) bi zimanê Erebi ye.

(صَرَخَاتُ إِنْسَانِيَّةٍ : ديوانُ شِعْرِ (٢٠١٩ م).

▫ Giyanine Şoreşvan: Berhevokek helbestan e (2020 Z) bi zimanê Erebi ye.

(أرواحُ ثائرةٌ : ديوانُ شِعْرِ (٢٠٢٠ م).

▫ Paqijiya Evînê: Berhevokek helbestan e (2022 Z) bi zimanê Erebi ye.

(عَفَّةُ الصَّبَابَةِ : ديوانُ شِعْرِ (٢٠٢٢ م).

▫ Gelek gotar bi zimanê Kurdî û Erebi di gelek kovar û rojnameyên Kurdî û Erebi de weşandine.

▪Bêtirî heyşt salan li Tirkîyê koçber bû, ji sala 2014an de ta sala 2022an, û li wir jî karê mamostetiyê bi zimanê Erebi dikir.

▪Niha (2023 Z) mamosteyê Zimanê Kurdî ye li Peymangeha Zimanan - beşa Zimanê Kurdî li Ezazê- Helebê.



## Mehmûd Omer

Nav û Paşnav: Mehmûd Omer kurê Ebdulrehman e, diya wî Emîne Haco ye, sala 1973yê hatiye dunyayê.

Rewşa malbatê: Bi jin e û şeş zarokên wî hene.

Rewşa xwendinê: Di sala 1998an de, li zanîngeha Şamê bawernameya yasayê werdigire, û ji sala 2001ê heta niha li bajarê Qamişlo - li parêzgeha Heseke, karê hiqûqê dike.

-Ew endamê Rêxistina Mafên Mirovan -MAF- li Sûriyê, wek endamê desteya çavdêriyê ye.

-Ew ji sala 2014an ve endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê ye.

-Bi dehan gotar li ser rewşa giştî ya siyasî û mafên mirovan li Sûrî û bi taybetî rewşa Kurdî weşandine.

- Li ser komkujiya Aleqemşê lêkolîneke pir hêja nivîsandiye û gelek gotar di kovara El-Hîwar û rojnameya Kurdistan de dane weşandin.

- Bi sernavê: "Rêwîtiyeke Aware di Jînenîgariyeke Dewlemend de", ku çardeh beş in, xwendina wî ya pirtûka (Bîranînên Min) a Dr. Nûredîn Zaza e.

- Li ser gundên herêma Alyan gelek lêkolînên wî hene, di kovara El-Hiwar de hatine weşandin.

-Endamê herî piçûk ê Komîteya Berevanî û Parastinê ya Girtiyên Serhildana 2004an bû.

-Çend Lêkolînên wî li ser Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî hene.

-Berhevoka gotarên bi sernavê (Bi Sirûşa Dadgehan) di malperên Kurdî de hatine weşandin.

-Di sala 2009an de, çavdêrê navneteweyî yê hîlbijartinên serokatî û parlamentoya Herêma Kurdistanê Iraqê bû.

-Perwerdekarê bi dehan hunergehên çandî yê li ser destûr, rêxistina hîlbijartinê, çavdêriya hîlbijartinan, aştîya sîvîl û dadweriya veguhêz e.

- Weke çalakvan û parêzvanê mafên mirovan, ji Navenda Biratî ya Demokrasî û Civaka Sîvîl ji bo sala 2014an xelat wergirt.

- Ew li ser navê rêxistina –Maf- di Konferansa Tora Jinên Sûriyeyê de, ku di sala 2013an de, li Qahîreyê hate lidarxistin, nûnertî kir.

- Wek çavdêrekî navdewletî, û di nav tora çavdêrên navdewletî de, wî çavdêriya referanduma Herêma Kurdistanê Iraqê ya sala 2017an kir.

- Wî kursa şopandin û belgekirina binpêkirinên mafên mirovan li Kurdistanê Iraqê di sala 2018an de şopand, ku ji aliyê Navenda Yasa ve hatibû amadekirin.



## Melevan Resûl

**Nav û paşnav û cihê xwedêdanê:** Melevan Resûl, li gundekî pala xwe daye çiyayê Misûsana, yan çiyayê Qereçoxê, girêdayî herema Dêrika Hemko, di sala 1960î de, li gundê Hemze Begê, çavê xwe li gerdûnê vekir. Bihna gundîtiyê difna wî tije kir û bi firşikê parzûnkirî ji doşava peyva bijartî, wî ji pêşîra diya xwe vexwar.

Heskirina wî pêşî ji xwezaya herema wî re hebû, ciwaniya peyva Kurdî di çîrok û çîvanokên kevneşopiya Kurdî de, ji devê diya xwe û xweha xwe ya mezin bihîstin. Bi wan pûnijî, roj bi roj heskirina ziman û çanda devokî di dilê wî de mezin bû, û bûye aşiqê zimanê xwe. Piştî wî xwendina xwe ya seretayî û navîn û amedeyî qedand, û xwendina xwe ya falkotê li bajarên corbecor yên dewleta Sûrî derbas kir, di wan qonaxan de, ew tevî xebatên ramyarî û konevanî jî bû, herdem pûtédana wî ji bo wêjeya Kurdî li pêş bû. Bi qasî 34 salan wekî mamoste xebitiye.

**Xebata wêjevanî:** Pêşî di salên 1980yî de, dest bi nivîsandina helbestê kir, naskirina wî ji gelek helbestvanên wekî seydayî Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj re hebû. Berê xwe da helbesta kilasîk û roj bi roj hînê terazûya helbesta kêşesaz bû. Lê helbestê ew têr nekir, ji lewra wî berê xwe da nivîsandina gotar, pexşan, şano û vekolînên wêjeya Kurdî. Piraniya nivîsandinên wî bi zimanê Kurdî ne, û beşek bi zimanê Erebbî jî hene. Di dezgehên ragihandin û wêjevanîyê de, xebatek berferh şopandiye:

- Avakirina yekîtiyên nivîskar û hunerî di Rojava de (Tevna Çand û Huner, Koma Edebiyata Kurdî li Sûriye, Komeleya Ehmedê Xanî, Yekîtiya Rewşenbîrên Herema Cizîrê, Kordinasyona Rewşenbîrên Bakur- Rojhilatî Sûriye) her wisa jî di avakirina komên hunerî de mîna koma Cûdî, komên Cizîrê, di salên corbecor de pişkdar e.

- Sazî û dezgehên ragihandinê (radyo û TV).

- Xebatên çapemeniya Kurdî, di piraniya kovar û rojnameyan de nivîs belav kirine: (Sorgul, Rojda, Ronahî, Hevend, Sêwan, Şermola, Destar , المتقف ، الشرق الأوسط û ... herweha belavkirin û weşandina berheman di riya enternet û malperên Kurdî û Erebî de, ew bû xwedan şensek.

### **Babet û berhemên wî:**

Heta niha bi qasî 7 dîwanên helbestî (Kevneşop û nûjen) bi zimanê Kurdî nivîsandin e.

- Bi qasî 65 şano û skêçan li ser ( 3 celeban) li ber çapê ne.

- Lêkolîn bi zimanê Kurdî û Erebî (pêlawazên helbesta Kurdî ya kevneşop).

- Pirtûkek xwerû bi zimanê Erebî (في رحمة الكلوان والبلوط) li ber çapê ye.

- Çîrok ( 2 celeb) li ber çapê ne.

- Bêtir ji 300 gotaran bi zimanê Kurdî û Erebî.( piranî hatine weşandin).

- Bi qasî 285 xelekên rojnamegeriyê, ji çavpêkeftin û dîdarvaniyê bi nivîskar û ronakbîrên Kurd re.

- Lêkolîn û ravekirina navdar û mîrnişînên Kurd. (13 ) vekolînên berferêh wekî belgefilm hatine weşandin.

- Vekolînên ramyarî bi zimanê Erebî (3 celeb).

- Sererastkirin, wergerandin û vekolîn ji berhemên gelek nivîskarên Kurd re.

-كتاب عن الشهيد بولات هر كول في الذاكرة


### **Berhemên çapkirî:**

- 3 dîwanên helbestî ( ARAM, ARÎN û ÇIRÎSK).
- Cihê hêvî û daxwazan ( ŞANO)
- Qevdek şano û skêç
- Kezî (şano û skêç)
- Pêlawazên helbesta Kurdî ( lêkolîn)
- Reş wê werin ser sorgulan ( çîrok).
- Gotar û nivîsên ronakbîrî (1 celeb) Kurdî.
- Gotar û nivîsên ronakbîrî (2 celeb) Kurdî.
- Gotar û nivîsên ronakbîrî (3 celeb) Kurdî.

– محاضرات وبحوث فكرية وادبية . مقالات فكرية وادبية -

- Simînarên torevanî (lêkolîn û şirovekerin) bi dirêjahiya salan li navend û holên ronakbêriyê pêşkêş kirine. Gelek berhemên wî, bi zimanê Erebi û Kurdî hîna reşnivîs in, û ji ber kêmdarfetiyê nehatine çapkirin.

**Destxweşî û xelat:** Cihê xwe di piraniya ahing û fistîvalên hunerî û wêjeyî de girtiye. Her weha hejmarek xelatên wêjebaniyê wergirtin e, wekî: Xelata Balîxan a entelogiya helbesta Kurdî, Xelata Mehrecana 14an a Helbesta Kurdî li Sûriye, Xelata Navenda Zimanê Kurdî, Xelata Saziya Zimanê Kurdî, Xelata Saziya Hînkirin û Perwerdeya Zimanê Kurdî, Saziya Dijle ya Rewşenbîrî, gelek xelatên herêmî ji partî û kesayet û navdarên ronakbîr û sazî û rêxistinên navçeyî bi dest xwe ve anîn e. Giraniya xebata wî di 10 salên dawî de, di çêkirina bernameyên ronakbîrî di ragihandina TV û Radiyo de li pêş e.



## Memo Abdî

Dr. Mihemed Alî Abdî, tê naskirin bi nasnavê: "Dr. Memo Abdî", di biwarên rewşenbîrî û qadên çandewerî de.

\* Di sala 1967ê de, li gundê "Dekşûrî" jidayik bûye. Helbet xwendina xwe Qamişlo ve biserî kiriye.

\* Piştî ku dibistana seretayî tewaw kir, bi fermanê ku qonaxa amedekarî li gundê Dekşûriyê tunebû, naçar ma ku xwe veguheze bajarê Qamişlo, bi armanca berdewamiya xwendina xwe û sitandina bawenameya sertefikat, li pey wê jî Bakaloriya, ku xwedekar, li gor rêjeya zîrekiya wî, derbasî zanîngehê dike.

\* Ji xwe qonaxa bakaloriya bi rêjeyeke bilind, li seranserî parêzgeha "Hisiçe" derbas kir, ku rê li ber vekir ji bo ketina koleja bijîjkiyê ya di zanîngeha Dîmeşq de.

\* Sala yekê ji xwendina zanîngehê serkeftî derbas kir, lê bi sedemê belengaziya malbata wî, naçar bû berê xwe bide Yekîtiya Sovyêtê, da karibe xwendina bijîjkiyê bighîne dawiyê, û vê derfeta dîrokî ji destê xwe nebe.

\* Sala fêrbûna zimanê Rusî li bajarê Bakû, ku paytexta Azerbeycanê ye têperand. Piştî ku fêrî zimanê Rusî bû, ew hate rêkirin bo bajarê Xarkiv, ku bajarekî duwemîn bû li komara Ukrayîna Sovyêtî bû. Li wir xwendina bijîjkiyê tewaw kir, û diploma bijîjkiyê sala 1992yê bidest xist. Li vir ranewestiya û besnekir, lê pir arezûkir ku pisporiya xwe di nexweşiyên dilî de bidest bixe, bi rastî wî ev qonax wisa tacegulîn kir.

\* Piştî wergirtina Diploma bijîjkiyê ya taybetmend di nexweşiyên dilî de, sala 1995ê, du salan naçar bû ku di nexweşxaneyê dilî a navendî ya li bajarê Xarkivê de kar bike, hem jî jiyana xwe pê derbas kir; û ji aliyê din ve, azmûneya xwe di warê bijîjkiyê kûr û asê kir.

\* Piştî bidestxistina diploma nexweşiyên dilî, biryar da ku vegere welêt ji bo alîkariya malbata xwe, dost û xizmên xwe. Sala 1997 li şarê Qamişloyê niştecih bû, lê norîngeha xwe taybet vekir. Mixabin li vir dirêj nekir, ji ber leşkeriya naçar a dewleta Sûriyê, diçe Helebê, Dara' a û dawî li Dêra Zorê bicî dibe ta ku leşkeriya xwe biserî dike.

\* Vê carê berê xwe dide Bajarê Helebê ji bo kar û xebata xwe ya dawî, li taxa Aşrefiya Kurda dibe xwedî norîngeheke taybet, pê re tê erkdarkirin li Nexweşxaneyê Basil a nexweşî û neştergeriya dilî ya ku nû hatibû vekirin. Ta sala 2013ê, li Helebê dimîne, lê piştî şevreşa ku li Sûriyê Qewimî, naçar bû dîsa cihnişîna xwe biguherîne û vegere cihê bav û kalan li bajarê Qamişloyê.

\* Dubare li vir (Mebest jê bajarê Qamişlo ye), navendeke pispor û pêşketî ya nexweşiyên dilî vedike di bin navê "Navenda Dil a Nûjen" de tê binavkirin, ku bi hemî pêdawîstiyên nexweşiyên dilî ve dagirtî ye. Ji bilî vê navenda taybet, li bajarê Qamişloyê nexweşxaneyêke taybet a nexweşiyên dilî tê vekirin ji hêla Desteya tenduristiyê ya Rêveberiya xweser a Rojhilat û Bakurê Sûriyayê ve. Ji hingê û ta îro, bi erkê Rêveberê Giştî yê vê nexweşxaneyê radibe.

\* Ev e pêvajoya wî ya pîşeyî ye, ku bi bijîşkiyê ve girêdayî ye, lê ji bilî vî karê wî yî sereke hemçerxane ew çalakî û lebata xwe ya rewşenbîrî hevterîpî pê re birêve dibe.

\* Ji sala 1980yê ve, endamê Partiya Çep a Kurd a Sûriyê (PÇKS) bû.

\* Ji salên zaroktiya xwe, xwendina bi Kurdî jê re arezûyeke ji dil bû, ji lewre, ji sala duwem a dibistana amadeyî xwe fêrî alfaba û zimanê Kurdî dikir. Di salên xwendina xwe di zanîngehê de, hewl da ku Romaneke bi Kurdî binivîse, bi navê "Evîna Bêsînor", bedbextane nekarîbû biweşîne û bertelef çû.



\* Bi weşana rojnameya "Welat", qonaxeke nû ji nivîsîna bi zimanê Kurdî dest pê kir. Xweşbextan e ku ew jî bû xwêner û nivîserê vê rojnameyê hê ji hejmarên pêşîn jê.

\* sala 2007, ew di konferansa damezirêner a saziya zimanê Kurdî (SZK), ku hatibû lidarxistin de, amade bûbû.

\* Komeleyek rengereng ji nivîs, gotar û lêkolînên di hemî biwarên jiyane de hene, ku li ser malperên medya civakî bi zimanê Kurdî û Erebi hatiye belavkirin.

\* Destnivîsên bi Kurdî li benda komkirin û berhevkirinê ne, da ku ronahiya çapê bibînin.


\* Helbestnûs, wêjehez û tagirê ziman û kelepura Kurdî ye. Gotarenûs bû di rojnameyên mîna: "Welat", "Welatê Me", "Azadiya Welat", "Axîna Welat", "Newroz" û kovarên mîna: "Rewşen", "Jiyana Rewşen", "Pirs", "Hevind" û "Berxwedan" de.

\* Di dema xwendina bijîjkiyê de, hemçerxane bi xwendina xwe ya serekî re, wî rêdana dana waneyên zimanê Kurdî li zanîngeha bajarê Xarkiv, a ku bûye kavi ji ber êrişên xwînmijê Pûtîn, standibû. Bi saya vê destûrê, nêzîkî 25 şagirtên zanîngehê yê Kurd xwe tomar kiribûn li pînavî fêrbûna Alifba û rêzimana Kurdî.

\* Serpereştê avakirina gotareke bi Kurdî ye, petîkirina axaftina xwerû ya bi Kurdî ye.

\* Aniha projeyê wî yê herî giranbuha li ber dilê wî ew e, ku karibe ferhengeke zaraveyên bijîjkî bi Kurdî bidamezirîne, û bingehê wêjeyeka bijîjkî bi Kurdî deyne da têxe ber destên bijîjk û hemî karmendên tenduristiyê.

\* Yek ji armancên wî ew e, ku kovareke bijîşkî-tenduristî xwerû bi zimanê Kurdî derbixe, ku bibe lêvegereke zanistî ji xemxur û heyranên tenduristiyêke bi Kurdî re be.



## **Merwa Birîm**

Li devera Reco, ya ku Bakur bi hezar awayî, bi bajarê Efrînê ve girêdide jidayîk bûye. Mamostetî di dibistanên seretayî de kiriye, û ji ber sedemine taybet, ji karê xwe vekîşîye.

Di sala 2014 de, bi fermî dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye, û bi dehan helbest û çîrok, di kovar û rojnemeyên Kurdî de weşandine.

Di sala 2015an de, ji aliyê Mihrecana MÊTAN a Şano ve hatiye xelatkirin, û her weha di sala 2016an de, ji aliyê Komîta Xelata nemir Kemal Henan ve jî hatiye xelatkirin.

Li Efrînê, di du salên 2016 – 2017 de, Endama Komîta Amadekirin û Lidarxistina Mihrecana Roja Helbesta Kurdî bû.


Berhemên wê bi du zimanan, Zimanê Kurdî û Zimanê Erebî jî hene.

### **Berhemên Kurdî:**

- ( kelekvanek û heftê avgerînok ).....komhelbest, li Berlînê çap bûye.2021
- ( Hîna Zawik li dor hilavêjka min digere ) komhelbest nehatiye çapkirin.
- (Bakurî Havînê Başûrî Zivistanê ) komçîrok, nehatiye çapkirin.

### **Berhemên wê yên li ber destan:**

Du romanên wê li ber destan hene, yek jê bi navê Şanêl 5 e.



## Merwan Berekat

**Jidayîkbûn:** Li Rojavayê Kurdistanê, herêma Çiyayê Kurmênc - Efrînê, navçeya Şêrewa, gundê Soxanekê, li sala 1964an ji dayîk bûye.

**Xwendin:** Li sala 1969an, dibistana berî ya seretayî li bajarê Helebê xwendiyê. Xwendina seretayî li dibistana gundê Soxanekê, ya amadeyî û navendî li dibistanên bajarê Helebê kuta kirine. Piştî ku du salan amojgeha bazirganî dixwîne, li sal 1987an, li zanîngeha bajarê Helbebê kolêja wêjeyî, beşê zimanê Îngilîzî dixwîne. Lê ji ber sedemine taybet xwendina xwe ya zanîngehê bi dawî nake.

**Fêrbûn û nivîsandina bi zimanê Kurdî:** Li sala 1981ê, abêya nemir Osman Sebrî peyda dike. Bi wê abêyê xwe fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî dike. Pişt re pirtûka rêzimên a Mîr Celadet Bedir-Xan, û ya Qanatê Kurd peyda dike, û du salan bi hûrbînî rêzimên dixwîne.

### **Kîngê dest bi nivîsandinê kiriye?**

Li 1984an dest bi nivîsandina kurteçîrok û helbesta Kurdî dike. Lê hîngê derfeta weşandinê nabîne ku kurteçîrok û helbestên xwe biweşîne. Li sala 1989an, yekem helbeta xwe (Ez Kurd im) di kovara XUNAVÊ de diweşîne. Li sala 2000î, derfetên çapê li bajarê Helebê dibîne û dest bi çapkirina berhemên xwe yên Kurdî dike. Bi du zimanan: Kurdî û Erebi dinivîse. Di destpêkê de bi Kurdî nivîsandiye.

**Xebatên rewşenbîrî:** Li sala 1993yan, dibe yek ji endamên komîta sernivîser a kovara XUNAVÊ. Piştî ku kovar radiweste, dibe yek ji endamên

komîta sernivîser a kovara BIHARÊ. Ji sala 2005an ta 2018an, endamê komîteya sernivîser a kovara PÎRSÊ bû. Li sala 2014an, ji aliyê komîtê ve serpereştê kovarê tê binavkirin. Li sala 2015an, dibe endamê komîta sernivîser a rojnameya NEWROZÊ. Ta sala 2018an di komîta sernivîser a kovara PIRS û rojnameya NEWROZÊ de dixebite. Gotar û berhemên wî yê siyasî, wêjeyî û lêkolînan di gelek rojname, kovar û malperan de, hatine weşandin û ji wan: Kovara Bihar, Xunav, Pirs, Şermola û Sîwan; Herwiha kovara El-Hîwar a ku bi Erebî derdikeve, rojnameya Newroz, malpera Welatê Me, Çandname û... hwd.

Li sala 2013an, ji nû ve komîteya amadekar a mihrecana Roja Helbesta Kurdî li Çiyayê Kurmênc - Efrînê ava dike û ta sala 2018an, serpereştê komîtê bû. Komîtê şeş mihrecanên Roja Helbesta Kurdî li Efrînê lidar xistin.

Li sala 2014an, li bajarê Efrînê, SÎYA WÊJEYÊ ava dike. Siya Wêje bi çalakiyên wêjeyî radibû. Ji mehê carekê komek ji helbestvan, romannivîs û çîroknivîs li cihekî dicivyan. Hinan helbest û çîrokên xwe dixwendin, û pişt re di warê zimên û wêjeyî de, dihatin nirxandin.

Li sala 2014an, li bajarê Efrînê li gel Dr. Mihemed Ebdo û Îmad Kuse Navenda Lêkolîn û Belgekirinê (Efrînavend) dadimezirînin. Hejmara endamên wê gihîşt 40 kesan, û her yek ji wan di warekî de pispor bû. Malperek ji navendê re çê kirin. Lê mixabin ji dest tunebûna diravî û destêwerdana partiyekê, di riya hin endaman re, navend rawestiya.

**Di warê zimên de:** Piştî ku rêzimanê Kurdî baş dixwîne, li sala 1994an, keç û xortan bi şeweyekî dizî li hin gundên Efrînê fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî dike. Lewra jî, ji aliyê ewlekarên dewletê ve, ji karê memostetiyê yê li dibistanên fermî tê bidûrxistin. Lê dest ji fêrkirina zimanê Kurdî bernade û di mala xwe de, bi şeweyekî dizî, fêr dike. Ta sala 2005an (62) xort û keçan fêrî abê û rêzimanê Kurdî dike.

Li sala 2006an, li gel komek ji Kurdîperweran, *Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî* li bajarê Helebê dadimezirînin. Ji destpêka damezirandinê ta niha endamê komîta rêvebir e. Ji sala 2008an ve, S.F.P.Z.K asta yekê ji pirtûka wî (*Zimanê Kurdî Fêr Dibim*) fêr dike. Ji sala 2013an ta 2018an ji bo fêrkirina xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî odeyek ji xaniyê xwe yê taybet dike dibistan. Piraniya keç, xort û kesên temenmezin ji gundê xwe fêrî

xwendin û nivîsandina Kurdî kirine. Yazdeh hezar hejmar ji pirtûka wî ya ``ZIMANÊ KURDÎ FÊR DIBIM - asta yekê`` hatine çapkirin.

Ji 65 pirtûkên Kurdî yên bi nivîskaran re ji çîrok, ziman, roman, helbest û lêkolînan, lêveger û hûrbînî di warê zimên de kiriye.

**Li kû dimîne û dijî:** Ta niha li Rojavayê Kurdistanê, li gundekî ji yên Efrînê dijî. Piştî ku li sala 1994an, bi sedema fêrkirina zimanê Kurdî, ji karê mamos-tetiyê ku li dibistanên fermî dike hate bidûrxistin. Ji hîngê ve hingan (mêşên hinguv) xwedî dike.

### **Berhemên Merwan Berekat Bi Zimanê Kurdî:**

#### **A - Helbest:**

- 1 - Pêlek Ji Deryaya Vinê. 2003. Tenê /100/ hejmar hatiye çapkirin.
- 2 - Çavlirêyî. 2004. Tenê /100/ hejmar hatiye çapkirin.
- 3 - Nameyên Azadiyê. Weşanxaneya Şilêr, Qamîşlê. 2021
- 4 - Dilrevîn. Weşanxaneya Şilêr, Qamîşlê 2021. Tenê helbestek e ji /100/ rûpelî pêk tê.
- 5 - Tabloyine Xemgîn. Weşanxaneya Şilêr, Qamîşlê 2021.
- 6 - Evîna Zamdar. Weşanxaneya Sersera, Almaniya - Berlîn 2019.
- 7 - Efrîn Helbesta Bê Dawî. Weşanxaneya Sersera, Almaniya Berlîn. 2019. Tenê helbestek e ji /135/ rûpelan e.
- 8 - Hestên Buharî. Li ber çapê ye.
- 9 – Hêviyên Zîldayî. Li ber çapê ye.
- 10 - Kobanî û Keçên Royê. Ji helbestekê pêk tê. ji çapê re amade ye.
- 11 – Hilma Birînên Bêdeng. Ji çapê re amade ye.

#### **B - Roman:**

- 1 - Awirên Royê. Ji aliyê Y.N.K.S hate weşandin.2019.
- 2 - Romana Pakrewanekî Kurd. Weşanxaneya Şilêr, Qamîşlê 2019.
- 3 - Efrîn Destan û Birîn. Weşanxaneya Sersera Almaniya- Berlîn 2019.
- 4 - Penageh. Weşanxaneya Ava. 2020.
- 5 - Helwest. Weşanxaneya Şilêr, Qamîşlê 2021.
- 6 - Kela Qumriyê. Weşanxaneya Şilêr, Qamîşlê 2021.
- 7 - Deriyên Reş. Weşanxaneya Şilêr 2022.

- 8 - Vedenga Êşan. Ji çapê re amade ye.
- 9 - Ez û Kerê Spî. Ji çapê re amade ye.
- 10 – Xencera Destikzîvî. Ji çapê re amade ye.
- 11 – Nameyên Jineke Kurd. Ji çapê re amade ye.

**C -**

- 1 - Jan û Jiyan- rêzine fîlosofî û helbestî. Weşanxaneyê Şilêr, Qamîşlo 2021.
- 2 - Wateyê Çikdayî - deqîne wêjeyî. Weşanxaneyê Sersera, Almaniya Berlîn 2019.

**Ç - Ziman:**

- 1 – Zimanê Kurdî Fêr dibin - asta yekê. Li gelek weşanxaneyan çap bûye. Ji bilî ya Sersera, hemîyan bênav çap kirine. Ji ber ku li sûriyê çapa wê qedexe bû. Yazdeh hezar hejmar jê hatine çapkirin. Li her welatê ku SFPZK lê heye pê tete fêrkirin.
- 2 - Gulistana Zimên ( Kurdî - Erebî ) ji sê beşan e: Abê, Rêziman û Ferhengok. Weşanxaneyê Ebdilmon`im Naşîrûn - Heleb. 2008z. (7000 ) jê hatine çapkirin.
- 3 - Ez Zimanê Kurdî Fêr Dibim - Asta Duyemîn - 2012.
- 4 - Ferhenga Biçûk - Erebî - Kudî - 2012z. Çapxaneyê Heleb.
- 5 - Jiyana Zimên. Weşanxaneyê Sersera, Almaniya - Berlîn. 2019.
- 6 - Jiyannasîn. Weşanxaneyê Sersera, Berlîn Almaniya 2020. Ev pirtûk ya me sê kesan e: Merwan Berekat, Dr. Mihemed Ebdo Elî û Îmad Kuse.

**D - Zargotin:**

- 1 - Gurzek Ji Stranên Folklorî. Weşanxaneyê Şilêr, Qamîşlê 2021. Weşanên Pîrê, Nerwêc 2020.
- 2 - Pêkenokên Gelêrî. Li ber çapê ye.

**E – Çîrok:**

- 1 - Li Welatekî Sêwî. Weşanxaneyê Sersera. Almaniya - Berlîn 2019.


**Ê – Gotar:**

- 1 - Helwest û Nêrîn. Li ber çapê ye.

**Berhemên bi Zimanê Erebî:**

- 1 - شذا الأيام - شعر - دار عبد المنعم ناشرون، حلب. 2002 م.
- 2 - من ذاكرة القلب - شعر - دار عبد المنعم ناشرون، حلب، 2007 م.

- 3 - فوضى الرحيل - شعر - دار عبد المنعم ناشرون، حلب - 1010م.
- 4 - همسات مملكة البراءة - قصص قصيرة - دار عبد المنعم ناشرون، حلب - 2006م.
- 5 - جبل ليلون في مرآة التاريخ - بحث جيولوجي، تاريخي، أثري، اجتماعي موثق - دار عبد المنعم ناشرون، حلب - 2006م.
- 6 - عفرين عبر العصور - بحث جيولوجي، جغرافي، تاريخي، أثري موثق - دار عبد المنعم ناشرون، حلب 2008م. دار شلير، ط ٢ قاميشلي ٢٠٢٠. دار نفرتيتس، ط ٣ القاهرة ٢٠٢١.
- 7 - مواضيع في حياة اللغة . دار نشر DAR القامشلي ٢٠١٧.
- 8 - جرح الزيتون. رواية. دار المثقفون العرب للنشر والتوزيع، مصر.
- 9 - موجز كردستان - الجغرافيا والتاريخ. جاهز للطباعة.



## Mesûd Dawid

Di sala 1981ê de, li gundê Cirnê Reş yê girêdayî bajarê Dirbêsiyê li rojavayê Kurdistanê, jidayik bûye.

- Xwendina xwe ya seretayî û navendî li bajarê Dirbêsiyê tewaw kir, û ya lîseyê li bajarê Qamişlo bi dawî kir.

- Di sala 1999an de, bû xwendekar li zanîngeha Helebê û dest bi xwendina wêjeya Erebi kir. Di sala 2002yan de, bawernameya wêjeya Erebi ji heman zanîngehê bi dest xist. Pişt re di 2004 an de, li kolêceya Perwedê li Helebê diploma bala tewaw dike.

- Di 2003yan de, dest bi karê mamostetiyê dike li lîseyên bajarê xwe Dirbêsiyê û herweha li navendên xulên fêrkirina xwendekaran ta sala 2017z.

- Ji sala 2014an ta sala 2017, bûye endamê komîta sernivîs ya kovara (AL-Hîwar), ya ku bi zimanê Erebi li Qamişlo tê weşandin, û di heman demê de hin gotar tê de belav kirine.

- Di malper, kovar, û rojnameyên Kurdî de berhemên xwe belavkirine, û gelek şevbuhêrkên helbestî û simînarên rewşenbîrî li bajarê xwe, Dirbêsiyê, bi rê ve birine.

- Niha li Hewlêrê, peytexta herêma Kurdistanê, jiyana xwe berdewam dike, û ji 2017an de, li wir wek penaxwaz bicî bû ye ta roja îro.



- Bi herdû zimanan Kurdî û Erebî dinivîse, em karin bêjin helbest bi Kurdî û gotarên xwe bi zimanê Erebî dinivîse.

-Di Naveroka helbestên xwe de, bêhtir babetên welatparêzî û niştîmperwerî dane diyarkirin, û bi zimanekî Kurdî sade, asan û petî nivîsandine û gotarên wî di van waran de ne: Civakî, siyasî, û zimanê Kurdî.

**\* Berhemên wî yên weşandî:**

- Bişkojên azadiyê, helbest, 2017z.

- Baxçê zarokan, helbestên zarokan, 2020z.

- Gotarên min PDF, jimarek gotarên civakî, zimanê Kurdî, û siyasî ne, bêhtirên wan di rojname, kovar û malperan de hatine weşandin.


**\* Berhemên neçapkirî**

- (Dirbêsiyê di navbera rabirdû û niha de): Pirtûkek behsa dîroka bajêr dike û herweha şaredariyên pê ve girêdayî, bi şêweyekî zanistî û hemû bûyer bi belge hatine xuyakirin. Bûyerên ku di sedsala borî de derbas bûne. Pirtûkek bi nirx e û em bi hêvî ne, di demeke kurt de roniyê bibîne.

- Berhevoeke helbestan bi zimanê Kurdî heye ew jî nehatiya çapkirin.

**\* Di warê wergerê de :**

- Wegera Dîwaneke helbestî ya helbestvan Hozan Girkundê, ji Kurdî bo Erebî, bi navnîşana: Evîna herheyî .... û destana Êşê (Serê kaniyê): Di sala 2020an de, ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Sûriyê ve hatiya weşandin. Herwiha gurzek helbestên helbestvan Xemgîn Ramo û hin helbestvanên din ji Kurdî bo Erebî, piraniya wan di malperên eliktironî de hatine weşandin.



## Mîdiya Merwan Berekat

Di sala 1997an de, li gundê Soxanekê, Şêrewa - Efrînê jidayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe Soxanekê, ya amadeyî li gundê Aqîbê û ya navendî jî li bajarê Efrînê xwendiyê. Di piçûkaniya xwe de, bavê wê ew bi dizî fêrî zimanê Kurdî dikir, û li sala 2015an derbasî Zanîngeha Efrînê beşa Ziman û Wêjeya Kurdî dibe. Lê, mixabin, ji ber rewşa şer û dagîrkirina Efrînê nikarîbû xwendina xwe li Efrînê bi dawî bike. Lewra ji neçarî çû bajarê Qamişlo li Zanîngeha Rojava jî salekê xwend û di sala 2019an de, ji Zanîngehê derçû. Di sala 2021ê de, li Zanîngeha Rojava bûye mamoste û metiriyala Romanê dida.

Bi çîrok û helbestên xwe beşdarî pir şevbuhêrkan bûye, û li herdu Zanîngehên Efrînê û Rojava, helbest li roja Zimanê Kurdî dixwendin û nivîsên xwe di hin kovar û rojnameyan de mîna: Pirs, Rewşen Bedirxan û Şermola weşandine. Nivîsên xwe di hin pirtûkan de hene mîna beşdarî weke: Entolojiya Jinên Kurd - Antolojiya Êşên Jinan û h.w.d.

### **Berhemên wê yên çapkirî:**


-Roman: Berxwedanistan, çapxaneya şilêr li Qamişlo, 2019

-Çîrok: Rengên Êşan, çapxaneya SerSera li Almaniya, 2021.

Berhemeke çîrokan û yek jî ya helbestan hene hîn çap nebûne.

**Çar xelat jî di warê çîrokê de standine, ew jî ev in:**

1. Xewna Zarokekî- Mehrecana Osman Sebrî, 2020
2. Qeşe- Pêşbirka Sirûcê ya Kurteçîrokan, 2020
3. Odeya Tazî - Mehrecana Wêje û Hunera Jinê, 2021
4. Velantyn Li Welatê Me - Mehrecana Wêje û Hunera jinê, 2022



## Mihemed Bakro

Dr. Mihemed Bakro (Bekiro) di sala 1936an de, li Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Amûdê, jidayik bû. Xwendina xwe ya seretayî li Amûdê û ya navendî û lîseyê li bajarê Heskê bidawî kir. Ji şagirtên Kurd yê pêşeng bû, ku bawernameya xwendina bakaloriya beşê zanistî bidestxist. Bi riya rewşenbîrê Kurd yê bejinbilind Qedrîcan hevkarîya Kurdî ji bo xwendina derveyî welêt, li dewleta Çîkoslovakiya (Tşîkoslovakiya) berê ji bo wî hate dayîn. Zanista abûrî li wir xwend, macistêr û doktora jî li heman dewletê bidest xist. Di wê demê de, wek bêjer di radyoya Tşîk - beşê Erebi de, kar kir.

Piştî rêkeftina 11ê avdarê ya di navbera gorbuhîştî Mele Mustefayê Barzanî û rêjîma Iraqê de hate imzekirin, û ji ber ku vekirina zankoya Silêmaniyê yek ji bendên wê bû, li ser daxwaza hin serkirdeyên Partî Dîmoqratî Kurdistanî mîna birêz Samî Ebdurehman, Dr. Bakro berê xwe da başûrê Kurdistan. Salekê li zankoya bexdayê kolêja rêvebirin û abûrînasî mamostayî kir heya ku zankoya Silêmaniyê amade bû; du salan li zankoya Silêmaniyê beşê aborî mamostayî kir. Di vê demê de, çend xwendin di derbarê abûriya Kurdistanê de danîn û amadekirin, û di hin kovaran de weşandin. Piştî têkçûna rêkeftina 11ê Adarê, berê xwe da Ewropayê, li Elmaniya Rojava cîbicî bû, û heşt salan li wir ma.

Di sala 1980yê de, vegeriya Rojavayê Kurdistanê, hêzên ewlehî yê rêjîma Sûriyê gelek astengî li pêş kar û jiyana wî danîn, lê tev wilo jî ew li ser xaka welatê xwe ma û jiyana xwe bi dijwarî derbas dike.

Tê hejmartin ji nav helbestvanên Kurd yê pêşeng ku helbesta Kurdî ya nûjen nivîsîne, û ew yek ji wan e. Çar girûpên wî yê helbestî çapkirî û belavkirî hene, navên wan:

-**Dara bitenê**, Beyrût-Libnan, sal: 1992

-**Bûka ber êvarê**, Beyrût-Libnan, sal:1996

-**Helbesta azaran**, Şam, sal: 2006.

-**Sîper**, Qamişlo, çapxana Pêla, sal:2020



## Mihemed Ebdó Elî

Li sala 1956an, li Gundê Turindê - Çiyayê Kurmêmc (Efrînê) – Sûriyê, jidayîk bûye. Hersê astên xwendinê, seretayî, amadeyî û navendî li bajarê Efrînê biserî kirin. Li sala 1980yê bawernama bijîşkiyê ji zanîngeha Helebê - Sûriyê wergirtiye. Ji sala 1983yan de, karê bijîşkiyê li Efrînê dike.

- Ji damezirawên Rojnama Newroz a siyasî, ku bi zaravayê Kurmancî û bi şeweyekî nepen li Sûryê derdikeve, ye; ji nivîskarên wê ye û pênc salan jî sernivîserê wê bû.

- Ji hejmara Kovara Pirs ya 36an û ta ya 52yan, sernivîser û nivîskarekî wê bû. Ew jî kovareke çandeyî ye, bi şeweyekî nepen li Sûryê derdikeve.

- Endamê desteya sernivîser ya kovara El-Hîawr ya Erebî bû, ku li Sûriyê çap û belav dibe.

- Bi Kurdî û Erebî dinivîse.

### **Berhemên Çapkirî:**

#### ✓ **Bi zimanê Kurdî:**

1- Ji bingehên rêzmana Kurdî, Pirtûka fêkîrinê – çapa yekem- Heleb 2006. Çapa duyem heleb 2014. Çapa sêyem- DEZGEHA Sersera 2019an - Almaniya.

2- Nasîna Rêzmana Kurdî, pirtûka fêkîrinê – çapa yekem - Efrîn 2014, çapa duyem li dezgeha SERSERA 2019an Almaniya. Efrîn 2014.

3- Çiyayê kurmênc (Efrîn) Dîrok, Civak, Belgekirin – dezgeha SERSERA 2019an li Almaniya hate çapkirin.

4- Çiyayê kurmênc (Efrîn) Lêkolîneke xaknîgarî gîştî – li Qamîشلê 2018an û li Dezgeha SERSERA 2019 - Almaniya hate çapkirin.

5- Êzdî û Êzdiyêtî li Bakur û Rojavaya Sûriyê – dezgeha SERSERA - Almaniya 2019an û li Qamîشلo 2017an hate çapkirin.

6- Gotar û nivîsarên wî di rojnama NEWROZ de (1995 – 2012). Çapa Taybet- Efrîn 2016. Çapa duyem jî li sala 2019an ji hêla Dezgeha SerSera ve hate çapkirin.

7- Ji wêjeya olî li navça Efrînê (MEWLÎDA ŞERÎF ya Şêx UMER MELLE ELÎ, Pêkanîn û wergerandin ji tîpên Osmanî, Çapa Taybet 2015an.

8- Ji wêjeya olî li navça Efrînê (MEWLÎDA ŞERÎF ya Şêx NEZMÎ ÎMADEDÎN, Pêkanîn û wergerandin ji tîpên Osmanî. Çapa Taybet, 2015an.

9- Kelîle û Dîmne, wergerandin ji Erebî – dezgeha SERSERA li 2019an çap kir.

10- Bêjene vebijartî, Ferhengeke biçûk, Erebî – Kurdî: 2016, çapeke Taybet.

✓ **Bi zimanê Erebî:**

1- Te`lîq `Ele Kîtab (Tarix Sûriye ElQedîm- Elmerkez)- li sala 1999an bi navê Rozad Elî li Sûriyê hate belavkirin.

2- Cebel ElKurd (Efrîn) dîrase Tarîxiye - Ictîma`iye – tewsîqiye, çapxana El-Yemame 2004an. Wezaretê çandê li herêma Kurdistan li 2016an çap kir.

3- Cebel ElKurd (Efrîn) dîrase Cuğrafiye Şamîle - Efrîn 2008an û li Qamîشلo 2018an hate çapkirin.

4- ElÊzdiye we ElÊzdiyûn fî Şîmal Êerbî Sûriye – Heleb - dar Ebdilmun`êm- 2009.

5- ElKurd fî Mewsû`et ElEsedî - li Qamîشلo 2019an hate çapkirin.



## Mihemed Elî Hiso (1930-2016)


Mihemed Elî Hiso wek "Nûjen" jî dihat binavkirin, di sala 1930î de, li gundê Mozan yê girêdayî bajarokê Amûdê, li Rojavayê Kurdistanê, jidayik bû. Jiyanê zor û dijwar derbas kir û ji ber xebata xwe ya siyasî, gelek caran hat girtin û di zindanên rêjîma Sûriyê de rastî îşkenceyên mezin hat. Wî di 20-saliya xwe de, gelek siyasîmedar, rewşenbîr û helbestvanên navdar yê mîna Osman Sebrî, Cegerxwîn, Nûredîn Zaza, Tîrêj, Bêbuhar, helbestvanê Komara Mehabadê Hejar Mukiryânî û zimanzan Cemal Nebez nas kirin.

Di sala 1960î de, dest bi nivîsandina helbestên Kurdî kir. Piraniya helbestên Hiso yê qeşeng û herikbar ji aliyê stranbêj û hunermendên Kurd yê navdar ve hatine gotin, û li her çar aliyên Kurdistanê belav bûne, wek: Bûkê rindê ciwanê, Welat kaniya zêra ye, lo şivano, taxa fila û gelekên din.

Hiso di sala 2008an de, hêjayî xelata Cegerxwîn ya Helbestê hat dîtin. Ji xeynî dîwaneke neçapkirî, wî çar dîwanên helbestan li pey xwe hîştin bi navê: Nalîn (1999), Zîlan (2002), Derdê Ezîtiyê (2001) û Berxwedan (2012). û ya dawî li ber çapê bi navê, "Ez û keça pakrewan".

Di 04. 03. 2016an de, bi beşdarî û tevlîbûna rewşenbîr û nivîskarên deverê, û bi axaftinekê ji aliyê mamoste Dilawerê Zengî, serokê yekîtiya nivîskarên Kurd – Sûriyê, li goristana Hilêliyê li bajarê Qamişlo bi axê hat spartin.





## Mihemed Elî Şakir (1946-2020)

Di sala 1946an de, li herêma Dirbêsiyê ya Rojavayê Kurdistanê jidayik bû.

Di sala 1966an de, Xwendina xwe ya seretayî, navendî û lîseyê li Dirbêsiyê biserî kir.

Di sala 1968an de, xwendina mamostetiyê jî bi dawî kir.

Di sala 1973yan de, leşkeriya neçar ya Sûriyê bi dawî kir.

Di sala 1975an de, ji nû ve xwendina amadeyî (lîse) ya wêjehî (edebî) xwend û bawername wergirt. Wî li Zanîngeha Helebê zimanê Ingilîzî sergihakir (kutakir), di sala 1981ê de. Li dora 12 salan mamostetiya mûzîkq, nîgarvanî (resm) û zimanê Ingilîzî kir. Hezkirina wî ji mûzîkê re ji makzayî de ye. Ewî tim guhdariya Mihemed Arifê Cizîrî, Meryem Xan, Mecîdê Herkî, Se'îd Axayê Cizîrî, Kawîs Axa û htd ... dikir.

Di sala 1963yan de, ji xwe û birayê xwe yê piçûk (Mehmûd) re, berbetek (ûd) kirî. Çend meh tê de derbas nebûn dest bi xwendina (nota) mûzîkê kir ta ko fêrbû.

li dor 255 stranên ji helbest û awazên wî hene, û nêzî 40 stran jî ji helbestên çend helbestvanên Kurd hene, mîna: Seydayê mezin Ehmedê Cizîrî, seydayê Cegerxwîn, seydayê Tîrêj, Osman Sebrî, Umerê Lalê, Yûsifê Berazî (Bêbuhar), Deham Ebdûl Fettah û Dilawerê Zengî.

Gelek hozan û hunermendên Kurd stranên wî strandine, wek: birayê wî Mehmûd Ezîz Şakirî, Mihemed Şêxo, Gulistan Perwer, Şehrîbana Kurdî, Mistefa Xalid û hin hunermendên din jî hene ew jî nûjen in mîna: Selah Kîkî.

Du kasêt bi dengê xwe tomar kirine binav û nîşana: (Çi guneh min kir), di sala 1995an de, û (Narîn) di sala 1997an de.

Şêst awaz û awazbendek berhevoka wî ya yekemîn e ko çap bûye, ev berhevok şêst stran tê de hene, û piraniya wan hatine awazkirin û stran. Lê wî 21 ji wan notan kiriye. Li ser daxwaza wî, mamoste Dilawerê Zengî pêşgotina wê nivîsandiye, çapxana Sîmav, ji weşanên Desteya Çandê, sala 2015, Qamişlo.

Piştî êrîşa Turkiyê ya dagirker li ser bajarê Serê Kaniyê, Mihmed Elî Şakir jî weku hemî welatîyên bajêr ji neçarî cî û war li pey xwe hêlan, û berê xwe da bajarê Amûdê, û li wir bicî bû ta di 24ê Berçileyê 2020an de, bi nexweşiya Korona ket û mir. Li Amûdê, li goristana Şermola hat veşartin.



## Mihemed Emîn Reşîd Sa'dûn

\* **Jidayîkbûn:** Di sala (1967)an de, li gundê Giresorê Heso, ku dikeve devera koçeran, ser bi bajarê Dêrika Hemko ve ye, li Rojavayê Kurdistanê, hate ser rûyê dunyayê.

\* **Xwendin:** Xwendina xwe ya seretayî li dibistana gundê xwe bi dawî kir. Pişt re çûye bajarê Dêrikê û xwendina xwe ya navendî û amadeyî berdewam kir. Piştî ku xwendina navendî û amadeyî qedand, çûye Şamê û li zanîngeha wê, di Fakulteya Endezyariyê de hate qebûlkirin.

Di sala 1994an de, ji Fakuleteyê derçû û vegera bajarê Dêrikê û li wir bû karmend. Li serdema xwendina wî di zanîngehê de, û piştî ku gelek ji nivîskarên mîna Apê Osman, Diya Ciwan û hinên din nas kirin, bi hûrbûnî guhdan da zimanê Kurdî. Berî wê demê, wî hin caran babetin dinivîsandin lê bi tîpên Erebî bûn. Mana li Şamê û bi taybetî di wê serdemê de, çend kovar û rojname, çîrok, roman, dîrok û rêzimana Kurdî ketin nav destên wî. Fêrî nivîsandina bi tîpên Latînî û rêzimana Kurdî bû. Cara pêşîn wî çîrokeke bi navê (Dizê Şeva Gonê) di kovara Xunavê de weşand. Di destpêka ezmûna xwe ya nivîsandinê de çîrok, serborî û serpêhatî nivîsandin, û piraniya wan çîrokan di kovarên Xunav, Buhar, Zanîn, Gelawêj û Metîn, û çend malperên Kurdî de hatin belavkirin. Her dîsanê, û piştî ew ji Şamê vegera û li bajarê Dêrikê nişteçî bû, bi rengê xurtir guhdan da nivîsandinê, û vê carê bergehê wê ferehtir kir; wî dest bi nivîsandina gotar û lêkolînan kir, û di rojname Newroz û Berbangê û kovara Gulan a Latînî, Hevînd û Dicle de weşandin, û di gelek malperên Kurdî de, mîna Amûdê, Efrîn, Welatê me, Puk Mîdya, Rojava, Gemî, Peyamnêr, Nefel û hinên din de nivîsand.

\* **Navên Veşartî:** Çîrok, gotar û berhem û lêkolînên xwe bi navên cuda û veşartî belav dikirin, ji wan navan: M. Emîn, Diyar Ehmed, M. Emîn Koçerî, B. Kamîran, bavê Şêrîn, M. Emîn Sadûn.

\* Di sala 1995an de, wî û jimarek ji rewşenbîr û nivîskarên Kurd li bajarê Dêrikê Guropa Dêrikê ya Çanda Kurdî, bi serokatiya xwedê jê razî, nivîskar Mihemed Qasim (Ibn El-Cezîre) ragihandin.

Di sala 2001ê de, ew jî bi hijmarek ji xemxwer û evîndarên gotina Kurdî, û birek siyasetmedar, rewşenbîr û nivîskarên navdar tevî xebata damezrandina Navenda Celadet Bedirxan a Rewşenbîrî li bajarê Qamîşlo bû. Wî û nivîskarê koçbarkirî, mamoste Mihemed Qasim (Ibn El-Cezîre) wek nûnerên Dêrikê cihê xwe di nava desteya rêveber de girtin.

\* Di sala 2012an de, bi arîkariya çend xemxwerên zimanê Kurdî Peymangeha Bedirxan a Zimanê Kurdî li Dêrikê ava kirin, û ew weke rêveberê wê hate destnîşankirin. Her di wê salê de, ligel wan mamosteyan Dibistana Dr. Reşd Ehmed a perestarî û rewşen lezgîn ava kirin.

\* Di sala 2015an de, bi piştevanî û piştgiriya çend xêrxwaz û zimanhezan pirtûkxanek bi navê pirtûkxaneya Barzaniyê Nemir li bajarê Dêrikê vekir, ku jimara pirkûkên wê di destpêka ragihandina pêşîn de gihan (2981) pirtûkê. Ji wan pirtûkan (1320) pirtûk wî ji pirtûkên pirtûkxaneya xwe ya taybet diyarî wê kirin.

\* Di sala 2013an de, û bi beşdarbûna jimarek ji nivîskarên Kurd Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Sûriyê, li bajarê Qamîşlo damezirandin, û ew di wî kongirî de wek endamek di desteya rêveber de hat hilbijartin.

\* Di sala 2015an de, beşdarî di avakirina Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriya de jî kir, û wî cihê xwe di desteya rêveber de girt.

\* Di sala 2019an de, ji bo hevserokatiya Odeya Endezyarên Dêrikê ya Yekîtiya Endezyarên Herêma Cezîrê, hate helbijartin û ta niha jî hê berdewam e.

\* Ji ber çalakî, kar û xebata wî ya siyasî û rewşenbîrî ya berçav û balkêş, ew gelek caran rastî gef û astengiyan ji aliyê navendên hêzên ewlekariyê hat, û di encama wan de, çar caran ji karê xwe di dezgehên dewletê de, hat dûrxistin û cara dawiyê di sala 2013an de bû.

\* Di pêvajoya xebata xwe ya rewşenbîrî û siyasî de, gelek rûniştin û simînar li ser zimanê Kurdî, lêkolîn li ser berhemên nivîskaran, xwendin û

raxistina naveroka pirtûkan, û mijarên cuda li Şam, Qamişlo, herêma Kurdistanê, Girkê Legê û Dêrikê dane.

**Berhemên wî yên çapkirî:**

-Hizir û ramanên veder, ji aliyê YNKS ve hatiye çapkirin.

**Berhemên wî yên neçapkirî:**

-Qêrîna xîmava lal-çîrok


-Turkiya .. sêkuçkiya gera mirinê, lêkolîneke dîrokî û ciyosiyasî ye.

-Helwestên xav, gotarên cuda

-Sed xam û xan, lêkolîneke li ser pênasîn û berhemên sed nivîskarî ye. Hê bi dumahî nehatiye.

-Azola êmê belaş-lêkolîneke li ser zanista çandiniya nû û bêbuha.

-Gotinên paşiyar li ser kêşa pêşiyar.



## Mihemed Hemo

Di yekê meha Avdarê, sala 1961ê de, li gundê Şîtka, bi ser devera Çiyayê Kurmênc (Afrîn)ê ve ye, jidayik bûye. Kurê malbatek cotyar û xwedî bax û bistan, û pir oldar û Kurdperwer bûn; birayê heşt xwîşk û çar birayan bûye. Xwendina seretayî di dibistana gundê nêzîkî wan de, bi navê gundê Mîrka û navarast li Gundê Birîmc xwendiyê. Paşê li bajarê Helebê xwandiyê. Ji pola heştê de, dest bi tîpên Erebi kiriye. Gava ew diçe bajarê Helebê, Alfabeya Osman Sebrî peyda dibe û bi saya wê fêrî nivîsandina tîpên Latînî dibe. Di dû wê re jî, kovara Gulistan ku bi dektîlo nivîsandî, ya Partiya Pêşverû bû û bi serpereştiya nemir Cigerxwîn derdiket, dikeve destê wî. Ji ber wê jî hinekî fêrî xwandina Kurdî dibe. Gava ew çû leşkeriya neçar, li Şamê, bi berdeyamî serdana nemir Osman Sebrî dikir, û ji wî fêrî gelek tiştan dibe. Hin kovar û pirtûkên Kurdî diketevin nav destên wî. Hîngê wî helbest dinivîsandin û di pêşkêşkeriya aheng û Newrozan de dixwend. Ew li Şamê rastî korseke zimanê Kurdî tê ku, gelek kesên Kurdperwer tê de xwe fêrî zimanê Kurdî dikirin, ji wan Sebah Mêrzo Xanim, Gesam Derbas û hevmala wî Fethiye, û Îbrahîm Berzencî û çendekên din. Mamosteya wan, Perwîn xanim, Kurda Amedê bû, ji ber sitema dewleta Turk, ew û hevmalê xwe Xelîl Xoce li Şamê bicî bûbûn. Xelîl Xoce, siyastmedarekî Kurdê Mêrdînê bû. Çend caran Mihemed jî di korsê wan de amade dibe û sûdê jê werdigire.

Di destpêka sala 1983yê de, leşkeriya neçar biserî dibe, û diçe çend mehan li gundê xwe Şîtka dimîne; hîngê gelek keç û xortên gund fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî dibe, û di Newroza 1983yê de şanoya Kawayê

Hesinker amade dike, û di gel keç û xortên gund û bi amadebûna hemî xelkê gund û gundên derdorê, li ser bêderên gund ew şanoyê pêşkêş dikin. Li cem gundiyan tişteki nuh bû, çimkê cara yekê bû ku gundî sêrî şanoyek bi Kurdî dikin. Ew şano gelek di nav gundiyan de, deng dide, loma çavên sîxurî û Basiyan li ser wî vedibin û çavdêriya wî dikin. Ji neçarî ew diçe bajarê Helebê, di Kompaniya Îstîsîla Al-Eradî de, dibe fermanber; ew li bajarê Helebê dest bi çalakiyan dike. Dibe endamê Partiya Hevgirtina Gel û di siyasetê de jî dixebite.

Di gel çend hevalan, koma Şanoyê damezirand û tevî koma Armanc ya hunera Kurdî bûn. Ew bû yek ji rêveberên giştî yên koma Armanc û dest bi karê Hunerî jî kir. Di ber wê re jî koma Xanî ya wêje û çanda Kurdî bi çend hevalan re damezirand. Bi helbest, şano û çîrokên zarokan dest bi nivisandinê kir. Li destbêkê, wî berhemên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belavkirin e, nemaze kovara Aso û Stêr.

Di destpêka salên notî yên sedsala borî de, li Helebê, li gel hevlekî xwe yekemîn pirtûkxaneya Kurdî bi navê Xanî vekir, û kêmkî salekê berdewam kir û di dûv re jî pirtûkxana Bedirxan, bi tena xwe, li Helebê taxa Eşrefiyê vekir. Ew pirtûkxane bû navçeya rewşanbîrên Kurd. Bi vî awayî jî, gelek pirtûk çapkirine û belavkirine. Ji ber wê yekê, hêzên ewlekariya rijîma Sûriyê gelek caran ew zîndan û îşkence kirine. Lewma ew neçar bûye ku berê xwe bide Başûrê Kurdistanê, hîngê jî îstîxbaratê Leşkerî yên Sûriyê destê li ser pirtûkxana wî ya bi navê Bedirxan danîn, û pirtûkxana wî ya malê talan kirin.

Ew li bajarê Silêmaniyê karê rojnamevanîyê dike. Li Kurdsat.Tv çend bernameyan amad û pêşkêş dike. Dibe nivîserê kovara Al-Îtîhad, li bajarê Silêmaniyê. Li wezaretê Rewşanbîrî pispore zimanê Kurdî beşê Latînî bû. Yekem beşê Latînî di Kitêbxaneya Giştî ya Silêmaniyê de dadimezirîne. Li Senterê, Gêncên Behdînan waneyên fêrbûna Latînî dane. Ew ji desteya sentera lêkolênên Aştî bû.

Di sala 1996ê de, Xelata Çîroka yekem ya Koma Xanî ya wêje û çanda Kurdî, wergirtiye.

Sala 2000î bi xelata Mehrecana Cegerxwîn a helbesta Kurdî rêz lê hatî girtin.

Niha li bajarê Hewlêrê xwediye Sentera Hemo ya Rewşanbîrî û Kelepûrî ye. Ew Endamê desteya Kargêriya Tevgera Aştiya Navxoyî ye.

### **Berhevokên wî ev in:**

1) Civata Kulîlkan. Şanoya zarokan, bi Kurdî ye, 1994 Beyrût, weşana wê bi zimanê Firansî 2000 Li Firansa bajarê Rims. Û ew şano li çendîn bajarên Firansa bi zimanê Firansî hate pêşkêşkirin.

2) Seyrana dil, di şîna evînê de – Helbest. Sala 1997ê ji çapa weşana kitêbxana Bedirxan - Heleb derçûye.

3) Di bin dilovaniya jiyane de – Helbest. Sala 1999ê çap bûye, ji weşana kitêbxana Bedirxan - Heleb. Helbestvana Kurd Semîre Şebab (Axîna Welat) ew berhevok wergerandiyê zimanê Erebî.

4) Di kûrahiya vê riyê de – Helbest. Sala 2004ê li bajarê Silêmanî, li dezgeha çapemeniya Xak, hatiye çapkirin û belavkirin.

5) Helbeststirana gulên mûmdankan – Kurtehelbest. Li Silêmaniyê sala 2008ê, ji aliyê Dezgeha Sema ya rewşanbîrî û hunerê ve, li welatê Dubey hatiye belavkirin.

6) Kenê girînokî, çîrok, Sala 2013ê li Silêmaniyê, ji aliyê Dezgeha roşanbîrî ya Cemal Îrfan ve, hatiye çapkirin û belavkirin.

7) (ضحكات باكية) wergera Kenê Girînokî ya Erebî, di sala 2017ê de, bi alîkariya Wezaretê Rewşanbîrî û Lawan, li Hewlêrê hatiye çapkirin. Wergervan: Azad Ukaş.

8- Di şîna Evînê de. Çar dîwan di dîwanekê de, çapxaneyê Sersera - Berlîn 2020


9- Nirx û Giringiya Peyvê li Afrîn (Çiyayê Kurmênc) lêkolîn. Ji weşanên Enistîtuya Kelepûrê Kurdî, Duhok 2022.

### **Li ber çapê:**

Du Hnermendên Folklorî yên Afrînî.

Hunermend Bavê Selah û Hunermend Xalê Xelo





## Mihemed Şerîf Berzencî (1940-2001)

Di sala 1940î de, li gundê Xizna yê bi ser qeza Qamişlo, parêzgeha Hîsiça ve, hatiye dinê.

Di malbateke tengezar û xizan de mezin bû. Qur'an û çend pirtûkên wêjeyî û olî li nik birayê xwe yê mezin Seyid Remezanê Berzencî xwendin. Di pey re, sê salan li dibistanê jî xwendiyê, lê ji ber bînahiya çavên wî kêr bûn, wî berdewam nekir. Ji bo debara jiyanê, wî dest bi çakirina baporan kir, û di wê pîşeyê de pir jêhatî bû. Di ber hûnandina helbestên Kurdî li erbanê jî dixist.

Di sala 1958an de, helbesta pêşîn bi navê (Elîfbêya îşqê) nivîsand û awaz kir. Ev nixuriya helbestên wî bû, û jê pêve helbest û awazên wî yên evîni, neteweyî û civakî rêz bûn wek: Dunya bû buhar, hunermend Mihemed Şêxo gotiyê, Qelemê, hunermend Remezan Necîm Omerî û Şukrî Necîm gotine. Şengejin, Beşîr Mihemed Şerîf gotiyê, Mem Îm Ez Tu Zîn Î, Ka fincankê ji wê qehwê, Dilber canê, Xwediya Kembera piştê, Venaxum, Min serî danî, Şukur bo xweda, Ezê çawa rizgar bikim, Sebra li ber vî dilî, Dilê min birîndar e.

Li dora 1800 helbestên wî hene. Bêtirên helbestên wî awazkirî ne, û bi dengê xwe tomar kirine. Hinek jî bi dengê hunermendên hevalên wî wek: Hunermend Se'îd Yûsif, Nemir Mihemed Şêxo, Remezan Necîm Omerî, Şukrî Necîm, Beşîr Mihemed Şerîf, Se'ed Herbawî, Mûsa Mihemed, Mihemed Hiso (Ronî can), Şiyar Farqînî, Şiyar Berzencî û hinek ji komên folklorî. Di katjimêr yekê nîvroja roja 20/7/2001ê de mir.

Dîwanek wî bi navê "Derya Xeman", pêşgotina Dilê Kurd, Qamişlo, 2022 hatiye çapkirin.



## Mihemed Şerîfê Cilînî

**Zayin:** Cih û roja jidayikbûnê: Bajarê Dirbêsiyê, 28ê Tebaxa sala 1946an.

**Malbat:** Bavê wî Hecî 'Emo Cilînî. Diya wî Seyro Hisên Şemo. Bav û diya wî ji gundê Cilînê, yek ji (33) gundên Êla Sûrgiça, ye.

Di sala 1932yan de, koçberê Bin-Xetê bûbûn. Ew kurekî bi tenê ji bav û diya xwe re bû, ligel du xuşkan. Hevjîna wî keça Hemo Dirbo ji Amûdê û hem ji heman Êlê ye.

Sê kurên wî hene:

- Yek Endezyarê bihevghiştin ( têlîkom), ê torên Internetê ye.
- Yek xwendina erdnasî li Helebê neqedand, nih pisporê agahîtiyê û hem jî wênegeriyê li Dûbey kar dike.
- Yek Endezyarê kîmyayî li Elmaniya dixwîne, ji ber li Sûriyê bi dawî nekir.

Sê keçên wî hene:

- Yek bijîşk û pispora nexwşiyên xwînê û penceşêrê (kansêr)ê ye.
- Yek erdnîgarî li Helebê qedandiye, li Elmaniya Êkonomî û Bazirganî xwend
- Ya Efare niha Perwerdehiyê dixwîne.

Weke çawa bavê wî ew daye xwendin, weharengê wî jî zarokên xwe dane xwendin.

### **Wargeh û niştecih**

- Li dirbêsiyê heya sala 1958an dijiya.
- Di navebra Dirbêsiyê û Şamê de, di navbera salên (1970 -1975)an de.
- Li bajarê Helebê di navebera salên (1975 – 2012)an de.
- Li Libnanê û Bexdadê ji bo kar, di navbera salên (2012 -2014)an de.
- Niha ji sala 2014an de, li Elmaniya, bi malbatê dijî.

### **Xwendin û fêrbûn**

- Xwendina seretayî li Dirbêsiyê, di dibistana gundewerî (rîfî) de, ji sala 1953/1954 heya sala 1958an, ku wî bawernama seretayî li gor pergala kevin ( berya yekîtiya Sûriyê û Misirê) wergirtibû.
- Xwendina amadeyî li Dirbêsiyê, di amadiya Dirbêsiyê, ji sala 1958/1959 heya sala 1962yan, ku wî bawernama amadeyî wergirt.
- Xwendina navendî – beşê zanistî li Dirbêsiyê, di dibistana nevendî bi navê Yemûk de, ji sala 1962/1963, heya sala 1965an, wî bawernama navendî – beşê Zanistî wergirt.
- Xwendina Zanîngehê (Zanko), li Şamê di amojgeha Zanistî ya Zankoya Şamê – beşê Kîmiya kirdeyî (tettbîqiye), bi Inglîzî Applied Chemistry, ji sala 1965/1966 heya sala 1970, û bawernama Kîmiya kirdariyê wergirt.
- Pisportiya pîşesaziya zeyt û rûnê rewika (nebata/rewzan), li Emerîka di sala 1980/1981 de wergirt.

**Bo tîbînî,** Dema xwendina seretayî, ew Deh salî bû, bavê wî ew fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî kir, ji ber ew yek ji suxteyên nemiran mîr Celadet û mîr Kamîran Bedir-Xan bû.

Di sala 1937/1938 de, li Şamê fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî bi tîpên mîr Celadet bûbû. Hêjayî gotinê ye ku, dema wî dest bi xwendina qonaxa amadeyî kir, bavê wî wêrek dikir ku guhbidin fêrbûna zimanê Inglîzî, ew bûbû sedema xurtbûna wî bi zimanê Inglîzî, ya ku pê re bûye alîkar di xwendina Zankoyê de.

## **Kar û xebata wî**

- Mamosteyê Kîmiya, Fîzya û zanistiya giştîyane li Dibistana navendî ya Dirbêsiyê ji 1970/1971 – 1971/1972 bû. Li Dibistana navendî ya Amûdê ji 1972/1973 -1973/1974 –1974/1975.
- Di warê pîşesaziya zeytê de:
  - Kompayina zeytê ya dewletê li Helebê ji 19/8/1975, heya 1992.
  - Li Himsê serperîştê avakirina pîşesazgehên zeytê yên Sabko/ Anbûba, û Famco/ Ferzat di navbera 1992-1996an de.
  - Li Hema serperîşt û rêberê pîşesazgeha zeytê ya kompaniya Avoco /Al-Eliyye di navbera 1996 – 2002an de.
  - Li Tertûsê serperîştê avakirina parzîngeha zeytê ya kompaniya El-Sûriye / Ese'ed û Bêtincanê di navbera 2003 – 2006an de.
  - Li Idlibê nûjengkirina pîşesazgeha zeytê ya kompaniya El-zehebî / Berekat û Qebanî di navbera 2006 – 2011an de.

## **Di warê siyaetê de**

Tucarî nebûye endamê partiyekê, wî xwe didît piştevan û alîgirê PDK, û çî ji wî dihat dikir, lê ne bi rengê rêxistî, û heya îro jî bawermendê rêbaza Barzaniyê nemir e, bêyî ku bibe alaveke bazirganî weke niha gelemper bûye.

Tenê ew yek ji komika Suxteyên (Qutabiyên) Kurd li zankoya Şamê bû. Yekîtiya Qutabiya Kurd li zankoya Şamê damezirandin, paş perçebûna partî di navbera Rast û Çep de, bi mebesta navberiyê di nav herdû perçan de bikin û nakokiyên kêm bikin û wan bigihînin hev, lê ew bi ser neketin, ji ber gelek sedeman, çîrok dûr û dirêj e û bûye ji rabirdû.

## **Komika wan ji van kesan pêk dihat:**

- Şêx Emîn Gulîn ji Efrînê, niha li Şamê dijî, û hê têkiliyên wan nehatine birîn.
- Dr. Newzad Mêrkan (neviyê Ebdilrehmanê Eliyê Ünîs e), niha li Êlihê (Batmanê) dijî, û hê têkiliyên wan nehatine birîn.
- Ismayil Deham Mîro, mixabin tu agahî derbarê wî tune ye.

- Bişar Hecî Husên Biro (Sîno), dilovaniya Xwedê lê be, heya ew sax bû têtikiliyên wan nehatin birîn.

- Mihemed Enwer Mamed Axa ji Efrînê niha li Siwêd dijî.
- Dr. Xelîl Ebdî (bavê Mezlûn Ebdî - Ferhad).
- Dr. Şûkrî Mistefa Mehmûd, paş xwendina xwe çû Ferensa.

Hejmara Qutabiyên Kurd li zankoya Şamê di navbera (40 -60) Qutabî bûn, ji bilî yê di demên Ezmûnan de, dihatin Şamê.

### **Berhemên wî**

Bi rastî ew xwe nabîne nivîskar an zimanzan, ji ber mercên nivîskariyê û zimanzaniyê li cem xwe nabîne. Ev jî nîşana nefspiçûkiya wî ye.

Ji dema pergala Medya civakî belav bûye, wî bi kurtî çend gotar bi zimanê Erebi û zimanê Kurdî li ser rûpela Fêsbûkê belavkirin; ev gotar jî derbarê Dîroka Kurdistanê ya kevnare, Erdîngariya Kurdistanê, serpêhatiyên hin navdarên Kurd, nemaze yê Bakur û Rojavayê Kurdistanê, û serhildanan bûn.

Li alîkî din çendîn gotar bi zimanê Kurdî derbarê pîşesaziyên kelepûrê yê Kurdan, û pîşesaziyên nûjen, mîna derxistina gelek cûreyên zeyta rewikan, Şîrmenî (hemî berhemên Şîrê pez û dewaran), Sabûn û kerestên pakkûnê), lê wî ew çap nekirin, hêvî dikim ku di demek nêz de, li gel pirtûka derbarê dara zeytûnan çap bibin.



## Mihemed Şêxo

Di 20. 03. 1968an de, li gundê Leylan ku dikeve Rojhilatî bajarê Qamişlo hatiye dinê. Li gundê Leylan şeş salan xwendiyê, pişt re çûye bajarê Qamişlo, û li wir bakaloriya, piştî şeş salan, biserî kiriye.

Di sala 1986an de, li gundê Sermisaxa Xwarê mamostayî kiriye.

Di sala 1989an de, Inistûtiya Endezyariya Riyên Hasinî beşê xwekêşê (ŞEMENDEFIRÊ ) tewaw kiriye.

Yek ji rêveberên Mihrecana Helbesta Kurdî ya ji sala 1993 dest pê bûye.

Di sala 2009an de, Kolîja dad û yasan xwendiyê.

Di 11/10/2013 de, li bajarê Qamişlo, Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriya hatiye damezirandin, û serokê wê mamoste Dilawerê Zengî (2013 - 2020) bû. Di kongirê yekê de, bûye cîgirê serokê vê Yekîtiyê ta dema ku ji welêt derketiye. Keda wî di damezirandina Yekîtiyê de, û di çalakî û avakirina şaxên wê de, balkêş bû.

Ji bo lidarxistina Navenda Celadet Bidirxan, pêşinyarkirina wî bû, ligel çend rewşenbîrên mîna: (Mişel Temo, Elî Cizîrî, Ebdilqadir Mustefa, û Mihemed Emîn Ehmed) hate avakirin. Lê mixabin bi tundî rijêma sûrî ew Senter girt.


**Pirtûkên wî yên çapkirî ev in:**

- Sirûda Şîr - helbest - sala 1995.

- Maçek ji dil, helbest - sala 1998, Qamişlo.

- Antolojiya helbesta Kurdî li Sûriyê, amadekirin, Duhok - sala 2003.

Sê destnivîsên rexneyî amadene ji bo çapkirinê. Gelek gotarên rexneyî di kovarên Kurdî û Erebi de nivîsandine, û hîn berdewam e. Di sala 2015an de, bi malîti çûye Elmaniye.



### **Mihemed Xelef 'Rêwî' (1955-2010)**

Di sala 1955an de, li gundê Xirbê Kejê, yê bi ser parêzgeha Hisiça ve ye, jidayik bû. Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û lîseyê li dibistanên Hisiça biserî kir. Xwendina bilind, di sala 1996an de, Lîsans di Mafnasiyê de, li Zanîngeha Helebê biserî kir.

Ew jî mîna piraniya nivîskarên Kurd, pêşî bi nivîsandina helbestê dest bi nivîsandina zimanê Kurdî kir. Lê, dest avêtiye gelek cûreyên din ji wêjeya Kurdî mîna: Civandina folklor, helbest bo zarokan, wergerandin, gotar û dîrok. Bi herdû zimanên Kurdî û Erebî dinivisand.

Di 16/12/2010an de çûye ber dilovaniya Xwedê.

#### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

-paytexta Derdan, helbest, 1985

-Salar û Mîdya, Cegerxwîn, wergerandin ji bo zimanê Erebî.

-Dîroka wêjeya Kurdî li Sûriyê.

-Revandina Ocelan û yasaya navdewletî.

-Nazê û Diyar.

-Helbestên Zarokan



-Dîroka rojnamegeriya Kurdî li Sûriya.

**Berhemên destnivîs ev in:**


-Ola Êzîdîyan, bi zimanê Erebi

-Têkiliyên Kurd û Ermenan, bi zimanê Erebi.

-Dîwanek ji helbestên kilasîk

-Pend û metelokên Dicle û Xabûr.

-Baxê gulan, gotarin bi zimanê Kurdî.



### **Mihemedê Cemîlê Seyda (9/8/1918 - 9/8/2005)**

Mihemedê Cemîlê Seyda, di 9/8/1918an de, li navçeya Licê ya Diyarbekir hatiye dunyayê. Bavê wî, Cemîlê Seyda, yek ji leşker û lehengên Şoreşa Şêx Se'îdê Pîran bû.

Mihemed kurê Cemîl e. Cemîl kurê Mihemed Hadî (Seydayê Licî) ye. Mihemed Hadî kurê Sebxtullah e. Ew jî kurê Resûl Paşayê Sorî yê Rewandîzê ye, û birayê Kor Mihemed mîrê Soran e.

Piştî şikestina Şoreşa Şêx Se'îd, Mihemed digel dayika xwe û pênc sed malên zaza ve, ji Licê tînin nav Amedê, û ji wir wan surgunî bajarê Nîgdeyê kirine. Di navbera Nîgde û Amedê de gelek zarok ji ber sermayê diqefilîn û dimirin. Di navbera Amed û Nîgde 719 kilometreye zêdeyê vê rêyê bi peyatî ne, Nîgde bajarêkî nêzîkî Enqera ye. Ew sê salan li wê dûrgehê mane.

Di sala 1928an de, 'efû derketiye. Piştî vê fermanê, malbata Mihemedê Cemîlê Seyda bi koçberî diçe Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Amûdê bicih dibe.

Herdû birayên wî Ewdilbarî û Ewdilqudûs nehatibûn girtin û neçûbûn neffiyê. Ewdilbarî bi bavê xwe re daket sûrî jiber ew hingê 18 salî bû, Ewdilqudûs xwe dide alî wê çaxê 13 salî ye, dûre dadikeve binxetê, Mihemed 8 salî ye, ev birayana her yek 5 sal di navbera wan de heye.

Li bajarokê Amûdê, diya wan çû ber dilovaniya Xwedê. Herdu birayên Mihemed xwendina olî xwendine û bûne mele. Cemîlê Seyda kurê xwe Mihemed şandiye dibistanê li Şamê û ew spartîye Celadet Alî Bedir-Xan, da ku dibistana fransî bixwîne. Mihemed li bin nihêrîn û şiyariya mamostayê hêja Celadet Alî Bedir-Xan ku alaya ziman, rêziman û toreya Kurdî bi xurtî

hildabû, dixwend û li mala Mîr razaye; zanîn û torevaniya Kurdî ji Mîr Celadet hîn bûye.

Bavê wî, Cemîlê Seyda, di serhildana Agirî de, alikarî û keda wî heye. Ew çawa dibihîze ku li Dêrsimê jî şer heye, dixwaze alîkariyê bide Seyid Riza û Dêrsimê. Paşê, tevî hin hevalên xwe û li ser daxwaza komeleya Xoybûnê, berê xwe didin Bakurê Kurdistanê. Artêşa Tirkîyê pêşiyê li wan digire, û bi rojan şer dikin. Leşkerên Tirk di şer de bi wan nikarin. Paşê li ser têdhildanekê li Bismîlê Cemîlê Seyda, Şêx Abdurahim, Şêx Mizbah, di nava zewiyekî genim de, di xewê de bûn. Agir berdidin genim û wan dişewitînin. Nav û qehremaniya wan di nav xelkê de belav dibe, û dengbêj li ser wan gelek stranên çêdikin.

Di sala 1939an de, dîplomaya fransî stendiye. Di Cenga Cîhanê ya duyem de, tevaya dibistanên fransî hatine girtin.

Di sala 1940ê de, bû imamê mizgefta gundê Girbêjîng.

Di sala 1958an de, berê xwe da Qamişlo û li wir jiyana xwe berdewam kir ta çû ser dilovaniya Xwedê.

Di sala 1962yan de, Dewleta Sûriyê hin pirtûk û helbestên wî şewitandine, û ew xistine zindanê. Dû re, wî surgunî Siwêda dikin.

M. Cemîlê Seyda nexşeya Kurdistanê destnîşan kiribû, û ji ber wê du salan di zindanên rêjîmê de girtî mabû.

Di sala 1964an de, dîsa vegehiyaye Cizîrê û dest bi daneriya Ferhenga Jîn kiriye ku heta bi sala 1987an pê ve karîwer bû.

### **Berhemên wî ev in:**


–Abeya Zimanê Kurdî. Beyrûd-libnan, çapxana Emîral, 1995

-Dîwanek helbestan. (Destnivîs).

- Ferhenga Jîn, Kurdî–Erebî. Qamişlo, 1987

- Pirtûkek bi navê Tekoşîna Min.

Di 9- 8- 2005an de mir û li goristana taxa Qudûr Beg, hatiye veşartin.



## Mihemedê Pîrê

Mihemedê Pîrê (Pîr Mem) di sala 1950î de, li gundê Kurdoyê jidayik bûye. Xwendina xwe ya bilind li Zanîngeha Beyrûtê beşê coxrafiya xwendiyê. Piştî xwendina Zanîngehê xwe fêrî xwendin û nivîsîna bi zimanê Kurdî kiriye, û di wê demê de dest bi xwendina hejmarek mezin ji pirtûkên Kurdî kiriye. Piştî ku hînî xwendin û nivîsandina bi Kurdiya Kurmancî dibe, îcar dest bi berhevkirina metelok û gotinên pêşyan, çîrok û çîvanokên gelêrî dike. Bi hezaran gotin, biwêj û metelokên Kurdî yê herêmî civandine.

Di sala 1984an de, dest bi amadekirina ferhengeke berfireh dike (Ferhenga Zimanê Kurdî bi Zarê Kurmancî), amadekirina ferhengê heya sala 2013an pê re dirêj kiriye. Ev Ferheng bêhtirî 80 hezar bêjeyê li xwe digire.

### **Berhemên wî yê çapkîrî:**

1. Ferhenga Zimanê Kurdî (çar cild).
2. Destanên Kurdî.
3. Lîstikên Biçûk û Mezinan Li Deşta Mêrdînê.
4. Xoce Simayîl: Dîne Bîrewer.



## Mihemedê Seyid Husênê Sîtî (1943-2022)

Di sala 1943an de, li gundê Tel-Erbîda jêrî, ya bi ser bajarê Qamişlo ve, hatiye dunyayê. Xwendina xwe ya seretayî li gund û ya amadeyî li Qamişlo xwendiyê.

Demekê li derveyî welat jiyaye, lê ji ber girêdana bi bajarê evînê Qamişlo ve, ji serdana welat qut nedibû.

Di sala 1957ê zayînê de, di temenkî piçûk de, dest bi hînbûna nivîsandin û xwendina bi zimanê dayikê dîke; di sala 1987an de, dest bi weşandina berhem û nivîsandinên xwe di kovar û rojnmaeyan de dîke.

Nivîskar Mihemed Seyîd Husên di 11ê Sibata 2022yan de, li nexweşxaneyê Covid-19, li Qamişlo ji ber nexweşiya vîrûsa Koronayê, jiyana xwe ji dest da.

### Ji berhemên Mihemedê Seyid Husên:

- |                      |                                     |
|----------------------|-------------------------------------|
| 1- Halana Qamişlo    | 2- Kê destane sor kirine            |
| 3- Gernejîna rokê    | 4- Kurdistan helbesta min e         |
| 5- Şeva dirêj        | 6- Welat Bihuşta min e              |
| 7- Awazên evînê      | 8- Bizava hozan û bîrlêkirina ziman |
| 9- Payîzxêra hêsiran | 10- Sirûşa pênuşê.                  |



## Mîral Zîlanî (Simyar Mîrza)

Di sala 1962yan de, li bajarê Amûdê jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û awarteyî li bajarê xwe biserî kiriye. Ji destpêka çax û benga xwe ve, ango ji temenê şanzdeh saliyê ve, karê siyasî û wêjevanîyê kiriye.

Di sala 1990î de, berhemê wî yê yekem, li Şamê bi alîkariya Dilawerê Zengî hate çapkirin. Şanoyeka siyasî-dîrokî bû, û bi navê “Xelex û Peyman” û bi Kurdiya tîpên Latînî bû.

Berhemê duyem gulbeka helbestan bû, ku di pirtûkekê de, bi navê “Destpêkên Şevînê” li Swêd, di sala 1994an de, hate çapkirin, û bi Kurdiya tîpên Latînî bû.

Berhemê sêyem pirtûkek bi navê “Ol û felsefeya Zeradeşt” bû, wezaretê çandeyî ya Herêma Kurdistanê, di sala 1997an de, çap kir, û bi Kurdiya tîpên Erebî bû.

Berhemê çarem pirtûkek bi navê “Yekîtiya Kurd” bi zimanê Erebî hat, çapkirin, û Kurdiya wê jî ji çapê re amade ye.

### **Berhemên wî yên neçapkirî jî ev in:**

- Ferhengêka bijartî ya Kurdî-Kurdî.
- Pirtûkek li ser neteweya Kurd.
- Jînenîgarî û hinek berhemên din ên hizrî (fîkrî) û civakî.
- Pirtûkek li ser zimanê Kurdî ji çapê re amade ye.

Ji bilî evê çendê, wî di rojnamevaniya Kurdî de kar kiriye, û bi taybetî li herêma Kurdistanê. Ji sala 1994an ve, û heta sala 2011an, wî di biwarê ragihandinê de kar kiriye. Vatiniya wî (wezîfeya wî) ya serekîn jî, mamostetiya di biwarê zimên û dîroka Kurd de bûye, ku bi taybetî li rojavayê Kurdistanê û li başûrê Kurdistanê wî ev xebat encam daye.

Hêjayî gotinê ye ku, hemû kar û berhemên wî di bin navê “Mîral Zîlanî” de hatine weşandin û encamdan.



## Miş'el Osman

-Di sala 1970yî de, li gundê Xwêtla ya girêdayî navçeya Dirbêsiyê ve, hatiye dinê.

-Di sala 1988an de, li bajarê Amûdê Belgenameya Navîn a Giştî, şaxê wêjeyî wergirtiye.

Nivîsên wî di çend kovarên Kurdî û Erebi de hatine weşandin. Destpêka weşandinê, hin helbest bûn di kovara (Azadî), ku li Qibrisê, di dawiya salên heştêyan de, derdiket. Helbest û berhemên wêjeyî Bi Kurdî û Erebi nivîsandine û dinivîse.

### Berhemên çapkirî:

- 1- Dîwana (Nîv Piyal), helbest, bi zimanê Kurdî ye 2017
- 2- Pirtûkek bi navê (Mihemed Şêxo jiyân û huner) karekî hevbeş e bi helbestvan Îbrahîm Ebdî re, bi zimanê Kurdî ye.

### Berhemên destnivîs:

3-Dîwana (Hestên Westiyayî), bi zimanê Kurdî, Helbest.

4-Dîwana (Ji bo we) Helbest.

٥- الصحافة الكردية المكتوبة في جنوب غربي كردستان في النصف الثاني من القرن العشرين (دراسة).

٦- الطلاسم المنسوجة بجداول الفجر، ديوان شعر.

٧- هل ينام البنفسج والأرجوان، ديوان شعر.



٨-مسرحية (كلب الأغا) للكاتب ممدوح عدوان، ترجمة.

٩-مسرحية (ثورة الموتى) للكاتب العالمي أروين شو، ترجمة.

10- Dîwana (Ji bo we) Helbest bi zimanê Kurdî ye.

- Li ber destê Dildarê Şeko fêrî zimanê Kurdî bûye.

-Kesayetiyan ku bi wan daxbarbû di jiyana xwe de (Seydayê Mehmûd ê Sebrî, Seydayê Tîrêj, Seydayê Bêbuhar, Ibrahîm Ebdî, Ibrahîm Xelîl, Cemîl Darî, Mihemed Nûr Huseynî..).

- Di komên folklorê Kurdî de, di cejnên Newrozê de, beşdarî kiriye ( Koma Helebce û Koma Medyayê).

-Hunermendên ku helbestên wî awaz kirine û stirandine ev in: Masûm Şikakî, Raman Osman û Ferhan bavê Midiya.

- Endamê Komîteya Mihrecana Helbesta Kurdî li Sûriyê ye.

- Ji destpêka damezirandina rojnameya (Bûyer) ve, bo heyama sê salan, wek nûçegihan kar kiriye.

-Endamê Desteya Rêveber a Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyê ye

- Yek ji damezirînerên Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê ye 2013.

-Yek ji damezirînerên Komela Şemal ya Xêrxwaziyê ye 2012.



## Miş'el Temo (1957-2011)


Siyasetmedar û nivîskarekî Kurd e. Di sala 1957an de, li gundekî piçûk ji herêma Dirbêsiyê (Rojavayê Kurdistanê) hatiye dinyayê. Wî di sala 1980yê de, li Zanîngeha Helebê xwendina Endezyariya Çandiniyê biserî kiriye. Di destpêka jiyana xwe ya siyasî de, ji sala 1972yan û vir ve, tevî çalakiyên tevgera Kurdî bûye, û heta sala 2000î di Partiya Hevgirtina Gel de kar kiriye. Di sala 1999an de, li bajarê Qamişlo, bi çalakvanên din re, du kombûnên çandî, bi navên "Komîteyên Vejîna Civaka Sivîl li Sûriyê" û "Navenda Celadet Bedirxan a Rewşenbîrî li Qamişlo", di 10ê berfanbara 2000î de, ava kiriye. Di sala 2005an de, Partiya Şepêla Pêşeroj a Kurdî damezirand.

Desthilatdaran ew di 15ê tebaxa 2008ê de girt, û di 11ê Gulana 2009an de, bi sûcên "bidestvehîna sehma dewletê", "qelskirina hestên neteweyî" û "lawazkirina derûniya gel", sê sal sizayê girtîgehê lê hat birîn. Piştî derketina wî ji girtîgehê bi çar mehan, di 7ê cotmeha 2011an de, li Sûrî, li bajarê Qamişlo, bi xiniztî û bêbextî hate kuştin.

Pakrewanê azadiyê Mişel Temo, ligel karê siyasî, çîrok û helbest bi Kurdî û Erebi nivîsandine. Xêzandar e û 6 zarokên wî hene (4 kur û 2 keç).

### Ji berhemên wî:

- Gotina dawî, 2001 (bi Erebi)
- Bawerî û nêrîn, 2002 (bi Erebi)
- Rûpelên welatekî bêwelat, 2002 (bi Kurdî)
- Gopalê sor, çîrok, 2003 (bi Kurdî)



## Mistefa Tewfîq Mihemed "Bawerê Kurmanc"

Navê wî Mistefa ye, kurê Tewfîq e, Tewfîq kurê Mihemed e, Mihemed kurê Heso ye, Heso kurê Melek e, Melek kurê Şemo ye, Şemo kurê Gird Elî ye. Wekû dê û bavê wî ji wî re digotin, ew di navbera salên 1961 – 1964 de, li gundê Miftî, yê ku dikeve Bakurê Rojhilatî bajarê Hisiçayê, û niha ew bûye taxek ji taxên bajêr, jidayik bûye, (lê, di nasnameya wî de roja pêncşemê 03.03.1966ê li Qamişlo, di belgeyan de, hatiye tomarkirin). Ew ji sala 1971ê ve hatine bajarê Qamişlo, tara Elî Fero (Tara Rojava). Heya sala 1978an, malbata wî li Kurdistana Başûrê Rojava (Kurdistana Sûriyê) bê nasname bûn, ango, ew "Mektûm" bûn.

Wî xwendina xwe ya serateyî, navîn û amadeyî beşê zanistî li dibistanên Hisiça û Qamişlo xwendiyê. Li Elmaniya, wî li peymangehên taybet serpereştiya civakî û perwerdeyî xwendiyê. Ji 22. 04. 1994 ve, ew li dewleta Elmaniya Federal dijî. Ji berî rojbûna wî û heya roja îro, timî pirtûkên rêzanî û rewşenbîrî bi zimanê Kurdî û erebî û tirkî, tevî qedexekirina wan jî, li mala wan hebûn, bi taybet dîwanên seydayê Cegerxwîn. Ew jî ji ber ku ew bi malbatî hemû endamên Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurd li Sûriyê bûn, û têkiliyên wan bi civaka Kurdî re pir fireh bûn. Ew dawiya salên şêstan û destpêka salên heftêyan ji sedsala bîsta, li ber dengê dapîr, dayîk û bavê xwe Tewfîqê Hesoyê Melek (Hebîsî), û mamoste Ebdilrezaqê Cengo, yên ku bi zimanekî şîrîn helbestên Cegerxwîn dixwendin û bi stranî jî digotin, ew fêrî zimanê Kurdî bû. Herweha, li ber dengê Sebrîyê Xelo Sîtî û li ber dengê êzgehên Kurdî û stranên hunermendên Kurd, fêrî zimanê Kurdî bûye. Ji sala

1975an ve, wî tembûr dijenand û helbestên stranî, û carinan jî kurteçîrok û serpêhatî dinivîsandin. Heya niha, wî heft pirtûkên cûrbicûr nivîsandine; lê, hîn ew çap nebûne. Ew jî ev in:

1- Ji çîrokên pir kurt û dirêj (du beş in), her yek 133 kurteçîrok in. Ya sisêya jî heye, lê, hîn ew temam nebûye.

2- Nerîn û helwest. (pirên wan gotarên rêzanî ne). Ya dudiwan jî heye, lê, hîn temam nebûye.

3- Hinek ji çîrok û destanên malbata Restemê Zalê zêrîn. (Ev ji çîrokbêjan veguhestiyê û bihîstiyê û nivîsiyê).

4- Rastî, mabûn û hebûn ( du beş in, afirandine).

5- Ji serpêhatiyên bê sînor. (13 serpêhatî ne)

6- Helbestên stranî û nûjen. (afirandine).

Ew bi zimanê Kurdî, Erebî, Ingilîzî, Elmanî û Tirkî dizane; lê, tenê bi zimanê Kurdî dinivîse. Carinan jî bi zimanê Erebî dinivîse.

Ew li gelek amûrên mûzîkê dide, ji wan: Tembûr, Biziq û ûd...

Di sala 1994an de, kasêtek bi tembûr û dengê xwe, bi alîkariya hunermend Se'îd Gabarî li mala wî tomar kiriye.

Navê wî yê hunerî û nivîsandinê li ser rûpelên internêtê "Bawerê Omerî" ye. Di pirtûkên wî de, wê bi navê "Bawerê Kurmanc" be.



## Mizgîn Hesko

- Di 20ê Sermaweza (Mijdar) 1973yan de, li gundê Şelhûmiyê – Tirbespiyê - ku girêdayî Qamişlo ye, jidayik bûye.
  - Qonaxa dibistana seretayî, navendî û amadayî (lîse) li Tirbespiyê xwendiyê.
  - Bi Erebî dest bi nivîsandinê kiriye, lê ji ber heza zimanê dayikê, ew zû dest ji Erebî berdide.
  - Yekemîn helbesta wê ya bi Kurdî di kovara Gelawêj de, sala 1988an, hatiye belavkirin.
- Pirr ji helbest, nivîs û gotarê wê di piraniya malper, rojname û kovarên Kurdî de hatine weşandin.
- Ji sala 1996an de, ew li Elmaniyayê dimîne.
  - Li Elmaniya Floristik (Florîstîk) xwendiyê, û di sala 2004an de Diplom wergirtî ye.
  - Ji Gulana 2015an de, ew ji endamên desteya birêveber ( beşa Kurdî ) ya Kovara Pênûsa Nû ye.
  - Ji endamên Yekîtiya giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê ye.

### **Çar caran ew hatiye xelatkirin.**

1. Xelata rêzgirtinê ya Seydayê Cigerxwîn/ Hannover 2012/ Ji aliyê Partiya Demuqrata Kurd Pêşverû.
2. Xelata Mihrecana Helbesta Kurdî li derveyê welat / Essen 2013/ Ji aliyê Hevbenda Nivîskar û Rojnamavanên Kurd.

3. Xelata Rûdoz
  4. Xelata Seydayê Tîrêj ya yekem sala 2022/ Ji aliyê Yekîtiya Nivîskar û Rojnamavanên Kurd li Sûriyê.
- Hêjayî gotinê ye ku yekemîn Helbesta Mizgîn Hesko bi Elmanî di Novembara 2020-an de, û ji layê pirtûxaneyê Frankfurtê ya nîvdewletî hat hilbijartin weku yekek ji baştirîn Lîrkên nûjen.

### **Ji berhemên wê yê çapkirî:**

- 1- Tîpên evînê, Avdara 2007 ( helbest ).
- 2- Asoyekî tijî Endeko, Tîrmeha 2008 ( helbest ).
- 3- Di nav henasên kovanan de, Avdar 2010 ( helbest ).
- 4- Li ber pala welatekî birîndar diherikîm, Avdara 2012 ( helbest ).
- 5- Ristek Lal e, Rezbera ( Êlûn ) 2013 ( helbestên dema seretayî ).
- 6- Ber bi werzên hezkirinê ve, Sermaweza ( Mijdara) 2015 ( helbest ).
- 7- Rêgehên keskîn, Gulana 2019 (helbest).
- 8 - Ji Bexçika jiyane, Sermaweza (Mijdara) 2020 (Rojnivîs, hin nerîn û dîtîn û çîrokên rastteqîn).
- 9- Nexşeya rewanê bêdengiyê, Avdara 2021( helbest ).
- 10- Surperiya zîvê sihirdar - Avdar 2022 ( helbest)

### **Ji berhemên neçapkirî**

1. Ji Ferhenga Lêgeriyanê- Rojnivîs, hin nerîn û dîtînên taybet -/ Nêzîk dê bête çapkirin/.
2. Sebeta Şekir / helbestên zarokan.
3. Hirçê qeşayê ber bi kû ve / Werger ji Elmanî, çîrok ji bo zarokan/.
4. Refek ji helbestên nuh.
5. Salamanderê Reşik / projeya Romanê/.
6. Hemû gotarên min/ Berhevkirina gotarên Mizgîn Hesko di yek berhemê de/.



## Mohamed Jumaa


Di sala 1953yan de, li gundê Hasda jêrî, ku sînordarê zeviyên Amûdê ye, hatiye dinyayê. Xwendina seretayî li gund, û ya navendî û amadeyî li Qamişlo qedandiye. Ji Zanîngeha Helebê beşê wêje û zimanê Ingilîzî bi serî kiriye. Wek mamoste û wergêr di vî beşî de, li destegêhên hikumeta Sûrî kar kiriye. Wek niviskar û helbestvan du dîwanên wî ji helbestên klasîk hene, ew jî ev in:

-Dîrok û siberoja me, 2019, çapxana Asiya.

-Niştiman, 2019, çapxana Asiya.

-Serxwebûn, li ber çapê ye.

Herweha, wî Jon pirtûk wergerandine ji zimanê Ingilîzî bo zimanê Kurdî, pirtûka çîroka bi navê: (Windows kevrê hedge û Jon çîrokê efsanewî), û pirtûkek ji Ingilîzî bo Erebî bi navê: (ابناء الميديين الكورد والفرس), pirtûka çîroka bi navê: Sindoqa kevrê heste û hin çîrokên efsanewî ne.



## Muhemed Ehmed Reşîd

Navê wî Muhemed Ehmed Reşîd e, bi navê bavê Sobar tê naskirin. Li gundê Sêgira yê girêdayî bajarê Dêrikê yekem car ji dêbavine cotkar re bayê cîhanê hilmijiye, li gundê xwe zaroktî û ciwaniya xwe qedandiye û ta niha jî li gund dimîne, li gundê xwe qonaxa seretayî qedandiye û paşê jî qonaxa navendî û paşnavendî li Dêrikê û sala 1986an ji peymangeha pîşesazî li Heskê derçû ye.

Muhemed Reşîd ji piçûkaniya xwe ve ji zimanê kurdî hez kiriye, û ji evîniya kurdîniyê vexwariye û ji ber vê jî tu caran xwe ji çalakiyên ziman û kurdperweriyê nedaye paş. Ji ber van sedemên navbûrî jî gelek caran ji hêla hêzên ewlekarî yê rijîmê ve hatiye seknandin û êşkencekirin herweha ew jî weke gelek malbatan nasnameya welatîbûnê ji wan hatiye vekişandin û ev tişt jî bûye sedema dûrbûna wî ji karmendiya dewletê û neçar bûye bi destê xwe kar bike.


Yek ji kesên yekem bû, yê ku bingeha saziya fêrkirina zimanê kurdî li herêma GirkêLegê danî û ji endamên sereke yê nivîskarên Rojnameya Herekol bû. Gelek gotar û lêkolînên wî yê kevneşopî û dîrokî hatine weşandin.

### **Berhemên wî yê çapkîrî ev in:**

1-Kevneşopiya Botan û reseniya ziman, lêkolîn,

2-Ferhenga SOBARO (Kurdî-Erebî), çapa yekem, 2023, çapxaneya Perwa-Girkê Legê.





## Muhemed Salih Cuma

Dr. Muhemed Salih Cuma, di 28 Gulana sala 1937an de, li gundê Kêstek, li Herêma Cizîrê, li Kurdistana Sûrî, ji malbata Başokî Yezîdîyî Musulman ve, hatiye dunyayê; jiber ku fermana Bav û Kalên wî li ser destên Selteneta Osmanî, di sedsala nozdehan de, li Şingalê hate birakirin, û bi darê zorê, gumgume bi destên wan ve dane bihilgirtin.

Wî xwendina xwe li dibistanên bajarê Qamişlo û Şamê, ji sala 1946 tanî sala 1959, di nava dibistanên Suryanî de, bidawî kiriye.

Di pêşî de, di Payîza sala 1959 de, wî li zanistgeha bajarê Şamê, dest bi xwendina beşê Felsefê kiriye.

Pişt re, di Buhara sala 1960î de, li Elmanya Fêderalî li bajarê Monîxê, di zanistgeha wê de di beşê zanistiyên dewletê de tanî sala 1964 xwendiyê.

Di Payîza sala 1964 de, bi saya Partîya Demokratî Kurdistan, xwendin li Elmanya Demokratî bi destên wî û neh Hevalên din yên Partî ve, hate bikevtin. Wî li Berlina Rojhilat, di Kolêca Abûrî de, şaxê Abûriya Siyasî xwendiyê.

Di Tîrmeha sala 1967 de, wî Diplom di zanistiya mêjûwa abûriya siyasî de wergirtiye, û herweha jî, tê de di Reşmeha sala 1972 de, wî nama Doktora di zanistiya mêjûwa abûriya siyasî de wergirtiye.

Ji sala 1975 de, wî di warê wergerandinê de kar kiriye.

Ji sala 1975 tanî sala 1992, wî li zanistgeha Hombold, li bajarê Berlin, di berê mêjûwa abûriya siyasî de bi giştî, û di mêjûwa abûriya siyasiya Dewletên Paşkevî de, bi taybetî, kar kiriye.

Ji sala 1953 ve, wî xwe bi zimanê me yî Şêrîn û perest ve mijûl kiriye; herweha jî, mêjûwa me tevaya bala wî bi ser xwe ve kişandiyê. Bi xewna zarotiya wî ve der dikevt ku, ew di warê zimên û mêjûwa me de, kar bike û wan bide bipêşvexistin, da ku milletê Kurd ji sedsalên navînî û bendîtiyê bête rizgarkirin, û bi serxwebûnê di nava Kurdistanê de, bête bitackirin. Ji ber vê jî, ew ji bona xwendekariyê ber bi Ewropa ve çûye.

Cîhanbîniya wî di têgihiştina diyalêktîka jînê de, li ser felsefa Zerdestî, Aristo, Xanî, Hegel û Marx, têtê bibingehkirin, û pêkanîna dewleteke neteweyî ye Serbixwe di nava Kurdistanê de, li ser rêbaza Barzanî û felsefa Xanî têtê bicîwarkirin.

Ji sala 1953 ve û ta niha jî, ew bi endamê Partî ve têtê biderkevtin, û her û her ew weke kesekî jêhatî di nava rêzên wê de, mîna endamekî kar dike.

Ji sala 1960 tanî 1987, wî di nava rêzên Komela Xwendevanên Kurd li Ewrop de, bi jehatîbûn kar dikir; û di 22 Reşmeha sala 1960î de, li bajarê Planing, li nêzîkî Monixê, li Elmanya Fêderal, wî beşdarî di Civîna Pêkanîna Rêxistina Partî Demokratî Kurdistan li Ewropa de dikir. Ji wê rojê ve tanî neha, ew di nava rêzên wê partiyê de kar dike.

Di nava salên 1979 tanî sala 1993 de, bi Endamê Komiteya Nawendî û Endamê Mekteba Siyasî dihate biderkevtin.

Ji sala 1996 ve, ew bi Nîşana Barzanî hate xelatkirin, herweha jî bi Rawêjkarê Siyasî ji bona Mesûd Barzanî hate destnîşankirin.

Ji sala 1964 ve, wî jinek Elmanî anî, û lawekî wî bi navê Ciwan têtê dîtin, yê ku ew bi yekekî ji Zanistvanên Gencên Elmanî ve, di zanistiya Elektironik de têtê biderkevtin.

Wî di jiyana xwe de, ji xwe re bi zimanê Erebi, Ingilîzî, Suryanî, Farisî, Rusî û Elmanî xwendiyê; belam wî Suryanî û Rusî jibîr kirine.

## **Berhemên wî:**

-Barzanî û Tevgera Azadîya Kurd 1931 – 1958. Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Barzanî û Tevgera Azadîya Kurd 1958 – 1961 Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Kurtîya Mêjûwa Kurd û Kurdistanê ji Despêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê Mohamed Emîn Zekî Beg, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Mêjûwa Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd Di Pêla Musulmantîyê De

- Bergê Duwem ji Kurtîya Mêjûwa Kurd û Kurdistanê Mohamed Emîn Zekî Beg, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Pirsiyarîya Kurd Mêjûwa Kurdan û Niha Wan (Civata Xweyîbûnî Kurdîyê Welatperwer), Dr. Bilêc Şêrkoh, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Kurd Rûnkirin û Dîtin Kurd Nevîyên Mîdîyan V. F. Mînoriskî, Hewlêr, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Kurdistan Turkî di Navbera Herdu Cengan de Profisor A. Hasretyan, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Der Sitratîcîya Siyasîyê û sipahîya Tevgera Welatîyê Kurd -Temaşekirinek ji bona Mêj û Niha, herweha jî yekeke din ji bona Ayinde jî, Dr. Ismet Şerîf Wanlî, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şêweyê wê, Pêşkevîna wêna, Rûnkirinê li ser Mêjûwa Kurdistanê û Dîroknivîsandina Rojhilatî, Dr. Ismet Şerîf Wanlî Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Tevgera Kurd di serdema nuh û niha de, Akadimîya Zanistîya Yekitîya Sovyêtê, û Akadimîya Zanistîya Erminiya Sovyêtê, di sala 1987 de, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-“Mîr” Nikolo Mikavili, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

-“Peymana Civakî” Jean Jacques Rousseau, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Pêşkevtina Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê, Friedrich Engels, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merov, Friedrich Engels, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-“Manîfêsta Patîya Komonist” Marx, Engels, Di Weşanên Ronahî de Elmanya, û di Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan, sala 1999 de.

-Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de Lenin Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Sê kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê, Lenîn, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Zîmeta Zimanî di nava Heremên Kurdî de, R. L. Tissabolov, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de.

-Li ser rêya Azadiya Kurdistanê de, Çendbîr û bawerî li ser hin rûdanên siyasîyî de, ji sala 1956 – 1975 de, Dr. M. S. Cuma, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

-Li ser Tirba Şero de, Dr. M.S. Cuma, Berlin, di sala 1966 de.

-Sî sal li ser Mêjûwa Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de, Dr. M. S. Cuma, Berlin, di gelawêja sala 1986 de

-Şerefname, Şeref Xanê Bedlîsî, Dihok, sala 2006, Wêşanxaneyê Spîrêz, Çapxana Wezaretê Perwerdeyê, Hewlêr, di sala 2006

-Evsane, Thomas More, Çapxana Xanî – Duhok Wêşanxaneyê Spîrêz, sala 2008

-Qanûnên Hemorabî, sala 2012.

-HEGEL- Peyvdariyên li ser Mêjûwa Felsefê de, sala 2017 Bergê I, Çapxana Hîvî- Hewlêr.



## Muhamed Zeyno

Di 08. 02. 1963yan de, li gundê Kaxrê, herêma Çiyayê Kurmênc - Efrînê jidayk bûye. Xwendina seretayî li gundê Kaxrê, û ya lîseyê li bajarê Efrînê sala 1982 qedandiye.

Ji sala 1982-1983yan ve, bûye mamoste li dibistana gundê Kaxrê.


Havîna sala 1983yan çûye welatê Sovyeta berê. Ji 1983-1984 ve, zimanê Rusî li bajarê Mînskê qedand. 1984-1989, li zanîngeha bajarê Kiyev diploma Beşê Felsefê wergirt. 1989-1993, li akademiya zanistê li bajarê Moskovayê tîtila Doktorê felsefa civakî wergirt. Ji sala 1996 ve, li welatê Almanya , li bajarê Dortmund dijî .

Yek ji damezirînerên kovara PÊNÛSê bû. Di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de berhemên xwe bi zimanê Kurdî û Erebî belav kirin e, mîna: Pênûs, Pirs, Newroz, Hevgirtin û Kurdistan.

Dr. Muhamed Zeyno endamê komîta Xelata Osman Sebrî ya dostaniya gelan e. Endamê komîta xelata Cemîl Horo û Bavê Selah ya hunerî ye.

Dr. Muhamed Zeyno giranî daye rewş, hebûn û paşeroja gelê Kurd li Ewropa. Wî sê berhemên civakî nivîsandine. العائلة الكردية في المهجر. 2009 . السوربون هجرة أم تهجير ٢٠١٧ الاندماج ٢٠١٩ bo zimanê Almanî.

Dr. Muhamed Zeyno zewicî ye û keçek û lawekî wî hene.



## Mûsa Dilbirîn

Dr. Mûsa Dilbirîn navê wî Mûsa yê Salihê Dawid e. Di sala 1965an de, li gundê Xirbê Golê, ku dikeve başûr û roavayê Qamişlo li dora 30 km, li Roavayê Kurdistanê, jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gundê tamam kir, lê xwendina xwe ji pola 7 ta 12 li Qamişlo Temam kir. Tim di dibistanê de, di xwendina xwe de, li pêş hevalên xwe bû. Di sala 1983yan de, bekalorya zanestî bi pileyên bilind bi dest xist, û yekser dikarîbû derbasî Zangoya Helebê - Fakulteya bijîjkî bibe. Li wê de, li Helebê Xwendina xwe ya bijîjkiyê tamam kir, û bû pisporê nexweşiyên mindalan. Li wê de, li Helebê, di gel xwendina xwe, dest bi nivîsandina helbesta Kurdî kir.

Di sala 1984an de, tev ku zimanê Kurdî qedexê bû jî, di wê demê de qelenê wê Hebis û zindan bû, lê bi mêranî wî dest pêkir, û hingê wî çend şevbuhêrkên helbestî di nav girûpên xwendevanên Kurd de, li taxa Eşrefiyê, li Helebê pêk anîn. Di heman demê de, wî û çend kesan ji Efrînê Komelek ava kirin ji bo pêşxistina wêje û toreya Kurdî, û civînên xwe bi rêk û pêk, her hefteyekê carekê lidar dixistin; lê wê komele, dirêj nekir - du sala temen kir û pişt re hate rawestandî.

Piştî ku kirîza sûriyê dest pê kir, wî jî wek piraniya xelkê, dest ji kilînkê xwe ya taybet li Qamişlo berda û berê xwe da Kurdistanê Başûr, li bajarê Derbendîxan ku dikeve Rojhilatê Helebça niştecî bû. Li wê de, wek dektor Pisporê mindalan li nexweşxana giştî sê salan kar kir. Di nav wan sê Salan de,

Dîwanek ji helbestan pêk anî, navê wê kir “Derbendîxan”, lê heta niha ew dîwan destnivîs e. Di heman demê de, du pirtûkên xwe li çapxana Kurdistan li Sulêmaniyê çap kirin, yek bi navê çîroka “Siwar û muxtar”, û ya din dîwanek bi navê “Evîn”.

Di sala 2016 de, di rêya kongireke bijîjkî re, rê girt û berê xwe da Elmanya, û mafê Niştecibûnê li wir wergirt. Du salan li wir jîyan kir ; Sal û nêvek di nexweşxanê de karkir, lê dît çîqa Elmaniya şêrîn be jî, welat jê şêrîntir e, dara ghişîtî tu wê ji xaka wê rake pir zor e di xakek din de bijî. Lewra, karûbarê vegeerê kir û berê xwe da welêt û Elmanya li paş xwe hişt.

Di sala 2014an de, tevî Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriyê bû. Di kongirê Sêyem de, di komîta rêveber de, hat helbijartin, û heta niha ew endamê Yekîtiya nivîskarê Kurd - Sûriyê ye.

**pirtûkên wî yên çapkirî ev in:**

- Çîroka “Siwar û Muxtar”, çapxana Kurdistan li sulêmaniyê, 2015.
- “Evîn” dîwan e, çapxana Kurdistan li sulêmaniyê, 2015.
- “Newroz” dîwan e, çapxana pêla Qamişlo.
- “Derbendîxan” dîwan e, Qamişlo, 2023.



## Mûsa Zaxuranî

Mûsa Osman Xelef, û naskiriye bi Mûsa Zaxuranî, di sala 1955an de, hatiye jiyane, li gundê Letîfiyê, li ser sînore Tirkîyê û Sûriyê, Rojhilatî Qamişlo bi 8 k.m. Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe xwend, û her şeş salên din li dibistanên Qamişlo xwendin. Di sala 1973yan de, bawernameya bekeloriya wergirt. Li çend cihên din gelek korsên xwendinê birine, nemaze li ser markisîzmê, tevgera karkerên cîhanê û aboriya siyasî ... hd. Her di wan korsan de, di nav yekemînan de bû.

Ji sala 1969an ve, helbest bi Kurdî û Erebî hûnandine.

Di gelek rojname û kovarên Kurdî de nivîsiye, û helbestên wî di van kovaran de hatine bilavkirin: ( Metîn – Sitêr – Gelawêj – Gurzek gul – Zanîn – Peyman – Rojhilat – Peyv – Xebat – Teaxî – Roj ... hd ).

Di hemî festîvalên helbestê de beşdarî dibû, û di hemî bîranînên xebatkarên Kurd, û şîn û şahiyên gelê Kurd de amade dibû.

Endamê komîta mehrecana helbesta Kurdî li Sûriyê ya sala 2007an de, yek ji damezinerê koçka Qamişlo ya çanda Kurdî ye.

Hemî cûrên helbestê û li ser pir babetan helbest hûnandine, û gelek êş û girtin û lêdan di ber kêşa Kurdî de dîtiye.



Herwiha, di sala 2011an de, ji ber ku beşdarî di hemû xwepêşandanên li dijî rêjîma sûrî dibû, dema ku ji herêma Kurdistanê vedigeriya li qapiyê Qamişlo û Nisêbînê dihate girtin. Li gelek zindanan gerandin ta li zindana (El Feyha) qefandin. Her di wê demê de, gelek zor, lêxistin û êşandin û işkencekirin dîtîye, û her di hemû navend û senterên polîs, ewlekarî û asayîşan de, lêdan ji rêjîmê xwariye û zor lê hatiye kirin, ji Qamişlo ta zindana (Filestîn).

Herwisa, ji bo mafê gelê Kurd û Kurdistanê, di gelek şandan de pişikdar bû, û her li pêş bû, û diwemîn lîsteya ku li ser rewşa pirsgirêka Kurd li Sûriyê radestî serok wezîrê hikumeta Sûriyê yê wê demê (Ebdulre'ûf El-Kesim ) kiriye.

#### **Berhemên wî yê çapkirî ev in :**

1 – Govendek Helbest. Helbest, 2009.

2 – Bûka Helbestan. Helbest, 2022.

3 – Landika Helbestan. Helbest. 2023.

#### **Xelat û bawernameyên ku wergirtine ev in :**

1- Xelata helbestvan mela Nûrî yê Hesarî ji Y.N.R.K.S


2 - Xelata helbestvan Emerê Lalê ji malbata wî.

3 - xelata sipasnameyê ji rêxirawa Canî Roj.

4 - Xelata rêzlêgirtinê ji şaxê Duhokê yê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyayê, sala 2022 Z .

5 - Xelat sipasdariyê ji rêxirawa ( NRC ) ya Emrîkî.

6 - Xelata sendîka hunermendên Kurdistan - Rojava.



## Mustefa Emîr (1949-2014)

Di sala 1949an de, li gundê "Xaziyan" ê girêdayî herêma "Efrînê", ya girêdayî parêzgeha Helebê, hatiye dinyayê.

- Ew di malbateke debarxweş de mezin bû, wek malbatên din karê çandiniyê dikir, û ji ber ku li gundê wî dibistana seretayî tune bû, ew û hevalên xwe neçar man ku ji heşt kîlometran zêdetir bimeşin ta bigihin dibistanê, li gundê "Sariya" li navçeya "Me'ebatlê" ya ser bi gundê wî ve.

- Xwendina xwe ya navîn û amadeyî li bajarê "Efrînê" ya girêdayî parêzgeha Helebê û "Harim" li parêzgeha Idlibê qedandiyê.

-Piştî qedandina lîseyê, di sala 1973yan de, diçe Awusturya û li wir bicih dibe; li zanîngeha Viyanayê beşa bijîşkî dixwîne, paşê diçe heman zanîngehê ji bo xwendina xaknîgariyê. Lê vê yekê jî nehiştiye ku ew bigihîje xewna xwe ya wêjeyî, û bigihîje xebatên girîng ên wêjeyî, berhemên zimanî yên wek gelek ferhengên zimanan bi zimanên Kurdî, Erebî û Almanî bi hezaran peyvên ji van zimanên navborî pêk anîne, da ku li pirtûkxaneyên zimannasî û zanistî, yên li ser dîmenên Ewropî bîn zêdekirin, da ku rojavayî û rojhilatî bi hev re wan bixwînin.

Ji ber nirxa zanistî û wêjeyî ya berhemên wî, Zanîngeha Viyanayê ew çap kir, derxist û belav kir; û bi vî awayî ew di warê çandî û rewşenbîrî de li qada Ewropî hate naskirin û di warê çandî de girîng bû.

Wî piraniya jiyana xwe ji bo xizmeta çand û wêjeyê bi nivîsandina gelek ferhengên zimannasî, û xebata xwe ya dirêj di warê wergerê de, terxan kir.

Ew ji ber gelek xebatên xwe yên di vî warî de, du caran ji bo xelata Nobelê ya wêjeyê hate berbîjêrkirin.

- Lêkolîner "Mustefa Emîr" bi navê "Emîr Xan" bû, û ew yek ji kesayetiyan navdar e di warê ziman û çanda parêzgeha Helebê de; di vî warî de, roleke wî berçav hebû. Taybetmendiyan girîng ên ezmûna wî ya rewşenbîrî, kûrkirina lêkolînan wî yên çandî, olî û dîrokî bûn.


- Li ser girîngtirîn destkeftiyên xwe yên wêjeyî û zimanî jî wiha dibêje: "Dr. Mustefa Emîr li ser nivîsandina ferhengeke almanî-Kurdî û ferhengeke Kurdî-almanî kar kiriye ku, di sala 1991ê de, çap kiriye. Ferhengeke Erebî-Kurdî nivîsiye, tê de 75000 peyv di sala 1997an de hatine çapkirin.

- Wî dîroka olan lêkolîn kir û tê de kûr bû, ji bo ku xebatên xwe yên di wergerandina Pirtûka Pîroz, Încîl, Peymana Nû de bi dawî bike, û di sala 2002 de çap kir.

- Dr. Mustefa Emîr di heyama xebata xwe ya wêjeyî û lêkolînî de, beşdarî gelek gengeşeyên bi dîroknasên Ewropî re, li ser mijarên dîrokî û di warê lêkolînan zimannasî û olan de bû, û ji ber rola xwe ya berçav di warê rewşenbîrî de, ji aliyê zanîngeha Viyenê ve, ji bo di sala 2005an de jî Xelata Nobelê ya Wêjeyê werbigire. Di sala 2006an de jî, cara duyemîn ji aliyê "Papa Paulus II" ve ji bo xelata Nobelê hatiye berbîjêrkirin.

- Berhemên wî gelek caran hatine çapkirin, û hemû pirtûkên "Mustafa Emîr", ji aliyê zanîngeha "Viyenê" ve, hatine belgekirin û çapkirin.

- Lêkolîner Dr. Mustefa Emîr, piştî têkoşîneke dijwar bi nexweşiyêke bêderman, li bajarê Stenbolê yê Tirkiyê, di 12/Kanûna pêşî/2014an de mir, û bi vî awayî me yek ji zanayan ziman, çand û wêjeyê winda kir.



## Mustefa Reşîd

Mustefa Reşîd, roja 19. 12. 1945an ji dayîka xwe bûye. Ew roj rojeka Çarşemê bû, dem jî dema êvarê bû. Di wê şevê da heyv hate girtin. Ji ber vê bûyerê jî, piştî 50 salî, roja bûyîna wî ya rastîn hate derxistin. Gundê ku ew lê bûye jê ra Kaxirê dibêjin. Ev gundê Kurdan li Çiyayê Xastiyan, li herêma Çiyayê Kurmênc, li Başûrê Rojavayê welatê me yî şêrîn e. Bavê wî pêşiyên xwe digihîne êla Dinan, û dayîka wî ji aliyê bavê da digihîne Xerziyan û ji aliyê dayîkê da digihîne Şikakan.

Dayîka wî, di destpêkê da, ew bi çanda Kurdan perwerde kir. Stranên landikê jê ra gotin, çîrok û efsane jê ra hewaldan, awaz û stranên gelêrî jê ra strandin. Berî ku ew biçe xwendegeha destpêkê, stranên mîna Dewrêşê Evdî, Memê Alan, Cebelî Mîrê Hekariyan, Salihê Naso, Xezala Mendalan, Xezala Reşîd Begê, Husênê Zilî, Siyamend û Xecê ... û hwd bi dehan stranên giran, û bi sedan stranên sivik, çîrok û efsaneyên Kurdan êdî bûbûn beşek ji jiyana wî. Siwarê xewnên wî Memê Alan, li ser piştê Bozê Rewan, li ser rêya Cizîrê bû. Çirûskên rêya wî ji bedewiya Zîna Zêdan, Binefşa Narîn û Keja Gulîsor bûn.

Tevî ku wî, li gor temenê xwe pir tişt dizanîn jî, lêbelê gava ew çû xwendegehê dît ku mamoste bi zimanekî din daxive û ew tê nagihe. „Hey hawar ev çi bû!“ wî ji xwe ra got ... lêbelê, çare tune bû. Dîsa jî wî çare li wê pirsgirêkê dît û di wê salê da, di nav hevalên xwe da, bû yê herî jîr. Wî xwendina xwe bi zimanê Erebi berdewam kir, paş va nema û di sala 1965an da, sala 12an bi standina bekeloriya (lîse) bi dawî kir.

Ji aliyê malbata wî da rêyek li pêşiya wî hatibû danîn. Ji ber ku birayê wî yê mezin bûbû doktor, diviyabû ev kurê din bibe muhendis. Bi wê armancê

ew roja 19. 04. 1966an li otobûsê siwar bû, sînorê Sûriyayê derbas kir û di Îskenderûnê ra, di Edenê ra, di Stenbolê ra hat ta ku gihîşt bajarê Bêlgrad, paytexta Yugoslaviya. Dema pêşî li wî gelek giran hat, û hin caran jî, ji ber awat û bîrêkirina welat, di koşka xwe da bi tenê li ber pencereyê rûdinişt, yan jî di nava nivînê da hêstir dibarandin. Lome û gazin ji xwe dikirin û digot: "Çima min ji ber gotinên xelkê bi ya xwe nekir û kêrsekek (axa hişk) ji axa welat nexist çenteyê xwe û bi xwe ra ne'anî, daku min di demên xemgîniya xwe da, serê xwe daniya ser wê axê. Qeder û çarenûsa mirov kes nizane, gava ez li van deran mirim jî, hema bila serê min li ser wê axê be."

Piştî mehekê ew bû endamê Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa, û ji wî ra bû destpêka jiyaneke dûr û dirêj di nav rêzên tevgera xwendekarên Kurdistanê da. Ew li Bêlgrad bêtirî çar salan ma û nema debara wî li wir bû. Bêyî ku ew xwendinê bi dawî bike, berê xwe da Almaniya û li bajarê Berlîna Rojava bicih bû. Li zanîngeha Berlîn xwendina înfomatîk (xwendina computer) bi dawî kir.

Di sala 1981ê da, bi keçekê Kurd ra zewicî û piştî çend salan du kurên wan çêbûn.

Di sala 1976an da, wî û hin hevalên xwe biryar girtin ku, ji niha û pê va, xwe bi zimanê Kurdî perwerde bikin, û her nivîsarên xwe bi zimanê dayîkê belav bikin. Lê belê, pêşî diviyabû kesek xwe pêş va bibe û di pey ra hevalên din perwerde bike. Ev karê han bû barê wî. Çi pirtûkên Kurdî yên wê demê hebûn, wî ji xwe ra peyda kirin. Ji nivîsarên Bedirxaniyan heya bi Qenatê Kurdo û Reşîd Kurd, wî tev xwendin. Derketina Hawarê (Çapa Ewropa) ji wî ra bû mizgîniyeka mezin. Bi rojan, bi şevan, hin caran heya ber destê sibehê, wî Hawar dixwend; Hawar bû încîla rewşenbîriya wî, Celadet jê ra bû mamostayê herî mezin. Ji sala 1977an heya 1979an, wî li komela karkeran kursên zimanê Kurdî pêşkêş kirin.

Wî di wan salan da, gelek demên jiyana xwe di nav rêzên tevgera xwendekarî da derbas kirin. Bi hevalên xwe ra, di gelek komîteyan da cih girt, gelek sêminar pêşkêş kirin, civîn û kongire pêkanîn, aksiyon organîze kirin, belavok û weşan nivîsandin û belav kirin. Wek nimûne: Di sala 1983yan da bû sekreterê giştî yê Yekîtiya Xwendekar û Lawên Kurdistan li Ewropa.

Wî ji sala 1979an heya 1985an li xwendegeha gelêrî ya bilind li bajarê Berlîn mamostetiya zimanê Kurdî kir. Gelek xort û keç di kursên wî da hînî

xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bûn. Lêbelê, yê ku ji tevan bêtir sûd girt û hînbû ew bi xwe bû. Beşdarên kursan ji her aliyên welat bûn, û wisa jî, wî zaravayê her herêmekê dibihîst.

Hîn ji dema Bêlgradê da, wî ji xwe ra stran çêdikirin; stranên wî pir li xweşiya hevalan dihatin. Wî ev şêwe li Berlîn jî berdewam kir; di pey ra li cihê stranan helbest hûnandin. Bi vî awayî, wî gotina meta xwe, ya dema zarotiyê anî cih. Gava ew hîn biçûk bû û li ba meta xwe li ber rezan bû, gotinên wî gelek balkêş bûn. Hîngê meta wî digot: Ev lawê birayê min şa'îr e.

Wî piraniya helbestên xwe di rojname û kovaran da bi navê Xamevan dinivîsandin. Ji bona wê, dîwana helbestên wî, ya bi navê "Serfirazî", di sala 1994an da, di bin navê Xamevan da hate belavkirin. Dîwana duwem bi navê "Evîn" hên nehatiye weşandin. Dîwaneka wî ya helbestan bi zimanê almanî jî heye, û ew jî nehatiye weşandin.

M. Reşîd ji sala 1966an heya sala 1990an bi navê Mustefa Alî dihat naskirin. Hîn li welat, paşnavê wî bi biryareka jorîn hatibû guhertin. Di sala 1990î da, wî paşnavê xwe sererast kir û mîna paşnavê birayên xwe yên din kir. Bi vî awayî, hûn dibînin ku Mustefa Reşîd, Mustefa Alî û Xamevan yek mirov in.


M. Reşîd bi hin hevalên din ra, di amadekirina pirtûkên xwendinê da, beşdarî kiriye, ku li ser wan jî navê Xamevan hatiye nivîsîn.

Di sala 1994an da, wî mala xwe ji Berlîn bar kir û hat bajarê Homburg, wilayeta Saarland, ya li ser sînorê Frensayê. Li înstîtûteka zanîngeha vî bajarî bûye karmendê zanîngehê. Lê dîsan jî, di ber karê xwe ra, dest ji xebata rewşenbîrî bernade. Ew li bajarê Saarbrücken kursên zimanê Kurdî dide, di MEDYA-TV da waneyên li ser folklorê Kurdî pêşkêş dike, û li zanîngeha Bonnê jî mamostetiya zimanê Kurdî kiriye. Wî di gelek rojname û kovaran da nivîsandiye û demekê serpereştiya kovara HIWA kiriye. Ji folklorê me Kurdan gelek tişt civandine, lêbelê heya niha tenê çîroka zarokan ya bi navê "Çîroka Bizê" hatiye çapkirin û hejmarek çîrokên zarokan ku wergerandine Almanî di sala 2003yan da, ji aliyê "Verlag für Kultur und Wissenschaft" va hatine weşandin.

Di vê dema dawî da, li ser daxwaza hevalê wî yê dibistanê Dr. Ehmed Xelîl, nivîsên wî yên dîrokî werdigerîne zimanê Kurdî û belav dike.

Mustefa Reşîd ji herêma Çiyayê Kurmênc (Efrîn) - rojavayê Kurdistanê ye. Ew bi lêkolînên zimanî, folklorî, dîrokî û wêjeyî xerîke. Hin pirtûkên wî yên girêdayî mijarên wêjeyî, zimanî û folklorî ku hatine weşandin ev in:

1. Dîwana helbestan bi navê Serfirazî, 1994.
2. Çîrokên gelêrî (ÇÎROKA BIZÊ), 2000.
3. Kurdische Märchen für Kinder (Hin çîrokên Kurdî ji bo zarokan), 2003.
4. Liebe auf den ersten Blick (dîwanek helbestan bi zimanê almanî), 2013.
5. Awirek li rêzimana Kurdî, 2021.



### **Mustefayê Hilêliyê (21/3/1923 -25/2/2012)**

Mele Mustefayê Mele Îsa, ku bi navê din yê navdar Mele Mustefayê Hilêliyê jî tê naskirin, li Başûrê-Rojavayê Kurdistanê Kurdperwerekî navdar bû. Mele Mustefa yê Mele Îsa di 21/3/1923yan de, li Heskîfê jidayik bûye. Lawê Mele Îsa ye. Bavê wî, Mele Îsa, hevalbend û têkildarê Şêx Se'îd bû. Ji ber vê jî piştî şoreşa Şêx Se'îd mehkûm bû. Ev jî bû sedema ku wek malbat ew ji Heskîfê bardikin diçin gundê Solanê, cem Şêx Fethullahê Hemdî. Şêx Hemdulah alîkariya Mele Îsa dike û wî vedişêre, nifûsek sexte Ji bajarê Qubînê bi navê Mihemed Îsa jê re dide çêkirin. Herweha Şêx, ji bona wî ji ber çavan dûr bixe, wî dişîne gundê Cinesker. Mele Îsa bû Meleyê gund û li gundê Cinesker heta mirina xwe feqiyan dida xwendin. Hêja Mele Mustefa çardeh (14) salî bû dema bavê wî Mele Îsa çû rehmetê, û tevî sê bira û xwişka xwe sêwî man. Ew tevî dêya xwe bardikin diçin gundê Depa Berava li ber Bismilê. "Mele Mustefa xwendina xwe weha diyar dike:

"Min li rex bavê xwe heta kitêba Se'edulah Gewre Pîre û kitêba Îlane El Talibîn xwendin. Û di saxiya bavê xwe de, li rex Seydayê Mele Ebdulrezaq Dinbilî, li gundê Girbawî, li wê derê jî min kitêba Helî tevde li rex wî xwendiyê. Ji Depa Beravan ez çûme gundê Kifirza jorîn li rex Seydayê Mele Îsmeîl Bikindî xwend, dûra ez çûme gundê Şorşib dinav Êla Sorgiçî li rex Seydayê min î Şêx Ehmedê Korî xwend. Dûre ez çûme Bilkê nav Êla Bamirdî li rex Seydayê Mele Elî Başrûtî xwend. Ji wê derê çûme Cizîra Botan li rex Seyid Elî



Findikî meh û nîv xwend. Dûvre mala me ji Depa Beravan hate Hesenkêfê. Ji wê derê di sala 1940 zayinî bi malîtî hatin gundê Girhesen ku li rex Nisêbînê ye. Li wî gundî du mehan em man. Ji wê derê ez çûm Xiznê li rex Seydayê Mele Ehmed Zivingî Miftiyê Qamişlî, ku ewê kitêba Eqid El Cewherî, şerha Dîwana Cizîrî çêkiriye? Min li cem wî xwend.” Ew pişt re li gundê Hilêliyê cîwar dibin. Heta mirina xwe li wir dimîne.

Li Şamê, di sala 1947an de, Dr. Nafiz, Qedrî beg Cemîl Paşa naskiriye û ketiye nav Komeleya Xoybûn.

“Şêx Ehmedê Xiznewî, Mele Mustefa û hevalê wî Mele Ehmed jibona xwendina Miftîbûniyê bixwînin şandine Şamê. Di dema vê şandinê de, Dr. Nafiz jî pê re nameyek ji bona xwedîlêderketinê ji Cemîl Qedrî Beg re şandiye. Qedrî beg nameyek daye Mele Mustefa û wî bi rêya Beyrûdê şandiye Bexdayê. “Ew nameyê dibe Bexdayê û ji wê derê bersîva nameyê tîne. Li vegeerê dibîne ew name ya Serok Barzanî ye.

Piştî salên 1960an, dema ku li Başûrê Kurdistanê Şoreşa Êlûnê dest pê dike, bi şoreşê re dikeve nav pêwendîyan.

Dema ku li Başûrê Kurdistanê Şoreşa Êlûnê dest pê kiribû, Partiya Demokrat a Kurdistanê Sûriyeyê hatibû avakirin, Ew jî hevalbendê partiyê bû. Wî bi riya kesane û bi riya partiyê ji Şoreşa Êlûnê re bi her awayî piştgirî û alîkarî dikir.

“Di sala 1965an de, pirsgirêk di nava PDK-S de derdikeve û partî dibe du beş. Kesên ku li dijî perçebûna partiyê ne Komîteya Lihevhatinê çêdikin.

Mele Mustefa endametiya xwe dide rawestandînan, û bi rêberî û pêşniyara Qedrî Beg, dikeve nav Komîteya Lihevanînê. Serokê Komîteyê Qedrî Beg bû. Mele Mustefa, di wê demê de bûye peywendîdarê navbera Qamişliyê û Şamê jî. Pişt re Mele Mustefa bûye têkildarê navbera vê Komîteyê.

“1967an de Mele Mustefa, tevî li dor sed (100) kesî ji aliyê rejîma Sûriyê ve hatin girtin. Hukumeta Sûriyê wan bi sizayê giran gunehbar dike.

Lê di sala 1970yê de, Hafiz Esed derbeyek leşkerî çêdike û tê ser hukum. Piştî vê derbeyê tevayiya girtiyên li Sûriyê tên efûkirin û berdan. Kurd bi vê efûkirinê ji kuştinê rizgar dibin û tên berdan.

“Di sala 1970yê de, û dibin çavdêriya Berzanî de, bi beşdarbûna herdû aliyên partiyê, Kongireya PDKS lidar dikeve. Mele Mustefa jî beşdarî vê Kongireyê dibe.

Dema ku di sala 1975an de Otonomiya Kurdistanê encama êrîşa dewleta kolonyalîst ya ba'asî û Iraqê hat hilweşandin, bi dehan pêşmergeên rasterast li mala xwe dike mêvan. Ji bona tevayî pêşmergeyên hatibûn Başûrê-Rojavayê Kurdistanê bi cî û war bibin, hewildanek xurt nîşan dide.

Di sala 1980yê de, dema li Bakurê Kurdistanê darbeya leşkerî çêbû û dîktatoriya leşkerî wek pergal ava bû, gelek welatparêzên Bakurê Kurdistanê derbasî Başûrê-Rojavayê Kurdistanê bûn. Herweha Mele Mustefa, yek ji wan kesan bû ku di pirsgerêkên civatî û malbatî yên herêma Cizîrê de, desteya çareseriyê pirsgerêkan bû.

Helbest bi herdû zimanan, zimanê Kurdî û zimanê Erebi, dinivisand. Dîwanek wî ji helbestan bi navê: "Gulzar a xemlandî bi sirûdên bê deng" li Istenbolê hatiye çapkirin, sala 2013. Gelek destnivîs û rêşpelik li şûn xwe hiştin.

Di 25/2/2012 de, li bajarê Qamişlo koça dawî kir û li goristana Hilêliyê hate veşartin.



## Narîn Omer Seyfudîn

Narîn li bajarê Dêrikê li Rojavayê Kurdistan jidayik bûye; ew keça Omerê Seyfudînê Meylanî ye, û dayika wê Hedya Melek e.

Xwendina seretayî, navendî û bidomahî di dibistanên Dêrikê de bi dawî kiriye, û pişt re ew tevî Zanîngeha "Dîmeşqê, paytexta Sûriyê, bûye. Di sala 1995an de, bawernameya bilind wergirtiye "Beşê wêjeya Erebî", bi dawî kiriye.

Wê karê mamotatiyê di hemî pêvajoyên fêrbûn û xwendinê de kiriye.

Di warê wêje, nivîsîn û doza jinê û zarokan de kar dike û ji piçûkaniya xwe ve dest bi avakirina Girûp, komele û yekîtiyên çandî û civakî kiriye.

Ew û hevjin û zarokên xwe, bi sedema şerê li welêt û çend sedemên din ên dijwar, li pêlên biyaniyê siwarbûne û niha ew li welatê Elmanya dijîn.

Sê zarokên wê hene û du nevî "Dastan, Sazîn, Şêrîn, Şanya, Aryam".

Hêjayî gotinê ye ku ew xwîşka helbestvan û zimanasê Kurd Adil Omer Seyfudîn e.

### **Berhemên wê yên çapkirî:**

1-Perîxana min" helbest, bi zimanê Kurdî ye, û bi weşanên saziya SemaKurd hatiye çapkirin

2- "Hinga bêdengî can dikêşe" Helbest bi zimanê Erebî ji weşanên çapxaneyê Dar El-Zeman, .

3-Romana "Çaxê derbideriya ber bi rojava " bi zimanê Erebî ji weşanên çapxaneyê "El-Xelîc", li welatê Urdinê.

4-Romana "Axoşkirina Pênûsê û demsalên giyan", ji çapxaneyê El-Sukeriye li welatê Misrê.

5-Pirtûka "Kenê Şanya" helbestên zarokan, bi zimanê Kurdî ji weşanên Yekîtiya nivîskarên Kurdistana Sûriya ye.

6-Romana "Henasên Jiyanê, Koçberiya bê henas" ji weşanên Çapxaneya SerSera li Berlînê - welatê Elmaniya, bi zimanê Kurdî û bi alîkariya Dr. Beşar Mistefa.

7-Romana "pistpistên bîrokê" bi zimanê Erebî ji weşanên Dar El-Kelîmat li welatê El-cezayir. Vê Romanê xelata yekemîn wergirtiye di pêşbaziya romana Erebî de, ji layê weşanxaneya "Dar El-Kelîmat".

8-Pirtûka "Tîrêjên vejînê" li ser hunermend û dengbêjên Kurd yên jin

9-Berhevoka "Çavên Dil" helbest, ji weşanên çapxaneya SerSera ye.

10- Pirtûka "Navdarên Kurd" bi hevkarîya nivîskar û dîroknas Behcet Ehmed.

Bêhtirîn 20 berhemên destnivîs jî hene: roman, helbest, çîrok, çendeser û fêrdanên ser jin, malbat û hêlên çandî û civakî, çîrok û helbestên zarokan.

#### **Xelat û bawernameyan ku wê wergirtine:**

1- Bawernameya helbestvan Seydayê Tîrêj

2-Xelata rêxistina jinê di partiya "partî dîmoqratî Kurdistanî- Sûriya.

3-Xelata rêxistina jinê di partiya "Yekîtiya dîmoqratî Kurdî sûriyê

4-Xelata helbestvan û zimanzan Mele Ehmedê Palo ji aliyê Yekîtiya nivîskar û rojnamevanên Kurd li Sûriyê.

5-Xelata rêxistina jinên Kurdistana sûriyê

6-Bawernameya tîpa muzîkê bi rêveberiya hunermend Ciwan Sebrî

7-Bawernameya baştirîn nivîser di sala 2009 ji malpera "diljan"

8-Xelata Seydayê Cegerxwîn ji rêxistina Heskê ya partiya Yekîtiya

9-Xelata vestîvala "mihrecana" helbesta Kurdî ya 19 de mîn li bajarê Qamişlo sala 2014

10-Navê wê di nav baştirîn nivîserên cîhanê de hatiye nîşankirin di sala 2009.

11-Xelata Seydayê Cegerxwîn ji aliyê komîteya çandî ya partiya Pêşvero ve di sala 2017

12-Bawernameya Dezgeha Aştî û Hevaltiyê, şaxê Elmaniya

13-Bawernameya Rêxistina 21ê Newrozê ya rahênan û fêrkinê li Herêma Kurdistanê.

14- Rêznameya civaka Kurdên sivil li Ewropa 2022.

### **Xelatên Erebi yên ku wê wergirtine:**

1-Xelata sêyemîn ya çîroka Erebi ji aliyê Dr. Xeldiya Al Xelîfe ve, li welatê Elbehrên.

2-Xelata yekemîn di hevpişk û pêşbaziya Romana Erebi li welatê Alcezayir ji layê weşanxaneyê "Dar El-Kelîmat" ve.

3-Xelata dîdargeha "Ibin El-Nîl" li ser çîroka "Çarêk"

4-Xelata çîrokê di pêşbaziya nivîskar Rûla Husênat ji layê malpera "El-Keyan El-Edebî".

5-Xelata El-Keyan El-Edebî li ser çîroka "Bîroka diya min dema diaxive".

### **Girûp û komele û yekîtiyên ku ew di wan de endama rêveber û damezinêr e:**

-Girûpa civakî ya keçan sala -1983

-Girûpa çandî û civakî ya keç û jinên Dêrikê.

-komela jinên Dêrikê.

-Girûpa Dêrikê ya çandî.

-Baxê jinên Dêrika Hemko

-Tevna çand û hunera Kurdî

-Girûpa mamosteyên zimanê Erebi

-Hevbenda nivîskarên Dêrikê

-Yekîtiya mamosteyên Dêrikê

-Komela jinên Kurd ya li Qamişlo hatibû damezrandin

-Andama komîta rêveber e di Yekîtiya" nivîskar û rojnamevanên Kurd li Sûriyê de ye.

-Endama Encûmena niştimaniya Kurdî li Sûriyê, Şaxê Dêrikê û ew yekemîn jin bû derbasî Encûmenê bibû

-Di sala 2012an de, gazî û bang li keç û jinên Kurdan dike ji bo avakirina "Hewgirtina jinên Kurd li sûriyê" û bi wan re hevgerîtinê ava dike û rêbaza hundirîn ji yekîtiyê re didane û dinivîse.

### **Ezmûna wê bi helbesta stranê re:**

Ji destpêka derbasbûna wê di warê nivîsîn û wêjeyê de, wê guh daye helbesta stranê; ji sala 1995 û heya niha stranbêj û hunermendên Kurd helbestên wê distirînin, ji wan:

Berbend Simê, Cemal Sedûn, Ronî Cizrawî, Azad Feqe, Kemal Ebdulkerîm, Ciwan Sebrî, Ridwan Cizîrî, Dilo Doxan, Hêvî Mirad, Bavê Dilbirîn, Heval Qamişlokî, Merwan Şero, Ferhan Silêman, Behzad Qemer, Şahîn Şan, Fewzî Elî, Mîlad Ehmed bavê Dilbirîn, kovan Medenî û çend kesên din

Hunermend "Dilo Doxan" du helbestên wê kirine stran û ew pir li nav gel û civakê belav bûne, strana:

Wî kenî û Dilî dilî, û van rojan helbesta li ser pakrewana Kurd "Jîna Emînî" jî sitraye.

### **Çalakiyên li welêt û derveyî welêt:**

Ew beşdarî pir çalakiyên çandî, wêjeyî, ramyarî, konevanî û civakî bûye li seranserê Rojavayê Kurdistanê û li Sûriyê, û pir simînar û fêrdan û şevbiwêrk amade kirine, çi bi navê girûp, komele û yekîtiyan, û çi bi tenha xwe û sê caran beşdarî festîval û dîdaran bûye li Başûrê Kurdistanê:

1-Kongerê Hevgirtina jinên Kurd li Sûriyê, 2012 û bi gotina wê kongir destpêkiriye

-Konfiransê Hevgirtinê li bajarokê Girkê Legê û li bajarê Qamişlo û bi gotina wê û ya hevgirtinê konfirans destpêkiriye.

3-Dîdargeha medyekarên Başûr û Rojava 2012 li Başûrê Kurdistan

4- Bîranîna koçkirina helbestvanê mezin Emerê Lalê, 2014 li Başûrê Kurdistan

5-Festîvala helbestê li Dihokê 2014

6- Bîranîna koçkirina helbestvanê hêja Ferhadê Içmo li Parîzê, paytexta Ferensayê 2017

7-Festîvala Seydayê Cegerxwîn di sala 2008 an de, lê wê nikarîbû amade bibe ji sedemên ewlehî.

8-Du festîvalên helbestê li Hewlêr û Silêmaniyê.

9- Li çend festîvalên helbesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê amade bûye.

Berhemên wê di gelek kovar, rojname, malper û dezgehên Kurdî û Erebi de hatine û têne weşandin û belavkirin; û heta îro jî karê wê yê wêjeyî û civakî berdewam e.



## Nayif Şêx Çolo

Di sala 1965an de, li gundê Hermê Hesên jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî û navendî û kutahî li dibistanên bajarê Qamişlo xwendiyê.

Hezkerê zimanê bavûkalan e, ji elfebêta Kurdî, ku wê demê bi dizî dihatin belavkirin, fêrî zimanê dayikê bûye. Piraniya dîwanên seydayê Cegerxwîn, û ji helbestvan û nivîskarên Kurd re jî xwendine. Ji xortaniya xwe de, ber bi nivîsandina helbestê de diçû, lêbelê ji ber sedemên xwendina dibistanê û hin sedemên din, di nivîsandina helbestê de baş dereng ma.

Di sala 1995an de, dest bi nivîsandina helbestê kiriye. Bi herdû zimanan, zimanê dayikê û zimanê Erebî, nivîsiye, pê re carcaran bi zimanê îngîlîzî jî.

Di çend kovar û rojnameyan de, helbestên xwe belavkirine, çî xwecihî, çî herêmî û çî navdewletî bin. Gelek caran hevpeyvîn, ji aliyê hin ragihandinên xwecihî, radyo, televîzyon, rojneme û malperên rewşenbîrî, pê re kirine.

Di sala 2020ê de, dikaribû du berhemên xwe yê bi zimanê Erebî, bi alîkariya hevalê xwe Ahmed Izet Simko çap bike, û ew çapxana Mîrav de, li bajarê Qamişlo hatine çapkirin. Navnîşanên wan: (أغزل سكوناً مقبرة العتمة).  
الليل ev herdû dîwan bi alîkariya mamostê zimanê Ferensî Nîdal Xelef hatine wergerandin bo zimanê Ferensî.

Bi dehan helbestên bi zimanê Kurdî nivîsandine, lêbelê mixabin hîn ronahî ne dîtine, ew jî li benda alîkariyê ne ku bî çapkirin. Hêjayî gotinê ye ku ew endamê Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevên Kurd li Sûriyê ye.



## Nêrgiz Ismay'îl

Li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo hatiye dinê. Xwendina xwe li dibistana Erebi hetanî refa nehê qedandiye. Ji temenekî biçûk ve, xwedî hestên nazik, germ û bi coş bû. Li beramberî jiyanê bi hûrgulî dimeyzand. Nêrgiz Ismay'îl ji temenê piçûkaniyê de, bi dapîr û bapîrên xwe bandor bûye; gava li şevbuhêrkên wan rûdinişt, wê xweş guhdarî li stranên dengbêjî û çîrokên wan dikir.

Di temenê piçûk de tevî komên çand û hunerê li bajarê Qamişlo dibe. Destpêkê koma zarokan a bi navê Kulîlkên Kurdistanê, û paşî tevî Koma Botan dibe. Di rojên taybet de, helbest di heman demê de, di gurûpa govendê de, cih digirt û pêşkêş dikir. Herweha şanogera ser dika çandê bû.


Di salên temenê xwe de, her xwestiye ku li ser cewhera jinê nivîsaran binivîse. Di qada wêjeyê de, jê re mijara herî sereke bûye. Herweha di qada ragihandinê de jî cih girtiye. Nêrgiz Ismay'îl yekemîn jina ku Koavara Asoya Jinê ya bi zimanê Kurdî xwedî kedek bû ku damezirandiye. Di sala 2015an de, berga yekemîn çap kiriye. Li kêleka wê Kovara Sewt Ul-Heyat, ya ku bi zimanê Erebi bû, mehane diweşand. Ne tenê ev, lêbelê hetanî di xebatên bihîstî de ku xwedî ezmûn e, û di damezirandina radiyoyên li ser asta Rojavayê Kurdistanê xebitiye, û bi taybet jî radiyoyên FM. Li kêleka xebatên xwe yên çapemenî, di gelek qadan de waneyên DENG Û DÛBLAJÊ daye û hîna jî dide. Gelek nifşên delal pêşxistine. Li kêleka van xebatan jî, ew xwedî berhemên dewlemend e ku hetanî niha jî mîna ava çemekî diherike û



nasekine. Bi hestên xwe yên nazenînî, hestiyarbûneke li beramberî xweza, civak, jin û jiyanê pir xurt e.

**Berhemên wê jî ev in:**

- 1 – Xelata Xewna Min – Helbest, 2003, Çapxaneya Ronahî/ Qendîl.
- 2 – Hisret – Helbest, 2004, Çapxaneya Azadî, Qendîl.
- 3 – Mêşîn – Helbest, 2008; Çapa yekemîn, Qendîl, Çapa duymîn  
Weşanxaneya Aram, Amedê 2020
- 4 – Stêrvana – Pexşan, weşanên Akademiya Ziman, Dîrok û Wêjeya Kurdî ya  
Celadet Bedirxan, 2015, Qamişlo, Çapxaneya Sîmav
- 5 – Guliyên Eşqê – Helbest, Weşanxaneya Şilêr, Qamişlo, 2019
- 6 – Rûpelên Jînê – Cilda – 1 /Çîrok/Qamişlo/ Weşanxaneya Şilêr 2018
- 7 - Rûpelên Jînê – Cilda – 2 /Çîrok/ Qamişlo/ Weşanxaneya Şilêr 2021
- 8 - Rûpelên Jînê – Cilda –3 /Çîrok/ Qamişlo/ Weşanxaneya Şilêr 2022
- 9 - Rûpelên Jînê – Cilda – 4 /Çîrok/ Qamişlo/ Weşanxaneya Şilêr 2022
- 10 – Gustîlka Pencereyê/ Çîrok/ Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2021
- 11 – Çirrik – Roman/ Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ Rojavayê Kurdistanê  
2019



## **Newafê Bîşar**

Sala 1956an, li gundê Til Xizalê, herêma Cizîrê, Newafê Bîşar hatiye dinê.

Sala 1976an, Lîse li bajarê Qamişlo xwendiyê, paşê Endezyariya Şaristnî (Civil Engineering) sala 1981ê, ji Zanîngeha Helebê wergirtiye.

Ji sala 1970yî ve, ew fêrî Elfabeya Kurdî bûye, û ji ber kêmbûna Kovar û pirtûkên bi zimanê Kurdî wê demê, wî hin dîwanên Seydayê Cegerxwîn, Romana Erebê Şemo û yên berdest xwendine, û her çûye, evîna zimanê dayikê di dil û hişê wî de mezin bûye.

Sala 1987an, ew bûye endamê desteya kovara GELAWÊJ ê, û bi navê ZOZIK kurteçîrok di wê kovarê de weşandine.

Ew yek ji endamên desteya kovara PIRSê bûye, di civîna yekem a damezirandina wê de beşdar bûye, bi hevrêyên xwe re, navê wê vebijartiyê. Hêjayê destnîşankirinê ye ku, hejmara pêşîn ji vê kovarê di Newroza sala 1993yan de hate weşandin. Digel ku ji ber egerên şer ji çend salan ve ew nehatiye weşandin jî, lê hê jî ew di desteya wê kovarê de endam e. Hêvî û omîd e ku careke din, PIRS ronahiye bibîne, li xwendevanên zimanê Kurdî vegere.

Herweha, bi navê Rêberê Silivî, wî gelek gotar di kovara PIRS û Weşana NEWROZê de weşandine, û her bi wî navî, gelek gotar ji Zimanê Kurdî wergerandine zimanê Erebî, û ew di kovara AL-HÎWAR û malperan de weşandine.

Di desteya weşana Kurdî NEWROZ de, ewa ku hejmara wê gihaye 156an, endam e. Herweha ew endamê desteya kovara Erebî EL-HÎWAR de ye.

Ta roja îro, ew di nivîsgeha xwe ya Endezyariyê ya taybet li bajarê Qamişloyê de dixebite.

### **Berhem:**


Gelek gotar, wergera Erebî – Kurdî û kurteçîrok di kovar û rojnameyên Kurdî de weşandine. Mijara wî ya pêşîn, wergera çîrokeke Ji Folklorê gelê Korya ji zimanê Erebî bo zimanê Kurdî bû, ya ku di hejmara 9 - Êlûna sala 1983yan de, bi navê (Zozik), ku navê wî yê nivîsandinê wê demê bû, hatiye weşandin.

Ji bilî wan gotar, çîrok û wergeran, wî 15 hejmarên Rojnameya Kurdistan a dayik ji tîpên Erebî veguhestine tîpên Kurdî yên Latînî; ew bi hêvî ye ku derfet hebe, hejmarên mayî jî biguhêze, û piştî lêveger û lêhûrbînekê, çap û belav bike.

Hin nivîs û gotarên wî bi zimanê Erebî jî li dirêjiya bêtir ji 20 salan hene, di malper û rojnameyan de hatine weşandin.

- Nivîsar û gotarên wî di nav rûpelên pirtûka “Wêje û Nêrîn: Çîrok, gotar û name” de, di Nîsana 2635k/2023z de, hatine çapkirin û belavkirin.

Vêga pirojeyê wî heye ku nivîs û berhemên xwe yên bi zimanê Erebî kom bike, û di pirtûkekê de biweşîne.



## Nizar Yosif

Di 10. 03. 1960ê de, li Gundê Beroj (Qereçox), yê girêdayî herêma Dêrika Hemko, jidayîk bûye. Dibistana sereke (6) sal lê qedandine. Di temenê 7,8 salî de, ji şewekariyê (Resim) hez kir, û tê de pêşdiket. Pişt re çû dibistana navîn, li bajarokê Dêrika Hemko. Li wir pêşengehên şewekariyê (Resim) li dibistan û pirtûkxaneya bajêr dihatin lidarxistin. Ew yek ji şagirtên jîr û serketî di tablûyan de bû.

Ji aliyekî din ve, wî ji mûzîkê pir hez dikir, li dibistanê mamosteyê mûzîkê jê re Ûd dijenand û wî jî stranên Mihmed Şêxo digotin. Pişt re, rêza/pola 10an li bajarê Hîşîçeyê xwend. Di nava xwendekaran de, dîse karê wî her şewekarî bû, û li seyran û newrozan stranbêj bû. Rêza 11-12an wî li bajarê Şamê xwend. Paşê ji xwendinê rawestiya, kete nava pêlên Konevaniyê (siyaset) û di gerên wê û rêxistinên de, huner bihtir dilivîya û gurtir dibû, û bihtir rola xwe li rex distand. Konevaniyê (siyasetê) û xewnên neteweyî, serxwebûn û azadiyê, bi piropaxanda xwe, di afirandin û çêkirina stranan (gotin û awaz) de baş lehîst.

Di salên 1979an de, dest bi jenandina Tenbûrê kir, û gotin û awazên stranan, wî bi xwe çêdikirin. Ji 1984an heta sala 1991ê, pênc Kasê tomar kirin.

Her wisa nivîsandina gotinên stranan jê re bû binexek mezin ji bo avakirina helbestê, ji ber ku gotin û têxtên stranan û helbest hevpişkên hevdu ne, bi wî re zîl dan ( Helbest, awaz, tembûr, xwendina stranê), xwe

bihtir di wê rêyê de perwerde kir. Hêjayî gotinê ye ku ew bi kû de diçû, komên mûzîkê didamerizandin, li Şamê, Humsê, Dêrikê.

Di sala 1990ê de, ew hevserbû, ji destpêka sala 1996an ve li Elmaniya dijî, 3 zarokên wî hene, karê rojane ji 9, heta 10 saetan dike û di ber re jî, di mercên zehmet de, karê huner û nivîsê (helbest, lêkolîn û gotar) berdewam kir.

#### **Pênc (5) pirtûkên wî yên çapkirî hene ew jî ev in:**

-Di sala 2008an de, berhevoka helbestê ya yekem (Rêwiyê xewna efsûnî) weşand, derhêner mamoste Edrîs Omer, û çapa duwem di payîza sala 2019an de, derket (lêveger mamoste Heyder Omer), çapa yekem çapxaneyê Bafet, ya duwem çapxaneyê SerSeran.

-Di sala 2016an de, li Hewlêrê ji çapxaneyê Kurdistan, du pirtûk çap bûn (Kedera min (lêveger mamoste Can Kurd, derhêner mamoste Mehmûd Ûnever)

-Kêferata paytexta kor (lêveger mamoste Konê Reş û derhêner mamoste Elî Cefer).

-Di sala 2019 de, li Elmaniya, pirtûka (Bêdengiya Şevê) bi alîkariya çapxaneyê SerSera hat çapkirin.

-Di sala 2021ê de, "Hêlîna Xewnan" lêveger mamoste: Can Kurd, derhêner: Mamoste Edrîs Omer. Berg: Mamoste Mehmûd Ûnever. Çapxaniya SerSera.

#### **Berhemên wî yên destnivîs ev in:**

-Pirtûkek lêkolînê (Zengilên Şaristaniyên Zagrozan), di bin çavên Dr. Azad Elî re derbas dibe.


-Behevokek helbestan, lêveger mamoste Can Kurd, derhêner mamoste Edrîs Omer (nav ?!).

-Berhevokek ya stiranên wî (Vedenga awazan).

Di sala 2005an de, CD yek ji (12), li Tirkîyê bi navê Kevokên Deştê, tomar kir, hemî gotin û awazên wî ne. Wî 16 Vidiokîlîp çêkirine (You Tube, Nizar Yosif), li ser hinek kenalên Kurdî hatine weşandin, û yeke nû di rê de ye.

Gelek hunermendên Kurdan stranên wî gotine, hinekan gotin û awaz û hinekan tenê helbest ji xwe re awaz kirine. Di van 27 salên li surgûniya li Ewropa, tevî gelek çalakî û ahengên hunerî bûye, û di gelek Gongireyên Rewşenbîran û yên Hunermendan de bûye endam û cîgir. Gelek rojname, kovar û televizyonan hevpeyvîn pê re çêkirine ( Kovarên Sema Kurd, El Taaxî El Iraqîye, Efrîn net, Soparo, Özgür politika, Kovara El Hiwar, Gemiya Kurdan, Radio yek Elmanî re, Orint news, Malpera çand û huner, Efrîna rengîn, Efrîn1 , Ark tv, Med tv,,,,, ).

Tevî gelek Simînar û Konsertan bûye, di gelek bernameyên kenalên Kurdî de bûye mêvan. Di sala 2021ê de, di Peyv.tv de, bernameyek hunerî - Vedenga Awazan - pêşkêş kir.



### **Nûredîn Zaza (1919-1988)**

Di 15ê sibata 1919an de, li Madenê jidayik bûye. Di 7ê çiriya pêşîn 1988an de li Lozanê, Swîsreyê bi nexweşiya penceşêrê mir.

Nûredîn Zaza di nav maleke Kurdperwer de rabûbû. Di şoreşa Kurdî ya sala 1925an de, bavê wî Ûsiv Efendî û birayê wî yê mezin Ehmed Nafiz Beg, hevalbendên Şêx Se'îd bûn, dijî dewleta Tirk ya nijadperest. Pismamê wî Osman Efendî di wê şoreşê de jiyana xwe ji dest daye.

Piştî têkçûna şoreşa Şêx Se'îd û bûyerên xirab li Bakurê Kurdistanê, desthilata Tirk, Dr. Nafiz binçav kiribû û derfet lê teng kiribû, û emrê sergûna Izmîrê jê re derxistibû.

Vêce, ew neçar bûbû ku çarekê ji xwe re bibînê. Di sala 1930î de, ew û birayê xwe yê piçûk Nûredîn ber bi Sûriyê ve binxet dibin, ku di bin mandata Fransayê de bû.

Dr. Ehmed Nafiz, kesatiyeke hekîm, tekûz û mêrxas bû. Hatina wî ya Kurdistanê Sûriyê bû hêzeke nû ji Xoybûnê re. Ew roleke girîng tê de dileyîze, û di salên 1940an de, serokatiya wê dike. Di warê bijîşkiyê de Dr. Nafiz bi kar û xebateke mezin li herêma Cizîra Sûrî radibe. Wê çaxê, êş û nexweşiyên weke êşa zirav, melariya, tîfo, sorik û xurî belav bûbûn, û mezin û piçûk bi wan êşan diçûn. Dr. Nafiz êşên cih nas kirin û li ser destên wî yên pîroz bi deh-hezran nexweş sax bûn. Ji lewra, baweriya xelkê bi bijîşkiya Dr. Nafiz

zêde bû û nav û dengên wî, ne tenê li herêma Cizîrê, lê belê di Sûrî tevî de belav bûbû.

Vêce, Nûredîn, li Rojavaya Kurdistanê di bin sih û perwedeya Dr. Nafiz de mezin dibe. Ew ne tenê jê re bira ye, lê belê ew dibe bav, mamoste û rêber jî. Herwesa, Nûredînê piçûk, di nav civata welatparêz û girgirekên Kurdan de mezin dibe. Di salên 1930an de, gelek şoreşger û rewşenbîrên Kurdan ji ber zilm û zora rêjîma Atatürk ya nijadperest ber bi Sûriyê ve binxet bûbûn. Ji wan Memdûh Selîm, Mîr Celadet û Kamîran Bedir-Xan, Qedrî Beg û Ekrem Cemîl Başa, Hemze Begê Muksî, Haco Axa, Evdilrehman Axa yê Elî Ünîs, Nûrî Dêrsimî, endeziyar Arif Ebas û hinên din. Wê riça wan camêran di warê neteweperweriyê de li Nûredîn hebe. Bi wext re, wê Nûredînê dagirtî bi giyanê şoreşvaniyê bide ser şopa wan û barê Kurdîtiyê yê giran bigire xwe, û doza mafên gelê xwe yê Kurd bike.

### **Çalakî û xebatên Nûredîn Zaza**

- Ew kuştar û bobelatên mezin, yê ku dewleta Tirk dijî Kurdan li Bakur, nexasim li Dêrsimê pêk tanîn, Nûredîn di dil de têşîne. Vêce ew raporekê, derbarî wan bûyerên xirab û hovane, dinivîse û dide pêşiya hevalên xwe ji xwendekarên dibistana Fransawî li Şamê, û çendek ji xwendekarên tara Kurdan, û diçin radestî balyozxaneyên dewletên biyanî dikin.

- Di sala 1937an de, dîse jî bi serokatiya Nûredîn, civateke xwendekaran bi navê Hêvî li Şamê tê damezirandin. Civata Hêvî, rihê netewî di nav xwendekarên Kurd de geş dike û pirsê gelê xwe bi rêya balyozxaneyên derve, yê li Şamê heyî, digihîne Civata Neteweyan.

- Di paşya sala 1937an de, Nûredîn Zaza û çend hevalên xwe, tîmeke fûtbolê bi navê Kurdistan li Şamê çêdikin. Tîma Kurdistan pir xweş dileyize û pêlewaniya Sûrî distîne.

- Nûredînê 20-salî, çalak û jêhatiyê di warê rojnamegeriyê de, di nivîsên xwe de, ew tekeziyê li ser ser fêrkirina zimanê Kurdî dike, û di kovarên Hawar û Ronahî de, berhemên wî hene. Mîr Celadet Bedir-



Xan, çîrokên wî yên kurt bilind dinirxîne, û wî weke Çexovê Kurdan bi nav dike.

- Bûyera kû di sala 1942yan de, bi Nûredîn re, di tirênê de, qewimî bû (xwe ji tirênê avêtibû) û helwesta wî ya wêrek bi herdû mamosteyên Tirk û cendirmeyan re, didin xuyakirin bê çiqas ew mirovekî zane û mêrxas bû.

- Nûredîn, her û her amade bû ku tiştêkî ji milletê xwe yê Kurd re bike. Gava jê re dibêjin: Em dikarin te bigihînin nik seydayê Barzanî û komela Hêwa, ew yekser qebûl dike, û dev ji mal û mewdanên xwe digere û diçe. Lê mixabin, wan li ser sînore Sûrî bi Iraqê re digirin, û Nûredîn salekê di girtîgehên Mûsil û Emara û Bexdayê de girtî dimîne.

- Li Bêrûtê, sala 1945an, dema ku Nûredîn Zaza li zanîngeha fransawî dixwîne, ew şûna Mîr Kamîran Bedirxan di Radyoya Libnanê - beşê Kurdî de digire, û bi karekî mezin di behiskirina pîrsa Kurdî û ragihandina salixdan û nûçeyan ji her çar parçeyên Kurdistanê radibe. Piştî ku hikûmeta Libnanê beşê Kurdî di Radyoyê de radiwestîne, Nûredîn dibistaneke şevane vedike ji bo Kurdên Libnanê fêrî zimanê Kurdî bike.

- Di sal 1947an de, Nûredîn Zaza bawernameya Lîsans di zanîstên siyasî de ji Zanîngeha Fransayê li Bêrûdê distîne, û berê xwe dide Swîsrayê da ku xwendina xwe ya bilind bidomîne.

- Li Swîsrayê, qonaxeke nû û girîng di jiyana Nûredîn Zaza de dest pê dike. Ew çûye wir xwendina xwe temam bike, lê pîrsa milletê wî yê Kurd di bîrê de ye. Wî li ser xwe erk didît ku her xizmetê jê re bikê. Hedan ji Nûredîn re nîn e. Li Zanîngeha Lozanê, ew di ber xwendina xwe re, Kurd û Kurdistanê bi xwendekaran dide naskirin. Gava dibîne ku xwendekarên Kurd hewceyî rêxistinekê ne da ku wan bide hev û bi heve girêde (da bikaribin bi awakî fermî danûsitandin û têkiliyan bi berpirsiyarên swîsrî û rêxistinên biyanî re pêk bînin), ew komela xwendekarên Kurd li Ewropayê, di sala 1949an de, dadimezirîne û dibe serokê wê, û kovarekê bi sernavê Dengê Kurdistan derdixin.

- Nûredînê zane, wêrek, û mêr, bivênevê, deng û pirsarî mîletê xwe û zor û sitemkariya lê tê kirin bigihîne sazî, forûm û kongireyên navneteweyî ku li Ewropayê dihatin lidarxistin. Li Budapêştê, paytexta Maceristanê, di Festîvala Xortên Cîhanê de, sala 1949an, bi ser hemû astengiyên ku partiyên komunîst yê rojhilata navîn (ya sûrî, Tirkî û îranî) li pêşiyê didanîn jî, wî weke nûnerê Kurdan xwe tê de ferz kir, s û helbestek li ser rêber û lehengê neteweya Kurd Mistefa Barzanî li pêşiya 5000 kes xwend. Piştî çend rojan ji wê Festîvalê, li Sofiyayê, paytexta Bulgaristanê, li kongireya xwendekarên cîhanê, wî weke nûnerê Kurdistanê qebûl dîkin. Nûredîn Zaza di bîranînên xwe de dibêje: "Ew serkeftineke mezin bû. Vêce ez rehet û bi dilekî xweş vegerehame Swîsreyê".

Li Fransayê jî wîlo, gava Neteweyên Yekbûyî, cihê xwe di Sera Şapo de digirt, Nûredîn endamê şandekê bû ku raporekê ser rewşa Kurdan bide, bizav û hewildanên xwe dike ku bigihe nûnerên dewletan da ku guh bidin pirsarî Kurdî, û wê di civînê de danûstendin bikin, û li her derê jî wîlo, Nûredîn bêtexsîr e. Rast e Nûredîn yek bû, lê wî hamberî 100 çalakvanî kar û xebat dîkir.

### **Nûredîn Zaza û Yekîtiya Xwendekarên Kurd li Ewropayê**

Di sala 1956an de, Nûredîn Zaza du karên pir girîng pêk tîne. Yê pêşî, ew doktoriya di zanistên perwedeyiyê de, ji zanîngeha Lozanê werdigre. Karê didwan, ew Yekîtiya Xwendekarên Kurd li Ewropayê didamezirîne. Dûv re, ew dide rê û vedigere Sûriyê. Di bîranînên xwe de Bîranîn, Dr. Nûredîn Zaza dinivîse: "Di paşiya hezîrana sala 1956an de, ez bi hisret bûm ku ez tiştêkî ji Kurdan re bikim. Min rabû da rê, di rêya deryayê re, Îtalya-Bêrût, berê xwe da Sûriyê. Li Bêrûtê, piştî 9 salan ji mayîna li biyanîyê, birayê min yê mezin Dr. Nafiz û hin dostên me yê dilsoz, hatibûn pêşwaziya min. Çawa ez ji gemiyê peyabûm, min naskir ku Kurdên Sûriyê ji mêj ve li hêviya vegera min in. Vêce gelo ezê karibim wan ji bin sitem û zordariyê xilas bikim, û maf û daxwaz û meremên wan di heyif û salên werin de bi cih bînim, yan na?!

## Nûredîn Zaza û Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê

Li Sûriyê, Nûredîn Zaza dibîne ku rewşa miletê Kurd xirab e. Ji hêlekê ve, Kurd ji nijadperestîya partiya Be'is di metirsiyê de ne. Li hêla dîtir, Partiya Komunîst a Sûriyê, ya qaşo Internasyonalîst, xwe ji neteweya Ereban re kiribû parêzer, lê li dijî Kurdan derdiket; hinga doza mafên xwe yê neteweyî dikirin û ew bi şovînîzmê tometbar dikirin. Nûredîn Zaza dinivîse: “di rewşeke wesa, min avakirina rêxistineke ku karibe nasnama gelê Kurd biparêze û doza mafê wan yê rewa bike, pêwîst didît. Li Şamê, xwendekarên Gemnazyom û dibistanan pêkanîna wê projeyê ji min dixwestin. Herwesa, welatparêzên kevnare, mela, muxtar, û cotaryên sade di pêkanîna wê projeyê de, piştî min digirtin û di paşîya sala 1957an de, ew xewn pêkhat û Partiya Demokrata Kurdî li Sûriyê (PDKS) hate damezirandin.”

PDKS, ji serokatîya xwe re, Nûredîn Zaza hildibijêre, û di demeke kurt de, gelek Kurd tevî Partiyê dibin. PDKS, karekî mezin di warê siyasî, rewşenbîrî û civakî di nav Kurdan de dike; lewra, nav û deng û bandora wê di nav Kurdan de xurt dibe. Lê di salên 1958 - 1961ê de (dema yekîtiya Sûrî û Misrê), hikim di destê rêjîma Cemal Evdul-Nasir yê dîktatûr de ye. Di wan hersê salan de, rewşa siyasî, ewlekarî û aborî li Sûriyê kambax dibe. Berdevkê Nasir li Sûriyê, Evdihemîd Elserac, û hêzên parastinê zordariyeke xirab li xelkê dikin, nemaze li Kurdan û helbet li PDKS, ku hebûna wê weke metirsiyeke mezin li ser yekbûna dewleta Erebi dibînin. Vêce rêjîma Nasir, hemû bobelat û bêtarên xwe yê siyasî û aborî dike stukra gelê Kurd û PDKS de. Di çend rojan de, li dora 5000 endamên PDKS û serokê wê Nûredîn Zaza têne girtin. Piştî çendkê, behra mezin ji hevalan têne berdan. Nûredîn Zaza û 31 heval di hepis û zindanên Helebê û Şamê (Mezê) de, girtî dimînin. Girtiyên Kurd gelekî têne lîxistin û îşkencekirin. Belê, behra mezin ji jiyana Nûredîn Zaza di siyasî de derbas bû. Lê di heman demê de, ew nivîskar û rewşenbîrekî mezin bû. Wî bi sedan gotar di rojname û kovarên Kurdî Hawar û Ronahî, û yê biyanî de nivîsandibûn. Herwesa, wî Destana Memê Alan ji nûve çapkiribû û pêşgotineke hêja jê re nivîsibû. Di sala 1982an de, wî pirtûkek bi navê Ma vie de Kurde (“Jiyana min a Kurdî, yan jî Hewara miletê Kurd”) nivîsibû; tê de behsa jiyana û xebata xwe ya netewî di ber pîrsa Kurd û

Kurdistanê de kiribû. Her wisa Nûredîn Zaza giringiyêke mezin dida pirsê zimanê Kurdî û pêşxistina wî. Di banga xwe de, Nûredîn Zaza ji Kurdan re dibêje: "Gelî Kurdan! Heger hûn naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî her tiştî zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê heger hûn dixwazin xwe nasbikin û xwe bidin naskirin û hizkirin, bi hevaltî û dostaniya milletên din bi pêş ve herin û bi rûmet û ser bilindî bijîn, dîse zimanê xwe bixwînin û bidin xwendinê".

### **Salên dawî yên Nûredîn Zaza li Swîsreyê**

Dr. Nûredîn Zaza salên xwe yên dawî li Swîsrayê dimîne. Li wir, ew di 1972yan de, bi keçeke swîsrî bi navê Gilberte Favre re dizewice, û di 1973yan de, kurekê wan çêdibe, nav lê dikin Chango Valéry (Şengo Valéry).

Nûredîn Zaza di 7ê çiriya paşîn a 1988an de, ji ber nexweşiya pençeşêrê mir. Ew li goristana Bois-de-Vaux, li bajarê Lozanê hat veşartin.

### **Berhemên wî**

- *Destana Memê Alan*, Bahoz, Uppsala, Swêd, 1973.
- *Memê Alan*, Çapxaney Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1977.
- *Ma vie de Kurde*, Pierre-Marcel Favre Publi, SA, Lozan, 1982.
- *Keskesor*, Weşanên Nûdemê Stockholm, Swêd, 1995.
- *Bîranîn*, Avesta, Stembol-Amed, 2008.
- *Gulê*, Weşanên Lîs, Amed, 2015.
- Berî mirina xwe bi salekê berhema Ehmedê Xanî ya bi navê Mem û Zîn werdigerîne zimanê fransîzî.



## **Nûriyê Hesarî (1934 - 2011)**

Di sala 1934an de, li Hesar a gundê Kercewsê, jidayik bûye. Di nava Kurdan de, bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Navê diya wî Xanim e, navê bavê wî Mele Yûsifê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê, ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji rema (eşîr) Hevêrkan bûye.

Mele Nûrî ji malbateke xwenda, zana û bîrewer hatiye. Bavê wî mele bûye, diya wî jî keça melan û jineke xwenda bûye.

Di sala 1939an de, pêşî li cem diya xwe dest bi xwendina Qur'anê kiriye, û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdne'îm xwendine.

Di sala 1940î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyanê xwe spartiyê Xwedê, îcar wî li ba kekê xwe Mele Hisên xwendiyê. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, îcar bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê Tirkî de, ya ku li Hesarê bûye.

Di 1945an de, çaxê di nofa (sinif) çaran de, dibistana Tirkî dixwend, bavê wî jiyana xwe spartiyê Xwedê. Îcar kekê wî Mele Hemîd ew ji dibistanê derxistiye û daniye ber xwendina medresê. Piştî demekê ew û kekê xwe Mele Nezîr çûne gundê Bilêderê, û li cem birayê xwe yê ji dê mane. Pişt re çûye mala xalê xwe Mele Mihemed, li gundê Êlihê (Niha bûye wîlayet û jê re Batman dibêjin), maye. Ji wir jî çûye gundê Kurrika li Bişêriyê, li medreseya Mele Hesên Tilmizî xwendiyê û ders ji Mele Faîqê kurê Mele Hesên girtiye. Piştî demekê ji wir şûnde vegeyriyaye û çûye Hesarê. Ew û kekê xwe Mele Hemîd, ji bo xwendinê daketin Binxetê û çûne cem mala Şêx Ehmedê

Xiznayê. Li wirê dîsa li cem kekê xwe Mele Hemîd xwendiyê heta ku “Sadulaha Gewra” xilas kiriye.


Di sala 1949an de, birayê wî Mele Hemîd, çaxê xwendina xwe ya medresê kuta kiriye, di Kanûna Paşî de vegeyariyê Hesarê, lê Mele Nûrî li Xiznayê maye, û îcar li cem Mele Beşîrê Batêrgizî xwendiyê. Lê di dehê meha Heyvdarê 1950ê de, Şêx Ehmed çaxê giyanê xwe spartiyê Xwedê, ji wir çûye Tilmârûfê û li ba şêx Eladînê kurê Şêx Ehmed xwendiyê. Mele Nûrî li wirê bûye pêbawerê Şêx Masûmê kurê Şêx Ehmedê Xiznayî.

Mele Nûrî di 20-saliya xwe de (1954), dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye, û berhemên xwe hemû bi alfabeya latînî nivîsandine. Camêr digel wê perîşanî, dilêşanî û xizantiya xwe, deh pirtûk kirine malê Pirtûkxaneya Kurdistanê.

Di roja 25. 01. 2011an de, Mele Nûriyê Hesarî (Pirêşan), ji nav me barkir.

#### **Ji berhemên wî:**

- - Şoreşa Barzanî: Helbest, 1995
- Hostanibêja Zarhaweyên Kurdî, Stockholm 1996
- - Axlîma: Pêlên Helbesta Kurdî, 1996
- - Rêziman: Destnivîs
- - Ferhenga Kurdî – Kurdî, Destnivîs
- - Ferhenga Kurdî – Tirkî, Destnivîs
- - Ferhenga Kurmancî- Zazî, Destnivîs
- - Mewlida Pêxember, Destnivîs
- - Vegeandina Zimanê Erebî Şarvîn, Destnivîs
- - Koledar: Çîrokek Helbestî ye, Destnivîs
- - Dû Mar: Çîrokek Helbestî ye, Destnivîs, Bi zimanê Erebî ye.
- - 11 Dîwanên Helbestan, Destnivîs
- - Bîranîn, ji jiyana wî, Destnivîs.



## Nûşîn Bêcirmanî

"Ebdilrehman kurê mele Ûsivê Mele Hesenê Bêcirmanî, di 1ê Nîsana 1956ê de, li gundê Til-Berhem, ku bi 7 K.Man Başûrî Tirbespiyê, ji herema Sincaqa Rojavayê Kurdistanê dikeve, jidayik bûye. Sala 1962 - 1963, li dibistana gundê Til-Berhem, ji pola 1ê dest bi xwendina xwe ya seretayî kiriye. Di sala 1967 - 1968ê de, li bajarê Qamişlo, di ezmûna pola 6ê de derbas bûye, piştî mehekê encama serketinê para wî bû. Xwendina xwe ya ji pola 7ê ta bekeloriya li bajarokê Tirbespiyê derbas kiriye. Di sala 1974ê de, bawernameya Bekeloriya beşê zanistî wergirtiye. Di ber mamostetiye re, bawernameya (Pola taybet ya amadekariyên mamostetiye- الصف الخاص ) wergirtiye, û ji zanîngeha Helebê bawernameya perwerdeyê - beşê mamosteyê refê, wergirtiye.

Piştî sala 1968ê, bavê wî mele Ûsiv, ku di rêzimana Erebî de zîrek bû, weke piraniya melayên Kurd, pirtûka (الشرح المغني) ya rêzimana Erebî pê re rewya kiriye. Di dawiya qonaxa amadeyî de 1971ê, dîse bavê wî pirtûka (عزّي للصرف) pê re rewya kiriye.

Di sala 1979ê de, xwe bi xwe hînî zimanê Kurdî kiriye. Korsên hînkirina zimanê Kurdî bi rengê nehênî vedikirin. Roj bi roj pêwîstî dida zimanê Kurdî û li jêderên bi zimên ve girêdayî vedigeriya da ku xwe fêrî ziman û beşên wî bike.

Nûşîn Bêcirmanî, yek ji damezirênerên Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê ( S.F.P.Z.K.S ) ye. Di sala 2006ê de, sê şaxên wê hebûn

( Cizîrê, Efrîn û Şam). Bi şûn de, li Kobanê, Ewropa û Başûrê Kurdistanê jî, şaxên wê hatin avakirin. Di civata damezirandina Saziyê de, Nûşîn Bêcirmanî bû endamê komîta rêveber ya Saziyê û hîn jî berdewam e.

Di civata fereh a Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Sûriya de, ya ku di 15/8/2014ê de hate lidarxistin, Nûşîn hate destnîşankirin weke yek ji endamên komîta nixandina berhemên Erebi, yên ku ji bo wergirtina endametiya Yekîtiyê ji kongirê Yekemîn re hatibûn pêşkêşkirin; herewha weke yek ji komîta amadekirina rêşpelika tozika Yekîtiyê bo kongirê yekemîn, hatibû bijartin.

Di kongirê yekemîn yê Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Sûriyeyê de, yê di 10/10/2014ê de hatî lidarxistin, di Desteya Rêveber de hatibû hîlbijartin. Herweha jî, di kongirê diwemîn de ku di 16/10/2016ê de hatibû lidarxistin.

Nûşîn Bêcirmanî, di kongirê sêyemîn yê Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Sûriya de, ku di 27/9/2019 de lidar ketibû, weke Cîgirê serokê Y.N.K-S, hate hîlbijartin û ta kongirê çaremîn yê awarte jî di endameteya yekîtiya nivîskarên Kurd li Sûriyê de, berdewam e.

Nûşîn Bêcirmanî di hin kovar û weşanên Kurdî de nivîsiye weke kovara Nivîskar, Pirs û Welat û weşanên Newroz û Bûyer.

Di refê 11ê de, carina helbestin bi zimanê Erebi dinivîsîn; bi şûn de, piştî ku xweşik hînî zimanê Kurdî bû, dest bi nivîsandina helbestê li kêleka zimanê Erebi kir.

#### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

1- Dîwana bi zimanê Erebi ( الكل غنى لعينيك ).


2 – Dîwana ( Lê Esmerê ) bi zimanê Kurdî.

3 – Dîwana ( Ez gel im ) bi zimanê Kurdî.

4 – Pirtûka ( Pênûsa Azad Sêwî ye ). Tibabek ji gotar û lêkolînan bi zimanê Kurdî ku di weşanên bi zimanê Kurdî derdikevin de hatibûn weşandin.

- Pirojekî wî di rê de ye , ew li ser kar dike, di warê wêjeya Kurdî û rola wê di hişyarkirina hestê neteweyî de li cem gelê Kurd; ew jî bi zimanê Kurdî ye.





### **Osman Sebrî (1905-1993)**

Di dawiya babilîska nozdehan û destpêka babilîska bîstan de, destpêka dîroka hişyarbûn û bizava rizgarîxwaz a neteweyî ya gelê Kurd e.

Bi belavbûna rojnama (Kurdistan 1898)an û çapemeniya Kurdî re, roj bi roj hizrê ramyarî û civakî li nik rewşenbîrên Kurdan ber digirt, û rojnameya Kurdistan, li hemberî zordariya fermandarên Osmaniyan, şerê azadî û serxwebûnê domand. Ramana neteweyî roj bi roj di nav Kurdan de, li ser destên nivîskar û helbestvanên Kurd yê mîna Hacî Qadirê Koyî xurtir û geştir dibû.

Di dawiya şoreşa 1908an de, bi hatina (Ciwanturk) re, qonaxeke nû dest pê kir. Rewşenbîrên Kurdan roleke pir mezin di vê partiyê de lîstin. Lê her ko çû (Ciwanturk) li dijî ramanên neteweyî yê Kurdî derketin. Siyasetmedarên Kurdan jî piştî xwe danê û dest bi avakirina çend komeleyên civakî û siyasî kirin, ji wan: [Cem'iyeta Azm-î Kavî ya Kurdistanê, Cem'iyeta Hêvî ya xwendekarên Kurd, Cem'iyeta Te'alî ya Kurdistanê û .. wd.], û ramana neteweyî bi riya perwerdeyî, rêxistinên civakî, xebata weşan û çapemeniyê belav dibe. Wek weşandina Kurdistan (1908 – 1909), rojnameya Teavûn û Teraqî ya Kurd, Rojî Kurd - 1913, Yekbûn 1913, Jîn - 1918, wd. Ev qonax bi destpêka xebata neteweyî ya Kurd tê zanîn.

Gava Şerê Cîhanê yê Yekemîn, sala 1914an, dest pê kir û dewleta Osmanî li kêleka Almaniyayê kete cengê, dîsan Kurdan bizav kirin ku sûdeyê ji Rûsyayê werbigirin û şoreşekê li dijî Osmaniyan pêk bînin; lê mixabin hewildanên Kurdan ber negirtin. Imperatoriya Osmanî parvebû, ji ber ko para mezin ji erdê Kurdistanê di bin destê Osmaniyan de bû, Kurdistan jî pê

re hate parvekirin. Di 16/5/1916an de, û di riya van hersê dewletên mezin Rûsiya, Bîrîtanya û Ferensayê re, û bi navînkirina peymanê reş (Saykis – Bîko), Bakurê Kurdistanê giha Turkiya, Başûrê Kurdistanê giha Îraqa nuh, Rojavayê Kurdistanê giha Sûriya, û ji xwe Rojhilat tev di bin destê Îranê de ma.

Piştî rûxandina dewleta Osmanî, Kurdan derfet û nîreke nuh di derbirîn û çareserkirina pirsê xwe de dîtîn. Nemaze di danezana rêbaza Wilson ya çardexal de; ji bo mafên miletan bi azadî û serxwebûnê bê çespandin. Pê re jî berê Kurdan dîsan berve riyên xebata ramyarî û dîplomatîk çû. Serkêşê evê xebata dîplomatîk Şerîf Paşa bû, ewî doznameya Kurdî pêşkêşî kongira Firasayê kir. Lê mexabin biryarên Sêvirê, li kongira Lozanê 23.07.1923yan binpê kirin, û hevkarên soz û peymanên xwe bi Kurd û Kurdistanê re xwarin.

Ji hêlekê din ve hewldan, şoreş û raperînên Kurdan rojekê ji rojan bê deng neman, ji raperîna Şêx Ubeydullahê Nehrî 1880yî, raperîna Dersimê 1905an, Şêx Evdilselam Barzanî, hewldanên Kamil Bedirxan û yê Şêx Tahayê Sidîqê Şemdînanî, hewldanên Seyîd Evdilqadirê Nehrî, Şêx Mehmûdê Berzencî 1919an, serhildana Qoçgirî û Dersimê (1920-1926) her rêz û qor li pey hev berdewam bûn.

Piştî têkçûna peymanê Sêferê û îmzekirina Peymana Lozanê, di 29ê Cotmeha 1923yan de, Komara Tirkîyê tê çespandin, û hebûna Kurdan tê tunekirin. Li ser vê yekê, hinek serbaz, axa, beg, Şêx û rewşenbîrên Kurd li Erziromê, di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî de, bi navê (Komîteya Îstîqlala Kurdîstanê) yan jî tevgera (Azadî) rêxistineke siyasî dadimezirînin. Ev rêxistin bingeha pêxistina agirê şoreşa Şêx Se'îdê Pîran 1925-an bû.

### **Jiyan, tekoşîn û xebata Osman Sebrî:**

Di roja 05/01/1905an de, Osman Sebrî li Bakurê Kurdistanê, gundê Narincê, qeza Kextê ji wîlayeta Semsûr (Adiyeman) hatiye dinê. Bavê wî, serekeşîrê Merdêsiyan e. Navê bavê wî Sebrî<sup>5</sup> ye. Navê diya wî Emîne ye. Di bîranînên xwe de Osman Sebrî li ser hoza xwe weha gotiye:

---

<sup>5</sup> -Sebrî Emîne ji xwe re anî, lawek bi navê Osman û du keç (Horiye û Emîne) ji wan re çêdibin.

(Eşîra me Merdês perçeyek ji emareta – mîrnişîna - Mirdês e ku sernîveka wê bajarê Egilê bûye. Piştî qelsî û jihevdeketina emaretê mîrekan her yekî aliyekî emaretê bi navê eşîrê xistiye bin destê xwe. Ji kalê min Mihemed ku tevî eşîra xwe (Merdêsê Gawestî) hatiye erdê ku îro bi Mirdêsan hatiye nasîn, heya digehê min, em neh bav di wî erdî de rûniştine).

Osman Sebrî di dehsaliya xwe de bavê xwe winda dike. Piştî ku bavê wî diçe ser dilovaniya Xwedê, diya wî Emîne, bi apê wî re, ango Şikrî axayê Merdêsiyan re, hevjin dike. Vêca li şûna bavê wî, apê wî yê mezin (Şukrî) bi kar û barên hoza Merdêsan ve rabû û bi dilovaniyeke mezin jî (Osman Sebrî) li ser rêzan û rêdanên hozanî xwedî kir. Osman Sebrî li ser xwendina xwe ya destpêkê weha diyar dike: (Dawî sala 1917an mamostayek ji me re hat û wê salê min şhadeta îbtîdaî istend. Sala din apê min ez şandim Kextê dibistana Rişdiyê. Di nava sê salan de min şhadeta xwe li wir jî sitand). Apê Osman di dermafê rewşa rêzana eşîrtî û zûjînanînê de gotiye: "Sala 1920an de min şhadeta xwe ji Rişdiyê bir û vegehm çûm mal da ku hînê rê û rêzanên eşîrê bibim. Sala 1922an payîzê ez hevde salî bûm ku ji min re jin anîn. Piştî salekê ji min re lawek bû (kurrê min Welato)"<sup>6</sup>.

Apê osman ji rêzana êlî û eşîrtiyê kiz û jê teng dibe, ûştê vê yekê jî diyar dike: (Sebebê vê guherrîna han bi navê (Ismâîl efendî) mamostayek bû. Vî camêrê han çavên min li ser kirêtiya rêzana Derebegîtiyê vekir).

Demeke kurt Osman Sebrî li kêleka apê xwe Şukrî Axa bi karûbarên hoza Merdêsan ve rabû, ta şoreşa Şêx Se'îdê Pîran dest pê kir, di wê hingê de wan jî xwest di hawara şoreşê de herin û soz û peymanên xwe bi Şêx Se'îd re

---

<sup>6</sup> -Hevjîna wî ya yekemîn dotmama wî Eysê bû lawekî bi navê (Welato) jê re tîne, di demek kurt de hevjinê wî dimire. Lawê wî, Welato, di temenê çel û heft saliya xwe de, ango sala 1970yî, li serxetê bi destê dijminên apo tê kuştin. Li Sûriyê – Şamê, careke din apo jinê tîne. Hevjîna wî ya diwemîn Çerkes e navê wê "Şadiye" ye. Şadiye xanim sê lawan (Hoşeng-1945, Hoşîn 1946, Heval-1955), û du keçan (Hingûr-1948 û Hêvî-1951) jê re tîne. Kewê bi xwe dibe keça birayê apo Osman yê ji alî dê ve. Piştî mirina bavê Osman Sebrî apê wî Şukrî diya wî ji xwe re tîne lawek bi navê Şewket û du keç, Behiye û Adalet, ji wan re çêdibin. Şewketê Şukrî Emîxanê ji xwe re tîne. Berî keça wî Kewê - 1948an çêbibe bi heftiyekê, Şewket dimire. Vêca ji neçarî apo Osman wê tîne binxetê û xwedî dike.

bibin serî. Lê sed heyf û mixabin, şoreş zû beravêtî bû, Şêx Se'îd û 48 hevalên wî di havîna 1925an de, li Amedê hatin bidarvekirin.

Piştî têkçûna şoreşa Şêx Se'îdê kal, di sala 1925an de, dewleta Turk dest bi siyaseta helandina bi darê zorê kiriye ko bi siyaseta Tirkirinê (tetrîk) têt naskirin. Dasa şer, hişk û ter da ber hev. Bi destekî hesinî dest bi kuştin û wêrankirina gelek gund û bajarên kirin. Çek ji destê hoz û eşîrên Kurdan wergirtin. Berê agirê setemkariyê giha hemû warên jiyane (aborî, civakî, siyasî û rewşenbîrî). Bi sedhezaran Kurd dûrî welêt xistin. Kurdistan kirin dojeh. Gelek ji wan siyasatmedar û welatparêzên Kurd penaberî Sûriyê, Îraqê, Îran û Ewropayê bûn. Lê digel van karan tevan jî, dewleta Tirkan nikarîbû viyan û hêviyên Kurdan ji dest û hizrê wan yê neteweyî bibire û rehên agirên serhildan û berxwedanên wan vemrîne. Ew agirê ko, li Çiyayên Cabikcûr, Farqîn, Sason û Agiriyê vexistî mabû, di şerê xwe de berdewam bû.

Di roja 24/06/1926an de, Tirkan herdu Apên wî (Şikrî û Nûrî), li Amedê bidarvekirin. Osman Sebrîyê ciwan jî wê demê têt girtin, û hetanî sala 1928an li Denîzleyê di zindanê de dimîne. Piştî ji zindanê derdikeve, vedigere Meletiyê û karê xwe yê welatparêziyê û dijberiya rejîmê didomîne. Li ser vê yekê carekî din, tevî 26 serokeşîr û axayên Kurdan, têt girtin û çendekî li zîndana Meletiyê dimînin. Piştî heft mehan, ew û axayên din têt berdan; lê hukûmet dîsa li pey wî ye. Careke din biryara girtina wî têt standin, bi gotina Cegerxwîn: "biryara îdama wî derdikeve". Lê Osman Sebrî xwe nade dest. Vêca ji neçarî, di roja 24/12/1929an de, ji bakurê Kurdistanê – Serxetê – daket û berê xwe da rojavayê Kurdistanê – Binxetê; xwe li hoza Beraziyan li bajarê Kobaniyê girt. Serokê vê hozê Mistefa û Bozan Şahîn Beg bûn, yê ku endamên komela (Xoybûn)ê bûn. Osman Sebrî xwediye wê baweriyê bû ku êdî vegeer ji vê rîya dûr û dirêj nema, lewra dibêje:

“Mirovekî ku pêleke dirêj ji jîna malbata wî di şerê sitemkar û zorbazên Tirk de borî be, ne dûre ku ew jî hemî jîna xwe di wê rîya bi rûmet de biborîne. Herçî ez, rîka kolîdarên Tirk ên zorbaz û hezkirina welat û gel digel hev min di rêya têkoşînê de dehf didin. Ji lewre eger ez di fikir, raman û xebata xwe de qelsiyê rave bikim ji bextereşîya min e”.

Li Binxetê, li ser destê Mîr Celadet Bedir-Xan, Osman Sebrî dibe endamek ji endamên komela (Xoybûnê), ew komela ku di sala 1927an de, ji rex welatparêzên Kurdan ve li beyrûdê hatibû damezirandin. Di vî warê de, Osman Sebrî gotiye: “Piştî hatina Sûriyê bi sê çar heftiyên Celadet Bedir-Xan hatibû Kaniya Ereban (Kobanê), piştî em rûbarî hev bûn li ser destê wî ez bûm endamê partiya Xoybûnê ...”.

Li ser daxwaz û biryara Xoybûnê, Osman Sebrî derbasî serxetê dibe ji bo gihandina nameya Seyid Riza li herêma Dersimê û belavkirina belavokan bû. Lê mexabin, ev karê wî neçû serî û paş ve vedigere.

Piştî ku derbasî Sûriyê dibe, hikûmeta Kemalî ji hikûmeta Fransî, ya ku di Sûriyê de karbidest bû, doza xwestina wî kirin; lê Fransiyên ne dixwistin ku Osman Sebrî radestî Tirkan bikin, ji ber hin berjewendiyên xwe; vêca ew ji Kobaniyê surgûnî bajarê (Reqa) yê kirin; da ku ji sînor dûr be.

Di sala 1930î de, endamên komela Xoybûnê biryara alîkariya şoreşa Agirî wergirtin û kar û barê xwe kirin ku ji sînorê binxetê derbasî serxetê bibin. Xoybûn şeva 3iyê ser 4ê Tebaxa sala 1930î, roja êrîşkirina ji başûr- Binxetê - ber bi bakur-Serxet- ve biryar stendin. Serkirdayetiya Xoybûnê enya şer ji Cerabulsê, ko li ser ava Feratê dikeve, ta Endîwarê li ser ava mezin Dicle, û li ser şeş deveran ji rojava ta rojhelat li endamên Xoybûnê leva kirin. Devera Kobanê: Bozan Şahîn Beg û birayê wî Mistefa Beg, serokên hoza Beraziyan, û Osman Sebrî berê wan li Urfayê û Mereşê bû, û Osman Sebrî wê ber bi hoza Merdîsan here. Lê, mexabin dema xwestin ji Başûr êrîşî dewleta Tirkan bikin, gelek ji wan axa û begên ko soz dabûn, sozê xwe xwarin û pê ranebûn. Tenê Osman Sebrî û çend peyayên Beraziyan sînor derbas kirin, şer kirin û hindêk ji belavokan belav kirin, lê mexabin ji neçarî bi şûn de vegeriyan.

Piştî vê rewşa dijwar, cih li wî teng dibin û berê xwe dide Kurdistana Başûr. Li wir tekoşerê mezin rehmetî Şêx (Evdilrehmanê Garisî) nas dike. Osman Sebrî bi xwe wisa gotiye: “Di sala 1930î de, li Barzan min û rehmetî Şêx (Evdilrehmanê Garisî) hev nas kiribû û serekî dirêj bi rehmetî re bibûm heval...”.

Osman Sebrî ji vegera xwe ya ji Iraqê, 1930-1931ê, li Mûsilê ji hêla hikûmeta Ingilîzî ve tê girtin û bi rewşeke perîşan xwe ji nav lepên wan Ingilîzan reha dike<sup>7</sup>, diçe Uman û Felestinê; dîsa vedigere berê xwe dide bajarê Şamê û xwe li welatparêz û ronakbîrên penaber digire.

Civata pêşî ya wan penaberan li mala welatparêzê Kurd Elî Zilfo Axa - li taxa Kurdan - li bajarê Şamê bi serokatiya Mîr Celadet A. Bedir-Xan tê girêdan. Di wê civîna pêşîn de, Mîr Celadet A. Bedir-Xan ev gotina xwe ya dîrokî pêşkêşî wan kir û got: "Gelî Kurdan..! Gelî rewşenbîr û welatparêzên delal... Şoreş û raperînên me bi çekan serneketin, ne jî gihan armancên xwe... Niha ji me tê xwestin ko em bi pênuşê, bi zanîn û rewşenbîriyê, gelê xwe hişyar bikin, û pê şerê dijminê gelê xwe bikin. Em, dîrok, tore, folklor û rewşenbîriya xwe nasbikin û xwe bi cîhanê bidin naskirin... Bila zanîn çekê me be..".

Bi van gotinên pir bi akam û hêja Mîr, Celadet Alî Bedir-Xan ronaka xebatê li pêş wan vexist û berê xebatê da pênuş û zanînê.

Şoreşger û welatparêzên mîna Celadet, Kamiran, Osman sebrî, Ceger-xwîn, Hesên Hişyar, Qedrî can, ... û hwd, riya xebata wêjeyî û rewşenbîriya Kurdî qelaştin. Bi hest û ramaneke Kurdistanî bingehe kultûr û çandeya Kurdên Binxetê danîn. Ew hest û xebata wan ronakbîran, sînorê çêkirî di nav perçên Kurdistanê de derbas kirin, û têkilî û danûstendinên xwe bi perçeyên dî re ava kirin.

---

<sup>7</sup> -Li ser gotina mamoste Hac Ebdilferîdê mele Ibrahîmê Golî ko bi xwe ji devê Osman Sebrî bihîstibû dibêje: Dema Ingilîz xwestin Osman Sebrî radestî Turkan bikin, ew ji Mûsilê ber bi Şingalê ve birin. Di wê çûnê de, du rêwingên Êzîdî pê re li otobosê siwar in. Danûstendin di nav wan û Apo de çêdibe. Osman Sebrî diyar dike ko Îsmail Beg ji xelkê çiyayê Şingalê pê re di zindanê de girtî bû. Herdû rêwingên Êzîdî rewş û sedemên giriftariya O. Sebrî baş nas dikin û bi lez hawara xwe digihînin xunkarê çiyayê Şingalê (Hemê Şero û lawê wî Xwedêda), û serpehatiya girtina Apo ji wan re diyar dikin. Xwedêda bi lez û bez xwe digihîne ingilîzan û ji wan dixwaze ko Apê Osman radestî Turkan nekin û wî serbest berdin. Di nav bera dibe û nabe.. Xwedêda dibêje: "Eger hûn O. Sebrî berdidin berdin, hûn bernadin wê xwîn li çiyayê Şingalê biherike". Bi saya van lehengên çiyayê Şingalê, O. Sebrî ji destê Ingilîzan reha dibe.

Kovara “Hawar”-ê, di 15-5-1932yan de, der xistin, û pê re jî wêjeya Kurdî, li Binxetê, derbasî qunaxa wêjeya nivîskî û nûbûyî kirin, nemaze jî piştî çapkirin û weşandina alfabe ya Latînî.

Bi piştgiriya Celadet Bedirxan, apê Osman ji eniya şer û cengan cihê xwe di eniya rewşenbîriyê de, di rêz û benda pêşî de, bi pênuşeke bejinbilind û hêja cihê xwe digire. Ne tenê wek nivîskar, helbestvan û wergêr, belê wek hîmdar û rêveberê kovarê jî.

Lê Apo<sup>8</sup> tim û tim çavê xwe li rewşa ramyarî, şoreşgerî û xebata çekdariyê digerland. Ji ber liv û karê wî yê ramyarî gelek caran dihat giriftarkirin, lê ko dihate berdan dîsa vedigeriya kar û xebata xwe. Tucar çavên wî ji zindan û girtîgehan nedîşkest.

Di sala 1935an de, du caran li Libnanê tê girtin, û ji wir hikûmeta Fransî wî surgûnî Afrîqayê (Girava Medexşer)ê kirin, lê ma ta bi sala 1936an. Ji ber hin sedemên navxweyî, di sala 1938-an de xwe dûrî komela Xoybûnê kir, çavên xwe li hin saziyên din ji kar û xebatê re digerrîne. Her roj û her demên wî di bin girtin û di dijwariyê de derbas dibin. Gelek caran, heta bi gotina Osman Sebrî bi xwe, di jiyana xwe de (18) caran tê girtin û zîndanîkirin. Ne tenê li Tirkiyê û Sûriyê, li Libnan û Iraqê, ango li Mûsil û Bexdayê jî di zîndanê de dimîne, û (12) salan ji temenê xwe di girtîgehan de dibûrîne. Lê, ev zilm û zor wî ji riya xebatê venagerîne. Wekî ku Cegerxwîn dibêje: “Ew – O. Sebrî-gelperestekî xurt e û bi dostê xwe re dost, bi dijminê xwe re jî dijmin e). Wî û çend kesên din komelek bi navê (Yekîtiya Xortan) li bajarê Şamê damezirandin, û vê dawiyê xwe tevî (Nadî Selah Eldîn ya rewşenbîrî) dikan, navê nadiya xwe guhertin û kirin (Nadî Kurdistan), kar û xebata van Nadiyan hînkirina xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî û geşkirina hestê neteweyî bû.

---

<sup>8</sup> - Bi navkirina Osman Sebrî bi navê Apo ji ber vê yekê hatiye: Osman Sebrî pir ji navkirinên (Axa, beg û paşan) kiz û dilteng dibû, digel ko ew bi xwe ji malmezinên Kurdan bû. Ewî ji binavkirina Apo ji xwe re hez kir û li dijî navkirinên dî derdiket. Ji hêlek din ve, ji ber rêzgirtin û rêzdariya kesîniya Osman Sebrî, her kesî bi Apê Osman bandikirê. Nemaze xanima hêja Rewşen Bedir-Xan.

Piştî ko Sûriyê ji bin destê sîdariya Ferensa rizgar bû, alîkarî û piştgiriya Kurdan ji xwe re jibîr kirin. Hemû civat û libatên Kurdan hatin qedexe kirin.

Di sala 1949an de, heyama desthilata Husnî Ze'îm, Osman Sebrî hat girtin û di pey re hat surgûnkirin û ew avêtin bajarê (Tudmir)ê; di wê demê de conta leşkerî li desthilata Hisnî Ze'îm rabû û desthilat hate guhertin, bi wê guherînê re jî, Osman Sebrî ji surgûniyê reha bû. Wê hingê, ew vegeriya Şamê û mala xwe barkir nav Kurdên Cizîrê. Li dora du salan li bajarê Dirbêsiyê dibe mamûr di mîra de. Bi biryara wezîrê hundir wî ji kar dûr dixin.

Di sala 1951ê de, li parêzgeha Helebê (Komela rewşenbîrî) hat damezirandin. Endamên wê komelê: Reşîd Hemo, Şewket Henan, Mihemed 'Elî Xoce û Qadir Ibrahîm bûn. Armançên wê belavkirina rewşenbîrî û hestê neteweyî bû. Lê mexabin di wê salê de tev hatin girtin û komele têkçû.

Di sala 1953yan de, Edîb Şîşeklî, Sûriya xist bin rejîmek leşkerî û bû serekomarê welêt. Bi hatina leşkeran zoreke mezin ket ser welat û gelê Sûriyê. Pir dirêj nekir, bi destê hin efseran hate rûxandin, û gelê Sûriyê ji zulm û zora wî hat rehakirin.

Di sala 1953yan de, 'Civata Yekîtiya xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê' hate damezirandin. Damezirênerên civatê jî ev bûn: Mihemedê Mele Ehmed, Samî mele Ehmedê Namî, Evdilezîzê Elî Evdê û Derwêşê mele Silêman.

Hêjayî gotinê ye ko evê Civatê û yên din tevan piştî damezirandina Partî di (1957)an de xwe helkirin.

Di sala 1955an de, li bajarê Şamê li mala nivîskar Osman Sebrî, komela (Vejiîna Çanda Kurdî) (Encûmen) hate damezirandin. Endamên wê: Osman Sebrî, Hemîd Derwêş, Mecîd Hac Derwêş, Mihemed Salih hac Derwêş, Xidir Ferhan Îsa û 'Adil ji çiyayê Kurmênc û Se'ed (Se'do) Îbo bûn. Mexabin evê Komelê salekê dirêj nekir.

Di sala 1956an de, li bajarê Helebê, Komela (Zanistî û alîkariya Kurd) hate damezirandin. Damezirênerên komela Zanistî û Alîkariya Kurd: Dr. Nûrî Dêrsimî, Rewşen Bedirxan, Hesên Hişyar, Osman Efendî û Heyder Mihemed Kinco bûn.



Di sala 1956an de, Apo Osman û Dr. Cemal Nebez bi hev re li ser peydakirina alfabeyeke Latîni ye tekûz xebitîn û bingehên rêzana avakirina korî zanyarî Kurd danîn. Lê mexabin bi çûna mamosta Cemal Nebez dervayî welêt re, ew piroje li şûn ma.

Di sala 1957an de, li bajarê Şamê Komela Xwendekarên Kurd li zangoya Şamê hat damezirandin. Endamên vê komelê ji Kurdên Sûriyê û Iraqê bûn. Diyar e tu lebata wan nebû zû dengê wan vemirî.

Di sala 1957an de, Partiya Azadî li bajarê Qamişlo hate avakirin. Damezirênerên partiyê: Seydayê Cegerxwîn, Mihemedê Fexrî, Mela Şêxmûsê Şêxî û Mela Şêxmûsê Qerqatî bûn.

Ji hêleke din ve, piştî şoreşa Yûlyo (Tîrmeh) 1952yan, li Misrê û hatina serok Cemal Ebdilnasir, û şoreşa 1958an li Îraqê, dengê dozdarên neteweya Ereben neteweperest û nijadperest li herêmê pir bilind bû. Ji encama vî bayê neteweperestiyê û gurbûna nijadperestiya Ereban, Kurdan dest bi tekoşîna neteweyî kirin, û ji bo pêkanîna mafê xwe yê dadmend kar kirin. Hestê neteweyî di nav Kurdên Binxetê de xurtir û geştir dibû, nemaze piştî vegera nemir Barzanî ji Sofyêtê sala 1958-an û pêxistina agirê şoreşa 1961-ê li Başûrê Kurdistanê.

Di Pûşbera (Hezîran) 14 - 6 - 1957an de, Partî hat damezirandin. Di destpêkê de navê Partî: "Partiya Demokrat a Kurdistanê bû, û yekemîn armanca wê ya giring rizgarkirin û yekirina Kurdistanê bû.

Li vê dawiyê, navê Partî hate guhertin û bû (Partî Demokrat ya Kurd li Sûriyê), û ji armanca rizgarkirin û yekirina Kurdistanê hatin xwar. Bi avakirina partiyê re, qonaxeke nû di civaka Kurdên Binxetê de dest pê kir. Her welatparêzekî Kurd, xwe li dora partiyê didît. Endamên komîta navendî ya partiyê ev bûn: Osman Sebrî, Şêx Mihemed Îsa, Hemîd Hec Derwêş, Hemza Niwêran, Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed, Şewket Henan, ... hd.

Rewşa Sûriyê ji sala 1954 - 1958an, berî yekîtiya di navbera herdu hikûmetên Sûriyê û Misrê de çêbibe, gelê Sûriyê di bin siya hikûmeteke niştimanî û perlemanî de, jiyanê xweş di warê siyasî, civakî û wekhevîyê de domand. Lê, dîsa jî gelê Kurd ji hemî mafên xwe bê par bû.

Piştî yekîtiya herdû hikûmetan, û berî her tiştî, demokrasiya heyî û hukmê Perlemanê bi rejîmeke diktator hate guhertin, û biryar bi helandina partiyan hate dayîn. Lê Partiya Demokrat a Kurd û Partiya Qomonîst a Sûrî ew biryara nehêlana partiyan red kirin, û xebata xwe ya nependî berdewam kirin. Roj bi roj rewşa gelên Sûriyê ber bi nebaşiyê ve diçû. Di bin darê zor û setemkariyê de, gelek welatparêz û xebatkar di bin êşkencê de hatin êşandin û kuştin.

Osman Sebrî ji wan girtinan bê par nema, di roja 12. 8. 1960ê de, tevî Dr. Nûredîn Zaza û (31)<sup>9</sup> hevalên xwe tên girtin. Ji zindana Helebê berê wan dan Mezzê li Şamê man ta roja 20. 2. 1962yan. Di vê girtinê de, pir nakokî di navbera girtiyan de derketin holê. Hêja ye ko bi kurtî li ser vê girtinê baxivim:

Dadgeha Parastina Dewletê ya Bilind a Leşkerî, bi serokatiya serbaz Derwîş El-Zûnî û herdû endamên dadgehê serbaz Ednan Raxib û Ebdurehman Xefîr, hate lidarxistin. Nûnerê cihgiriya giştî (dozgeriya giştî) Yasîn Eragîlî bû. Li gorî nerîna dadgehê Osman Sebrî, Dr. Nûredîn Zaza, Reşîd Hemo û hevalên xwe - girtî tev -31- kes bûn - bi gunehê ko ev girtî: (dixwazin perçakî ji erdê Sûriyê qut bikin û bi ser dewleteke biyanî ve ber din) gunehbar in. Ji hêleke din ve, di dadgehê de, li ser rêzan û biryarên partî hate rawestandî, gunehbariya herî giran ji pirsên dadgehê yê li ser rêzan û biryarên partî: (Ev Partî dozdarê avakirina dewleteke Kurdî ye) û ji armanca

---

<sup>9</sup> - Di roja şemiyê 5 – 12 - 1960ê de, li bajarê Şamê - Dadgeha Parastina Dewletê ya Bilind a Leşkerî hat girêdan. Dadgehê li hemberî van girtiyan da'wa vekir: 1-Elreqîb Muhemed Elî Heso ji Qamişlo, 2-Nûredîn Zaza Sebrî ji Dîmeşqê - Ezbekiyê, 3-Reşîd Hemo ji Efrînê, 4-Ebdilmeccid Çaçan ji Qamişlo-Tirbesipî, 5-Osman Sebrî ji Dîmeşiq- Şêx Mihyedîn, 6-Ehmed Henan ji Efrînê,7-Seyid Muhemed Reslan ji Efrînê, 8-Kemal Cemîl ji Efrînê, 9-Umer Mustefa ji Kobanê,10-Hesen Ebdo Osman ji Efrînê,11-Muhemed Ehmed Elehmed ji Qamişlo, 12-Mehmûd Şewket ji Efrînê, 13-Xelîl Umer – leşker e - ji Efrînê, 14-Şewket Husên, 15-Muhemed Elî Ehmed ji Helebê,16-Mustefa Ibrahîm Mustefa ji Kobanê, 17- Umer Ebid Kurdî ji Helebê, 18- Hesen Xelîl Yûsif ji Helebê, 19-Nihai Ce'fer ji Efrînê, 20-Muhemed Xelîl Yûsif ji Qamişlo, 21-Mustefa Hesen ji Efrînê, 22-Muhemed Elî Şêx Osman ji Efrînê, 23-Mehmûd Salih Baqî ji Kobanê, 24-Ehmed mele Ibrahîm ji Kobanê, 25- Ebdulqadir Kurdî ji Dêrikê, 26-Muhemed Samî (...) ji Qamişlo, 27-Ken'an Egîd ji Dêrikê, 28-Newaf Nayif Mustefa ji Qamişlo,29-Ebdullah Salih ji Eyndîwar, 30-Umer Mustefa Ferzat ji Dêrikê,31-Sadiq Muhemed Mîrza ji Qamişlo.

- Cihgirê giştî yê dadgehê di biryara gunehbarkirinê de - doseya wan heft rûpel in - ji her Sêzde girtiyên pêşî re zindankirina timî – muebed - xwest, û ji hejde -18- girtiyên mayîn re di navbera pênc – 5 - salan ta bi bîst – 20 - salan zindankirin xwest.

- li ser vê mijarê ji bo agahiyên pirtir li vê pertûkê vegere: -Ji Toreya Dozê, danhev û amadekirina Dilawerê Zengî û Ehmed Şehab, Elmanya - 2011. Bi zimanê Erebî ye.

wê: (Rizgarkirin û yekirina Kurdistanê ye). Mexabin, ji girtiyan gelek kesan rêzan û biryarên Partî neparastin û xwedî lê derneketin. Lê, Osman Sebrî li ber dadgerê dadgehê mîna lehengan rêzan û biryarên partî tev parastin, û wekî parêzerekî serbilind bê şîvîşk û bivac qirên û gelş di dadgehê de kir, û ji armanc û biryarên Partî û ji hebûna Kurd û Kurdistanê nehat xwar. Digel ko ew bi xwe ne bi wergirtin û hildana wan biryarên Partî re bû, digot: (Dema rêzan û biryarên Partî hatin danîn ez ne bi van dîtî û biryaran re bûm, sîmbol û biryarên me hilgirtine ji gewdê me bi gelekî mezintir in, em nikarin dibin de rabin. Lê hevalan weha xwest. Li ber dadgehê, heyfe, li gotinên xwe xwedî derneketin. Digel ko ne baweriyên min bûn, lê, dîsa min ew parastin). Bi gotina hemû hevalên wî, apê Osman bi tena xwe, di dadgehê de, li rêzan û biryarên Partî xwedî derket, nemaze xwedî li her sê herêmên Kurdî (Cizîr, Kobanê û Efrîn)ê wek perçên Kurdistanê parastin. Ji hêla têkiliyên Partî bi derveyî welêt re, dadgerê dadgehê jê pirsî:

- Hûn şaxek in ji Partiya Demoqrat bi serokatiya Barzanî ya li Îraqê?!

-Na, em partiyek serbixwe ne.

-Tu wan çawa dibînî?.

- Xwedê hêz û xweşiyê bide wan.

Ji ber vê mêraniyê O. Sebrî du salan tê girtin û ji hevalên xwe tevan pirtir tê zindankirin.

Di destpêka meha Sibata sala 1962yan, Partî (Partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê) konfiransa xwe ya pêşîn li bajarê Şamê girêda. Osman Sebrî li vê konfiransê beşdar nabe; ji ber ko girtiyê zindanê bû.

Di destpêka sala 1963yan de, konfiransa diwemîn li bajarê Qamişlo bê beşdariya apê Osman tê girêdan, ji ber ko apo ji ber hukûmetê xwe dabû alî, çûbû Libnanê. Di vê konfiransê de, wek endamê komîta navendî tê hilibijartin.

Di sala 1964an de, konfiransa siyemîn li gundê (Cima'ayê) bê beşdariya Osman Sebrî tê girêdan. Ji ber ko careke din ew û hinek hevalên xwe û kurê xwe Hoşeng di 23 – 5 - 1964an de, li Helebê hatin girtin, û di zindanê de mane ta bi dawiya sala 1965an.

Di 5 – 8 - 1965an de, Partî konfiransa xwe li gundê (Cima'ayê) bi beşdariya endamên herêman, endamên şaxan û nûnerên komikan girê dide. Ûştê girêdana vê konfiransê çareserkirina nakokî û aloziyên di nav partiyê de bû.

Lê mexabin ev konfirans bû bingeha perçebûna Partî û maka avakirina Partiyêke nuh ku bi navê partiya Çep a Kurdî hat naskirin. Careke din, ji ber girtin û zindanê, Apê Osman beşdarî vê civatê nabe, lê ew hemû biryar û pêşinyarên konfiransê erê dike.

Di sala 1966an de, li Qamişlo - gundê Hilêliyê, bi serokatiya Apo Osman partiya çep kongirê xwe yê yekemîn girêda. Piştî karûbarê kongir bi dawî hat, Apê Osman berê xwe dide bajarê Şamê. Lê, li devê rê, û berî bigihê bajarê Helebê tê girtin.

Di sala 1968an de, Partiya Çep konfiransa xwe ya diwemîn li bajarê Amûdê bi serokatiya Apê Osman girêdide. Lê, mexabin, di hundirê konfirans de, pir nakokî di navbera Apê Osman û hin endamên rêvebir de diyar dibin. Piştî demeke pir kin - destpêka sala 1969an e - Apê Osman li mala xwe rûdine û nema tu karê partîtiyê dike.

Di sala 1969an de, dadgeha dewletê biryar bi du salan Osman Sebrî bê zindankirin da. Lê wî xwe nespant destê wan, û di 4/6/1969an de, berê xwe da Serxetê. Piştî du-sê mehan vedigere. Li vegeerê tê girtin, di zindana (Qel'e) de li Şamê dimîne ta sala 1973yan.

Her ku di çû nakokî di navbera herdû partiyan (Çep û Rast) de germtir dibûn. Heta nemir Barzanî bixwe nikarîbû ew birîn derman bikira, û ji kongirê (Nawberdan), ji dêvla yekirina herdu partiyan, yeke sisiyan sala 1970yî, di bin navê "Partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê – Elpartî" de hate damezirandin<sup>10</sup>.

Bêdiro, Osman Sebrî bi derd û kovan, xweşî û nexweşî, paşketin û pêşveçûna gelê xwe re dijiya. Radestî li ber narvînê nekiryê, û xwe dîlê hêvî û lavlavan nedîtiye. Lewra digot: "jîn berxwedan e". Ango, ûştê azadî û xoybûnê zor e. Zor nebe setem naçe. Bi lavlavan mirov nagihê armanca xwe. Belê, bi baweriya "tekoşîn şana hebûnê ye" bawermend bû, ji neçarî piştî xwe da xebata ramyarî û bi dilekî kuldar û xemgîn, bi hêvî û gumana ko rojekê ji rojan wê roja azadî û serxwebûna Kurdistanê hilê. Lê, sed heyf û mexabin, tim û tim ji Kurdên xiniz, guhbel, nandoz, ezezîperest û nokeran piştikul bû. Di vî warî de digot: "diyar e, em Kurd bi xwe nikarin Kurdistanê çêkin, di demekê de, wê hinek Kurdistanê ji me re ava kin. Lê, tirsî min ew e ko ew Kurdistan bi destê Kurdan xera bibe".

---

<sup>10</sup> -Di sala 1972yan de, konfiransê xwe yê yekemîn girêdan.

Di sala 1971ê de, hukûmeta Sûriyê nasnameyê jê dikşîne; û her jiyana xwe tev di bin çavdêriya dewletê de derbas kir. Ji vê qonaxê û pê de mala apê Osman li bajarê Şamê - taxa Kurdan dibe mîna dibistana perwerdekirina Kurdayetî û fêkirina zimanê Kurdî. Gelek xortên Kurdan ji vê dibistanê hînî Kurdayetî û rastnivîsandin û rastxwendina zimanê Kurdî bûn. Ji hêleke din ve, bandora wî di warê rewşa civakî de li Kurdên taxê baş diyar bû. Gelek aloziyên civakî çareser dikirin; û bi saya serê wî Kurdên Şamê navên Kurdî li zarokên xwe dikirin. Ew cihê bawerî û rêzgirtinê bû. Deriyê mala wî ji her kesî re vekirî bû.

Bi şanazî dibêjim: Ez yek ji wan xortên ko li ber destê wî hînî nivîsandina serbest û serwextî gelek tiştan bûm.

Di roja 11 – 10 – 1993yan de, li bajarê Şamê - taxa Kurdan koça dawî kir, û li Cizîrê – Berkevîrê, hate veşartin. Hezar mihder li giyanê wî û hemû welatparêzan bibarin û cihê wan buhişt be.

Hêjayî gotinê ye, di 09. 01. 1998an de, sêminerek ji aliyê hin wêjevan, rojnamevan, rewşenbîr û nivîskarên Kurd ve, li mala nemir Osman Sebrî, li bajarê Şamê pêk hat, daku bûyera buhartina 93ê salan di ser roja bûyîna Osman Sebrî re, careke din were pîrozkirin, û avakirina şêwazekî rûmetiyê ji bo kesayetiya Osman Sebrî bête gotûbêjkirin. Pêşniyaza damezirandina xelatekê bi navê nemir (Xelata Osman Sebrî) hat kirin. Ev pêşniyaz ji hemû beşdaran û rêvebirên şevînê hate pejirandin. Ev xelat dê her sê salan carekê ji bo kesekî ne Kurd were pêşkêşkirin, yê ko xizmet û xebatên hêja û giring ji bo gelê Kurd, di warê zimên, wêje, dîrok, huner, şaristanî, polîtîk yan mirovatiyê de kirine.

Xelata me perçeyek zêr e, wêneya nemir Osman Sebrî û sîmbolek (Xelata Osman Sebrî ji bo dostaniya gelan) li ser e.

-Di 21. 07. 2000ê de, xelata xwe ya pêşî li bajarê Enqera me pêşkêşî Civatnasê navdar Dr. Isma'îl Beşikçi kir.

-Di sala 2004an de, xelata diwemîn me pêşkêşî dosta Kurdan Danyal Miteran li Parîsê kir.

-Di sala 2009an de, xelata siyemîn me pêşkêşî dostê Kurdan Dr. Munzir El-Fedil li Siwêdê kir.

### **Osman Sebrî wek nivîskar, helbestvan û wergêr:**

Bêgoman, rêjîmên şovenîst û dagîrkerên zordar, digel talankirina dewlemendiya serxak û binxakiya welatê me, bi setemkariyeke mezin êrîşî ser ziman, tore, û folklorê Kurdî dikin. Êrîşî ser dîroka şaristaniya hebûna wî dikin. Lê, herwekî xuya ye, ev armanc û mebesta wan heta niha neçûye serî, û di dilê wan de bûye xem û kuleke mezin. Ji bo em ji bin destên van rêjîmên şovenîst û setemkar derkevin, bi sedan serhildan, raperîn, şoreş û berxwedanên bi rûmet me dane; bê hejmar law û keçên xwe di vê riyê de gorî kirine. Ev şer, di warê parastina ziman, tore, û pêmayên Kurdî de jî, bi dijwarî dom dike, û roj bi roj, gûrtir û xurtir dibe. Ronakbîr, zimanzan, nivîskar, helbestvan û hozanên Kurd yên bi rûmet di nava vî şerê ha de, cihekî taybet digrin. Xebat û têkoşîneke giranbiha didin. Pêwîst e, ku em vê xebat û tekoşîna hêja û giranbiha kêmbûnê, û di vî beşê şerê tevgêra rizgarîxwaziya gelê Kurd de, wan tenê nehêlin û ne zindîkuj û mirîperest bin.

Di nav Kurdên Kurdistanê Rojava de, û bi taybetî piştî qonaxa xebata malbata Bedirxaniyan, rûpeleke nuh di dîroka toreya Kurdî de dest pê bûye. Ew dîrok, bi çapkirin û weşana herdû kovaran [Hawar (1932-1943) û Ronahî (1942-1945)an], dest pê bûye. Ev qonax, qonaxê zêrîn û pir dewlemend e. Li ser destê Celadet Bedir-Xan û Dr. Kamîran Bedir-Xan, û bi saya serê wan, gelek rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên mîna Osman Sebrî, Qedrî Can, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, Ehmed Namî, Hesên Hîşyar ... h.w.d, di wêjeya Kurdî de hatin diyarkirin, û wêjeyê nuhkirî, nuhbûyî û nûjen bi xwe re vejandin.

Wêje mîna hemû heyînan û hebûnên mirovatiyê ye. Teqez afirandina mirov e. Azîna û rêzaniya xwe ji kûrahiya jiyane werdigire. Hunerên wêjeyê haydar in bi can û bi rewan in, bi tevna sawêr, hest, sewdan û ramanên mirov ve divarqilin û lê dihingivin. Çi karê wêjeyê bi nivîsîna gotinê dest pê dibe û xêzik û rêzikan jiber dike. Karê wêjeyê ev e: Hunermandan hînî afirandinê

bike; bê çawa ji karê xwe hunereke bêhempa û ferzende bihûne ... wêje razek ji razên qeşengî û sipehîbûna hunermendê xwedî berhem e.

Dîroka wêjeyê bi dîroka zanîn û têgihîştina mirov ve girêdayî ye. Pêşketina miletan bi pêşveçûna wêjeyê ve girêdayî ye. Bêdiro, wêje çekek ji bo guhertina civakan, çêkirina mirovan û rewşa civatê ye.

Bêguman, Osman Sebrî xwediye van baweriyên e, ji dibistana wêjeya jîwerî ye. Hemû berhemên wî helbest, çîrok û gotar vê gotina me piştrast dikin, naveroka hemû nivîsandinên wî li ser tekoşîn û gelparêziya Kurdî ye, û di cîhana wêjeya jîwerî de digerin.

Berî her tiştî, Apê Osman pir ji zimanê xwe - zimanê Kurdî - hez dikir. Xwediye şeweyekî serbixwe bû. Mamosteyekî rewanbêj û hoste bû. Bi wî zimanî derd û kulên xwe, hest û ahînen xwe diyar dikirin. Bi ziman û toreya Kurdî serbilind bû. Ji qelsbûn û çilmisandina zimanê Kurdî pir ditirsiya. Gelekî bala xwe dida rastnivîsandina zimanê Kurdî, ew diparast û wek kelepûra bav û kalan, di raman û kesayetî û derûna Kurdî de pêş ve dibir. Bi Celadet Bedir-Xan re, di danîna Elfebeya Kurdî - Latînî de beşdar bû, ya ko di hemû berhemên xwe de bikar anîbû. Lê di danîna elfabeya Kurdî - Latînî de, xwedî pêşniyar û nerîn bû. Li gorî nerîna wî, elfabeya Celadet pênc tîp jê kêr in. ango tîpa ('p','ç','t','k','r) ku di dengvedanê de hene, lê çima di elfebeyê de nîn in!. Lewra ewî elfabeya Tekûz weşand. Lê tevaya berhemên xwe li ser rêzana elfabeya mîr Celadet weşandine.

Osman Sebrî xwe pasevanê zimanê Kurdî dibîne, û tiliyên xwe li ser hin birîn û aloziyên nivîskaran datîne. Ji ber vê berpirsiyariya dîrokî, dîtina xwe li ser wan kesên ko xwe di ser zimanê Kurdî re dibînin, û bi qurnazî zimanê biyanî diparêzin û bi zimanê Kurdî naxwînin û naxwazin bixwînin. Di ser re jî, tew xwe wek xebatkar û zanayê doza Kurdî dibînin. Lê, ew qet ji wan bawer nake. Gotiye:

“Ziman zimanê me gişikane?! Ne yê yekî an yê didiwane, gava ku em ji bo zimanê xwe bi xebitin em qencyê bi xwe dikin. Lê heyfa yê ku heyfa niha bi ziman mijûl dibin gelekî kêr in”. (Em miletekî bê ziman in. Anha pir xortên

me hene xwendane, bi Erebi jî xweş dizanin, dibêjin: (Em dê ji miletê xwe re xizmetê bikin..). Lê mixabin hînî zimanê xwe nabin, û ezê dê çawa ji wan bawer bikim...?!).

Li vir diyar dibe ko Osman Sebrî xwediyê wê nerîna ye ko dibêje: Ziman ûştê nasnameya her wêjeyekê ye. Ango, ziman nasnameya miletan e. bingeha vê nerînê ev e: Berî her tiştî Kurd bin, bi Kurdî bixwînin, bi Kurdî biramin, bi Kurdî binivîsînin, bi Kurdî bijîn û bi Kurdî bimrin.

Osman Sebrî bi herdû awayên helbestê (serbest û kevneşop) nivîsandiye. Nivîsên wî yên helbestî, wek di (Bahoz) de jî diyar e, hezkirina welêt û rizgariya Kurdistanê nîşan didin. Di derya helbesta nuhbûn û nûjeniyê de melevanî kirye. Mîna: Wefda Kurdî, Bang, Ho xort, Jan û Bersiva Hoşeng ... hwd. Ji hêleke din ve, pir dilê wî bi helbesta kevneşop ve girêdayî ye, helbestên xwe bi kêş û bare dihûne û bi kok û rehên wê yên resen ve girê dide, û ji êmîş û kaniyên welatê xwe vedixwe. Bi taybetî ji derya melayê Cizîrî – mîrê helbesta Kurdî - û Ehmedê Xanî - bavê ramana neteweya Kurd - vexwariye. Gelo, çawa û kengî Apo Osman dest bi helbestê kirye? De em bi hev re guhdarî li gotina wî bikin: "Piştî hinekî mezin bûm mældariya şîrê li nik min çar bû, û min gelek şîr jiber kirin. Lê mixabin ku ji dîwana Melayê Cizîrî û Mem û Zîna Ehmedê Xanî pêva şîrên Kurdî li nik me tunebûn, ji ber vê yekê min şîrên Tirkî yên siyasî dixwendin. Bi şopa ku wan şîr û çîrokan di canê min da hiştibûn bi hêsanî berê min ketibû rê ya têkoşîn û gelparêziyê. Bi vê baweriyê tevî ku ne şair bûm, min berî da nivîsandina şîrê."

Osman Sebrî, li ser helbestvaniya xwe weha dibêje: "Qet tu caran nedifikirîm ku helbestên xwe berhev bikim û bikime dîwan. Ji ber ku berî her tiştî ez xwe helbestvan nabînim. Lê, tiştên ez dinivîsim dema ku ji aliyê mirovên welatparêz û şoreşger ve tînin xwendin, kêfa min tê û ez dilxweş dibim. Ji bo vê sedemê jî dem û dem ez helbestan dinivîsînim. Heger helbest û çîrok ji bo hişyarbûna gel bînin nivîsîn, dê cîyê xwe di tevgera rizgarîxwaz a demokratîk de bigirin, û dê rola xwe ya pêşketî bilîzin. Min jî hewl da ku ev rol bête lîstin hemî berhemên xwe nivîsîne."



Gelek helbestên Osman Sebrî, bi terzekî marş, xweşxwan û bi awayê şoreşgerî hatine nivîsîn, û ji aliyê gelek hunermendan ve jî hatine gotin. Mîna: Ala rengîn, Marşa felatê, Marşa xortan ... hwd.

Ji hêleke din ve, ewî zarok û mendalên Kurdan jibîr nekirine û ji bo wan çend helbestên bedew afirandine. Mîna: Siyamend, Lewend û Tavîn..

O. Sebrî rexinê li pîrnivîsandina helbestan li nik nivîskarên zimanê Kurdî digire; bê çawa pîraniya nivîskarên Kurd dest bi nivîsandina helbestê kirine, û dûrî nivîsandina Kurdî ya serbest mane. Digot: “Gelek ji xortên me çavê xwe berdane nivîsandina helbestan, ev ne tiştê hêja ye, divê nivîsên rastesere – pexşan - bêne nivîsandin. Belê, helbest tiştê ji edebê ye, lê ne tevaya edebê ye. Di vê ku mirov bizanibe bi zimanê xwe binivîsîne, lê nizanim hemû ji min re helbestan çêdikin...”.

Osman Sebrî, ji bilî helbest û çîrokan, gotarên siyasî jî nivîsandine. Gotarên wî di kovara 'Hawar'ê de rêzên (Derdê me) çareserkirina pîrsgirêkên civaka Kurdî diyar dikin. Lê, gotarên wî yê herî bilind wek gotarên li ser nêçîrê, çiyayên Sasûnê, Agirî, Mirdêsan, rola jinan û sincî, ... hwd, bi awayekî dewlemend û pir bi nirx hatine nivîsandin. Osman Sebrî di bin bandora wêjeya jîwerî de maye, û li ser wê şopê berhemên xwe şopandine, ewî gotiye: “Şîr û çîrok heke bi awayê rênasî bîn nivîsîn dikarin rûmeta têkoşîn û gelparêziyê di peyayên xurt û hêja da vejînim).

“Tomas Biwa gotibû: ko Osman Sebrî bi ristik û çîrokên zaravayên kurmancî yek ji pêştirîn û zanatirîn nivîskaran e”.

Çîrokên wî yê kurt wek di (Çar Leheng) de, qehremaniya Kurdan û berxwedana wan li Kurdistanê ji bo azadiyê didin xuyakirin. Helbest û çîrokên wî li ser dehbeyan, hemû serpêhatî û huner in, yê ku di nav cemawerê Kurd de ji nîşekî derbasî nîşekî din bûne. Mîna: Dîk û rovî, Gurê pîr, Roviye jîr, Tevdîra mişkan, Roviye ker, Quling û Serê şêr...

Osman Sebrî xwe nivîskarê çîroka kurt, ne ya dirêj dibîne, û bandûra nivîsandina çîrokê kengî û çawa lê diyar kirye, ewî bixwe gotiye:

“Di biçûkaniya xwe de min ji çîrokan hez dikir. Çîrokbêjek li kû bûya min dişande pê tanî, an diçûm nik wî ji bo guhdariya çîrokên wî bikim, nemaze çîrokên lehengan ên efsaneyî. Herçî çîroka kurt hinekî bi min re derdikeve, lê a dirêj ez ne peyayê wê me. Rojekê ji rojan nehatiye bîra min ku bikaribim bi karek holê hêja rabim.”

Wêjenasê Kurd Prof. Qenatê Kurdo, di kitêba xwe ya Tarîxa Edebiyata Kurdî de, Osman Sebrî, weha dide naskirin: "Li paş Cegerxwîn şêrê serê çiyayê Kurda yê duwemîn Osman Sebrî ye. Di rewşenbîrkerin û şerê xwenaskirina Kurdan de, gelek roj û salên giran li pêşiya wî mêmî bûne. Lê ew îş û karê xwe de ji riya xwe venegeriyaye, xebitiye, şer kiriye, bo xatirê serxwebûn û azadiya neteweyê Kurd."

Osman Sebrî giringî û pêwîstiya karê wergerandinê mîna Celadet Bedir-Xan, Qedrî Can, Kamîran Bedir-Xan û Nûredîn Zaza haydar dibe, û bi wergerandina her karekî re armançek temîz û bilind dibîne. Armanca wî ya sereke ew e ku sûde ji çanda milletên din bê dîtîn, zimanê milletê Kurd pê zengîn û dewlemend bibe. Ez bawer im bê çiqas ew bi zimanê Kurdî zîrek û têgihîştî bû, wehareng e di zimanê Erebi de jî xurt bû. Lê qet carekê jî bi zimanê Erebi nenivîsî ye.

Ewî çend berhemên hêja ji zimanê Erebi wergerandine zimanê Kurdî, û di kovarên (Hawar û Ronahî)yê de belav kirine, mîna: Tarîxa Kurd û Kurdistan, Dîroka jîna Napilyon, Ezdî û Ola wan û Dîroka Jîna Selah Eldîn ...

Bi tevayî berhemên wî yên di kovarên Hawar, Ronahî û rojnameya Roja Nû de hatine belavkirin ev in: 40 gotar, 19 wergerandin û 17 helbest in.

### **Berhemên Apo Osman Sebrî yên çapbûyî ev in:**

-Elfebeya Kurdî: Di sala 1954an de.

-Bahoz: Di sala 1956an de.

-Derdên Me: Di sala 1956an de.

-Elfebeya Tekûz: Di sala 1982yan de.

-Çar Leheng: Di sala 1984an de.

-Bersiva Hoşeng

-Di sala 1981ê de, li almaniya komek helbestên wî ji rex buhiştî Hemereş Reşo ve hatine çapkirin û belavkirin.

-Di sala 1998an de, li Istenbolê komek ji helbestên wî ji alî A. Balî ve hatine çapkirin û belavkirin.

-Şerê Sasonê di sala 2005an de, ji alî min ve hatiye komkirin, çapkirin û belavkirin.

-Bîranînên Osman Sebrî ji alî min ve bi herdû zimanan – Kurdî /2005 û Erebî /2001- hatiye komkirin, çapkirin û belavkirin.

-Romana Dê, ya M. Xorkî ji zimanê Erebî wergerandiye zimanê Kurdî. Lê mexabin, bi dawî naniye. Destnivîsa wê li nik min heye.

### **Serencam:**

Bêgûman, heyvanê mêranî û zanebûnê bi hev re di mirovekî de li hev nagerin û ne tînin meyandin. Rêzgirtin û mezinahiya nemir Osman Sebrî ji ber van herdû xalan tê. Ne tenê navekî di meydana têkoşîn, xebat û şer û cengan de geş û navdar e. Belê, mirovekî zana, rewşenbîr û nivîskarekî gewre ye. Ango, ne mirovekî normal e.

Navê wî bi qonaxeke pir giring ji dîroka gelê me ve hatiye girêdan.

Ji dema raperîn û serhildanan ta bi dema rûxandin û şikestinan dirêj dike. Di dema ko li seranserî Kurdistanê 'ewrên reş û tarî, kuştin, talankirin û herifandina hêviyên Kurdan bû. Ew qet cangiran û bêhêvî nebû, di hilgirtina ramana şoreşgerî û bawerîya bi çek û bi tekoşînê bawer bû. Çewa xebatkarekî bi çelengî, mêranî, lehengî û serbilindiyê ve hatiye nasîn, wehareng e di meydana rewşenbîrî, ziman û dîrokê de jî bejinbilind bû. Dema hilgirtina çek pê re nebû heval, û gelek hevalên wî xinizî û radestî kirin û piştî xwe dane

xebatê, ewî dest avête pêûsê û mîna çekekê li hemberî dijminê gelê xwe bikar anî. Bi çekê zanînê bandûreke mezin li civaka gelê xwe kir û bi roleke sereke di hişyariya hestê neteweyî li nik Kurdan rabû. Bi Ramanêke azad û baweriyeke xurt tirseke mezin di dilê dijminê gelê xwe de çand. Ji ber vê rastiya xwe li nik mirovên pergîr û kêsbaz bi mirovekî tundar dihat naskirin.

Di her qonaxekê de lehengek, an zanayekî gewre ji nava miletekî der tê. Apê Osmên leheng û zanayê dema xwe bû. Di meydana rewşenbîriyê de ronakbîr û torevanê gelê xwe bû. Di xebatê de mirovekî rastgo û xwediyê peyva xwe bû. Tekoşerekî sondxwarî bû. Qet radestî û serşûrî di ferhenga jiyana wî de nebû. Di jiyana xwe de, hertişt gorî û qurbanî Kurdayetiyê dikir. Zanyariya xebata wî di van çend gotinan de tê ravekirin; (Herçî bi zorê hat standin, bi zorê tê veğerandin). Jiyanêke serbilind, û mirineke bi rûmet dixwest. Wî digot: “Serê ko bête danîn, tucar nayê hildan”, “Bi qelsî kes nebûye xwedî rûmet û şan”. Di vê meydanê de, ew xebatkarê yekane yê bê hempa bû. Wî digot: “Xebatkarê rast, divê ji sê tiştan netirse: ji birçîbûnê, ji zindanê, û ji mirinê”.

#### **Çavkanî û jêder:**

- Bîranînên Osman Sebrî**, bi zimanê Erebi, komkirin û wergerandina: Dilawerê Zengî û Horemê Yezdî, pêşgotina: Mele Dawidê Zeynê 2001. Libnan. Çapxana Emîral.
- Bîranînên Osman Sebrî**. Komkirin û amadekirina Dilawerê Zengî, Beyrût-2005. Bi zimanê Kurdî, çapxaneya Emîral.
- Ji Toreya Dozê**, danhev û amadekirina Dilawerê Zengî û Ehmed Şehab. Elmanya: 2011. Bi zimanê Erebi ye. Çapek taybet.
- Bînahî**, Dilawerê Zengî. Beyrût-2011. Bi zimanê Kurdî ye. Çapxaneya Emîral.
- Dîtin û hevrû yên min ên taybet bi nemir Osman Sebrî re. Naskirina min pê re ji (1983-1993) dirêj kirye.
- Dîwana Osman Sebrî**. Berhevkar: A. Balî. Stenbol-2004. Weşanxana: Pêrî.
- Kovara Hêvî**, hejmara 7an, sala-1990 / Parîs.
- Têbînî**: Ev agahî ji ber pirtûka min ya bi navê (Osman Sebrî –Jiyan, Tekoşîn û Berhem), Qamişlo, 2012, hatiye wergirtin.



## Pîr Rustem

Di dîroka 4. 3. 1963yan de, tê jiyane û heft salên xwe yê pêşîn li gundê Çeqela, li herêma Efrînê diborîne û ji bo jiyaneke çêtir, bavê wî mala xwe bar dîke bajarokê Cindirêsê. Pîr tevî heval û jiyaneke nuh dibe, û ev yeka dê bandoreke fireh bigihîne pisîkolojiya wî ku, ew kesekî goşegîr be.

Li bajarokê Cindirêsê xwendina xwe ya sereta û navçe jî kuta dîke; ji bo xwendina xwe bibe serî û bibe xwendekarê Zanîngehê berê xwe da bajarê Helebê. Lê, ji berî ku ew xwendina xwe kuta bike û di rêza çaran de, û ji ber hin sedemên konevanî û guhdana wî ya bi çalakiyên çandî û rewşenbîriya Kurdî, dev ji xwendina endezyariyê berdide û dest bi çalakiyên xwe yê wêjeyî dîke. Di wê demê de, ew vedigere bajarokê Cindirêsê û heya bi sala 2013an li wir cîwar dibe.

Cara pêşî, di Kovara Stêr - hejmara 17an, sala 1990î de, çîrokek bi navê "Bîrkirin" belav dîke. Di wê çîrokê de, êş û derdên lehengê xwe, çî ji rewşa civakî be yan jî ji aliyê rêjîm û destlatdaran be, bi şeweyekî tinazî tîne zimên. Lê ji berî weşandina evê çêroka han jî, wî hineke çêrokên din bi zimanê Erebi nivîsandibûn, lê ew neweşandin. Piştî çar pirtûkên çîrokan, û piştî demeke dirêj ji westandina di warê çîrokê de, ew hinekî ji evî celebê wêje bidûr dîkeve, û li dora sê sal û nîvan xwe hinekî bi karên rojnemeyaniyê û nivîsandina hin babetên li ser bîr û baweriyên Ola Islamê mijûl dîke. Pirtûkekê li ser zor û sîtema Misilmanan li yê din dikirin, ji evê guhdana xwe derkeve. Lê wî di evan deman de jî karîbû romana xwe ya ku, ji zûde nivîsandibû, careke din lê vegere û wê sipî bike.

Piştî çar pirtûkên wî yên çîrokan, romanek û sê pirûkên dîtir di cureyên cudacuda, li ser zora Misilmanan û yeke dîtir li ser zargotina Efrîn, û ya dawî jî weke gotarên siyasî nivisand. Di destpêka sedsala nuh de, berê xwe da nivîsandina konevanî bi zimanê Erebi; û bi sedema wê yekê, û bi serde ji ber kar û çalakiyên xwe yên siyasî weke endamekî di bîlotbîroya Partiya Demokrata Kurdî li Sûriyê û şandeya wan yê Helebê yê di Banga Şamê de - إعلان دمشق - bû. Ji ber van çalakiyan ji aliyê rêjîma Sûriyê ve ne cihê aramiyê bû. Ji neçarî li dora du salan xwe da alî û di sala 2013 de, ji Sûriyê derket û li welatê Siwêsrâ bicih dibe. Ma em ji were bêjin ka pirtûkên wî yên heya nuha hatine çapkirin û belavkirin, çine. Lê ji berê evê yekê jî wî gelek çîrok, gotar û lêkolînên xwe di kovar, rojname û malperên Kurdî û Erebi de belavkirine, mîna: Stêr, Zanîn, Pirs, Aso, Peyv, Azadiya Welat, Jiyana Rewşen, Armanc, Pênûs, Newroz, Avêsta, Deng û malperên mîna: Amûdê, Efrîn, Pena Kurd, Mehnane, Peyamnêr, Roja Nû, Qamişlo û Kobanî, û gelk yên Erebi û bi taybet الحوار المتمدن .. û hwd.

#### **Pirtûkên wî jî ev in:**

- 1- Çivîkên Beravêtî, çêrok 1992 Bêrût, ji weşanên Kovara Aso.
- 2- Pilindir, çêrok 1993 Bêrût, ji weşanên Kovara Aso.
- 3- Pûtvan, çêrok 1998, ji weşanên Merx.
- 4- Tîrav, çêrok 2002 Duhok, ji weşanên Sipîrêz. Û careke din ev herçar pirtûkên çîrokan bi hev re di hundirê pirtûkekê de, bi navê; Çêrokên Pîr Rustem, li welatê Almaniya hatine çapkirin
- 5- Zarotiya NEYNIKEKÊ; roman e. Hin li Rojava ji aliyê Weşanxaneyê Şilêr ve, û hin jî ji aliyê SerSera li Almaniya hatiye çapkirin
- 6- Mihemed HENÎFÎ û gurzek dîtir ji zargotina Efrînê; ji aliyê weşana SerSera li Almaniya hatiye çapkirin.
- 7- ÇANDA TIRSÊ Û IMPERETORIYA XWÎNÊ; ew jî ji aliyê SerSera ve hatiye çapkirin

8- المسألة الكردية ومشروع الأمة الديمقراطية؛ طبع ونشر في روزآفا بقامشلو من قبل هيئة الثقافة في الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا

10-الأحزاب الكردية والصراعات القبلية؛ طبع ونشر في روزآفا بقامشلو من قبل هيئة الثقافة في الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا

**Pirtûkên bi riya malperên êlêktironî jî hatine belavkirin jî ev in:**

1- مجموعة مقالات باللغة الكردية (CERG Û GOTIN) -1

2-هفبرات؛ حوارات أجريت مع الكاتب باللغتين الكردية والعربية .

3-القضية الكردية في الخطاب العربي؛ مجموعة مقالات يتم فيه الرد على عدد من الكتاب والباحثين العرب الذين تناولوا القضية الكردية.

4-القضية الكردية/ آفاق وأزمات ( مجموعة مقالات فكرية) .

5-الكورد في المعادلات السياسية.

6-"المجتمع المدني .. بين المخاض والولادات القسرية" وهي مجموعة مقالات تتناول الشأن السوري عموماً وعقلية الدولة الأمنية وإنعكاساتها على المجتمع والشأن الكوردي على وجه الخصوص .

7-"سيرة جدار .. يومياتي على الفيسبوك"، الكتاب يضم للوقت الراهن ثماني أجزاء وهي عبارة عن يوميات الكاتب على صفحته وجداره الفيسبوكي حيث قام بجمع ما دون عليه أغلب همومه وذكرياته وأفكاره في مختلف المواضيع والقضايا السياسية التي تخص شعبنا وبحسب التسلسل التاريخي لكتابتها، مما يعطي العمل نوع من السيرة الذاتية والتوثيق للأحداث والمواضيع والقضايا المختلفة .

8-كردستان مستعبدة دولية

9-سجلات فكرية

10-سقوط الوهم (نهاية حقبة الديكتاتوريات)

11-آراء وقضاء (تصاريح - حوارات - مقابلات)

12-كلمات.. في الدين والدولة (صلاح الدين والدولة الأيوبية أم الكردية)

13-الكرد وخارطة الصراعات الإقليمية؛ نصوص ومقالات

14-عفرين نجمة في سماء كردستان وسضم جزأين؛ الأول دراسة بحثية تعرف بعفرين وجغرافيتها وتاريخها وأوابدها وعشائرها وعائلاتها.. أما الجزء الثاني فهو تعريف بشخصياتها وفي مختلف مناحي الحياة السياسية والثقافية والدينية والفنية.



## Qadir Egîd

Di sala 1973yan de, li bajarê Amûdê jidayik bûye. Xwendina amadeyî û navîn li dibistanên bajarê Amûdê biserî kiriye. Lîse di sala 1991ê de, ji dibistana Elme`erî wergirtiye.

-Di sala 1994an de, ji peymangeha amadekirina mamosteyan /Mamosteyê refê / Derçûye, û piştî xizmeta 30 salî di warê perwerdeyê de, ji kar hatiye dûrxistin. Derçûyê zanîngeha Rojava, beşê ziman û wêjeya Kurdî ye.

- Di sala 2019an de, weke mamosteyekî alîkar li zanîngeha Rojava maye.

- Ji sala 1995an de, bi Kurdî dinivîse. Çîroknivîs, ragihêner, perwerdekar û wergêr e.

- Ji sala 2000an de, bi hindek werger, lêkolînên ziman, û xwendina di berhemen nûçapbûyî de, dest bi nivîsîna ji malperên Kurdî û Erebi re kir.

- Di sala 2013an de, beşdarî damezirandina saziya Nûdem a ragihandinê (Malper û rojname) bû, ku tê de cîgirê serokê encumena rêvebir û sernivîser bû.

- Di dawiya sala 2014an de, beşdarî damezirandina saziyeke ragihandinê nû bi navê Bûyer (malper Kurdî û Erebi, rojname, û radio) bû. Û ji destpêka damezirandinê ta 2019an birêvebirê cîbicîkar û sernivîser e.



- Di piraniya hemleyê (QSD)ê de, mîna nûçegehaneke şer beşdar bû û hemû şerên di navbera Asayîş û hêzên rejîmê li Qamişlo û Hîsiça rû dane romal kiriye.

- Sê bername pêşkêş dikirin: Rojnamegeriya Kurdî/ 15 xelek – Wêjename /60 xelek – Şopa helbestê/ 10 xelek. Herweha bêtir ji 150 hevpeyvînên siyasî û rewşenbîrî jibo rojnameyê kirine.

- Di sala 2018an de, xelata yekem ya *pêncemîn festîvala* çîroka Kurdî li Rojavayê Kurdistanê wergirt. Di heman salê de, xelata duyem ya festîvala çîrokê li Mexmûrê wergirt. Endamê komîta amadekar ya pêşangeha pirtûkê ya şehîd Herekol e.

- Du dewreya li ser hev weke Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê hatiye hilbijartin, û hîn li ser karê xwe ye.

#### **Ji Berhemên çapkirî:**

1- Gureke Bendepêz/ Derhênerê Iranî Ebas Kiyarustemî/ 300 wêneyên helbestî/ Werger.

2- Di sala 2008an de, pirtûka wî ya bi navê Agirê Sînema Amûdê / werger / ji Kurdî, Ji hêla saziya Sema ya çandî li Dubey hate çapkirin.

3- Di sala 2013an de, pirtûka bi navê "Jin Di Folklorê Kurdî de /lêkolîn-werger ji Kurdî/ Ji hêla Wezareta Rewşenbîrî li Başûrê Kurdistanê hate çapkirin. Herweha heman pirtûk di sala 2020an de, ji hêla weşanxaneyê Şilêr ya Desteya Çand û Hunerê li Rojava hate çapkirin.

4- Zarokên Taxa Me. Necîb Mehfûz. Roman. Werger ji Erebî.

5- Afirênerên Jiyana Azad . Rojnivîs. Werger bo Erebî.

#### **Ji Berhemên neçapkirî:**

1- Wergera Kurdî, dîrok û pêşeroj / Lêkolîn /.

2- Ferhenga Zêrîn ji bo Navê Şêrîn/25 Hezar Navê zarokan

3- Berhevoka çîrokan bi navê "Serê Birînê": Belgekirina çîrokên xelkê Serê Kaniyê ye, yê ku nivîskar deh rojan li kampa Waşûkanî ji 30- 12- 2019 ta 8 – 1- 2020an li gel wan mabû û çîrokê wan belge kiribûn.

**Wergerên neçapkirî:**

- 1- Elfil Ya Melek Elzeman/ Se`edella Wenûs/ şano / Werger ji Erebi.
- 2- Kûçikê Axa/ Memdûh Edwan / şano/ Werger ji Erebi.
- 3- Xatê Xanim/ Eliyê Abdilrehman/ Roman/ Werger ji Kurdî.
- 4- Kawayê Hesinkar, Destana Newrozê/ Ebdusemed Yîgît/ Roman / Werger ji Kurdî.
- 5- Çemê êvarê/ Mehûd Badilî/ Helbest/ Werger bo Erebi.
- 6- Bistan Hatî Berdan /şêxmûs Sefer / Helbest/ Werger bo Erebi.
- 7- Xewnên Zêvîn- Fatma Savcî / Helbest/ werger bo Erebi.



## Qado Şêrîn

Qado Şêrîn ji Rojavayê Kurdistanê ye, di sala 1967an de, li gundê Naroz, li başûrê bajarê Qamişlo, jidayik bûye. Xwendina seretayî li gundê xwe, ji bo dibistanê şeş salan, rojane 7km diçû dibistana Kabaka; piştî dibistana seretayî tewaw dike, li gel malbata xwe diçe Qamişlo da ku xwendina xwe berdewam bike; piştî lîseyê werdigire, diçe bajarê Dêra Zorê da ku Enstitutiya Matematîkê bixwîne. Wî çend salan karê mamostetiyê li dibistanên Qamişlo kiriye. Di sala 1995an de koçberî Hollenda dibe, û li wir dibe nişteci, û ta niha li wir dijî. Di 2006an de dizewice, du kurên wî bi navê Adaro û Pîroz hene.

Di sala 1982yan de, dest bi nivîsandinê kiriye, ew bi tenê bi Kurdî dinivîse. Çîroka wî ya pêşî "Kortik" di dawiya salên heştêyan de, di kovara Gurzek Gul de, ya ku Konê Reş û Ebdilbaqî Huseynî derdixistin, belav bûye.

Di sala 2011an de, dibe endamê Hevgirtina nivîskarên Rojavayê Kurdistanê. Piştî nakokî derdikevin û hevgirtin perçe dibe, Qado Şêrîn bi daxwiyaniyek fermî, di 2015an de, radiweste û ji rêxistin û saziyên nivîskaran dûr dikeve, çimkî nikare tev li nakokiyên nivîskaran bibe û şer û dijîtiya dostên xwe yên nivîskar bike.

Qado Şêrîn gelek çîrok, gotar, rexne û Qilçix di kovar û malperên internetî û rojnameyên Kurdî de belav kirine. Gelek hevpeyivînên televizyonî pê re hatine kirin. Ji sala 1982yan ve dinivîse, û pirtûka wî ya çîrokan ya bi navê 'Serok û Merok' berhema wî ya yekem e di warê çîrokê de.

Qado Şêrîn bêtir ji hemû cureyên din yê wêjeyê, kurteçîrokan dinivîse. Di 2009an de, yekemîn pirtûk bi navê “Serok û Merok” ji weşanên dezgeha Sema ya Çandî û Hunerî çap kiriye. Qado bi şêweyê tinazî û qerf û henekî dinivîse. Babeta pirtûkê çîrok in; ev pirtûka ku ji 24 kurteçîrokan pêk tê, ji 120 rûpelan e, ku nivîskar ev çîrok di navbera salên 1993 - 2006an de nivîsandine. Tabloya li ser bergeya pêşî ji aliyê şêwekar Inayet Dîko ve hatiye çêkirin. Û bergeya paşiyê ji Fermanekê ku bi destxeta nivîskar hatiye danîn, naveroka fermanê jî ev e: *Fermana 11an*:

*Ji serokê Rojhilat û Rojava, Bakur û Başûr re, divê ji niha û pê ve hûn tenê vê durîşmê ‘Bijî serokê me û bavê me ji bo keç û jinên me!’ Li şûna ya berê ‘Bijî serok Qilçix!’ bilind bikin. Ê ji we ji vê duruşmeyê pê ve bilind bike, ewê bê xazoqkirin, ta ku bimire.*

*Serokê we û bavê we..*

Ji vê fermanê ku dişibihe fermanên sultanên Osmaniyan, naveroka çîrokan diyar dibe, û şêweyê nivîskar di nivîsandina çîrokê de xuya dibe, bi awayekî rexne di gel qerf û henekên civakî ku bi zimanekî gelêrî û rehet dixwaze hin aliyên civaka Kurdan, saziyên wan ên siyasî, partî û rêveberan rexne bike, û wan hişiyar bike bi wan qilçixên xwe, û dixwaze wan qerf û adetên nerind di civakê de, bi riya wan nameyên xwe, rake.

Her wiha nivîskar Qado Şêrîn pirtûkek bi navê “Stranên Mihemed Şêxo”, li gel Beha Şêxo, amade û çap kiriye. Pirtûk ji danhev û amadekirina hemû helbestên û stranên hunermendê nemir Mihemed Şêxo pêk hatiye. Pêşgotina pirtûkê Qado nivîsandiye, tê de qala jiyana hunermendê nemir dike, herwisa li ser şêweyê awaz, mûzîk û stranên M. Ş nivîsandiye.

Pirtûka Qado Şêrîn ya sêyemîn “Ismaîl Emo, Bîr û Boçûnên we” ye, ev pirtûk jî mîna ya berê danhev û amade kiriye. Wî hemû gotar, nivîs, helwest, derbirîn û daxwiyaniyên li ser nemir Ismaîl Emo, ku piştî mirina wî hatibûn nivîsandin, berhev kirine û li gel pêşgotinek dirêj di derbarê nemir de, di sala 2011an de, li ba weşanxaneyê HAN çap kiriye. Hêjayî gotinê ye ku Ismaîl Emo

siyasetvanekî Kurdên Rojavayê Kurdistanê bû, ji hemû aliyan ve dihat pejirandin û li cihê rêzê bû, dema mir serokê partiyek Kurdî bû. Pirtûk 600 rûpel heye û bi Kurdî û Erebi ye.

Pirtûka çaran, "Mihemed Şêxo Huner û Jînenîgarî" ye. 2022. Çapa duyemîn a pirtûka "Stranên Mihemed Şêxo" ye, lê vê carê gelek cudahî hene, navê Qado Şêrîn bi tenê li ser bergewê ye. Pirtûk ji 360 rûpelan e, û ji weşanên Dar El-Zeman e, ji pêşgotinek dirêj, gotar, lêkolîn, helbestên û stranên Mihemed Şêxo, Note, portrêt, û ji wêne û belgeyan pêk tê.

Qado Şêrîn di hevpeyvînek xwe de gotiye: "Mirov bi pirtûkan nabe nivîskar". Ji ber wê kêma pirtûkan çap dike, û baweriya wî jî ew e ku ji kîs xwe pirtûkan çap neke, belkû ji ber wê kêma pirtûkan çap dike.

Qado Şêrîn pênc salan, 2002-2007, sernivîseriya malpera TÎRÊJ a çandî, wêjeyî û hunerî kiriye. Di 2007an de, ji ber dem û rewşa kesayetî rawestiya. Dûv wê re, malper jî hate girtin. Hêjayî gotinê ye ku malpera Tîrêj pencereya hemû nivîskaran bû. Kurdan ji herçar perçeyên Kurdistanê û ji Ewropa tê de dinivisandin, û berhemên xwe yê wêjeyî tê de diweşandin. Malperê bi du zimanan, Kurdî û Erebi, weşan dikir.

Qado, di malpera Tîrêj de, şêweyekî nû ji nivîsandinê taybet bi xwe, afirandibû, navê şêweyê xwe kiribû Qilçix; ew şêwe di navbera çîrok û gotarê de ye, qerf û henek, ango tinazî, û tije ken e. Di Qilçixan de rexne dikir, her wiha tinazê xwe hema hema bi her tiştî dikir. Hêjayî gotinê ye ku Qado ta niha bi wî şêweyî, qilçixan dinivîse.

Herwisa, di salên 2012-2015an de, sernivîseriya rojnameya "Pênûsa Nû", beşê Kurdî kiriye. Wî 34 hejmar derxistin, û dûv re rawestiyaye, lê rojname berdewam e. Rojname bi ser Hevgirtina nivîskaran ve ye; dema di 2015an de wek endamê Hevgirtinê rawestiya, wek sernivîserê rojnameyê jî rawestiya.

Di 2003yan de, xelata yekemîn ya pêşbirka kovara Zevî ji bo kurteçîrokê wergirtiye. Di sala 2021ê de, xelata sêyemîn a pêşbirka Mehrecana çîrokê wergirtiye. Herwisa, gelek bawername û rêzlêgirtin jî wergirtine.

Qado Şêrîn di medya civakî de, ji bo parastin, hezkirin û fêrkirina zimanê Kurdî, bi gelek çalakiyan rabûye, mîna Pêncşema Zimanê Kurdî û xelata Ezîzê Omero. Mebest ji çalakiya Pêncşema Ziman ew bû ku, herkes di roja pêncşemê de hewl bide tenê bi Kurdî binivîse, û xelata Ezîzê Omero (Kurdekî Qomonist î navdar e, axaftina wî qaşo bi Kurdî ye, lê hema hema hemû gotinên wî bi Erebi ne, tenê bilêvkin bi Kurdî ye) wek xelata wêrankirina zimanê Kurdî digiha kesayetiyek Kurd a navdar, wek siyasetmedaran, dema li ser medyayê (tv, radyo...) bi Kurdiyêk çewt û xerab daxivîn.

Qado Şêrîn pirtûkan jî rexne dike, lê nehemû pirtûk, pirtûka astebilind, gelek gotarên wî di vê derbarê de jî hene.

**Pirtûkên Qado Şêrîn ên çapkirî ev in:**

- 01- Stranên Mihemed Şêxo. 1995.
- 02- Serok û Merok, çîrok. 2009.
- 03- Ismaîl Emo, Bîr û Boçûnên we. 2011.
- 04- Mihemed Şêxo Huner û Jînenîgarî. 2022.

**Destnivîs:**

- 01-Çîroka Kurdî ji Şahmaran ta bi Çîxofê Kurd. Lêkolîn.
- 02- Kurteçîrok.



## **Qedrî Can (01/07/1911 - 09/08/1972)**

Di 01/07/1911an de, li Dêrika çiyayê Mazî hatiye dinê û di 09/08/1972yan de, li bajarê Şamê - Taxa Kurdan miriye.

Navê wî yê rast Ebdilqadir (Qado) Can e, bavê wî: Cano ye, Diya wî: Ayşe ye, bapîrê wî: Feteħ e, dapîra wî: Hedê ye, birayê wî: Şehmus Özcan (Şêxmuse Cano) ye, birayê wî: Salih Özcan (Salihê Cano) ye, birayê wî: Abdurahman Özcan (Evdê Cano) ye, birayê wî: Davut Özcan (Dawudê Cano) ye.<sup>11</sup>

Qedrî Can ji xelkên Dêrika çiyayê Mazî ye. Di destpêka xortaniya xwe de tevî tevgera welatparêzan dibe. Ji ber sedemên ramyarî dûtî welatê xwe dikeve. Berê xwe dide binya Xetê. Di vî warî de, Cegerxwînê nemir di bîranînên xwe de dibêje: “.. Du xortên ciwan ji Kurdistana Turkiyê hatine Amûdê, xwendina xwe ya lîse xelaskiribûn, herdû xort Qedrî Can û Reşîdê Kurd bûn”. Ji hêleke din ve, hevalê wî Dr. Xalid Qotreş dibêje: “Qedrî can ji ber sitema Turkan xwendina xwe nebî serî, di sala didiwan ji xwendina xwe (Mala Mamostan =Dar el-mû’elimîn) reviya û hate Sûriyê”. Lê di reşbeleka xwendinê de, diyar e ko ew di sala çaran de bû, li bajarê Qoniyayê dixwend. Dr. Xalid Qotreş gotina xwe berdewam dike: “Di sala 1928an de, temenê wî (17) salî bû dema hatiye Sûriyê. Di salekê de hînî zimanê Erebî bûye. Li bajarê

---

<sup>11</sup> Ev agahî, di rîya mamoste û welatparêza hêja Zinet Dinçer re gihîştine destê min, ku ewê jî ji belgeyên nufusa Dêrikê wergirtiye.

Selemiyê xwendina (Mala mamosteyan) yên çandiniyê dixwîne. Piştî ko xwendina xwe kuta dike, li bajarê Entakyê dibe mamoste". Li wir zanyarê mezin Memdûh Selîm nas dike.

Qedrî Can, li bajarê Qamişlo û Amûdê mamostetiyê dike. Li gorî gotina şagirtê wî Mustefa Kurê Hesên Hîşyar dibijê: "Di sala 1942yan de Qedrî Can li bajarê Amûdê kargêrê dibistanê bû". Li bajarê Şamê, Taxa Kurdan, û derdora wê jî mamostetî kiriye. Piştî demekê, li wîzareta perwerdeyê mîna rêveberê kar xebitiye. Li wir jî pir dirêj nake, li tomara Giştî ya karkirên dewletê kar dike. Demek tê re naçe, ew tevî komkarên azadîxwazan dibe, û mîna endamêkî zîrek, di nav de, cih digire. Qedrî Can mîna mirovekî xebatkar, ramiyar û rewşenbîrê tê naskirin.

Qedrî Can di hejmara pêşî ji kovara HAWARê de nivîsiye. Di 15-5-1932yan de, Qedrî Can, bi pêşewaziya mîrê Kurdan Celadet Bedir-Xan, di eniya dî de, eniya çandeyê de, nivîskarekî afirîner, stêrka wî geş bû, û têkoşerekî şervan bû.

Di sala 1936an de, Qedrî Can helbesta xwe (Reya Teze) nivîsiye. Ev helbest (Reya Teze), helbesta pêşî ye, di dîroka helbestên nûjen û azad, di toreyê Kurdî de. Ev dîrok, bûye mîna qonaxeke nû di toreyê Kurdî de, hem di nûjenkirina helbesta Kurdî ji hêla ruxsar û naverokê de, hem jî bûye bihnokek di navbera herdu qonaxan de: qonaxa nuhbûn û kevneşopê de. Ew qonaxa kevneşop ya nav lê dikin kilasîk, û qonaxa nûxwaziya bi mînake spehî û hevdemî û resenî di yek demê de gihandiye hev, û di nav xwe de hilgirtiye.

Di sala 1944an de, piştî nasîna Qedrî Can bi ramana Markisî û Lênîniyê ve, qonaxeke nû û dîrokî di ramana wî de dest pê kiriye. Bûye dostê ramana qomonistan. Dr. Xalid Qotreş dibêje: "Qedrî Can, ne partî û ne jî qomonîst bû. Xebatkar û welatparêzekî pêşketî bû. Mîna min endamê komela Xoybûnê bû". Ez bawer dikim ko mirovekî welatparêz û pêşverû bû, mîna gelek xortên wê demê, bawerî bi riya qomonîstiyê tanî. Lê bi tu partiyên ve xwe girê nedabû.

Di sala 1957an de, di meha tîrmehê de, Qedrî Can bi girûpek xortên Kurd re beşdarî Mehrecana Ciwanên Cîhanê ya şeşan li Moskoyê dibe. Li wir, diçe



serdana serdarê Kurdan Barzanî yê nemir û helbesta xwe ya bi navê (Serdarê Kurdan Barzanî) diyarî wî dike.

Di sala 1958an de, piştî vegera Barzanî, li bajar Bexdadê careka din hevûdû dibînin. Di wê dîtinê de, nameyeke bixêrhatinê dispêre destê serdarê Kurdan, û di kovarên 'Hêwa' û 'Azadî' de, helbesta xwe ya bi navê (şêr hat welat)\* belav dike.

Di çaxê ku li Moskoyê bû. Diçe nik Prof. Qenatê Kurdo. Di vî warî de, Prof. Q. Kurdo dibêje: "Ewî ji bajarê Adêsê ji min ra birqî (têlêgram) bi kurmancî bi van xeberan şandibû "têda nivîsî bû" Ez Qedrî can im, tevî xortan tême festîvalê dixwazim te bibînim".

Qedrî Can çend helbestên xwe yê ne belavkirî bi xêza destê xwe diyarî Qenatê Kurdo dike. Qenatê Kurdo dibêje: "... Deftera çend şê'rên xwe yê çapnekirî pêşkêşî min kir ... Ji wan şê'ra, şê'ra wî ya bi sernavê "Ez diçim Mosko" wextê Festivalê bi Rusî hatibû çapkirinê, û di rojnama "Îzvêstiya da". Navê wan şê'ra ev in:"Ez diçim Mosko, Begê axir zeman, Reya teze, Gula sor".

Di nav salên (1959-1961)an de, li zindana Mezê girtî bû. Seydayê Cegerxwîn dibêje: "Qedrî can du-sê caran derbasî zindana Mezê bûye". Ji bo xebata ramiyarî û toreyî çend salan li Libnan û Îraqê maye.

Qedrî Can pireya berhem û nivîsên xwe di kovar û rojnameyên ko li Sûriyê û Libnanê derdiketin (HAWAR, Ronahî û Roja Nû), de belavdikir. Çend helbest li Îraqê, di Kovara Hêwa, Gelawêj û rojnameya Azadî de jî belavkirin.

Pêvî Çîrok û helbestan, çend gotarên wî di kovara (Hawar, Ronahî û Roja nû) de hene. Ji wan: "Silêman Bedirxan, Gelo ne wisa ne, Bihara Dêrikê, Şîna Xalê min, Inqîlaba Sor, û Yaney Serkewtin".

Qedrî Can yek ji nivîskarê pêşîn e, ko di van kovar û rojnameyan de nivîsiye. Evî nivîskarî li kêleka helbestan, kurteçîrok û gotar û karê wergerandinê jî kiriye. Ji hêleke din ve, alîkarî di wergerandina romana

---

\* Ev helbestên Qedrî Can yê ko di van herdû kovaran de (Hêwa, Gelawêj û Azadî) de hatine belavkirin, di riya Mamoste Fetah Zaxoyî re gihane destê min.

(Şivanê Kurd) ya Erebe Şemo de kiriye, û pêşgotina dîwana yekê ya Seydayê Cegerxwîn nivîsiye.

Ji destpêka sala şêstî ta bi sala heftêyî, tu berhemên wî bi dest me neketin. Me ji keça wî Dr. Şêrîn Can û malbata wan pirsî, lê mexabin tu destnivîs an reşbelek li nik wan tune bûn.

Qedrî Can rojên dawîn ji jiyana xwe li bajarê Şamê bûrandine.

Di sala 1939an de, jin aniye. Du kur û keçek wî ji xanima wî (Neylûfir) hene. Zayîna zarokên wî ev in: Mizgîn 1943yan, Şêrîn 1945an, Serwer 1948an).

Di 9ê Tebaxa sala 1972yan de, li şarê Şamê, li taxa Kurdan miriye û li goristana Şêx Xalidê Neqşebendî hatiye veşartin.

Hêjayî gotinê ye ku helbesta li ser kêla gora wî ji aliyê welatparêzê Kurd Izet Axayê Dêrikî ve hatiye nivîsandin ew jî ev e:

*Cendekê d' vê gorê de*

*Zor nazik û ciwan e*

*J' Dêrka çiya ê Mazî*

*Navê wî Qedrî Can e*

*Hezar xweşî l' gora wî*

*Hozanekî Kurdan e*

*Welatparêzekî qenc bû*

*Rohsitîn jê girt can e*

*Gorê xiste zikê xwe*

*Ew jî kire qurban e*

*Ji piştî me Kurdan çû*

*Ev zana ê Zeman e .*

**Berhemên Qedrî Can ev in:**

**Çîrok û Gotarên wî:**

-HAWAR hebe gazî li dû ye

Kovara Hawar, Hejmar:1, Sal:1932.Rûpel:5, 6

-Gundê Nûava

Kovara Hawar, Hejmar:2, sal:1932.Rûpel:6

-Silêman Bedirxan

Kovara Hawar, Hejmar:3, sal:1932.Rûpel:4, 5

-Besreka Zêrîn

Kovara Hawar, Hejmar:5, sal:1932.Rûpel:6, 7

-Hêva çardeşevî

Kovara Hawar, Hejmar: 6, sal:1932. Rûpel:5, 6

-Gelo ne wisan e?

Kovara Hawar, Hejmar:10, sal:1932.Rûpel:2

-Bihara Dêrikê

Kovara Hawar, Hejmar:13, sal:1932.Rûpel:4

-Şîna Xalê min.

Kovara Hawar, Hejmar:22, sal:1933.Rûpel:6

-Sond

Kovara Hawar, Hejmar:35, sal:1941.Rûpel:8, 9, 10

-Guneh

Kovara Hawar, Hejmar:39, sal:1942.Rûpel:6, 7, 8

-Rojên derbasbûyî

Kovara Hawar, Hejmar:52, sal:1943.Rûpel:9, 10

-Sehên zozanan

Kovara Ronahî, Hejmar:14, sal:1943.Rûpel:11

-Gulçîn

Kovara Ronahî, Hejmar:16, sal:1943.Rûpel:5, 6, 7, 8

-Nêçîra Berazan

Kovara Ronahî, Hejmar:28, sal:1945.Rûpel:5, 6, 7

-Inqîlaba Sor ya mezin

Kovara Ronahî, Hejmar:28, sal:1945.Rûpal:23, 24

-Serencam

Rojnameya Roja Nû, Hejmar:2, sal:1943.Rûpel:4

-Yaney Serkewtin

Rojnameya Roja Nû, Hejmar:19, sal:1943.Rûpel:1

-Muhra Suleyman

Rojnameya Roja Nû, Hejmar:39, sal:1944.Rûpel:4

-Roviyê Xapînok

Xwendina Kurdî, Şam 1938,Çapxaneya Tereqî, Rûpal:45

-Rasthatineke Ecêb

Xwendina Kurdî, Şam 1938,Çapxaneya Tereqî, Rûpel:54

### **Helbestên wî:**

-Berdêlk

Kovara Hawarê, Hejmar:6, Sal:1932, Rûpel:2

-Hesinker

Kovara Hawarê, Hejmar:7, Sal:1932, Rûpel:4, 5

-Di şorezarekê de

- Kovara Hawarê, Hejmar:10, Sal:1932, Rûpel:4, 5
- Tabûta bi xwîn
- Kovara Hawarê, Hejmar:11, Sal:1932, Rûpel:6
- Cegerxwîn
- Kovara Hawarê, Hejmar:12, Sal:1932, Rûpel:2
- Xewna hişyariyê
- Kovara Hawarê, Hejmar:13, Sal:1932, Rûpel:2
- Dadê
- Kovara Hawarê, Hejmar:14, Sal:1932, Rûpel:3
- Cuhaba lawanî li diya Hawarê
- Kovara Hawarê, Hejmar:20, Sal:1933, Rûpel:11
- Reşbelek
- Rojnameya Roja Nû, Hejmar:1, Sal:1943, Rûpel:2
- Şîn/li ser giyanê M.Seyda
- Rojnameya Roja Nû, Hejmar:18, Sal:1943, Rûpel:4
- Reya Teze
- Kovara Ronahî, Hejmar:26, Sal:1944, Rûpel:17
- Şêr hat welat
- Şêrê welat .. Barzanî hat
- Kovara Hêwa.Hejmar:4.Sala:2an.1958.Rû:-76, 77
- Begê axir-zeman
- Kovara Ronahî.Hejmar:5-6.Sala:1ê.1961.Rû:-33, 34
- Gula Sor
- T.E.Kurdî-Q.Kurdo, cild:1.Stockholm, 1983

-Niştiman birîndar e

Kovara Gelawêj. Hejmar:8. Sala:1947

-Serokê Kurdistan...Berzanî

-Şîna pêşiwa/Serokê cemhûriya Kurdistan/

-Ez diçim Mosko

T.E.Kurdî-Q.Kurdo, cild:1. Stockholm, 1983

-Heyva sor

-çardeyê Gelawêjê

Kovara Hêwa. Hejmar:3. sala didiwan. Rûpel:49-50

-Karwanê me

Kovara Ronahî, Hejmar:1. sala yekê, 1960. Rûpel:51

-Name bo êstgehê radyo Tehran

Rojnameya Azadî. Hejmar:46. sal:18/12/1959

-Cejna Oktober

-Li zîndanê şoreşa me

-Şîna Celadet Bedir-xan

### **Wergerandinên wî:**

-Tayek porê spî

Kovara Ronahî, Hejmar:13, sal:1943. Rûpel :7

-Di welatê Zembeqê gewir de

Rojnameya Roja Nû, Hejmar: 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12-13, 14, 16, 17, 19, 20, 24, 25, 40, 41. Sal:1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1943, 1944, 1944. Rûpel:4, 4, 2, 2, 4, 4, 4, 4, 4, 4, 4, 4, 2, 4, 4, 4, 4

### **Çavkanî:**

Ji ber pirtûka min ya bi navê Qedrîcan (Çîrok, gotar, helbest û werguhêz). Beyrût- Libnan-2005, Çapxaneya Emîral hatiye wergirtin.

Min ev pirtûk wergerandiye zimanê Erebî û li çapxaneya Aras, Hewlêra paytexta Kurdistanê, 2001ê de çapkir.

Ev pirtûk bi zimanê Kurdî û bi tîpên Latînî li Istanbulê di sala 2004an de, li weşanxana (komel) hat çapkirin. Lê, sed mexabin ji ber çapeke bê serûber bû, hemî şaşî û çewtî bû, min li Beyrût- Libnan-2005, Çapxaneya Emîral careke din da çapkirin.



## **Qehar Silo Abbas**

Evdilqehar Silo Abbas di sala 1954an de, li bajarê Qamişlo jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û lîseyê li dibistanên Qamişlo biserî kiriye. Ji piçûkaniya xwe de, pir ji hunera şewekariyê hez dikir. Gelek caran tabloyên heval û dostên xwe çê dikirin. Pir dirêj nekir, piştî xwe da karê şewekariyê û berê xwe da helbest, wêje û çanda Kurdî.

Di sala 1980yê de, bi riç û bandora rêzimana Celadet Bedir-Xan, Reşîdê Kurd û helbestên Cegerxwîn, dest bi nivisandina zimanê Kurdî kir. Di destpêka nivîsandinê de, helbest nivisand. Lê, tiştî bêtir bala wî kişand ferheng û rêzimana zimanê Kurdî-kurmancî bû.

Di sala 1975an de, jin anî, sê kur û sê keçên wî hene.

### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

-Dîwanek ji helbestan bi navê “Kêlên Fermiskên Sor”, di sala 1999an de, li bajarê Qamişlo hatiye çapkirin.

-Rêznameya Rêzimana Kurdî- Kurmancî, di sala 2019an de, li Amedê, li pirtûkxana Seyda hatiye çapkirin.

-Ferhenga Rewzan, bi sê zimanan zimanê (Kurdî, Erebi û Ferensî) ye, di sala 2019an de, li Qamişlo hatiye çapkirin. Hêjayî gotinê ye ku ev ferheng li dora 15 salan pê re dirêj kiriye.

-Ferhenga Qehar, beşê yekem, sala 2021ê, li Qamişlo hatiye çapkirin.

- Ferhenga Qehar, beşê duyem, sala 2023ê, li Qamişlo hatiye çapkirin.





## **Raman Hesê**

Di sala 1998ê de, li Qamişloya Rojavayê Kurdistanê jidayik bûye. Xwendina seretayî, navîn û amadeyî li Qamişloyê bi dawî kiriye.

Di sala 2015ê de, bûye hevrêveberê radiyoya Dengê Cûdî, û karê xwe yê birêveberiyê tê de domandiye. Xwe li Zanîngeha Tîşrînê, beşa Wêjeya Ingilîzî tomar kiriye, hewl daye ku bixwîne, lê ji ber şerê Sûriyayê negihandiyê serî.

Di dawiya sala 2016ê de, weke xwendekarê Ziman û Wêjeya Kurdî derbasî Zanîngeha Rojava bûye, û di 2018ê de biserî kiriye.

Sala 2017ê û di Mîhrîcana Osman Sebrî de, xelata Asta Yekemîn di Kurteçîroka Kurdî de wergirtiye. Piştî zanîngehê di gelek qad û beşên ragihandinê de kar kiriye, ya dawîn bûye birêveberê saziya Ara Zarok a rojnamegeriya zarokan.

Niha jî mijûlî xebatên ragihandin, nivîsîn û projeyên taybet e.

### **Berhemên wî yên çapkiri:**

\*Bêhna xwînê (Kurteçîrok)

\*Kurd û Îslam (Lêkolîn)

\*Pilingên di roja dehemîn de (Werger)

\*Mêrên li ber rojê (Werger)



## **Rêber Hebûn**

\* Rêber Hebûn ew (Rêber Adil Ehmed) e.

- Bi du zimanan berhemên xwe dinivîse Kurdî û Erebî.

Nivîskar, helbestvan û rexnegirekî Kurdistanê ye, li bajarê Munbicê, bakurê sûrî, di 2ê meha Çirya Paşîn sala 1987an de, jidayîk bûye.

Ji Êla Gêtikan e, û bi xwe ew êl şaxekî ji tofê Beraziyan e, malbata wî ji Kobaniyê ye, û ji sedemên aborî berê xwe dan e Munbicê, û ev bajar bi pirnetewiya xwe ve navdar e; di nav de Ereb, Turkmen, Şerkes û Kurd dijîn.

Xwendina xwe ya seretayî, navîn û dabîristanî li dibistanên bajêr, di navbera salên 1994an û 2006an de qedandî ye.

Zimanê Erebî li zanîngeha Helebê, beşê wêjeyê di navbera 2007 û 2011an de xwendî ye.

Bi sedema cenga navxweyî li Sûrî di adara 2011an de, nikarîbû xwendina xwe li zanîngehê bi dawî bikira. Di havîna sala 2012an de, berê xwe dabû Libnanê, û pişt re zivirî Şamê. Di payîza 2012an de, berê xwe da Başûrê Kurdistanê, û li wir di rêxistina Nojdarên Bêsînor de, mîna karmendekî tendirûstî di nava koçberên Rojavayê Kurdistanê de xebitî li kampa Domîz, ya ku dikeve di navbera Musil û Dihokê de. Lê bi encamê êrîşa Da'îşê û nemana kar, neçar ma ku di havîna sala 2015an de berê xwe bide Elmanyayê, û li bajarê Dûsseldorfê bicih bû.

**\* Pirtûkên wî yê çapkirî:**

- Qêrînên Roniyê, Helbest, Erebî- 2016
  - (Leylan û nerîn, deq û xwendin – Erebî 2017)
  - “Narînbendên Kurdistanî”, pexşan. Hevbeş e bi pînar Kobanî re - Erebî - 2019)
  - (Qêrînên roniyê, Helbest – Kurdî-2020)
  - ji hevkirina simbûl di romanên Helîm Yûsiv-rexne- Erebî 2020
  - Evîn hebûn e û hebûn zanîn e – raman- Erebî 2021
  - Rewrewkên xwînî – pexşan – 2021, Berlîn
  - Bi sedan gotarên wî hene, li ser gelek malperên Elketronî û rojnameyên Kurdî û Erebî de hatibûn e weşandin.
- \* Damezinerê malxaneyê - Kombûna Zanyarên Azad- a eleketronî ye.



## **Resendar Misûr**

Navê wî yê wêjeyî Resendar Misûr re. Di sala 1965an de, li gundê Hofa, yê girêdayî bi bajarê Qamişlo ve jidayik bûye. Ew jî wek hemû zarokên gundan jiyana xwe ya zarokî li gund borandiyê. Xwendina wî ya seretayî li wî gundî û ya navendî û lîse li bajarê Qamişlo bû. Bawernameya Zanîngehê ya Perwerda Nûjen wergirtiye.

Di sala 1981ê de, xwe fêrî zimanê Kurdî bi şeweyekî xweber kiriye, û ta îro hîn şerît li ser çirkê ye. Li gundewar û bajarê Qamişlo mamostetiya fermî kiriye ta rûniştina ji kar.

### **\* Çalakiyên wî:**

1- Hinek keç û xort li ser destên wî fêrî zimanê Kurdî bûne. Ew damezinerê Navenda Romaf a Çanda Kurdî bû. Şevbuhêrkên helbestane li hin bajar û bajarokên Rojava, lidar xistine.


2- Hin berhemên wî di weşanên xwecihî û herêmî de hatine belavkirin.

### **\* Berhemên wî ev in:**

1- Şikefta bê stêr ( Helbest) e.

2- Kelê Buharê ( Hayku) ye.

3- Dîwarê Şevê ( kurteçîrok) e. Destnivîs.



## Reşîdê Kurd (1910-1968)

Tekoşer, nivîser û rewşenbîrê payebilind Reşîdê Kurd, navê wî Reşîd kurê Mihemedê Reşo ye. Di sala 1910an de, li gundê “Rewşatê” yê bi ser Dêrika Çiyayê Mazî ve, li Bakurê Kurdistanê jidayik bû.

Qonaxa xwendina seretaî li gund, ya navendî li Mêrdînê dixwîne, û bi pileyeke bilind bawemameyê bi dest dixe.

Ji ber asta wî ya berz û li pêş di xwendinê de, di amojgeha mala mamos-teyan de, li Qonyayê tê qebûlkin.

Di wê demê de, bûyerin pir mezin û dîrokî diqewimin, wekî (rûxandina dewleta Osmanî, şoreşa 17ê Oktoberê li Rûsyayê û avabûna Yekîtiya Sovyêt, peymanê Sîver û Lozanê, şoreşa Şêx Se'îd û şoreşa Araratê û gelek bûyerin din) ku bandora xwe bi xurtî li rewşa gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê kirin.

Reşîdê Kurd, wekî ciwanekî bîrewer û xwendekarekî jîrek bi van bûyeran bandor dibe, û dest bi tekoşînê di ber doza gelê xwe yî bindest û mirovahiyê de dike, û li dijî faşîzma Tirk û kemalîzmê radibe.

Ji ber çalakkûna wî li mala mamosteyan, ji aliyê hêzên ewlehiya desthilatdariya kemalîzmê ve, tê girtin û zindankirin. Piştî demekê ji zindanê, direve û xwe ji ber çavên desthilatdariya kemalî dide alî; lê ew ji dû wî venagerin û didin pey şopa wî heya ku careke din wî digirin û davêjin zindanê. Vê carê fermana bidarvekirina wî derdixînin. Ji ber ku malbata Reşîd

zengîn bûn û li deverê xwedî bandor bûn, dikarîbûn pereyan bidin hin berpîrsên Tirk û Reşîd ji zindanê bidin revandin.

Piştî lêbirîna hukmê bidarvekirinê û reva ji zindanê, ew neçar dibe berê xwe bide Rojavayê Kurdistanê.

Reşîdê Kurd û Qedrî Can li Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Amûdê bicih dibin – ku ew ji bo hemû tekoşerên Kurd bûye navenda çalakiyên siyasî û rewşenbîrî - û di warê siyaset û çandê de kar dike.

Lêbelê, ewî du tiştên giranbuha li dû xwe hiştibûn, ew jî hevîna wî Xatûn û pirtûka wî Rêzimana zimanê Kurdî bûn. Ji lewre, di sala 1946an de, bi dizî derbasî Bakurê Kurdistanê dibe, dema digihêje gundê xwe, pirtûka xwe ya (Rêzimana Kurmancî) dide hevîna xwe û jê re dibêje: “ Xatûn vê pirtûkê bigihîne Sûriyê; eger tu gihiştî gundê Talikê digel vê pirtûkê, wê hingê tu min ji mirinê rizgar dikî.”

Xebat û tekoşîneke berz di ber azadiya mirov de dike, ji lewre hezkirin û rêza xwe di nava gelê belengaz û hemû pêkhatayên Cizîrê de diçîne. Di heman demê de, wekî tekoşerekî Kurd li herçar parçên Kurdistanê tê naskirin.

Di sala 1948an de tevî Partiya Komonîst a Sûrî dibe, û di heman salê de jî, digel Yûsif Hesan, tê girtin û dikeve zindanê.

Di sala 1949an de ji zindanê derdikeve, û salekê ji ber çavên hêzên ewlehiya desthilata Sûrî xwe dide alî.

Di sala 1950î de, digel 83 endamên komonîst ku, ew mezinê wan bû, cardin tê girtin, hêzên ewlehiyê bi tundiyê hovane wî êşkence dikin, pişt re wî rêdikin zindana Mezê, li Şama paytext.

Di sala 1959an de, digel hejmarek mezin ji berpîrs û endamên partiya komonîst, bi sedema dijîtiya awayê avakirina yekîtiya Misirê û Sûriyê hatin girtin.

Ji ber êşkenciya hovane ya ku di zindana mezê de dibîne, Reşîdê Kurd nexweş dikeve û êşa kezebê lê dixê.

Di sala 1967an de, ji bo dermankirinê diçe dewleta Romanyayê, lê mixabin dermankirin çarenake, çiku nexweşî li tevahiya laşê wî belav dibe.

Di dawiya dîwana xwe ya bi navê (Kerwan) de dibêje;

“Pir karûbarên min hene ku ez bikim, min ew hêj nebirine serî. Na! Gerek e ez niha nemirim! Gerek ez vegerim baxçeyên Dêrîkê, ku min ji mêj ve bêriya wan kiriye, paşê bila mirin were.”


Di 20/01/1968an de koça dawî dike, û li goristana Şermola li Amûdê tê veşartin.

Tevahiya jiyana xwe di navbera zindan û girtîgehên Turkiyê û Sûriyê de derbas dike, û wekî lehengekî, mêrxasekî û tekoşerekî, herwiha rewşenbîr û nivîserekî Kurd, navê xwe di dîrokê de dikole.

### **Berhemên Reşîdê Kurd:**

Reşîdê Kurd hezkerê zimanê Kurdî bû. Li kêleka guhdana wî ya bi zimanê Kurdî, çîrok û helbest jî nivîsîne. Ji berhemên wî yên çapkirî:

- Rêzimana Zimanê Kurmancî, Çapxana Kerem, Çapa yekem, Şam 1959an
- Ez, dîwaneke helbestê ye.
- Kerwan, dîwaneke helbestê ye, piştî koça wî li Swêdê hatiye çapkirin.
- Konê Reş, komek ji helbestan di rojnameya Riya Taze de hatine belavkirin.
- Çend çîrokên wî destnivîs hene.



## **Rewşen Bedir-Xan (1909-1992)**

Piştî têkçûna Sultan Ebdulhemîd di sala 1908an de, û hatina Sultan Reşad, rewşa azadiyê pêşve çû û azadî ji girtiyan re derket. Di wê demê de, Salih Bedirxan deh salên xwe di girtîgehê de buhurandibûn. Bi wê azadiyê re ew ji zindan û girtina timî (herehe) reha bû, û ew şandin bajarê Qeyseriyê.

Di roja 11ê Tîrmeha sala 1909an de, Sultan Reşad hat ser hukum. Di wê rojê de, Xwedê keçek da Salih Bedirxan. Ew keç bi xwe Rewşen Bedirxan bû. Piştî ko du salên Rewşenê li bajarê Qeyseriyê qediyar, malbata wan hatin Stenbolê; li wir gelek ji malbata Bedirxaniyan hebûn.

Salih Bedirxan ji Stenbolê jî berê xwe da riya Şamê. Bavê Rewşenê tucar nedisekinî, û bi hêz û hunera xwe ji bo milletê Kurd dixebitî, li xweşî û kêfa jiyane nedipirsî. Ew li mal û li navûdengiya xwe jî nedigeriya.

Salih Bedirxan gelek nivîs di kovar û rojnameyan de çapdikirin. Daxwaza wî ya yekemîn di jiyane de, hişyarkirin û pêşxistina milletê wî bû. Ew bê westan, şev û roj li kar bû.

Salih Bedirxan piştî hatina xwe ya Şamê, demekê bê kar ma. Di vê navê de şerê Cîhanê yê Yekemîn derket; mercên jiyane pir dijwar bûn. Ji bêçareyî, berê xwe da kar û li zindana Keleha Şamê kar kir. Lê mexabin bi êşa tîfoyê ket; pir dirêj najot, di 30yê Adara 1915an de mir. Di wê demê de temenê Rewşenê negihiştibû şeş salan.



Piştî mirina Salih Bedirxan, diya Rewşenê ew şand dibistanê. Rewşenê piştî ko dibistana seretayî xelas kir, çû dibistana mamostetiye (Dar El-Mu'elîmat) û ew jî bidawî anî. Rewşen bû mamoste û ji nifşên sêyemîn, ên ko li Sûriyê dibistana mamostetî qedandibûn, tê hejmartin.

Rewşen Bedirxan di sala 1925an de diçe bajarê Kerkê (li Urdun) û li wir dibe berpirsiyara dibistanê.

Li Urdunê bêdeng namîne, bi pênuşeke bilind li ser doza Erebi û rewşa Sûriyê û bûyerên wê demê, gotarên xwe di çend rojnamên felestînî, Urdunî, libnanî û Sûrî de belav dike. Mîna rojnama "Minîrva, Miraat El-Şerq, Nîdal, El-Şe'eb, Huriye û Wijdan. Hêjayî gotinê ye ko, xwediyê herdû rojnaman, Wijdan û Huriye, rojnamevanê gewre Yûsif Melek bû. Ev rojnamevan dostekî dilsoz û piştgirê doza Kurdan bû. Gelek belge û nivîsên hêja li ser Kurd û Kurdistanê belav kirine.

Di sala 1928an de vedigere Şamê, dibe mamoste û berpirsiyariya (kargîra) gelek dibistanan dike.

Di sala 1934an de, dibe endama komela Yekîtiya Jinan li Sûriyê.

Di roja 22. 2. 1935an de, bi Mîr Celadet Bedir-Xan re hevjin dibe. Bi navên Sînem 21- 3- 1938an û Cemşîd 9- 11- 1939an keç û lawek ji wan re çêdibin. Berî ko Rewşenê lawê apê xwe Celadet bike, mêrekî din "Omer Malik Hemdî" kiribû û keçek bi navê "Useyme" jê anîbû. Rewşen Xanim bi qasî ko li dibistanê mamoste bû, ewqas jî di xwedîkirina zarokan de mamoste bû. Diyeke dilsoz û dilovan bû.

Di sala 1944an de, li ser navê jinên Sûriyê, li Misrê beşdarî Kongra Jinên Cîhanê bû. Jiyana Rewşen Xanim a niştimanî pir berfireh û kûr e; ew bi hemû hêz û ramana xwe li dijî Qolonyalîzma Fransa sekinî û piştgiriya doza Erebi kir. Bi taybetî jî, wê doza gelê Felestînê parast, û wê di dibistanên Ereban de mamostetî kir û gelek nivîs û gotar di kovarên Erebi de weşandin.

Di rojnama "Wijdan" hejmar (331)ê, di gotarek xwe de, bersiva nivîskarê mezin "Circî Niqola baz" dide. Ewê ko ji piştgiriya Rewşenê bi doza Felestîn û Sûriyê re matmayî maye û dipirse gelo Rewşenê Çerkes e yan Erebi e?

Rewşen Xanim bersiva wî weha dide: "Ez bi xwe, bi xwîn û canê xwe Kurd im. Lê berî her tiştî ez mirov im. Dema ez li ser mafê miletan dinivîsînim mirovatiya xwe di bîra xwe de tînim û wê jibîr nakim. Çawa azadiyê ji miletê xwe re dixwazim wehareng e ji hemû miletên bindest re dixwazim. Ew kesê êş û derdê bindestiyê dîtibe, nikare setemkariyê ji miletên dî re bipejêre. Ez bawerim mirovê birçî be bi hevalê mîna xwe haydar e. Eger azadîxwaza gelê xwe me, bawer bin ne mafxura mafê tu kesî me. Azadî û serbestiya gelê min ne li ser rûxandina berjewendiya tu gela ye. Armanca min eve ko miletê min jî mîna hemû miletên serdest bi serbestî û azadî bijî".

Di pertûka herdû nivîskaran "Merwan El-Mesrî û M.Elî Elanî" de, ya li ser jinên nivîskar ên Sûrî (1892-1987)an de, pir bi dewlemendî û şanazî li ser Rewşen Bedirxan nivîsandine û pesinandine.

Jiyana wê ya niştimanî gelek giranbuha ye; cihê serbilindî û mezinahiyê ye. Digel ko Rewşen Xanim mamoste bû, xebata wê di behsa zindanan de, ji bo rastkirina tenduristiya keç, jin û pîrekên bê sincî yên di zindanan de jî hebû. Bi aramî û bîhinfirehiya xwe, dest davête hemû aloziyên jiyane. Lewra quretî û serşorî di ferhenga jiyana wê de nebû. Jîna Rewşen Bedir-Xan neynika jîn û danûstandina Mîrê gewre (Mezin) Celadet Bedir-Xan û malbata Bedirxaniyan bû. Ew xeleka gihandina dîroka miletê xwe ya kevin û nû ye. Ew dîroka lehengiyê ya dûr û dirêj e, a ko bav û bapîrên wê bi sedan sal ji bo Kurdistanê kiri ne. Jiyana wê ne kêmtî jiyana bav û kalên wê bû. Nemaze di warê dijarî û zehmetiyan de, piştî mirina mîrê wê Celadet Bedir-Xan di 15-7-1951ê de.

Dibêjin li pişt her mîrê gewre (mezin) jinek gewre heye. Belê, Rewşen piştevana mezinahiya mîrê ronakbîran Celadet Bedir-Xan bû. Piştevana amadekirina kovar, pirtûk û hemû afirandinên mîr bû. Digel xebatên hêja, ewê bi xwe jî di kovara Hawarê de dinivîsand. Bêdiro, em dikarin bibêjin Rewşen Bedir-Xan pîreka Kurd ya pêşî ye ko bi zimanê Kurdî-Latînî di kovara Hawarê de nivîsiye, û çend gotarên taybet li ser rewşa jina Kurd afirandine. Rewşen Xanim di hejmara 27an ji kovara Hawarê de, di nivîsek xwe ya bi navê "Kebanî û Mamoste" de, ewha dinivîse: (Mêrên ko qedera miletan di destên xwe de dibin, li ber destên jinan xwedî dibin. Terbiya xwe di'elimin,

heta axa gorinan ji bîr nakin, û ew tim û tim li wan hukum dikin. Ji lewre methelokê gotiye: ‘Kurmê şîrî heta pîrî’). Rewşen Bedir-Xan karê jina Kurd netenê kebanî û xwedîkirina zarûkan dibîne, li ba wê karê jinan ê giring li dijî nezaniyê şerkirin û perwerdekirina zarokan e.

Bêguman, di vê xebata perwerdeyî de, rola welatperweriyê jî jibîr nake. Rewşen Bedir-Xan bi dengê bilind û zelal weha bang dike: “Xwehên min ên delal, herwekî hûn jî dizanin, derdê milletê me yê mezin û xedar nezanî ye. Nezanî nexweşiyek e, û dermanê wê zanîn e. Nik milletên xwedan hukumat û teşkîlat vê nexweşiyê di xestexaneyên xusûsî de derman dikin, û ji wan xestexanan re dibêjin dibistan. Mamoste bijîşkên wan xestexanan in.”

Em dikarin bibêjin ko Rewşen Bedir-Xan, bi xebat û nivîsên xwe, di pirsên jinan de çalakiyên hêja dane. Rewşen Bedir-Xan di gotareke xwe de, di hejmara 28an a Kovara Hawarê ya bi navê (Jin û bextiyariya malê) de, weha dinivîse; “Gelek jin hene bawer dikin ko rehetî û xweşiya malê bi pere û dewlemendiyê ye. Lê ne wa ye. Se’adet û bextiyarî ne ji dewlemendan bi tenê re ne. Xincîkên belengazan hene ku se’adet û bextiyarî, ji qesra dewlemendan bêtir û çêtir tê de qerar digirin û bi rihati cih dibînin.”

Rewşen Bedirxan dixwaze vê yekê bi jina Kurd bide zanîn: xweşî û bextiyarî ne pere û qesr û qonax in; belê xweşî ew e gotina xweş, danûstandin, kar û xebata ku mirov ji millet û welatê xwe re bike. Xweşiya jiyane ya bi peran diqede lê xweşiya jiyane a welatperwerî û zanîna naqede.

Her giringiya rola jinê û rizgarbûn û pêşveçûna wê di civakê de pêwîst didît. Di jiyane de, jin kok û bingeha dibistana pêşî ye, li ser wê bingehê civak tên avakirin. Kurdan berê gotiye: ‘Kurmê şîrî heta pîrî’. Gelo ew çî nifşên xwendevan û şagirtan e ko ji dibistaneke bê bingeh û herifandî bêne der!! Rizgarkirina jinê, rizgarkirina civakê ye. Pêşiyên berê gotiye: “Jin keleha mêran e”. Lli pişt her mêrê gewre jinek gewre heye. Jin jiyane, Ji dibistana jinê hemû mirovên zanyar, ronakbîr, bijîşk, parêzer, padîşah û fermanदार perwerde bûne.

Ji bilî nivîsîna bi zimanê Kurdî, Rewşen Xanim bi zimanê Erebî jî gelek nivîsar li ser Kurdan belav kirine. Rewşen Bedir-Xan di sala 1971ê de,

beşdarî Kongra Sêyemîn ya Yekîtiya Jinên Kurdistanê (li başûrê Kurdistanê) bû û bi piştgiriya xwe serketina wan parast. Di eynî salê de rûmeta endamtiya Korî Zanyarî Kurd girt û di wê demê de li ser daxwaza Korî Zanyarî Kurd çû Stenbolê. Ev çûna wê ji bo komkirin û civandina destnivîs û pirtûkên ko di arşîv û pirtûkxaneyên Tirkên de, yê ko li ser Kurdan in, bêne civandin û ji Korî Zanyarî Kurd re bêne rêkirin bû. Bi rastî jî ev layiqî pesindanê ye ko, ew di vî karê xwe de bi zanebûn û bi bêdengî bi ser ket.

Rewşen Xanim di sala 1956an de, digel Dr. Nûrî Dersimî, Hesên Hîşyar, Heyder Heyder û Osman Efendî, li bajarê Helebê Komela Zanistî û Alîkariya Kurd damezrandin.

Rewşen Xanim bi bêhinfirê û aramiya xwe li dijî hemû alozî û dijwariyên jiyane biser diket.

Jiyana mirovan bi salan nayê jimartin, ne jî bi mal û milkên ko mirov li dû xwe dihêle. Jiyana bîranîna şopeke kamûranî, qencî, comerdî û mirovatîyê ye. Nemaze ji bo mirovên xwedî berhem, şop, têkoşîn, xebat û kar e.

Ji ber vê yekê, ez dikarim bibêjim ko Rewşen Xanim nemiriye; ew ji me haydar e û em jî pê haydar in.

Herçiqas wê di roja 01. 06. 1992yan de, ji nav me koç kir, lê ew di dilê me de dijî. Heta roja mirinê jî, ew ji bo gel û welatê xwe dixebitî.

Rewşen Xanim li ser doşeka mirinê weha ji min re digot: “Kurê min, dema em hebûn, hûn negiha bûn; îro hûn giha ne; lê mixabin em nema ne. Kurê min, ji hev hez bikin û piştgiriya hev bikin. Yek bin, kurê min, bela wela nebin.”

Piştî ko ez hinekî li ser rewşa Kurdistana Başûr, û li ser hîlbijartinan sekinîm, Rewşen Xanim gotina min birî û weha got: “Kurê min, yekîtiya Kurdan bide min, ezê Kurdistanek azad bidim te.”

Piştî ko Rewşen Xanim canê xwe spart Xwedê, li ser daxwaza wê û li gor soza ko min pê re dabû, min karûbarê veşartina wê kir, û min cendekê wê ji bajarê Banyasê anî bajarê Şamê, li teniştê mêrê wê Celadet û bapîrê wê

Bedirxan Beg, li goristana Şêx Xalidê Neqşebendî veşart. Piştî ko li mizgefta Hemo Leyla, li Taxa Kurdan, li ser cendekê wê limêj kirin, merasîmên veşartinê bi beşdariya gelek ji dost û nasên malbata Bedirxaniyan û nivîskar û rewşenbîran dest pê kir. Ji ber rewşa Kurdan ya dijwar û awarte, û li ser daxwaza keça wê Êseyime Xanim, kesekî tu gotin û tu helbest li ser gora wê nexwendin.

Ev e Rewşen Bedir-Xan, ya herdem, wekî bav û kalên xwe, êşa miletê xwe dikişand û qet jibîr nedikir. Wê mezinahiya xwe ji stûnên Birca Belek girtibû û Rewşenbîriya xwe ji dibistana Sor, ji kaniya Cizîrî û Xanî wergirtibû.

**Berhemên wê yên çapkîrî ev in:**

1-Bîranînên Jinekê, Daner: Gozîda Sebrî, werger ji zimanê Tirkî bo Erebî, 1951.

2-Xeramî We Alamî, Daner: Mukerem Kamil, werger,(çîrok) ji Tirkî bo Erebî 1953.

3-Bîranînên Mamosteyekî (sê pirtûk), Daner: Reşad beg Nûrî, werger, ji Tirkî bo Erebî 1954.

4-Rûpelin ji Toreya Kurdî -1954.

5-Nama Gelê Kurd (helbest - Goran) ji Kurdî bo Erebî 1954 - ji ber

rewşa siyasî navê xwe li ser vê pertûkê nenivîsîye.

6-Name ji Mustefa Kemal Paşa re, werger ji Tirkî bo Erebî (Ev pirtûk bi alîkariya min hat çapkirin û belavkirin).

7-Bîranînên Min, Salih Bedirxan, werger ji Tirkî bo Erebî. (Ev pirtûk jî bi alîkariya min hat çapkirin û belavkirin).

8-El-red 'ele El-kosmopolîtiye, Mehmûd Şîniwî, werger, (ji ber hin sedemên siyasî navê xwe li ser vê pertûkê nenivîsîye).

9-Mîr Bedirxan, perçak ji pirtûka Lutfî ye; lêveger, sala:1992-yan. Libnan.

10-Bîranînên jinekê (perçê diwemîn). Ev pirtûk li Şamê sala 1996an, li çapxana Dar Alai hate çapkirin.

11-Rapora Mufetişê Turk ê El'am, Abdîn Osman, konevaniya Turkirina Kurdan (23) rûpel e, di rojnama (Wijdan) de hatiye belavkirin. Werger ji zimanê Tirkî bo zimanê Erebî. Sala: 1956an. Hejmarên taybet: (303-306-314- bê hejmar).


12- Nerînek li Dîroka Osmaniyan, ya nivîskar Dr. Nûrî Dersimî, werger, ji Tirkî bo Erebî. Min jî di kovara El-Hîwar de belav kir.

13-Celadet Bedirxan wek min naskir. Mexabin berî ko bidawî bike, mir. Min jî di kovara El-Hîwar de belav kir.

**Pertûkên wê yên neçapkirî ev in:**

-Bavê min Abdulhemîd, nivîsa Ayşe keça Sultan Ebdulhemîd e, wergerandina Rewşen Bedirxan e.

-Bîranînên Min. Destnivîs e. Li ba keça wê Sînem xanim e.



## **Rezoyê Osê (1950-2010)**

Nivîskar, helbestvan, zimanzan û rexnevan Rezo - Ebdulrezaqê 'Eliyê Îsayê Osê - roja 10. 10. 1950î li gundê Dekşûrî, yê Qeza Qamişlo, hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya sereta li gundê Tenûrî, û ya navendî û bekelorya li bajarê Qamişlo kuta kiriye.

Aro, Rezo, Stêr, Azad, Pirs, Ebdulrezaqê Osê û Rezoyê Osê, navnîşanên torevaniyê bûn ko ji sala 1970yî ve, Rezo li xwe kiribûn, û nivîsandinên xwe di gelek kovar û rojnameyan de, weke Stêr, Armanc, Dugir, Metîn, Dengê Azadî, Zanîn û ... hwd, bi van navan diweşandin.

Sala 1971ê, bi mebesta xwendinê, çû Berlîna Rojava û du salan di pê re çû Yekîtiya Sovyatê. Herdû salên pêşî wî xwendina xwe li bajarê Baku û Krîverok, û jê pê ve li Mosko endeza petrolê li Înstîtuta Gubkîna, berdewam kir. Piştî wergirtina magîsterê, di sala 1980yî de, Rezo vegeriya Sûriyê, 10 salan li Rimêlanê û 13 salan wek endazyarekî pîspor ê serbixwe li Qamişlo kar kir.

Rezo gelek gotar û lêkolîn belav kirine, wilo jî helbest, kevneşop û nûjen nivîsîne, şano di kovaran de belav kirine, folklor daye hev û belav kiriye, kurteçîrok nivîsîne, çîrokên zarokan dane hev û pênc pirtûk çap kirine.

### **Xebata Rezo bi kurtî:**

-1972-1974 Endamê redaksiyona kovara Şoreşgêr, ko li bajarê Berlîna Rojava derdiçû, maye. Di van salan de jî, bûye endamê komîta çapderîn, ko

sê pirtûk li Berlîna Rojava çap kirin: dîwana S. Hêzanî - bi Kurdî. Helperkên Kurdî yên folklorî - bi zimanê Elemanî. "Miletek berxwedanê di ber hebûna xwe de dike" bi zimanê Elemanî.

-1977, Kursa fêrbûna zimanê Kurdî li bajarê Moskow, ji grûpek xortên Kurd ên zanîngehaê re vekiriye.

-1977, Bûye endamê komîteya damezirandina "Hevbenda Kawa bo wêjeya Kurdî" ko ji Bavê Nazê, Dr. m. E. Nejarî, Dr. Se'dedîn Mele û Rezoyê Osê, li Moskow pêk hat. Vê hevbendê gelek pirtûk bi zimanê Erebî, çî wergerandin, çî jî afirandin, dane weşandin.

-1980-1981. Berpirsiyariya belavoka "Ronakbîr", li Sûriya, kiriye.

-1983-1993. Berpirsiyariya kovara "Stêr" bi Zagrosê Haco re, wek damezirêner, paşê bi Dilovan û bi hin rewşenbîrên din re, kiriye.

1993. Endamê komîteya berpirsiyar a kovara "Pirs" bû.

10. 2002. Endam û yek ji damezirênerên "Komîteya Xxelata Cegerxwîn" bû.

-2003. Bûye endamê komîteya şêwirdarên kovara "Pêl" ko, li Elmanya der têt. Vê salê jî bûye endamê "PEN" a Kurd.

-12. 2003. Vexwendî çalakiyên sedsaliya Cegerxwîn, li Amedê û Izmîrê bûye. Li wir "Xwendinek di Berhamên Cegerxwîn de" pêşkêş kiriye.

-13. 2004. Endam û çalakdarê komciwîna duwemîn a "Rojên Wêjeyî li Amedê" bûye û beşdarî kiriye.

-14. 2005. Endamê konferansa "PENa Kurd û PENa Tirk" bû. Ew di bin çavdêriya "PENa Navnetewî" û "UNESCO" de, li Amedê pêk hat.

-12. 2005. Vexwendiyê festîvala Rewşenbîrî ya yekemîn li Duhokê bû, da lêkolînekê li ser "hevoksaziya Kurdî" pêşkêş bike. Lê ji ber sedemên rewşa navdewelatî di navbera Sûriyê û Îraqê de, Rezo nikarîbo amade bibe, tenha lêkolîna xwe rê kir.



-16. 2006. Endam û çalakdarê Festîvala rewşenbîrî ya duyemîn a li Duhokê bû.

-17. 2008. Endam û çalakdarê festîvala Cegerxwîn a li Hewlêrê bû.

-18. 2008. Wergêrê xelata yekemîn a "Fablê" li Wanê bû.

### **Berhemê Rezoyê Osê Yên Çapkirî**

Di sala 2005an de, berhevkerin û nivîsandina bi zimanê Kurdî, Rezoyê Osê, û wergerandina bo zimanê Erebî Dr. M. Nejarî, pênc pirtûkên zarokan. Li Sûriyê di bin sernavê " Çîrokên Kurdî yên gelêrî û yên zarokan" hatin çapkirin û belavkirin, ew jî evin:

1-Dîk-Dîko, çapa didiwa, çar çîrokan himbêz dike. Çapa yekê sala 1991: Rovî-beranê kovî. Kerê pişturmî. Kêça kezîkur. Dîk-Dîko.

2-Libhinarê, çapa didiwa, çar çîrokan himbêz dike. Çapa yekê sala 1991: Desbiratiya Rovî û Melê. Libhinarê. Gurê tirsonek. Pîrê û Rovî.

3-Bavê Hepûn. Çapa Yekê: Bavê Hepûn. Hirçê û Mihemedoko. Kero hevsarzero. Kêza Kêzaxatûn.

4-Şengê û Pengê. Çapa yekê: Şengê û Pengê. Gurê har. Keçên Pîrê. Beq û Tûpişk.

5-Finda Şemal. Çapa yekê: Finda Şemal. Gavan û Gur. Mih û Gur. Fatika Gavan.

### 6-Pitûka bi navê: "**Berhemên Rezoyê Osê, Koma 1**"

Berhemên di vê çapê de rengereng in, ew jî ev in:

-Rexna li rexnê.

-Xwedîkirin û guhdana zarokan di civaka Kurdiya kevin de.

-Tûjik.

-Civîna pêlavan.

-Helbest.

-Merganê

-Xilmaşî.

Pirtûk bi alîkariya KOMELEYA RAMYARÎ YA SWÊDÎ-KURDÎ, 12ê AVDARÊ, hatiya çapkirin.

Mixabin. Nexweşiya bêbext, pênuşa Rezoî Osê, ew pênuşa zêrîn di nava wê dana bi rûmet de, rawestand û kar û xebata wî di warê wêjeya Kurdî de nîvco hişt; û di 04/03/2010an de, çû ber dilovaniya Xwedê û li goristana gundê Dekşûriyê hate veşartin.

### **Çavkanî**

BERHEMÊN REZOYÊ OSÊ KOMA 1. Çapa yekemîn, Nîsan 2014. Weşanxana Ar 41, Stanbol.

Têbînî: Berhemên Rezoî Osê yên neçapkirî:

-Wergêra romana bi navê "Donkîşot" ya nivîskarê Êspanî Migêl Dê Sêrpantês. Hîna destnivîs bû ji nivîsgeha wî nependî bû.

-Berhemên Rezoî Osê Koma 2.



## **Ridwan Yûsif**

Di sala 1968an de, li bajarê Hisiça jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û lîseyê li dibistanên Hisiça biserî kiriye. Bawernameya Peymangeha (SEF XAS) di sala 1989an de wergirtiye. Bawernameya Zanîngehê beşê (Mamostê refê) di sala 2008an de wergirtiye, û 30 salî maye mamosteyê zarokan (Qonaxa seretayî).

Di sala 1985an de, xwe fêrî zimanê Kurdî kiriye û dest bi nivîsandina helbestê kiriye.

### **Berhemên çapkirî ev in:**

- Roniya jînê 2018 (Sirûdên zarokan)
- Nejbîr 2022 (Helbestên terazû)




## Rizoyê Xerzî

Helbestvanekî Kurd e. Xerzî di sala 1966an de, li bajarê Qamişlo, hatiye dinyayê. Li Zanîngeha Helebê beşa Zimanê Ingilîzî xwendiyê, lê xwendina xwe ji ber hin sedemên taybet kuta nekiriye (ta bi sala sisiyan xwendiyê).

Yek ji endamên komîteya amadekariya kovara Rojda bû. Ji sala 1988an ve dest bi weşandina helbestên xwe kiriye, di kovarên mîna Zanîn, Gulistan, Nûdem, Buhar û gelek kovarên din de weşandine. Di sala 2000î de, pirtûkeke helbestan bi navê *Dema Çavên te*, û di sala 2011an de jî pirtûka bi navê (Dilê min ne dîne), dane çapkirin. Endamê Yekîtiya Nivîskarên PENa Kurd e. Yek ji rojnamevanên rojnameya Azadiya Welat e; yek ji damezranerên komeleya KARGER a lêkolîn û pêşxistina ziman e; yek ji edîtorên kovara zarokan ŞEMAMOK e. Endamê Koma KcKurd e. Di sala 2021ê de, pirtûka wî ya helbestan a bi navê (Bêyî Pêjna Te), ji weşanên Belkî, derket.

Ji sala 2006an heta sala 2016an di beşa çapemeniyê ya şaredariya Sur a Amedê de xebitiye. Di sala 2016an de, piştî hatina qeyûman, tevî gelek kesên din, dawî li karê wan hate anîn û ew ji şaredariyê derxistin.

Di sala 2018an de, derdora salekê li Weqfa Mezopotamyayê wekî kargîrê karê weşanê xebitiye. Di dawiya sala 2019an de, bi destpêkirina rojnameya Kurdî ya heftane (Xwebûn), li wir dest bi kar kir.



## Rojdiyar Xelef Hemê

Di sala 1960ê de, li taxa Qidûrbeg, li bajarê Qamişloyê, jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretaî li bajarê Qamişlo bi dawî kir, lê ji ber rewşa abûrî xwendina xwe berdewam nekir. Helbest bi sê zimanan dinivîse Kurdî, Erebî û car caran bi Ingîzî. Ew ji sala 1971ê ve, ji bajarê xwe Qamişlo koçber bûye. 24 sal ji temenê xwe di navbera zindan û serdanên leqên ewlehiyê yê rijêmê bûrandine. Çar sal ji wan, di zindana Sêdnaya de derbas kirine, û 20 sal bi serdanên senterên ewlehiyê derbas bûne. Sedemên girtina wî ev bûn: Ku mala wî ya li Helebê, li taxa Eşrefiyê, bûbû dibistana zimanê Kurdî û cihê şevbihêrk û çalakiyên wêjeya Kurdî. Niha li kampa Domîz bicih bûye.

Di sala 1985an de, li Helebê destpêka cîhana helbest û siyasetê bû.

### Pirtûkên wî yê çapkiri:

١- قارب ورفي شعر كلاسيكي دهوك مطبعة ( Gazî ) ٢٠٢١/٣/١٥

٢- (Koçber û penaber im) Helbestên kilasîkî -Duhok: çapxana:Gazî 26/7202

٣- بقلات غجرية شعر كلاسيكي وحديث..دهوك مطبعة ( Gazî ) ٢٠٢٢/٩/٢٠

### Pênc pirtûkên neçapkiri ji helbest û kurteçîrokan hene:

1- / Ji Geza sêvê min zanî / Helbestên Kurdî kilasîkî.

2- / Ne bext û ne zanîn / Helbestên Kurdî nûjen

٣ / -حب في زمن الجوع / شعر عربي..

٤ / -البصمة البيضاء المشاكسة / قصص قصيرة جداً ..

5-/ Landika lawêjan / Helbestên Kurdî bo zarokan.

### **Helbestên ji dîwana duyem bûne stran ev in:**

Koçber û penaber im ( islam Zaxolî ).

( Koçber û penaber im ) bi dengê/ Islam Zaxolî.

( Qamişloka evînê ) bi dengê/ Selah Resûl/.

( Bi kene xwe bi lbîne ) ( Qamişloka min delaloka min) bi dengê/ Ihtîdal Mehmûd/.

( Pêşmergên rojên giran) bi dengê / Ihtîdal Mehmûd û Îsa Ibrahîm/..

( Dewleta Kurdî ) ( Ez û te dilber ) bi dengê/ Mîdya Hiso û Îsa Ibrahîm/..

( Efrîna min buhişta min) bi dengê /Sîpan Mêrkan/..


(Berî her tiştî Kurd im) bi dengê /Aras Agir/.

Di 05/10/2013an de, li ser hola /Mihemed Arif Cizrawî/ Duhok, deh stranbêjên me yên Kurdên Sûriyê helbesta min gotine ( Xewna Kurdistanî)  
1- Ihtîdal Mehmûd 2- Roken 3- Nûşîn 4- Jiyan 5- Gulbuhar 6- Îsa Ibrahîm 7- Hişyar Yaqûb 8- Besam Dêrkî 9- Şivan Cizêrî 10- Xemgîn Qamişlo..

Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistan Sûriya ye.

Ji ber çalakiyên wî li başûrê Kurdistanê, pir caran hatiye xelatkîrn (Sê mêl)  
(Dukok) û li kampa Domîz û ji rêxistinên mirovayetiye jî.

Du salan ji bo şano û stranên zarokan bêberamber û xwebexş di sentera  
(Aktid) bo penaberan karkiriye.



## **Rojîn Mihemed Mûsa**

Rojîn Mihemed Mûsa, ji gundê Şora Rojhilat, yê girêdayî bajarokê Zirgan e. Zirgan, di navçeya gelek bajaran de cih digire, mîna li ser xeta Serê Kaniyê, Til-Temir û Dirbêsiyê. Ew bîst û şeş salî ye, Xwendekara Zanîngeha Rojava ye, beşê Wêje û Zanistên Civakî, û sala xwe ya dawî dixwîne. Li bajarê Dirbêsiyê û Zirgan Peymangeha Kurdî qedandiyê, û herwiha hemû astên Kurdî jî derbas kirine. Xwendina wê ya Erebi Hiqûq bû, lê ji ber rewşa şer 2014 li bajarê Heseke wê xwendina xwe bidawî nekir.

Di 2019an de, dest bi nivîsandina zimanê Kurdî û çîrokan kir. Ew bi xwe keça siyasetmedar mamoste Mihemedê Mûsê ye, ji zaroktiya xwe ta roja îro, bavê wê bi wê re piştgir û alîkar e. Him bav e, him jî heval û şêwirmendê jiyana wê ye.

### **Berhemê wê ev in:**

Berhema çapkirî bi navê: " Xewna Meha Dehan", MG, Qamişlo, 2020

### **Berhemên destnivîs ev in:**

- 1-Çîrokên zarokan.
- 2-Gotarin /Siyasî, Civakî û Dîrokî/.
- 3- Komêk çîrok li hêviya çapkirinê ne.



## Ronî ELÎ

Weke her zarokê Kurd ku di şevreşiyê de, çav li jiyane vekirin, û bi pirûncekan bi dîwarê ronahiyê diket û li gerjenîngekê digeriya ... qîrîna jidaykbûnê bi lêv kir.

**Jidayikbîn:** Di 1968an de, li bajarê Kobanî.

**Xwendin:** Di navbera dibistanên gundên Bîrzinar û Bîrxatê de, xwendina seretayî bidawî kir, jiber ku wê demê danişiyê gundê xwe, Golqulingê bû.

Di sala 1983yan de, xwendina amadeyî li bajarê Kobanî kuta kir, û di eynî sale de, tevî rêxistina partiya Hevgirtina GEL bû.

Ji ber ku hezkirê helbestê û folklor bû, di sala 1985an de, û ligel hin hevalên xwe, yekemîn koma folklorî bi navê Kobanî damezirandin. Ew kom bû wek zemîna rêxweşkirina nivîsandina Şano û berhevkirina pend, metelok, stranên şîn û şahiyên û herweha dîlanên folklorî yê herêma Kobanî.

Di sala 1985an de, bi biryarekê ji dibistanê hate bidûrxistin, û hemî hewildanên vegeerê biser neketin.

Di 8. 10. 1992yan de, piştî 40 rojê ji jiyana hevsergiriye, ji aliyê hêzên Ewlehiye ve hate destgîrkin; û çî nivîs û destxetên ji sala 1983yan de hebûn wenda bûn, çî yê ku hatin destbiserkin û çî jî yê ku di bin axê de zerzilîn.



Di sala 1995an de, bawernameya Bekalorya di zindana Edra de, bidest xist û li kolîceya yasa li zanîngeha Helebê hate tomarkin.

Piştî derketina ji zîndanê di 30. 10. 1995an de, û jiber kar û çalakiyên siyasî û herweha stûbariyên rêxistinê, dikete nav pêla nivîsandina gotarê de, çî bi zimanê Kurdî û çî jî bi zimanê Erebî, ji ber ku weke endamê komîteya birêveber ya rojnameyên DENG û HEVGIRTINA GEL û kovara (الرأي الحر) hate binavkirin. Ji bilî nivîsandina di rojnameyên الحياة والزمان û malperan de.

Piştî binavkirina partiya AZADÎ, ya ku ji yekbûna herdu partiyan, Hevgirtina GEL û ÇEP, di sala 2005an de hate lidarxistin, di komîta serokayetiye de karê xwe berdewam kir heta sala 2010an; di wê salê de, biryara bidawîkirina ji karê rêxistinê re da.

#### **Berhemên bi zimanê Kurdî :**

- 1- Sirûda hastên penaber / ji weşanên Ava 2019
- 2- Çivîkên baskokirî / ji weşanên Ava 2019
- 3- Arvanekî ji peyvên / ji weşanên Ava 2021
- 4- Bajarekî bê piştan / ji weşanên Ava 2021
- 5- Kulmek AX / hîn çap nebûye
- 6- Heviyên razayî / hîn çap nebûye
- 7- Yareke bê dil / hîn çap nebûye

#### **المجموعات الشعرية باللغة العربية :**

- ١- صوت بلا صدى إلى مشعل التمو / منشورات دار آفا ٢٠١٩
- ٢- رحيل الجن إلى السماء / منشورات دار آفا ٢٠١٩
- ٣- تذكرة عاشق في نفق الهزيمة / منشورات دار آفا ٢٠٢١
- ٤- فارس صهوة الريح / منشورات دار آفا ٢٠٢١

#### **مجموعات لم تطبع بعد**

- ٥- أوراق شرفة خريفية

- ٦- حب بلا مأوى
- ٧- قصة حب في مهب الديناميت
- ٨- وعود تحتضر في عشق السراب
- ٩- خيول الهزيمة
- ١٠- الغرق في دخان الحنين
- ١١- قناديل السراب
- ١٢- ولادة المسافات
- ١٣- غيمة حبلى بالرصاص
- ١٤- عواء الليل
- ١٥- حقنة في وريد الليل
- ١٦- نذبات من الجحيم
- ١٧- حفلة على الرصيف
- ١٨- غرغرة الذكريات
- ١٩- مخاض من الكوابيس.



## Rûken Silo

Rûken Silo ya kû bi navê Salîha Qasim tê naskirin. Ew ji Rojavayê Kurdistanê ye, ji gundê Carûdiyê yê girêdayî bajarê Dêrika Hemko ve. Lê di sala 1989an de, li paytexta Sûriyê, li Şamê, li navçeya Yebrûdê jidayik bûye. Navê bavê wê Qasim Silo ye, û dayika wê Newroz Neso ye. Xwendina seretayî û navîn li wir qedandiye.

Di sala 2005an de, li bajarê Şamê bi zimanê Erebî dest bi helbest û nivîsandina kurteçîrokê û bîranînan kiriye. Piştî ku hatiye Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Dêrika Hemko bicih bûye.

Di sala 2017an de, xwe hînî zimanê Kurdî, ango zimanê dayikê, kiriye û piştî wê dest bi nivîsandina helbestê, bi hemû cûreyên wê ve, kiriye û bi dehan helbestên wê ên niştîmanî, welatparêzî û evînî di kovar û rojnameyên herêmê û derveyî herêmê de hatine belavkirin. Li kêleka wan kurteçîrok, bîranîn û gotarên civakî û wêjeyî hatine çapkirin û belavkirin, û pê re gelek lêkolîn li ser wêje û zimên kirine.

Rûken Silo di Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê de, wekî hevseroka şaxê Dêrikê û endametiye, cih girtiye û bi erkê xwe yê neteweyî û wêjeyî rabûye; di gelek yekîtiyên din de jî, beşdarî şevbuhêrkên helbestê û çalakiyên wêjeyî bûye, nexasim şevbuhêrkên HRRê û pêşkêşvaniya gelek bernamêyên çalakiyên yekîtiyê yên wêjeyî û cejna Newrozê kiriye.

## **Berhem**

-Dîwaneke wê ya bi navnîşana ( Lavijên Jiyanê ) çapkirî heye, ya ku ji 48 helbestên nûjen û kilasîk û 11 bîrhatinan, pêktê. Qamişlo, 2023.

### **-Ji xelatên ku wergirtine:**

1-Xelata bi navê Jina Ciwan.

2-Xelata Rêxistina Nûdem.

3-Xelata Rêxistina Pîn.

4-Xelata kovara Konê Wêjeyê.

Helbesteke wê di dibistanên seretayî de tê derisdan. Hêjayê gotinê ye ku gelek hevpeyvînên wêjeyî, rewşenbîrî û çandî pê re hatine kirin.

Heya roja îro jî Rûken Silo, di nivîsandina zimanê Kurdî de, bi xwestek û vîn berdewam e.



## **Rustem Welat**

Nivîskar û şêwekar Rustem Welat, di sala 1990î de, li gundewarê Amûdê jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gundewarê xwe qedandiye. Pişt re li bajarê Qamişlo xwendina navîn biserî dike.

Di sala 2006an de, koçberî bajarê Helebê dibe, û li wir xwendina xwe ya amedeyî (bakalorya) bi dawî dike û derçûna peymangeha Amedekirina Mamosteyan beşê Hunera Bedew bidest dixê.

Di sala 2011ê de, mîna endamekî serbixwe tevî tevgera siyasî li bajarê Helebê dibe, û komela bi navê Hilat, bi alîkariya hevalên xwe ava dike; ew wek kesekî serbixwe di Encûmena Niştîmanî ya Kurdî- Sûriya- beşê Helebê de kar kiriye.

Di sala 2013an de, carek din vedigere Qamişlo û mîna kesayetekî serbixwe karê çapemeniyê dike. ew yek ji damezirênerên rojnama Ronahî li Qamişlo ye.

Di sala 2018an de, wek mamoste tevî Zanîngeha Rojava dibe.

- Kesek ji Encûmena Rêveber ya Fakolteya Hunerên Bedew li Qamişlo.
- Mamostê Hunerê li fakolteya Perwerdê, beşê Amadekerina Mamosteyan, Waneya Taybet bi Hunera Bedew e.

Di sala 2020an de, carek din koçberî Ewropa dibe û li Elmanya biçih dibe. Ji ber rewşa koçberiyê hindêkî nivîsandin li paş ketiye. Tevli pêşangeha pirtûkan a bi navê Herekol dibe, ya ku her sal li bajarê Qamişlo lidardikeye.

**Pirtûkên ku hatine çapkirin ev in:**

- Dîwana Warê Xurbetê
- Dîwana Serdem

**Pirtûkên ku ji çapkirinê re amade ne:**

Nerîna nû, ji sala 2020an de amade ye, lê hîn çap nebûye.

Pirtûkên ku kar li ser tê kirin: Bîranînên Rewşa Siyasî li Rojava.



## Rûxweşê Zîvar

Helbestvan û nivîskar Rûxweşê Zîvar di 20. 06. 1963yan de, li gundê Dargirê yê girêdayî herêma Efrînê li Rojavayê Kurdistanê, jidayik bûye.

Rûxweşê Zîvar xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe dike; pişt re tevî malbata xwe diçe Helebê û di sala 1985an de li zanîngeha wê bawernameya xwe ya endazyariya çandiniyê werdigire, û di eynî salê de jî dizewice û niha bavê 3 kur û keçekê ye.

Rûxweşê Zîvar, bi herdu şêweyên klasîk û nûjen helbestan dinivîse, bi dehan helbestên wî bûne stran. Ew niha li xerîbiyê (li Danmark) dijî.

Rûxweşê Zîvar yek ji avakerên Mîhrecana Helbesta Kurdî li Sûriyê ye, herwiha hevrê û hevçaxê piraniya helbestvanên navdar yên Kurdistana sûriyê ye.

Wî di nava salên 1980yî de, dest bi xwendin û nivîsandina Kurdî kiriye, di wê çaxê de, rastî zehmetiyên berçav hat.

Rûxweşê Zîvar herwiha endamê Koma Xanî ya Çand û Toreyê bû, û di gelek çalakiyên wê de beşdarî kiriye.

Li bajarê Helebê û piraniya bajarên Rojavayê Kurdistanê, ew di semînerên wêjeyî û êvarên helbestan de amade bûye, û di gelek pêşbaziyan helbestê de jî yek ji endamên komîteyan biryarder de bûye.

Lê xala herî girîng di jiyana toreyî û çandî ya Rûxweşê Zîvar de ew e dema di nîveka salên 80yan de, rastî Apo Osman Sebrî tê.

Ev bû bêtirî 35 salan ku Rûxweşê Zîvar bi zimanê Kurdî dinivîse, û gotar û nivîsên wî bi berdewamî cihê xwe di rojname û kovarên Kurdî de digirin.

Rûxweşê Zîvar di sala 2018an de, bi xelata nivîskarê Kurd Ebdilrehman Alocî ya 2018an, ji hêla yekîtiya rojnamevan û nivîskarên Kurd li Sûryê, hatiye xelatkirin.

### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**


1- "Goristana Bê Gor", ew di sala 1991ê de, bi piştgiriya KOMA XANÎ ya çand û toreyê ji hêla weşanvan Hoşeng Kurdaxî ve, li Beyrûtê hatiye çapkirin

2- "Xewnên Tazî", di sala 2003yan de, ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê Duhokê ve, li Duhokê hatiye çapkirin

3- " Evîna bê sînor" di sala 2021ê de, ji hêla weşangeha SerSera (Dr. Beşar Mistefa), li Berlînê hatiye çapkirin

Herwisa jî, lêkolînek Rûxweşê Zîvar bi navnîşana "Kurd û Bingehên Hişyariya Neteweyî" çapkirî heye; ew di sala 2020an de, ji hêla weşangeha SerSera (Dr. Beşar Mistefa), li Berlînê hatiye çapkirin.





## Salih Bozan

Di sala 1951ê de, li Kurdistana Rojava, li gundê Şewitî jidayîk bûye. Gundê Şewitî bi bajarokê Girê Sipî ve girêdayî ye. Li Yekîtiya Sovêtê li uneversîta Kiyêv, di sala 1978 de, Diplom "Master Ekonomik" wergirtiye.

Di Mozexana Bajarê Helebê de xebitî, berpirsiyarê (Manager) Beşa Hunera Nûjn bû.

### **Berhemên Çapkirî:**

1. **Lawo.** Kurteçîrok. Dihok 2003.

2. Wergera dîwana Ebdilwehhab Beyatî

**"Helbestên evîne li ser dergehên heftane yên cihanê"**. Istanbul 2004.

3. **Isra û Mihrac.** Werger û lêkolîn. Erbîl 2014.

4. **Marista.** Şano. Weşanên Pîrê 2019.

5. **Koçberî Karê Te bû.** Helbest. Boon 2021

6. **Mellace.** Helbest. Werger. Boon 2022.


### **Di pin çapê de:**

1. Derwêş li Rastiyê Digerin. Şano. Werger. Di bin çapê de ye.

2. Gilgamiş û Enkîdo (Çîroka Destanê û Lêkolîn).

**Destnivîsên neçapkirî:**

1. **Taw Tî Çîng.** Şareza Law Tso. (Werger-Şîrove-Lêkolîn).
2. **Helbestên Jinên Piştonî** (Landayî). Werger û Têbînî.
3. **Çîrokên Şewitiyê** û Lêkolîn.
4. **Lavêjên Xirîstanî.** Helbest. Werger ji tîpên Erebi û lêkolîn.
5. **Srûda Welêt.** Helbest.
6. **Gewdistan.** Helbest.



## Salihê Heydo

Navê wî Salihê kurê Hisên e, kurê Mihemed e, kurê Sima'îl e, kurê Faris e, kurê Îdo ye kurê Izêrê Heydo ye. Malbata wan ji hoza Gabara ye. Di sala 1918an de, ji ber kuştin û fermana Ferîq paşayê Osmanî, ji Şingalê hatine Cizîrê - devera Amûda Rojavayê Kurdistanê, piştî ku 35 kes ji malbata wan di wê fermanê de jiyana xwe ji dest dane. Navê diya wî Fatime keça Mihemed Emînê Eliyê Derwêşê Esmer e, ji deşta Xerza ye ku dikeve Başûrê çiyayê Sasûnê, li Bakurê Kurdistanê. Herwiha, malbata diya wî jî ji ber şervanên şoreşa şêx Se'îd û alîkarê serhildana Malabata Eliyê Ünîs ê Sasûnî bûn, di salên 1925-1937 de, piştî rûxandina şoreşê û şewat û talankirina gundê wan, ew jî mişextî binxetê dibin, û li Cizîra Rojavayê Kurdistanê bicî dibin.

Di sala 1956an de, 6ê Avdarê li gundê Hesê Êso ku dikeve ser devera Amûdê, parêzgeha Heseke, jidayik bûye. Xwendina seretayî li gund û ya navendî li bajarê Heseke xwendiyê.

Di sala 1970yî de, dest bi nivîsandin û xewndina zimanê Kurdî, bi tîpên Latînî, digel tîpên Kurdî kirîlîk, ku Kurdên Ermenistan, Gurcistan û Azerbêcanê pê dinivîsin, kiriye û helbest û nivîsandinên xwe li ser rûpelan dane hûnandin û belavkirin. Di sala 1975an de, pirtûkên xwendina Zimanê Kurdî ji pola yekem heya şeşan afirandine, digel wêne û resmên di hindirê wan de, ji ber ku ji hêla şêwekariyê ve jî, ne bê par e. Herwiha, zane li piraniya amûrên sazê jî bide, weke Tembûr, Biziq, Berbet (Ûd), Cumbiş, Bilûr

û cotik. Kar û xebatek berfireh di warê folklor û zargotina Kurdiya Kurmancî de kiriye, ji gencîneya ku berev û şirove kiriye tev deq û mijarên temam û şirovekirina wan ev in:

-3000 dûrik ji folklorê Kurdî berev kirine, û hemî şirove kirine, tev noteyên wan yên muzîkî digel cih, dever û herêmên wan. Ew jî yên paleyî, destarhêrandin, qirşvanî, cûnîkut, savarkelîn, bêrîvanî, dewkilandin, dêran, kirîvantî, govend, berbûkî, giraniyê û bêlûteyên feqehan.

-4000 Pend û gotinên pêşiyar (metelok û edyom)

-1500 Sirûdên lîstikên zarokan, digel şirovekirin û danasîna herêmên wan.

-500 Çîrokên folklorî yên şevbuhêrkan.

- 500 Qinyatên kudewarî yên civakî.

-1000 Têderxistinok û zûgotinokên Kurdî.

-7000 Wêneyên keç û jinan digel yên mêran bi cil û bergên resen yên folklorî ji her çar perçeyên Kurdistanê, û dever û herêmên Kurdnişîn.

-100 Sîdî bi deng û reng, digel keç û xortan, jin û mêran, û saz û awazên Kurdî yên resen, herêm bi herêm gund bi gund.

### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

-Kêferat dîwana yekan 1985 Beyrût.

-Birîna kûr dîwana duduyan 2, Şam 1988. Partiya Pêşverû ya Kurd li Sûriya

-Serpêhatiya Tûmazê kildanî û axayê Şerwanî 1996, Şam (çîrokên jîwarî)

-Evîna welêt dîwana 3 sisyan 1997, Şam Partiya Pêşverû ya Kurd li Sûriya.

-Komek dûrik ji folklorê Kurdên Rojavayê Kurdistanê, bergê yekem, Silêmanî, çapxana Şiwan 2006.

-Komek dûrik ji folklorê Kurdên Sûryayê, bergê duyem, çapxana Şiwan 2006, Silêmanî.

-Komek dûrik ji folklorê Kurdên Sûryayê bergê sêyem çapxana Aras Hewlêr 2009.

-Komek dûrik ji folklorê Kurdên Sûryayê bergê çarem çapxana Aras Hewlêr 2009

-Dûrikên govendî ji folklorê Rojavayê Kurdistanê. Bergê pêncem Çapxana Enistutiya Gelepûrê Kurdî Silêmanî 2014.

-Ravekirina stranên gelêrî çapxana Hewart Dihok 2013.

-Buxçika bûkan ji zargotina biçûkan (sirûdên lîstikên zarokan) çapxana Kemal Dihok 2012.

-Pîra Bûk û çend çîrokên kevin û dêrîn ji gencîneya folklorê me yê zêrîn, çapxana Kemal Dihok 2012.

-Çend çîrok ji folklorê Kurdî yê devera Şengal û Amûdê çapxana Hewart Dihok 2014.

-Bîr û behweriyên Kurdewarî çapxana Enistutiya Gelepûrê Kurdî Silêmanî 2013.

-Pîra bûk çîrokên devera Amûdê û Şingalê 2013 Silêmanî

-Minminîkên rengîn li nav gulên bi bîn, Akadîmiya Celadet Bedirxan, Qamişlo, 2015.

-Şewq û Fener, dîwana 4an, partiya demuqrata pêşverû Kurd li Sûriya, Heseke, 2015.

-Serpêhatiyên jîwarî ji civaka Kurdewarî, Heseke, 2015.

-Sirûdên bilbilan li nav baxên gulan, dîwana 5 an, Akadîmiya Celadet Bedirxan, Qamişlo, 2015.

-Sirûdên lîstokan ji folklorê zarokan, Heseke, 2015.

-Bexçeyê têderxistinokan ji mamikên zarokan, Heseke, 2015.

-Gencîneya cewher ji dîrokên nebîter, Akadêmiya Celadet Bedirxan, Qamişlo, 2016.

-Entîkeyên kêmpayda ji folklorê Kurda, Heseke, 2016.

-Hestekî nazik ji dilekî tenik, dîwana 6 an, partiya demuqrata pêşverû Kurd li Sûriya, Heseke, 2016.

-Bêlûte û giranî ji folklorê Botanî, Heseke, 2016.

-Sirûdên Tembûrê li ber rengê hingûrê 2016 Tirbespiyê Akademiya Şehîd Yekta Herekol.

- Sirûdên lîstokan 1 2 3 4 Enîstûtiya gelepûrê Kurdî Silêmanî 2016

-Stranên şahî û govenda ji folklorê wînda, weşanxaneya DAR ê, Qamişlo 2017.Z.

-Sirûdên zarokan ji folklorê zarokan, weşanxaneya DAR ê, Qamişlo 2017.Z.

-Dîrokên hemereng ji baxê qeşeng, Heseke 2018.

-Ronak û Rewşen ji baxê gulşen, dîwana 8 - 2019.

- Geşt û guzar li baxê gulzar 2019 ji weşanên Rojava TV.

- Dîrokên kar û xebatê ji zargotina civatê 2019.

- Çivîkên dilşadiyê li gulîstana azadiyê, Heseke 2020

- Çend mijarên cuda ji çanda Kurda, Heseke 2020

- Çîrokên balkêş ji geştê derwêş, Heseke, 2021

- Ji bîrhatinên berê bi qelem û defterê, Heseke, 2021

-Dengê Kurdên Qevqasê di rojên reş û asê desteya çandê 2021 Qamişlo

-Dîrokên palan ji devê bav û kalan 2021 Heseke

- Dîrok û stran ji devê keç û jinan 2021 Heseke
- Kurt û kin ji serpêhatiyên min 2021 Heseke
- Sirûdên hopanyê ji listokên biçûkaniyê Heseke 2020
- Dîtin û serbûr ji nêzîk û dûr 2022 Heseke
- Şerbikê zîv û zêr ji gerra doh û pêr 2022 Heseke
- Ronahî û find ji şevbuhêrkên gund 2022 Heseke
- Hest û dîdar ji gerra war bi war 2022 Heseke
- Helbest û ristar ji dilekî evîndar dîwana 11 Heseke 2022
- Evînek rasteqîn ji dilekî bi tîn dîwana 12 Heseke 2022
- ken û girî ji rojên buhirî 2022 Heseke
- Komek serpêhatî ji kanga civatî 2022 Heseke
- Lawirname ji çanda me 2022 Heseke
- Ez û civakê li kolan û zikakê 2022 Heseke

**Her wisa ev xelatên rêzgirtinê yên jêrin wergirtine:**

- Xelata Tîrêj ya saziya zimanê Kurdî 2006 Qamişlo.
- Xelata Melle Ehmedê Palo ya yekîtiya nivîskar û rojnemevanên Kurd li Qamişlo 2013.
- Xelata wîzaretê rewşenbîrî ya helbestê herêma Kurdistanê Hewlêr 2007.
- Xelata rêzgirtinê ji bo folklorê Kurdî ya komîta navendî, nivîsgeha siyasî ya P.D.P.K.S, 2013.
- Xelata Cegerxwîn ya tevgera ciwanên Kurd li Qamişlo 2013.

-Behwernameya rêzgirtinê ya peymangeha Bedirxan ya zimanê Kurdî Dêrik 2013.

-Behwernameya rêzgirtinê ya werzişvanên Kurd li Sûriyê Heseke 2013.

-Xelata Ronî ya jinên Kurd li Qamişlo 2012.

-Xelata tevgera xwendekarên Kurd li zanîngeha Heseke 2014.

-Behwernameya rêzgirtinê ya çîmangeha pêlîstank Heseke 2015.


-Xelata ofisa Cegerxwîn.

- Xelata HRRK 2021 Qamişlo

-Bawernameya lîsansê - beşê Wêjeya Kurdî ji hêla Zanîngeha Rojava wergirtiye.

- 2022, Xelata Rojên Huner û Çanda Kurdî li Berlînê wergirt.





## Samî Mela Ehmedê Namî

Di sala 1939an de, li gundê Tilşe'îra Aşîta, qeza Qamişlo, li Rojavayê Kurdistanê hatiye dinyayê.

Xwendina dibistana sereta li vî gundî bi dawî anî, û digel hejmarek xort û kalên gund li dibistana fêrkirina zimanê Kurdî, ya ko bavê wî Namî mamostê wê bû, hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bû, ta ko wî hejmarek ji hevalên xwe hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî kirin.

Di sala 1952yan de, malbata wan li bajarê Qamişlo bicî bû; wî xwendina xwe ya navîn û bakalorya li wir kuta kir.

Paşê, wî li zanîngeha Şamê li Kolêja Dadevaniyê du salên xwendinê bi dawî anîn. Mixabin bi sedema rewşa wan ya aborî û destengiyê, ew naçar bû ko xwendina xwe li zanîngehê bi dawî bîne.

Di temenê xwe yê biçûk de, hiş û bîr û baweriyên wî li Kurdayetiyê vebûn, çiko bavê wî nivîskar û helbestvan bû. Herweha, di nava hemû rêxistinên siyâsî de weke Civata Xoybûnê, Civata Arîkariyê ji Bûna Belengazên Kurd Li Cizîrê (Civata Hîsiça), Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan, Nadiya Ciwan Kurd Li Amûdê û Civata Aştîxwazên Cîhanê Li Sûriyê, endamekî, çalak bû.

Û di nava malê de, digel xwîşkên xwe, wan guhdariya helbestên bavê xwe dikirin û hin ji wan jî ezber dikirin.

Bi sedema ko di malê de ew kurek bi tenê û delalî bû, gelek caran bi bavê xwe re di nava çalakîyên Kurdayetiyê de beşdar dibû û wî bi vî awayî hejmarek siyasetvan û welatparêzên Kurd didîtin û nas dikirin: Celadet Alî Bedir-Xan, Doktor Ehmed Nafiz Beg, Doktor Nûredîn Zaza, Seydayê Cegerxwîn, helbesvan Hejarê Mukriyanî, Evdîrehman Axa yê Eliyê Yûnis, Arif Beg Abas, Qedrîcan, Apo Osman Sebrî, Qedrî Beg Cemîl Paşa, Ekrem Beg Cemîl Paşa, Hesên Axa Haco, Cemîl Axa Haco, Mela Ehmedê Şûzî, Mela Ehmedê Zivingî, Hesên Hîşyar, Reşîd Kurd û Evdê Têlo...

Di warê rêxistinî de, û di sala 1950î de, bûye endamê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Cihanê.

Di sala 1954an de, Mihemedê Mela Ehmed, Samiyê Mela Ehmedê Namî, Evdîlezîzê Eliyê Evdê û Derwêşê Mela Silêman, Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd Li Sûriya damezirandin.

Piştî damezirandina Partiya Demokrat a Kurd Li Sûriyê, û bi erêkirina bavê wî Namî (Çiko Namî wek şêwirdar bû ji Civatê re), û li gor daxwaza Doktor Nûredîn Zaza û Mam Celal Talebenî (dema ko li bajarê Qamişlo bûn), Damezirênerên Civatê biryar dan ko Civata Yekîtiya Xortan bibe beşek ji Partiya Demokrata Kurd û karê rêxistinî di nava refê partiyê de domandin.

Bi behana çalakîyên Kurdayetiyê, gelek caran ew digel bavê xwe, yan bi tena xwe bûye mihvanê zîndanên, nemaza di sala 1959an de, dema ko serok û hejmarek mezin ji berpîrsên komîta navendî û komîtên herêman û endamên partiyê hatin zîndankirin (ew yek ji wan bû), û li zîndana Mezê û li ber dadgeha Leşkerî ya Bilind li Şamê, hatin dadgehkirin.

### **Çalakîyên wî di warê çanda Kurdî de**

Ji demeke dirêj ve wî dest bi nivîsîna zimanê Kurdî kiriye û hejmarek gotar di kovar û malperên Kurdî de weşandine.

### **Berhemên wî yên çapkirî**

1-Di sala 2000î de, pirtûka wî ya yekemîn, bi navê "Dîmenin Ji Dîroka Winda" li Stokholmê, ji Weşanxaneyê APECê, hate çapkirin û weşandin.

2-Di sala 2021ê de, pirtûka wî ya duyemîn, bi navê "Gulzara Mela Ehmedê Namî" li Stokholmê ji Weşanxana APEC, û bi alîkariya Komeleya Ramyarî Ya Swêdê – Kurdî, 12ê avdarê, hate çapkirin û weşandin.

Bavê wî, weke hemû rewşenbîrên Kurd ên wê demê, berhemên xwe yê bi zimanê Kurdî bi tîpên Erebî, dinivîsîn.

Piştî koça dawî ya bavê wî, berhemên wî yê destnivîs ko bi tîpên Erebî bûn, ew veguestin bo nivîsandina bi tîpên Latînî.

Dîwana Helbestan ya bi navê "Daxwazname", cara pêşîn li Stokholmê, û ya duyemîn li welêt hate çapkirin, û piştî ko wî naverokên helbestan zelalkirin, waye bi dîmenek nû tê çapkirin.

Pirtûka "Agirê Sînema Amûdê" li Stokholmê hate çapkirin, û anha bi dîmenek nû li welêt tê çapkirin.

Ferhenga Kurdî-Erebî û Erebî-Kurdî bi navê "Kozar". Wî jî karekî ber bi çav di danehev û nijinandina gotinên ferhengê de kiriye, û digel Rêzimana Kurdî têne çapkirin.

"Jînenîgariya Namî" û ew jî destnivîsa Ehmedê Namî ye.

Di sala 1959an de, li navenda Kirîna Genim li Qamişlo bûye karmend. Mixabin piştî sal û nîvekê ji kar, û li gor biryara Wezaretê Hundur û desthilata dewletê, ew ji kar hate biderxistin.

Di sala 1961ê ta sala 1992yan, li dibistana taybet ya Kildan Katolîk û dibistanên fermî li bajarê Qamişlo bûye mamoste.

Piştî 26 salan ko mamosta bû, û bi sedema tundiya hêzên ewlekariya dewletê û yê Partiya Be'is, ew naçar bû ko dev ji kar berde û bûye xanenişîn.

Di sala 1999 de, koçberî welatê Swêdê bû û aniha li bajarê Stokholmê dijî.



## **Sawuška Ammar Mûsa**

Di sala 2010an de, li bajarê Heseke jidayik bûye.  
Şêwekar e, nêzî 4 pêşangehan, ligel dayik û bavê xwe lidar xistine.  
Di sala 2019an de, Pêşangehek taybet li herêma Kurdistanê lidar xist.  
UN tabloyek wî ji xwe re ji pêşangeha di roja koçberan de, pîrozkiyê.  
Li gel hin karên montac û dîzaynên yûtyûbê dixebite.  
Bi zimanê Kurdî û Erebî pirtûk amade kirine.


### **Pirtûkek bi zimanê Kurdî çapkiriye ew jî ev e:**

-Goşiyê Gotinan. Sala 2020.

Pirtûk ji bo zanîn û fêrkirî ye, li ser dever û kultûr, zanîn û kesayetiyên Kurdî ye.

### **Pirtûka Erebî ya li hêviya çapkirinê ye:**

-هل تعلم



## **Sebketullah Seyda (1941- 2008)**

Sebketullah Hacî Ubêdullah Seyda, di sala 1941ê de, li Amûdê hatiye dunyayê. Xwendina xwe li Amûdê bi dawî kir û li Beyrûtê tevî Fakulteya Dîrokê bû, heta ku bûyerên li Lubnanê pêk hatin. Ji ber vê jî, ew ligel nifşê xwe neçar bû ku zanîngehê biserî neke û vegere Amûdê, ji bo ku xwe li pola taybet (Mamosteyan) tomar bike. Paşê ew tevî kadroya mamostetiyê bû, ji bo beşînên pola taybet; lê di demeke kurt de, bi behaneyê ku ew dijber û metirsîdar e li ser ewlehiya dewletê, ji kar hat dûrxistin.

\* Di nav gelek komîte û desteyên partiyê de cih girt, û di encama têkoşîna xwe de, di sala 1966an de hate girtin, û wê demê beşeke mezin ji kesên welatparêz, xebatkar, rêveberên partiyê û kesayetiyên civakî yên Kurd di nav de bûn.

Ji bilî çewisandin û şopandina berdewam ji aliyê sîxuriyê ve. Herweha, ew neçar dibe ku, di navbera salên 1972 û 1976an de, penaberî Beyrûtê bibe û li wir çalakiya xwe ya siyasî di çarçoveya rêxistina Partiya Çep a Kurd li Lubnanê de pêk anî.

\* Di sala 1973yan de, wekî endamê Komîteya Navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê, di konferansa çaremîn de, hate hilbijartin. Pişt re, bû endamê mekteba siyasî ya heman partiyê di sala 1975an de.

\*Piştî perçebûna ku di sala 1982yan de li partiya Çep a Kurdî li Sûriyê ket, ew wek sekreterê Partiya (Şexîlê) ya Kurd li Sûriyê hat hilbijartin.

\* Di sala 1990 de, ji karê Partiya (Şexîlê) dûr ket, li ser şert û mercên Partiya Çep a Kurd li Sûriyê, bi serokatiya nemir Yûsif Dîbo, ji bo yekîtiya rêxistinî di navbera wan de here serî.

Di 13/12/2008 de, nivîskar, têkoşer û kesayetiya niştimanî ya bi nav û deng Sebxetullah Hacî Ubêdullah Seyda, bi sedema nexweşiyê giran, koça dawî kir. Li goristana Amûdê, li kêleka apê xwe têkoşer Îsmet Seyda hat veşartin.

#### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

- Pirtûka "**Stran û Xebat**" 1975 hatiye çapkirin.

-Pirtûka "**Pira Ziman**" 1980yê, ya li ser rêzimana zimanê Kurdî ye.

-Ji bilî herdu pirtûkan, ewî pirtûka nivîskarê Kurd "Erebê Şemo" wergerandiye zimanê Erebî, lê cihê daxê ye ku ew nehatiye çapkirin.

Sebxetullah çalakvanekî çepgir û neteweperest bû. Di dîroka tevgera neteweyî ya Kurdî li Sûriyê de, bi berdewamî, ji çaryeka sed salî ve, roleke mezin lîst. Herweha, jiyana xwe ji bo doza gelê xwe yê Kurd, û li her derê, ji bo pirsgerêkên azadî, demokrasî û wekhevîyê terxan kir.



## Selah Eldîn Ibrahîm Seyda

Selah-Eldîn Ibrahîm Seyda, di sala 1960î de, li Rojavayê Kurdistanê, li bajarokê Amûdê yê bi navçeya bajarê Qamişlo ve girêdayî ye, jidayik bûye. Hersê qonaxên Xwendina bingehîn li bajarokê Amûdê biserî kirine. Xwendina xwe ya Lîsans di beşê Abûrî de, li Zanîngeha Helebê qedandiye. Her weha Sê Astê Zimanê Kurdî li Navenda Nemir Reşîdê Kurd, li bajarokê Amûdê bidawî kirine.

Ji piçûkanî de, hîn temenê wî negiha bû hijde salan, ew tevî tevgera Rêxistina Partiya Çepên Kurdên li sûrî bûn. Ew bû sedemek ko mijûlî zimanê Kurdî bibe, bi taybet xwendina pirtûkên seydayê Cegerxwîn û seydayê Tîrêj her wiha xwendina pirtûkên nivîskarên cîhanê re yên wergerandî ne zimanê Erebi wek mînak : yên nivîskar Ezîz Nesin û Tolstoy û hin şanoyên cîhanî yên ji welatê Kuwêtê dihatin weşandin. Lê piraniya demên xwe dida xwendina pirtûkên Abûrî û Ramyarî, weke mînak: yên Markis û Lênî û Xîfara.

- Ji sala 2019an de, ew endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd -Sûriya ye.

Piraniya çîrokên ku dinivîsîne bûyer û serpêhatî û pêkenokên bi kesan re çêbûne û ji nava civakê werdigire.

### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

1-Ji tirsî kurk ket : Kurteçîrok, ji weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya 2019 .

2- Mamoste : Kurteçîrok, ji weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriya 2020 .

**Berhemên wî yên destnivîs ev in:**

Sê Pirtûkên Kurdî amade ne bo çapkirinê:

1- Tekoşîn Ev e: Şano ji sê Şanoya pêk tê

2- Amûdkî: kurteçîrokên li Amûdê û derdora wê bûne.

3- Simo: kurteçîrokên bi Simo re derbas bûne, bi rengê Şanogerî

4- الدراویش : مجموعة قصص قصيرة باللغة العربية





## Selah Mihemed

Navê wî Selah Mihemed e, di sala 1965an de, hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî li gundê ( Xirbihê şêx ) kuta kiriye. Pişt re mala wan hatibû bajarê Qamişlo, li wir xwendina xwe berdewam kir, lê mixabin ji ber hinek sedeman û bênasnamehiyê, wî xwendina xwe berdewam nekir û ne ghişt xwendina bilind.

Di sala 1982yan de, berê xwe da bajarê Şamê, li wir (Osman Sebrî) naskir.

Di sala 1985an de, fêrnama pûla nehan wergirt.

Ew beşdarî mehrecanên helbesta Kurdî û festîvalên din bûye.

Berhemên wî di gelek kovar û rojnaman de belav bûne.

Di sala 2015an de, Xelata helbestvan Mele Nûriyê Hesarî, ji alî Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnemevanên Kurd li Sûriya, wergirt.

Di salên 1983 – 1984an de, di rojnama Elsewre ya sûrî de, kar wek peyamnêr kiriye. Lê, ji ber nasname wî tune bû, nehiştin berdewam bike.

Endamê Yekîtiya Giştî ya nivîskar û rojnemevanên Kurd li Sûriya ye.

Endamê komela Mafê Mirova ya Kurd li Sûriya (Maf) e.

Ew niha li Elmaniya dijî.

### **Ji berhemên wî yên çapkirî:**

1 – Nûbar- helbest- 1999

٢ - قصة حريق سينما عامودا تأليف ملا احمد نامي (ترجمة من الكردية) ٢٠٠٠

3 - Hêviyam min- helbest- 2003

٤ - تعلم الكردية باللهجة الكرمانجية - ط ١ - ٢٠٠٦

- تعلم الكردية باللهجة الكرمانجية - ط ٢ - ٣ - ٤ - ٢٠١٢

- تعلم الكردية باللهجة الكرمانجية - ط ٥ - ٢٠١٤ في تركيا درّس في مدارس جان السورية في باطمان.

- تعلم الكردية باللهجة الكرمانجية - ط ٦ المانيا ٢٠١٧

5 - Rû li rû - helbest – Selah Mihemed – Ferhad İçmo....2016

6 -borîna pêxemberê keşweran ( werger ji zimanê Erebi – İbrahîm El-Yûsiv (عويل رسول الممالك Elmanya- 2016.

7 - Êva -helbest - 2017 Elmaniya

8 – Riya penaberiye - helbest 2018 Elmanya

9 - Kînda - helbestên kin ( mobayêl )- helbest 2018 -Elmanya

10 - Namên biyaniye – 1 - helbest 2019

11 - Namên beyaniye- 2 - helbest 2019

١٢ - قاموس عربي كردي اعداد ٢٠١٩

13 - Navdarên navçeya Cezîrê li Sûriya ( Werger ji zimanê Erebi. Osman Remzî – Selîm Hana ) الجزيرة ورجالاتها 2019

14 – şînda - helbest 2020 Elmaniya

15 - kîma -helbest 2020 Elmaniya

16 - Navên zarokan-2020 Elmaniya

**Ji berhemên wî yên neçapkirî:**

1 - Rama - helbestên zarokan

2 - Nû dem - helbest

3 - Bexçê gula - helbest

4 - Dendefrîş -helbest

5 - Çîrokên hilbijartî

6 - Keşwera miriya

7 - Helbestên min – berê – 1

8 - Helbestên min – berê – 2

9 – Li ser rêçikin Asiya yê ( werger ji zimanê Erebî – hamid bedirxan ) على  
دروب اسيا

10 – Xencerek di xavikê de - roman

11- من ذاكرة التاريخ ( اعداد الحوادث التاريخية)

12- ما قل ودل ( اعداد)

13- ديوان - الذكريات

14- قواعد اللغة الكردية- اعداد

15- 45 يوم في القامشلي

16- قصص مختارة



## Selam Darî

Navê wî Ebdulsalam Darî ye, di sala 1964an de, li bajarê Qamişlo, hatiye dunyayê. Bavê wî Mele Eliyê Darî mirovekî oldar, niştimanperwer û Kurdperwer bû. Li mala wan dîwanên helbestvanên mîna Melayê Cizîrî, Xanî, Cegerxwîn, ... berdest bûn û dihatin xwendin, û gelek mele li mala wan dicivyan, şevbuhêrkine xweş digelandin. Di jîwarekî wisa de, Selam Darî perwerde bû, û giyanê wî ji van kaniyên toreyê vexwar. Ew bû evîndarê hemî cûreyên rewşenbîriyê; bi dehan pirtûk xwendin û bawernama bekaloryos ya edebiyata Zimanê Erebi stand. Pişt re ew çû korsa rêzimana zimanê Kurdî, û bûye mamoste û çendîn kors li gelek bajaran dan.

Şevêk ji şevên buharê ye, sala 1992yan ew û Hefîz Abdulrehman û Siyamend Birahîm, li mala wî bûn; di wê şevbuhêrkê de biryar standin ku kovareke wêjeyî û demsalî bi navê Aso derxin. Wan dest bi korsên fêkirina zimanê Kurdî jî kir. Ji hêla dî ve, wan gelek şevbuhêrk û simînarên wêjeyî lidar xistin. Ji bilî vê tevî jî, wan çend pirtûkên Kurdî çapkirin mîna pirtûka ElKurd ya Basîl Nîkîtîn û ferhenga Elî Seydo Goranî û 4000 Pendên Kurdî ya Mehfûz Reşîd ... û htd. Lê heyf e, çar jimar bi tenê ji kovarê derxistin û ji ber sedemine aborî wan nikarîbû di derxistina kovarê de berdewam bikin.

Di sala 1997an de, wî û Xalid Mihemed û Hefîz Abdulrehman, pirtûkeke fêkirina zimanê Kurdî bi navê "Keskesor" derxistin, tevî kasêtekê jî pê re, da ku kesê bixwaze fêr bibe, pirtûkê bixwîne û hem bibihîze jî.

Di sala 2007an de, wî û Hefîz Abdulrehman û Xalid Muhemed, pirtûkek bi navê (Pirtûka Min) derxistin.

Di sala 2021ê de, wî pirtûkek bi navê "Melayê Cizîrî Şêxê Aşiqan e" weşand û ev berhema wî ya dawî bû.



## Serdar Keleş

Serdar Keleş, di 8ê Avdarê Sala 1971ê de, li gundê Bakirwanê li devera herima Aliyan li Bakurê ÇilAxa, ji dayîk bûye. Bakirwan gundekî gelekî xweş e, hemî av û dar û kehnî ne, û li dora wê hemî beşçe û girik û zevî ne. Xwendina xwe ya seretayî li gund bi domahî kir. Paşê li bajarê Qamişlo bicî bû û xwendina xwe ta bekaloriya li wir bidawî kir. Sala 1990ê, li bajarê Dêrezorê xwendina kolêja Tendirustî, Baskê Tirêjê xwend. Di wê salê de ew û pênc hevalên xwe ji xwendinê bi tawana karê konevanî hatin dûrkerin. Lê piştî du salan careka dî ew hatin veşandin, û wî xwendina xwe bi dawî kir. Ji wê demê ve ta 2015an, li Nexweşxana Qamişlo ya niştimanî, digel hevjiņa xwe bi hev re kar dikirin. Çar zarokên wî hene: (Saman- Ariya-Hêlîn- Hêwa).

Ji piçûkaniya xwe de, ji tembûr û çêkirina wêneyan hez dikir. Gelek taployên wî hene, çî yê Zeytiyan, çî bi nivîsoka resas, û çî kûmirî (Fehim). Lê helbest û stran pirtir bala wî dikişand. Di sala 1986an de, dest bi nivîsandina helbestê kiriye. Naveroka helbestên wî evîni, civakî û neteweyî ne.

Di sala 1988an de, romanek bi zimanê Kurdî bi navê (Rêç) nivîsand. Du dîwanên helbestê hene. Di kovarên Kurdî de, helbest û gotarên xwe belav dike. Pirtûkek binavê (غابت عني الشمس) sala 1996an, bi Zimanê Erebi nivîsandiye.

Ew endamê Saziya Fêrkerin û Parastina Zimanê Kurdî bû, ya ku sala 2006an hatibû damezirandin. Gelek simînar di warê ziman, dîrok û çanda Kurdî de, û kursê fêrkerina zimanê Kurdî di malan de lidar dixistin. Gelek

xelek li ser kurtejiyana navdêrên Kurd çêkirine, ew jî wek pirtûkekê amade ye.

Di vî warî de, ew dibêje: "Mixabin min piştgirî, guhdan û derfet nedît ku nivîsandinên min ronahiyê bibînin û berhemên min bêne çapkirin. Lê, niha derfet çê dibe ku hin kes hene li rewşenbîr û nivîskaran xwedî derdikevin, wek nivîskarê hêja mamoste Dilawerê Zengî, ku nivîskaran li hev kom dike û roniyê dide li ser wan rûpelên wendayî ji kurtejiyana nivîskarên Rojavayê Kurdistanê, û bi xelkê dide naskirin. Silav û rêz bo keda we mamoste Dilawerê Zengî, silav bo hemî kesên ku bi zimanê Dayikê, zimanê bav û kalan dinivîsin".



## Serhan Îsa

Serhan Isa, di 14. 04. 1974an de, li Rojavayê Kurdistanê, gundê "Alareşa", herêma Tirbespiyê hatiye dunyayê. Xwendina xwe ya seretayî û amadeyî û navendî li dibistanên Alareşa û Bajarê Tirbespiyê û Hisiça bi dawî anî; paşê di Buhara 2000an de, koçberî Elmaniya bûye.

Di sala 2009an de, xwendina xwe ya li Zanîngeha Erebi ya vekirî li Denîmarkê, beşê Ragihandinê bi dawî anî.

Di salên 1990an de, dest bi nivîsandina Helbestê bi zimanê Kurdî kiriye. Paşê car caran bi zimanê Erebi jî dinivîsand. Di gelek Kovar û Rojnameyên Kurdî û Erebi de nivîsandiye, mîna: Stêr, Pirs, Zanîn, Gelawêj, Qendîl, ... whd. Herweha, di desteya birêveber a gelek Rojname û Kovaran de jî kar kiriye.

### **Pirtûkên wî yên çapkirî ev in:**

1. Dîwana yekem bi navê Dûrbûna te destpêka helbestê ye, di sala 1997an de, li Şamê hatiye çapkirin.

2. Pirtûka duyem bi navê: Gula mijê – وردة الغمام Helbest, Dr. Xalid Hisên. Wergerandiye zimanê Erebi û di sala 2001an de hatiye çapkirin.

**Pirtûkên dibin çapê de:**

1. Bozename Helbest
2. Lêkolîn: Helbesta Kurdî a nûjen li Kurdistana Sûrî Hoşeng Broka wek nimûne.
3. Barwîr Sîvak – Helbest, wergerandin ji zimanê Erebi
4. Çapa diwem: Gula mijê وردة الغمام helbest, Dr. Xalid Hisên. Wergerandin ji zimanê Erebi.





## Seyfidîn Qadirî

Di sala 1964an de, li gundê Xirbe Camûs, çavên xwe li jiyane vekirine.

-Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyayê ye.

-Endamê Sendîkeya Rojnamevanên Kurdistanê – Sûriyayê ye.

-Di gelek kovaran de nivîsên xwe belav kirine.

-Gelek hunermendan helbestên wî awazkirine û strandine, ji wan:  
Mihemed Emîn Cemîl, Dilan Darî, Hêvîn Şêxê, Masûm Şikakî

### **Berhemên çapkiri:**

- Dîwana (Bayê Geliyan), Helbest, 2022

### **Destnivîs:**

- Dîwana Feqê Teyran - Danhev.



## Silêman Azer

Navê wî Silêman Remedan e. Di sala 1965an de, li gundê Beyandûr yê girêdayî navçeya Qamişlo, jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li dibistana gund temam kiriye. Pişt re xwendina navendî û amadeyî li bajarê Qamişlo bidawî kiriye. Înstîtuya bijîşkîya lawiran li bajarê Dêra Zorê bidawî kiriye. Jiyana xwe ta sala 2014an li bajarê Qamişlo derbas kiriye, ew koçber bûye û niha li Elmanya dijî.

### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

- 1: Dîwana Awazin Kelogirî (Helbest), di sala 1996an de hatiye çapkirin.
- 2: Romana Bêhnberdana Germ ya Romanivîsa Kurd Wecîha Abdulrehman wergerandiye ji zimanê Erebi, û di sala 2019an de hatiye belavkirin; ji weşanên SerSera ye.
- 3: Dîwana Taldeya Tenahiyê (Helbest), di sala 2020an de hatiye çapkirin, ew ji weşanên SerSera ye.

### **Destnivîsên amade ji bo çapkirinê ev in:**

- 1: Nod û Neh Rev û Şevak (Helbest) destnivîs.
- 2: Ew Barana Bişûn me de (Helbest) destnivîs.
- 3: Tivtivandî bi xewnê (Helbest) destnivîs.
- 4: Şahê rûyalîyê (Helbest) wergerandina ji Erebi ya helbestvan Edîb Hesên e.
- 5: Mala me ya piçûk (Helbest) wergerandina ji Erebi ya helbestvan Zaredeşt Muhemed e.



## **Siyamend Birahîm (1953-2018)**

Nivîskar û rojnamevanê Kurd Siyamend Birahîm, di sala 1953yan de, li gundê Aşûr Bananî yê bi ser bajarê Amûdê ve, li parêzgeha Heskê jidayîk bûye. Dibistana seretayî, navîn, lîse û fakulteya Îngilîzî (salek) li Şamê xwend. Bi zimanê Erebi û Kurdî helbest û gotar dinivîsand. Wî û çend hevalên xwe kovara (Aso) di Tebaxa 1993 de damezirandin. Kovareke demsalî bû, ku bi zimanê Kurdî derdiket. Li bajarê Qamişlo jî pirtûkxaneyê Kurdî vekir. Di sala 2000î de, 3 mehan di girtîgeha Şamê de, ji bo çapkirina Kovara Aso girtî ma.

Nivîskar û rojnamevan Siyamend Birahîm roja 15ê Kanûna Pêşîn a 2018ê, koça dawî kir û di 65 saliya xwe de li nexweşxaneyê Almaniyayê, li bajarê Kolnê bi nexweşiya penceşêrê koça dawî kir. Li goristana Qudûrbeg a bajarê Qamişlo hate veşartin.

### **Berhemên wî**

- Kovara Aso, Wî û çend hevalên xwe li Şamê derdixistin.

-Zincîra Fêrbûna Zimanê Kurdî (1).

-Wergera Çar Leheng a Osman Sebrî ji bo zimanê Erebi.



## Stêr Çelo

Stêr kurê Miçoyê Çelo ye. Di sala 1971ê de, li gundê Helincê girêdayî bajarê Kobaniyê, jidayîk bûye. Ji malbatek kedkar û welatparêz e. Xwendina xwe ya seretayî, navendî û başhatî li navçeya Kobanî bi dawî dike.

Di sala 1989an de, tevgera Kurdî nas dike û derbasî nav xebata siyasî dibe. Di sala 1990ê de, li Kurdistana Bakur birîndar dibe, ligel çend hevalên xwe dikeve nav lepê dijmin. Piştî demekê ji aliyê hevalê wî ve tê rizgarkirin û ji bo dermankirinê wî dişînin Rojavayê Kurdistanê. Ji ber karê wî yê siyasî, çandî û wêjeyî, ji aliyê rêjîma Sûriyê ve tê girtin û nêzikî du salan di zindana (Şaxê Filestîn)ê de dimîne.

Di sala 2006an de, yekemîn dîwana wî bi navê (Derya bê av), li Şamê, li çapxana Zeman tê çapkirin. Dîwana bi navê (Ev der Kobanî ye) jî hîna li ber çapkirinê ye.

Sê berhemên wî bi rengê kilîp wek destana EV DER KOBANÎ YE. Ev DER EFRÎN E û NEPEYÎVE hene û li ser televîzyonên Kurdî tên weşandin.

Di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de wek (Welatê me, Avesta, Dilname, Torîvan û Dengê Kurdistan...) de gotar û helbestên wî dihatin weşandin. Herwiha gelek helbestên wî ji aliyê hunermendên Kurd ve hatine awazkirin, wek (Reşîd Sofî, Rojvan Cesîm, Sefqan Orkêş, Sehdûn Kobanî, Dilşad Huner û koma Botan...).



## Subhî Ahmad

Di sala 1955an de, li gundê Kêşikê jidayik bûye. Xwendina seretayî li gundê xwe bi dawî kiriye, û xwendina xwe ya navendî li Dêrikê bi dawî kiriye. Di vê qonaxê de, wî dest bi nivîsandin û xwendina Kurdî kiriye. Li ser destê cînarê xwe Şêxmûs fêrî tîpên zimanê Kurdî bûye. Xwendina xwe ya amedeyî li Qamişlo qedandiye bi dawî kiriye. Nivîsandina zimanê Kurdî birastî ji qonaxa amedeyî dest pê kiriye. Nivîsandinên wî bitaybetî li ser ziman in. Çar pirtûk li ser ziman nivîsandine ew jî ev in:

- 1- Pirtûta Rêziman
- 2- Şaşiyên normal di zimanê Kurdî de
- 3- Rêziman beşê yekem
- 4- Rêziman beşê duyem

Li ser pirtûkek bi navê mijarên hestiyar di zimanê Kurdî de, dixebite. Gelek semînerên li ser zimên lidar xistine. Waneyên ziman li Zanîngehan gelekî dane, çî zanîngehên Rojava Qamişlo û Rimêlan, û çî li derveyî welat. Semînerên wî hemî bi Kurdî ne. Ew xweşiya xwe bi zimanê Kurdî re dibîne.



## Şahînê Bekirê Soreklî

Nivîskar, wergêr û helbestvanê Kurd Şahînê Bekirê Soreklî, ligor qeyda fermî, sala 1946 li gundê Mezrê, yê li Rojavayî Kobaniyê jidayik bû. Bavê wî, Mihemed Elî Soreklî, ji Kurdên Zaza yê herêma Siwêregê ye, û derdora salên 1920n, yan 1930an, derbasî herêma Binxetê bûye, û li Kobaniyê û gundê Mezra Ebrûş bicih bûye. Diya wî, Nayla Bozanê E'brûş, Kurmanc bû û ji êla Zînikliyan bû, ku bi piranî li gundê Mezreyê cîhwar bûn. Şahîn xwendina xwe ya destpêkê li bajarê Kobanî bi dawî haniye, û dû re çûye li bajarê Helebê xwendina xwe ya navendî, li dibistanên Kewakîbî û Benî Hemdan bi dawî haniye.

Piştî wergirtina bawernameya “bekalorya” ya sûrî di sala 1965an de, dawiya meha 10emîn ji wê salê, bi temenê 19 salî, bi mebesta xwendina bilind gihîştibû Viyenna (Nemsa). Dû re, dema li Zanîngeha Mûnîxê (München) xwendekar bû, ji ber sedemên aborî biryara çûna Australya girtibû. Dawiya meha 10emîn ji sal 1968, bi alîkariya hukûmeta australî gihîştibû Sydney. Wê demê bi mebesta ku li dû karkirina salekê yan du salan dîsa vegeriya Almanayê, çûbû Australya...

Di meha yekemîn ji sala 1971 de, li Australya bi jina xwe Robynê re zewicî. Sala 1972yan, dîsa bi armanca kutakirina xwendina bilind vegeriya bû Almanya. Lê, piştî mayîna derdora 9 mehan li Berlînê, ji ber sedemên cuda, careke din biryara vegera li Australiya dabû.

Destpêka 1974an, Şahîn li xwendina bilind vegeriya. Dawiya sala 1977, li zanîngeheke Sydney (*Macquarie University*) xwendina xwe ya bilind bi dawî hanî (*Bachelor of Arts, Diploma of Education*). Destpêka sala 1978an, wek mamosteyê zimanê Almanî li dibistaneke herêmeke Rojavayê Sydney (Casula High School) dest bi kar kir. Ew 26 salan ligel wezareta perwerdeyê (herêma NSW/Sydney) di kar de ma, wek mamoste, şêwirmend, perwerdekar. Li dawiyê wek mamûr û serpereşt, ta ku dawiya sal 2004 derket xanenişîniyê, teqawîtê. Şûna ragîhandinê ye ku li Australya, Şahîn bi navê fermî “Chahin Baker” dihêt nasîn.

Ji bilî karê xwe yê sereke, Şahîn di xwendegehên êvaran û dawiya hefteyan de jî kar kiribû, dersên Înglîzî, Almanî û Erebi didan xwendekaran. Di warê pirçandiyê û fêrkirina zimanên komên etnîk li herêma NSW de, roleke wî ye berbiçav demekê hebû.

Sala 1979an, wî û hin Kurdên din yekemîn komeleya Kurdî li Australya damezirandibûn, û ew derdora 6 salan wek serokê/sekretêrê wê komeleyê mabû.

Şahîn, sala 1982yan li Sydney, dest bi karê ragîhandinê jî kiribû, û li Dezgeheke Radyo (2SER FM) bernameyeke heftane bi zimanên Kurdî û inglîzî pêşkêş dikir, ku nêzikî 2 salan domand. Dû re, di sala 1984an de, dest bi amadekirin û pêşkêşkirina bernameya Kurdî di Radio 2EA de kir; dû re bû SBS RADIO. Ji wê salê ta nivê sala 2015an, 31 salanê wek berpîrs û rêvebirê bernameyê ma.

Bi sedan nivîsên Shahînê Bekirê Soreklî bi zimanên Kurdî û inglîzî, herweha gotarine bi Erebi û Almanî, di rojname, kovar û malperan de, hatine weşandin.

### **Hinek ji berhemên Şahînê Bekirê Soreklî:**

- Kurd, Cîhan, Jiyan: 252 Gotarên bi mijarên ji dîroka me ya nûjen û rûdanên li Rojhilata Navîn û cîhanê 1990-2020 (forma PDF).
- 55 Çîrokên 38 Salan: Kurteçîrok, Weşanxaneya Ava, Hewlêr/Kobanî: 2020.

- HELBESTÊN JI DIL: Helbest, Weşanxaneya Şemal, Stenbol, 2019.
- NAMEYEK JI BAVÊ MIN RE – Pexşan û kurteçîrok (128 rûpel): DO, Stenbol, 2009.
- VEGER – Roman: Çapa 3yemîn: SerSera, Berlîn, 2019; Çapa 2yemîn: Na, Izmîr, 2014. Çapa 1emîn: Yeketiya Nivîskarên Kurd, Duhok, 2006.
- WENDABÛN – Roman: Çapa 3yemîn: SerSera, Berlîn, 2019. Çapa 2yemîn: Na, Izmîr, 2014. Çapa 1emîn: Enstîtuya Kurdî ya Bonn û Verlag für Kultur und Wissenschaft, Bonn, 1987.
- ÇÎROKÊN HEJDEH SALAN - Komeke ji kurteçîrokan (296 rûpel): DOZ, Stenbol, 2005.
- PISÎK JÎ XEWNAN DIBÎNIN - Komeke ji kurteçîrokan (127 rûpel): LÎS, Diyarbekir, 2004.
- NAMÛSA ÊMO - Komeke ji çîrokan (112 rûpel): HayKurd, Stockholm, 1994.
- Hinek ji çîrokan dikarin wek kurteroman bihên binavkirin, wek Namûsa Êmo, Azadbûna Mehmet Karataş û hinekên din.
- ŞEREFA WENDABÛYÎ YA KATHARINA BLUM – Romana nivîskarê almanî yê navdar Heinriç Böll (139 rûpel) – Wergerandina ji almanî bo Kurdî: ŞBS – NÛDEM, Stockholm, 1997.
- JANA HEFT SALAN – Helbest (155 rûpel): Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, Brûksel, 1990.
- Nivîsandina destana Dewrêşê Evdî, wekî ku Baqî Xido gotibû, edîtekirina naverokê û tomarkirina berhemê bi dengê xwe li ser DVD: SBS, Sydney, 2004.
- Dû re derxistina destanê wek pirtûk: Çapa 1em: SerSera, Berlîn, 2019. Çapa 2yem: Weşanxaneya Şemal, Stenbol, 2019.





## Şama Mihemed

Navê wê Şama Mihemed Mihemed e.

Di 21/7/1970yê de, Li bajarê Qamişlo, hatiye dunyayê. Xwendina seretayî û navîn li wir xwendiyê. Mala wan bar dike Şamê. Ji ber hin sedeman, xwendina xwe nebir serî.

Piştî kirîza Sûriyê, bi malbatî vegeriyar Qamişlo, Wê 3 astên zimanê Kurdî bi dawî kirin, û bû mamosteya zimanê Kurdî di dibistanên Qamişlo de.

Wê, di sala 2015 de, bawernameya peymangeha Cegerxwîn a zanistên perwerdehiyê wergirt. Semînerên zimanê Kurdî li wir didan xwendekaran, û hem perwerdeyên havînê didan mamosteyên dibistanan. Du salan semînerên ziman li Akademiya Tenduristî ya Rojava li Serêkaniyê didan. Du salan jî di Saziya Zimanê Kurdî de kar kiriye.

Di 28/10/2021ê de, Belgeya Derçûnê ji Zanîngeha Rojava, Beşa Wêjeya Kurdî wergirt. Ji 15/11/2021ê de, di peymangeha Amadekirina mamosteyan de li Qamişlo, weke mamoste kar dike, waneyên ziman û wêjeya Kurdî dide û weke seroka beşê Kurdî kar dike.


Kurê wê yê navîn, di 15. 6. 2017an de, li bajarê Reqa şehîd ket. Kezeba wê şewitî, vê êşê berê wê bi awayekî xurt da nivîsandina helbestê, ku ew hestên xwe û yê dayikên kezêbşewitî bîne ziman. Şoreşa Rojava û fedakariya cangoriyên azadiyê mijarên helbestên wê ne.

### **Berhemên wê:**

Navenda jinê UTAMARA li Elmanya pirtûkek daye çapkirin bi navê (Her jin çîrokek xwe heye) di vê pirtûkê de helbesta bi navê (Lorî) beşdar bûye.

Ew di gelek şevbuhêrk û çalakiyên rewşenbîrî de beşdar bûye (HRRK, Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê) û di gelek kovaran de helbest, çîrok û mijarên wêjeyî weşandine, weke: Şermola, Sîwan, Kovara Avşîn, Destar, Dezgeha Welat û di hin malperên internêtê de, û di Rojnameya Ronahî de jî weşandine.

Ew niha li ser dîwaneke helbestan kar dike, û pirtûkeke wê ya çîrokan weke destxet heye.



## Şev Hesen

Navê wê Şevîn Izedîn Hesen e, ji bajarê Amûdê ye. Di 20ê Gulana 1989an de, hatiye jiyane. Xwendina seretayî, navîn, amadehî û zanîngehê li bajarê Heskê biserî kiriye.

Di sala 2015an de, ji fakulteya perwerdahiye di Zanîngeha Firatê li Heskê derçûye.

Di sala 2016an de, dest bi xwendê li fakulteya ziman û wêjeya Kurdî li Zanîngeha Rojava (Nifşê yekem ), li bajarê Qamişloyê kiriye. Helbest û çîrokan bi zimanên Kurdî û Erebî dinivîse.

Di gelek mihrecanên helbest û çîrokên Kurdî de beşdar bûye.

Ji sala 2018an de, Endama komîteya Mihrecana Helbesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê ye.

Di sala 2018an de, li ser çîroka bi navê "Diya Şervan" Xelata çîroka Kurdî di Mihrecana wêje û Hunera Jinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê, wergirtiye.

Di warê ragihandinê de kar dike, û weke bêjer, amedekar û edyatoriya nûçeyên Kurdî li hin alavên ragihandinê li Rojavayê Kurdistanê kar kiriye.

Li radiyaoya Arta.Fm, du salan pêşkêşiya nûçeyên bi zimanê Kurdî û Erebî kiriye. Herwiha di Bersiv.Tv edyatora beşê Kurdî û pêşkêşvana nûçeyên Kurdî li kenale bû. Niha li radiyoya Bûyer.Fm di amedekarî û pêşkêşiya bernameyan de kar dike. Berhemên wê di gelek kovar û rojnameyan de hatine weşandin. Du dîwanên helbestê bi zimanê Kurdî û berhemek komçîrok wek destnivîs hene.



## Şiyar Alyanî

Navê wî yê rasteqîne Qasim Şêxmûs Qasim e, li gundê (Dêrûna Axê), Devera Aliyan, di sala 1965an de, hatiye rûyê dunyayê. Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe yê navborî kuta kir. Di pişt re xwendina xwe ya navîn û amadeyî di beşê pîşesaziyê de, li bajarê Qamişlo berdewam kir. Bi temenekî piçûk tevî tevgera rêzgarîxwaz ya Kurdî bû. Dostanî û têkiliyên xwe bi kesên rewşenbîr û hunermend re berfireh kirin, mîna: seydayê Tîrêj, Mele Palo, Mele Nûriyê Hesarî, Imerê Lalê û gelekên dîtir.

Yekemîn helbesta xwe di bin sernavê (Barzanî) de, li şahiya Newrozê li gundê (Maşûqê) pêşkêş kir. Di sala 1983yan - 1984an de, li gel koma (Narîn) ya folklorê Kurdî, wekî endamekî damezirêner ji vê komê re, dihate nasîn. Gelek ji helbestên wî bûne stranên koma Narîn, û hineke dîtir jî di şahiyên Newrozê de dihatin xwendin. Bi helbestan alîkariya gelek komên din jî kiriye mîna komên (Helebçe- Zêwa-Yekîti).

Di destpêka jiyana wî de, wênekêşiyê gelekî bala wî dikişand, wêneyên ku wî çêdikirin di gelek kovarên Erebi wek (El Hurriye) de, dihatin belavkirin.

Di sala 2013an de dibe endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya. Herwiha dibe endamê Koşka Cegerxwîn li devera Aliyan.

Ji ber rewşa siyasî û aborî ya zehmet berê xwe da bajarê (Şam)ê, û li wir jî karê xwe yê neteweyî berdewam kir, her wiha nivîsandina helbestên Kurdî.

Ji ber rewşa aloz û awarte li Sûriyê, di sala 2012an de, berê xwe dide gundê xwe (Dêrûna Axê) û di sala 2014an de, berê xwe dide Başûrê Kurdistanê. Li kampên Başûrê Kurdistanê (Domîz- Gewêlan) beşdarî gelek

çalakiyan dibe, bê beramber xwebexiş, li kempa Gewêlan bi rêxistina navdewletî (NRC) û Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî re kar dike.

Giringiyêke mezin dide folklorê Kurdî û bêtir ji (2500) metelokê komkirine.

Kovara Cegerxwîn û kovara (Kurd li rojhilata navîn), li gel hevalê xwe Hisên Ebasî, li Duhok û kempên Rojava li Başûrê Kurdistanê damezirandine. Herwiha damezirênerê malpera ( Kesayetên navdar di bîranîna Kurdî de) li gel mamoste Ehmed Qeto.

Helbestên wî di gelek kovar û rojnameyên Kurdî û Erebî de hatine weşandin, û gelek bawername û spasname ji wan wergirtine.

### **Berhemên wî nehatine çapkirin ew jî ev in:**

- 1- Dijwariya dûrketinê ( bi zimanê Erebî)
- 2- Roja Azadiyê ( bi zimanê Erebî )
- 3- Rêbaz ( bi zimanê Kurdî)
- 4-Mêkew ( bi zimanê Kurdî )
- 5- Yilmaz Gunay – jiyaname( bi zimanê Erebî )



## Taha Selîm Husên

Helbestvan û çîroknivîs Taha Selîm Husên di 18/6/1967an de, li Amûdê jidayik bûye. Xwendina xwe ya navîn li bajarê Qamişlo qedandiye. Di destpêka jiyana xwe de, dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Bi herdû Zimanan: Zimanê Kurdî û zimanê Erebi dinivîse. Li vê dawiyê berê xwe daye nivîsandina çîrok û romanên. Di rojên dijwar û zehmet de, li hemberî sitemkariya rêjîma Be'is ya zordar bêdeng nemaye; ew xwedî roleke balkêş bû, nemaze di lidarxistina cejna Newrozê de, gelek çalak bû û beşdarî komên folklorî bûye. Di warê nivîsandin û derhêneriya şano û helbestan de, cih digirt. Mirovekî welatparêz û Kurdperwer e. Bi keda xwe hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê dayikê bûye.

### **Berhemên wî yên çapkirî:**

-Evîn û hestên din

-Helbestên dema xemgîniyê, bi zimanê Erebi

### **Berhemên wî yên neçapkirî:**

-Berhevokek mezin a helbestên Kurdî û Erebi

-Berhevoka çîrokan bi navê: Bajarokê bê poz

Berhevoka çîrokan bi zimanê Erebi bi navê: قصص من مياه أسنة

Romaneke Erebi bi navê: ارمنية في بلاد الكرد



## Tengezar Marîni

**jidayikbûn:** Tirbespî, 04. 09. 1959

**Xwendin:** Derçûyê Zanista Ragehandinê û derûnasiya wê. Rahêneriya Terapeutên derûnnasiyê Beşê EMR: (Eye Movement Desensitization and Reprocessing.)

**Kar:**

Nivîskarê goşeyan di Azadiya Welat, Evro û War de.

Karmend û ji desteya rêveber ya Radio Flora, beşê toreya Kurdî ji 1997-2007.

Amadekar û pêşkêşkerê Programa Edebiyatê bi Elmanî (Blaue Stunde= Demjimêra Şîn) di Radio Flora de.

Karmendê Civakî, bo pirsra Pêkvejiyan û karê Penaberan.

Nivîskarê goşeyên taybet, di rojnameyên Welat, Azadiya welat, Evro û War de.

Nivîsandinên belavbûyî, dli bêhtirîn, kovar û belavokên edebî yê li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê de, bo nimûne: Zanîn, Roja, Pirs, Armanc, Nûdem, Peyv, Biyav, Serwa, Wêje û Rexne, Pêl û gelekên din.

Nivîsîn di Rojnameyên Elmanî de, mîna Neue Presse, Tageszeitung, HAZ, Jugend Deutschland, Lindener Spiegel, etc...

Karmendê Civakî, li Kampa Penaberan û bêxaniyan, li nik Xaça Sor ji sala 2015 ve.

**Berhemên çapkirî:**

**Helbest (Kurdî):**

1. Kilît,

2. Çirûskên xewneke bazdayî,
3. Evîna Leylan û Mijê,
4. Şevnema Şînê,
5. Nisrîna Qedexe ji bêciriya te,
6. Xewn ji Tiliyên min dibarin. 2019 Weşanên SerSera Berlin
7. Parçeyek ji helbesteke bi dawî nehatî, 2020 Weşanên SerSera Berlin.

#### **Pirtûkên din:**

8. Zanista Rexneyî di navbera Tiyorî û Praktîkê de, çapa yekê 2014, ji Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd- Duhok.
9. Zanista Rexneyî di navbera Tiyorî û Praktîkê de. Çapa diwem, 2019, Weşanên SerSera Berlin.

#### **Helbestên çapkirî (Elmanî)**

10. Funken des Nebel= çirûskên mijê.
11. Was hast du gesagt= te çi got?

#### **Pirtûkên bi Elmanî:**

12. Der Baum der Freiheit: Dara Azadiyê, di gel Roger Toppel.

#### **Pirtûkên çapkirî yên wergêranê ji Elmanî:**

13. Helbestên rengîn./ Erich Fried
14. Pantelonê Sheytan, " Îtalo Kalvîno" (Werger, ji Elmanî)
15. Wergerandina 20 Berhevok ên Tenduristiyê û sîstema tendurustiyê li Elmaniya.

Gelek pirtûkên neçapkirî di hêla helbestê û li dor helbestê, Werger (240 helbestvan ji Elmanî bo Kurdî), 1 pirtûk dor ragehandinê û 1 li ser felsefê hene.


Nivîsên wî bo Ingilîzî, Elmanî, Erebi û Farisî hatine wergerandin.

Ji sala 1996an ve li Elmaniya dijî.

20 Salan kar û pîşeyê wergerandinê.

Niha jî weke şêwirmendê civakî li ba Xaça sor ya Elmanî kar dike.





## Tewfîq Huseynî (1938-2018)

Bi Şêx Tewfîqê Huseynî jî tê naskirin, yek ji zana, ronakbîr, nivîskar û wergêrên herî bi nav û deng li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê ye. Di sala 1938an de, li Girê Moza-Orkîş, li nêzîkî Amûdê, hatiye dunyayê. Xwendina xwe ya seretayî li "Dibistana Xezalî " li Amûdê, di çar salan de biserî kiriye. Paşê hewl da ku li lîseya "El-Suryan" a Qamişlo bixwîne. Lê ji ber gelek sedeman bidawî nekir. Di malbateke bi rewşa xwe ya olî û civakî tê naskirin, û ji xwendin û zanîne pir hez dikin, de mezin bûye. Wî dest bi vexwarina ji kaniyên zanîne yên li derdora xwe kiriye, heta ku bawernameya wergêrana zimanê Îngilîzî wergirtiye.

Piştî ku ew fêrî zimanê Îngilîzî bû, wî bi Îngilîzî, Erebî û Kurdî helbest çêkir. Lê wextê helbestê dirêj nebû, û piştî ku wî dev ji nivîsandina wê berda, wî xwe spart nivîsandina pexşanê û ravekirineke baş li ser mebestên helbesta El-Burda li hev kir, Îmam El-Busîrî û peyvên wê yên Erebî, ji bo ku naveroka vê helbesta dirêj nêzîkî xwendevanan bike. Ev berhem, di pirtûkeke li ser çapxaneyê (Corc Hermûş) - Çapxaneyê El-Xabûr - li bajarê Qamişlo di sala 1959an de, bi navê "Helbesta Burda" hatiye çapkirin û weşandin. Paşê di sala 1960î de, pirtûkeke din li ser çapxaneyê navborî derketiye, ku tê de wergera helbestên bijarte ji berhevoka "العقد الفريد" ya helbestvanê mezin Mele Ehmedê Cizîrî ye, paşê wî nivîsên din ên nivîskar, ronakbîr û romanivîsên

sereke ji Îngilîzî, wek: Bernard Şow, Jon Steinbeck, Yaşar Kamal, Azîz Nesîn, Agasa Kiristî, û yê din wergerandine.

Tiştê ku têkiliya wî bi wergerê re xurt kir û kûrahiya vê pêwendiyê zêde kir ew bû ku, ew hat wezîfedarkirin ku ew hin pirtûkên ku di dema xebata wî ya li Rimêlan û Qereçoxê de, li ser kar û barên petrolê, rêvebirin û hesabên petrolê dinihêrîn wergerîne; û pişt re ew di Ajansa Nûçeyan a Lubnanê de, û ya Kuweyt wek edîtor û nûçegihan xebitiye.

Ji bilî karê wergerandinê, wî kurteçîrok û şano nivîsîne. Digel vê jî, lêkolînên wî li ser olên kevnares û mijarên din hene, ji wan: lêkolînek li ser ola êzîdîyan û yek li ser ola kevnares a Zerdeştî, ku di du pirtûkên serbixwe û cuda de hatine çapkirin. Ferhengêk bi hersê zimanan Kurdî - Îngilîzî – Erebi, û yeke din bi Kurdî û Erebi amade kiriye. Parêzer Rêwî Mihemed Xelef Ya Kurdî-Erebi pê re parve kirine. Wî gelek gotar, helbest û pexşan nivîsandine û hin berhemên wî yê wêjeyî di kovarên "El-Dunya", "El-Reqîb", "El-Neqqad" û "El-Xabûr" de hatin weşandin.

Ew zû fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bû. Ji ber vê yekê, wî helbestên Cegerxwîn, û paşê çîroka wî Reşoyê Darê wergerandin, ku piştî du salan ji wergerandina wê, bi xwesteka Cegerxwîn bi xwe hat çapkirin.


Di wan rojan de, stêrka helbestvan Nizar Qebbanî di bilindahiya xuyabûna xwe de bû, lewma Şêx çend helbestên wî wergerandine zimanê Kurdî, lê ew ji windabûnê nehatin parastin, mîna helbestên din ên ku wî saz kirin û ew jî winda bûn.

Di nav berhemên wî yê wî wî wî de, romaneke efsaneyî ya ku rastî û aşopeyî di bin navê "Nivîşk"ê de li hev dike, û romaneke din a nivîskarê Daxistanî "Fazu" ya bi navê "Bûkek bi Sed û Bîst Kezî" heye.

Bi dehan pirtûk nivîsandine û wergerandine zimanê Erebi, zimanê Kurdî û zimanê Îngilîzî. Wî gelek berhemên nivîskar û helbestvanên Kurd jî wergerandine zimanê Erebi, wek mînak: Helbestvan Mele Ehmedê Cizîrî, Cegerxwîn, Erebi Şemo, Hesên Hişyar Serdî, Tîrêj, Bavê Nazê, Mihemed Uzun, Dilawerê Zengî, Diya Ciwan, Rêwî û yê din.

Nêzîkî şêst pirtûkên wî hatine çapkirin, piraniya wan li Şamê, û herî kêm li Qamişlo, Swêd, Xelîc û Almanya, di navbera karê afirandin û karê wergerandinê de. Berhemên wî yê wergerandî li dora 42 pirtûkan, û yê nivêsin li dora 15 pirtûkan hene. Pirtûka "Simo" bi Erebî û Kurdî weşandiye û ya piştî mirina wî ku hatiye çapkirin: "Ji Amûdê ber bi Herêma Bextewar (El-Herîr- Basirma- Hewlêr)", wek jînenîgariya bîranînan e. Sala 2021.

Tewfîqê Huseynî mirovekî pir qenc, nefspiçûk, rûliken, zimanxweş, xwînsivik, kêşens û bêderfet bû. Bi rewşenbîrî û zanîna xwe dewlemend bû û dewlemend jiya; lê di debara jiyane de pir hejar, xizan û belengaz mir, roja pêncşemê 18- 1- 2018an, li goristana bajarê Amûdê hate veşartin. Bavê şeş zarokan (sê kur û sê keç) bû. Xwedê wî bi dilovaniya Xwe şad bike û cihê wî bihuşta rengîn be.



## Tîrêj (1923-2002)

Seydayê Tîrêj di sala 1923yan de, li gundê Nicim, ê ku li Rojava û nêzîkî Qamişlo dikeve, jidayik bûye. Navê wî Nayif e, kurê Hesoyê Biroyê dêwid e, biçûkê du bira û du xwişkan bû. Ew heft salî bû gava ko mala wan ji Nicim barkirin û çûn gundê sêmitikê jorîn, ango Sêmitikê Newaf, nêzîkî Amûdê; li wir li ber destê Mela Ibrahîmê Golî, Qura'an û çend pirtûkên ayinî xwendine. Sala 1937an, Seydayê wî jê re gotibû ko ji te re çêtir e ko tu li dibistana fermî li Amûdê bixwînî. Li wir pênc salan xwendiyê, û li wê derê gelek helbestvan û rewşenbîrên Kurd naskirine, wek Seydayê Cegerxwîn, Qedrî Can, Hemze begê Muksî, Hesên Hîşyar, Nûredîn Zaza, Mihemed Elî yê Şiwêş, û hinekên din, hem ew naskirine, hem jî hevaltiya wan kiriye, û bi alîkariya wan hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bûye.

Weke xweş tê xuyakirin, bandora van kesayetiyên gelekî li ser Tîrêj hebû; di nav wan de çavên wî bêtir vebûn, bîr û ramanên wî zengîn û fireh bûn, hestên wî yê netewî jî berz û bilind bûn. Loma, hema dem li dest, kete nav rêza rêxistina (Xoybûn)ê, û di heman salê de dest bi nivîsandina helbestan kiriye, û çend helbest di kovara (Roja Nû) de belav kirine. Weke ko ew bixwe dibêje, seydayê wî di destpêka nivîsandina helbestan de, Seydayê Cegerxwîn bû, her ko tiştek dinivîsî, şanî Seyda dikir, li têbînî û şiroveyên wî baş guhdarî dikir, û wane ji wan werdigirtin.

Di sala 1943yan de diçe Beyrûtê, Kamîran Bedir-Xan û Nûredîn Zaza dibîne,

helbestek taybet ji Mîr Kamîran re dixwîne, ko tê de gelekî pesnê wî û birayê wî, Mîr Celadet, dide, û derxistin û belavkirina herdû kovarên (Hawar û Stêr) bilind dinirxîne, û ji wan hêvî û daxwaz dike ko wan kovaran ranewestînin.

Di destpêka salên pêncî ji sedsala bûrî de, dema ko malbat li gundê Girkeftar û Eslo bicî bûbû, Seydayê tîrêj nêzikî Tevgera Alîgirên Aşitîyê û Partiya Komunîst ya Sûrî bûbû, û ji ber wilo hate girtin û êşkencekirin, û gelek ji helbestên wî winda bûn û ji dest wî çûn. Lê, di sala 1952yan de, gava ko malbatê parçezeviyek li nav hoza Cibûriya kirî, Seydayê Tîrêj û mala xwe ya nuh çûn li ser rûniştin, û wilo ji çavdêrî û şopandina hêzên esayîşê dûr ket.

Bi vêketina agirê Şoreşa 11ê Êlûnê sala 1961ê, Seydayê Tîrêj bi xurtî û germî piştgiriya wê kir û gelekî pê ve girêdayî bû, loma gelek helbest û sirûdên xweş û hêja li ser wê, li ser serokê wê Berzaniyê nemir, li ser Pêşmergeyan û li ser mêraniya wan û dastanên ko di şer de pêk tanîn, nivîsîn, ko wê demê û heya niha jî gelekî deng vedane, û fireh hatine belavkirin û weşandin. Heya roja dawî ji jiyane xwe, Seyda bi dilsozî li ser wan bîr û bawerî, rêbaz û ramanên Barzanî mabû, û bi xurtî pê ve pabend û girêdayî bû.


Di sala 1972wan de, Seydayê Tîrêj li bajarê Hisiça nişteçî bû, jiyana xwe a mayî li wir bûrand, û li wir herdem di nav cemawerê gelê xwe de amade bû, di nava hezkirî û heyranên helbestê xwe de bû, û bi taybetî di nav rewşenbîr û nivîskar û helbestvanan de, herweha di nav siyasetvanan de jî, ko herdem wan hemûyan seredana wî dikirin û pê re dibûn heval û hogir. Di salên dawî ji jiyana xwe de, Seyda bi nexweşiya şekir ketibû, ko bûbû sedema hinek nexweşiyên din, ên jê vedikevin, heya ko di roja 23. 03. 2002wan de serê xwe danî, û bi yekcarî ji nav me koçkir, û li gundê xwe Girkeftar hate veşartin. Hêjayî gotinê ye ko, bi deh hezaran ji xelk û gelê wî, bi coş û dilgermî, bi rêz û hezkirinek bê hempa, bi cendekê wî re birêketin heya ser gora wî. Li ser temîna wî Dilawerê Zengî bi karûbarê dêrindêzên veşartin û şîna wî rabû. Hêjayî gotinê ye ku mamoste Dilawerê Zengî hemû berhemên seyda ji tîpên Erebi veguhestin tîpên Latîni û çapkirin.

Seydayê Tîrêj xwedî hestî gelekî tenik û hestyar bû, xwedî selîqe û

behremendiyek payebilind bû, di hûnandin û nivîsandina helbestan de, ko gelek wateyên xweş, wêneyên pir bedew, pêkanîna hevokên xweşik û lihevhatî, hema wilo bi hesanî ji devê wî, ji xameya wî diherikîn û bi dû hev re rêz dibûn, loma hezkerên helbestên wî zû ew ezber dikirin. Gelek ji helbestên wî, çî yên evîni yan ên netewî, bi bedewî li ser ziman û deng û awazên hunermendan hatine stran, ew stranên gelkî bi berfirehî belav dibûn û digihan her der û her welatî.

### **Berhemên wî yên çapbûyî ev in:**

- Dîwana Xelat, pêşgotina: D. Zengî, Libnan-Beyrût-1985.
- Dîwana Xelat di sala (1991) li siwêdê careke din hate çapkirin.
- Dîwana Zozan -pêşgotina: D. Zengî, Libnan-Beyrût-1990, hate çapkirin.
- Dîwana Cûdî - pêşgotina: D. Zengî, Libnan-Beyrût-1998, hate çapkirin.
- Mewlûda Pêxember - pêşgotina: D. Zengî, Libnan-Beyrût-2006, hate çapkirin.
- Serpêhatiyên Kurdan I-II (perçê yekê 1992/perçê dudiwan 2009) perçê(2). pêşgotina: D. Zengî, Beyrût.
- Dîsa Dîwanên Tîrêj Xelat, Zozan û Cûdî, çapa Berlinê 2020, bi hev re hatin çapkirin.



## **Vejîna Kurd**

Jinek ji Rojavayê Kurdistanê, ji Çiyayê Kurmênc e. Navê wê yê rasteqîn Zehfet Henan e.

Li sala 1975an li gundê Maratê yê girêdayî Herêma Efrînê jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî û lîseyê li herêmê qedandiyê, û li bajarê Helebê ji kolêja wêjeyî- beşê zimanê Îngilîzî derçûye. Pê re karê mamostetiyê li Efrînê kiriye.

Di sala 2012an de, li Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Efrînê fêrî rêzimanên Kurdî bûye. Dûvre bû endama wê saziyê û gelek korsên zimên fêr kirin. Ji wê salê de jî dest bi nivîsandina helbest û gotaran kir.

Di heman salê de, Vejîna Kurd û çend jinên Efrînê komela Rewşen Bedirxan a Jinên Kurd li Efrînê damezirandin, û xebateke hêja di vî warî de kirin.

Di eynî salê de, ew bû berpirsiyara rojnama REWŞEN a ku ji aliyê komelê ve dihate weşandin. Rojname bi zimanê Kurdî û Erebi bû. Bîst û şeş hejmar jê hatin weşandin, lê mixabin bi dagîrkirina Efrînê re ew rawestiya.

Gotar û helbestên Vejîna Kurd di gelek malper, kovar û rojnameyên Kurdî, li hundir û li derveyî welêt de tên weşandin.

**Berhemên çapkirî:**

- XEWNÊN ELENDE, komehelbest, li Efrînê sala 2016, û çapa duyem li Qamişlo sala 2022yan.
- HAWARINE EFRÎNÎ, roman, li Qamişlo û li Almaniya sala 2018.
- PENCEREYÊN ÊŞÊ, kurteçîrok, li Almaniya sala 2019.
- GULISTAN PÎR NABIN, komehelbest, li Almaniya sala 2019.
- RÛMET, roman, li Kobanî, Weşanxaneya Ava sala 2020.

**Berhemên neçapkirî:**

Nexşeya Êşê, roman.





## **Xalid Cemîl Mihemed**

Nivîskarekî Kurd e, 30. 03. 1968 li taxa Hilêliyê li bajarê Qamişlo jidayik bû.

Xêzandar e û bavê 6 zarokan e.

Di warên wergerandin û lêkolînên wêjeyî û zimanî de kar dike.

Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û lîseyê li dibistanên Qamişlo biserî kir.

Xwendina bilind, li Beşê Zimanê Erebi, li Kolêja Wêjeyan, li Zanîngeha Helebê biserî kir û bawername di (Ziman û Wêjeya Erebi) de wergirt.

Berhemên wî bi Zimanê Kurdî û Zimanê Erebi hene.

Ji sala 1991ê ve weke mamosteyê Zimanê Erebi li dibistanên Qamişlo wane didan.

Ji ber helwestên wî yê siyasî li dijî rejîma Sûriyê û kar û çalakiyên wî yê di ber kultûr û Zimanê Kurdî de, sala 2004 dema (7 sal û mehekê) ji mamostetiyê hate dûrxistin û bi fermaneke ewlehî, hate veguhestin bo Komelgeha Perwerdeyê (المجمع التربوي) li Qamişlo; pişt re hate veguhestin bo Şaredariya Qamişlo, pişt re hate veguhestin bo Şaredariya Heskê, pişt re dîsa hate veguhestin bo Şaredariya Qamişlo. Sala 2011 jî, hate veqerandin ji bo mamostetiyê. Sala 2012 bi biryareke fermî ji rejîma Sûriyê bi tevayî ji kar hate dûrxistin.

Berfanbara 2012, berê xwe da Başûrê Kurdistanê û li Tora Medyayî ya Rûdawê kar kir.

Ji 18/12/2012an ve, heta niha (2021) weke edîtor û wergêr li Tora Medyayî ya Rûdawê, li Hewlêrê, kar dike.

Wergerê di navbera Zimanê Kurdî (Kurmancî - Soranî) û Erebi de dike.

### Ji berhemên wî yê weşandî:

-Pirtûkeke fêrbûna Zimanê Kurdî, bi hevbeşî, bi navê (PITRÛKA MIN).

-Sê lêkolîn bi Zimanê Erebi, li Şamê hatin çapkirin:

١. المجازفة في الكلام (بحث في آراء بعض الكتاب العرب في اللغة الكردية) ٢٠٠١.
٢. الجَزْرِيّ شاعرُ الحُبِّ والجَمال ٢٠٠٦.
٣. من قضايا المعجمية الكُردية ٢٠٠٨.

-Wergera romana (Qurbanîyên Gunehkariyê) ya romanîvîs (Heysem Hisên), ji Zimanê Erebi.

-Hejmarek ji destnivîsên lêkolînan bi Kurdî û Erebi, li ber destên wî hene, li benda derfeteke guncaw in ji bo ku bêne çapkirin, ji wan:

-Destnivîsa materyala fêrkirina Zimanê Kurdî ji bo qonaxên xwendinê yê seretayî, amadeyî û lîseyê.

-Lêkolînek derbarê çend mijarên helbestên Melayê Cizîrî. (Bi Kurdî ye).

-Lêkolînek derbarê (Fehengsaziyê di Zimanê Kurdî de). (Bi Kurdî ye).

-Pirtûkeke korsên fêrkirina Zimanê Kurdî ji bo astên (1-2-3). (Bi Kurdî ye).

-Pirtûkeke Rêzimana Kurdî. (Bi Kurdî ye).

-Pirtûkeke rênivîsa Zimanê Erebi. (Bi Erebi ye).

-Pirtûkeke Peyvsaziya Zimanê Erebi. (Bi Erebi ye).

-Pirtûkeke Rêzimana Zimanê Erebi. (Bi Erebi ye).

-Lêkolînek derbarê (Helbesta Erebi ya Nûjen). (Bi Erebi ye).

-Bi dehan gotar û lêkolîn di kovar, rojname û malperên Kurdî û Erebi de, belav kirine.

-Bi dehan korsên fêrkirina Zimanê Kurdî û Zimanê Erebi dane û hêj (2022) tê de berdewam e.

-Bi dehan semînar bi Zimanê Kurdî û Zimanê Erebi, li Rojava û Başûrê Kurdistanê pêşkêş kirine, û hêj (2022) berdewam e.



## Xalid Umer

Di sala 1979an de, li Heseke, taxa Til-Hecer jidayik bûye. Xwendina xwe ta bekelorya li bajarê Heseke xwendiyê; pişt re beşê yasayî li zankoya Helebê tomar kir, lê bi dawî nekir; ji ber rewşa Sûriyê. Ji sala 1996an de, ew helbesta kilasîk bi zimanê Kurdî dinivîse. Beşdarî gelek çalakiyan bûye. Sê dîwanên destnivîs amadene ji bo çapkirinê. Karek çîrokên kin jî ji bo çapê bi navê “Sê Hêsir” amadeye. Car caran mijûl dibe bi helbesta pexşan lê hîn nebûye dîwan.

Mirîd im ez di tekyê de  
Li ser canê Melê dakin  
(Şeraba abê rumanî)  
Me mey noşî hetanî mey  
Di kevrê dil de bû kanî  
Wekî bilbil me perwaz dan  
Li dor baxê te Nîşanî  
Li ser şopê ne ey şahê'm  
Me kelk û xame dananî  
Di cezba vê semahê de  
Em in tîtek û perwan in  
Sitêra kumbeda işqê  
Li pê şopa te kerwan in  
Me fir kir qeqefa mehrê  
Teles û şet û dîwan in  
Li Şehramê ye baskek te  
Perên din jî li Kîwan in  
Mirîd im ez di tekyê de  
Meded destê te Nîşanî  
Şevên tarî li Kurdistan

Çirîsk û şebçiraxî me  
Ez im pella dilê kokê  
Li ser wî kat û şaxî me  
Siya canê te yî pîroz  
Di nava vî kelaxî me  
Ez im qeyka li ber lehyê  
Du sewlên wî qiraxî me  
Giyana toza ji kîlê ye  
Di nava tiliyên manî  
(Dur anîn der ji behreyî)  
Tu ey taca serê ristan  
Li ser hîma te pal dayê  
Dipêjin ş i'r û helbestan  
Deqa rokê dimalînin  
Ji tozê em bi van destan  
Bi şûrê tûj û sûnayî  
Dibirrin em devê xestan  
Eya şewqa şevên işqê  
Qebes da pencera xanî.



## Xalis Misewer

Nivîskar Xalis Misewer di sala 1951ê de jidayik bûye. Bawername bi zanista Cuxrafya ji zanîngeha Şamê wergirtiye. Li Sûriya - bajarê Qamişlo dijî. Bi herdû zimanan Kurdî û Erebî dinivîse, û nivîsandin û wergerandinê, di navbera zimanên Kurdî û Erebî de dike. Rexneya wêjeyî û lêkolînên dîrok û kelepûra Kurdî jî dinivîse, û di warê lêkolînên efsaneyî û olên Rojhilata Navîn de jî dixebite.

Pirtûka dîrokan û helbestvanê mezin Cegerxwîn, ya bi navê - Dîroka Kurdistanê - bi hersê parçeyên xwe ve - ji Kurdî wergerandiye Erebî, û li bajarê Beyrûtê di rêya mamoste (Dilawerê Zengî) re hatine çapkirin. Pirtûka Bîranînên nivîskar û şoreşgêrê Kurd yê bi navûdeng (Hesen Hişyar Serdî) ji Kurdî wergerandiye zimanê Erebî, lê hê destnivîs e, çap nebûye. Hin pirtûkên wî bi zimanê Erebî hatine nivîsandin hene mîna ya bi navnîşana “Jêgirtin û Zayendbazî di Tewratê de), ew jî li Şamê hatiye çapkirin. Destnivîsên di warê folklorê Kurdî de, bi navnîşana “Çar çîrokên folklorî yên Kurdî” wergerandinê zimanê Erebî.

Pirtûkek bi Erebî bi navê “Vegeryayê windayî” ku ew jî pirtûkeke rexnesazî ye. Vê dawiyê jî, pirtûka wî bi zimanê Erebî bi navê “Lêkolînên di warê helbest û rexneyê de”, û bi Kurdî pirtûka bi navê “Li Rojava Nerînek rexnesazî li xwenasîna neteweyî di helbesta Kurdî de”, hatine çapkirin û weşandin. Destnivîsên di warê Cuxrafiya de jî mîna “Zanista Avûhewa”, digel gotarên di warê dîrokî, civakî, cuxrafî, û folklorê Kurdî bi rengê giştî, di kovarên Kurdî û yên Erebî de jî, bi herdû zimanan hatine weşandin mîna kovarên (Gulan El Erebî, kovara El Hîwar, Pirs, Hevînd), û hin di rojnameyên Sûriyê de, bi Erebî hatine weşandin, û destnivîsên din jî ji paşerojê re li bal nivîskar hatine amadekirin.



## **Xelîl Kalo (1958-2015)**

Xelîl Kalo di sala 1958an de, li gundê Dêrûna Qulingan yê girêdayî navçeya Aliyan – Tirbespiyê, jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gund xwendiyê, û ya navîn û lîseyê li Tirbespiyê û Qamişlo biserî kiriye. Pişt re, li Zanîngeha Şamê, beşa Jeolojiya xwendiyê, û di sala 1980yê de biserî kiriye. Di wê demê de, li ber destê Osman Sebrî hînî zimanê Kurdî dibe. Kalo xwedî gelek gotarên cuda cuda, yên li ser Kurdan, e û wî çend pirtûk jî nivîsandine. Wek:

-Pendên Kurdî.

-Kurdayetî û Qeyrana Kesayetiyê (الکرد وأزمة الشخصية). Bi zimanê Erebi.


-Dîtin û bîranînên min - pirtûka Hesên Hîşyar Serdî, ji zimanê Kurdî wergerandiye zimanê Erebi.

Gelek hunermendên Kurd mîna Xêro Ebas, Dilo Dogan, Serwet ê ji Bakurê Kurdistanê û Romîda ji Efrînê, helbetên wî kirine stran.

Nivîskar Xelîl Kalo Spasname ji Rêxistina Maf a Kurdî, Nasnameya Endamtiyê ji Rojnameya Ronahî û Nasnameya Yekîtiya Ragihandina Azad wergirtin.e

Beriya niha Yekîneyên Parastina Gel (YPG) ji ber helwestên wî bi biryardarî, yên di xizmeta gelê Kurd û şoreşa wî de, endametî wekî xelat pêşkêşî wî kiribûn.

Xelîl Kalo di 15ê Êlûna 2015an, ji ber nexweşiya penceşêrê çû ber dilovaniya Xwedê. Bi beşdarî û tevlîbûna rewşenbîr û nivîskarên ji bajarê Qamişlo û deverê, û bi axaftinekê ji aliyê mamoste Dilawerê Zengî ve serokê yekîtiya nivîskarên Kurd – Sûriyeyê, cendekê gorbihuşti li goristana gundê wî bi axê hate spartin.



## **Xelîl Mihemed Elî Sasonî (1944-2017)**

Helbestvan û parêzerê Kurd Xelîl Sasonî, di sala 1944an de, li bajarê Qamişlo çavên xwe li jiyane vekirine. Xelîl Sasonî xwendina xwe ya seretayî û navîn li dibistanên bajarê Qamişlo diqedîne, paşê li Zanîngeha Helebê, di sala 1977an de, Beşê Parêzeriyê bi dawî dike.

Malbata Xelîl Sasonî, ya ku bi Mala Eliyê Ênis/Qewmê Çiyê/ tê naskirin, serkêşa Serhildana Sasonê bû, û zêdetir ji 11 salan şerê Roma Reş (Tirkiye) kiriye. Xelîl Sasonî jî da ser şopa bapîrên xwe, lê ewî tenê PÊNÛS wekî çek hilgirte nav tiliyên xwe û hestên xwe bi rêya xamê derbirîne.


Di geştê xwe ya nivîskariyê de, Xelîl Sasonî çar xelatên Kurdî wergirtine:

-Xelata Cegerxwîn. –Xelata Palo. –Xelata Komîta amadekar a Şîna Barzanî.  
–Xelata Mihrecana Helbesta Kurdî.

Aniha berhevokeke wî ya helbestan a bi navê “ŞÎPEK JI BERFA MERETO” hat çapkirin; jê û pê ve 3 destnivîsên wî hene, ji helbest, folklor û lêkolînek rexneyî pêk tên.

Nivîskar Xelîl Sasonî, ji beriya çend salan bi Nexweşiya Penceşêrê ket û ber bi Bakurê Kurdistanê ve çû, da ku li wir bê dermankirin.

Li Bakurê Kurdistanê, û di 3yê Çileyê 2017an de, koça dawî kir û li gundê bav û kalên xwe hat veşartin.



## **Xembar Gul**

Di sala 1968an de, li gundê Carûdiyê jidayik bûye. Carûdiyê bi ser bajarê Dêrika Hemko - Rojavayê Kurdistanê - ve dikeve. Di sala 1974an de, ew çûye dibistanê ji bo xwendina xwe ya seretayî, lê bi dawî nekir. Li ber destên meleyan fêrî xwendina Qura'anê bû, heta sala 1981ê; paşê berê xwe da Şamê paytexta Sûriyê, û li wir biçî bû, û xwe fêrî zimanê Kurdî kir. Di destpêka salên heştêyan de, dest bi nivîsandina helbestê kiriyê.

### **Berhemên wî ev in:**

-Dîwana yekemîn bi navê “Rewşen”, di sala 2015 de, li Qamişloyê hate çapkirin.

-Duyemîn “Sînor”, di sala 2015 de, li Qamişloyê hate çapkirin.

-Sêyemîn bi navê “Dîrok”, di sala 2016 de, li Qamişloyê hate çapkirin.

-Çaremîn bi navê “Ronîda”, 2017 de, li Qamişloyê hate çapkirin.

-Pêncemîn bi navê “Vegeş”, 2017 de, li Qamişloyê hate çapkirin.

-Şeşemîn bi navê “Bahoz”, 2019, li Qamişloyê hate çapkirin.

-Heftemîn bi navê “Raperîn”, 2020, li Qamişloyê hate çapkirin.

-Heştêyemîn bi navê “Heft Buhar” helbestên hîlbijartî ji heft dîwanên xwe û mercên nivîsanidina helbestê di sala 2021 de, li Qamişloyê hate çapkirin.

-Pirtûkek wî, ji çîrokên bav û kalan hîn nehatiye çapkirin. (Destnivîs e).



## **Xemgîn Remo**

Di sala 1961ê de, li gundê Tehlika malbata CEMÎL paşa, çavên xwe li jiyane vekirine. Li wê bihišta piçûk, li nav dar û şinkayiyên wê, zaroktî û beşê yekem ji xortaniya xwe, bûrandiye. Li destpêka sala 1980yî, bi helbestê dest bi nivîsandina Kurdî kiriye; herwiha, li nîva sala 1985an, dest bi nivîsandina kurteçîrokan kiriye, û ji zû de bi karê wergerandinê jî mijûle. Ji destpêka salên notî de, berhemên xwe li gelek govarên wêjeyî li Rojava, Başûr û Bakurê Kurdistanê diweşîne; herwiha jî, di gelek malperên Kurdî de jî berhemên xwe weşandine.

### **Ji pirtûkên wî yê çapbûyî :**

- 1-AXÎNA DÎL, helbest, Şam 1991
- 2-KESKAYIYÊN KIZIRÎ, helbest, ji weşanên govara ZANÎN, Şam 1996.
- 3-PÊLÊN EVÎNÊ, helbest, ji weşanên govara SORMEY, Qamişlo 2005
- 4-AYETÊN ÇIYA, helbest, ji weşanên saziya SEMA , Imarat - Dubey 2008.
- 5-ŞEVÊN DEŞTA MÊRDÎNÊ, çîrok, ji weşanên Hevgirêdana KAWA ya Rewşenbîriya Kurdî, Beyrût 1998.
- 6-KEPEZÊ XEWNA, çîrok, ji weşanên yekîtiya nivîserên Kurd - Duhok 2008.



7- SİRÛDÊN JANÊ, helbest ji weşanên Çand û Huner Qamişlo 2020

8 – GÏRYÊ BÊ DENG, çîrok ji weşanên Çand û Huner Qamişlo 2021

Wergerandin: Lî SER QADÊN BÎ BERHEM, roman, orhan KEMAL, li hêviya çapê ye.

ASOYÊN HÏNERÊ, werger, 13 de, xelekên tilfizyonê li RONAHÎ t.v hatine weşandin.


**Komek pirtûkên destnivîs ji hene ku ji helbest û çîrokan pêk tên, li hêviya çapkirinê ne. .**

1 – JANA HÊVIYAN, helbest

2 – AWAZÊN VEDERÏYÊ, helbest

3 – GERÏNOKÊN DEMÊ, helbest

4 – WEZÊN ÊGÏR, çîrok.



### **Xemgîne Xanî (1904-2008)**

Navê wî Nûredîn kurê Muhyedîn kurê mele Eliyê şêx Ebduleyê Ebdilmecîd e. Ew ji selaleta şêx Ehmedê Xanî ye. Di bin navê Xemgîne Xanî de helbestên xwe dinivîse. Ew li ber destê şêx Salihê şêx Ebdilhadî yê Seyid Şêxmûs hînî Qura'anê bûye.

Di sala 1904an de, li gundê Bêrxo, qeza Wanê hatiye dinê.

Di şerê cîhanê sala 1914an de, ew hatine Cizîra Botan, û ji wir wan berê xwe daye binya xetê gundê (Dêrûna Qulinga). Li vê dawiyê hatiye gundê (Hemû Qûm). Dû re jî, ew bûye melê gundê ('Er'ûr), û li wir maye ta 30/4/2008 ji nav me koç kiriye.

Wî bi sê zimanan zanibû, zimanê Tirkî, zimanê Erebi û zimanê Kurdî.

Wî dîwanek ji 225 helbestan nivisandibû, û pirtûka şêxê Sena'anî (texmîs) pênc rêz kiribû.



## Xoce Ferec

Xoce Ferec ji Rojavayê Kurdistanê ye, li gundê Girasorê Feqe girêdayî herêma Koçeran, hatiye jiyane. Ew di piçûkaniya xwe de fêrî nivîsandina zimanê Kurdî dibe. Bi herdû zimanan, zimanê Kurdî û zimanê Erebî, dinivîse. Li kêleka helbest û nivîsandinê karê hunermendî û şêwekariyê jî dike. Wek hunermend û helbestvan, tevî koma Wanê ya girêdayî herêma koçeran dibe. Gelek salan, wî wek axêver (spîker) û pêşkêşvanê cejna newrozê kar kiriye, û di çend koman de xebitî ye, bi taybetî di Koma Wanê, Cûdî û Serhed de.

### **Berhemên wî yên çapkirî:**

-Pirtûkek bi navê Dardekirin, helbest, 2006, Şam

-3ê Albom stran, awaz û gotinên wî hene û hemî strandine: (1) -Bi navê gundê min, 1998. (2) -Bi navê evîna rast, 2000. (3) -Bi navê derya xeman, 2003.

Gelek stran û awaz û gotinên wî, Koma Koçeran di newrozan de gotine, û herweha Koma Cûdî û Hunermend Şiyar Agirî jî hin helbestên wî kirine stran.

Sala 2014, li navenda Tayk Wendu ya Ebdulezîzê Abê, di pêşangehek hevbeş de, ew bi tabloyek şêwekarî beşdarî pêşangehê bû. Pêşangeha bi navê: "huqbet min Al zemen", li Hesekê bû.

**Berhemên wî yên neçapkirî ev in:** Pazde pirtûk ji helbest, şano, çîrok û 200 stranên nû, tev gotin û awazên xwe, û 40 tabloyên şêwekariyê hene.



## **Xorşîd Ehmed**

Sala 1960î li gundê Nesran, herêma Qamişlo, parêzgeha Heskê - Sûriyê jidayîk bûye. Dibistana seretayî li dibistana gundê xwe Nesran, ya navîn li dibistana Fayîz Mensûr a bajarê Tirbispî û dibistana amadeyî jî li dibistana El-Urûbe li bajarê Qamişlo xwendiyê. Paşê tevî koleja Endezyariya Elektrîk û Elektronîk li zanîngeha Helebê dibe, pisporê enerjîyê, 1990. Herweha, xwediyê bawernameya di Hiqûqê de, ji Zanîngeha El-Furat - Beşa Lêkolînên Yasayî, 2013.

Ew kurteçîrokên bi Erebî û Kurdî dinivîse.

- Çîrok, gotar û lêkolînên xwe di gelek kovar û rojnameyan de weşandine, ji wan: Dîrasat Iştirakiye - El-Tali'ah - Mewasim - Xebat - Azadiya Welat - Serhildan - Kirras – El-Kifah El-Erebî ... û yên din.

Beşdarî gelek festîvalên wêjeyî bûye.

Gelek xelatên wêjeyî stendine.

Bi salan wek endamê desteya weşanê ya kovara El-Mewasim a wêjeyî xebitiye.

Di sala 2006an de, wek serokê Komeleya Hamid Bedirxan ji bo çanda Kurdî li Sûriyê hat hilbijartin.

Endamê komîtê di Pêşbaziya Wêjeyî ya Iqor ji bo Kurteçîrok - Kursa wêjevan Jean Alexan ji bo sala 2022

Di navbera salên 2007-2019an de, weke endamê nivîsgeha rêveber a Sendîkaya Karkerên parêzgeha Heseke kar kiriye.

Di dadgeha herzegî ya parêzgehên rojhilat: Reqa, Dêra Zorê û Heseke de wek endamê desteya desthilatdar kar dikir.

**Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

- 1 – Nisran û Panavin Din (نصران ومسافات أخرى) – Çîrok, Şam.
- 2- Dawiya Xewnekê- (نهاية حلم) – Çîrok, Şam.
- 3 - Çîroka Kurdî li Sûriyê - guvahî û deq-(القصة الكردية في سوريا - شهادات ونصوص) -Şam.
- 4 - Nûçeyên herî dawî yên padîşahan – ( آخر أخبار الممالك) - çîrok - Atîna - Yewnanistan.
- 5 - Hevpeyvîn û gotar li ser siyaset û wêjeyê, - (حوارات ومقالات في السياسة) - (والأدب) - Qamişlo
- 6- Komara Lawiran, çîrokên Kurdî, Qamişlo

**Berhemên wî yên destnivîs ev in:**

- 1 - Rêçên Kew - دروب الحجل -Roman
- 2 - Li bin ezmanê Qamişlo -- تحت سماء قامشلو -- Roman.
- 3 - Rêya Koco -- الطريق إلى كوجو -- Roman.



## Xoşman Qado

Di sala 1982yan de, li bajarê Amûdê jidayik bûye. Beşê Felsefeyê, yê zanîngeha Tişrînê ya li bajarê Lazîqiyê li Sûriyeyê, bi dawî kiriye. Niha wekî rojnameger dixebite. Karê wergerê jî dike, û di kovar û rojnameyan de gotar belav kirine.

### **Berhem:**

-Qolinc, kurteçîrok, Qamişlo, 2013.

-Dema Ku Bi Pinpinîkan Şa Dibim, helbestên pexşanî, Weşanxaneyê Lîsê, Amed, 2016.

-Razayîbû Çaxa Ku Şoreşê Dest Pê Kir, helbest, Îmad Ebû Salih, werger ji zimanê Erebî, Weşanxaneyê Şilêr, Qamişlo, 2021.



## Yasîne Eliyê Bekir (Laleş Mîrza)

Navê wî yê rast Yasîne Eliyê Bekir e, di warê nivîsandinê de, bi navê Laleş Mîrza tê naskirin. Bapîrê wî ji êla Heyderan e, ji Bakûrê Kurdistanê, ji hêla Serheda ber bi alîyê Binxetê ve dadikeve, û li Amûdê bicih dibe.

Di sala 1968an de, li Rojavayê Kurdistanê, li gundê Eqrebiyê, ku li Bakurî bajarê Heseke dikeve, hatiye cîhanê. Bi bûyîna wî re, malbat dadikeve ber bi bajarê Heseke ve, û ji wê demê de ta sala 2014, ew li vî bajarî dimîne . Di vî bajarî de, hemî qonaxên xwendina xwe biserî kirine; ji dibistana seretayî ta bi dawîkirina Enstîtûya Zimanê Erebi. Pişt re, 24 salan wî mamostetiya zimanê Erebi, bi şêweyekî fermî, di dibistan û enstîtûyan de kiriye.

Sala 1995an, berî da Zanîngeha Helebê da ku fakulteya mafnasiyê bixwîne; lê mixabin, ji ber rewşa aborî nikaribû xwendina xwe biserî bikira. Wî xwe bi xwe fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê dayîkê kir, û di destpêka sala 1994an de, dest bi nivîsandina helbesta resen kir. Hinek helbestên xwe, di rîya kovarên Kurdî yê çapkirî û malperên înternetê de, weşandine.

Ji dawiya sala 2014an ve, li Elmanya dimîne. Hin helbestên wî bûne stran, û hin jî hatine wergerandin ji bo zimanê Erebi.

### **Berhemên wî:**

- Lalezar: Helbest, ji weşanên (Ar) Îstanbul 2022
- Cenga li ser qafê min: Helbest, li ber çapê ye
- Jiyanameya Mehmûd Sebrî. Amadekar. Destnivîs e.



## Yûnês Şêx Nasan

Mamoste Yûnês Şêx Nasan di sala 1978 de, li bajarê Efrînê ji dayik bûye. Her sê qonaxên xwendina seretayî, navîn û lîseyê li bajarê Efrînê biserî kiriye.

Salên 1997-1999 peymangeha çavdêrên teknîkî (alîkarê endezyar) li Helebê bi dawî kiriye. Wê hîngê, ew û hin hevalên wî xwe fêrî zimanê Kurdî kiribûn .

Piştirast 2000-2004an ji fakulteya Ziman û Wêjeya Îngilîzî derçûye. Salên 2006 - 2008an jî xwendina bilind bi zimanê Îngilîzî di warê zimanzanîyê (linguistics) xwendiyê.

2021 yekem pirtûka lêkolîner Yûnês Şêx Nasan bi navê "Pirzimanî û Veguhastina di Navbera Zimanan de", di warê zimanê Kurdî de, ji aliyê weşanxaneyê SerSera li Almanyayê hat çapkirin.

Lêkolîner Yûnês Şêx Nasan li ser vê pirtûka xwe dibêje: "Ev pirtûk lêkolînek zimanzanî ye li ser herdû diyardeyên pirzimanî, anku kesê ku bêtir ji zimanekî dizane û diyardeya veguhastinê anku guherîn û çûnûhatina di navbera zimanan û zaravayên wan de ye."

Herwiha dibêje: "Ev lêkolîn bi giştî li ser cure, hoker, sedem û encamên herdû diyardeyên navborî radiweste û bi taybetî li ser civaka Efrînî ya pirzimanî ya bi herdû zimanan dipeyivin; zimanê Kurdî wek zimanê yekem yê dayikê û zimanê Erebî wek zimanê duyem û fermî."



Lêkolîner Yûnês Şêx Nasan tekez dike ku xewna wî her tim rûbirûkirin û berhevdana xalên hevbeş û nakok di navbera wêje û hemû aliyên zimanê Kurdî û Înglîzî bû û wî gelek kar û xebat di wî warî de kirine.

Yûnês Şêx Nasan gelek helbest, kurteçîrokên çapnekirî nivîsandine, Herwiha, çendîn nivîs û lêkolînên di warê zimanzanîyê de di gelek malperên zimanê kurdî û malperên mîna zimannas ,Kurdistan24, ARKê de nivîsandine û di pirtûkek neçapkirî de bi navê "Hin Mijar û Diyardeyên Zimanzanî" berhev kirine.

Herwiha, Yûnês Şêx Nasan diyar dike ku wî gelek biwêj, pend û gotinên pêşyan ji Çiyayê Kurmênc kom kirine û lêkolînek li ser çêkiriye.

Mamoste Yûnês Şêx Nasan mamosteyê zimanê kurdî li sazîya Cegerxwîn û peymangeha Horî bû di sala 2012-2013.

Niha ew li Efrînê dijî û li ser wergera romana Înglîzî ya navdar "Kal û Derya" ya nivîskarê Emerîkî Hemingway bo Kurdî dixebite.



## Yûnis Hemê Husên

Yûnis Hemê Husên, di sala 1947an de, li gundê Suxana, yê ser bi herêma Amûdê ve, jidayik bûye. Dibistana seretayî li gundê Te'elikê xwend. Di sala 1967an de, tevî Partiya Demokrat bû û dest bi xebatên partiyane kir.

Di sala 1992yan de, ji aliyê partiyê ve daxuyaniyek li ser serjimêriya nerewa li Cizîrê hat belavkirin, û di encama vê daxuyaniyê de, ji aliyê Şaxa Ewlekariya Siyasî ve hat girtin. Di wê demê de, ew endamê çalakiya hevpar a partiyê bû. Pirtûka xwe ya yekem a helbestan bi zimanê Kurdî û tîpên Latînî, li zindana Edra, baskê siyasî, di sala 1993yan de, nivîsand û navê wê Nêrgiz bû.

Ji piçûkaniya xwe de, ji helbest û çîrokan hez dikir, lê rewşa wî ya siyasî, civakî û jiyane ne alîkar bû, ku wêjeya Kurdî di rêza pêşîn de be, û xwe ji nivîsandina helbest, çîrok û romanên re vala bike.

Di girtîgehê de, şert û mercên wî yên xwendin û nivîsandina helbestê hebûn, wî helbestên xwe li ser kaxez û qapaxên çixaran û yên din dinivîsandin, ji ber ku di destpêka zindana wî de anîna defter û pirtûkan qedexe bû. Lê pişt re, destûr dan wan ku rojnameyan jî bixwînin, û firsenda wî hebû ku ew çend pirtûkên dîrok û romanê bi dest bixe.

Riç û werêça helbestên Mele Ehmedê Cizîrî û seydayê Cegerxwîn pir lê hebûn. Herweha, Seydayê Ferîd Cizîrî wek mamosteyê xwe dibîne. Îro, berê xwe daye nivîsandina çîrok, roman, dîrok, berhevkirina folklor û nivîsandina gotaran. Beşdarî gelek çalakiyên wêjeyî û siyasî bûye û di şevbuhêrkên

helbestan de gelek helbest xwendine, û çendîn caran jî wî gotarên neteweyî û siyasî pêşkêş kirine. Hêjayî gotinê ye ku çar caran hatiye xelatkirin:


- Xelata Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê.
- Xelata Şagirtên Dibistanê.
- Yekîtiya Nivîskarên Kurdistna Sûriya- Şaxê Hisiça
- Mehrecana Helbestê ya 26mîn, sala 2022

**Berhemên wî:**

- (1)-NÊRGIZ, helbest,1992-2004
- (2)-ÇEND ÇÎROK, 2008
- (3)-HOLA BIÇÛKA, helbest: 2010
- (4)-رحلة في سهول الخابور وسفوح هومان/تاريخ ٢٠١٧-
- (5)-XAKA XWE BINASIN, dîrok, 2017
- (6)-DERD Û ÊŞ, Gotinên bijartî, 2017
- (7)-PENDA ZÊRÎN, çîrok,2018
- (8)-KEŞTIYA BAVPÎRAN, çîrok, 2018
- (9)-KURTE FERHENG KURMANCÎ EREBÎ, ferheng, 2019
- (10)-ROMAN, Xirbê keviran, 2020

**Pirtûkên Destnivîs:**

- DEDÊ DARISTANÊ, çîrok
- TÛNELA DEDAN, helbest.



## Yûsivê Berazî "Bêbuhar" (1931-2009)

Navê wî Yûsiv Elî Şêxo ye, nasnavê wî Bêbuhar e. Bêbuhar li gundê Til Çerçiyê ku li bakurê bajarê Babê dikeve. Di sala 1931ê de jidayik bû. Malbata wî bi koka xwe ji bajarê Kobaniyê ne.

Di sala 1954an de, li gel malbata xwe vediguhezin bajarê Serê Kaniyê û li wir bicih dibin. Ji ciwaniya xwe ve guhdan bi xwendinê dikir û ji mûzîkê hez dikir. Helbesta klasîk a Kurdî xwend û gelek helbestên Cizîrî, Xanî, Şîrazî jiber kirin, herweha guhdan bi wêjeya Kurdî ya gelêrî û zargotinên Kurdî û stranên folklorî jî dikir.

Têkilî û peywendî bi rewşenbîr û helbestvanên Kurd yê hevde ma xwe re girêdan, mîna; helbestvanê gewre û mezin Cegerxwîn yê ku han pê da ku helbestê binivîse, herweha nivîskar û zimanzanê Kurd Reşîdê Kurd yê ku ew fêrî rêzimana zimanê Kurdî kir, û ev ji bo nivîsîna helbestê jê re bû bingeh.

Ji ber ku welathez û netewperwer bû, ji destpêka tevgera siyasî ya Kurdî ve, ew tevî partî bû, û dest bi xebat û tekoşîna siyasî kir. Di sala 1966an de, rêjîma Sûriyê gelek ciwan û çalakvanên Kurd ên siyasî girtin û avêtin zindanan, ew jî yek ji wan girtiyan bû.

Di zindankirina tekane de, rastî gelek êşkencekirina laşî û derûnî hat. Bêbuhar di hevpeyvîneke xwe de behsa wê zindanê dike û dibêje: Di wê zindanê de, min rahişt darikekî çixatê, û bi wî darikî min li ser dîwarê wê

zindana tekane helbesta xwe ya yekem (Hebs û Zindan) nivîsî. Ji wê hingê ve, dest bi nivîsandina helbestê kir, û dema ku ji zindanê derket, berdewam helbestên xwe şanî Seydayê Cegerxwîn dikirin, ew jî jê re li wan vedigeriya, şîret lê dikirin û han pê dida.

Helbestvanê me gelek astengî û zehmetî di jiyana xwe de kişand, ew gelek caran hate girtin û zindankirin. Herweha, ji ber rewşa xwe ya aborî ya xerab, karê berberiyê (porbirînê) dikir.

Bi ser hemû zehmetiyên jiyânê de, Bêbuhar kesayeteke zarxweş, devliken û henekî bû; ew xwedî karîzmeke dilkêş bû ku dihişt her kesê wî nas bike jê hez bike.

Ji ber ku ji mûzîkê hez dikir, helbestvanê me gelek helbestên xwe, bi xwe dikirin awaz û bi stranî digotin. Di heman demê de jî, hin hunermend û dengbêjên Kurd ew helbestên ku ji awazên wî bûn, bi dengê xwe strandin. Yek ji wan hunermend û dengbêjê navdar Mehmûd Ezîz bû, ku çend helbestên wî weke stran li beşê Kurdî yê radyoya Bexda tomar kirin, mîna strana (Gulîzar şînbû rîhan) û strana (Perwîn) û hin din jî. Herweha, hunermendê mezin Mihemed Şêxo jî gelek helbestên Bêbuhar kirin stran, û ew stran di nav gel de dengvedaneke pir mezin çêkir, wek mînak; Hebis û Zindan, Rabe ji Xewê, Derdan Çi Ez Diljar Kirim û ... hwd. Gelek hunermend û dengbêjên Kurd ên din jî, helbestên Bêbuhar strandine. Hêjayî gotinê ku, hejmara helbestên wî yê bûne stran gihîşt 58 helbestan.

Piraniya helbestên Bêbuhar welatperwerî bûn, hin jî mirovî û evîndarî bûn, lê di wan de hestekî nazik û rewanbêjîyeke dilkêş hebû.

Berî koçbûna wî bi du salan, seredana Başûrê Kurdistanê kir, û xelata sedsaliya Cegerxwîn wergirt.

Di sibeha roja pêncşemê 15 - 1 - 2009an de, û di encama nexweşîya penceşêrê de, li bajarê Serê Kaniyê koça dawî kir, û li paş xwe gencîneyeke berz û nirxdar hişt.

Berhemên wî yê çapkirî 5 dîwanên helbestî ne ku ew jî ev in:

Zindan 1988, pêşgotina Dilawerê Zengî. Bergê wê hunermend Fûad Gemo.  
- Bang 1997- Raperîn 2002- Serxwebûn 2005- Pêşketin 2007

Tora Medyayî ya Rûdaw hemû berhemên wî komkirin, û di du cildan de çapkirin, 2018, Hewlêr- Herêma Kurdistana Îraqê. Amadekirin û sererastkirin Besam Mistefa.



## Yusra Zibêr

Di sala 1973yan de hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û lîseyê biserî kiriye. Di dema xwendina bekaloriya de, ji xwendinê hate dûr xistin bi sûcê (Metirsî li ser ewlehiya dewletê). Vê dawiyê, û di sala 2014an de, bawernameya bekaloriya edebî wergirt û Kolêja Hiqûqê li bajarê Hîsiça qeyd kir. Lê mixabin, ji ber sedemên malbatê û xwedîkirina zarokan, derfeta xwendinê pir kêmbû.

Endama Partiya Demokrat a Kurd li sûriyeyê bû, û pênc salan di koma Jiyan ya folklorê Kurdî de kar kir. Bavê wê Zibêr Alî berpîrsê komê û yê karê rêxistinî bû. Pênc salan di Koma Xelat ya folklorê Kurdî de jî kar kiriye.

Endama Nûnertiya Encûmena Niştimanî ya Kurd li Ewropa ye, û endama Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnemvanên Kurd e. Berpîrsa Rêxistina Jina Kurd azad e.

Di warê rojnamevaniyê de, gelekî kar kiriye, wek sernivîsera Rojnamevan û Malperê Li ser kenala Peyv.Tv pêşkêşvan e.

Bi zimanê Kurdî û Erebi dinivîse.

Du dîwanên wê bi zimanê Kurdî hene, yek jê bi navê Kilît, 2022, li bajarê Berlînê, li çapxana Sersera hatiye çapkirin. Ya din bi navê Sema li ber çapkirinê ye.

Du pirtûkên bi zimanê Erebi jî hene, kurteçîrok in û neçapkirî ne.



## Zagros Osman

Di sala 1962yan de, li Kurdistana Rojava, li Gundê Talikê yê bi ser Bajarê Amûdê ve, jidayek bûye. Xwendina xwe ya seretayî li dibistana Gundê Çolbistana jêrî û dibistana Gundê Dawdiyê bidawî kir. Paşê xwendina xwe ya amadeyî û lîseyê li dibistanên Amûdê qedand.

Di sala 1981ê de, derbasî Zanîngeha Dîmeşq bû, beşê Mêjû, di Kolêja wêjeyî de xwend, taku ji Zînîngehê derçû. Di navbera 1991-2015an de, li dibistanên Bajerên Tirbespiyê, Qamişlo û Amûdê mamostetî kir.

Bi zimanên Kurdî û Erebi dinivîse; berhemên pênuşa wî curbecur in çîrok, helbest û gotar. Herweha, babet û naveroka deqên wî rengorengo ne, hin evîni û îrotîkî ne, û hin jî civakî û komîdî û polotîkî ne.

Di 1981ê de, dest bi nivîsandinê kir, dema ku çend gotar bi xwaznavekî di Kovara Al-hurriyê de, ya Filestînî, belav kirin. Wisa wî berdewam kir ta sala 1991ê; jê û pê ve, li kêleka nivîsandina gotaran, dest bi danîna wêjeyê kir, û gelek berhemên xwe di Rojname û Malperên Kurdî û Erebi de bela kirin.

Di sala 2009an de, xelata yekemîn a Festîvala helbesta Kurdî a 14mîn di warê helbesta nûjen de wergirt. Di heman salê de, di warê lêkolînê de, Xelateke yekemîn e dîtir ji Malpera Minber El-Huriyê wergirt.




Di sala 2010an de, Pirtûka wî ya yekemîn hate çapkirin, romanek bi zimanê Erebi bi navnîşana (Nexşeyên bo Herêmen can) خرائط لأقاليم الروح bû.

Di sala 2013-2014an de, wî û Daryos Darî pirogramek komîdî (tinazî) di Radyoya ArtaF.M de pêşkêş dikir.

Di 2015an de, wî koçî Elmanya kir, hîn jî li wir dimîne. Wî Romana xwe ya navbûrî wergerand zimanê Kurdî, herweha wî bi zimanê Kurdî û zimanê Erebi romanek dîtir bidawî kir, navnîşana wê Serê pengê ye رأس الخيط.

Wekî din helbestên xwe jî tev kom kirine, niha ji bo çapkirinê amede ne.



## Zagrosê Haco

1.10.1949, ji bajarê Tirbespiyê, herêma Cezîrê, Rojavayê Kurdistanê ye.

Li welatê Swêdê li bajarê Gävle bicih bûye, di sala 1990î de penaber bûye.

Xwendina sereta li gundê Girê Pirê û bajarê Tirbespiyê, xwendina navîn li bajarê Qamişlo û li welatê Çekoslovakiya, li bajarê Brno, endazyariya telekomunikasyonê li Zankoya teknîkî VUT tewa kiriye.

Hin pirtûkên Kurdî li mala wan di nav malbatê de hebûn wek alfabeyên Kurdî, dîwana Sewra Azadî ya Cegerxwîn û Memê Alan bi pêşgotina Nûredîn Zaza; û hin din derengtir bi dest wî ketin, wek: pirtûkên Kamuran Bedirxan ji wan Zimanê Mader, Destpêka Xwendinê û Rêzimana Zimanê Kurdî; Kovara Hawar û Birîna Reş ya Mûsa Enter.

Celadet Bedir-Xan, Kamuran Bedirxan, Cegerxwîn, Nûredîn Zaza û Qenatê Kurdo di çavên wî de bi têkoşîn û berhemên xwe pir mezin bûn.

Ew bi tenê bi Kurdî dinivîse. Ziman ji bo wî xwenasîn e, evîn e, nasname ye.

Ew endazyar e, wî debara xwe bi karê endazyariyê kiriye.

### **Berhema pêşî:**

MAK; Ji wêjeya bulgarî, wergêr: ZEAEZ (Zagrosê Haco), Kovara Şoreşgêr 1, Almanya, Berlîna Roava, Nîsana 1974

## **Berhemên wî**

Pirtûk

- HORAS û KURYAS; Bertold Brecht, werger Zagrosê Haco, Stockholm, Sw, 1992
- DAYIK; Karel Çapek, wergêr Zagrosê Haco, Stockholm, Swêd, 2002
- FERHENGGA GOTARÊN ZANISTÎ, Kurdiska pedagogiska centrum, Stockholm 2017

## **Kovara Şoreşgêr**

Almanya, Berlîna Rojava

- MAK; Ji wêjeya bulgarî, wergêr:ZEAEZ, Şoreşgêr 1, Nîsana 1974
- NAVÊ MIN... XWEŞNAV E; Bavê Nazê, Wergêr:ZEAEZ (Zagrosê Haco), Şoreşgêr 2, tebaxa 1978
- ÇIMA EM STÊRIKAN BI ROJ NABÎNIN?; amadekirina ZEAEZ (Zagrosê Haco), Şoreşgêr 2, tebaxa 1978
- LI SER SÎNORAN; Eduard Kladius, Wergêr ZEAEZ (Zagrosê Haco), Şoreşgêr 2, tebaxa 1978

## **Kovara Stêr**

Rojavayê Kurdistan

- LAŞÊ MIROV; Dr.O.Roman, Wergêr Bilûrvan (Zagrosê Haco), Stêr 2/1983
- ILMÊ TÛRIK; Berhvkirina Bilûrvan, Stêr 3/1983
- MIROV Ê ENERJÎ; Amedekirina Bilûrvan, Stêr 3/1983
- BEHRAM; Amadekirina Bilûrvan, Stêr 4/1984
- LEYSTIKÊN ZAROKAN; Bilûrvan ji devê Nêgiz girtine, Stêr 4/1984
- SED Ê YEK HÊK; berhevkirina Bilûrvan, Stêr 5/1985
- STRANÊN KAR: JARÊ HEBÊ, HOY HOY MEMO (STRANÊN PALEYIYÊ), HEY FELEK FELEK, HEY GERM E; ji devê Bêkes, Bilûrvan, Stêr 5/1985
- GOTINÊN PÊŞIYAN; amadekirina Xiçîk (Zagrosê Haco), Stêr
- HUNERMENDÊ HÊJA YILMAZ GUNAY MIR; Stêr, Stêr 6/1985
- HEVPEYVÎN BI NIVÎSKAR M.EMÎN BOZARSLAN RE; Bilûrvan û Welat, Stêr 7/1986

- DEWLETA EYÛBIYAN; Rojnama Hevkarî jimara 14, wegerandina Bilûrvan, Stêr 7/1986
- VEDÎTIN; Varlin Stransev, wergêr Xiçîk, Stêr 7/1986
- KERO HEVSAR ZERO; Bilûrvan ji devê Nêrgiz grtiye, Stêr 7/1986
- ŞAHBÛNA BI ZAROKAN; ji devê Bêzarê, amedekirina Bilûrvan, Stêr 7/1986
- STRANÊN ZAROKAN; Bilûrvan ji devê Nêrgiz û Hezarê girtine Stêr 8/1987
- KATJIMÊRA BIOLOJÎ; Ji kovara Çtenî, ya çîkî, Wergêr Bilûrvan, Stêr 8/1987
- HEVPEYVÎNA BI MAMOSTA CELÎLÊ CELÎL RE; Bilûrvan, Stêr 13/1989

### **Kovara Armanc**

Stockholm, Swêd

- ALFABÊTA KURDÎ; Zagrosê Haco, Armanc
- BEHRAM JI MIROVAN RE DIKARE BIBE BEHUŞT; Erîk Tandberg, wergêr Zagrosê Haco, Ji kovara swêdî Fakta, Armanc
- KOMPUTER GUHDARIYÊ DIKIN Û BERSIVÊ DIDIN; Tom W. Ottmar, wergêr Zagrosê Haco, Armanc
- TELEFONÊN MOBÎL (Sîstêmên radyotelefoni selularî giştî); Vaclav Zalud, kovara Amaterske Radio1, 1996 , werger Zagrosê Haco, Armanc

### **Kovara Dugir**

Stockholm, Swêd

- GIRÊ MOZAN; Marilyn Kelly Buccellati, Georgia Buccellati, wergêr Zagrosê Haco, Dugir 3, 1996
- GORAN BIKOLE!; Cibran Xelîl Cibran ; pirtûka Bahoz, 1984, wergêr Zagrosê Haco, Dugir 4, 1996
- JAMES ALDRIDGE; Zagrosê Haco, Dugir 5, 1997
- JAMES ALDRIDGE; Jack Lindsay, wergêr Zagrosê Haco, Dugir 5, 1997
- LEŞKER; ji folklorê finlandî, wergêr Zagrosê Haco, Dugir 6, 1997
- BEHREMÊ Haco; Dr. Dieter Buter, wergêr Zagrosê Haco, Dugir 6, 1997
- Çîrokên ji berîka pêşî: MÎZÊNA XÊR Û GUNEHAN; Karel Çapek; werger Zagrosê Haco, Dugir 7, 1997

## Internet

<http://www.gavle.to/~zagros/>

- PÊŞEROJ YAN PAŞEROJ?; Zagrosê Haco, amude.net, 2003
- Vedîtinên dawî ji bajarên bakurê Mezopotamyayê, bajarê Tilbirak: Geoff Emberling & Helen McDonald, Wergêr Zagrosê Haco, rojava.net, 2004
- LEYLAN, PROJEYÊ ŞAHINŞAHIYA AKADAN; Profesora Harvey Weiss, Zankoya Yale, Werger: Zagrosê Haco
- WÊNEYÊN PÊŞÎ JI TÎTAN
- DYA DIXWAZE DAWIYÊ LI TELESKOPA HUBBEL YA 15 SALÎ BÎNE
- RADYOYA ANALOG CIHÊ XWE DIDE YA DÎGÎTAL
- ZAZA Û KURMANC JI ALÎ DNA VE JÎ NÊZÎKTIRÎN GRÛB DERKETIN
- ÇAVÊN BYONÎKÎ BO KORAN
- VOYAGER 1 LI KEVIYA SÎNORÊ SÎSTEMA ROJÊ YE
- SEHKER "IMPACTOR" LI STÊRIKA BI DÛV TEMPEL 1 KET
- KÎJAN HEVKÊŞA LI DINYAYÊ YA HERÎ ÇÊJXWEŞ E?
- BÎRKARÎ ALÎKARIYA KÊŞEYÊN TRAFÎKÊ DIKE
- TELESKOP 'EXTERÊN DÛR' DIBÎNIN
- HARVARD LI BINGEHA JIYANÊ DIGERE
- BEHRAM NÊZÎKÎ ZEMÎNÊ BÛYE
- 'XWENDINA RAMANAN' BI PÎVANA SÎGNALÊN MÊJÎ
- ROTIKVANÎ RAST E, YAN DEREW E?
- JI NÛ EZ TÊ DIGEHIM EINSTEIN ÇI DIBÊJE
- XELATWERGIRÊN XELATA NOBEL
- SUPERKOMPUTER JI NÛ VE MÊJÎ Û GERDÛNÊ DIAFIRÊNIN
- "EM DI HUNDURÊ ÇALAKE REŞ DE DIJÎN"
- SEHKER 'KERESTEYAN JI SER ASTEROYÎDEKÊ DIDE HEV'
- DEH AZMÛNÊN HERÎ SPEHÎ LI DINYAYÊ
- CEMSERÊ MAGNETÎSÎ YÊ BAKUR BI LEZ CIHÊ XWE DIGUHERE

- SALA 2005AN LI BAKUR SALA HERÎ GERM BÛ
- TEQÎNA GERDÛNÎ YA HERÎ DÛR HATE DÎTIN
- KAMÊRA TAZÎKER VÊ BUHARÊ LI FIROKXANEYAN DIKEVINE BER KAR
- HUNERMENDIYA JIMARTINA PÎ BI ALÎKARIYA BELKOYÊ
- EM ÇAWA DIKARIN BIZANIN KO ÇALA REŞ HEYE?
- BANDORA HÊZA CORIOLIS ÇI YE?
- EINSTEIN NE YÊ PÊŞÎ BÛ
- XELATWERGIRÊN XELATA NOBEL YA FÎZYAYÊ 2006
- XELATWERGIRÊ XELATA NOBEL YA KÎMYAYÊ 2006
- VEDÎTINA TRANSISTOR DIKARÎBÛ EWROPÎ BE
- GERA LI PEY LEREYA NEUTRÎNO
- AFIRANDIN JI NETIŞTEKÎ?
- LAŞ BI AWAZAN DIAXIVE
- DÎROKA O
- STÊRZAN ESEH DIKIN KO EINSTEIN ŞAŞ BÛ
- ÇEWTIYÊN PROGRAMAN YÊN HERÎ MEZIN
- KODÊN JINIYANÊ JI GOMANAN JÎRTIR IN
- ÇAWA JIYAN HATE SER ZEMÎNÊ
- CÎHANÊN TERÎB
- GERA LI PEY NEZEMÎNIYAN
- GPS, STÊRA HEYAMA GERDÛNÎ; Çavkanî: Mikael Grönblad, Werger: Zagrosê Haco
- TEMAŞEKIRINA TELEVIZYONÊ FIŞARA XWÎNÊ BILIND DIKE; Çavkanî: Anna-Lena Haverdahl, Svenska Dagbladet, Swêd, Werger: Zagrosê Haco
- NANOTEKNOLOJÎ
- GOOGLE KARÊ XWEDÊ DIKE
- KWAZAR JI NÊZÎK VE
- DATA LI ASTÊ ATOMAN TÊNE EMBARKIRIN

- HEVGUNCÎNA JÎRIYA MIROV Û MAKÎNÊ
- ROBOT DIBINE XWEDÎ RÛ
- EM TEV AFRÎKÎ NE
- BERHEMÊN IT YÊN HERÎ MEZIN LÊBELÊ TÊKÇÛYÎ
- PARÇE JI KAR KET BUGUHRE!
- 14 ERKÊN HERÎ GIRING LI SER MILÊN ENDAZYARAN
- PARÇEKÎ ELEKTONÎ YÊ NÛ "XWEDÊ DA": MEMRÎSTOR
- BER BI EZMÊN VE HILFIRIN, TRAFÎK XITIMIYE!
- MISTEK AVA EXTERA BEHRAM
- WÊNEYÊ HERÎ CIWAN JI ZANISTÊ
- EZMANÊ PAYÎZA 2008
- CANPOLA BEDEW ÇÛ NAV GERDÛNÊ
- PLAZMA YAN LCD?
- PHOENIX BI SERFIRAZÎ KARÊ XWE BIRE SERÎ
- DÎTANEYA EINSTEIN  $E=mc^2$  HATE ÇESPANDIN
- 5 SALAN LI SER BEHRAM: WÊNEYÊN HERÎ CIWAN
- IBM DIXWAZE KOMPUTRÊN WEK MÊJÎ AVA BIKE
- HEBÛNA ÇALA REŞ HATE ÇESPANDIN
- ROBOT ÊDÎ PÊŞDIKEVIN Û WEKE ZÎNDEWERAN XWE LI GOR REWŞÊ DIGUNCÊNIN
- WÎKÎPEDIYA PEYAKE NAV KOMPUTERÊ XWE
- STRÊRIKA BI DÛV BÊ TELESKOP TÊ DÎTIN
- NÊZÎK PERÊN FIREMBÊLÊ BER BI BÊ DIKEVIN
- 10 TRENDÊN TEKNÎKÊ DÊ CIHANA TE BIGUHERÊNIN
- DÎROKA LOGARÎTMA XWEZAYÎ
- BÎRANÎNA DOSTÊ DILSOZ REZOYÊ OSÊ.



## Zahid Mehmûd Xelef

Parêzer Zahid Mehmûd Xelef, di sala 1967an de, li gundê Sîha Biçûk ya ku dikeve başûrê Tirbespiyê, jidayik bûye, û niha li bajarê Qamişlo dimîne.

Ji dema berî 1990î ve bi zimanê Kurdî û Erebî dinivîse.

### **Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

- 1- Perav û dil - Helbest
- 2- Awazên dildar - Helbest
- 3- Sawa Evînê - Helbest
- 4- Jiyana Oxirê - Hebest

٥- أشواق لا ضفاف لها. شعر

٦- حدائق اللازورد. شعر

-Ew çîroknivîs e, hejmarek ji çîrokên wî yên destnivîs hene.

-Ew gotarê jî di mijarên cûrbecûr de dinivîse, û di hin kovar û malperan de belav dike.

-Ew mijûlî karê civaka sivîl jî dibe, simînar û danasînê bi mijarê yasayî dide (werşe)

-ورشات قانونية واجتماعية





## Zara Salih

Di sala 1966an de, li gundê Tenûrî, yê ku dikeve Rojhilatê bajarê Qamişlo, hatiye dunyayê. Xwendina seretayî li dibistana gundê Tenûrî bi dawî kir, û pey re li Qamişlo xwendina xwe berdewam kir.

Ew bi alîkariya mamoste Rezoî Osê fêrî zimanê dayikê bû, ku di sala 1985an de, li gundê wî, Dekşûrî, bi dizî û di xanîkî vala de, ew bi şev çend şagirt bûn, ji Tenûrî û Dekşûrî, beşdarî waneyan dibûn, di wan hersê heyvên havînê de.

### - Xwendina bilind:

\* Akademiya Bilind ya bijîşkiyê ji Zankoya Sofiya, Bulgaria (Master di beşê dermansaziyê de).

\* Master di xwendin û lêkolîna aştî û çareseriyê nakokiyên navdewletî de, Zankoya Koventrî, Brîtaniya.

### - Berhem:

\* Pirtûka (Tenûrî .. mêjû û landikê zarotiyê) bi zimanê Kurdî, di sala 2020an de hate çapkirin.

\* Romana ( الفرقة ١٧ ) ku bi zimanê Erebî ye, 2020.

\* Çîroka (The Secret of SmithTopia) bi zimanê Ingilîzî, di sala 2021ê de, li Brîtaniya hate çapkirin.


\* Gurzek çîrokên nû bi zimanê Kurdî, niha nêzîk, wê bêne çapkirin.

\* Niha ew çîrokeke nû bi zimanê Ingilîzî amade dike.

Ji bilî van berheman, bi dehan gotar û nivîsandin bi zimanê Kurdî, Erebi û Ingilîzî di rojname, kovar û malperan de belavkirine. Yê Kurdî, hin ji wan ku têne bîra wî kovara: ( Aso, Hevînd, Helez) li Rojavayê Kurdistanê.

Di sala 2021an de, xelata (Ashmolean Museum), ya festîvala kelepûrî ya navdewletî li bajarê Oxford, Brîtaniya ku wî bi zimanê Ingilîzî çîroka " Mem û Zîn" pêşkêş kir.

Niha jî li Brîtaniya dimîne.



## Zekeriya Efrîn

Helbestvan û hunermendê Kurd Zekeriya Efrîn, an bi navê xwe yê din Zekeriya Dawûd, di sala 1974an de, li herêma Çiyayê Kurmênc (Efrîn)ê jidayîk bûye.

Zekeriya Efrîn qonaxa xwendina xwe ya seretayî û amadehî li dibistanên Efrînê xwendiyê. Di sala 1991ê de, ew ji amûjgeha Mûzîkê ya bajarê Helebê derçûye.

Piştî ku ji amûjgehê derdiçe, ew dest bi karê mûzîk û nivîsandinê dike. Herweha, ew di salên 1990an û bi şûn ve, dest bi helbestvaniyê dike. Di sala 1994an de, ew gelek helbestan bi zimanê Kurdî dinivîse û belav dike, weke: "Evîna Min, Rêwiya Min, Axa Welat, Rindê Kurdistanê û hwd. Piraniya helbestên wî, di wê serdemê de, bûne stran û li ser zimanan geriyane.

Yekem berhema Zekeriya Efrîn pirtûka helbestê bi navê "Lîlav" bû, ku di sala 2001ê de, li Weşanxaneya Sariya Baran hatiye çapkirin. Herweha, Zekeriya bi domana demê re, gelek berhemên dîtir nivîsîne weke "Pêlên Birîndar (2004), Peyv Dibe Bîranîn (2006), Sêdoz (2021)"

Li rex van berheman, Zekeriya pirtûka helbestê, ya bi navê "Em Hene", ji bo çapê amadekiriye. Gava mirov berhemên helbestvan dixwîne tê de

xwezaya Kurdistanê, evîna rasteqîn, lehngiya zarên welat û xîretiya jina Kurd dibîne.

Tevî wê jî, Zekeriya di warê mûzîkê de ked û xebateke mezin kiriye. Wî bi dehan giropên mûzîkê perwerdekirine, û derhêneriya gelek kilîpên hunerî û belgefilmên hunerî jî kiriye.

Zekeriya Efrîn ji malbateke welatparêz û hunerhez e, malbata wî jî di nava karê mûzîkê û hunerê de ye. Hevjîna wî Yara Hebîb û Keça wî Firişte Efrîn stranbêjiyê dikin, û ta niha gelek stranên ji berhemên wan li ser Televeziyon û malperan hatine belavkirin.



## Zerdeşt Haco

Zerdeşt Haco, zimannas û nivîskarê Kurd e. Di sala 1950î de, li welatê Sûriye, jidayik bûye. Li Almaniya dijî. Serokê PENa Kurd a Ewropayê bû. Wî PHD ya xwe li Zanîngeha Berlîna Azad, di warên zimannasî û zimanên hindî-Îranî de wergirtiye. Heta niha li zanîngehên Berlîn, Bremen û Hambûrgê waneyan dide.

Dr. Haco tevî wergerandina Încîla Pîroz ser zimanê Kurdî bûye. Wî gelek gotar li ser babetên zimannasiyê di kovar û rojnameyên Kurdî de weşandine. Pirtûka wî ya helbestan bi navê *Goraniyên Xerîbiyê* hatiye çapkirin.



## Zubêr Ehmed Zînal

Di sala 1958an de, li gundê Topiz navbera Amûdê û Qamişlo dikeve, jidayik bûye. Xwendina seretayî li gund û ya amadeyî li Qamişlo qedand. Çar salan li Şamê (dar elmû'elimîn) xwendiyê. Li dora 40 salî li dibistanên Qamişlo mamostetî kiriye, refa 5 û 6 bîrkarî û zimanê Erebi daye. Wî bêhtir ji 6 mehan li êzgeha Hêvî pirogrameke zarokan pêşkêş kiriye (helbest, çîrok, zûbêj û metelok). Li dora 16 xelek ji rêzefilimekî tomar kiriye, bi navê: "Tava Sor", li kenala Stêrk, bi zimanê Kurdî bi 40-50 lîstikvanî hate weşandin.

### **Berhemên wî ev in:**

- Du pirtûk ji zimanê Erebi wergerandine zimanê Kurdî: (Romana nivîskar Burhan Mehmûd bi navê "Xewbînê Dawî" 310 rûpel e, û pirtûkek ji Zanîngeha Rojava re beşê Jinolojiya).


-Çend gotar bi zimanê Kurdî di rojnemeya Bûyer de nivîsandine.

- 6 çîrok û 4 şano wergerandine zimanê Erebi, û di kovara Şermola de hatine weşandin.

- Berhemên xwe tev di pirtûkekê de, bi navê (غبغبة اليراع) kom kirine û çap kirine.

Hin berhemên ku bi dawî nebûne, li ber destên wî hene.

\*\*\*\*\*



Bergeyên pirtûkên min

Namûs e li hakim û emîran

Tawan çî ye şa'ir û feqîran

**Ehmedê Xanî**